Bi navê Xwe dê,
Aştî li ser te bît, sipas û pêzanîn jibo te xwînerê hêja.
Herwek tu dizanî Xwandina (Qurana) pîroz zêdey 1400 sal berê jibo Mihemed peyamber eşkere bûye! Eve heman ev destûr û peyame ku jibo Adem, Nû Xwe (Nûh), Ibrahîm, Mûsa, Îsa û hemû peyambera eşkere bûye, rêbaza Xwe dê yêke û çi aligor bi ser da nayên.

Yêkem peyv û fermana Xwe dê jibo Mihemed peyamber ´Bixwîne´ bû!
Lewma xwandin erke li ser milê her Kurdekê bawermendê dînê Ibrahîm û peyrevê rêbaza Mihemed peyamber. Payeva Quranê bi kurdî dibîte Xwandin, lewma pêvîste her kurdeke bawermend ev nivîsîna pîroz bixwînît taku bikarît peyam û fermana Xwe dê jibo Mihemed peyamber şandî vergirît.

Herwek tu dizanî, bi navê Xwe dê û ev nivîsîna pîroz Turk, Ereb û Farisa Kurdistan dagîr kiriye! Lewma pêvîste her Kurdek ew nivîsîna pîroz, ferman û qanûna Xwe dê bixwînît ku mafê miroviyê xwe li bal Xwe dê bizanît!
Bi navê Xwe dê çîroka hebûnê bixwîne û mafê xwe weke mirov bizane û di sîbera Xwe dê, da riha xwe rizgar bike. Xwe dê Padişahê hebûn û nebûnê ye û Vî, em mirovên bawermend, zarûkên A Dem afirnadine ku em bibine cêgirê Vî li ser erdê. Lewma pêwîste tu mirovê Xwe dê nas li ser erdê weke padişah bijî. Bi hizr, gotin û kiryarên xwe yên pak û mirovî Kurdistanê jî bike Padişahî.
Aştî û rehma Xwe dê li ser te û hemû bawermenda bît.

**Eva li ber destê te vergêrane, serçaveya vê bi zimanê erebiye.**
**Ez têgeheştime ku barê her mirovekê hindî têgeheştina wî girane, lewma min Xwandina (Qurana) pîroz şirove nekiriye, min Xwandin (Quran) peyv bi peyv vergêraye. Eger te guman li her peyvekê heye çavdêriya Qurana bi zimanê Erebî û wateya ew peyvê bike.**

Vergêran: Gabar Çolî
Berhev kirin: Şivan Akreyî
ISBN 9798335298841

# Xwandin

Xwandin (Quran) bin-axeya rêzimanê Erebiye. Zimanê Erebî peyrevî li rêzimanê Samî diket, lê zimanê Kurdî li binemala zimanên Hindî Awropayiye û rêzimanê me cudaye. Vergêrana ev gotina Xwe dê bo ser zimanê Kurdî hindek cara pêvîstî bi paş û pêş kirina hindek peyva di eşkereya (aye) da hebû. Lê, tevî cudahiya rêzimana, dîsa jî min çi peyv li ev nivîsîna pîroz kêm û zêde nekirîne!
Xwandin fermana Xwe dê ye û qanûna jiyana ev dinyayê ye, her wisa ev pîvane (Terazû). Di qanûna Xwe dê, da li hemberê başiyê da nebaşiye, li hemberê baweriyê da nebaweriye, li hemberê rastiyê da nerastiye! Li hemberê baxçe (biheştê) da agire (cehneme)! Lewma eger Xwe dê hêlabît, ez serast têgeheştime û min çi peyv lê kêm û zêde nekirîne ku kêşe û giraniya ev pîvana pîroz têk biçît!
Xwe dê dibêje 2 cûre eşkere (aye) hene, hindek fermanin, ev zelalin, lê even dîke mînakin, ev şêlû ne. Mirovên bawermend peyrevî li fermana Xwe dê diken û ew li ser rê têne rênivînî kirin, lê mirovên nebawer û ewên ku li dilê xwe da nexweşî hene peyrevî li mînaka diken û ew li rê diderkevin. Li ser ev têgeheştinê eger min wateya eşkereyekê (aye) nezanîbe, min peyv bi peyv vergêraye ser zimanê Kurdî. Xwe dê hez biket dê singe te fereh bît û tu jî dê wateya evan bizanî! Xwe dê ferman diket pêş rojhilatê da ev nivîsîna pîroz hêdî û hejmartî bixwînî!
Di zimanê Erebî da, navê serekiyê Xwe dê Elah e. Di zimanê Kurdî da em dibêjin Xwe dê, yanî Ev ê jiyanê didete Xwe. Ne Ev zane nejî Ev dizêt! Di zimanê Kurdî da, Xwe dê hem nave hem kiryare û hem lêkere. Li ber xatira Kiryar û Lêker bûna Ev navê pîroz, li cihê ku amaja (basê) Xwe dê heye lê nav nehatiye min peyva Ev yanjî Vî bikar înaye! Her wisa jibo pênaseya Xwe dê, li ew cihê ku navê Elah nehatiye min peyva Ev yan jî Vî bikar înaye! Çimkî Xwe dê ne nêre ne mê ye û Ev herdem û li her derê heye.
Xwandin (Quran) gotina Xwe dê ye! Lewma li şûna peyva pirtûk ê, min peyva nivîsîna pîroz bikar înaye! Gelek cara li şûna amaje bi Rênivînî (Torat) Mizgînî (Incîl) ê yanjî Xwandinê (Quranê) peyva nivîsîna pîroz bikar hatiye. Pirtûk berhema dest û hizra mirovaye lê, eve gotinê Xwe dê ne! Ciyawaziya serekî li nawbera Xwandin (Quran) Rênivînî (Torat) û Mizgînî (Incîl)ê ewe ku Rênivînî (Torat) û Mizgînî (Incîl) tenê jibo rênivîniya mirova hatine şandin lê Xwandin (Quran) rênivînî û mizgîniye hem jibo mirova hem jibo Cina!
Di zimanê Kurdî da min çi cêgirek jibo peyav ´Nebî´ nedîtin, lewma min peyav Pêşbîn bikar înaye! Gelek cara jibo amaje bi Mihemed peyamber peyva Nebî (Pêşbîn) bikar hatiye.

Rêz û sipasên bêpayan jibo Beşar Nêrweyî, Hîvron Turanlî û Peyam Çolî ku wateya gelek peyva bo min gotin û barê min siwik kirin.

| | | |
|---|---|---|
| 1. | Kilîl (El fatîhe) | 1 |
| 2. | Çêl (El beqere) | 2 |
| 3. | Binemala Imran (Al Imran) | 24 |
| 4. | Jinan (El nîsa) | 38 |
| 5. | Cejin (El maîde) | 53 |
| 6. | Ajelên kevî (El enam) | 63 |
| 7. | Bilindiya (El eraf) | 75 |
| 8. | Destkevtên şer (El enfal) | 87 |
| 9. | Peşîmanî (El tewbe) | 92 |
| 10. | Yûnis (Yûnis) | 103 |
| 11. | Hûd (Hûd) | 110 |
| 12. | Yûsif (Yûsif) | 118 |
| 13. | Birûsk (El red) | 125 |
| 14. | Ibrahîm (Ibrahîm) | 128 |
| 15. | Gundê Kevira (El hijir) | 132 |
| 16. | Mêşa Hingvînê (El nehil) | 135 |
| 17. | Rêvîngiya Şevê (El isra) | 143 |
| 18. | Şikevt (El kehf) | 149 |
| 19. | Miryem (Meryem) | 155 |
| 20. | Ta Ha (Ta Ha) | 159 |
| 21. | Pêşbîna (El enbiya) | 165 |
| 22. | Hec (El hec) | 170 |
| 23. | Bawemenda (El mûmînûn) | 175 |
| 24. | Ronahî (El nûr) | 179 |
| 25. | Cudaker (El furqan) | 184 |
| 26. | Helbestvana (El şuera) | 188 |
| 27. | Mêrû (El nemil) | 194 |
| 28. | Çîrok (El qesas) | 199 |
| 29. | Pîrê (El enkabût) | 205 |
| 30. | Rom (El rom) | 209 |
| 31. | Luqman (Luqman) | 213 |
| 32. | Ser nivandin bo Perestînê (El secde) | 215 |
| 33. | Hêzên Hevkar (El ehzab) | 217 |
| 34. | Şîba (Seba) | 222 |
| 35. | Destpêker (Fetir) | 226 |
| 36. | Ya Sîn (Ya sîn) | 229 |
| 37. | Di Rêza da Rêz kirî (El safat) | 232 |
| 38. | Sad (Sad) | 236 |
| 39. | Kom (El zumor) | 239 |
| 40. | Lêbihor (Qafir) | 244 |
| 41. | Bi Hurî Hatî Şirove Kirin (Fusîlat) | 249 |

| | | |
|---|---|---|
| 42. | Ravêj (El şûra) | 253 |
| 43. | Xemla li Zêra (El zuxrof) | 257 |
| 44. | Dûkel (El duxan) | 261 |
| 45. | Çok danan (El casiye) | 263 |
| 46. | Girên Lîm ê (El ehqaf) | 265 |
| 47. | Mihemed (Mihemed) | 268 |
| 48. | Serkevtin (El fetih) | 271 |
| 49. | Odeyên Taybet (El hocorat) | 274 |
| 50. | Qaf (Qaf) | 276 |
| 51. | Belavker (El zariyat) | 278 |
| 52. | Çiya (El tûr) | 280 |
| 53. | Sitêrk (El necim) | 282 |
| 54. | Heyv (El qemer) | 284 |
| 55. | Xwedanê Rehmê (El rehman) | 286 |
| 56. | Rûdan (El waqia) | 288 |
| 57. | Asin (El hedîd) | 290 |
| 58. | Gengeşê (El mûcadile) | 293 |
| 59. | Kom bûn (El heşir) | 296 |
| 60. | Ew Jina ku dê bête Taqî kirin (El mumtehene) | 298 |
| 61. | Rêz (El sef) | 300 |
| 62 | Civat (El cuma) | 301 |
| 63. | Ewên durû (El monafîqûn) | 302 |
| 64. | Dest lê berdana Hevbeş (El teqabon) | 303 |
| 65. | Berdan (El telaq) | 304 |
| 66. | Qedexe kirin (El tehrîm) | 306 |
| 67. | Padişahî (El molk) | 307 |
| 68. | Pênûs (El qelem) | 309 |
| 69. | Hebûna Bêguman (El haqe) | 311 |
| 70. | Hilkêşane Serê (El mêrac) | 313 |
| 71. | Nûh (Nûh) | 314 |
| 72. | Cin (El cin) | 315 |
| 73. | Pêçayî (El mozemêl) | 317 |
| 74. | Ewê Xwe Peçavtî (El modesêr) | 318 |
| 75. | Rabûne ser xwe (El qiyame) | 320 |
| 76. | Mirov (El însan) | 321 |
| 77. | Şandî pêş (El morselat) | 322 |
| 78. | Nûçe (El nebe) | 323 |
| 79. | Ewên ku Radikêşine pêş (El naziat) | 324 |
| 80. | Naw çavên xwe kirine girê (Ebes) | 325 |
| 81. | Helweşandin (El tekwîr) | 326 |
| 82. | Şikan (El inifitar) | 327 |
| 83. | Ewên ku Pîvanên kêm Dipîvên (El motefefîfîn) | 328 |

| | | |
|---|---|---|
| 84. | Tîş bûn (El inşîqaq) | 329 |
| 85. | Kom-Stêrkên Bilind (El borûc) | 330 |
| 86. | Di Şevê da têt (El tariq) | 331 |
| 87. | Herî Bilind (El ela) | 332 |
| 88. | Rûdawa Gelek Dijwar (El xaşiye) | 333 |
| 89. | Serê Sibê (El fecir) | 334 |
| 90. | Bajêr (El beled) | 335 |
| 91. | Roj (El şems) | 336 |
| 92. | Şev (El leyl) | 337 |
| 93. | Ronahiya Serê Sibê (El zuha) | 338 |
| 94. | Fereh kirin (El şerih) | 339 |
| 95. | Hêjîr (El tîn) | 340 |
| 96. | Şêweya ku Pêve Dizeliqît (El eleq) | 341 |
| 97. | Hêz (El qedir) | 342 |
| 98. | Belge (El beyîne) | 343 |
| 99. | Erd hej (El zelzele) | 344 |
| 100. | Hespê Hêriş ê (El adiyat) | 345 |
| 101. | Karesat (El qarie) | 346 |
| 102. | Pêşberkê bo ya zêdetir (El tekasor) | 347 |
| 103. | Roja ku Derbaz dibît (El esir) | 348 |
| 104. | Lome kirin (El homeze) | 349 |
| 105. | Fîl (El fîl) | 350 |
| 106. | Qureyşê (Qoreyiş) | 351 |
| 107. | Qenciyên biçûk (El maûn) | 352 |
| 108. | Firavanî (El kewser) | 353 |
| 109. | Nebawera (El kafirûn) | 354 |
| 110. | Piştîvanî (El nesir) | 355 |
| 111. | Rîşalê Xurmê (El mesed) | 356 |
| 112. | Baweriya Ji Dil we (El ixlas) | 357 |
| 113. | Rojhilat (El feleq) | 358 |
| 114. | Mirova (El nas) | 359 |
| * | Nûbêj (Nivêj bi Kurdî) | 361 |

## 1.Para Kilîl ê

[1] Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[2] Pesn[a] jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinyaya[b]. [3] Xwedanê rehmê, Ev ê ku rehmê didet.
[4] Padişahê[c] roja dadweriyê. [5] Ev Tuyî ku em diperestin, Ev Tuyî ku em daxwaza
yarmetiyê lê diken. [6] Me rênivîniyê rêya rast bike. [7] Rêya ewên ku Te erênî kirîne,
ewên ku kerb newekirîne, ewên ku li rê nederketine.

1

* Bi awayek giştî jiboy Xwe dê peyvên Vî û Ev bikar hatine.
* Wateya peyva Quran ê bi Kurdî dibîte Xwandin. Ev berheme gotina Xwe dê ye. Lewma li şûna peyva pirtûkê min peyav nivîsîna pîroz bikar înaye. Pirtûk berhema dest û hizra mirova ne.
* Wateya peyva Sûre dibîte, heviş, çar dor girtî, pirtik, par, pişik, lewma min peyva Par bikar îniye.
* Li şûna peyva haşa û înkar min peyva nikolî bikar înaye.
* Li şûna peyva nivêjê, min peyva Nûbêj bikar înaye, ez pêvîst dizanim, em pariyana xwe, ser li nû bi zimanê xwe yê zikmakî bêjin, lewma min peyva nûbêjê bo nivêjê bikar înaye.
* Li şûna peyva kafir, min peyva nebawer bikar înaye. (ewê ku bawer bi Xwe dê naken)
* Para kilîlê destpêkê û devê nûbêjê ye.
* Peyva Rehm, peyvek Kurdiye, mînaka herî kevnar, navê Ibrahîm peyambere ku bi Kurdî dibîte Ê birehme! Ew peyv gelek cara bikar hatiye.
* Li şûna peyva Aye (Gotin û destûra Xwe dê li Xwandinê da) min peyva eşkere bikar înaye.
* Li şûna peyva Wehî (Gotin û destûra Xwe dê bo peyambera) min peyva sirûş bikar înaye.
* Li şûna peyva Ayet (Nîşaniya Xwe dê, mucîze) min peyva nîşane bikar înaye.
* Li şûna peyva Melek, Milyaket min peyva Firişte bikar înaye.
* Li şûna peyva Resûl (Pêxember) min peyva Peyamber bikar înaye.
* Li şûna peyva Nebî, min peyva Pêşbîn bikar înaye.
* Li şûna peyva Qiyametê, min bi piranî peyva Vejiyan ê bikar înaye, lê Qiyamet yanî rabûne ser xwe. Dema ku li roja vejiyanê da mirov dê rabine ser xwe.
* Li şûna peyva Axiretê min peyva Dawiyê bikar înaye.
* Li şûna peyva Nemet min peyva Erênî bikar înaye.
* Li şûna peyva Mosliman min peyva ´ewê xwe radest kirî´ bikar înaye.
* Li şûna peyva Zikat ê min peyava ´ew xêra ku bo te hatiye dest nîşan kirin´ bikar înaye.

a: Li şûna peyva Hemd min peyva Pesn bikar înaye.
b: Di zimanê Erebî da wateya peyva el alemîn dibîte, hemû dinyaya; dinyaya mirova, firişta, ajela, hemû rihtibera, ev dinyaye û dinyaya dîke jî.
c: Li gor gotina Dr. Şebîr Elî,10 xwandinên ciyawaz li hindek peyvên Xwandina (Qurana) pîroz têne kirin. Peyva Malk yêk li wan peyvaye ku ciyawaz tê xwandin. Li Bakûrê Afrîqa ew peyvê bi Padişah dixwînin. Li cihên dîke ew peyvê bi Serwer, Serok dixwînin. Padişah li desthilat û pileya xwe da li serok û serwer bilindtire lewma min peyva Padişah bikar înaye. Gelek cara li Xwandina (Qurana) pîroz da weke Padişah pênaseya Xwe dê hatiye kirin.

## 2.Para Çêl ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Elîf Lam Mîm[a] 2 Eve, ev nivîsîna pîorze ku têda çi guman[b] nîne û jiboy ew kesa
rênivênî têdaye, ew kesên ku hişyarê Vî ne. 3 Ewên ku bawerî bi nedîtiyê hene û
nûbêja[c] diken û diden li ewa Me daye wan. 4 Ewên ku bawerî bi evê hene ku bo te
eşkere[d] bûye û hatiye xarê û bawerî bi evê hene ku Me pêş te da şandiye, ewên ku
bawerî bi Dawiyê[e] hene. 5 Ewane ew kesin ku rênivîniya Xwedanê xwe dişopînin û dê
serkevin. 6 Lê ewên ku bawer naken jiboy wan herwek yêke, çi ciyawaziyekê naket çi
tu wan hişyar bikey yanjî hişyar nekey: ew bawer naken. 7 Xwe dê dil û guhê wan
pêçaye û çavê wan peçavtî ne. Ew dê eşkenceyek gelek mezin bibînin. 8 Hindek li wan
mirova dibêjin; ´Me bawerî bi Xwe dê û Roja Dawiyê heye´ Lê ew bawermend nînin.
9 Ew dixwazin Xwe dê û mirovên bawermend bixapînin. Lê li xêncî riha xwe, kesê
dîke naxwapînin û bixwe jî nizanin. 10 Di dilê wan de nexweşiyek heye ku
Xwe dê lê zêde kiriye. Liber direwên wan, êşkenceya bi-êş li benda wane. 11 Dema
dibêjine wan, ´Li ser erdê gendeliyê çêneken´ Ew dibêjin; ´Em tiştên xar serast diken. ´
12 Birastî, ew gendeliyê çêdiken, lê bixwe jî tênagehin. 13 Dema ku dibêjine wan
´Bawer biken herwek ku mirovên dîke bawer kirîne´ Ew dibêjin, ´Dibît em jî wek ew
nezana bawer biken? ´ Lê ew bixwe nezanin, herçend ew nizanin jî. 14 Dema ew
bawermenda dibînin, dibêjin; ´Em bawer diken´ Lê dema ku digel şeytanên xwe re
bitenê dimînin ew dibêjin; ´Birastî em digel te da ne, em tenê trana[f] diken.´ 15 Xwe dê
trana ewan diket û sînor bezandina wan dirêjtir diket û ew bi koretî digerên. 16 Li şûna
rênivîniyê da, ewan bixwe şaşî kirîne, ew dan û sitandina wan çi qazancê naket û ew
yê rênivînî kirî nînin. 17 Ew mîna ew kesiye ku agir hilkir lê dema ku hemû tiştê der
dorê wî ronahî kir Xwe dê ronahî lê sitand û ew di tarîtiyê da ma û ew nekarî bibînît.
18 ker lal û kore, lewma ew nawegerên. 19 Yanjî mîna ewre tirîşqa li asîman da, ewrê bi
birûsk, tarîtî û ronahî. Li tirsê mirinê da, ew tiliyên xwe dikene guhê xwe da, taku
dengê gurnjîna ewre tirîşqê li xwe dûr biken, lê Xwe dê nebawera dorpêç diket.
20 Hema hema birûsk ronahiya çavên wan li wan distîne: her dema ku birûsk li ser
wan dibiriqît ew rêve diçin û dema tarîtî bi ser ewan da dikevît ew radwestin. Eger
Xwe dê hez kiriba dê dîtin û bihîstin jî li wan sitandiba. Xwe dê desthilat li ser her tiştê
heye.



a: 29 parên Xwandinê bi pîtên wek elîf lam û etc dest pê diken, şiroveyên ciyawaz li ser da hatine gotin, lê li hemûya balkêştir gotina Reşad Xelîfe ye ku digot ew tîpane jimare ne û jimara 19 nîşane û jimara Xwe dê ye.

b: Şik

c: Nivêj

d: Wehî, gotina Xwe dê, aşkira bûn.

e: Axiret, Roja herî dawiyê, f: Henek, Fişe, Qeşmerî, Pêkenîn.

21 Mirovino, Xwedanê xwe biperstin, Ev ê ku hûn û ewên pêş we da hatî afirnadîne.
Belke liber hindê hûn hişyar bin. 22 Ev ê ku jiboy we erd kiriye ravêxek û asîman kiriye
banek û av jê şand xarê û pê wê, berhem înane bo xwarina we. Lewma dema ku hûn
dizanin jiboy Xwe dê dijbera çêneken. 23 Eger we li eva ku Me bo koleyê Xwe şandiye
xarê guman heye ka parçeyekê mîna vê berhem bînin û bes Xwe dê nebît, gazî gewahê[a]
xwe biken, eger hûn rast dibêjin. 24 Eger hûn vê naken ku hûn çi cara nikarin jî, bes
hişyarê ew agiri bin ku sotemeniya ew agiri mirov û kevirin û jiboy nebawer hazire.
25 Mizgîniya bexçeyên ku çem têda diherikin bide ew bawermenda ku başiyê diken.
Hemû carê ku li berhema wan xwarinê didene ewan, ew dê bêjin: ´Berê berhemên mîna
ew berhemane dayne me. ´Jiber ku pêşta tiştên wisa dayne wan û ew dê bibine xwediyê
hevjînên pak kirî û ew dê bêpayan li wir bimînin. 26 Xwe dê li berawird kirina tişta şerm
naket tenanet ya weke pêşûyê yanjî biçûktir. Ewên ku bawer kirîne dizanin ev rastiye ji
bal Xwedanê wan we. Lê mirovên nebawer dibêjin: ´Mebesta Xwe dê li ew berawird
kirinê weke mînake çiye? ´ Pê wan berawirda, Ev, geleka li rê dertêxît û gelekan jî
rênivîniyê rê diket. Lê Ev tenê, wan mirova li rê dertêxît ku bi pêdagirî serkêşin. 27 Ewên
ku peymana xwe digel Xwe dê şikandin, piştî ku girêbest kiribûn, ewên ku ew girêya qet
diken ku Xwe dê ferman diket bi hev re werin girêdan, ewên ku dibine hokarê gendeliyê
li ser erdê, ewane ewin ku dê bidorînin. 28 Tu çawa dikarî bawerî bi Xwe dê nekey dema
tu mirî bûy û Vî jiyan da te. Dema ku Ev ê, te vemirîne û paşan vejîne ku tu vegerî bal
Vî. 29 Ev ê ku hemû tiştên li ser rûyê erdê bo te afirandiye. Paşê berê Xwe, da asîman û
heft asîman çêkirin. Ev e ku her tiştî dizane.
30 Dema ku Xwedanê te gote firişta[b], ´Ez ê bo Xwe cêgirekê danême ser erdê, firişta
got: ´Tu dê yekê li wir bicih bikî ku bibe hokarê[c] gendelî û xwîn rijandinê. Dema ku em
pesna Te pîroz digrin û pakiya Te radgehînin? Lê Xwe dê got: ´Ez dizanim ewa hûn
nizanin.´ 31 Vî, A Dem fêrî navê hemûya kir. Paşê ew nîşanî firişta dan û Got: ´Eger hûn
rast dibêjin, ka bo Min navên ewane bêjen´ 32 Ewan got: ´Bilindî her ya Te ye! Em tenê
ewê dizanin, ewa ku Te em fêr kirîne. Tu Zanayî, Dadwerî. ´
33 Paşê Vî got: ´Ka A Dem navê evane bêje wan.´ Dema A Dem navê van got,
Ev got: ´Meger Min negote we, Ez dizanim li ser erd û li esmanan çi weşartiye û Ez
dizanim hûn çi eşkere diken û hûn çi diweşêrin? ´ 34 Dema Me gote firişta li ber A Dem
çok danên û serê xwe binvînin, hemûya çokê xwe danan û serê xwe nivandin bes Iblîs
nebît. Ew nepejirand, ew qude bû û bûye nebawer. 35 Me gote A Dem ´Bi hevjîna xwe
re li naw ev baxçeyî da bijî. Hûn her du jî li wir bi keyfa dilê xwe û bi azadî bixwen, lê
nêzîkî ew darê nebin, neka hûn her du jî dê bibine nerastkar.´



a: Şahid
b: Melek, milyaket
c: Sebeb, delîl

36 Lê Şeytan ew lê înane xarê û ew li rewşa ku têda bûn, dane der êxistin. Me got: ´Herne
xarê. Hindek li we dijminê ewên dîkene. Ta demekê li ser rûyê erdê, we dê cihek hebit
ku lê bimînin û we dê debarek hebît ku pê bijîn.´ 37 Paşê A Dem li Xwedanê xwe peyv
vergirtin û Xwe dê peşîmaniya wî pejirand. Ev e ku peşîmaniyê dipejirînît, Ev ê Birehm.
38 Me got, ´Hûn hemû lê herine xarê! Lê dema ku li bal Min we rênivînî jibo we têt.
Jibo ew kesên ku peyrevî li rênivîniya Min diken, ne tirs heye nejî xemgînî.
39 Lê ewên ku bawer naken û nikoliyê[a] li eşkereyên Me diken, ew dê bibine hevrêyên
naw agir û ew dê ta bêdawiyê li wir bimînin. ´ 40 Zarûkên Israîli, ew erêniya ku Min li
we kiriye bîra we bît û peymana Min bicih bînin û Ez jî dê peymana we bicih bînim.
Ezim Ev ê ku divê hûn lê bitirsin. 41 Bawer bi eva Min şandiye xarê biken ku evê[b] piştrast
diket, eva ku li bal we ye. Nebine yêkem kes ku bawer pê naken û peyama Min bi
buhayek kêm nefroşin: hişyarê Min bin. 42 Rastî û direwê têkel nekin û dema ku hûn
rastiyê dizanin ewê neweşêrin. 43 Nûbêjê[c] bidomîne û ew xêra ku jibo te hatiye dihar
kirin[d] bide û digel ewên ku serê xwe diçemînin serê xwe biçevîne. 44 Tu fermanê li
mirova dikey karên rast biken û bixwe jî li bîr dikey, dema ku tu nivîsîna pîroz[e] dixwînî?
Bes tu hizra xwe bikar naynî? 45 Bi bêhin ferehî û nûbêja daxwaza yarmetiyê biken, lê
birastî eve dijware, bes bo ewan nebît ku xwe ûstîxar kirîne û xwe radest kirîne[f]. 46 Ew
arxayînin ku dê Xwedanê xwe bibînin û dê vegerêne bal Vî.
47 Zarûkên Israîli, erêniya Min bîra we bît û çawa Min li gelên dîke zêdetir qencî li we
kir. 48 Hişyarê ew Rojê bin ku hîç rihek têra rihek dîke naket, çi nawbêjvanî bo rihê nayê
pejirandin û çi qerebû[g] jibo rihê nayên vergirtin. Nejî dê yarmetiya wan biden.
49 Dema Me hûn li destê netewa Fireûnî rizgar kirin. Ewên ku hûn bi êşkenceyeke
dijwar êşandin. Kurê we serjê kirin û tenê li jiyana jinên we xweş bûn. Ew li aliyê
Xwedanê we ra ezmûnek[h] gelek mezin bû 50 û dema Me bo we derya ker kir taku we
rizgar ken û gelê Fireûnî peş çavê we xendiqand. 51 Me çil şev bo Mûsa destnîşan kirin
û piştî wî, we golik hilbijart- we şaşî kir! 52 Paşê Em li we xweş bûn, belke li ber hindê
hûn sipasdar bin. 53Me nivîsîna pîroz[i] da Mûsa û wateya cudakirin rast û nerastiyê jî da
wî, belke li ber hindê hûn bêne rênivînî kirin. 54 Mûsa gote netewa xwe: ´Ey netewa min,
bi vergirtina golikê[j] we şaşî li xwe kiriye, daxwaza lêborînê li Afrînerê xwe biken û kesên
tawankar li naw xwe da bikujin. Li ber çavê Afrînerê we, eve baştrîn kare ku hûn biken.
Paşê Vî peşîmaniya we pejirand[k]. Ev peşîmaniya dipejirînît û Rehmê didet. 55 Dema we
got, ´Mûsa, em çi cara bawerî bi te naken taku em Xwe dê rûbirû nebînin, aha wê hindê
da, we lê nihêrî û brûskê li we da. 56 Paşê Me hûn vejandin, piştî ku hûn mirin, belke li
ber hindê hûn sipasdar bin.



a: Haşa, înkar b: Rênivînî (Torat) c:Nivêj d:Zikat
e: Xwandin (Quran) f:Mosliman g: Berdêl, li şûn da h: Imtîhan, ceribandin
i: Rênivînî (Torat) j: Perestîna golikê k: Qebûl kir, Erê kir

[57] Me pê ewra li ser we kire sîber û mena[a] û herwêde[b] bo xwarina we şandine xarê. Me
got: ´Li ew debarên baş bixwen ku Me dayne we.´ Ewan şaşî li Me nekir, lê ewan şaşî li
xwe dikir. [58] Dema Me got: ´Bi serbestî têkevine ew gundî û bi azadî li wir bixwen wekî
ku hûn hez diken, lê gava hûn li derî çone jor, çok danên û serê xwe binvînine ser erdê
û daxwaza peşîmaniyê biken û Em ê li gunehên we xweş bin û ewên başiyê diken Em ê
zedê biken. [59] Lê belê ew kesên ku nerastî kirin, li cihê ragehandina ku gotibûne wan,
gotinên cuda cêgir kirin. Lewma Me li esman ra sizayek şande xarê, bo ser ewên ku
nerastî kiribûn. Jiberku ew bi pêdagirî serkêş bûn. [60] Dema ku Mûsa jibo netewa xwe
daxwaza avê kir. Me gotê: ´Pê kopalê xwe li kevir bide.´ Dunzdeh kanî peqîn û hemû
mirova cihê vexwarina xwe dizanîbû. ´Bixwen û vexwen li ev debara Xwe dê û karên
kotî neken û gendeliyê li ser erdê belav neken. [61] Dema we got: ´Mûsa, em nikarin tenê
xwarinekê bixwin. Liber Xwedanê xwe bipariyê bila li wan berhemê erdê bo me hindek
pancar, xiyar, sîrik, nîsik û pîvaza derêxît.´ Wî got: ´Meger hûn dê ewa zêdetir digel ewa
kêmtir veguherin? Herine Misrê, ew tiştê we daxwaz kirî hûn dê li wêderê peyda biken.
Ew bi xemgînî û serşoriyê hatine qotan û wan kerbê Xwe dê yê gelek mezin vekirin,
çimkî, ewan bawerî bi eşkereyên Xwe dê nekirin û bêy ku mafê wê hindê hebin Pêşbîn[c]
kuştin. Ewe hemû liber wê hindê bû ku ewan peyrevî nekiribûn û sînor bezandibûn.
[62] Ewên ku birastî bawer diken; ewên Cihû, Fele û ewên Şîbayê. Hemû ewên ku bawerî
bi Xwe dê û Roja dawiyê hene û karê durust diken- Ew dê padaşê xwe li Xwedanê xwe
vergirin. Jibo wan, ne tirs heye nejî dê xemgîn bin. [63] Dema Me digel we peyman girê
da û Me li ser we da çiya bilind kir: ´Eva Me daye we qahîm bigrin û naveroka vê di
hişê xwe de xwedan ken taku belke hûn hişyar bin.´ [64] Tenanet piştî vê jî, we pişta xwe
dayê. Eger li ber qencî û rehma Xwe dê li ser we neba, bêguman hûn dê li wan kesa
ban ku dê dorandiban. [65] Her li berê da, we sebaret bi ew kesên ku Roja Şemî yê
şikandin dizanî, Me gote wan, ´Bibne meymûnên kerb lê vebûyî. ´ [66] Me ev, jibo wan
kesên ku ew demê li wir bûn û ewên ku li paş wan hatin, kire sizayeke jêveger û jibo
kesên ku hişyarê Vî ne Me ev kiriye wane[d]. [67] Û Dema Mûsa gote gelê xwe: ´Birastî
Xwe dê ferman li we diket ku hûn çêlekê serjêken´ Ewan got: ´Tu henekê xwe bi me
dikey? ´ Wî got: ´Ez penaha xwe jiboy Xwe dê dibem, çimkî ez li naw nezana dame.´
[68] Ewan got: ´Ka bo me gazî Xwedanê xwe bike bila nîşanî me bidet ka ew çiye?´ Wî
got: ´Ew ne çêleke sawa ye nejî pîre, lê di nawberê da. Lewma, ew fermana li we hatiye
kirin bicih bînin.



a: Tişteke weke nan.
b: Balindeyek weke kevê ye ku li naw zewî zara hêlûna xwe çêdiket
c: Nebî
d: Ders

69 Ewan got: ´Ka bo me bike gazî Xwedanê xwe, bila nîşanî me bidet ew çi renge? ´ Wî
bersiv da: Ev dibêjît: ´Çêleke zer ê ronahî û li ber çavan bedeve.´ 70 Ewan got: ´Ka bo
me bike gazî Xwedanê xwe bila nîşanî me bidet tam ew çiye?´ Li ber çavên me kêm û
zêde hemu çêl wekhevin. Xwe dê hez ket emê bêne rênivînî kirin.´ 71 Wî bersiv da: ´Ev
dibêjît, ew çêl ne bo cotê nejî bo av daniya zewya hatiye perwerde kirin. Ew bêkemasî
û bêxal e. Wan got: ´Niha te rastî îna.´ Lewma ew çêl serjêkirin. Lê belê kêm mabû ku
ew, wî karî neken. 72 Dema we kesek kuşt û sebaret bi ew mijarê gengeşe kir – lê Ev
Xwe dê bû ew tiştê ku we veşartibû îna derê. 73 Lewma Me got: ´Pê parçeyek laşê wê li
mirî biden, wiha Xwe dê mirî vedijîne ku nîşaniyên Xwe pêşanî we bidet, belke li ber
hindê hûn hizra xwe bikar bînin. 74 Tenanet piştî wê jî, dilê we wekî keviran req bû
hema li keviran jî reqtir bû. Çimkî birastî çem li kevira diteqin. Hindek li wan dema ku
ker dibin av lê diherike û hindek jî hene, dema liber tirsa Xwe dê matmayî dimînin û
dikevin xarê. Xwe dê li kiryarê we bê-agah nîne! 75 Çawa hûn dikarin hêvî biken ku
mirovên wisa baweriyê bi we biken? Dema hindek ji wan, gava ku peyvên Xwe dê
dibhîstin bi zanebûn badidan, tenanet dema ku ew têgeheştibûn û wan dizanî! 76 Dema
ew bawermenda dibînin, dibêjin: ´Me jî bawer kiriye´ Lê dema ew bihevra bitenê
dimînin, dibêjine hevdu, ´Hûn çawa dikarin sebaret bi ev peyama ku Xwe dê jiboy we
eşkere[a] kiriye, bêjine wan? Çimkî ew dê bikarin li hember Xwedanê we, pê evê digel we
gengeşê biken. Meger hûn hizira xwe bikar naynin´ 77 Meger ew nizanin ku Xwe dê
dizanît ew çi diveşêrin û çi dibêjin? 78 Hindek li wan nexwîndevarin û nivîsîna pîroz
nizanin, bes pêka dil û daxwazê xwe dibêjin, ew tenê texmîna dibêjin. 79 Lewma, hewar
li wan bikevît, ewên ku pê destê xwe pirtûkekê dinivîsin û paşê dibêjin ´Ewe li Xwe dê
ye! ´ Tenê jiberku veguherine buhayeke kêm. Hewar li wan bikevît bo ewa ku destê wan
nivîsiye. Hewar li wan bikevît bo ewa destê wan dikevît. 80 Ew dibêjin: ´Agir bi me
nakevît, bes tenê bo çend roja nebît´ Bêje: ´We çi peyman li Xwe dê vergirtine? Çimkî
Xwe dê çi cara peymana xwe naşkînît - Yanjî hûn derbarê Xwe dê, da tişta dibêjin ku
we çi zanistek li ser da nîne?´ 81 Erê! Ewên ku nebaşiyê dest xwe têxin û di gunehê xwe
da dorpêç bûne ew dê bibine hevrêyên naw agir û ta bêdawiyê ew dê li wir bimînin.
82 Lê belê, ewên ku bawermendin û karên durust diken dê bibine hevrêyê naw baxçe û
ta bêdawiyê ew dê li wir bimînin. 83 Dema ku Me peyman li zarûkên Israîl vergirt ku:
´Kesê neperistin bes Xwe dê nebît. Digel dayik, bab, xizm, sêwî û hejara baş bin. Gotinê
baş bêjine hemû kesê. Nûbêjê xwe biken û ew xêra bo we hatiye dîhar kirin biden[b].´
Paşê we hemûya pişta xwe dayê bes çend kes nebin û we nepejirand. 84 Dema ku Me
peyman li we sitand ku ´Hûn xwîna hevdu nerêjin û hûn hevdu li malên hev nekene
der.´ Hingê we ev peyman pejirand û hûn gewahiya wê jî diden.



a: Aye, peyama Xwe dê
b: Zikat

85 Paşê hûn hevdu dikujin û hindek li we, ewên dîke li malê wan dikene der û hûn
yarmetiya hevdu diden, li guneha û hêriş kirine ser yek. Dema ew, weke girtî têne bal
we, hûn dê bo serbestiya wan diraf biden, lê tenanet we mafê wê nebû ku ewan li malê
wan bikene der. Wisa be, hûn bawerî bi hindek parçeyên ev nivîsîna pîroz diken û hûn
bawerî bi hindek parçeyên dîke naken? Sizaya ew kesên ku ew karî diken li xêncî
serşoriyê li ev dinyayê da hiç tiştek dîke nîne û di Roja Vejiyanê da ew dê bi dijwartrin
eşkenceyê bêne siza dan. Xwe dê li kiryarên we bê-agah nîne. 86 Ewane, ew kesin ku
jiyana ev dinyayê pê nirxa Dawiyê dikrin. Ne dê eşkenceya wan kêm bît û nejî dê
yarmetiya wan bête kirin! 87 Me ev nivîsîna pîroz da Mûsa û li piştî wî li pey hev Me
peyamber şandin. Me nîşaneyên zelal dane Îsayê kurê Miryemê û Me ew pê riha pak
bihêz kir. Ewe çawaye dema peyamber, eva ku bi dilê we nebît tînin, hûn qude[a] dibin
û nikolî[b] li hindeka diken û hûn ewê dîke jî dikujin? 88 Ew dibêjin, ´Dilên me pêçayîne´
Lê, liber nebaweriya wan Xwe dê ew nerênî kirîne. Ber xatira hindê ku baweriya wan
gelek kême. 89 Dema nivîsîneke pîroz[c] li bal Xwe dê ra jiboy wan hat û eva[d] ku li bal
wan bû erênî kir û herçend ku pêşta ew jibo serkevtinê li dijî nebawera li ber Xwe dê
dipariyan. Tenanet dema eva ku wan nas kir jiboy wan hat, ewan bawerî pê nekir.
Lewma dê nerêniya Xwe dê li ser nebawera bît. 90 Çend kotiye ewa ku wan xwe pê
firotiye, bawer naken bi eva ku Xwe dê şandiye xarê, kîne hene ku Xwe dê li qenciya
Xwe dişînîte xarê, li ser her koleyek Xwe ku Ev hez diket. Lewma ewan kerbê mezin li
ser kerbê mezin înaye ser xwe û nebawera sizaya rûreşiye heye! 91 Dema dibêjine wan
´Bawerî bi evê biken ku Xwe dê eşkere kiriye, ew dibêjin, ´Em bawer bi vê diken ku bo
me eşkere bûye.´ Lê ew bawer bi vê naken ku paştir hatiye, tenanet ev yek birastî, eva
ku wan heyi erênî diket. Bêje, ´Eger hûn birastî bawermendin, we çima pêşta, Pêşbîn ê
Xwe dê şandî kuştin? 92 Mûsa jibo we nîşaneyên zelal înabûn lê paşê, we golik vergit -
we nerastî kir. 93 Dema Me peyman li we sitand, Me çiya ser we da bilind kir û ´Eva Me
daye we qahîm bigrin û guhê xwe bidenê.´ Ewan got; ´Em dibhên lê em peyrevî naken´
Û jiber nebaweriya wan, li dil da, golik bi wan dane vexwarin. Bêje, ´Çend kotiye ew
tişta ku baweriya we ferman li we kiriye ku hûn biken! Eger dibya hûn bawermend bin´
94 Bêje, ´Eger mala dawiyê li bal Xwe dê xêncî we, bo çi kesê dîke nîne, bes daxwaza
mirinê biken, eger hûn rast dibêjin.´ 95 Lê, liber ewa ku wan bi destê xwe, pêş xwe da
şandiye, ew çi cara daxwaza mirinê naken. Xwe dê agahdarê ewane ku karên nebaş
diken. 96 Bêguman, tu dê bibînî ku wan xwe li mirovên dîke qahîmtir bi jiyanê we
girêdane, tenanet li ewên ku gelek ´hevala´ jiboy Vî peyda diken. Her yêk li wan xwaziya
jiyaneke hezar salî dixwazît, lê jiyanek wisa dirêj jî nikarît ewan li eşkenceyê biparêzît.
Xwe dê ewa ku ew diken dibînît.



a: Xwe bayî, Xwe mezin zan
b: Li şûna peyva haşa, înkar, min peyva nikolî bikar înaye
c: Xwandin (Quran)
d: Rênivînî (Torat)

97 Bêje, ´Eger kesek li we dijminê Cibraîl e- ewê ku bi destûra Xwe dê eve îna xar bo
naw dilê te, eva li pêş evê da erênî kir û weke rênivînî û mizgînî jibo bawermenda ´
98 Her kesek dijminê Xwe dê, firişta û peyamberên Vî ye, dijminê Cibraîl û Mikaîl ye,
bes bêguman Xwe dê dijminê nebawera ye. 99 Birastî Me jiboy te eşkereyên zelal şandine
xarê, kes nikoliyê li wan naket bes ew nebin ku bi pêdagirî dijberiyê diken.
100 Meger ewan hemû carê peyman girê nedan û pişt guhê xwe we nehavêtin? Bes
hindek li wan nebin, piraniya wan bawer naken. 101 Dema ku peyamberek li bal
Xwe dê we hate bal wan û erênî kir eva li bal wan bû, hindek li wan ku pêşta bo wan
nivîsînên pîroz hatibû, nivîsîna pîroza Xwe dê ser mile xwe we havêtin, wek tu bêjî ewan
çi zanist nebû 102 û peyrevî li wê kirin ku Şeytana li dema padişahiya Silêmani da
gotibûn. Ne ewe ku Silêman nebawer bû, lê Şeytan nebawer bûn û mirov fêrî cadûya û
ewa li Babîlonê bo her du firişta, Harût û Marût eşkere bûyi kirin. Lê ew her du ya çi
cara çi kes fêr nekirin, meger ku pêşta bêjin, ´Em tenê ezmûnekin, lewma ser baweriya
xwe we neçin´ Li wan her du ya ew, fêr dibin ku çawa bibine hokarê cuda bûnê li
nawbera mêr û hevjîna wî. Herçend ew nikarin pê wê zirarê li kesê biden, meger destûra
Xwe dê li ser nebît. Ew fêrî wê dibin ku zirarê digehînîte wan, nek ewa ku qazancê
digehînîte wan. Ewan baş dizanî her kesê ku ewê bikrît, ew çi pişk li Dawiyê çinabin.
Birastî kotiye ewa ku wan xwe pê firotiye, tenê eger ewan zanîba! 103 Eger ewan bawer
kiriba û hişyarê Vî ban, padaşê wan li bal Xwe dê, dê baştir ba, tenê eger ewan zanîba.
104 Bawermendino nebêjin ´Ka me binêre[a]´ lê bêjin ´Bi bêhnek fereh benda me raweste
û guhdar bin.´ Eşkenceyek bijan li benda nebawerane. 105 Ne ew nebawerên xwedan
nivîsîna pîroz û nejî putperest[b] hez diken ku çi tiştek baş li bal Xwedanê te we bo te
bête xar. Lê Xwe dê jiboy rehma Xwe, ew kesê ku Ev dixwazît hildibjêrît. Xwe dê
xwedanê xelatê gelek mezine. 106 Her gotinek pîroz ku Em sernixûn ken yanjî bidene
bîr kirin, yan Em dê cihê ev gotinê digel gotinek baştir yanjî gotinek mîna vê veguherin.
Meger tu nizanî Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye? 107 Meger tu nizanî desthilata
erd û esmana ya Vî ye û xêncî Xwe dê we çi parêzer û yarmetîder nînin? 108 Yan, hûn
jî hez diken ku daxwaza tiştek wisa li peyamberê xwe biken, mîna ew daxwaza ku li
Mûsa hatibû kirin? Her kesê ku baweriya xwe digel nebaweriyê veguherît ew kes gelek
li rêya rast dûr ketiye. 109 Gelek li wan mirovên nivîsîna pîroz ji dil daxwaz diken ku
ewan karîba we vegerine ser nebaweriyê, tenanet piştî ku we bawer kiriye. Tenanet piştî
ku rastî bo wan zelal bûyî, ew li ber dilreşiyê wê diken. Wan bibhore û guhê xwe nedê,
taku Xwe dê fermanê diket. Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye.



a: Li gor gotina Ebdil Helîm, hindek Cihû yê şarê Medînê, ku kerbê wan li Mihemed peyamber divebû, bi ziman xarî gotina peyva Reîna (Li me binêre) vegohertin û wateya wê dibû, ´Tu nezanî´, yan jî ´hûn kerê pez´! Lewma ferman li bawermenda hatiye kirin ku peyva Reîna bikar neyin. Li şûn da peyva ûnzurna bikar bînin.
a: Ew mirovên ku hevala jibo Xwe dê peyda diken.

[110] Nûbêjê xwe biken û ew xêra ji bo we hatî dîhar kirin biden. Çi başiyê hûn bixwe
pêşta rêken hûn dê ewan bal Xwe dê peyda biken. Xwe dê ewa ku hûn diken dibînît.
[111] Û ew dibêjin, ´Kes naçîte biheştê meger ew Cihû yanjî Fele nebin,´ Ewe daxwaza
dilê wane. Bêje, ´Ka belgeyê xwe derêxin, eger hûn rast dibêjin.´ [112] Erê! Her kesek bi
tevahî xwe radestê Xwe dê biket[a] û başiyê biket, ewan dê li bal Xwedanê xwe padaşê
xwe hebît. Bo wan ne dê tirs hebît nejî xemgînî. [113] Cihû dibêjin, ´Feleya çi tiştek çinînin
ku li ser rawestin û Fele jî dibêjin ´Cihû ya çi tiştek çinînin ku li ser rawestin. ´ Herçend
ku her du alî jî nivîsîna pîroz dixwînin û ewên çi zanistek nînin jî heman tiştê dibêjin.
Xwe dê li Roja Vejîyanê da, dê li ser nakokiyên nawbera wan da, dê dadwer bît. [114] Kê
dikare li wan nebaştir bît ku gotina navê Xwe dê li mizgewta Vî da qedexe diken û hewil
diden ewan bidene wêran kirin? Mirovên wisa nabît bê tirs bêne mizgewtê, ev dinyayê
da bo wan rûreşî heye û di Dawiyê da jî eşkenceyek bijan li benda wane.
[115] Rojhelat û Rojava yê Xwe dê ne. Tu bera xwe bideye her aliyekê rûyê
Xwe dê li wir dibînî. Xwe dê Berbilav û Zaniste. [116] Ewan gotiye ´Xwe dê kurek heye.´
Ev paye bilinde! Ne! Hemû tiştê ser erd û asimana yê Xwe dê ye. Hemû jidil we peyrevî
li daxwaza Vî diken. [117] Çavkaniya erd û asimana ye û dema Ev fermana bûyerekê diket,
Ev tenê dibêjît ´Bibe´ û ew heye. [118] Her wisa ewên ku nizanin jî dibêjin ´Çima Xwe dê
digel me jî napeyvît? ´ Yanjî dibêjin ´Eger nîşaneyeke derhoz[b] bo me jî hatiba´ Ewên
pêşta jî tiştên wisa gotin. Dilê hemû ya wek hewe. Jibo ew mirovên ku jidile we bawer
diken, Me nîşaneyên Xwe zelal kirîne. [119] Me bi te ra rastî şandiye û mizgînî û hişyarî jî
li bal te ye. Tu nabiye berpirsê ewên ku dibine hevrêyên naw agirê biçirûsik. [120] Cihû û
Fele çi cara te erênî naken taku tu peyrevî li rêbaza wan nekey. Bêje ´Rênivîniya
Xwe dê rênivîniye.´ Eger piştî ew zanista ku bo te hatî, te peyrevî li daxwaza wan kiriba,
te kes peyda nedkir ku te li Xwe dê biparêzît yanjî yaremtiya te biket.
[121] Ewên ku Me nivîsîna pîroz daye wan dixwînin, rast dixwînin! Ew kesên ku bawerî
pê neken, ew dê bidorînin. [122] Zarûkên Israîl, ew erêniya ku Min li we kir bîra we bît û
Min li gelên dîke zêdetir erênî li we kir [123] û hişyarê ew Rojê bin ku çi rih nikarin
yarmetiya rihek dîke biden. Çi qerebû jibo wê nayên vergirtin û çi navbêjvan bikêr
nayên û nejî dê yarmetiya wan bête kirin. [124] Dema Xwedanê Ibrahîm pê gotina ew
taqî[c] kir û wî bi cih înan. Ev got ´Ez dê te bikeme rêberê mirova. Pirsî; ´Û li paşkevtiyê
min jî? ´ Vî got; ´Peymana Min nagehîte ewên ku nebaşiyê diken.´ [125] Me jibo mirova
ew mal kire cihê vegeryanê û tenahiyê´ Û bo cihê perestîna xwe, wê derê rawestin ku
Ibrahim rawestayî.´ Me ferman li Ibrahîm û Ismaîl kir; ´Mala Min pak biken bo ewên
ku li dora wê digerên, ewên ku tenê bo perestînê li wir dimînin û ewên ku xwe diçemînin,
çok datnên û serê xwe dinvînin.´



a: Mosliman
b: Mûcîze
c: Imtîhan, ezmûn, ceribandin.

126 Ibrahîm got; ´Ey Xwedanê min, ew welatî bike cihek tenah û ji bo ewên ku
bawermendê Xwe dê û Roja dawiyê ne, xwarinê lê berhem bîne. Vî got; ´Jibo
nebaweran, bo demek kurt, Ez dê xweşiyê pêşkêş wan bikem lê paşê Ez dê wan bikeme
mijara eşkenceya agir û armanca wan nebaşe. ´ 127 Dema Ibrahîm û Ismaîl binêşeya
mala Xwe dê bilind dikirn ´Ey Xwedanê me, evê li me bipejirîne[a], Tu Bihîstinî, Zanistî.´
128 Ey Xwedanê me; me bike li wan ku xwe radestê Te kirîne[b]. Paşketiyê me jî bike
civakek ku ew jî xwe radestê Te biken. Nîşanî me bide ka em çawa Te biperestin û
bizvire aliyê me, birastî em dizvrine aliyê Te, Evê Rehmê didey. 129 Ey Xwedanê me,
bila peyamberek jibo wan li naw ewan da serî hil det ku eva Te eşkere kirî bo wan bêjît,
ewan fêrî nivîsîna pîroz û têgeheştinê biket û her wisa ewan pak biket. Tu Xwedanê hêz
û zanistêy. ´130 Bes kesek nezan nebît, meger kesek dê dest li dînê Ibrahîm berdet? Me
li vê dinyayê ew hilbjart û li Dawiyê da jî ew dê li naw dirustkar da bît.
131 Dema Xwedanê wî gote wî; ´Xwe radest bike´ wî got; ´Ez xwe radestê Xwedanê
hemû dinyaya dikem. ´ 132 Û Ibrahîm tembî li kurên xwe û her wisa Yeqûb jî, ew yêk
kir; ´Kurên min, Xwe dê dînê we jibo we hilbijartiye, lewma nemrin, taku hûn xwe
radestê Vî diken. ´ 133 Meger hûn li wêderê gewah bûn dema mirin hate ser Yeqûb?
Dema wî gote kurên xwe, ´Piştî min hûn dê çi biperestin? ´ Ewan got; ´Em dê Xwe dê
te û bab û bapirê te Ibrahîm, Ismaîl û Ishaqi, Xwe dê Yêkta biperestin. Me xwe radestê
Vî kiriye. ´ 134 Ew civakê wexera dawî kiriye. Ewa ku dest wan ket ya wane û destkevtê
we ya we ye, hûn nabine berpirsyarê kiryarê wan. 135 Ew dibêjin, ´Bibe Cihû yan Fele
û tu dê bêye rênivînî kirin bo ser rêya rast. Bêje; ´Belê, bes dînê Ibrahîm! Ewê serast.
Ewê ku çi ´heval´ bo Vî peyda nekirin!" ´ 136 Bêjin; ´Me bawerî bi Xwe dê û eva ji bo
me hatiye şandin xarê heye û eva ji bo Ibrahîm, Ismaîl, Ishaq, Yeqûb û paşkevtiyê wan
hatiye şandin xarê û eva hatî dan bi Mûsa, Îsa û hemû pêşbîna li bal Xwedanê wan we.
Em çi ciyawaziyê li nawbera hîç yêk li wan naken û me xwe radestê Vî kiriye.
137 Herwiha, eger ew jî wek we bawer biken, ew jî dê bêne rênivînî kirin. Lê eger ew
pişta xwe bidenê, ew dê bikewne çepera dijberiyê. Li dijî wan da, Xwe dê têra te heye.
Ew Bihîstine, Zanîne. 138 Rengê Xwe dê ye, kê li Xwe dê bêhtir reng diket? Em, Vî
diperestin. 139 Bêje, ´Hûn çawa dikarin sebaret Xwe dê digel me gengeşê biken dema ku
Ev Xwedanê me û Xwedanê we ye? ´ Kiryarê me yê mene û kiryarê we yê wene. Em
jidil we digel Vî ne. 140 Yanjî hûn dibêjin ´Ibrahîm, Ismaîl, Ishaq, Yeqûb û paşkevtiyên
wan Cihû û Fele bûn. ´ Bêje, ´Hûn baştir dizanin yanjî Xwe dê? ´Kê dikarît li wan
nebaştir bît ku ragehandinek ewan li Xwe dê vergirtî diweşêrin? Û Xwe dê li ewa ku
hûn diken bê-agah nîne.´ 141 Ew civakê wexera dawî kiriye. Ewa ku dest wan ket ya
wane û destkevtê we ya we ye, hûn nabine berpirsyarê kiryarê wan.



a: Qebûl bike, Erênî bike
b: Mosliman

142 Ewên nezan li naw wan mirova da dibêjin, ´Ew çiye ku rûyê wan li ew aliyê perestînê
zivrandiye ku wan pêşta rûyê xwe dikirê? ´ Bêje, ´Rojhelat û Rojava yê Xwe dê ne. Ev
her kesê bixwazît dê rênivîniyê rêya rast biket. ´ 143 Me hûn kirîne civakek dadmend ku
hûn bibine gewahê mirova û herwisa dê Peyamber jî bibîte gewahê we. Me tenê ew
aliyê perestînê çêkir, ewê te pêşta rûyê xwe dikirê ku ewên peyreviyê li peyamber diken
li ewên ser paniya xwe we dizivrin cûda biken. Birastî ew dijwar bû, tenê bo wan nebît
ku Xwe dê rênivînî kirîne. Xwe dê çi cara nahêlît ku baweriya we xwerayî biçît, jiberku
bo mirova Xwe dê Evê herî dilovane û Rehmê didet. 144 Gelek cara Me dîtiye ku tu ruyê
xwe dikeye asîman, lewma Em rûyê te dizivrînine aliyê nûbêjê ku dê te keyfxweş biket.
Rûyê xwe bizvrîne aliyê mizgewta Heram[a]. Hûn her derê bin, rûyê xwe bizvirînine wê.
Ewên ku nivîsna pîroz[b] bi wan hatiye dayin bêguman dizanin ku eve rastiye li bal
Xwedanê wan we. Xwe dê, bê-agah nîne li ewa ku hûn diken. 145 Hêşta eger tu bo ewên
ku nivîsîna pîroz bi wan hatiye dayîn hemû belgeya bînî ew berê xwe nadene aliyê
nûbêja te û tu jî berê xwe nadeye aliyê nûbêja wan, bi rastî hîç yêk li wan berê xwe
nadene aliyê hevdu. Piştî ew zanista ku bo te hatiye, eger tu peyrevî li daxwazê wan
bikeya tu dê bibye yêk li wan nebaşkara. 146 Ewên ku Me nivîsîna pîroz daye wan, ew bi
başî nas diken weku ku kurên xwe nas diken, lê hindek ji wan rastiya ku nas diken
diveşêrin. 147 Rastî ya Xwedanê we ye, lewma nebe yêk li wan kesa ku gumanê diket.
148 Hemûya aliyê xwe heye ku berê xwe didenê. Hûn li her derê bin, lezê li kirina karên
baş biken û Xwe dê, dê we bîne bal hev. Xwe dê şêyana kirina hemû tişta heye.
149 Lewma li her cihê tu biçiye derê, rûyê xwe bizvrîne aliyê mizgewta Heram. Ewe
rastiye li aliyê Xwedanê te we, Ev bê-agah nîne li ewa tu dikey. 150 Li her aliyê tu biçye
derê, rûyê xwe bizvrîne aliyê mizgewta Heram. Her yek ji we li her derê bin, rûyê xwe
bizvrînine aliyê wê, bila çi mirov digel we gengeşê neken, bes ewên nebaşkar li naw
ewan da nebin, li wan netirse, li Min bitirse û Ez dê erêniya Xwe li ser te bêkêmasî
bikem û belke li ber hindê tu bêye rênivînî kirin. 151 Herweku Me peyamberek li we
bixwe şande naw we da ku bêjîte we eva Me bo wî eşkere kirî, we pak biket û we fêrî
nivîsîna pîroz, têgeheştin û wan tiştên ku we nedizanî biket. 152 Min bînine bîra xwe, Ez
dê we bînime bîra Xwe. Sipasdarê Min bin û çi cara nankor[c] nebin. 153 Ewê ku bawer
dikey, bi bêhin ferehî û nûbêja daxwaza yarmetiyê bike, çimkî Xwe dê digel bêhn fereha
ye.
154 Nebêje ewê ku li rêya Xwe dê, da hatî kuştin ´mirî´ ew saxin lê tu tênagehî.
155 Bêguman, Em dê te bi tirs, birsîtî, jidest dana ewa te heyî, jiyana û ewa te çandî taqî
biken. Lê mizgîniyê bide ewên ku bêhn ferehin. 156 Ewên ku dema bi karesatê
malkambax dibin, dibêjin ´Em ji Xwe dê ne û em dê vegerne bal Vî. ´ 157 Jibo wan, li
aliyê Xwedanê wan we, dê pîrozî û rehm bête dan û ewin ku têne rênivînî kirin.



a: Navê mizgewta bajêrê Mekê
b: Rênivînî (Torat) Incîl (Mizgînî)
c: Ne şokir, Sipasiyê neken.

158 Sefe[a] û Merwe linaw rêûresmê Xwe dê ne, lewma bo ewên ku bo mala Xwe dê heca
biçûk yanjî mezin diken, çi tawan têda nîne ku dora herduk li wan bigerên. Her kesê
liber xwe da karê baş biket, bes birastî Xwe dê sipasdare û dizanît. 159 Jibo ewên ku belge
û rênivîniyên Me şandî xarê diweşêrin, piştî ku Me di nivîsîna pîroz da bo mirovan zelal
kirî, Xwe dê ewan nerênî diket û her wisa ew li bal ewên ku nerênî[b] diken têne nerênî
kirin. 160 Meger ku ew peşîman bin, serastkariyê biken û aşkira bêjin. Ez dê peşîmaniya
wan bipejirînim. Ezim peşîmaniya dipejirînim û rehmê didem. 161 Bo ewên ku
nebawerin û bi nebawerî dimrin, nerêniya Xwe dê û her wisa firişte û hemû mirova
bihewra jî li ser wane. 162 Ta bêdawiyê ew dê li wêderê da bimînin. Eşkenceya wan siwik
nabît û ew paşve nayêne vergêran.
163 Xwe dê te, tenê Xwe dê yeke, çi xwedê dîke çinînin xêncî Vî. Xwedanê rehmê ye û
rehmê didet. 164 Di afirandina asimana û erdê da, di guhertina şev û rojê da, di ew
gemiyên ku li ser deryayê da diçin ku bo mirova qazanc hene, di ew ava ku Xwe dê li
asiman ra dişînîte xarê ku jiyanê bidete erdê mirî û hemû çeşne rihtiberekê li serda belav
biket û di rênivînî kirina ba û ewra da ku di nawbera asiman û erdê da asê-ne, jibo ewên
ku hizra xwe bikar tînin, bêguman li ewane da nîşane hene. 165 Herwiha, li naw mirova
da hindek hene ku li tenişt Xwe dê da, ´hevala´ bo Vî peyda diken, weke Xwe dê jî hez
li wan diken, lê ewên bawermend evînek gelek bihêztir jibo Xwe dê hene. Eger ewên
nebaşkar tenê karîban liber çav bigrin - dema ku ew eşkencê dibînin - hemû hêz ya
Xwe dê ye û Xwe dê bi dijwarî sizayê didet. 166 Dema ewên ku hatine şopandin, nikoliyê[c]
li şopînerê xwe diken, ew dê sizayê bibînin û girêyên girêbesta wan dê biqetiyên.
167 Şopîner dê bêjin; ´Bes eger me tenê derfetek dîke heba, me dê nikolî li wan kiriba
herwek ku ew niha nikoliyê li me diken.´ Bi wî awayi Xwe dê, dê kiryarên wan weke
peşîmanî nîşanî wan bidet. Ew çi cara naw agir da naderkevin. 168 Mirovino, ewa baş û
qanûniye li erdê bixwen û şûnpêyê Şeytan neşopînin, çimkî ew bi aşkira dijminê we yê.
169 Ew tenê fermanê li we diket ku ewa nebaş û bêşerim biken û sebaret bi Xwe dê tişta
bêjin ku hûn nizanin. 170 Lê dema dibêjine wan: ´Eva Xwe dê şandiye xarê bişopînin. ´
Ew dibêjin: ´Ne, em dê ewa me li bal bab û bapîrên xwe dîtî bişopînin. ´Herçend ku
bab û bapîrên wan çi tê-nedgeheştin û nehatibûne rênivînî kirin? 171 Mînaka ewên ku
gazî nebawera diken, weka ewêye ku gazî ew kesa diken ku çi nabhên bes qêrîn û giryan
nebît. Ew ker û lal û korin û ew çi tênagehin. 172 Tu ku bawermendî tiştê baş bixwe ku
Me bo te terxan kirîne û sipasdarê Xwe dê be, eger tenê Eve ku tu diperestî. 173 Ev tenê
ewên mirar, xwîn, goştê beraz û ew ajelên ku her navek xêncî navê Xwe dê li ser wan
hatibîte gotin li we qedexe kirîne, lê eger her kesek ber xatira birsîtiyê neçar ma ku ewan
tişta bixwet nek ber xatira xwezî û zêdegaviyê, ew kesi çi guneh nekirye. Birastî Xwe dê
Rehmê didet û Lêbihore.



a: Her du girê li hember Kebê ne ku hemû hacî û mêvanê mala Xwe dê dibya bi boneya bîra anîna Hacera dayka Ismaîl peyamber li ser da biçine serê û bêne xarê. Dema Hacer bo Ismaîl li avê digeriya li ser Sefa û merwayê da ço serê û hate xarê. b: Lenet c: Haşa

174 Lê, jibo ewên ku nivîsîna pîroza Xwe dê şandiye xarê diweşêrin û bi bihayek kêm
difroşin, ew dê tenê zikê xwe tejî agir biken. Di Roja Vejiyanê da Xwe dê ne dê tev
ewan bipeyvît û nejî dê ewan pak biket, eşkenceyeke gelek bijan çavnihêrê ewane.
175 Ewane ewin ku rênivîniyê digel şaşî û lêbihorînê digel eşkenceyê vediguherin. Çend
bi bêhn ferehî ew dû agir da diçin! 176 Ewe liber wê ye ku Xwe dê ev nivîsîna pîroz birastî
şandiye, ewên ku di naw nivîsîna pîroz da li ciyawaziyê digerên, ew li dijberiyeke kûr da
mane 177 Qencî tenê li wê pêk neyêt ku tu rûyê xwe bizvrînye Rojehlat û Rojava. Ewên
rastî qenc, ew bawermendê Xwe dê, Roja dawiyê, firişta, nivîsîna pîroz û Pêşbîna ne.
Ewên ku hindek li heyiyê xwe didene ewên dîke. Her kesê hez jê biken, xizmê xwe,
sêwiya, ewên xwedan pêvîstî, rêvî û parseka yanjî bo serbest kirina girtiya bikar bînît.
Ewên ku nûbêja diken û ew xêra bo wan hatiye dîharî kirin diden. Ewên ku her dema
ku ew peymanê girê diden peymana xwe bicih tînin, ewên ku li dema êşê, li dest dan û
kelecanê da bêhn ferehin. Ewane, ewên rastin û ewane, ewin ku hişyarê Vî ne. 178 Ey
bawermendino, di mijara kuştinê da, berdêla[a] bi dadmendî li we ferman tête kirin.
Mirovê serbest li şûna mirovê serbest, mirovê kole li şûna kole, mê li şûna mê. Lê eger
her kesek her tiştekê li birayê xwe xweş bît, divê hûn bi dadmendî pêbendê ev fermanê
bin û divê mirovê tawanbar, bi awayek baş diraf bidet. Ew kiryare sivik kirina gunehê li
bal Xwedanê we ye û rehme. Lê eger piştî evê, her kesek ev sînora bibezînît, dê sizayeke
bijan çavnihêrê wî bît. 179 Berdêla bi dadmendî jibo we jiyanê rizgar diket, mirovên
xwedan têgeheştin, belke bi wî awayî hûn hişyar bin. 180 Dema mirin nêzîkê yêk li we
dibît, ewê ku dê mîratê heyî li paş xwe we bihêlît, Ferman eve ku ew kes bi awayek
serûber tembiyê[b] li dayk, bab û xizmê xwe yê nêzîk biket _ ew erke berpirsatiya wan
kesaye ku hişyarê Vî ne. 181 Eger kesek, piştî ku bihîstî ew tembiyê veguhere, guneha
veguhartinê dikeve ser ew kesî, Xwe dê Bihîstin û Zaniste. 182 Lê eger her kesek bitrsiyêt,
ewê tembî kirî şaşî yanjî guneh kiriye û herwiha tiştê nawbera herdu aliya da serast ket,
ew kes çi guneha naket. Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. 183 Bawermendino, rojî girtin
li ser we fermane, her wisa ku li ser ewên pêş we da hatî ferman bû, belke liber hindê
hûn hişyar bin.
184 Bi hejmara taybetî çend roja rojî bin, lê eger yêk li we nexweşe yanjî rêvî ye, paşê di
rojên dîke da bigrin, jibo ewên ku gelek bi dijwarî rojî dibin, li şûna wê da, xwarinê bide
mirovêk hejar. Lê eger kesek li berxwe da qenciyê biket, ev jibo wî baştire. Lê rojî bo te
bêhtire, bes eger tenê te zanîba! 185 Di meha Remezanê da bû ku Xwandin (Quran),
weke rênivînî bo mirovatiyê eşkere bû ku pê peyamên zelal rêberiyê didet û ewa rast û
nerast li hevdu cuda diket. Lewma her kesek li we ku ew mehê da dibîne[c] pêvîste rojî bît
û her kesê nexweş yanjî rêviye, pêvîste li şûna ew rojiyên xwarî da paşê rojî bît.
Xwe dê hêsaniyê bo we dixwazît nek dijwariyê. Lewma ew dema li we hatiye ferman
kirin hûn biqedînin û Vî mezin biken ku hûn rênivînî kirîne, belke liber hindê hûn
sipasdar bin.

a: Li şûn da, li cih da, li bedel

b: Wesiyet

c: Mebest ewe ku di meha Remezanê da heyvê bibînît!

[186] Dema koleyên Min li te pirsa Min biken, birastî Ez nêzîkim. Ez bersiva gaziya ewên ku gazî Min diken didem, lewma bihêle bila bersiva Min biden û baweriyê bi Min biken, belke liber hindê bêne rênivînî kirin. [187] We destûr heye di şeva rojî bûnê da jinên xwe bigîn. Ew weka cilê ber bedena we da ne û hûn jî weka cilên ber bedena wanin.
Xwe dê hajê hebû dema we xwe dixapand, lewma Ev zivrî aliye we û hûn bihorîn. Niha hûn dikarin xwe digel wan dirêj ken, bibînin ka Xwe dê çi destûrek li we kiriye ´Bixwen û vexwen taku tîrêjên sipiyên sibê li tirêjên tarî cuda dibin, paşê rojî bin taku şevê. Ew şevên ku te bo perestîna di mizgewtê da xwe pêşkêş kirye digel wan xwe dirêj neke. Ew sînorane li bal Xwe dê we hatine danandin, lewma nêzîk wan nebin.´ Bi wî awayî
Xwe dê eşkereyên Xwe jibo mirova zelal diket, belke liber hindê hûn bikarin hişyarê Vî bin. [188] Bi bêdadî malê hewdu nexwen û pê xelata nedene dadwera, bo hindê ku hinek malê mirovên dîke bi gunehê bixwen, dema hûn dizanin. [189] Ew pirsa nîvheyva ji te diken, bêje ´Ew demên dîharî kirî bo mirova nîşan diden û bo hecê. ´ Durust nîne ku hûn li derê piştê da[a] têkevine mala xwe. Mirovê birastî baş, ewe ku hişyarê Vî ye. Lewma li derî da werne mala xwe da û hişyarê Xwe dê bin, belke liber hindê hûn serkevtinê bibînin.
[190] Li rêya Xwe dê da, li dijî ewên ku şerê te diken şer bike. Lê sînora nebezîne.
Xwe dê hez li wan naket ku sînora dibezînin. [191] Ewan bikuje, li her derê tu rast wan hatî û ewan bike der li ev dera ku ewan tu lê kiriye der. Çimkî çewsandin gelek li kuştinê dijwartire. Li mizgewta Heram da şerê wan neke, meger ew li wir şerê te biken. Eger şerê te kirin, ewan bikuje – Eveye sizaya mirovên nebawer. [192] Lê eger ew rawestin, paşê wê, birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. [193] Hind şerê wan bike taku edî çi çewsandin nemînît û perestîn pêşkêş Xwe dê bêt kirin. Eger ew rawestînin, edî çi dijmindarî nayête kirin, bes xêncî çewsînera[b] nebît. [194] Heyvek pîroz jibo heyvek pîroz. Bin pê kirina ewa pîroz pêvîstî bi berdêla bi dadmendî heye. Lewma eger kesekê hêriş kire ser te, lêde her wek ew li te didet, lê belê hişyarê Xwe dê be û bizane Ev, digel ewane ku hişyarê Vî ne. [195] Di rêya Xwe dê, da dirafê xwe xerc ke, pê destê xwe tevkariya kawil kirina mala xwe neke, lêbelê başiyê bike, çimkî Xwe dê hez ewan diket ku başiyê diken.



a: Li got gotina Ebdêl Helîm, dema ku hindek Ereb li hecê dizvrîn. Jiboy xwe kiribûne pêşe, ku li derê piştê da biçine mala xwe. Ewan we dizanî ku çone jor li derê piştê da, nişaneya dîndariya wane! b: Mirovên zalim, ewên ku tepe ser diken.

196 Li ber xatira Xwe dê heca biqedîne, hem ya mezin hem ya biçûk. Lê eger bo
qurbaniyê pêşgîriya te kirin, her tiştek destê te hat ku pêşkêş bikey bişîne û serê xwe
netiraşe takû ewa te pêşkêş kirî bigehîte cihê qurbaniyê. Eger her kesek li we nexweş be
yanjî êşek di çermê serê xwe da heye, ew kes divê li şûn da rojî bît yanjî xêrê bidete
hejara yanjî qurbaniyekê pêşkêş biket. Dema hûn di ewlehî yê dane, her kesê ku hez
diket li nawbera heca mezin û biçûk da bêhna xwe vedet, ew kes dibya her tiştek destê
wî hat pêşkêş biket. Lê eger tiştek destê ew kesî nayêt, ew kes divê sê roja li dema hecê
da rojî bît û heft roja li dema zivrînê da. Hemû pêkve bibîte deh roj. Ewe li ser wan da
tête sepandin ku mala wan nêzîkê mizgewta Heram nîne. Hemû demê hişyarê Xwe dê
be û bizane ku Xwe dê gelek dijwar toleya diveket. 197 Di ew heyvên ku bi başî dîharin
hec tête kirin. Ewên ku hecê diken nabît li dema hecê da karên nebaş biken, gan ê biken
û gengeşê biken. Xwe dê gelek baş agahdarê her karekê başe tu bikey. Bi başî bo xwe
dabîn biken, baştirîn tişt ku hûn bixwe dabîn biken hişyariye – we ku têgeheştin heye,
hişyarê Min bin. 198 Lê çi tawan nîne ku tu çavnihêrê qenciya li Xwedan ê xwe bî. Gava
hûn li Erefatê ser jorda tên xarê, li Mizgewta Heram Xwe dê bîr bînin. Ev bîne bîra
xwe, Ev tu rênivînî kirî. Pêş hingê da tu yêk li wan bûy ku li rê derkevtibûy. 199 Li ew
derê da herin ku mirovên dîke diçin û daxwaza lêborîna Xwe dê bixwazin, Ev Lêbihore
û Rehmê didet. 200 Dema we rêûşopê xwe yên perestînê qetandin, bila Xwe dê bîra we
bît her wek ku babên we bîra we dane û zêdetir jî bîra we bît. Hindek mirov hene ku
dibêjin ´Xwedanê me, ev dinyayê da bide me´ Û wan çi pişik di Dawiyê da nabît.
201 Hindek li wan jî dibêjin ´Xwedanê me, li ev dinyayê da baş bide me û Dawiyê da jî
baş bide me û me li sizaya agir biparêze. 202 Ewan dê ew pişik hebît ku wan bo kar kiriye.
Xwe dê li hisab pirsînê da gelek lezgîne 203 Li rojên destnîşan kirî da Xwe dê bîra we bît,
eger kesek bi leze ku piştî du roja biçît, çi guneh ûstê ew kesi da nîne û çi guneh gerdena
ewan jî nîne ku dimînin, taku ew demê ku ew hişyarê Ev bimînin. Hişyarê
Xwe dê bin û bîra we bît ku hûn dê bo bal Vî bêne kom kirin. 204 Di naw mirova da
yêke wisa heye ku gotinên wî li ser jiyana ev dinyayê te keyfxweş diken, tenanet ew gazî
Xwe dê diket ku gewahê ewa li naw dilê wî da bît, lê belê ew dijberê herî dijware.
205 Gava ew diçît, ew berxwe didet ku gendeliyê li ser erdê da belav biket, dexl û danê
çandî wêran diket û têjikê[a] ajela dikujît– Xwe dê hez gendeliyê naket.
206 Dema dibêjine wî, ´Hişyarê Xwe dê be, qudetiya wî, ew rêberî diket bo gunehê.
Cehnem têra wî heye, ciheke nebaş bo bêhin vedanê. 207 Lê belê, li naw mirova da yêke
wisa jî heye, jiyana xwe difroşît ku Xwe dê keyfxweş biket û Xwe dê jibo koleyê Xwe
gelek Mêhrîvane. 208 Hûn ku bawer diken, jidil we têkevine xwe radest kirinê û şûn pê
Şeytan neşopînin, birastî ew bi zelalî dijminê we ye. 209 Eger tu paşgez bî, piştî ku
belgeyên zelal bo te hatin, bes bizane ku Xwe dê Bihêze Biryardere. 210 Gelo ew hêviyê
ne ku Xwe dê digel firişta, di sîbera ewra da bo wan bêt? Lê belê, wê demê da, li mêjda,
dê biryar li ser wê mijarê bête dan, hemû mijar dê bêne zivrîn bo bal Xwe dê.



a: Biçûkê ajela, heyvana.

211 Li zarûkên Israîl pirs ke, ka Me çend nîşaneyên zelal dane wan. Eger kesek, piştî ku qenciya Xwe dê vergirtî, veguhere, bes birastî Xwe dê gelek dijware li siza danê.
212 Jiyana ev dinyayê jibo nebawera hatiye xemilandin û ew tranê xwe bi ewan diken ku bawer pê diken. Lê ewên ku hişyarê Vî ne, di Roja Vejiyanê da, ew dê li serwey wan
bin. Xwe dê bêpayan pêşkêşî ew kesî diket ku hez jê diket. 213 Mirovatî tenê civakek bû,
paşê Xwe dê Pêşbîn rakirin ku mizgînî û agahdariyê biden û jibo wan, pê rastiyê nivîsîna pîroz şande xarê ku linaw mirova da, li ser nakokiyên nawbera ewan da, dadweriyê biken, lêbelê her ew kesa dijberiya vê kirin ku pêşta eve dabûne wan, piştî ku nîşaneyên zelal bo wan hatibûn- jiber pexîliya di nawbera wan da! Sebaret bi ew mijara ku bawermenda pirsgrêk li ser hebûn Xwe dê pê fermana Xwe ewan rast rênivînî diket û
Xwe dê herkesê ku Ev bixwazît rênivîniyê rêya rast diket. 214 Yanjî hûn hizir diken hûn
dê têkevine naw baxçe da, bêy ku bête serê we, her wek ewên ku pêş we da mirî. Pê dijwarî, ji dest danê li wan hatibû dan û ew wisa hatibûne lerzandin ku tenanet Peyamber û ewên digel wî da ku bawerî pê kirbûn gotibûn, ´Kengê dê yarmetiya
Xwe dê bêt? ´ Bêguman yarmetiya Xwe dê nêzîke. 215 Ew li te dipirsin, ´ Em çi biden?´
Bêje, ´Her tiştê baş hûn biden, divê ew bo dayk û bab xizma, sêwî, mirovên belengaz û
rêviya bît. Her karekê baş hûn biken, Xwe dê bi başî agahdarê wê ye.´ 216 Şer kirin li ser
we fermane, her çend ku kerbê we jî lê vebît. Belke hûn hez tiştekê neken, herçend ew bo we başe, yanjî belke hez tiştekê biken herçend ew bo we nebaş bît û Xwe dê dizanît
û hûn nizanin. 217 Ew sebaret bi şer kirin di heyva pîroz da li te dipirsin. Bêje, ´ Şer kirin
di heyva pîroz da gunehek gelek mezine, lê belê pêşgîriya ewên dîke kirin bo ser rêya Xwe dê, nebawerî bi Vî, rêgirî kirin bo mizgewta Heram û mirovên wê jê der kirin, hêşta li pêş çavê Xwe dê, da gunehên mezintirin. Çewsandin gelek li kuştinê kotîtire. Ew li şer kirin digel we narawestin taku we li ser dînê we nezvrînin, eger ew bikarin. Eger her kesek li we, li ser dînê xwe biçît û bi nebawerî bimrît, li ev dinyayê da kiryarê ewan dê pûç bin û li Paşe Rojê da, ew dê bibîte hevrêyê ewên nîştecihê naw agir da û
ew dê ta bêdawiyê li wir bimînît. 218 Lê ewên ku bawer kirîne û koçber bûne û li rêya
Xwe dê, da berxwe dayne, ew dikarin çavnihêriya rehma Xwe dê biken, Xwe dê
Lêbihore û Rehmê didet. 219 Sebaret bi serxweşker û qumarê li te dipirsin Bêje,
´Gunehek gelek mezin li herdu ya daye û bo mirova qazanc jî têdaye, lê guneha wan gelek li qazancê wan zêdetire. Dîsa li te dipirsin, ew dibya çi biden, bêje, ´Ewa zêde´ Bi wî awayî Xwe dê eşkereyên Xwe bo te zelal diket, belke liber hindê tu têbîniyê li xwe da bikey.
220 Sebaret bi sêwiya di vê dinyayê û Dawiyê da li te dipirsin. Bêje ´Ewa baş ewe ku hûn tişta bo wan serast biken. Eger hûn karûbarê wan têkilî yê xwe biken ew birayê we ne. Xwe dê ewên gendel û ewên baş jî nas diket. Eger Xwe dê xwastiba, Ev dê tu jî nerênî
kirbay. Birastî Xwe dê Bihêze Biryardere. ´ 221 Digel putperesta dawetê neken, taku ew
bawer neken, bêguman jinek bindest[a] ya bawermend li putperestekê baştire. Her çende ew te dilxweş biket jî û dawetê digel mêrên putperest neken taku ew bawer neken.



a: Ew mirovê ku li bin desthilata te da bijît, vergêrê ereb peyva kole bikar înaye herçend ku tenê Xwe dê peyva kole bo xizmetkarê xwe bikar tînît. Mirov nikarin xwedan kole bin!

Bêguman mêrek bindeste bawermend li mêrek putperest baştire. Her çend ew te dilxweş
biket jî. Mirovên wisa gazî naw agir diken, lê Xwe dê pê destûra xwe, gazî naw baxçe û
lêbihorînê diket. Ev peyamên Xwe, bo mirova zelal diket, belke ew bikarin li bîra xwe
da xwedan ken. 222 Ew sebaret bi rewşa mangane ya jina[a] li te dipirisn. Bêje; ´Rewşa
mangane ya jina rewşek bijane. Lewma wê demê, xwe li jina dûr bigre. Nêzîk wan nebe
taku ew pak dibin. Dema ku wan xwe pak kir, li ew cih ra tu dikarî li wan nêzîk bî, her
wek Xwe dê destûr daye te. Xwe dê hez wan diket ku bi peşîmanî dizvirne bal Vî û Ev
hez wan diket ewên ku xwe pak diken.´ 223 Jinên we cihê çandina tovê we ne, lewma
herine naw cihê xwe yê çandinê, her çawa hûn hez diken û ji bo xwe bişîne pêşta.
Hişyarê Xwe dê be. Bîra te bît tu dê Vî bibînî û mizgîniyê bide ewên ku bawer diken.
224 Xwe dê nekene astengî ku hûn nekarin durustkar bin, hişyarê Ev bin û aştiyê di
nawbera mirova da çêken. Xwe dê Bihîstin û Zaniste. 225 Xwe dê li ser sûnda we bi qestî
xwarî lêpirsînê li we naket, lê Ev dê jibo ewa hûn di dilê xwe da dibêjin dê hisabê li we
bipirsît. Xwe dê Lêbihor û Pêdagire. 226 Bo ewên ku sûnd dixwen ku nêzîkê jinê xwe
nabin, ew dibît bo dema çar heyva rawestin. Eger paşê ew bizivrin, birastî
Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. 227 Lê belê, eger ew pêdagir bin li ser berdanê, birastî
Xwe dê Dibhêt û Dizanît. 228 Pêvîste jinên berdayî bo dema sê rewşên mangane
çavnihêr bin, eger bi rastî ew bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê diken, ew bo wan qanûnî
nîne weşêrin ku Xwe dê di zikê wan da çi afirandiye. Mêrê wan dê karekê baş biken ku
di ew demê da ewan paşta vergirin. Bi berçav girtina wê ku ew bixwazin aştiyê biken.
Gorey ewa ku dadmende mêra pileyekê[b] zêdetir li ser ewan da heye. Xwe dê Bihêze
Biryardere. 229 Du cara berdan dikarît rû bidet, yan bi rêbazek erênî bête xwedan kirin
yanjî bi şêweyek baş serbest bête berdan. Qanûnî nîne ku ewa we dayê carek dîke li wan
bistînin. Tenê ew demê ku her du alî bitirsiyên ku nekarin sînorên ku Xwe dê dîhar
kirîne biparêzin. Eger tu bitirsiyêy ku ew nekarin sînorên Xwe dê biparêzin, piştî wê
demê çi guneh li ser hîç yêk li wan nîne, eger jin hilbjêrît ku tiştekê bidet ku bête berdan.
Ewane sînorin li bal Xwe dê we hatine danan. Lewma ewan derbaz neke. Her kesê ku
sînorên Xwe dê danane derbaz diken bes ew karên nebaş diken. 230 Eger mêrek jina xwe
dubare berdet, piştî berdana cara duyê, ew jin bo wî qanûnî nabît, taku ew jin mêrek
dîke neket. Eger ew mêrê taze, wê jinê berdet. Çi tawan têda nabît eger ew jin û mêrê
cara ewlî vegerine digel hewdu da. Bi berçav girtina wê yêkê ku ew hizr biken dê bikarin
di ew sînorên Xwe dê danayî da xwe biparêzin. Ewane sînorên Xwe dê ne ku Ev bo ew
neteweya ku têdigehît zelal diket. 231 Dema hûn jinekê ber diden û ew geheştine dema
xwe ya destnîşan kirî, paşê yan bi rewiştek dadmendî xwedan ken yanjî bihêlin bila bi
dadmendî serbest biçît. Bi mebesta wê ku zirarê bigehînine wan yanjî lêden ewan
xwedan neken. Her kesek ew kar biket birastî nebaşiyê li xwe diket. Henekê xwe bi eva
Xwe dê eşkere[c] kirî neken. Bîra we bît, ew erêniya Xwe dê we kiriye û eva li nivîsîna
pîroz jiboy we eşkere bûye ku têgeheştin û şîretê didet. Hişyarê Xwe dê bin û bizanin
ku Xwe dê zanista tewaw li ser hemû tişta heye.



a: Dema ku jin xwîn rêjiyê diken  b: Mêra li mal da pileyek zêdetir erk û maf li ser jina da hene.
c: Gotina Xwe dê, wehî

232 Dema hûn jina berdiden û ew digehine dema xwe ya destnîşan kirî, pêşgîriyê li wan
neken ku carek dîke şû bi mêrên xwe biken, eger herdu alî biryarê biden ku bi şêweyek
dadmendî digel hevdu ew kar biken. Ewe şîrete jiboy ewên ku bawerî bi Xwe dê û Roja
dawiyê diken, ewe jiboy we, bêhtir û paktire. Xwe dê dizanît û hûn nizanin.
233 Dayik bo dema du salên tewaw şîr didene zarûkên xwe. Eger ew bixwazin ew demê
biqedînin, divê bi awayek dadmendî, cil û pêdavîstî li bal bab we bêne dabîn kirin. Divê
çi kes barek lê neyê kirin ku ew nekarît hilgrît, nabît çi dayik ser xatirê zarûkê xwe zirarê
bibînît û nabît çi bab jî ser xatira zarûkê xwe. Heman erk jî li ser milê dapîr û bapîrane.
Eger bi li hevhatina hevpar û şêvirmendî jin û mêr bixwazin zarûk li şîr veken, ew
nayêne tawanbar kirin û çi tawan têda nîne, eger hûn bixwazin dayeyekê[a] kirê biken bi
dabîn kirina wê ku hûn diraf biden, wek we li hev kirî, bi awayek dadmendî. Hişyarê
Xwe dê bin, bizanin ku Xwe dê dibînît hûn çi diken. 234 Eger her yêk li we bimrît û
bêwejina bihêlît, ew bêwejin divê çar mang û deh şeva rawestît. Piştî ewan dema
destnîşan kirî derbaz kir, hûn bi hîç tiştekê nayêne tawanbar kirin, eger ew bixwazin her
karekê bi rewişt digel xwe biken. Xwe dê bi tewawî agahdarê wêye ku tu dikey. 235 Hûn
nayêne tawanbar kirin eger hûn amaje biken ku hûn dixwazin digel wan jina jiyana
hevbeş pêk bînin, yanjî jiboy ewa ku hûn li naw xwe da diveşêrin _ Xwe dê dizanît ku
hûn hez diken ewan bixwazin. Peymanên weşartî digel ewan girê neden. Bes eger
gotinek birûmet digel wan bipeyvin û girê besta jiyana hevbeş digel wan girê neden taku
ew dema destnîşan kirî bigehîte dawiyê. Bizanin ku Xwe dê dizanît çi riha we daye,
lewma agahdarê Vî bin. Bizanin, Xwe dê Lêbihor û Pêdagire. 236 Çi erk ser milê we
nîne eger hûn jinekê berden ku we destê xwe nedabîtê da û xelatê bûkniya[b] wê nedabîtê,
lê belê bi awayek dadmendî bo wan xelatekê li şûn da dabîn biken, ewê heyî pêka şêyana
xwe û ewê hejar jî pêka şêyana xwe. Ewe erke bo ewên ku karê baş diken. 237 Eger hûn
jinekê berden pêş ku hûn destê xwe bidenê da, lê we xelatê bûkniya wê dabîtê da, bes
nivya xelatê bûkniyê bidenê, meger ew li mafê xwe, xweş bin yanjî meger ewê ku girêya
wê ganê girtî destê xwe li mafê xwe xweş bît. Lêxweş bûn te li dirustkariyê nêzîk diket,
lewma bîr neken ku digel hev da mêhrevan bin. Xwe dê hemû tiştê hûn diken dibînît.
238 Te haj nûbêj kirina xwe hebît, Nûbêj baştirîn rê ye û bi xwe radest kirin li hember
Xwe dê raweste. 239 Eger hûn di bivê[c] dane, çi li dema ku hûn ser pêya ne yanjî gava
hûn dihajon, lê dema hûn di tenahiyê dane, Xwe dê bîr bînin, herwek Vî tu fêrî wê kirî
ya te nedizanî. 240 Eger her yêk ji we bimrît û bêwejina bihêlît, tembiyekê[d] bo wan biken,
debara bo salekê xwedan kirinê, bêy ku li mala xwe bêne derkirin, lê eger ew serbixwe
biçin, sebaret bi karê ku ew bi rewişt biryarê biden digel xwe biken, hûn nayêne
tawanbar kirin. Xwe dê Bihêze Biryardere.



a: Jinek ku şîr bidete zarûk, ew jina ku şîr bidete te, dibîte dayka te û tu nikarî digel zarûkên wê jiyana hevbeş pêk bînî! Zarûkê ew jinê dibine xweşik û birayê te.
b: Mahereyî
c: Xeter, Tahluke
d: Wesiyet, ferman ku bête cih

241 Dibît jinên berdayî jî, bi şêweyek ku bi dadmenî tête berçav girtin bêne xwedan
kirin. Ewe erke bo ewên ku hişyarê Vî ne. 242 Bi wî awayi Xwe dê ewa eşkere kirî bo we
zelal diket ta ku hûn hizra xwe bikar bînin. 243 Ew mirova ber çav bigre ku li tirsê mirinê
da welatê xwe bi cih hêlane, her çend ku ew bi hezara bûn, Xwe dê gote wan bimrin,
lê paşê ew vejiyandin, birastî Xwe dê qenciya digel mirova diket, lê piraniyê wan
nankorin. 244 Di rêya Xwe dê da şer biken û bizanin ku Xwe dê Bihîstin û Zanîne.
245 Kê dê deynekê baş bidete Xwe dê ku Ev bo we çend qata lê zêde biket? Ev, Xwe dê
ye ku paşwe radgirît û bi firavanî didet û jibo bal Vî ye ku hûn dê vegerên. 246 Serokên
zarûkê Israîl berçav bigre ku piştî Mûsa hatin, dema ewan gote pêşbînek xwe ´Bo me
padişahekê danê ku em li rêya Xwe dê da şer biken´ Ew got, ´Lê belê dibe ku eger
ferman li we hate kirin hûn şer neken? ´ Ewan got ´Em çawa li rêya Xwe dê, da şer
naken dema ku em li mal û zarûkên xwe hatine der kirin? Dema ku biryara şer li wan
hate kirin, hemû zivrîn bes çend kes nebin. Xwe dê zanist li ser ewên ku karê nebaş
diken heye. 247 Pêşbînê wan gote ewan, ´Birastî Xwe dê niha Talût wek padişah bo we
dîhar kiriye. ´ Lê ewan got, ´Ew çawa dikare bibe padişahê me, dema ku me gelek li wî
zêdetir bo padişahiyê maf heye? ´ Û gelek mal bi wî nehatiye dan. Ew got; ´Xwe dê, ew
li ser we da hilbijartiye û zanistek firavan û bejnek bilind daye wî.
Xwe dê, padişahiya Xwe pêşkêşî her kesê diket ku hez jê biket. Xwe dê gelek Berferhe,
Zaniste´ 248 Pêşbînê wan gote wan ´Nîşaneya padişahiya wî, dê bo ew li sindrûkê da bît[a].
Dê li naw da, libal Xwedan ra jibo we tenahî û bermayên binemala Mûsa û Harûn hebît
ku li bal firişta we hatine hilgirtin. Di evê da nîşaneyek heye bo we, eger hûn bawer
diken. ´ 249 Dema Talût digel şervanên xwe derkete der, wî gote wan
´Xwe dê, dê we bi çemekê taqî biket, her kesek jê vexwet ew digel min nîne, lê herkesk
xwe li tam kirina wê biparêzît ew dê digel min bît. Xêncî ewên ku tenê kolmekê jî lê
raken, lê belê hemûya lê vexwarin bes çend kes nebin. Dema ew digel ewên ku baweriya
xwe xwedan kirbûn lê derbaz bûn, ewan got ´ Îro me li hember Calût û şervanên wî da
çi hêz nîne´ Lê ewên ku dizanîn dê Xwedanê xwe bibînin gotin, ´Çend cara bi destûra
Xwe dê komek biçûk komek mezin bezandiye! Xwe dê digel bêhin fereha ye!´
250 Û dema ew çone pêşberî Calût û şervanên wî gotin ´Xwedanê me, bêhen ferehiyê li
ser meda birêje, pêngavên me qahîm bike û li dijî mirovên nebawer yarmetiya me bide.´
251 Û bi destûra Xwe dê wan, ew bezandin. Dawûd Calût kuşt û Xwe dê padişahî û
hişyarî dayê û ew fêrî wê kir ku Vî hez jê kir. Eger Xwe dê hindek bi destê ewên dîke
paşve nezivrandana, dê erd bi tewawî genî ba. Lê Xwe dê bo hemû mirova qencî heye.
252 Evane gotinê Xwe dê ne ku Em bi rastiyê bo te dixwînin û bi rastî tu yêk li wan
peyamberayî.



a: Li gor Rênivînî (Torat) ê gemî heman ew sinduq bû ku zarûkên Israîl weke mala Xwe dê digel xwe digêran!

253 Me digel hindek peyambera li serwey peyamberên dîke qencî kir. Xwe dê digel
hindeka peyvî û ewên dî pileya wan bilind kir. Me nîşaneyên Xwe yên zelal dane Îsa yê
kurê Miryemê û Me ew bi riha pîroz bihêz kir. Eger Xwe dê xwastiba piştî ku nîşaneyên
zelal bo wan hatî, cêgirên wan şerê hevdu nedkirin. Lê ewan ciyawazî hebûn, hindeka
bawer kir û hindeka bawer nekir. Eger Xwe dê xwasitba ewan şerê hevdu nedkir, lêbelê
Xwe dê ewê diket ya ku Ev dixwazît. 254 Ewên ku bawer diken, li ewa Me daye we biden,
pêş ku ew Roj bêt ku têda çi dan û sitandin nabît, ne hevaletî û nejî nawbêjvanî. Ewên
nebawerin ku ewa nerast diken. 255 Xwe dê, çi xwedê nînin bes Ev nebît, her dem zindî,
herdem çavdêr, ne westiyan, nejî xew ser Vî da digrît. Ewa di asimana û erdê da ya Vî
ye. Kê li wire ku bêy destûra Vî bikare têkiliya Vî biket? Ev dizanît ku çi li pêş û pişt
wane, lê belê ew hîç tiştekê li zanista Vî tênagehin, xêncî ewa ku Ev dixwazît. Textê Vî
dirêjî ser asimana û erdê dibît; Vî nawestînît ku her duya jî biparêzît. Ev herî Bilind û
herî Mezine. 256 Çi zordarî li dîn da nîne, rêya rast li şaşiya hatiye cuda kirin, lewma her
kesek xwedêyên direw nepejirînît û bawermendê Xwe dê bît, ew kesî destê xwe bi
destgira herî qahîm we girtiye, ewa ku çi cara naşkêt. Xwe dê Bihîstin û Zaniste.
257 Xwe dê hevalbendê ewane ku bawer diken Ev, wan li tarîtiyê da derdixe ber
ronahiyê. Lê belê parêzvanê nebawera xwedêyên wan yên direwin ku wan li ber
ronahiyê derdixe û wan dibete tarîtiyê da, ew hevrêyên naw agirin û ta bêdawiyê ew dê
li wir bimînin. 258 Meger te ew li berçav negirtiye, ewê ku sebaret bi Xwedanê Ibrahîm
digel wî da gengeşe dikir, çimkî Xwe dê padişahî dabûyê da? Dema Ibrahîm got, ´Ev,
Xwedanê mine ku jiyan û mirinê didet´ Wî got, ´Ez jî jiyan û mirinê didem´ Ibrahîm
got ´Birastî Xwe dê rojê li rojhelatê tînît, ka tu rojê li rojava bîne´ Ewê nebawer mat û
sersam ma. Xwe dê ewên ku karê nebaş diken rênivînî naket. 259 Yanjî ew berçav bigre,
ewê ku li ser gundeke kawle da derbaz bûyî. Ew got, ´Xwe dê, dê çawa jiyanê bidete
ewê, piştî mirina wê? ´Lewma Xwe dê bo sed sala ew vemirand, paşê ew vejand, gotê
´Ew çend dema tu wisa mabûy? ´ Ew got: ´Rojekê yanjî danekê rojê´ Vî got; ´Na, bo
sed sala tu wisa mabûy. Zênde xwarin û vexwarina xwe, pê derbaz bûna dem ew
neguheriye. Zênde kerê xwe_ Em dê te bikene nîşaneyek jiboy mirovan_ zênde hestiya;
bibîne Em çawa van tînine bal hevdu û van pê goşti cil diken! ´Dema bo wî zelal bû,
ew got: ´Ez dizanim Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye´ 260 Û dema Ibrahîm got,
´Xwedanê min, pêşanî min bide ku Tu çawa jiyanê dideye miriya´ Vî got, ´Te bawer
nekirye? ´ Got ´Belê, lê tenê bo ku dilê xwe arxayîn bikem.´ Vî got; ´Çar balindeya bigre
û wan fêr ke ku vegerêne bal te, paşê wan danê ser serê girikên cuda, gazî van bike
vegerên û ew dê bilez bêne bal te, bizanibe Xwe dê Bihêze û Biryardere´ 261 Mînaka
ewên ku heyî yê xwe li rêya Xwe dê, da xerc diken, her wek dindikekê ye ku heft
gulgenim pêve tên û her gulgenimek sed dindika didet. Xwe dê bi çend beraber zêdetir
didete her kesekê ku Ev hez diket. Xwe dê gelek Berferehe û Zaniste.

262 Ewên ku heyî yê xwe li rêya Xwe dê, da xerc diken û pê bîr anîna xêr xwaziyê yanjî
bi gotinên biêş dûda çona xerc kirina xwe naken, ewan dê padaşê xwe li bal Xwedanê
xwe hebît, ne bo wan tirs heye û ne ew dê xemgîn bin. 263 Gotinek bimêhir û lêbihorîn
gelek li karek xêrxwazî baştire ku êş dûda hebît, Xwe dê çi pêvîstî nînin û Xwe ragire.
264 Hûn ku bawer diken, kiryarê xwe yên xêr xwazî bi bîranîna û gotinên bi êş, hel
neveşînin, weka ew kesê ku heyî yê xwe xerc diket, tenê bo hindê ku bal mirova we bête
dîtin, bêy ku bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê hebît. Mirovê wisa wekû kewirekê ye ku
ax pêvebît; baranek xurt dibarît û wê bi tewawî rût dihêlît. Ew çi padaşa bo karê xwe
vernagrin. Xwe dê neteweya nebawera rênivînî naket. 265 Lê mînaka ewên ku heyiyê
xwe xerc diken ku pejirandina Xwe dê bi dest bînin û her wisa bo pêdagirî li ser bawerî
ya xwe, mîna baxçeyê li ser girekê ne, baranek xurt dibarît û berhemê wê ducar hindî
berhemê cara ne, tenanet eger baranek xurt jî nebarît, dîsa jî ew dê bi xonavê bête av
dan. Xwe dê ewa tu dikey dibînît. 266 Kesek ji we hez diket ku baxçeyek li darê xormê û
rezê tirî ku bi çemên biherik û hemû çeşne berhema we hatibîte xemlandin hebît. Dema
hûn derdê pîriyê û zarûkên bêhêz we gîrude bûn û babelîskek agirîn lêdet û binî da
bişevtînît? Bi wî awayî Xwe dê peyamên xwe bo we zelal diket ku hûn têbîniyê li ser
wan biken. 267 Hûn ku bawer diken, bi xêr xwazî ew tiştê baş biden ku we dest xwe we
înayne û Me bo we li erdê berhem înabûn. Lê negerê ku ew tiştê nebaş bidey ku hûn bi
xwe jî bes tenê bi çavê miqî dê bipejirînin. Bizanin Xwe dê çi pêvîstî nînin û hêjayê
perestînê ye. 268 Şeytan belêniya hejariyê didete we û fermana bedrewiştiyê li we diket
lê Xwe dê belêniya lêborînê Xwe û qenciyê didete we, Xwe dê Berfirehe û Zanîne.
269 Û Ev têgeheştinê didete her kesê ku Ev dixwazît. Her kesê ku Ev têgeheştinê bidetê
birastî gelek zêde baş bi wî hatiye dan, lê tenê ewên xwedan têgeheştin dê ewê li hişê
xwe da xwedan biken. 270 Her tiştê ku tu bidey ya sûnd bixwey bidey, Xwe dê baş dizanît
û ewên ku karên nebaş diken kes çinabît ku yarmetiya wan biket. 271 Eger hûn xêrekê bi
eşkere biden ew başe, lê belê eger hûn wê weşartî xwedan ken û bi nepenî bidene
belangaza, ew bo we baştire û Ev dê karên we yên nebaş pak biket. Xwe dê bi başî
agahdarê ewa ku hûn diken heye. 272 Ev bo te nîne ku tu rênivîniya wan bikey, Xwe dê
ye ku rênivîniya her kesê diket ku Ev dixwazît. Her xêra tu bidey dê qazancê bigehînîte
riha te, bi li berçav girtina wê ku tu ew karî bo xatira dîtina rûyê Xwe dê bikey. Her
tiştekê tu bidey, dê bi tewawî bi te bête dan û nerastî li te nayête kirin. 273 Ew belengazên
ku bi tewawî li rêya Xwe dê, da mijûlin û nikarin hat û çoyê li ser erdê da biken. Belke
li ber xwe ragiriya wan, bi nezanî hizir bête kirin ku ew heyî ne. Lê hûn dê pê nîşaniya
wan, ewan pênase biken ku ew bi berdewamî li ber mirova napariyên. Her tiştê baş ku
tu didey, Xwe dê baş pê dizanît. 274 Ewên ku li heyiyê[a] xwe, bi şev û bi rojê, bi veşartî û
bi aşkira diden, ewan dê padaşê xwe li bal Xwedanê xwe hebît, çi tirs bo wan nîne û ew
xemgîn nabin.



a: Serwet, mal

275 Lê ewên ku sûd[a] ê dixwen, li Roja dawiyê da dê rabine serxwe, weku kesê ku Şeytan
bi destê xwe êşandbît. Çimkî ew dibêjin, ´Dan û sitandin û sûd her wek yêkin´ Lê belê
Xwe dê derfeta dan û sitandinê daye lê sûd vergirtin qedexe kirye. Her kesek bi
vergirtina hişyariya Xwedanê xwe waz li sûd vergirtinê bînît, dibe ku deskevtên xwe yê
berê xwedan ket_ Xwe dê, dê dadwerê wî bît_ lê belê her kesek dupat biket, ew dê bibîte
hevrêyeke naw agir û ta bêdawiyê ew dê li wir bimîne. 276 Xwe dê sûd vergirtinê wêran
diket, lê belê li kiryarên xêr xwaziyê zêde diket û Xwe dê hez li gunehkarên nankor
naket. 277 Ewên ku bawer diken, kiryarên baş diken, nûbêjê diken û ew xêra ku bo wan
hatiye dîhar kirin diden, dê wan padaşê xwe li bal Xwedanê xwe hebît, çi tirs bo wan
nîne û ew xemgîn nabin. 278 Hûn ku bawer diken, hişyarê Xwe dê bin û waz li ewa
beremayî li sûdê bînin, eger hûn birastî bawer diken. 279 Eger hûn neken, bes agahdarê
şer li aliyê Xwe dê û peyambrê wî bin. We dê mavê[b] xwe hebît eger hûn peşîman bin,
hûn nerastiyê naken nejî nerastî li we tête kirin. 280 Eger deyndar li rewşek dijwar daye,
bes tişta gîro bike taku ev rewş bo wî hêsan dibît, dîsa jî eger tu weke kiryarek xêr xwazî
li deyn xoş bî, ew dê bo te baştir be, bes eger tenê te zanîba. 281 Hişyarê ew Rojê be ku
tu dê bêye vegerandin bo bal Xwe dê. Padaşê her rihekê dê bi tewawî bête dan, bo
ew tiştê ku destkevtî û nebaşî li wan nayê kirin. 282 Hûn ku bawer diken, dema hûn bo
demekê dîhar kirî deynekê dikêşine ûstê xwe, ewê binvîsin, bila nivîskar bi dadmendî di
nawbera we da binvîsît, nabît çi nivîskar nepejirînin ku nenvîsin, bihêlin bila binvîsît
weka ku Xwe dê ew fêr kiriye. Bila ewê deyn didet ferman biket û bila ew hişyarê
Xwe dê, Xwedanê xwe bît. Bila bi hîç awayekê biçûk çi tişta têda kêm neket. Eger ewê
deyn didet kêm hiş, bêhêz yanjî neşêt fermanê biket bila çavdêrê wî bi dadmendî
fermanê biket. Weke gewah, gazî du mêrên xwe biken, eger du mêr wêderê nebin, bes
gazî mêrekê û du jina biken, li ewên ku hûn dipejirînin. Eger yêk li wan jina şaşî kir, bila
ew jina dîke bikarît bînîte bîra wê. Dema ew hatine gazî kirin, bila ew gewahiyê red
neken. Nivîsîna deyn bi siwkatî nezane, çi kêm bît çi zor, digel ew dema ku dibya ew
bête dan. Li pêş çavê Xwe dê, ewe gelek dadperwerane ye, bo gewahî danê zêdetir cihê
pêbaweriyê ye û gelek zêdetir dê pêşgîriya ser hildana gumanê li nawbera we da biket.
Lê eger ew kel û pel wêderê ye û tu radest bikey, bo te çi tawan têda nîne, ger tu wê
nenvîsî. Dema ku hûn dan û sitandinê digel hevdu diken, bila gewahê we li wêderê bin
û nehêlin çi zirar bigehîte her yêk li nivîskar yanjî gewaha, çimkî eger tu zirarê bigehinye
wan, ew dê li aliyê te we bibîte tawan. Hişyarê Xwe dê be û Xwe dê, dê te fêr ket.
Xwe dê zanista li ser hemû tişt heye.



a: Riba, qazancê li dirafê deynê
b: Sermaye, ew dirafê ku bo damezirandina kar hatiye xerc kirin

283 Eger hûn rêvî ne û nikarin nivîskarekê peyda biken, dibya tiştek bo ewlekarî bête ra
dest kirin, lê eger we biryar da ku bawerî bi hevdu biken, bihêlin ewê ku baweriyê diket
bila baweriya xwe bi cih bînît, bila ew hişyarê Xwe dê, Xwedanê xwe bît. Belgeya
neveşêrin, herkesek ew karî biket, dilek gunehkar heye û Xwe dê bi tewawî agahdarê
hemû tiştaye ku tu dikey. 284 Her tiştek li asimana û erdê da hebît yê Xwe dê ye, çi hûn
ewa li naw xwe da eşkere biken yanjî weşêrin Xwe dê, dê hisaba wan li we bipirsît. Ev
dê li her kesê ku bixwazît dê bibhorît û her kesê bixwazît dê siza bidet. Xwe dê desthilat
li ser hemû tişta heye.285 Peyamber jî her wek bawermenda bawerî bi, eva ku bo wî, li
bal Xwedanê wî ra hatiye şandin xarê heye. Hemû bawerî bi Xwe dê, firişteyên Vî,
nivîsîna pîroza Vî û peyamberên Vî diken. ´Em çi ciyawaziyê li nawbera peyamberên
Vî da naken´ Ew dibêjin, ´Em dibhên û peyrevî diken. Ey Xwedanê me lêbihorîna Xwe
pêşkêşî me bike. Zivrîn jibo bal Te ye! ´ 286 Xwe dê barê hîç rihekê hind giran naket ku
nekarît hilgrît, jiboy wî ye her tiştê ku ew bidest xwe îna bît û li dijî wî ye her tiştê ew
bidest xwe îna bît. Xwedanê me, kara nespêre me eger bîra me biçît yanjî şaşiya biken.
Xwedanê me, barek wisa nede me, wek ew barê Te dayî ewên pêş me da hatî.
Xwedanê me, hind barek zêde nede me ku me hêza hilgirtina wê nebît. Li me xweş be,
me bibhore û bila rehma Te li ser me bît, Tu parêzerê meyî, lewma li dijî mirovên
nebawer yarmetiya me bide.

### 3.Para Binemala Imran

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Elîf Lam Mîm 2 Xwe dê, Çi xwedê nînin bes Ev nebît. Ev ê herdem zindî, Ev ê herdem
çavdêr,3 Vî nivîsîna pîroz jiboy te şandiye xarê ku bi rastiyê, eva pêş evê da piştrast diket.
Vî Rênivînî (Torat) û Mizgînî (Incîl) jî şandine xarê. 4 Pêşta rênivînî û cudahî li nawbera
rastî û nerastiyê jiboy mirova şandiye xarê. Ewên ku bawerî bi eşkereyên
Xwe dê neken ew dê eşkenceyek dijwar bikêşin, Xwe dê bihêze jiboy tole vekirinê.
5 Birastî hiç tiştek li asiman û ser erdê li Xwe dê weşartî nîne. 6 Ev e ku li ziki da şêwe
didete we hemûya weka ku Ev hez diket. Çi xwedêyek dîke çinîne bes Ev nebît, Ev
Bihêze û Dadwere. 7 Ev e ku ev[a] nivîsîna pîroz bo te şandiye xarê, hindek gotinê vê
zelalin _ Ewane berê bin-axeya nivîsîna pîrozin_ Ewê dîke jî mînakin[b], ewên li dil da
çevtkar, bi armanca çêkirina pirsgrêka, peyrevî li ya mînak diken û li wateyekê digerên
tenê Xwe dê wateya vê ya rastî dizanît. Ewên ku bin-axeya xwe bi xurtî li zanistê da ava
kirîne dibêjin, ´Em bawerî pê diken, eve hemû ya Xwedanê me ye_ tenê ewên bi
têgeheştina rastî dê bala xwe bidenê ´ 8 ´ Xwedanê me piştî ku Te em rênivînî kirîne,
nehêle dilê me la bidet. Rehma Xwe pêşkêşî me bike, birastî Tuyî ku pêşkêş dikey.
9 Xwedanê me Tu dê hemû mirova bicivîniye ew Rojê ku têda çi guman nîne,
Xwe dê çi cara peymana xwe naşkînît. 10 Jiboy nebawera li dijî Xwe dê ne mal û nejî
zarûkên wan dê kêr tiştekê bên. Ew dê bibine sotemenî jiboy agir. 11 Her weku mirovên
Fireûn û ewên pêş ewan da ku nikolî[c] li eşkereyên Me kirin, lewma Xwe dê li ber
gunehên wan, ew siza dan. Xwe dê dijware li siza danê da. 12 Bêje nebawera, ´ Hûn dê
bêne têkşikandin û li cehnenmê da bêne komkirin, ciheke kotiye bo bêhin vedanê. ´
13 We pêşta nîşaneyek dîtiye, li ew du leşkera ku di şer da hev dîtin, yêk jibo rêya
Xwe dê şer diket û ewa dîke li nebawera pêk hatiye. Pê çavê xwe dîtin ku ew du cara
hindî wan bûn, lêbelê Xwe dê yarmetiya her keskê diket ku Ev dixwazît. Birastî bo ewên
ku çav hene bibînin di evê da waneyek heye.14 Evîna tiştên bedev bala mirova dikêşît_
jin, zarûk, zêr û zîv, komên bilind yê xizîne li ser hev, hespên bi xalên ciwan, ajel û
zevîzar_ ewane keyfxweşiyên jiyana ev dinyayê ne, belê Xwe dê baştirîn cih bo
vegeryanê heye. 15 Bêje, ´Ez we agahdarê ew tiştê li ewane baştir bikem? Jiboy ewên ku
hişyarê Vî ne, li bal Xwedanê wan, dê baxçeyên ku çem têda diherikin hebin. Ta
bêdawiyê ew dê digel hevjînên xwe yên pak li wir bimînin, herwek erêniya Xwe dê li
sere. Xwe dê koleyên xwe dibînît. 16 Ewên ku dibêjin, ´Ey Xwedanê me, em birastî
bawer diken, lewma li gunehê me xweş be û me li sizaya agir biparêze.´



a: Xwandin (Quran) a pîroz.
b: Peyva Moteşebîhat bikar hatiye, mînak, berawrd!
c: Haşa, înkar

17 Ewên ku bêhin ferehin, rastbêjin, bi rastî Xwe dê perest, ewên ku diden û pêş serê sibê
da bo lêbihorînê dipariyên. 18 Xwe dê gewahiyê didet ku çi xwedê çinînin bes Ev nebît,
her wek firişte û ewên xwedan zanist jî evê dizanin. Ev dadperweriyê xwedan diket. Çi
xwedê nînin xêncî Ev ê Bihêz û Dadwer. 19 Dînê rastîn li bal Xwe dê tenê xwe radest
kirin bi Xwe dê ye[a]. Ewên ku nivîsîna pîroz jiboy wan hatibû, tenê piştî ku zanist bi wan
hatibû dan, liber pexîliyê li hev nekirin, her kesek nikoliyê li peyamên Xwe dê eşkere
kirî biket, Xwe dê lezgîne bo lêpirsînê. 20 Eger ew digel te gengeşê biken bêje, ´Min xwe
radestê Xwe dê kiriye û her wisa ewên ku peyreviyê li min diken jî wisa diken. Li wan
bipirse, ewên ku nivîsîna pîroz bi wan hatibû dayin û her wisa ewên ku nivîsîna pîroz bi
wan nehatiye dayîn[b] jî, hûn jî xwe tenê radestê Xwe dê diken? Eger ew xwe radest biken,
ew dê bêne rênivînî kirin, lê eger ew pişta xwe bidenê, tenê erkê te, gehandina peyamê
ye. Xwe dê koleyên Xwe dibînît. 21 Ewên ku eva Xwe dê eşkere kirî piş guhê xwe we
dihavêjin, ewên ku bêmaf Pêşbîna dikujin, ewan dikujin ku destûra dadperweriya naw
mirova da diden, nûçeya eşkenceya bijan bide wan. 22 Li ev dinyayê û Dawiyê da
kiryarên wan dê bêkêr bin û çi kes yarmetiya wan naket.
23 Te ew berçav girtine ewên ku parek li nivîsîna pîroz bi wan hatibû dan. Dema ku bo
dadweriyê ewan bangî nivîsîna pîroza Xwe dê diken, hindek li wan pişta xwe didenê û
diçin, hindek li wan jî dijberin. 24 Ewe li ber hindê ye çimkî ew dibêjin, ´Tenê dê bo
çend rojên sînordar dê agir berbîte me. ´Ew li dînê xwe da hatibûne xapandin, pê ew
direwên ku wan dahînayne.´ 25 Rewşa wan dê çawa bît, dema Em wan kom bikene bal
hev, bo ew Rojê ku têda çi guman nîne, dema ku dê bi tewawî bi her rihekê dê bête dan,
ewa ku pê destê xwe kom kiriye û nerastî li wan nayête kirin. 26 Bêje; ´Xwe dê, Xwedanê
Padişahiyê, Tu dideye her kesê ku Tu dixwazî û Tu padişahiyê li her kesê ku Tu dixwazî
distînî. Tu bilind dikey her kesê Tu dixwazî û Tu nizim dikey her kesê Tu dixwazî.
Hemû eva başe di destê Te daye, birastî Te desthilat li ser hemû tişta heye. 27 ´Tu şevê
dikeye rojê da û rojê jî dikeye şevê da, Tu evê zindî li mirî da derdixî û mirî li zindî da,
Tu bêpayan debarê dideye her kesê Tu dixwazî.´ 28 Ewên bawermend nabît li şûna
bawermenda ewên nebawer bikene hevpeymanê xwe. Her kesek karek wisa biket, çi
tiştek li bal Xwe dê nîne_ xêncî ew dema ku pêvîste hûn xwe li wan biparêzên.
Xwe dê we agahdarê Xwe diket. Vegera dawî bo bal Xwe dê ye. 29 Bêje, ´Xwe dê dizanît
hemû ew tiştê di singê we da ye, çi hûn weşêrin yanjî eşkere biken, Ev dizanît hemû ev
tiştê li asimana û ser erdê, Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye.



a: Mosliman
b: Ewên ku peyrevî li Rênivînî (Torat) Incîl (Mizgînî) Xwandin (Quran) ê naken. Çi peyamber bo wan nehatine!

30 Ew Roja ku hemû rihek ew başiyê kirî di pêşya xwe da bibînît û ew nebaşiyê kirî jî,
ew dê hêvî biket ku li nawbera ew kes û ewê da nawberek gelek mezin hebît. Xwe dê
sebaret bi Xwe agahdariyê didete we û Xwe dê jibo koleyên Xwe Mêhrîvane. ´
31 Bêje, ´Eger hûn hez ji Xwe dê diken peyrevî li min biken û Xwe dê, dê hez ji we
biket û dê gonehên we li we bibhorît, Xwe dê Ev ê Lêbihore, Birehme.´ 32 Bêje,
´Peyrevî li Xwe dê û peyamber biken, lê eger ew pişta xwe bidenê, bes Xwe dê hez
nebawera naket.´ 33 Xwe dê, A Dem, Nûh[a], binemala Ibrahîm û binemala Imran li
serwey hemû mirova hilbijartin, 34 hindek neviyên ewên dîke ne, Xwe dê Bihîstin û
Zanîne. 35 Dema jina Imran got; ´Xwedan, birastî eva di zikê min da mezin dibît, min
pêşkêşî Te kiriye, lewma evê li min bipejirîne. Birastî Tu Bihîstin û Zanistî 36 Lê dema
ew za, wê got; ´Xwedanê min, ez mêyekê za me, Xwe dê baş dizanî ew çi zabû, nêr
weka mê nîne, ´Ez nav lê dikem Miryem û li dijî Şeytanê nepejirandî ez daxwaza
penahê jiboy wê û zarûkên wê li Te dikem.´ 37 Xwedanê wê bi başî ew pejirand û ew li
başiyê da mezin kir û ew rasparte destê Zekerya. Her gava ku Zekerya diço ku wê li
sitargeha wê da bibînît, wî debar libal wê didîtin. Wî got ´Miryem ewe çawane ku te
eve hene? ´ Û wê got, ´Ewane li Xwe dê ne, birastî Xwe dê, bêpayan debara didete
her kesê ku Ev bixwazît.´ 38 Di wê hindê da Zekerya li ber Xwedanê xwe pariya. Wî
got, ´Xwedanê min, li Xwe zarûkek pak bide min, Tu hemû paryanekê dibhêy.´
39 Dema ew li sitargehê da sekinî bû û dipariya, firişteya gazî wî kirin ´Birastî Xwe dê
mizgîniya Yehya dide te, piştrast kirina peyvekê li bal Xwe dê. Ew dê birûmet û
pakdawên be û dê bibîte pêşbînek li naw durustkara da.´ 40 Ew got; ´Xwedanê min,
min dê çawa kurek hebît, dema ez hinde pîrim û jina min jî nezoke? ´ Vî got,
´Xwe dê wisa ye. Diket eva ku Ev dixwazît.´ 41 Ew got ´Xwedanê min, nîşaneyekê bide
min. Vî got, ´Nîşaneya te, ewe ku bo sê roja tu digel kesê got û bêjê nakey, bes bi
nîşana desta nebît. Gelek cara Xwedanê xwe bi bîr bîne û Vî di êvar û serê sibê da
paye bilind bike. 42 Dema firişta gote Miryemê; ´Miryem, birastî Xwe dê tu hilbijartî û
tu pak kirî, tu li serwey hemû jina da hilbijartî. 43 ´Miryem, bi xwe radest kirin peyrevî
li Xwedanê xwe bike û digel ewên ku xwe diçemînin û serê xwe dinvînin xwe
biçemîne, çok danê. 44 Eve li ev nûçeya nedîtiye ku Me bo te eşkere kiriye, dema ku
ewan pênûsa xwe havêtin ku bizanin kîjan yêk li wan dê çavdêriya Miryemê bigrîte
ûstê xwe, tu li bal wan nebûy, dema ewan gengeşe kir tu li bal wan nebûy. 45 Dema
firişta got, ´Miryem, Xwe dê li bal Xwe we mizgîniya peyvekê didete te, navê wî dê
Îsa, Mesîhê kurê Miryemê bît, li vê dinyayê û Dawiyê da, ew dê rêz lê bê girtin, ew dê
yêk li wan bît ku dê bînine nêzîk[b].



a: Navê Nûh bi Kurdî Nû Xwe ye! NÛ XWE. Ez bawer dikem li nivîsîna erebî da nixta ser H ketiye û Nû xwe bûye Nûh. Gemiya Nû xwe li ser çiyayê Cûdî (Cih dît) rûniştiye. Çiyayê Cûdî li Şirnexê (Şar Nû Xwe) ye.

b: Li Roja Vejiyanê da, 3 komê mirova hene, ewên destê çepê dê biçine cehneme, ewên destê rastê dê biçine biheştê (baxçê parêzdayî) û ewên pêşiyê ku dê nêzîkê Xwe dê bin!

46 Ew dê li naw landikê da digel mirovan bipeyvît û dema pêgeheşt ew dê li naw
durustkara da bît.´ 47 Wê got, ´Xwedanê min, çawa min dê kurek hebît, dema ku çi
mêra destê xwe nedaye min? Got, ´Xwe dê wisa ye, diafrînît ewa ku Ev dixwazît.
Dema Ev fermana bûyerekê diket, Ev tenê dibêjît, ´Bibe û ew dibît. ´´ 48 Ev dê wî fêrî
nivîsîna pîroz, têgeheştin, Rênivênî (Torat) û Mizgîniyê (Incîlê) biket 49 û peyambereke
jiboy zarûkên Israîl, ´Birastî ez bi nîşaneyekê li bal Xwedanê we ra hatime bal we. Ez
dê şêweya balindeyekê li heriyê bo we çêkem, paşê ez dê hilma xwe pif kemê û bi
destûra Xwe dê, ew dê bibe balindeyek rastî, ez koreya çavsax dikem û gorûya
derman dikem û bi destûra Xwe dê jiyanê dideme miriya. Ez dê bêjme we hûn dibya
çi bixwen û hûn dibya li malên xwe da çi xwedan ken. Di evê da birastî bo we
nîşaneyek heye, eger hûn bawermendin. 50 Ez hatime rastiya Rênivîniyê (Toratê)
piştrast bikem ku pêş min da hatiye û hindek tişta bo we qanûnî bikem ku pêşta jibo
we qedexe bûn. Ez bi nîşaneyekê li aliyê Xwedanê we hatime bal we. Lewma hişyarê
Xwe dê bin û peyreviyê li min biken. 51 Birastî Xwe dê Xwedanê mine û Xwedanê we
ye jî, lewma xizmeta Vî biken - eve rêya raste´ 52 Dema Îsa hest pêkir ku ew bawer
naken, wî got ´Kê dê jiboy Xwe dê yarmetiya min biket?´ Şagirta got, ´Em dê bibine
yarmetîderê Xwe dê, em bawerî bi Xwe dê diken_ gewahê xwe radest kirina me jiboy
Vî be.´
53 ´Xwedanê me, em bawerî bi evê diken ku Te şandiye xarê û em peyrevî li peyamber
diken, me di naw gewaha da tomar bike.´ 54 Ewan bernamerêjî kirbûn lê belê Xwe dê
jî bernamerêjî kirbû, Xwe dê li baştirîn bernamerêja ye. 55 Dema Xwe dê got, ´Îsa, Ez
dê rastî te paşve bikêşim û te bilind keme bal Xwe û te li nebawera pak bikem. Taku
Roja Vejiyanê, Ez dê ewên peyrevî li te kirî, dê li nebawera payebilindtir bikem. Paşê
hûn dê hemû vegerêne bal Min û Ez dê sebaret bi ciyawaziyên we dadwerê nawbera
we bim. 56 Lê sebaret bi nebawera jî, Ez dê li ev dinyayê û Dawiyê da, ewan bi êşek
dijwar siza bidem û ewan çi yarmetîder çinabin,57 lê jiboy ewên ku bawer diken û karê
baş diken, dê xelatê wan bi tewawî bidete wan, lê Xwe dê hez ewan naket ku karê
nebaş diken. 58 Em vedibêjine te ev eşkere kirinê ku bîranîneke biryardere.
59 Li bal Xwe dê mînaka Îsa jî her wek A Dem ye. Vî, ew li tozê afirand, paşê gote wî,
´Bibe´ û ew hebû. 60 Eve rastiye li aliyê Xwedanê te, lewma nebe yêk li wan ku
gumanê diket.
61 Eger her kesek li ser evê gengeşê digel we biket, piştî ku ev zaniste bi we hatiye dan,
bêjin, ´Werin, bila em kurên xwe û kurên we, jinên xwe û jinên we, xwe û we bicvînin
û jidil we li ber Xwe dê bipariyên û hêviya nerêniya Xwe dê li sere wan biken ku
direwa diken.´ 62 Birastî eve çîroka raste, çi xwedê nînin xêncî Xwe dê, birastî Xwe dê
Bihêz û Dadwere. 63 Lê eger pişta xwe bidenê, bes birastî Xwe dê baş agahdarê
gendela ye.

64 Bêje, ´Mirovên nivîsîna pîroz, werin em bigehne peyvekê ku em hemû têda hevparin,
em tenê Xwe dê diperestin, em çi ´hevala´ bo Vî nadanên û hîç yêk li me, xêncî
Xwe dê, ewên dîke wek xwedan vernagrît. ´Li paş evê eger pişta xwe bidenê da, bêje,
´Gewahê xwe radest kirina me bin.´ 65 Mirovên nivîsîna pîroz, hûn çima li ser Ibrahîm
gengeşê diken, dema ku hêşta Rênivînî (Torat) û Mizgînî (Incîl) eşkere nebibûn ta piştî
dema wî? Meger hûn hizra xwe bikar naynin? 66 Hûn lêre gengeşê li ser tişta diken ku
we hindek zanist lê heye, lê çima hûn gengeşê li ser tişta diken ku hûn çi lê nizanin?
Xwe dê dizane û hûn nizanin. 67 Ibrahîm ne Cihû bû ne Fele. Ew yêke serast bû ku xwe
radestê Xwe dê kiribû û yêk li putperesta nebû. 68 Ew mirovên herî nêzîk li Ibrahîm,
ewin ku birastî peyrevî li wî û ev Pêşbîn û bawermenda diken, Xwe dê piştîvanê
bawermend ye. 69 Hindek mirovên nivîsîna pîroz jidil we hez diken we li rê derêxin, lê
tenê ew xwe li rê diderêxin, her çend ew bixwe jî tênagehin. 70 Mirovên nivîsîna pîroz,
hûn çima nikoliyê li eşkereyên Xwe dê diken, dema ku hûn gewahiya vê diden?
71 Mirovên nivîsîna pîroz hûn çima rastiyê têkelî nerastiyê diken? Hûn çima rastiyê
diweşêrin dema ku hûn pê dizanin? 72 Hindek mirovên nivîsîna pîroz dibêjin, ´Li
destpêka rojê da baweriyê bi eva eşkere bûyî bo bawermenda biken paşê li dawiya rojê
da nikoliyê lê biken, taku ew jî dest jê berden.´ 73 Lê bawerî bi kesê neke meger ku ew
peyrevî li dînê te biket ´ Bêje, ´Rênivîniya rast, rênivîniya Xwe dê ye´ Neket ku bi kesek
dîke jî yêke weka eva bi we hatibû dan, hatibîte dan yanjî belke li pêşya Xwedanê we
bo gengeşe kirinê li dijê we da bikar bînin? Bêje ´Birastî qencî li destê Xwe dê daye. Ev,
pêşkêşê her kesê ku Ev dixwazît diket. Xwe dê Berfereh û Zana ye. ´ 74 Her kesekê ku
Ev bixwazît, Ev bo rehma Xwe hildibjêrît. Xwe dê xwedanê qenciya bêpayane. 75 Li
naw mirovên nivîsîna pîroz[a] da hindek hene eger tu komek zêra bispêrye wan, ew dê
vegerînin, lê hindek mirovên dîke jî, li wan hene eger tu tenê dirafekê bispêrye wan, ew
nadene te, meger ku tu berdewam li ser serê wan rawestî, çimkî ew dibêjin, ´Me li
hember ewên ku xwedanê nivîsîna pîroz nînin, çi berpirsiyatiyek nîne. Ew sebaret bi
Xwe dê direwa diken dema ku ew vê jî dizanin. 76 Belê ewên ku peymanên xwe xwedan
diken û hişyarê Vî ne, birastî Xwe dê hez ewên ku hişyarê Vî ne diket. 77 Lê ewên ku
peymana Xwe dê û sûndên xwe difroşine buhayek kêm, ewan çi parek li jiyana têt da
nabît. Li Roja vejiyanê da Xwe dê ne dê gel wan bipeyvît û nejî dê berê Xwe bidete
wan _ Ev, wan pak naket _ eşkenceyek bijan benda wane. 78 Hindek li wan hene ku
nivîsîna pîroz pê zimanê xwe ba diden taku hûn hizir biken ev parek li nivîsîna pîroze,
lê ew li nivîsîna pîroz nîne û ew dibêjin, ´Eve li Xwe dê ye dema ku li Xwe dê nîne, ew
sebaret bi Xwe dê direwa diken dema ku vê dizanin jî.



a: Basê Rênivînî (Torat) Mizgînî (Incîl) û Xwandin (Quran)ê ye.

79 Çi bimirek çinîne ku Xwe dê nivîsîna pîroz, têgeheştin û pêşbînî dabîtê bêjîte
mirova, ´Li tenişt Xwe dê da bibine koleyên min.´ Lê ´Hûn dibya bibine şagirtên xwe
radest kiriyê Xwe dê, li ber xatira eva ku we li nivîsîna pîroz fêr kiriye û eva ku hûn lê
fêr bûne.´ 80 Ev çi cara fermanê li we naket ku hûn firişte û pêşbîna weke xwedanê xwe
vergirin. Ev dê çawa destûrê bidete we ku bibine nebawer, piştî ku we xwe radestî Vî
kiriye? 81 Dema Xwe dê peymanek li pêşbîna sitand, ´Eger piştî Min hertiştek li
nivîsîna pîroz û têgeheştin pêşkeşî we kir, peyamberek bêt û eva hatiye dan bi we
piştrast biket, hûn dibya baweriyê pê biken û piştîvaniya wî biken. ´Got ´Hûn evê
erênî diken û peymana Min dipejirînin weke girêyekê li ser xwe? ´ Ewan got, ´Erê em
diken. ´ Vî got, ´Bes hûn gewah bin û Ez jî dê digel we li naw gewaha da bim.´
82 Ewên ku paş wê hindê pişta xwe danê, ew li wan bûn ku bi pêdagirî serkêşî kirin.
83 Erê, xêncî xwe radestkirina Xwe dê ew dînek dîke dixwezin? Li rewşekê da ku
hemû ewên li asimana û erdê da xwe radestî Vî kirîne, çi bixwezin yanjî nexwezin, ew
dê hemû bêne zivrandin bo bal Vî. 84 Bêje, ´Em bawerî bi Xwe dê û eva bo me û
Ibrahîm, Ismaîl, Ishaq, Yeqûb û nevyên wan hatiye şandine xarê diken û eva li aliyê
Xwedanê wan we bi Mûsa, Îsa û pêşbîna hatiye dayîn diken. Em ciyawaziyê li
nawbera hîç yêk li wan naken. Em xwe radestê Vî diken. 85 Eger kesek li her dînekê
xêncî bi tewawî xwe radest kirina Xwe dê bigerêt, çi cara ew li wî nayête pejirandin,
Ew dê yêk li wan be ku li Dawiyê da dorandiye. 86 Boçi dibît Xwe dê rênivîniya
neteweyekê biket ku bawer naken, piştî ku wan bawer kiribû û gewahî dan ku
peyamber raste û piştî ku belgeyên zelal bi wan hatine nîşan dan? Xwe dê rênivîniya
neteweyekê naket ku karê nebaş diket. 87 Ewên wisa dê li aliyê Xwe dê, firişta û li aliyê
hemû mirovan we bi nerênî[a] bêne siza dan, 88 taku bêdawiyê ew dê li wir bimînin, ne
dê sizaya wan bête siwik kirin, nejî dê paşve bête dan. 89 Ne ewên ku paşê peşîman
dibin û xwe serast diken, birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. 90 Birastî ewên ku
baweriya xwe li dest dan, piştî ku bawerî pê kirbûn û paşê li nebaweriya xwe zêdê
kirîne, çi cara peşîmaniya wan nayête pejirandin. Ewane ewin ku li rê derketine.
91Birastî ewên ku bawer naken û bi nebawerî dimrin, çi cara weke qerebû tejî di erdê
da zêr jî, li hîç yêk li wan nayête pejirandin[b]. Eşkenceyeke bijan çavnihêrê wane û
ewan çi yarmetîder jî çinabin. 92 Hiç yêk li we, dîndariya rastî bi destê xwe we naynît
meger hûn li eva ku hûn jê hez diken biden, her tiştekê hûn diden, Xwe dê pê Dizanît.
93 Pêş ku Rênivînî (Torat) eşkere bît hemû xwarinek bo zarûkên Israîl qanûnî bû, xêncî
ewa Israîl[c] li xwe qedexe kirbû. Bêje ´Rênivîniyê (Toratê) bînin û bixwînin, eger hûn
rast dibêjin.´



a: Lenet kirin
b: Qebûl kirin, pesend kirin, erê kirin
c: Israîl (Yeqûb) peyambere, liber êşa pêyê xwe, goşt û şîrê hêştirê nedxwar! Hindek Cihû ya digote Mihemed Peyamber, eger tu peyrevê dînê Ibrahîm, çima tu goşt û şîrê hêştrê dixwey. Yeqûb peyamber neviyê Ibrahîm peyamber ye û peyrevê rêbaz û dînê Ibrahîm peyamber bû.

94 Ewên ku paş hingê sebaret bi Xwe dê direwa berhem bînin, ew nebaş karin. 95 Bêje,
Xwe dê rastiyê dibêjît, lewma peyreviyê li dînê Ibrahîmê serast biken, ew yêk li wan
putperesta nebû.´ 96 Birastî yêkem mal[a] ku bo mirova bête ava kirin, ewa li Bekê[b] da
bû, pîroze û bo hemû dinyaya rênivîniye. 97 Nîşaneyên zelal têdane, ew cihe ku
Ibrahîm rawesta bû, her kesek têkevîtêda, ew ewlehe. Erkê hec kirin bo malê deynê
Xwe dê ye li ser ew mirovan ku bikarin bicih bînin. Lê ewên ku bawer neken birastî
Xwe dê pêvîstî bi çi mirova nîne. 98 Bêje, ´Mirovên nivîsîna pîroz, hûn çima nikoliyê li
eva Xwe dê eşkere kirî diken? Dema ku Xwe dê gewahe li ser eva hûn diken.´
99 Bêje, mirovên nivîsîna pîroz, hûn çima rêgiriya bawermenda li rêya Xwe dê diken û
hevil diden wê xar biken, dema ku hûn bixwe gewahê wê ne? Xwe dê bêagah nîne li
ewa ku hûn diken.100 Ewên ku we bawer kirîne, eger we peyrevî li hindek li wan ku
nivîsîna pîroz bi wan hatiye dan kiriba, dê hûn zivrandibana ser nebaweriyê, piştî ku
we bawer kirî. 101 Hûn çawa dikarin nebawer bin, dema ku eva Xwe dê eşkere kirî bo
we têt vexwendin û peyamberê Vî li naw we da dijît? Her kesek xwe qahîm bi Xwe dê
we bigrît bêguman dê bo rêya rast bête rênivînî kirin. 102 Hûn ku bawer diken, hişyarê
Xwe dê bin her wek ku eve deynê Vî ye û nemrin taku hûn xwe radestê Vî neken.
103 Hemû bihevra xwe qahîm bi bendikê Xwe dê we bigrin. Neveqetêyêne ser aliya.
Erêniya Xwe dê li ser we bîra we bît, dema hûn dijminê hevbûn û paşê Vî dilê we
înane bal hevdu û pê erêniya Vî hûn bûne bira, kêm mabû hûn bikevine naw çalek
agir da û Vî hûn jê parastin. Bi wî awayî Xwe dê eşkereyên Xwe bo we zelal diket,
belke liber wê hindê hûn bêne rênivînî kirin. 104 Bibine civakek ku banga evê diket ku
başe, pêdagiriyê li ser eva rast diket û eva nerast qedexe diket. Ewên ku vê diken
serkevtî ne. 105 Nebine weka ewan ku piştî belgeyên zelal bi wan hatine dan, diveqetine
ser aliya û dikevine naw gengeşa, sizayek gelek mezin li benda ew mirovane. 106 Di ew
Roja ku dê rûmet sipî bin û dê rûmet reş bin, ´Lê ewên ku rûmetê wan reş dibin, piştî
bawer kirinê, we nikolî[c] li baweriya xwe kir? Bes liber xatira eva ku we bawerî pê
nekirî, eşkencê tam biken. ´ 107 Lê ewên ku rûmetên wan sipî bûyi dê li rehma Xwe dê
da bin. Ta bêdawiyê ew dê li wir bimînin. 108 Evane eşkere kirinê Xwe dê ne, Em
birastiyê bo te vedixwînin. Xwe dê bêdadiyê jibo afirandinê Xwe naxwazît. 109 Hemû
tiştê li asimana û erdê da yê Xwe dê ye. Mijar dê bizvirine bal Xwe dê. 110 Hûn
baştirîn civakin ku jiboy mirova hatine hilbijartin. Pêdagiriya eva rast diken û ewa
nerast qedexe diken û bawerî bi Xwe dê diken. Eger mirovên nivîsîna pîroz jî her wisa
bawer kiriban, ew dê bo wan baştir ba, li naw ewan da bawermend hene, lê piraniya
wan bi pêdagirî serkêşin. 111 Ew zirarê li we naden, bes dê we bêzar biken, tenanet
eger ew bên şerê we jî biken, dê zû pişta xwe bidene we û yarmetiya wan nayête kirin.



a: Kebe
b: Meke
c: Haşa, înkar

[112] Her derê ku ew hatine peyda kirin pê rûreşiyê li wan hatiye dan, xencî wê ku ew
xwe bi bendikê Xwe dê û bendikê mirova we bigrin. Ewan kerbê Xwe dê li ser xwe
vekiriye û pê hejariyê li wan hatiye dan, çimkî ewan bawerî bi eşkereyên Xwe dê
nedikir û bêy ku mafek hebin Pêşbîn kuştine, çimkî ew serkêş bûn û sînor dibezandin.
[113] Lê ew hemû weka hevdu nînin, hindek li naw mirovên nivîsîna pîroz da civateke
rastin, di demên şevê da eşkereyên Xwe dê dixwînin û çok didanên û serê xwe
dinvînin[a] [114] Ew bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê diken, ew fermana evê diken ku
raste û vê qedexe diken ku neraste, ew li kiryarên baş da lezgînin. Ew mirovane li naw
ewên dirustkar dane [115] û her tiştekê baş ku ew diken çi cara nikolî li wan nayête kirin.
Xwe dê ewên ku hişyarê Vî ne nas diket. [116] Lê sebaret bi ewên ku bawer naken, li dijî
Xwe dê da çi cara ne malê wan û nejî zarûkên wan dê kêr wan bên _ ew hevrêyên
naw agir da ne û ta bêdawiyê ew dê li wêderê bimînin. [117] Mînaka hertiştê ku ew li vê
dinyayê da biden weke bayek bi şixte ye[b] ku li çandina wan mirova didet ku nerastî
digel xwe kirîne û wêran diket. Xwe dê nerastî li wan nekirye, ewan nerastî li xwe
kiriye. [118] Hûn ku bawer diken, xêncî xwe ewên dîke bo nêzîkatiya xwe helnebjêrin.
Ew çi derfeta li dest xwe naken ku we malkambax ken û hez diken hûn dijwariyê
bikêşin, kerbê wan di devê wan da xûya diket, lê ewa di singê wan da weşartiye gelek
mezintire. Bêguman Me eşkereyên Xwe jibo we zelal kirîne, eger hûn hişê xwe bikar
bînin. [119] Wêderê hûn hez li wan diken lê ew hez we naken, hûn bawerî bi hemû
nivîsîna pîroz diken û dema ew, we dibînin, ew dibêjin, ´Em bawer diken´ Lê dema
ew bi tenê ne ew li kerbê we da serê tilyê xwe leq diden. Bêje, ´Kerba da bimrin,
Xwe dê dizanît li singa da çi heye.´ [120] Eger başiyek bigehîte we, ew xemgîn dibin û lê
eger zirar bigehîte we, ew şad dibin. Lê eger hûn bêhin fereh bin û hişyarê Vî bin bi
hîç awayekê bernamê wan zirarê li we naden, birastî Xwe dê hemû tiştê ku ew diken
dorpêç diket. [121] Dema li serê sibê da tu mal derketî ku çeperên şer[c] bo bawermenda
dîhar bikey, Xwe dê Dibhêt û Dizanît. [122] Dema du komên we hema hema berda bûn
bivêriya xwe jibo serkevtinê li dest biden lê Xwe dê ew parastin. Dibya bawermend
pişta xwe bi Xwe dê rast biken. [123] Dema ku hûn gelek kêm bûn, Xwe dê li Bedr[d] ê da
yarmetiya we da, hişyarê Xwe dê bin, belke li ber hindê hûn sipasdar bin.
[124] Dema te gote bawermenda, ´Meger têrê naket ku dibya Xwedanê we bi şandina sê
hizar firişta bo xarê piştîvaniya we biket?



a: Sujde.
b: Bayê sar û tezî ku hemû tişta diqerisînît.
c: Cihê şer, sengerên şer.
d: Basê şerê bawermenda digel nebawera ye.

125 Belê, eger hûn bêhinfereh û hişmendê Vî bin û eger dijmin nişkida hêrişî we biket
Xwedanê we dê bi şandina pênc hizar firiştên[a] dirûşim[b] kirî dê piştîvaniya we biket!
126 Meger Xwe dê mizgînî neda we ku dilê we bêxîte tenahiyê da ku yarmetî tenê libal
Xwe dê Bihêz û Dadwer we têt! 127 Belke Ev teniştek nebawera qet biket[c], yanjî wan
biçewsînît, jiboy ew bêhêvî paşve vegerên. 128 Te çi kar pê neketiye ku Ev li wan bibhorît
yanjî wan siza bidet, çimkî birastî ew nerastkarin. 129 Hemû tiştê li asimana û erdê da yê
Xwe dê ye. Ev li her kesê dixwazît dibhorît û her kesê ku Ev dixwazît siza didet.
Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. 130 Hûn ku bawer diken sûdê nexwen, ducara zêdekirî
û yanjî çend car lê zêde kirî. Hişyarê Xwe dê bin belke liber hindê hûn behremend bin.
131 Hişyarê agiri bin ku bo nebawera hatiye amade kirin 132 û peyrevî li Xwe dê û
peyamber biken belke liber hindê hûn rehmê vergirin. 133 Lezê lê biken bo aliye
lêbihorîna Xwedanê xwe û baxçeyekê hindî asimana û erdê pan ku bo ewên durustkar
hatiye amade kirin. 134 Ewê ku li dema heyiyê û tengasiyê da didet, ewên ku pêşiya kerbê
xwe digrin û li mirova xweş dibin, Xwe dê hez li wan diket ku karê baş diken. 135 Ewên
ku dema bêrewiştiyê[d] biken yanjî nerastiyê li xwe biken Xwe dê bîr tînin û bo lêbihorîna
gunehên xwe dipariyên - xêncî Xwe dê kê li guneha xweş dibît? Û pêdagiriyê li ser
kiryarên xwe[e] naken, dema ku ew dizanin. 136 Padaşê ewên wisa, li bal Xwedanê wan
we lêbihorîne û baxçene ku çem têda diherikin, ta bêdawiyê ew dê li wêderê da bimînin.
Padaşê karkera erêniye. 137 Rewşên mîna ewane li pêş we da jî derbaz bûne, lewma
herin li ser erdê bigerên û bibînin ku dawiya ewên ku nikolî kiribûn çawa bû.
138 Eve[f] ragehandineke zelale bo mirova û renivînî û perwerdeye bo ewên ku hişyarê Vî
ne. 139 Lewma bêhêz û bêhêvî nebin, eger hûn bawermendê rastî ne hûn dê serdest bin.
140 Eger we derbek xariye, ew kesa jî derbek wisa xariye. Em rojên wisa bi nobe li naw
mirova da par vediken, jibo ku Xwe dê aşkira biket kanê kê birastî bawer diket, jibo ku
Ev li naw we da şehîda hilbjêrît, Xwe dê hez li nerastkara naket.



a: Milyaket
b: Nîşan kirî
c: Tenişta leşkerên nebawera
d: Fehşa
e: Bi nezanî
f: Xwandin (Quran)

141 Jiboy ku Xwe dê bawermenda taqî biket û nebawera li naw bibet. 142 We hizir dikir
ku hûn dê têkewine naw baxçe bêy ku Xwe dê pêşta bizanît kanê kîjan li we dê bo
armanca Xwe dê xebatê biket û bidete zelal kirin kanê kê bêhinferehe? 143 Pêş ku hûn
mirinê bibînin we hêviya wê dixwast. Başe, niha we pê çavê xwe dîtiye.
144 Mihemed tenê peyambereke, pêş wî da gelek peyamber hebûne û çone. Eger ew
bimrît yanjî bête kuştin hûn dê ser paniya xwe we bizvrin? Eger her kesek ser paniya
xwe we bizvrît, ew çi cara zirarê li Xwe dê nadet. Xwe dê, dê padaş bidete ewên
sipasdar. 145 Çi rih bêy destûra Xwe dê li dema pêşta hatî dîhar kirî namirin. Eger
kesek bo padaşên ev dinyayê da têkoşanê biket, Em dê li wan bidenê da. Eger kesek bo
padaşên Dawiyê têkoşanê biket Em dê li wan bidenê da, Em dê ewên sipasdar xelat
biken. 146 Gelek mamostayên dînî digel pêşbîna şer kirîne, ne liber xatira ewa li rêya
Xwe dê, da hate serê wan û nejî liber xatira bêhêz bûnê, ewan bivêriya xwe ji dest
neda, nejî xwe radest kirin, Xwe dê hez ewên bêhinfereh diket. 147 Hemû gotinên wan
xêncî evê tiştek dîke nebû,´Xwedanê me, li gunehê me û li zêde gaviyên me li
karûbarên me da xweş be. Pêngavên me cihgîr ke û li dijî neteweya nebawer da
yarmetiya me bide,´ 148 Û lewma Xwe dê padaşên ev dinyayê û padaşê başê Dawiyê
dane wan. Xwe dê hez ewan diket ku karê baş diken. 149 Hûn ku bawer diken, eger
hûn peyrevî li nebawera biken, ew dê we li ser paniyên we da bizvrînin û hûn dê
bidorînin. 150 Lê Xwe dê parêzerê we ye, Ev li baştrîn yarmetîdera ye 151 Em dê tirsê
bêxine di naw dilê nebawera da, çimkî ew hevala bo Xwe dê peyda diken, her çend Vî
çi desthelat bo vê hindê neşandiye, penah geha wan dê agir bît. Çend kotiye mangeha
ewên ku karên nebaş diken! 152 Bi paşvekêşana wan Xwe dê belêniya Xwe jibo we bi
cih îna, paşê we bivêriya xwe ji dest da û gengeşe li ser destûrê kir û we serkêşî kir, piştî
ku Vî nîşa we da ku hindek li naw we da hez li çi diken, hindek li we hez li ev dinyayê
kirin û hindekê dîke jî hez li Dawiyê kirin û paşê Vî pêşgîriya we jiboy ser wan kir ku
we taqî biket. Niha Ev li we bihoriye. Jiboy bawermenda Xwe dê xwedanê qenciyê ye.
153 Dema hûn serjêhel reviyan bêy ku hûn zêndene kesekê, dema ku li dû we da
peyamber gazî we dikir û lewma Vî xemgînî li ser xemgîniyê da we. Taku hûn
şîndariyê neken jiboy bo eva we li dest daye û ewa serê we hatî. Xwe dê gelek baş
agahdarê wêye ku hûn diken.



*Li gor gotina Ebdil Helîm, eşkereya 152 basê şerekê diket ku bawermenda serpêçî li destûra Mihemed peyamber kirin. Şervanên xwedan tîr û kewan hizir kirin ku bawermenda li şer da serkevtin bi dest înaye û berewajî fermana Mihemd peyamber çeperên xwe çol kirin û çon ku destkevtên şer bixwe kom biken. Ew karê wan bûye hokar ku dijminê wan ser li nû xwe rêk bêxin û hêrişê bikene ser wan û di şer da serkevtî bin.

154 Piştî xemgîniyê, Ev bû hokar ku tenahî li ser we da bikevît û xewê ser hindek ji we
da girt. Komek din, ku tenê di hizra xwe dane, hizrên direw sebaret Xwe dê kirin,
hizrên ku zêdetir kêr hatiyê nezana ne û gotin, ´Me çi tiştek di wê mijarê da heye? ´
Bêje, ´Hemû ew mijare ya Xwe dê ye. Ew li naw xwe da diweşêrin, ewa ku bo te
eşkere naken. Ew dibêjin, ´Eger me gotina xwe li ser wê heba, hindek li me li wêderê
nedhatine kuştinê. ´ Bêje, ´Eger we biryar daba ku hûn li mal da jî maban, ewên ku
çarenûsa wan hatibû nivîsîn ku bên kuştin, dê dîsa jî çobana derê ku mirina xwe
bibînin.´ Xwe dê eve kir ku ewa di naw singê we da taqî biket û ewa di dilê we da
bimalît. Xwe dê agahdarê ewa di singe we daye. 155 Lê sebaret bi ewan ku li roja şer da
her du hêz rû bi rûyê hevbûn zivrîn, ew Şeytan bû ku bûye hokar ew paşve vegerin,
liber xatira ewa ku wan dest xwe înay. Niha Xwe dê li wan xweş bûye. Xwe dê, Ev ê
Lêbihor û Pêdagire.156 Hûn ku bawer diken, weka wan nebin ku bawer nekirin û
gotine birayê xwe yê ku derketine rêvîtî yanjî ser dagirtinê, ´Eger tenê ew bal me
maban ew dê nemirban, yanjî nedihatine kuştinê ´ Xwe dê evê dikete serçaveya janê li
dilê ewan da. Ev Xwe dê ye ku jiyan û mirinê didet, Xwe dê ewa hûn diken dibînît.
157 Hûn çi li rêya Xwe dê bêne kuştin yanjî bimrin, lêbihorîna Xwe dê û rehma Vî
baştire li her tiştekê ku ew kom diken. 158 Hûn çi bimrin yanjî bêne kuştinê, hûn dê bo
bal Xwe dê bêne kom kirin. 159 Liber rehma Xwe dê tu bi hêminî digel wan rabûy û
rûniştî _ eger tu dijwar bay, yanjî dil req bay, ew dê li derdorê te belav bana _ lewma
li wan xweş be û daxwaza lêbihorînê bo wan bike. Li ser mijara da rawêjê digel wan
bike, paşê dema te li ser rêbaza kiryarê biryar da, pişta xwe bi Xwe dê rast bike,
Xwe dê hez ewan diket ku pişta xwe bi Vî rast diken. 160 Eger Xwe dê yarmetiya we
bidet kes nikarît serdestiyê li we biket, eger Ev we bêxwedan bihêlît, xêncî Vî dê kê
bişêt yarmetiya we bidet? Dibya bawermend baweriya xwe bi Xwe dê biken. 161 Çi hiş
tê naçît ku pêşbîn[a] karên bêdad biken[a]. Her kesek bêdadiyê biket dê li Roja vejîyanê
da, dê ev tiştê ku bêdadî pê kirî dê digel xwe hilgrît, dema her rihek bo her tiştê ku bi
dest xwe înaye dê bi tewawî dê pê bête dan, nerastî li wan nayête kirin. 162 Dibît ku ew
mirovê dû keyfxweşiya Xwe dê, da diçît mîna ew bît ku kerbê Xwe dê li ser xwe
vekiriye û penahgeha wi dê cehnem bît, armanceke kirêt?
163 Bal Xwe dê pileyên cuda hene. Xwe dê dibînît ku ew çi diken. 164 Bêguman
Xwe dê gelek başî digel bawermenda kiriye ku bo wan, li kesekê li naw ewan da
peyamberek şandiye ku eşkereyên[b] Vî jibo wan bêjît, ewan pak biket û fêrî nivîsîna
pîroz û têgeheştinê biket, her çend ku pêş evê da, ew bi aşkira li şaşiyê da bûn.



a: Nebî (Peyamberên Xwe dê) ew bê dadî anku bê edaletiyê naken.
b: Aye, Wehî, Gotinên Xwe dê, ev gotinên ku Xwe dê, jiboy wî aşkira kirî.

165 Çima dema ku karesatek hate serê we, tenanet ku ewê du car hind zirar gehande
wan! We got, ´Ewe çawa çêbû?´ Bêje, ´We bixwe ewe îna serê xwe. Xwe dê desthilat
li ser hemû tişta da heye 166 û di roja ku her du leşkera li şer da hevdîtin, ew bi destûra
Xwe dê bû ku ew hate serê we, jiboy ku Ev aşkira biket kê bawermende 167 û Ev bidete
aşkira kirin kanê kê durû ye! Dema gotine wan, ´Werin jibo rêya Xwe dê şer biken
yanjî biparêzin, ´Gotin, ´Eger me zanîba ka çawa şer biken, me dê tu şopandibay´. Di
wê rojê da, ew li nebaweriyê nêzîktir bûn taku baweriyê. Ew dibêjin bi dewê xwe eva
ku di dilê wan da nîne, Xwe dê dizanît ew çi diveşêrin.168 Ewên ku rûniştibûn û
sebaret bi birayên xwe gotin, ´Eger tenê ewan peyrevî li me kiriba, ew dê nehatibana
kuştinê.´ Bêje ´Bes mirinê li xwe dûr ken, eger eva hûn dibêjin raste.´ 169 Çi cara hizir
neken ku ewên li rêya Xwe dê, da hatine kuştinê mirî ne, ew zindî ne li bal Xwedanê
xwe û bo wan tête dabîn kirin. 170 Keyfxweşin bi eva ku Xwe dê li qenciya xwe daye
wan, ew sebaret bi ewên ku dê paşê bigehine wan lê hêşta nehatine bal wan, mizgîniyê
didene ewan, ne bo wan dê tirs hebît nejî xemgînî. 171 Mizgîniya erênî û qenciya
Xwe dê verdigrin û Xwe dê nahêlît ku padaşê bawermenda bête bezir kirin. 172 Ewên
ku bersiva Xwe dê û peyamber dan piştî ku birîndar bibûn, ewên ku li naw wan da
başî kirin û hişyarê Vî man, ewan dê padaşek gelek mezin hebît. 173 Ewên ku mirova
gote wan ´Mirov li dijî we kom bûne, li wan bitirsiyên´, Lê baweriya wan zêde bû´ Û
ewan got, ´ Xwe dê têra me heye, Ev baştirîn parêzere´ 174 Lewma li bal
Xwe dê we pê erênî û qenciya bersiva wan hate dan, bêy ku çi zirar bigehîte wan.
Ewan keyfxweşiya Xwe dê şopand û Xwe dê xwedanê qenciyên gelek mezine.
175 Tenê Şeytane ku we li piştîvanên xwe ditrsînît, li wan netirsin, lê li Min bitirsin,
eger hûn bawermendin. 176 Liber xatira ewên ku lezê li nebaweriyê diken xemgîn
nebe. Ew neşên çi zirarê li Xwe dê biden, Xwe dê dixwazît ku li Dawiyê da çi parekê
nedete wan û jiboy wan eve sizayeke gelek mezine.
177 Ewên ku baweriya xwe difroşine nebaweriyê, çi zirarê li Xwe dê naden û
eşkenceyek bijan li benda wane. 178 Ewên nebawer nabît hizir biken ku ew bo wan
baştire ku Em demek zêdetir didene wan, Em tenê dema wan zêdetir diken ku ew
zêdetir guneha biken _ eşkenceyek serşorker li benda wane. 179 Xwe dê bawermend li
ewê da nedhêlan ku hûn têdane, taku nebaşî û başiyê li hev cuda biket. Xwe dê ewa
weşartî jî nûşa we nadet, Xwe dê her kesê ku Ev dixwazît weke peyamber hildbjêrît.
Lewma bawerî bi Xwe dê û peyamberên Vî biken, eger hûn bawer diken û hişyarê Vî
bimînin, we dê padaşek gelek mezin hebît.

180 Ewên ku digel ewa Xwe dê li qenciyên Xwe daye wan, destmiçî ne, nabît hizir
biken ku ewe bo wan başe, Ne! Ew bo wan nebaşe. Her tiştê ku ew bi destmiçî xwedan
ken, li Roja Vejiyanê da, ew dê dora ûstiyê wan bête alandin. Xwe dê ye ku Xwedanê
asimana û erdê ye, Xwe dê agahdarê wêye ku hûn diken. 181 Bêguman Xwe dê gotinê
wan bihîstiye, ewên ku dibêjin, ´Birastî Xwe dê hejare û em heyîne ´ Em ewa ku ew
dibêjin tomar diken, her wisa bêy ku ewan mafek hebû Pêşbîn kuştin û Em ê bêjine
wan, ´Eşkenceya ev agirê biçirûsik tam biken. ´ 182 Eve li ewêye ku we bi destê xwe
bixwe pêş xwe da rêkir, Xwe dê çi cara bêdadiyê digel koleyên Xwe naket.
183 Jibo ewên ku gotin, ´Xwe dê ferman li me kiriye ku bawerî bi çi peyambera neken
meger ku ew bo me qurbaniyekê bînît ku agir[a] bişewtînît, Bêje ´Pêş min da peyamber
pê nîşaneyên zelal hatine bal we, pê ewên ku hûn bas jê diken, eger hûn rast dibêjin,
we çima ew kuştin? ´ 184 Eger ew te nepejirînin, vêca pêş te, ewan peyamberên dîke jî
nepejirandine, her çend ku ew bi belgeyên zelal û nivîsînên pîrozê hişmendiyê hatibûn
û nivîsîna pîroz ku we linaw xweda ronahî diket. 185 Hemû rihek dê mirinê tam biket û
tenê li Roja Vejîyanê da bi tewawî dê bi we bête dan. Her kesek liber agir bête paşve
kêşan û di naw baxçe da bête vergirtin, ew serkevtiye. Jiyana ev dinyayê xêncî
keyfxoşiyek xeyalî tiştek dîke nîne.
186 Bêguman hûn dê li rêya mal û riha xwe we bêne taqî kirin, bêguman hûn dê gelek
ewa bijan li ewên ku pêş we da nivîsîna pîroz bi wan hatibû dan û li ewên ku ´hevala´
jiboy Xwe dê peyda diken bibhên. Eger hûn bêhinfereh û hişyarê Vî ne, eve baştrîn
rêbaze. 187 Dema ku Xwe dê peyman li ewên ku nivîsîna pîroz dabû wan sitand ´Hûn
dibya bo mirova zelal biken, neweşêrin! ´ Lê ewan ser milê xwe we havêtin û ev digel
buhayek kêm veguhertin, çend kirête ewa ku wan kiriye! 188 Hizir neke ewên ku
dilxweşin bi ewa ku wan kiriye û liber xatira ewa ku wan nedikir jî li pesnê digerên û
hizir neke ku ew dê li eşkenceyê birevin, eşkenceyek bijan li benda ewane.
189 Padişahiya asimana û erdê ya Xwe dê ye, Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye.
190 Birastî di afirandina asimana û erdê da û li veguherîna şev û rojê da, jiboy ewên
xwedan têgeheştin nîşane hene. 191 Ewên ku li ser pêya, runiştî û xwe dirêj kirî,
Xwe dê tînine bîra xwe, ewên ku li ser afirandina asimana û erdê têramanê diken,
´Xwedanê me! Te ewe hemû bêhokar[b] ne-afirandiye, Paye bilindi ya Te ye! Lewma
me li eşkenceya agir biparêze. 192 Xwedanê me, birastî ewên ku Tu dê havêjiye naw
agir da Te ew serşor kirîne. Nebaşkara çi yarmetîder çinabin.



a: Agirê asiman, bi destûra Xwe dê,
b: Bê sebeb, bêdelîl, li xwe ra.

[193] Xwedanê me! Me bihîstiye kesek gazî me diket bo baweriyê, ´Baweriyê bi
Xwedanê xwe biken´ Û me bawer kiriye. Xwedanê me! Li me, gunehên me, li me
bibhore û kiryarên me yên nebaş pak bike û bibe hokar ku em digel ewên dirustkar
bimrin. [194] Xwedanê me! Bide me ewa Te li rêya peyamberên Xwe we belêniya wê
daye me. Di Roja Vejîyanê da me serşor neke, Tu çi cara belêniya Xwe naşkênî.
[195] Xwedanê wan bersiva wan da, ´Ez nahêlim kiryarên karkerên li naw we da wenda
bin, çi nêr bin çi mê, hûn li hevdu ne, lewma Ez dê kiryarên nebaşê ewên ku koçber
bûne û li malên xwe hatine der kirin, ewên ku jibo armanca Min zirar dîtî, ewên şer
kirin û hatine kuştinê paqij bikem. Bêguman Ez dê weke padaş ewan vergirme naw
baxçeyên ku çem têda diherikin, nêzîkê Xwe dê, nêzîkê Xwe dê baştrîn padaşe!
[196] Bi hatûçona nebawera li ser erdê neyê xapandin.[a] [197] Ewe tenê keyfxweşiyek
biçûke! Paşê dê cehnem bibîte penahgeha wan, ciheke kotiye bo bêhin wedanê!
[198] Lê ewên ku hişyarê Xwedanê xwe ne, dê baxçeyên ku çem li bin da diherikin
hebin, ew dê ta bêdawiyê li wir bimînin, mêvandariyek nêzîk Xwe dê. Ewa ku nêzîk
Xwe dê ye, herî bêhtire jiboy dirustkara. [199] Li naw mirovên nivîsîna pîroz da hindek
hene ku birastî bawerî bi Xwe dê, bi eva hatiye şandin xar ji bo we û eva hatibû
şandin bo wan jî diken, bi ûstîxarî xwe radestê Xwe dê kirîne, ew çi cara eva Xwe dê
eşkere kirî naguherine buhayek kêm. Jiboy padaş ew dê nêzîk Xwedanê xwe bin,
birastî Xwe dê lezgîne li hisab pirsînê da. [200] Hûn ku bawer diken, bêhinfereh û xwe
ragir bin, hemû dema hişyarê Xwe dê bin belke liber hindê hûn serkevtî bin.



a: Neyê lêbandin

## 4. para Jinan

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Gelî mirova, hişyarê Xwedanê xwe bin, Ev ê ku hûn li rihekê afirandin û li wê cota
wê afirand û li wan bê hejamar, dûr û fereh jin û mêr belav kir, hişyarê Xwe dê bin, bi
navê Vî hûn daxwaza li hevdu diken. Agahdarê qetandina tayê xizmatiyê bin. Birastî
Xwe dê hemû dema çavdêriya we diket. 2 Malê sêwiya bidene wan, tiştên baş digel
ewên nebaş neveguherin û digel malê xwe da, malê wan nexwen, birastî ewe gunehek
gelek mezine. 3 Eger hûn ditirsiyên ku nikarin bi dadperwerî digel kiçên sêwî têkiliyê
biken, hûn dikarin hevjîniyê digel ew jinên dîke pêk bînin ku we keyfxweş diken, du, sê
yanjî çar. Eger hûn bitirsiyên ku nekarin wekhev bin, bes hevjîniyê tenê digel yêk li
wan pêk bîne, yanjî ewên ku bi destê rastê yê we ne[a], ewe gelek dê kêrhatiyê te bît,
eger tu dijatiya wê nekey. 4 Xelatê bûkiniya[b] ew jinên ku hûn jiyana hevjîniyê digel
wan pêk tînin bi comerdî bidene wan, eger ew bi dilê xwe hez diken ku jiboy we li
hindekê xweş bin, hûn dikarin bi hişek pak lê vergirin. 5 Malê xwe nedene ewên
nezan. Xwe dê ew kiriye keresteya debara we. Pê ew debarê jibo wan berhem bînin,
wan cil ken û bi gotinên mêhrevaniyê digel wan bipeyvin. 6 Sêwiya taqî[c] biken taku ew
digehine temenê pêk înana jiyana hevpar, paşê eger we zanî, ew xwedanê darizandina
başin[d], malê wan bidene wan. Bi bêserûberî û bilez, pêş ku ew bigehne temen, malê
wan nexwen. Her kesê heyiye nabît ew destê xwe bidete malê sêwiya, her kesê hejar
bît, dibya ew tenê bi dadperwerî mal bixwot. Dema hûn malê wan didenê, gewaha
gazî ken, lê Xwe dê jiboy hisab pirsînê têrê heye. 7 Dibya mêra pişkek li ewa dayk û
bab û xizmê nêzîk bicih dihêlin hebît û dibya jina pişkek li ewa dayk û bab û xizmê
nêzîk bicih dihêlin hebît, çi kêm bît yanjî zêde; ew pişke erke.
8 Eger li dema par vekirnê da, xizm, sêwî û mirovên belengaz wêderê bûn, tiştekê
bidene wan jî û bi gotinên mêhrevaniyê digel wan bipeyvin. 9 Bihêle bila bitrsin, ewên
ku eger zarûkê lewaz li paş xwe we hêlaban dê bo wan tirsiyaban, bihêle bila ew
hişyarê Xwe dê bin, lewma bihêle bila gotinên jêhatî bêjin. 10 Ewên ku bi bêdadî malê
sêwiya dixwen, li rastî da ew agir qurt dikene zikê xwe da û ew dê li naw agirekê bi pêt
da bişevtin.



a: Ew mirovên ku li jêr desthilata wan da ne, wergêrên Ereb peyva kole bikar tînin herçend ku di Xwandinê (Quran) ê da peyva Kole bikar nayêt!

b: Mahreyî.

c: Imtîhan, ceribandin, ezmûn.

d: Gawa ew sêwî pê bigehin (Balix bin) û biryarê baş biden (Hikmê baş biken), başî û nebaşiyê li yêk cuda biken!

[11] Sebaret bi zarûkên we Xwe dê ferman diket ku dibya pişka nêrekê du car hindî ya
mêyekê bît, eger tenê jin hebin, li duya zêdetir, dibya du li sê pişkên mîrat par veken,
eger yêk, dibya ew bibîte xwedanê nivîyê, her yêk li dayk û baba dibine xwedanê yêk li
şeş pişka, eger mirî zarûk li dû xwe we hêlabin, eger ew çi zarûka li piş xwe we nehêlît
û dayk û babê wî tenê mîratgirin, dayka wî yêk li sê pişka heye, meger ku ew bira
hebin, di wê rewşê da yêk li şeşa li ber dayka wî dikevît. Piştî dana dirafê tembî kirî
yanjî deyna. Hûn nikarin bizanin kê li dayîk û bab yanjî zarûkên we jibo we zêdetir bi
kêrin, ewe erke li bal Xwe dê we û Xwe dê Zanaye Biryardere. [12] Hûn dibine
mîratgirê niviya ewa ku jina we li paş xwe dihêlît, eger we çi zarûk çinebin, eger wan
zarûk hebin, hûn çarîkekê mîrat diben. Piştî dana dirafê tembî kirî yanjî deyna*. Eger
we çi zarûk nebin, pişka jina we çarîkeke, eger we zarûk hebin para jina we yêk li heşt
pişka ye. Piştî dana dirafê tembî kirî yanjî deyna. Eger mêrek yanjî jinek bimrît û çi
dayk û bab yanjî zarûka li pişt xwe we nehêlît, lê tenê birayek yanjî xweşkek hebît, yêk
li şeş pişka mîrat li ber ew xwîşik yan biraya dikevît, eger xweşik û birayê zêdetir hebin
ew yêk li sê pişka di nawbera xwe da par vediken. Piştî dana dirafê tembî kirî yanjî
deyna, bêy ku zirar bigehîte çi kesekê, ewe fermaneke li aliyê Xwe dê. Xwe dê Zanîne
û Pêdagire. [13] Ewane sînorên Xwe dê ne! Ewên ku peyreviyê li Xwe dê û peyamberê
Vî biken, li bal Vî we dê bêne vergirtin bo naw baxçeyan ku çem li bin da diherikin û
ew dê ta bêdawiyê li wêderê bimînin û ewe destkevtê herî mezine [14] Lê ewên ku
peyreviyê li Xwe dê û peyamberê Vî naken û sînorên Vî dibezînin, Ev dê wan têkete
naw agir da û ta bêdawiyê ew dê li wir bimînin, eşkenceyek ser-şorker li benda wane!
[15] Eger her yêk li jinên we karek bêrewişt[a] biket, li naw xwe da gazî çar gewaha biken,
eger ew gewahiyê biden, ew jinê li mal da xwedan ken taku mirin tête ser wê yanjî ta
dema ku Xwe dê rêyekê nîşanî wê didet. [16] Eger du kesa li naw we da bêrewiştî kir, her
duya jî siza biden, eger peşîmaniya xwe ra bigehînin û rêya xwe serast biken, waz li
wan bînin, Xwe dê hemû dema amadeye bo pejirandina peşîmaniyê û Rehmê didet.
[17] Lê belê Xwe dê tenê peşîmaniya wan kesa dipejirînît ku ber nezaniyê karên nebaş
diken û zû piştî wê kiryarê peşîman bin, ewane ewin ku Xwe dê, dê wan bibhorît, Vî
zanista wê heye ku biryarê bidet. [18] Peşîmanî bo ew mirov nîne ku bi berdewamî karên
nebaş diket taku mirin rûbirûyê ew kes dibît û paşê ew dibêjît, ´Niha ez peşîmanim´
Nejî bo ew mirovane ku bi nebawerî dimrin, Me eşkenceyek bijan bo mirovên wisa
amade kirye.



a: Fehşa, anku du kesê ku digel hev jiyana hevbeş pêk neynane û ganê biken.
*Dema kesek mir, dibya deynê wî biden û eger ew tembiyek kiribît (wesiyetek kiribît) dibya tembiya ew kes bînine cih, paşê mîratê ew kes par veken!

[19] Hûn ku bawer diken, ew bo we qanûnî nîne hûn bibine xwedanê jina, bêy ku ew
bixwazin, nejî dibe hûn bi dijwarî digel hevjînên xwe rabin û rûnên û hêvî biken ku
hindek li xelatê wan yê bûkiniyê li wan bistînin, ewa ku we dabûye wan, meger ku ew
bi aşkira bêrewişt bin, bi mêhrevanî digel wan bijîn, eger hûn hez wan naken, reng bît
hûn hez ew tiştê naken ku Xwe dê gelek başî li wê da afirandiye. [20] Eger hûn dixwazin
hevjînekê digel hevjînek dîke veguherin, çi xelatê bûkniya wê lê nestînin, tenante ger
we gelek zêde jî dabîtê da, meger hûn dê bi aşkira gazinde û guneha vergirin? [21] Hûn
çawa dikarin li wan bistînin, dema ku hûn digel hevda razane û ewan belêniyek fermî
li we vergirtiye? [22] Hevjîniyê digel ew jina pêk neynin ku hevjînên babên we bûn, xêncî
ewa demên berê da, birastî ew bêrewiştiyek kirêt û rêbazeke kotî bû. [23] Li we qedexeye
ku hevjîniyê digel ewane pêk bînin; dayîkên xwe, kiçên xwe, xweşikên xwe, xaletên
xwe, metên xwe, xwarziyên xwe, biraziyên xwe, daykên şîriyê[a] xwe û xweşkên şîriyê
xwe, daykên jinêt we, zir kiçê we ku li bin çavdêriya wedane, ewên ku li wan jina bûne
ku we têkiriye ewan da, eger we netêkirbîte wanda, bes hûn nayêne gunehbar kirin,
hevjînên kurên li we bûyî, du xweşik heman demê da bi hewra, xêncî ewa li demên
derbaz bûyî da. Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet.
[24] Jinên ku pêşta hevjînî pêk înayne, xêncî ewên ku bi destê rastê hûn xwedanê wanin.
Xwe dê ewe hemû li we ferman kiriye, jinên dîke bo we qanûnî ne, bi mercekê ku hûn
pê xelata li malê xwe daxwaza hevjîniya wan biken û hevjînîyê digel wan pêk bînin
nek jibo bêrewiştiyê. Eger hûn hez diken xweşiyê li jina biben, xelatê bûkiniya wan
bidene wan, ewe erke, piştî we ev erke bi cih înaye, eger hûn herduk bi hevra, cûrek
dîke biryarê biden, hûn nayên gunehbar kirin, Xwe dê zanista wê heye ku biryarê
bidet. [25] Eger her yêk li we xwedan heyî nebît ku digel jinek bawermende pak
hevjîniyê pêk bînît, bes hevjîniyê digel bindesteke bawermend pêk bînin, Xwe dê
bêhtir baweriya we dizanît, hûn li hevdu ne, lewma pê destûra mirovên wan hevjîniyê
digel wan pêk bînin û bi xelatê bûkiniya rêkûpêk, ew jin dibît pak dawên[b] bin, nabît
ew li wan jina bin ku nişkida bê qanûnî ganê diden yanjî dezgîrana digrin. Dema ku
wan hevjînî pêk înaye, eger ew bêrewiştiyê biken, sizaya wan dê nivya sizayê jinên
serbest bît, ewe jibo ewan kesane ku li naw we da li guneh kirinê ditirsiyên, lê jiboy we
baştire ku hûn bêhinfereh bin. Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet.



a: Ew jinên ku daykê we nînin hûn nezane lê şîr dayne we.
b: Naw pisiya xwe pak biparêzin, xêncî hevjînê xwe digel kesek dîke evîndariyê neken!

[26] Xwe dê dixwazît Xwe jibo we zelal biket û we rênivîniyê rêya
ewan biket ku pêş weda çoyne û peşîmaniya we bipejirînît, Xwe dê Zanîne
Biryardere [27] Xwe dê dixwazît peşîmaniya we bipejrînît, lê ewên ku hestê[a] xwe
dişopînin, dixwazin hûn dûr li rê derkevin. [28] Xwe dê dixwazît barê we sivik biket,
mirov lewaz hatine afirandin. [29] Hûn ku bawer diken, bi nerastî heyiyê yek û du
nexwen lê bi pejirandina hevbeş dan û sitandinê digel hevdu biken. Xwe nekujin,
çimkî Xwe dê bêpayan digel we bireheme. [30] Eger her yêk li we liber dijmindarî û
bêdadiyê ew kara biket, Em dê ewan havêjine naw agir da, ew bo Xwe dê hêsane.
[31] Lê eger hûn xwe li ewên mezin biparêzin, ewên ku li we hatine qedexe kirin, Em dê
gunehên we yê biçûk bimalin û li deriyê giran buha da we bînine jor[b].
[32] Daxwaza wê neken ya ku Xwe dê zêdetir daye hindek ji we. We mêra ew
pişk heye ya ku we bi dest xwe ve înayne û we jina ew pişk heye ewa ku we
bi dest xwe we înayne û li Xwe dê daxwaza qenciyê Vî biken, Xwe dê
zanista li ser hemû tişta heye. [33] Me mîratgir bo hemû ew tişta
danaye ku dayk û bab û xizmê nêzîk li paş xwe bicih dihêlin û digel ewên
ku we peyman girê daye, pişka wan bidenê da, Xwe dê gewahê hemû tişta
ye. [34] Dibya mêr bi başî li jinê xwe hişyar bin, pê ew qenciyên ku Xwe dê li
hindeka zêdetir daye ewên dîke. Çimkî ew li heyiyê xwe xerc diken lewma
hevjînên[c] dirustkar û peyrev, diparêzin ewa ku Xwe dê dixwazît ew
biparêzin, di dema ku hevjînên[d] wan li wir nînin. Eger hûn li zor destiya
hevjînên[e] xwe ditirsin, bes şîretê li wan biken, paşê naw niwîna da guhê xwe
nedenê, herî dawiyê da lêden[f]. Eger peyreviyê li we biken, we çi maf nîne
ku karekê li dijî wan biken. Xwe dê bêpayan Bilind û Mezine. [35] Eger hûn
bitirsin ku nakokî li nawbera ewan da heye, dadwerekê li malbata wî dest
nîşan biken û dadwerekê jî li malbata wê. Paşê eger ew bixwezin
tişta serast biken, Xwe dê, dê aştiyê li nawbera wan da çêket. Xwe dê
Zanîne, Agahdariye. [36] Xwe dê bipereste û çi tişta neke hevalê Vî. Baş be digel dayk û
babê xwe û xizma, gel sêwiya, digel mirovên hejar, digel cînarên dûr û nêzîk, digel
rêviyên belengaz û digel ewên ku tu bi destê rastê xwedanê wanî[g]. Xwe dê hez li
mirovên qude û xwe mezinker naket.
[37] Ewên ku destmiçî ne û fermanê li mirovên dîke jî diken ku destmiçî bin,
diveşêrin ew qenciya ku Xwe dê daye wan. Jiboy nebawera Me eşkenceyek
serşorker amade kiriye.



a: Hewa, hewes, êhsas
b: Deriyê biheştê ye!
c: Jin
d: Mêr
e: Jin
f: Lêdan pê1 dest weşanê, li gor gotina Ebdil Helîm, tenê yêk dest weşan!
g: Ew mirovên ku bin desthilata te da ne.

[38] Ewên ku heyiyê xwe xerc diken ku xwe pê nişanê mirova biden, bawerî bi Xwe dê û
Roja dawiyê naken. Şeytan hevalê wane! Bes hevaletiya ew kes nebaşe! [39] Dê çi li dijî
ewan bît, eger ew bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê biken û biden li ewa ku Xwe dê
daye wan? Xwe dê sebaret bi wan baş dizanît. [40] Birastî hema hindî giraniya
nixteyekê[a] jî Xwe dê nerastiyê li kesê naket, Ev kiryarên baş du qat diket û padaşek
gelek zêde li aliyê Xwe we didet. [41] Ewê çi biken, dema ku Em li her civakekê
gewahekê bînin û te jî weke gewah li dijî wan bînin? [42] Di wê Rojê, ewên ku bawer
nekirin û peyrewî li peyamber nekirin dê awat bixwezin ku ew digel erd bibne yêk, ew
dê nekarin çi gotinekê li Xwe dê weşêrin. [43] Hûn ku bawer diken, eger hûn serxweşin,
bi hiç şêweyekê li nûbêjê nêzîk nebin, taku ew demê hûn dizanin hûn çi dibêjin, nejî
eger hûn nepakin[b] lê hûn dikarin li cihê nûbêjê da derbaz bin, taku hûn xwe bişon,
eger hûn nexweşin, rêvî ne, li ser avê hatine yanjî we destê xwe dabîte jina û hûn
nikarin çi avê peyda biken, bes pê hindek axa temîz dest û ruyê xwe pê pak biken.
Xwe dê herdem amadeye ku li we xweş bît û li we bibhorît. [44] Tu nabînî çawa ewên
ku parek li nivîsîna pîroz bi wan hatiye dan şaşiyê dikirin û awat dixwazin hûn jî rêyê
bezr biken. [45] Xwe dê dijminê we baş nas diket, Xwe dê weke piştîvan têra we heye û
Xwe dê weke yarmetîder têra we diket. [46] Hindek li wan Cihûya cihê peyva diguherin
dibêjin, ´Em dibhên û peyreviyê naken´ Û ´Dibhên lê guhdar naken û ´Me binhêrin´,
zimanê xwe ba diden û siwkatiyê bi dîn diken. Eger ewan gotiba, ´Em dibhên û
peyrewî diken´ Û ´Bibhê û li me binhêre´ Ewe dê bêhtir ba û zêdetir kêrhatiyê ewan
ba. Lê liber xatira nebaweriya wan Xwe dê ew nerênî[c] kirîne, lewma ew bawer naken,
bes çend kes nebin. [47] Lewma mirovên ku nivîsîna pîroz bi we hatiye dayin, baweriyê
bi evê biken ku Me şandiye xarê, eva we heye piştrast diket, pêş ku Em pêşreviya ewan
li wan bistînin û wan paşve bizvrînin, yanjî Em ewan nerênî biken, herwek ku Me
ewên Şembî[d] şikandin nerênî kirin, daxwaza Xwe dê hemû gavê tête cih. [48] Xwe dê li
peyda kirina ´hevala´ jibo Vî nabihorît, xêncî ew hindê, Ev li herkesê, li her tiştekê ku
Ev dixwazît, dibhorît, lê her kesê ´hevala´ bi Xwe dê veket gunehek gelek gelek mezin
çêkirye. [49] Tu ewan dibînî ku dibêjin em pakin? Ne! Xwe dê pak diket, herkesê ku Ev
dixwazît, hema hindî kewlê dindika xormê jî nerastî li kesê nayête kirin.



a: Misqal
b: Beden, laşê we pak nîne!
c: Lenet
d: Sebes, rê û resma olî jibo Cihûya ku roja şembiyê li mal bimînin û kar neken!

[50] Lê binhêrin ku ew çawa sebaret bi Xwe dê dahînana direwa diken, ewe têra xwe
guneheke aşkeraye! [51]Hûn nabînin, çawa ewên ku parek li nivîsîna pîroz bi wan hatiye
dan, niha bawerî bi puta û tiştên pûç diken? Sebaret bi nebawera dibêjin, ´Ew gelek li
bawermenda bêhtir rênivîniyê rê hatine kirin? ´ [52] Ewane, ewin ku Xwe dê nerênî
kirîne, Tu kesê peyda nakey ku yarmetiya ewan biket ku Xwe dê nerênî kirîne.
[53] Meger ewan pişkek li padişahiyê heye? Eger ewan heba, ewan hindî xeta ser
dindika xormê jî nedibexşîne mirova. [54] Yanjî ew ber xatira ew qenciya ku Xwe dê
daye mirovê dîke çavnebariya[a] ewan diken? Lê bêguman Me nivîsîna pîroz û
têgeheştin da binemala Ibrahîm û Me padişahiyek gelek mezin jî da wan. [55] Lê
hindeka bawerî pê kir û hindeka jî pişta xwe dayê. Lê agirê geşê cehnemê têra wan
heye. [56] Ewên ku bawerî bi eşkereyên Me naken, Em dê wan hajone naw agir da.
Dema pêstê[b] wan şewtî, Em dê pêstê wan digel pêstek nû veguherin, bila bi wî awayî
ew berdewam hest bi êşê biken. Xwe dê Ev ê Bihêze û Dadwere! [57] Lê ewên ku
bawermendin û karê baş diken, Em dê ewan vergirne naw baxçeyên ku çem têda
diherikin û ta bêdawiyê ew dê li wêderê bimînin. Wêderê da, ewan dê hevjînên pak
hebin û Em dê ewan vergirne bin sîberên fênik da. [58] Xwe dê fermanê li we diket, ew
tiştê ku bi we hatine sipartin vegerînine xwedanê wan yê rastîn û eger hûn li nawbera
mirova da darizandinê[c] diken, bi dadwerî wê biken. Fermana Xwe dê jiboy we
bêkêmasiye, birastî Xwe dê Dibhêt û Dibînît. [59] Hûn ku bawer diken, peyrevî li
Xwe dê, peyamber û ewên xwedan desthelat li naw xwe da biken. Eger we li ser her
mijarekê nakokî heye, bispêrine Xwe dê û peyamber, eger hûn bawerî bi
Xwe dê û Roja dawiyê diken, li herî dawiyê da ewe bêhtire û ya kêrhatiye.
[60] Meger tu ewan nabînî, ewên ku dibêjin em bawerî bi eva jibo te hatiye şandin xar
diken û eva pêş te da hatibu şandin xar? Lê jiboy dadweriyê dixwazin bizvirne bal
xwedêyên direw, herçend ku ferman li wan hatiye kirin ku wan nepejirînin? Şeytan
dixwazît ewan dûr li rê derêxît.
[61] Dema bi wan tête gotin, ´Werine bal eva Xwe dê jibo peyamber eşkere kiriye ´ Tu
dibînî, mirovên durû bi kerb rûyê xwe li te dizvrînin. [62] Ewe çawane, dema ku liber
xatira ewa ku wan bi destê xwe kiriye, belayek tête serê wan û têne bal te û sûnd bi
Xwe dê dixwen, ´Me tenê dixwast başî û pêk înanê biken? ´ [63] Xwe dê baş dizanît
di dilê ewan da çi heye, lewma guhê xwe nede ewan, şîretê li wan bike, digel ewan
sebaret bi wan bipeyve, peyvên ku di wan ra diçin bikar bîne.



a: Hesûdî, hez naket başiya kesek dîke bibînît
b: Kewil
c: Mehkeme, dadwerî

64 Me çi peyamber neşandin, bêy ku dibya bi destûra Xwe dê peyrevî li wan bête kirin.
Tenê eger ew hatibana bal te[a] dema ku wan nerastî li xwe dikir û pariya ban bo
lêbihorîna Xwe dê û peyamber jibo wan daxwaza lêbihorînê kiriba, dê ewan zanîba
ku Xwe dê peşîmaniyê dipejirînît û rehmê didet. 65 Bi Xwedanê te, ew nabine
bawermendê rastîn taku ew nehêlin tu nawbera ewan da dadweriyê li ser hemû ew
mijarên ku ewan nakokî li ser hene bikey û çi xweragiriyê di riha xwe da li hember
biryarên te peyda neken û hemûya bi tewawî bipejirînin 66 Eger Me ferman kirba,
´Xwe bikojin´ Yanjî ´Malên xwe bicih bihêlin´ Ewan we nedkir, bes çend kes nebin, lê
eger ewan kiriba, weka ku ferman li wan hatibû kirin, ew dê bo wan gelek bêhtir ba,
berxwedanke bihêztir 67 û Me dê li aliyê Xwe we, padaşek gelek mezin daba wan 68 û
Me dê ew rênivîniyê rêya rast kirban. 69 Her kesek peyrevî li Xwe dê û peyamber
biket, ew dê li naw ewan da bin ku Xwe dê erêniya Pêşbîna li wan kiriye, ewên rastbêj,
ewên şehîd û ewên dirustkar, hevalên wisa çend bêkêmasî ne! 70 Ewe qenciye li aliyê
Xwe dê we. Xwe dê weke zana têrê heye. 71 Hûn ku bawer diken, agahdarê xwe bin,
di komên biçûk da herine pêş[b] yanjî hemû bi hevra herne pêş.
72 Li naw we da mirovên wisa hene ku eger karesatek bête serê we, bêguman dê xwe
paşve bihêlît, ew dibêjît, ´Xwe dê erêniya min kiriye ku ez li wêderê, digel wan amade
nebûm´ 73 Lê eger li bal Xwe dê we qenciyek bo we bêt, bêguman ew dê bêjît, mîna
ku çi xweşevîstî di nawbera te û wî da nebûne. ´Ay xwezî ez jî digel ewan da bam, bila
min jî karîba destkevtek mezin dest xwe we bînim.´ 74 Bihêle ewê ku dixwazin jiyana
ev dinyayê bifroşine Dawiyê, bila li rêya Xwe dê, da şer biken. Her kesê ku
rêya Xwe dê, da şer diket, çi bête kuştin çi serkevtî bît, Em dê padaşek mezin bidenê
da. 75 Çima nabît hûn li rêya Xwe dê, da şer biken û bo ew mêr, jin û zarûkên
çewsandî ku digiryên, ewên ku dibêjin ´Ey Xwedan, me li ew gundi rizgar ke ku
mirovên wê zordarin! Bi rehma Xwe, piştîvanekê bide me û li bal Xwe we,
yarmetîderekê bide me? ´ 76 Ewên bawermend li rêya Xwe dê, da şer diken û ewên
nebawer li rêya xwedêyên direw da şer diken. Şerê hevalbendê şeytan biken,
bernameyên karê Şeytan birastî lewazin.77 Tu wan nabînî, ewên ku bi wan hatibû
gotin, ´Destê xwe biparêzin[c], nûbêjê biken û ev xêra ku bo we hatiye dîhar kirin
biden? ´Lê dema fermana şer li wan hatibû kirin, hindek li wan li mirova tirsiyan hindî
ku li Xwe dê tirsiya bûn yanjî zêdetir! Gotin, ´Xwedan Te çima fermana şer li me
kirye? Bes eger Te tinê kêmek zêdetir dem daba me. ´ Bêje, xweşiya ev dinyayê kême,
ya Dawiyê bo ewên ku hişyarê Vî ne gelek bêhtire, hema hindî pûşikekê[d] jî nerastî li
we nayête kirin.



a: Mihemed Peyamber
b: Jibo şer
c: Şer neken
d: Darikê hişik û gelek biçûk

78 Hûn li her derê bin jî, dê mirin her bête ser we, tenante eger hûn di naw kelehên
bilind jî dabin. Dema başî bête serê wan, ew dibêjin, ´Ewe li Xwe dê ye´ Lê dema
nebaşî bête serê wan, ew dibêjin, ´Ewe li aliyê te ye´ Bêje wan, ´Hemû li aliyê Xwe dê
we tên. ´ Pirsgrêka wan mirovane çiye ku ewa dibêjine wan, ew bi dijwarî têdigehin?
79 Her tiştekê baş ku bête serê ew li aliyê Xwe dê we ye, her tiştekê nebaş jî bête serê
we, li we bixwe ye. Me, weke peyamber tu bo mirova şandî, Xwe dê weke gewah têrê
heye. 80 Her kesek peyrevî li peymber biket peyrevî li Xwe dê diket lê ewên ku pişta
xwe didenê, Me tu neşandî ku tu bibye parêzvanê wan. 81 Ew dibêjin, ´Peyrevî´[a], lê
hema ew dema ku ew te bicih dihêlin, hindek li wan di şevê da bername rêjiyê jiboy
xêncî eva te gotî diken. Xwe dê ew bername rêjiya ku ew di şevê da diken, tomar
diket. Lewma pişta xwe bide wan û pişta xwe bi Xwe dê rast bike, Xwe dê weka
parêzer têrê diket. 82 Meger, ew sebaret bi ev Xwandinê (Quran) hizir naken? Eger
xêncî Xwe dê ev li aliyê her kesekê dîke ba, ewan dê gelek nakokî têda peyda kirban.
83 Her gava nûçeya her mijarekê sebaret bi tenahî yanjî tirsê bo ewan têt, ew wê belav
diken, eger ewan gotiba peyamber yanjî ewên xwedan desthilat li naw wan da, ewên
ku wateya wê ya serast dizanin, dê zanîban. Eger liber qenciya Xwe dê û rehma Vî
jiboy we neba, we dê peyrevî li Şeytan kiriba, bes çend kes nebin. 84 Lewma li rêya
Xwe dê, da şer biken. Tu tenê berpirsyarê xweyî. Bawermenda han bide ser. Xwe dê,
dê pêşya hêza nebawera bigrît, çimkî Xwe dê li şêyanê da bihêztire û li sizadanê da
gelek tirsnake. 85 Her kesek jibo armancek baş destêverdanê biket, ew dê pişkek lê
hebît û her kesek bo armancek nebaş destêverdanê biket, ew dê pişkek lê hebît.
Xwe dê parêzvanê her tiştekê ye. 86 Lê dema ku ew rewşa we dipirsin, bi peyvên bêhtir
rewşa wan bipirsin, yanjî her çi nebît bersiva wan biden, Xwe dê hisaba hemû tişta
dipirsît. 87 Ev Xwe dê ye, çi xwedê nîne, xêncî Vî. Ev dê li Roja Vejiyanê da we
hemûya kom biket ku sebaret bi wê çi gûman nîne, ragehandina kê dikarît li ya
Xwe dê rastir bît? 88 Hûn çima sebaret bi durû[b] ya dabeş bûne ser du koma da, dema
ku Xwe dê her Bixwe li ber xatira ewa ku wan dest xwe înayî ew paşve dayne? Hûn
dixwazin ewan rênivînî biken ku Xwe dê hêlaye li rê derkevin? Eger Xwe dê bihêlît
kesek li rê derkevît hûn çi cara nikarin jiboy ew kes rê peyda biken. 89 Ew hêvî
dixwazin ku hûn bawer neken, herwek ku ewan bixwe bawer nekirye, ku hûn jî weka
wan bin. Lewma ewan weke hevpeyman vernegrin taku ew li rêya Xwe dê, da koç
neken. Eger ew pişta xwe bidenê, bes li her derê hûn rast ewan hatin, ewan bigrin û
bikujin. Hîç yêk li wan weke hevpeyman yanjî weke piştîvan vernegrin.



a: Ew dê destûra bişopînin.
b: Ew mirovên ku tiştekê dibêjin lê karek dîke diken, di zimanê Erebî da dibêjine wan munafiq.

90 Xêncî ew kesên ku penahê jibo we tînin, ewên ku we digel mirovên wan
peymaname heye, li tirsê şer kirin digel we û mirovên xwe da, dilê wan leriziye. Eger
Xwe dê xwastiba, Ev dê li ser we da desthilat daba wan û ewan dê şerê we kiriba,
lewma eger ew paşe kêşê li we biken û şerê we neken û aştiyê pêşkêşî we biken, paş wê
Xwe dê li dijî wan çi hokara[a] nadete we. 91 Hûn dê ewên dîke bibînin ku hêvî diken li
we ewleh bin û li mirovên xwe jî ewleh bin, hemû dema ew dikevine rewşekê da ku ew
dudil bin, ew xwe radest diken, lewma eger ew paşve nekêşin, nejî aştiyê pêşkêş we
biken, nejî destê xwe biparêzin, li her derê ku hûn rast ewan hatin, ewan bigrin û
bikujin, Em desthilatek zelal li dijî mirovên wisa didene we. 92 Nabît çi cara
bawermendek bawermendek dîke bikujît, bes bi şaşî nebît. Eger her kesek
bawermendekê bi şaşî bikujît, ew dibya bindestekê ku xwe radestê Xwe dê kiriye[b]
serbest berdet û diraf bedel xwîn bidete binemala ew kes, meger ew bi xêr xazî lê xweş
bin, eger ew li wan bît ku digel we li şer dane, lê ew bixwe bawermende, bes bo qerebû
tenê dibya bindesteke bawermend serbest bête berdanê, eger ew mirovê wan bît ku we
digel ewan da peymaname heye, bes dibya qerebûyê radestê binemala wi biken û
bindesteke bawermend serbest bête berden. Her kesê ku şêyan nebû ku ewê biket, bi
rêya peşîmaniyê bo Xwe dê dibya du heyva li serhevda rojî bît; Xwe dê zanista wê
heye ku biryarê bidet. 93 Eger kesek bawermendekê bi zanebûn bikujît, sizaya ew kesî
cehneme û ta bêdawiyê ew dê li wêderê bimînît, Xwe dê digel ew kes toreye û ew
nerênî kiriye û sizayeke gelek mezin jiboy wî hazir kiriye. 94 Lewma, hûn ku bawer
diken, dema hûn li rêya Xwe dê, da diçine şer, lêbikolin û nebêjine ew kesê ku aştiyê
pêşkêş we diken, ´Tu bawermend nînî´ Liber hez kirin li derfeta deskevtên ev dinyayê,
Xwe dê gelek destkevt bo we hene, hûn bixwe serdemekê di vê rewşê da bûn, lê
Xwe dê digel we baş bû, lewma lê bikolin, Xwe dê agahdarê wê ye ku hûn diken.
95 Xêncî ewên ku nikarin, ew bawermendên ku paşve dimînin wekhev nînin digel
ewên ku rih û malê xwe sipartine bo hewl dan li rêya Xwe dê da, Xwe dê mirovên
wisa pileyekê li ew mirovên paşve dimînin qenctir kirîne, her çend ku Ev belêniya
padaşek baş dabû hemû bawermenda, lê Xwe dê pê padaşek gelek mezintir qencî li
wan kiriye ku jiboy rêya Xwe dê li mal derkevtine, serwey ewên ku paşve mabûn.
96 Pileyên li bal Vî we, her wisa lêbihorîn û rehme, Xwe dê Ev ê Lêbihore û Rehmê
didet. 97 Ewên ku nerastî li xwe kirîne û firişte wan diben dê li wan bipirsin, ´Tu çi
rewşekê da bûy? ´ Ew dê bêjin, ´Li ser erdê da em çewsandî bûn´Û firişte dê bêjin,
´Meger erdê Xwe dê weka pêvîst bo te fereh nebû ku tu koç bikeye cihek dîke? ´
Penahgeha mirovên wisa dê cehnem bît, armanceke kotiye,



a: Sebeb, delîl.
b: Miroveke bin dest û bê desthilat Mosliman. Vergêrên ereb peyva kole bikar tînin lê li Xwandinê (Quranê) da peyva kole bikar nehatiye

[98] lê ne ew mêr, jin û biçûkên tepeser kirî ku çi şêyan di hêza xwe da nînin nejî bo rêyekê têne rênivînî kirin [99] reng bît Xwe dê li wana xweş bît, çimkî Xwe dê Ev ê bexşende û Ev ê lêbihore. [100] Her kesek ku li rêya Xwe dê koç biket dê gelek penahgeha û gelek zêdehiyê li ser erdê peyda biket û eger kesek mala xwe bicih bihêlît ku koç bikete bal Xwe dê û peyamberê Vî û mirin ser wî da bigrît, bêguman padaşê wî li bal Xwe dê ye. Xwe dê, Ev ê Lêbihore û Rehmê didet. [101] Dema hûn li ser erdê da rêvîtiyê diken, eger hûn nûbêja xwe kurt ken, hûn nayêne tawanbar kirin, eger hûn bitirsiyên ku belke nebawer zirarê bigehînine we, ew bi aşkira dijminê we ne. [102] Dema tu digel ewanday, bo wan pêş-nûbêjiyê dikey, bihêle bila komek wan di nûbêjê da digel te ser pêya rawestin, çekê xwe digel xwe hilgirin û dema ewan çok danan û ser nivandina xwe tewaw kir, bihêle bila ew li aliyê piştê da cihê xwe bigrin. Paşê, bihêle bila ew koma ku hêşta nûbêj nekiriye, bila digel te nûbêjê biken, her wisa hişyarê xwe û çekên xwe bin, nebawer hêvî dixwazin ku hûn hişyarê çek û tûrikê[a] xwe nebin ku ew tenê di hêrişekê da, li ser we da dagirin. Eger li ber baranê yanjî nexweşiyê hûn çekê xwe danên hûn nayêne tawanbar kirin, lê agahdarê xwe bin. Birastî Xwe dê sizayeke serşorker jibo nebawera amade kiriye. [103] Piştî we nûbêj tewaw kir, berdewam bin li bîr anîna Xwe dê, çi ser pêya, çi rûniştî yanjî xwe li ser teniştê dirêj kirî û dema ku hûn ewlehin, nûbêjê xwe berdewam biken, çimkî li dema destnîşan kirî da nûbêj li ser bawermenda erke. [104] Li dûketina dijmin da newêrok nebin, eger hûn dijwariyê dikêşin, ew jî mîna we dijwariyê dikêşin, lê hûn çavnihêriyê li Xwe dê diken lê ew nikarin ew çavnihêriyê jî biken. Xwe dê zanista wê hindê heye ku biryarê bidet. [105] Me bi rastiyê nivîsîna pîroz bo te şandiye xarê ku pêka eva Xwe dê nîşanî te daye tu bikarî di nawbera mirova da dadweriyê bikey. Jiboy ewên ku dixapînin nepariyê.
[106] Daxwaza lêborînê li Xwe dê bike, Xwe dê Ev ê Lêbihore û Rehmê didet. [107] Li şûna ewên ku riha xwe dixapînin gengeşê neke. Xwe dê hez ew xapînerên gunehbar naket. [108] Ew hevil diden xwe li miorva weşêrin, lê ew nikarin xwe li Xwe dê weşêrin. Ev digel wane, dema ew li şevê da bernamerêjîyê diken û tiştê wisa dibêjin ku Vî keyfxweş naket, Xwe dê ew tişta ku ew diken dorpêç diket. [109] Hûn lêre, li ev jiyanê da, bi niwêneratiya wan gengeşê diken, lê çi kesek dê li Roja Vejiyanê da bi niwêneratiya wan dê digel Xwe dê gengeşê biket? Yanjî dê çi kesek bibîte parêzerê wan? [110] Her kesek karê nebaş biket yanjî nerastiyê li riha xwe biket û daxwaza lêbihorînê li Xwe dê biket ew dê bizanît ku Xwe dê Ev ê Lêbihore û Rehmê didet.
[111] Her kesê ku guneh ekê dest xwe bînît, ew dê li dijî riha xwe bidest xwe we bînît û Xwe dê zanista wê heye ku biryarê bidet. [112] Her kesê ku tawan yanjî gunehekê biket û sûçê wê havêjîte ûstiyê mirovek bêguneh da, ew kes barê boxtanê û gunehek aşkira li xwe kiriye.



a: Cante.

[113] Eger liber qenciya Xwe dê û rehma Vî li ser te neba, komek wan dê hevil[a] daba ku
te li rê derêxin, ew tenê xwe li rê der dixin û nikarin çi zirarê bigehînine te, jiberku
Xwe dê nivîsîna pîroz û têgeheştin bo te şandiye xarê û tu fêrî vê kirî ku te nedizanî.
Birastî qenciya Xwe dê li ser te gelek mezine. [114] Di piraniya peyvînê wan yê nihênî[b]
da çi başî çinîne, tenê di destûr dana xêrxwazî yan mêhrevaniyê yanjî aştî di nawbera
mirova da nebît. Her kesê ku ew tiştane biket, li keyfxweş kirina Xwe dê bigerêt, Em
dê padaşek gelek mezin bidenê da [115] Her kesê ku dijberiya peyamber biket, piştî ku
rênivînî ji bo wî hatiye zelal kirin û rêyekê cudatir li ya bawermenda bişopînît, Em dê
bidene wî, ewa ku wî bixwe biriye. Em dê wî hajone cehnemê da, ew armanceke
kotiye [116] Xwe dê li girêdana ewên dîke li Xwe nabihorît, herçend Ev dê li her kesê ku
Ev bixwezît ku tawanên dîke kirîne dê bibhorît. Her kesê ku ewên dîke bikete ´hevalê´
Xwe dê bêguman ew dûr li rê çoye derê. [117] Li şûna Vî da, bes tenê gazî ewên mê û
bes tenê gazî Şeytanê serkêş diken, [118] ewê ku Xwe dê nerênî kiriye, ewê ku got,
´Bêguman ez dê pişka xwe koleyên Te bibem [119] û ez dê wan bixapînim, hestên pûç li
wan da hişyar kem, ez dê fermanê li wan bikem ku guhê ajelên xwe yên kevî bibrin, ez
dê fermanê li wan bikem ku dest têverdanê li afirandina Xwe dê, da biken, her kesek li
cihê Xwe dê, da Şeytan weke hevalê xwe hilbjêrît, ew dorandinek aşkira dorandiye,
[120] ew belêniya didete ewan û hesta li wan da dibzvînît, lê belêniyên Şeytan li xeyala
zêdetir hîç tiştek dîke nînin. [121] Penahgeha mirovên wisa dê cehnem bît û ew çi
rizgariyê lê peyda naken, [122] lê belê ewên ku bawer diken û karê durust diken, Em dê
vergirine naw baxçeyên ku çem li bin da diherikin, taku bêdawiyê ew dê li wêderê
bimînin, belêniya Xwe dê raste. Kê li Xwe dê rastir dipeyvît.
[123] Ew pêka daxwaza dilê we nabît yanjî ya mirovên nivîsîna pîroz, her kesê nerastiyê
biket ew dê bête siza dan û xêncî Xwe dê ew kesê peyda naket ku wî biparêzît yanjî
yarmetiya wî bidet. [124] Çi nêr çi mê, her kesê karê durust biket û bawermend bît, ew
dê biçine naw baxçe û hema hindî koratiya di dindikek xormê da nerastî li ew kesa
nayête kirin. [125] Kê dikarît li dîn da li wan baştir bît, ewên ku bi tewawî xwe radestê
Xwe dê diken, dema ku ew başiyê diken û peyreviyê li dînê Ibrahîm diken, ewê ku di
baweriya xwe da rast bû? Xwe dê Ibrahîm weke heval vergirt. [126] Hemû tiştê di
asmana û erdê da yê Xwe dê ye, Xwe dê dorhêla hemû tişta bi tewawî digrît.
[127] Sebaret bi jina, daxwaza biryarekê li te diken. Bêje, ´Xwe dê sebaret bi wan
biryarek daye we, eva ku di nivîsîna pîroz da bo we hatiye xwandin, sebaret bi kiçên
sêwî jî, ew pişka ku bo wan hatiye dîhar kirin, hûn nadene wan û ewên ku hûn hez
diken hevjîniyê digel wan pêk bînin, herwisa serbaret bi zarukên bêhêz _ Ev fermanê li
we diket ku bi dadwerî digel sêwiya rabin û rûnên´ Xwe dê baş agahdarê her tiştê başe
ku hûn diken.



a: Xebat
a: Weşartî, nepenî

128 Eger jinek li zordestî yanjî bêxwedan hêlanê li bal mêrê xwe bitirsiyêt, hîç yêk li
wan nayête tawanbar kirin eger ew bigehne çareserîyeke aştiyane, çimkî aştî bêhtire.
Lê di riha mirova da qornûsî[a] heye, eger hûn karê durust biken û hişyarê Xwe dê bin
Xwe dê agahdarê ewa hûn diken heye. 129 Hûn çi cara nikarin bi dadweriya wekhev
digel jinên xwe têkiliyê biken, her çend ku hûn bixwazin wê biken jî, lê jinekê bi
tewawî pişt guhê xwe we nehavêje, yêke dîke jî daliqandî[b] nehêlin, eger hûn serastiyê
biken û hişyarê Xwe dê bimînin, Xwe dê Ev ê Lêbihore û Rehmê didet,
130 lê eger jin û mêr li hevdu cuda bin Xwe dê, dê li zêdehiya Xwe ewan dewlemend
ket, Xwe dê berfereh zana ye. 131 Ewa di asimana û erdê da yê Xwe dê ye, Me ferman
li ewên ku pêş we da nivîsîna pîroz bi wan hatiye dan û li we jî kiriye ku hişyarê
Xwe dê bin. Lê eger hûn bawer neken, ewa di asimana û erdê da yê Xwe dê ye û
Xwe dê têra Xwe heye, kêr hatiyê pesna ye. 132 Ewa di asmana û erdê da yê Xwe dê
ye û jiboy parêzeriyê Xwe dê têrê heye. 133 Mirovno eger Ev bixwazît, Ev dikarî we
hemûya bihevra wêda bibet û li şûna we da ewên dîke bînît, Xwe dê şêyan heye ku
ewê biket. 134 Ewên ku padaşên ev dinyayê dixwazin, padaşên ev dinyayê û Dawiyê
bal Xwe dê ne, Xwe dê Bihîstin û Dîtine.135 Hûn ku bawer diken, dadweriyê biparêzin
û gewahê Xwe dê bin. Tenanet eger li dijî we bixwe, dayk û babê we, yanjî xizmên we
bît. Çi hejar bin yanjî heyî bin, Xwe dê li wan herduya jî kêrhatîtire. Lewma xwe li
şopandina hestên xwe biparêzin bila hûn li rê nederkevin, eger hûn xemsariyê biken
yanjî bişêwînin, Xwe dê agahdare ku hûn çi diken. 136 Hûn ku bawer diken, bawer bi
Xwe dê û peyamberê Vî û nivîsînên pîroz ku Vî bo peyamberê xwe şande xarê û her
wisa nivîsîna pîroz ku Vî pêşta şandî xar biken. Her kesek ku bawerî bi Xwe dê bi
firişteyên Vî, bi nivîsînên Vî yên pîroz, bi peyamberên Vî û Roja dawiyê neket ew dûr
dûr li rê çoye der. 137 Lê sebaret bi ewên ku bawer diken paşê nikoliyê li baweriyê
diken û carek dîke bawer diken û car din dîsa nikoliyê li baweriyê diken û li
nebaweriya xwe zêde diken, Xwe dê li wan nabihorît, nejî Ev dê rênivîniya wan bo ser
rêkekê biket. 138 Mizgîniyê bide durûya ku eşkenceyek bijan li benda wane.
139 Ewên ku li şûna bawermenda hevpeymaniya nebawera diken, ew li bal wan li hêzê
digerên? Birastî hemû hêz ya Xwe dê ye! 140 Herwek ku Vî di nivîsîna pîroz da bo we
eşkere kiriye, eger hûn bibhên ku ew nikoliyê li eva Xwe dê eşkere kirî biken yanjî
henekê xwe pê biken, digel wan nerûnên, meger ku ew li ser tiştê dîke bipeyvin, yanjî
tu dê bixwe jî wek ewan lê bêy, Xwe dê, dê hemû durû û nebawera di cehnemê da
kom bikete bal hev. 141 Ewên ku li bendêne, eger Xwe dê serkevtinê bo te bînît, ew
dêbêjin, ´Meger em digel we nebûn? ´ Lê eger nebawera derfetek hebît, ew dê bêjine
wan, ´Meger em serdestê we nebûn lê me hûn li bawermenda neparastin? ´ Xwe dê,
dê li Roja Vejiyanê da dê li nawbera we da dadweriyê biket. Xwe dê çi cara rê nadete
nebawera bo ser bawermenda.



a: Destmiçî
b: Çarenûsa wê dîhar biken, helawêstî nehêlin.

142 Ewên durû Xwe dê dixapînin, lê Eve ku wan dixapînît. Dema ew bo nûbêjê radibine
ser xwe, ew gelek bê xîret radwestin, pêş çavê mirova xwe nîşan diden û tenê kêmekê
Xwe dê bîr tînin, 143 li nawbera ewanda dudiliyê diken, ne ser bi wî aliyî ne û ne ser bi
aliyê dîke. Eger Xwe dê bihêlît kesek li rê derkevît tu çi cara nikarî rêyekê bo peyda
bikey. 144 Hûn ku bawer diken, nebawera li şûna bawermenda da weke hevalbend û
parêzer nevergirin, hûn dixwazin li dijî xwe belgeyên zelal pêşkêşî Xwe dê biken?
145 Mirovên durû dê li koratiya herê xarê ya agir da bin û hûn çi cara yarmetîderekê bo
wan peyda naken. 146 Nek ewên ku peşîmaniya xwe radgehînin û xwe serast diken û xwe
qahîm bi Xwe dê we digrin û jidil we dînê xwe radestê Xwe dê diken, ewane dê bigehine
bawermenda û li demek nêzîk da Xwe dê, dê padaşek gelek mezin bidete bawermenda.
147 Bo çi Xwe dê bihêlît hûn eşkencê bikêşin, eger hûn sipasdarin û bawerî bi Vî diken?
Xwe dê Sipasdar û Zana ye.148 Xwe dê hez naket peyvên nebaş li naw giştî mirova da
bêne gotin, meger ku nerastî li kesekê hatibe kirin, Xwe dê Bihîstin û Zanîne.
149 Eger, bi eşkere yanjî bi nihênî hûn başiyê biken, yanjî hûn li nebaşiyekê bibhorin,
birastî Xwe dê Ev ê herî Lêbihor û Bihêze. 150 Lê sebaret bi ewên ku bawerî bi Xwe dê
û peyamberên Vî naken û hêvî diken ciyawaziyê bêxine nawbera Xwe dê û peyamberên
Vî da, dibêjin, ´Em bawerî bi hindeka diken û bawerî bi ewên dîke naken´ Û hêvî diken
rêyekê di nawberê da bigirne berxwe, 151 ew bi rastî nebawerin, Me sizayek serşorker bo
nebawera amade kiriye. 152 Lê ewên ku bawerî bi Xwe dê û peyamberên Vî diken û çi
ciyawaziyê nadanêne nawbera hîç yêk li wan, li demek nêzîk da Xwe dê, dê padaşê
ewan bidete wan û Xwe dê Evê Lêbihore û Rehmê didet. 153 Mirovên nivîsîna pîroz
daxwaz diken ku tu nivîsîneke pîroz li asimana da bo wan bînî xarê, lêbelê ewan
daxwaza li wê zêdetir jî li Mûsa kirbûn, ewan gotibû, ´Xwe dê rûbirû nîşanî me bide´
Û ber xatira nerastiya wan, ew bi birûskê hatibûne qotan. Tenanet piştî ku eşkereyên
zelal bo wan hatibûne xarê jî, ewan golik[a] vergirt, paşê ber xatra wê Em li wan xweş
bûn û Me desthilatek zelal da Mûsa154 Jiboy peymana wan, Me çiya li ser ewan da bilind
kir, Me gote wan, ´Derî da werne jorê, çok danên û serê xwe binvînin´ Û Me gote wan
´Şembiyê neşkînin´ Û Me peymanek fermî li wan sitand 155 û li ber xatira wê ku ewan
peymana xwe şikand û bawerî bi eşkereyên Xwe dê nekirin û bêmaf Pêşbîn kuştin û ber
xatira ew gotina wan, ´Dilê me pêçayiye´ Na! Li ber xatira nebaweriya wan, Xwe dê ew
xitimandine, lewma ew bawer naken bes hindek nebin 156 û çimkî ewan bawer nekirbûn
û ewan boxtanke gelek mezin bi Miryemê kiribûn 157 û wan gotibû, ´Me peyamberê
Xwe dê, Îsa, Mesîhê kurê Miryemê kuştiye, ´Ewan, ne ew kuştibû û nejî li xaçê dabûn,
lêbelê ew hat kirin ku wisa li ber çavê wan were xûya kirin, ewên ku li ser da ciyawazî
hene, li ser da guman hene. Ewan çi zanist li ser da çinîne, bes ew texmîna dişopînin,
bêguman ew nekuştin 158 Na! Xwe dê ew bilind kire bo bal Xwe. Xwe dê Ev ê Bihêz û
Dadwere. 159 Çi mirovên nivîsîna pîroz namînin pêş ku bimrin bawerî[b] neken û di Roja
Vejiyanê da ew dê li dijî wan bibe gewah.



a: Golik perestîn
b: Bi peyamber bûna Îsa peyamberê kurê Miryemê biken.

160 Liber ew nebaşiyên ku li bal hindek Cihûya we hatibûne kirin, Me hindek
xwarinên baş li wan qedexe kirin ku pêşta bo wan qanûnî bûn û jiberku ewan pêşya
geleka bo ser rêya Xwe dê girt 161 û liber sûd standina wan, dema ku ew li wan hatibû
qedexe kirin û jiboy ku bi bêdadî malê mirovên dîke dixwarin. Jibo ew nebawerên li
naw ewan da, Me eşkenceyek bijan amade kiriye. 162 Lê ewên ku bi başî li zanistê da
cihê xwe girtine û bawermendên ku bawerî bi eva ku bo te[a] eşkere bûye û eva ku pêş
te da eşkere bûye hene, ewên ku nûbêja diken, ew xêra ku bo wan hatiye dîhar kirin
diden û bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê diken, Em dê padaşek gelek mezin bidene
wan. 163 Me jibo te eşkere şandiye her wek ku Me bo Nûh û Pêşbînên piştî wî ra şand,
bo Ibrahîm, Ismaîl, Ishaq, Yeqûb û paşketiyê wan, bo Îsa, Eyûb, Yûnis, Harûn û
Silêman û Me nivîsîna pîroz dabû Dawûd jî. 164 Jibo peyamberên dîke ku Me pêşta
basê wan bo te kiriye û her wisa ew peyamberên ku Me basê wan jiboy te nekiriye.
Xwe dê, rastew Xwe digel Mûsa peyvî. 165 Ew peyamber, hilgirê mizgîniyê û
agahdariyê bûn ku mirova çi mahne li hember Xwe dê da nebin, piştî ku ewan
peyamber vergirtî. Xwe dê Evê Bihêze Dadwere. 166 Lê Xwe dê her bi Xwe gewahê
evêye ku Vî jibo we şandibû xarê, Vî bi zanista Xwe şande xarê, firişte jî gewahiyê
diden, herçend ku Xwe dê weke gewah têrê heye. 167 Ewên ku bawer nekirîne û
rêgiriyê bo ser rêya Xwe dê diken, ew gelek dûr li rêkê da çone der 168 Xwe dê li ewên
ku bawer nekirine û karên nebaş diken nabihorît û nejî dê ewan rênivîniyê çi rêka
biket. 169 Xêncî rêya cehnemê nebît, ew dê ta bêdawiyê li wêderê bimînin, ew jibo
Xwe dê hêsane.
170 Mirovino, peyamber bi rastiya li aliyê Xwedanê we ra hatiye bal we, lewma bawer
biken, eve bo we bêhtire, tenanet eger hûn bawer jî neken, hemû ewa di asimana û
erdê da ya Xwe dê ye, Xwe dê Zanaye Dadwere. 171 Mirovên nivîsîna pîroz, li dînê
xwe da zêdegaviyê neken û sebaret bi Xwe dê çi nebêjin bes rastî nebît. Îsa Mesîhê
kurê Miryemê li peyamberek Xwe dê zêdetir nebû, gotinek ku Vî gotibû Miryemê û
rihek li aliyê Vî! Lewma bawerî bi Xwe dê û peyamberên Vî biken û nebêjin, ´Sê´
Rawestînin! Ew bo we bêhtire, Xwe dê tenê yêk Xwe dê ye, Ev gelek li wê
payebilintire ku kurek hebît, hemû tiştê di asimana û erdê da yê Vî ye û Xwe dê weke
parêzvan têra heye. 172 Çi cara Mesîh kerb lê nedvebû ku koleyê Xwe dê bû, nejî
firişteyên ku li Vî nêzîkin. Ewên ku kerb lê divebin ku koleyê Xwe dê ne û xwe qude
diken Ev dê wan hemûya kom kete pêşya Xwe. 173 Jibo ewên ku bawer kirine û
kiryarên baş kirine Ev dê padaşê wan bidete wan û ewa zêdetir jî li qenciya Xwe
bidete wan, lê jiboy ewên kerbê wan webû û xwe mezin kirin Ev dê bi eşkenceyek
bijan ewan siza bidet û xêncî Xwe dê ew kesê peyda naken ku wan biparêzît yanjî
yarmetiya ewan biket. 174 Mirovino, belgeyên pêbawer li bal Xwedanê we re jibo we
hatine û Me ronahiyek zelal jibo we şandiye xarê. 175 Ewên ku bawerî bi Xwe dê diken
û xwe qahîm bi Vî we digrin, Ev dê wan vergrîte naw rehma Xwe û qenciyê da,
Ev dê li ser rêyek rast da ewan rênivîniyê bal Xwe biket.



a: Mihemed peyamber

[176] Ew daxwaza dadweriyekê li te diken. Bêje, ´Xwe dê sebaret bi mîratê ewê ku bê zarûk û bê dayk û bab dimrît, dadweriyekê didete we.´ Eger mêrek bê dayk û bab û bê zarûk bimrît û tenê xweşkek hebît, ew dê bibîte xwedanê nivya ewa mayî, eger xweşik bimrît ew dê bibîte mîratgirê wê eger ewê çi zarûk nebin, eger du mê bin, di nawbera xwe da, ew dê bibine xwedanê du li sê pişka li ewa ber mayî. Lê eger xweşik û birayên wî yê sax hebin, mafê ewê nêr li pişkê da, du cara hindî mafê ewên mê ye.
Xwe dê evê bo we zelal diket ku hûn li rê nederkevin. Xwe dê zanista li ser hemû tişta heye.

## 5. Para Cejin ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Hûn ku bawer diken, peymanên xwe bi cih bînin. Ajelên ku diçerin weke xwarinê ji
bo we qanûnî ne, xêncî ewa ku dê bi we bête ragihandin. Ji we qedexeye dema ku hûn
hecê diken hûn nêçîrê bikujin, Xwe dê ferman diket ewa ku Ev dixwazît, 2 lewma hûn
ku bawer diken rê û resmên pîrozên Xwe dê bin pê neken, yanjî heyva pîroz, yanjî
ajelên qurbaniyê û digel ewên golbijartî, yanjî ewên ku têne mala pîroz ku li qenciya
Xwedanê xwe û keyf xweşiya Vî bigerên, lê dema we rê û resmên heca xwe tewaw kirin
hûn dikarin nêçîrê biken. Nehêlin kerbê we li ew mirovên ku rêgirya we li çona
mizgewta Heram kirbûn, bibîte hokar ku hûn sînora bibezînin, yarmetiya hevdu li kirna
eva rast û hişyariyê da biden, yarmetiya hevdu li kirina guneh û dijminatiyê da neden.
Hişyarê Xwe dê bin, birastî Xwe dê bi dijwarî siza didet. 3 Li we qedexeye ku hûn ewane
bixwen; ewa mirar bûyî, xwîn, goştê beraz, ewa ku her navek dîke xêncî navê Xwe dê
liser hatibîte gotin; ewa xendiqî, yanjî bi derbek tund hatibîte kuştin, li cihek bilind
ketibîte xar, yanjî bi şaxê hatibîte birîndar kirin yanjî li bal ajelên kêvî we hatibîte
dirandin, meger tu wê serjê bikey yanjî her tiştek ku liser kevirê qorbaniya putperesta
hatibîte qurbanî kirin. Her wisa li we qedexeye ku bi kêşana tîrên[a] nîşan kirî par veken,
ewene serpêçiyên gelek kirêtin! Îro nebawera hemû hêviya xwe li dest dane ku hûn waz
li dînê xwe bînin. Li wan netirsin; li Min bitirsin. Îro Min dînê we jibo we bêkêmasî kir,
Min erêniya Xwe li ser we da tewaw kir û xwe radest kirin[b] weke dîn jibo we pejirand,
lê eger her yêk li we, liber zora birsîtiyê neçar ma, nek bi mebesta guneh kirinê, hingê
birastî Xwe dê Ev ê Lêbihore û Rehmê didet. 4 Li te dipirsin, bes çi bo wan qanûniye.
Bêje, ´Hemû xwarinên baş bo we qanûnî ne´ Her wisa, ewa ku we fêrî balinde û ajelên
xwe yê nêçîrê kirî ku bigrin, wan fêr bike, weka ku Xwe dê tu fêr kirî, bi wî awayî bixwen
ewa ku wan bo we girtî, lê pêşta navê Xwe dê li serda bînin. Hişyarê Xwe dê bin;
Xwe dê bo hisab pirsînê lezgîne. 5 Îro hemû xwarinên baş bo we qanûnî bûne.
Xwarina ewên ku nivîsîna pîroz bi wan hatiye dan, bo we qanûniye û xwarina we jî bo
ewan qanûniye û jinên dawên pak[c] li bawermenda û jinên dawên pak û bawermendê
mirovên ku pêş weda nivîsîna pîroz bi wan hatibû dan, bi wê mercê ku hûn xelatên
bûkniya wan bidenê û hevjîniyê digel wan pêk bînin, ewan weke evîndar yanjî dildarê
nihênî[d] vernegrin, herkesê ku nikoliyê li baweriyê biket dê kiryarên wi pûç bin û li
Dawiyê da, ew dê yêk li wan bît ku dorandiye. 6 Hûn ku bawer diken, dema hûn dê
nûbêjê biken, rûyê xwe bişon, dest û baskên xwe heta enûşkê bişon, serê xwe pê avê
bimalin, pêyê xwe heta gozînkê bişon û eger hûn pak nînin, hemû laşê xwe bişon.



a: Erebên putperest pê tîrên nîşan kirî tişt par divekirin.
b: Îslam
c: Ew jinên ku naw pisiya xwe pak diparêzin, xêncî hevjînê xwe hez li kesê dîke naken.
c: Bi dizî we, nepenî, weşartî.

Eger her yêk li we nexweş bît yanjî rêviye, yanjî li xwe berdaye yanjî destê xwe daye
jinekê û nikarît çi avê peyda ket, bes axa temîz bimaline dest û rûyê xwe. Xwe dê
naxwazît ku çi dijwariya jiboy we pêk bînît, Ev tenê dixwazît we pak biket û erêniya
Xwe li ser we bêkêmasî biket belke liber hindê hûn sipasdar bin. 7 Erêniya Xwe dê li
ser we û ew peymana Vî bîra we bît ku Vî hûn pê girêdan. Dema we got, ´Em dibhên
û em peyrevî diken´. Hişyarê Xwe dê bin Xwe dê dizanît ku çi di naw singa da heye.
8 Hûn ku bawer diken, li xwe radest kirina Xwe dê, da xwe ragir bin û gewahê[a] bê alî
bin, nehêlin kerbê we li mirovên dîke bibîte hokar ku hûn dadperwer nebin, lê
dadperwer bin, çimkî eve li hişyarî bi Xwe dê nêzîke. Hişyarê Xwe dê bin, Xwe dê
agahdarê ewê ye ku hûn diken. 9 Xwe dê belêniya lêbihorîn û padaşek gelek mezin
daye ewên ku bawer diken û karên durust diken. 10 Ewên ku bawer naken û nikoliyê li
eşkereyên Me diken, ew dê hevrêyên naw agirê cehnemê da bin. 11 Hûn ku bawer
diken erêniya Xwe dê bîra we bît, dema ku neteweyekê dixwast ku destê xwe bilind
kete ser we û Ev pêşya destê wan jibo ser we girt. Hişyarê Xwe dê bin bila bawermend
pişta xwe bi Xwe dê rast biken. 12 Xwe dê peyman li zarûkên Israîl sitand. Me wekir
ku dazdeh rêber li naw ewan da rabin û Xwe dê got ´Ez digel we me, eger hûn nûbêjê
xwe biken, ew xêra bo we hatiye dîharî kirin biden, baweriyê bi peyamberên Min
biken û yarmetiya ewan biden û deynekê baş bidene Xwe dê, Ez dê gunehê we
bimalim û we têkeme naw baxçeyên ku çem li bin da diherikin. Lê eger herkesek li
naw we da bawer neket, piştî evê, ew dê gelek li rêya rast dûr bît´ 13 Lê ewan peymana
xwe şikand, lewma Me ew nerênî kirin û dilê wan req kir. Ew peyva li cihê wan da
wêda diben û hindek li eva ku bi wan hatibû gotin li bîra kirîne, hêşta jî tu dê
xapandinê bal wan hemûya bibînî, bes hindek li wan nebin. Jê bigerê û li wan xweş
be, Xwe dê hez ewan diket ku karên baş diken. 14 Me peymanek li hindek ewên ku
dibêjin ´Em Fele ne´ vergirt, lê ewan bîr kirin, hindek li eva ku bi wan hatibû gotin.
Lewam, ta Roja Vejiyanê Me dijminatî û kerib li nawbera ewan da bilind kiriye,
demek nêzîk da Xwe dê, dê bêjîte wan ku ewan çi dikir. 15 Mirovên nivîsîna pîroz,
peyamberê Me bo we hatiye, gelek li eva ku we li nivîsîna pîroz da diweşart û pişt guh
dihawêt aşkira kiriye. Ronahiyek li bal Xwe dê we bo we hatiye û nivîsînek pîroz ku
tişta zelal diket. 16 Pê evê Xwe dê rênivîniya ew kesa diket ku li keyfxweşiya Vî digerên
û bi destûra Vî, ewan rênivîniyê rêyên aştiyê diket û ewan li taritiyê da tînîte ber
ronahiyê û ewan rênivîniyê rêyek rast diket.
17 Ewên ku dibêjin, ´Xwe dê Mesîhê kurê Miryemê ye´ bêguman bawer nekirîne.
Bêje, ´Eger Xwe dê xwastiba, meger kesekê dê karîba pêşya Vî bigrît ku Mesîhê kurê
Miryemê digel dayka wî û hemû ewên ser erdê li nav nebet? Padişahiya asimana û
erdê û ewa li nawbera wan da ya Xwe dê ye. Ev diafrînît eva ku Ev dixwazît,
Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye.

a: Şahid

[18] Cihû û Fila digotin ´Em zarûkên Xwe dê û xweşevîstê Vî ne´. Bêje, ´Bes çima Ev li
ber gunehên we, we siza didet? Hûn tenê bimirin[a], parek li afirandina Vî. Ev dibhore
li her kesê Ev dixwazît û siza didet her kesê Ev dixwazît. Padişahê asimana û erdê û
ewa di nawbera wan daye, vegera dawiyê jiboy bal Vî ye.
[19] Mirovên nivîsîna pîroz, piştî bêhn wedanekê li zincîreya peyambera niha
peyamberê Me hatiye bal we ku tişta bo we zelal biket, bila hûn nebêjin, ´Kes nehatiye
mizgînî yanjî agahdariyê bidete me´ Ber xatira hindê yêk hatiye bal we ku mizgîniyê
bidete we û we agahdar biket, Xwe dê desthilat heye ku hemû tişta biket.
[20] Dema Mûsa gote netewa xwe, ´Netewa min, erêniya Xwe dê li ser we bîra we bît;
çawa Vî Pêşbîn li naw we da rakirin û padişah bo we destnîşan kirin û daye we, eva ku
Vî nedabû çi kesê dîke li naw mirova da. [21] Netewa min, herine naw ew erdê pîroz ku
Xwe dê ferman li we kiriye, eger hûn paşve bizvrin hûn dê bidorînin´. [22] Ewan got,
´Mûsa, neteweyeke zordarê tirsnak li wêderê heye, em naçine wêderê taku ew lêrê
neçin, eger ew çon, paşê em dê biçine lêrê.´ [23] Li naw ewên ku ditirsiyan hêşta jî, du
mêrên ku Xwe dê erênî kirbûn gotin, ´ Li derwaze da herine jor û dema hûn çone
jorda, hûn dê serdestê wan bin. Eger hûn bawermendê rastîne, pişta xwe bi Xwe dê
rast biken. [24] Ewan got, ´Mûsa, taku ew lêrê bin em çi cara naçine jorda, ber wê hindê
tu û Xwedanê xwe herine jorda û şer biken û em dê lêre bimînin´ [25] Ew got ´Xwedan,
min xêncî xwe û birayê xwe, min desthilat li ser kesê da nîne, dadweriyê li nawbera
me herduya û ew netewa ku bi pêdagirî serkêşin da bike. ´ [26] Got, ´Bo çil sala ew li
wan qedexeye; ew dê li ser erdê bigerên. Lewma, sebaret bi ewên ku bi pêdagirî
serkêşiyê diken xemgîn nebe. ´ [27] Bi rastî serhata her du kurên A Dem bêje wan;
herduya qurbanî pêşkêş kirin û li yêk ji wan hate pejirandin û li ewê dîke nehate
pejirandin. Got, ´Ez dê te bikujim´Got, ´Xwe dê tenê li ewên hişyarî Vî ne dipejirînît.´
[28] Eger tu destê xwe bilind bikey ku min bikujî, ez destê xwe bilind nakem ku te
bikujim. Birastî ez li Xwe dê ditirsim, Xwedanê hemû dinyaya [29] û ez dixwazim ku tu
barê gunehê min li ser gunehên xwe da helgirî û tu bibye hevrêyê naw agir da; eweye
padaşê ewên ku karê nebaş diken.´ [30] Lê riha wî, ew han da ku birayê xwe bikujît;
lewma wî, ew kuşt û bûye yêk li wan ku dorand. [31] Xwe dê, qijalikek[b] şand ku erdê
bikolît û nîşanî wî bidet ku çawa laşê birayê xwe çal biket û wî got, ´Heware li min!
Meger min nekariye weke ew qijalikê bim û laşê biraye xwe çal bikem? Ew bû yêk li
wan peşîmana. [32] Berxatira wê hindê, Me ferman li zarûkên Israîl kir, eger her kesek
rihekê bikujît, meger ew li şûna kuştinê bît yanjî liber belav kirina gendeliyê li ser erdê,
weka ewêye ku ew hemû mirovatiyê dikujît, di dema ku eger kesek jiyanekê rizgar ket,
weka wêye ku ew jiyana hemû mirova rizgar diket, bêguman peyamberên Me pê
belgeyên zelal hatine bal wan, lê piraniya wan li zêdegaviya li ser erdê da berdewam
man.



a: Li şûna peyva Beşer da min peyva Bimir bikar înaye, ewê ku dê bimrît.
b: Qel, balindeyeke reşe

33 Ewên ku digel Xwe dê û peyamberê Vî şer diken û hewl diden li ser erdê da
gendeliyê belav biken, dibya bi kuştinê, li xaçê danê, birîna dest û pêyên kitan gohor,
yanjî li ew erdê kirine der, bêne siza dan, li vê dinyayê da jiboy wan serşorî heye û li
Dawiyê da jî sizayek gelek mezin. 34 Meger ku ew bizvirin, pêş ku hûn wan bigrin,
bizanin ku Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. 35 Hûn ku bawer diken, hişyarê
Xwe dê bin, li keresteya[a] nêzîk bûna Vî bigerên û jibo rêya Vî berxwe biden, belke
liber hindê hûn serkevtî bin. 36 Eger nebawer xwedanê hemû ewa di vê erdê da ban
û ewa weka wê jî û ew hemû li şûna ew eşkenceya Roja vejîyanê da barmite[b] daban,
dîsa jî ew li wan nedihate pejirandin – ewan dê eşkenceyek bijan hebît. 37 Ew dê
awat bixwazin ku naw agir da derkevin, lê ew nawda naderkevin; ew dê jiboy wan
eşkenceyek bêdawî bît. 38 Destên dizên nêr û mê bibrin, weke rêgirî li aliyê Xwe dê
we jiboy ewa ku wan kiriye; Xwe dê Bihêze Biryardere. 39 Lê eger kesek piştî kirina
karê nerast peşîman bît û serastiyê biket, Xwe dê, dê peşîmaniya wî bipejirînît;
Xwe dê Ev ê Lêbihore û Rehmê didet. 40 Meger tu nizanî padişahiya asimana û erdê
tenê ya Xwe dê ye? Ev siza didet her kesê Ev dixwazît û dibhorît li her kesê ku Ev
dixwazît; Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye. 41 Ey peyamber, liber xatira ewên
ku bi lezgînî nebaweriyê diken xemgîn nebe, ewên ku bi devê xwe dibêjin, ´Em
bawer diken´ Lê çi bawerî di dilê xwe da çinînin û li naw Cihû ya ku bi kelecan we
guhdariya nerastiyê diken û gohdariya ew mirova diken ku hêşta nehatine bal te, ew
wateya peyva badiden û dibêjin ´Eger ew destûre da te bipejirîne lê eger ne, bes
agahdar be! ´ Eger Xwe dê bixwazît pê ezmûna Xwe kesekê taqî biket, te jiboy wan
li hember Xwe dê da, dê çi tişt çinabît. Ewane li wanin ku Xwe dê naxwazît dilê wan
pak biket, di ev dinyayê da ewan dê serşorî hebît û li Dawiyê da ewan dê
eşkenceyeke mezin hebît, 42 ew bi kelecan we guhdariya nerastiyê diken û ewa ku
qedexeye dixwen. Eger ew bo dadweriyê bêne bal te, tu dikarî yan li nawbera wan
da darizandinê bikey yanjî pişta xwe bide wan, eger tu pişta xwe bideye wan, ew bi
hiç awayî zirarê li te naden, lê eger tu li nawbera ewan da bi dadperwerî darizandinê
bikey; Xwe dê hez dadperwera diket, 43 lê ew çima bo dadweriyê têne bal te, ewan
bo dadweriya Xwe dê Rênivînî (Torat) heye û tenanet piştî vê jî rûyê xwe zivrandin?
Ewane bawermend nînin. 44 Me di Rênivînî (Torat) ê da rênivînî û ronahî şande
xarê û pêşbînên ku xwe radestê Xwe dê kirbûn pêka vê bo Cihû ya dadwerî dikirin.
Xaxam û pispora jî pê ew nivîsîna pîroza Xwe dê ku bi wan hatibû sipartin her wisa
dikirin, ku ew li ser evê gewah bûn. Lewma li mirova netirsin li Min bitirsin,
eşkereyên Min nefroşine bihayek kêm; ewên ku pêka eva ku Xwe dê şandiye xarê
dadweriyê naken, bes ew bawer naken.



a: Wesîle, alaw, tişt, b: li şûn da biden, li bedel da biden, li cihê wê da biguherin.

[45] Me bo wan nivîsî; jiyanek bo jiyanekê, çavek bo çavekê, difinek bo difinekê, guhek
bo guhekê, didanek bo didanekê, bo toleya birînek weka wê; eger kesek liber xêr
xaziyê li ewê xweş bît, ew dê li cihê gunehên wî da bikar bêt. Ewên ku pêka eva
Xwe dê eşkere kiriye dadweriyê naken, bes ew nerastiyê diken. [46] Me Îsa kurê
Miryemê li şûnpêyê ewan da şand ku ya pêş wî, di Rênivîniyê (Torat) da hatibû erênî
biket; Me Mizgînî (Incîl) daye wî ku têda rênivînî û ronahî heye û erênî ya Rênivînî
(Torat)ê jî diket ku pêşta, bo ewên ku hişyarê Xwe dê ne weke rênivînî û wane eşkere
bibû. [47] Lewma, bihêle bila peyrevên Mizgîniyê (Incîlê), pêka ewa ku Xwe dê têda
şandiye dadweriyê biken. Ewên ku pêka eva Xwe dê eşkere kiriye dadweriyê naken ew
bi pêdagirî serkêşin. [48] Me bo te[a] bi rastiyê nivîsîna pîroz şand ku nivîsînên pîrozên
pêşta hatibûn erênî kirin û weke parêzer li ser da; lewma, pêka eva ku Xwe dê şandiye
xar, li nawbera ewan da dadweriyê bike. Peyreviyê li hest û hêviyê wan neke, dema ku
li rastiyê bo te hatiye. Jibo her yêk li we, Me rê û qanûnek dîhar kiriye, eger Xwe dê
xastiba, Ev dê hûn kirbana civakek, lê Ev dixwast bi eva ku Vî daye we, we taqî biket,
liber wê lezê li kirina başiyê biken; hûn dê hemû bizvirne bal Xwe dê û Ev dê bêjîte
we sebaret bi, ew mijarên ku we nakokî li ser hebûn.
[49] Lewma, pêka eva ku Xwe dê şandiye xarê li nawbera ewan da dadweriyê bike.
Peyreviyê li hest û daxwazên ewan neke û agahdarê wan be ku ew te han neden li
hindek li eva ku Xwe dê bo te şandiye xarê ladey. Eger ew piştа xwe bidenê, bizane ku
Xwe dê dixwazît liber hindek gunehên ku wan kirîne ewan siza bidet; piraniya mirova
bi pêdagirî serkêşin. [50] Ew pêka dema nezaniyê[b] dadweriyê dixwazin? Erê dadwerek li
Xwe dê baştir bo ewên xwedan baweriyek qahîmin heye? [51] Hûn ku bawer diken,
Cihû û Fela weke hevpeyman wernegrin; hindek li wan hevpeymanê ewê dîke ne. Her
kesek li we, ewan weke hevpeyman verbigrît, ew yêk li wane. Xwe dê mirovên
nerastkar rênivînî naket, [52] lê dîsa jî tu dibînî, ewên di dilê wan da nexweşiyek heye
dibezine bal wan bi gotina; ´Em ditirsiyên ku karesatek bête serê me. ´Lê belê belke
Xwe dê serkevtinekê serda bînît yanjî biryarekê li bal Xwe we bidet, paşê sebaret bi ew
sira ku wan li naw xwe da weşartine dê peşîman bin [53] û ewên bawermend dê bêjin,
´Erê, ewane ewin ku bi Xwe dê sûnd bi mezintrîn sûnda xwarin ku ew birastî digel we
bûn? ´ Kiryarên wan pûç bûne û ew bûne li wan ku dorandine. [54] Hûn ku bawer
diken, eger her kesek li we li ser dînê xwe bizvrît, Xwe dê bi zûyî dê ew mirovan bînîte
pêş ku Ev hez jê diket û ew hez li Vî diken, li hember bawermenda da ûstîxarin û li
hember nebawera da tundin û ewên ku li rêya Xwe dê, da hewil diden, bêy ku li loma
rexnegira bitirsin. Qenciya Xwe dê wisa ye. Ev didete her kesê ku Ev dixwazît.
Xwe dê bêpayan Berfereh û Zana ye.
[55] Hevpeymanê we yên rastî Xwe dê, peyamberê Vî û ewên bawermendin, ewên ku
nûbêja diken, ew xêra ku bo wan hatiye dîhar kirin diden û xwe diçemînin.



a: Mihemed
b: Pêş ku Mihemed peyamber peyama Xwe dê bînît! Dema put perestiyê

[56] Ewên ku hevpeymanê Xwe dê, peyamberê Vî û bawermenda ne, bêguman ew li
aliyê Xwe dê ne û ew dê serdest bin. [57] Hûn ku bawer diken, ewên ku tirana bi dînê
we diken û henekê xwe pê diken, çi ewên ku pêş we da nivîsîna pîroz bi wan hatibû
dan yanjî ewên nebawer bin, weke hevpeyman vernegrin û hişyarê Xwe dê bin eger
hûn rastî bawermendin. [58] Dema hûn banga nûbêjê diken, ew tirana pê diken û
henekê xwe pê diken; çimkî ew mirovê wisane ku hizra xwe bikar naynin. [59] Bêje
´Mirovên nivîsîna pîroz, liber her hoyekê xêncî ev rastiyê kerbê we li me wedbît ku;
em bawerî bi Xwe dê û eva ku bo me hatiye şandin xarê û eva ku pêşta hatibû şandin
xarê diken, di dema ku piraniya we bi pêdagirî serkêşin? [60] Bêje, ´Erê ez bêjime we çi li
ewê nebaştire weke siza libal Xwe dê we? ´Ewên ku Xwe dê nerênî kirîne, ewên ku Ev
lê tore ye û kirîne meymûn û beraz û ewên ku xwedêyên direw diperestin, cihê wan
gelek kotiye û ew li rêya serast dûr ketine.´ [61] Dema ew têne bal we, ew dibêjin, ´Em
bawer diken´ Lê belê ew bi nebawerî tên û bi nebawerî diçin, Xwe dê baş dizanît ew çi
diveşêrin. [62] Tu dibînî piraniya wan bilez diçin bo gûneh kirinê û dijminatî û xwarina
ewa ne qanûnî. Ew kiryarên wan çend nebaşin! [63] Çima Xaxam û pisporên dînê wan,
peyvîna bi gunehbarî û xwarina ewa ne qanûnî li wan qedexe naken? Ew kiryarên
wan çend nebaşin! [64] Cihûya gotiye, ´Destê Xwe dê bi zincîra girêdayiye ´ Destê wan
bixwe bi zincîra girêdayiye, ber xatira ewa ku wan gotiye ew hatine nerênî kirin. Belê
destên Xwe dê fereh vekirîne; Ev didet weka Ev hez diket. Eva li bal Xwedanê te bo te
hatiye şandin bêguman dê zêdegavî û nebaweriyê li piraniya wan da zêde biket. Ta
Roja Vejiyanê Me kerb û dijminatî li naw ewan da çandiye, hemû cara ku ew agirê şer
hil ken, Xwe dê divemrînît, ew hewil diden ku gendeliyê li ser erdê da belav biken, lê
belê Xwe dê hez wan naket, ewên ku genî diken. [65] Bes eger tenê mirovên nivîsîna
pîroz bawer biken û hişyarê Vî bin, Em dê gunehê wan li wan bimalin û ewan bînine
naw baxçeyên şadiyê da. [66] Eger ewan Rênivînî (Torat) û Mizgînî (Incîl) şopandiban û
eva li bal xwedanê wan ra jiboy wan hatibû şandin xar, ewan dê xwariba li jor xwe û li
jêr pêye xwe, civakek li naw ewan da li ser rêbaza raste, lê piraniya wan- çend nebaşe
ya ku ew diken. [67] Peyamber! Hemû eva ku li bal Xwedanê te we jiboy te hatiye
şandin xarê rabigehîne, eger tu nekey, bes te peyama Vî ranegehandiye û Xwe dê, dê
te li mirova biparêzît. Xwe dê mirovên nebawer rênivînî naket. [68] Bêje, ´Mirovên
nivîsîna pîroz, hûn li ser hîç tiştekê nînin, taku hûn Rênivînî (Toratê) û Mizgînî (Incîl)
ê û eva ku li bal Xwedanê we ra hatiye şandin xarê neşopînin ´ Lê bêguman eva li bal
Xwedanê te ra jiboy te hatiye şandin, dê li serhildan û nebaweriya piraniya wan zêde
biket; lewma ser xatira mirovên nebawer xemgîn nebe. [69] Ewên ku bawer kirîne û
ewên ku Cihû bûn, ewên Şîbayê[a] yanjî Fele bûn – ewên ku bawerî bi Xwe dê û Roja
dawiyê hene û karên durust diken, bo ewan çi tirs nîne û ew xemgîn nabin.



a: Gelê Şîba (Seba) yê, bawermendên Xwe dê perest.

70 Me belêniyek li zarûkên Israîl sitand û jibo wan peyamber şandin. Her cara
peyamberekê bo wan tiştek înaba ku riha ewan hez lê nekiriba, hindek li wan
nedpejirandin û ewên dîke jî dikuştin. 71 Ewan hizir dikir ku wan çi siza nabît liber
hindê ew ker û kor bûn. Paşê Xwe dê bi lêbihorîn li wan zivirî, lê piraniya wan dîsa
ker û kore bûn. Xwe dê hemû kiryarên wan dibînît. 72 Bêguman ewên ku dibêjin,
´Xwe dê Mesîhê kurê Miryemê ye´bawer nekirîne. Mesîh her bixwe got, ´Zarûkên
Israîl, Xwe dê Xwedanê min û Xwedanê xwe biperestin´ Eger kesek ewên dîke bikete
hevalê Xwe dê, bêguman Xwe dê, baxçe li ew qedexe kiriye û agir dê bibîte
penahgaha ew kesî. Nebaşkara çi yarmetîder çinabin. 73 Ewên ku dibêjin
´Xwe dê ewê sêyemîne li sêyan´ bêguman ewan bawer nekiriye û çi xwedê nînin bes
Xwe dê Yêkta nebît, eger ew dawî bi ewa ku dibêjin neynin, bêguman dê eşkenceyek
bijan li nebawerên li naw ewan da bidet. 74 Ew çima bi peşîmanî nazivrine bal Xwe dê
û daxwaza lêbihorîna Vî biken? Xwe dê Ev ê Lêbihore, Rehmê didet 75 Mesîhê kurê
Miryemê li peyamberekê zêdetir nebû, bêguman pêş wî da, peyamberên dîke hatibûn
û çobûn, dayka wî rastbêj bû, her duya jî xwarin dixwarin, zêndê Em çawa ew nîşana
bo wan zelal diken, bes zêndê ew çawa hatine xapandin. 76 Bêje, ´Hûn li kêleka
Xwe dê ewê diperestin ku çi hêz nîne zirarê yanjî qazancê bigehînîte we? Dema ku
Xwe dê Bihîstin û Zanîne? ´ 77 Bêje ´Mirovên nivîsîna pîroz, li dînê xwe da sînorên
rastiyê nebezînin û peyreviyê li hestên ew netewê neken ku li pêş weda bezir bûne,
ewan gelek li rê derêxistin û bixwe jî li rêya serast derketine.´ 78 Ewên ku li naw
zarûkên Israîl da bawer nekiribûn, pê zimanê Dawûd û Îsa yê kurê Miryemê hatibûne
nerênî kirin, çimkî ewan peyrevî nekirbûn û sînor bezandbûn, 79 ewan pêşya hevdu li
kirina kiryarên nerast negirtin, çend kotî bûn ew karên ku wan dikirn! 80 Tu gelek li
ewan dibînî ku dibine hevpeymanê ewên ku bawer nekirin. Çend kotiye ewa ku riha
wan jibo wan rêkiriye pêş! Xwe dê li wan tore ye û ta bêdawiyê ew dê li siza kêşanê da
bimînin. 81 Eger ewan bawerî bi Xwe dê, bi Pêşbîn û eva bo wî hatî şandin xar kiriba,
ewan, ew weke hevpeyman wernedgirtin, lê piraniya wan bi pêdagirî serkêşin.
82 Bêguman tu dê bibînî ku Cihû û ewên ku hevala jiboy Vî peyda diken, dijminatiya
herî dijwar digel bawermenda diken. Bêguman tu dê bibînî ewên ku nêzîkatiyê digel
bawermenda diken ewin ku dibêjin ´Em Fele ne´ Çimkî li naw ewan da Qeşe[a] û
Rahib[b] hene û ew xwe mezin naken 83 û dema ew guhdariya vê diken ku bo
peyamber hatiye xarê hûn dê bibînin ku rondik li çawê wan têne xarê, çimkî ew
rastiyê nas diken. Ew dibêjin, ´Xwedanê me, me bawer kiriye, lewma me li naw
gewaha da tomar bike.´ 84 Em çima nabît baweriyê bi Xwe dê û ewa ku li rastiyê jiboy
me hatiye şandin xarê neken, dema ku em li Xwedanê xwe hêvî dixwazin me bikete
naw netewa durustkar da?



a: Mamostayê dîniyê Fela.
b: Waz înan li xweşiyên ev dinyayê û dema xwe jibo Xwe dê, perestiyê terxan kirin.

[85] Ber xatira ewa ku wan got, Xwe dê bi baxçeyên ku çem li bin da diherikin ew xelat
kirîne û ta bêdawiyê ew dê li wêderê da bimînin; ewe padaşê ewane ku başiyê diken.
[86] Ewên ku bawer naken û nikoliyê li peyamê Me diken, ew dê bibine hevalê naw agirê
cehnemê da. [87] Hûn ku bawer diken, ew tiştên baş ku Xwe dê bo we qanûnî kirîne
qedexe neken, sînora derbaz neken, Xwe dê hez wan naket ku sînora derbaz diken
[88] lê bixwen ew tiştên qanûnî û baş ku Xwe dê bo we dabîn kirîne. Hişyarê Xwe dê
bin, Ev ê ku hûn baweriyê pê diken. [89] Xwe dê hisaba ew bê hizriya we di sûndên xwe
da xwarî li we napirsît, lê Xwe dê, dê hisaba ew peymana ku we di sûnda xwe da
xwaribû û şikandiye dê li we biprsît; qerebû ya şikandina sûndekê, dana xwarinê ye bi
deh mirovê hejare, bi xwarineke weke ya ku di rewşek asayî da hûn dê bidene
binemala xwe, yanjî ewan cil ken, yanjî gerdenekê* azad biken, eger her kesê neşêya
wana biket, ew dibya bo sê roja rojî bît, ewe qerebûye ji bo şikandina sûndên we,
dema hûn sûnd dixwen, sûndên xwe xwedan ken. Bi wî awayî Xwe dê eşkereyên Xwe
jibo we zelal diket, belke liber hindê hûn sipasdar bin. [90] Hûn ku bawer diken,
serxweşker, qomar, kevirên qurbaniyê[a] û pîroz kirina tîra[b] kiryarên qirêjin li bal
Şeytan we! Dûriyê li ewan biken bila hûn serkevtî bin. [91] Bi serxweşkera û qomarê
Şeytan tenê lê digerêt ku dijminatî û kerbê li naw we da belav biket û pêşgiriya we li
bîr anîna Xwe dê û nûbêjê biket. Lewma hûn waz li ewan naynin? [92] Peyrevî li
Xwe dê biken, peyrevî li peyamber biken û agahdar bin, eger hûn pişta xwe bidenê,
bes bizanin ku tenê erkê peyamber ewe ku bi zelalî eşkerê bigehînîte we. [93] Ewên ku
bawer diken û karên baş diken, ew nayêne gunehbar kirin jibo ewa ku wan xwariye[c],
taku ew hişyarê Vî bimînin, bawer diken û karên baş diken, bes ew hişyarê Vî ne û
bawer diken, bes ew hişyarê Vî ne û karên baş diken, Xwe dê hez ewan diket ku karên
baş diken. [94] Hûn ku bawer diken, bêguman Xwe dê, dê bi nêçîra liber dest û rimên
we, we taqî biket taku Xwe dê bizanît kê nedîtî li Vî ditrsît, niha pêwe her kesê ku
zêdegaviyê biket ew dê sizayek bijan hebît. [95] Hûn ku bawer diken, dema ku hûn di
rewşa pîroz[d] dane nêçîrê nekujin, her kesek bi zanebûn wê bikujît, siza ya wî qurbanî
kirina ajelek kevî hemberanê ewa nêçîr kiriye, bi înana wê bo Kebê ku li bal du mêrên
bi dad we li naw we da, dadwerî lê hatibîte kirin, yanjî li şûn da dana xwarinê bi
mirovên hejar yanjî hemberanê wê bi hejmara wekhev ya roja, bi rojî bûnê jî qerbû
biken, da ku hûn tama berhema ew kiryara xwe biken. Xwe dê li ewa derbaz bûyî
bihoriye, lê eger kesek dubare biket, Xwe dê, dê tole lê veket, Xwe dê şêyana wê hindê
heye ku tole veket. [96] Nêçîra derya yê û xwarina wê û debara wê jiboy we û rêviya
qanûniye, lê dema hûn li rewşa pîroz dane li we qedexeye ku nêçîra ser hişkatiyê
biken. Hişyarê Xwe dê bin, Ev ê ku hûn dê bêne kom kirin bo bal Vî.



* Wergêrên ereb peyva reqebe bi kole wergêrane, lê ew peyv wateya mirovek bindest didet ku gerdena wî li qeydê daye. Lêre basê serbestiya mirovê girtî û bindeste.*

a: Cihê ku put perest qurbaniya pêşkêş puta diken

b: Put peresta pê tîra tişt par divekirin û çarenûsa puta dihar dikirin

c: Pêş ku bawer biken

d: Hec.

[97] Xwe dê, Kebe kiriye mala pîroz, awahiyek bo mirova û heyva pîroz û ajelên
qurbaniyê digel ewên hatine gulbjêr[a] kirin; ewe jiboy wê hindê ye ku hûn bizanin
Xwe dê zanist heye li ser ewa di asimana û erdê da û Xwe dê agahdarê hemû tişta ye.
[98] Bizane ku Xwe dê bi giranî siza didet û Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. [99] Erkê
peyamber tenê ewe ku peyamê bigehînît; Xwe dê dizanît hûn çi eşkere diken û hûn çi
diweşêrin. [100] Bêje ´Başî û nebaşî wekhev nînin lê renge firavaniya nebaşiyê we gelek
sersam biket.´ Lewma hişyarê Xwe dê bin, hûn mirovên têgeheştinê, belke li ber hindê
hûn serkevtî bin.´ [101] Hûn ku bawer diken, li ser wan tişta nepirsin, eger ew bo we
bêne eşkere kirnê, belke we tengaw biken, eger dema ku Xwandin (Quran) tête xarê,
hûn sebaret bi wan bipirsin ew dê bo we eşkere bin, Xwe dê li ewa derbaz bûyî xweş
bûye; Xwe dê Lêbihore û Pêdagire. [102] Pêş we da, neteweyekê sebaret bi tiştên wisa
pirs kirin, lewma paşê ew bûne nebawer. [103] Xwe dê, Bahira, Saiba, Wasila û Ham[b]
nedamezrandine, lê ewên nebawer sebaret bi Xwe dê direwa berhem tînin û piraniya
wan hişê xwe bikar naynin, [104] dema dibêjine wan, ´Werine bal eva ku Xwe dê bo
peyamber şandiye xarê ´ Ew dibêjin ´Ewa me li bab û bapîrê xwe mîrat biriye baş têra
me ye.´ Tenannet bab û bapîrê wan tiştek nedizanîn û ew nehatibûne rênivînî kirin jî.
[105] Hûn ku bawer diken, hûn berpirsiyarin bo riha xwe; eger kesek dîke li rê derkevît,
ew zirarê li we nadet dema ku hûn hatine rênivînî kirin, hûn hemû dê vegerêne bo bal
Xwe dê, paşê Ev dê we agahdar biket ka we çi kiriye.[106] Hûn ku bawer diken, dema
mirin tête ser her yêk li we, bihêlin du mêrên dadperwer li naw we da gewahê tembiya
we bin, eger hûn ser erdê rêvîtiyê diken û belaya mirinê bête serê we, du mêra li
mirovên dîke peyda ken. Piştî nûbêjê herdu gewaha paşwe ragire, eger te guman
hebin, ewan bi Xwe dê bide sûndê, ´Em gewahiya te bi çi buhayî nafroşin, tenanet
eger xizmek nêzîk jî têkel bît. Em gewahiya Xwe dê naveşêrin, jiber ku hingê em dê
bibine gunehkar´
[107] Eger eşkere bît ku ew du gunehbarin[c] bihêlin bila du li ewên ku mafê qanûnî li ser
ew duyên pêşta hene li şûna ewan da rawestin. Bihêlin bila herdu bi Xwe dê sûnd
bixwen, ´Gewahiya me li ya wan rastire, birastî me zêdegavî nekirye, çimkî em dê
bibine nerastkar.´ [108] Ewe dê hegera wê zêdetir biket ku ew gewahiyek rast û serûber
biden yanjî bitrisin piştî ku sûnd xwarine paşê sûnda wan li bal ewên dîke neyête
pejirandin. Hişyarê Xwe dê bin û guhdar bin, Xwe dê ew netewa ku bi pêdagirî
serkêşe rênivînî naket. [109] Ew Roja ku Xwe dê hemû peyambera kom diket û li wan
dipirsît, ´ We çi bersivek vergirt? ´ Ew dê bêjin ´Me ew zaniyarî nîne, Tu tenê ewa
nedîtî dizanî´



a: Ew ajelên ku jibo qurbaniyê hatine dest nîşan kirin.
b: Li gor gotina Ebdil Helîm, ew komên cudayê ajela ne ku li rêncberiyê serbest hatine kirinê û bo rêzgirtin li puta weke xwarin bikar tînin.
c: Ew du gewah gunehbarê direw kirinê bin, gewahiya xwe veguhertibin!

110 Dema ku Xwe dê, dê bêjît, ´Îsa, kurê Miryemê! Erêniya Min li ser xwe û li ser
dayka xwe bîne bîra xwe! Dema Min pê riha pak tu bihêz kirî û li naw landikê da tu
digel mirova peyvî û dema tu pêgeheştî jî! Dema Min tu fêrî nivîsînê, têgeheştinê,
Rênivînî (Torat) û Mizgînî (Incîl) ê kirî, dema, pê destûra Min, te li heriyê şêweya
balindeyekê afirand û paşê pif kire têda û pê destûra Min ew bûye balindeyek, pê
destûra Min, te kore û gurû çê kirin, dema pê destûra Min, te li mirî derêxist, dema
Min pêşgîriya zarûkên Israîl li ser te kir, dema ku tu pê nîşaneyên zelal hatiye bal
wan û ewên ku li naw ewan da bawer nekirbûn gotin, ´Xêncî cadûeyk aşkira eve hîç
tiştek dîke nîne´ 111 Û dema Min sirûş[a] da şagirta ku ´Baweriyê bi Min û peyamberê
Min biken´ Ewan got; ´Em bawer diken û gewahiyê diden û birastî em xwe radestê
Vî diken[b]. 112 Dema şagirta got; ´Îsayê kurê Miryemê, dê Xwedanê te bikarît li
asiman ra bo me xwarinekê bişînîte xarê? ´ Got; ´Hişyarê Xwe dê bin, eger hûn dê
bawermend bin.´ 113 Ewan got, ´Em dixwazin lê bixwen ku dilê me lê piştrast bît ku
em bizanin te rastî gotiye me û li ser da, em li naw gewaha da bin.´ 114 Îsayê kurê
Miryemê got, ´Ya Xwe dê, Xwedanê me, li asiman ra xwarinekê bo me bişîne xarê
ku ewê yekemîn û ewê dawiya me bikarin cejnê bigrin û li aliyê Te we jiboy me
nîşaneyek bît. Bo me dabîn bike, Tu baştrîn dabînkarî´ 115 Xwe dê got ´Ez dê bo we
bişînime xarê, belê her kesek li naw weda piştî ewê bawer neket, ew dê bi sizayekê
bête siza dan ku Ez li dinyaya da kesê dîke pê siza nadem´ 116 Dema Xwe dê, dê
bêjîte, ´Îsayê kurê Miryemê, ´Te gote mirova li kêleka Xwe dê, da min û dayka min
weke du xwedê ya vergirin?´ Ew dê bêjît, ´Paye bilindî ya Te ye! Ewa ku min mafê
vê nebû, min çi cara negotiye, eger min gotiba Te dê zanîba, Tu dizanî ewa di naw
min daye û ez nizanim ewa di naw Te daye. Birastî Tu tenê ewa nedîtî dizanî.
117 Tenê eva Te ferman li min kirî, min gote wan; ´Xwe dê biperestin, Xwedanê min
û xwe´ Ta dema ku ez li naw ewan da bûm ez li ser wan da gewah bûm. Yê ew
dema ku Te, ez birî me serê, Tu çavedêrî li ser ewan da, Tu gewahî li ser hemu tişta
118 Eger Tu ewan siza bidey, ew koleyê Te ne, eger Tu li wan bibhorî, Tû Bihêz û
Biryarderî .´119 Xwe dê, dê bêjît, ´Eve ev Roje ku rastbêj dê qazancê li rastbûna xwe
biken. ´ Ew dê bi baxçeyên ku çem li bin da diherikin bêne xelat kirin û ta bêdawiyê
ew dê li naw da bimînin. Xwe dê digel wan keyfxweşe û ew jî digel Vî, ewe
serkevtina herî mezine. 120 Padişahiya asimana û erdê û hemû ew tiştê di wan da ya
Xwe dê ye, Ev desthilat li ser hemû tişta heye.



a: Wehî.
b: Mosliman.

### 6. Para Ajelên kevî

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Pesin bo Xwe dê ye, afrînerê asimana û erdê ku tarîtî û ronahî çêkir, hêşta jî ewên
nebawer hemberana bo Xwedanê xwe datinên! 2 Ev e ku tu li heriyê afirandî paşê
rewşeke taybet û demek dîhar kirî ragehand ku Ev tenê pê dizane, hêşta jî tu gumanê
dikey! 3 Ev Xwe dê ye li asimana û li ser erdê, Ev nihêniyên te dizanît û ewa tu aşkira
dikey jî û Ev dizanît tu çi dest xwe we tînî. 4 Çi nîşane li nîşaneyên Xwedanê wan ra
jibo wan nayên, lê ew pişta xwe didenê. 5 Lewma, ewan nikolî[a] li rastiyê kirin dema ku
bo wan hat, lê wan zûyane dê nûçeya heman ew tişta ku wan tiranê xwe pê kiribûn dê
bigehîte wan. 6 Meger ew nabînin ku Me çend nifiş pêş ewan da li naw birine? Me
gelek li we qahîmtir ew li ser erdê raçandin, li asiman ra bi firavanî baran li ser ewan
da şande xarê û Me vekir ku çemên herikî li ber pêyê wan da meşiyan, hêşta jî liber
xatira gunehên wan Me ew li nav birin û piştî wan Me nifşa ewên dîke înan. 7 Tenanet
eger Me bo te nivîsîneke pîroz li ser kewil nivîsî ba û şandiba xar û ewan bixwe destê
xwe jî dabayê, hêşta jî ewên nebawer dê gotiban, ´Xêncî cadûyeke zelal eve hîç tiştek
dîke nîne.´ 8 Ew dibêjin, ´Çima firişteyek bo wî neşandine xarê? ´ Lê, eger Me
firişteyek şandiba xarê, dê dadgeha wan jî bi yêkcarî hatiba kirinê, bêy ku derfetek bi
wan hatiba dan. 9 Birastî eger Me ew kiriba firişte, dîsa jî Me dê ew di şêweyê mêrekê
da şandiba û ew cil kiribana ber ewan da ku ew dikene ber xwe. 10 Tirane bi
peyamberên pêş te da jî hatibû kirin û ewên ku tirane kirbûn, pê ew sizayê hatine
dorpêç kirin ku tirane pê kiribûn. 11 Bêje, ´Li ser erdê bigerên û serhata ku serê ewên
nikoliyê lê diken bibîne ´ 12 Bêje ´Ya kêye, ewa di asiman û erdê da? ´ Bêje ´Ya
Xwe dê, Ev erkê rehmê kêşaye ser Xwe, bêguman di Roja vejiyanê da Ev dê we kom
biket, sebaret bi ew hindê çi guman nîne. Ewên ku riha xwe wenda kirîne, bes bawer
naken. 13 Ewa ku bi şevê yanjî bi rojê radwestît ya Vî ye. Ev Dibhêt û Dizanît´14 Bêje,
´Ezê çawa bikarim xêncî Xwe dê parêzvanek dîke vergirim, afrînerê asimana û erdê,
Ev ê ku xwarinê didet belê Ev naxwet? ´ Bêje, ´Ferman li min hatiye kirinê ku ez
yêkemîn bim ku xwe radestî Vî bikem[b]´ Nebime yêk li wan ku ´hevala´ jiboy Vî peyda
diken.
15 Bêje, ´Eger ez serpêçiyê li Xwedanê xwe bikem, ez li sizaya Roja gelek mezin
ditirism. ´ 16 Ev dê birehm bît, digel her kesê ku di wê Rojê da, Ev lê xweş bît, ev
serkevtine zelale´ 17 Eger Xwe dê bi karesatê destê Xwe li te bidet, kes nikarît wêda
bibet, bes Ev nebît û eger Ev bi başî destê xwe li te bidet, bes Ev şêyan li ser hemû tişta
heye. 18 Ev bilindtrîn Serwere li ser hemû rihtiberên Xwe, Ev dadwerê agahdare.



a: Haşa, înkar
a: Bibime Mosliman

19 Bêje, ´Çi tiştek li gewahiyê da mezintrîne? ´ Bêje, ´Xwe dê gewahe li nawbera
te û min da. Ev Xwandine (Qurane) sirûş bi min hatiye dan ku ez pê evê we
agahdar bikem û her kesekê ku digehîtê. Erê hûn birastî gewahiyê diden ku
xêncî Xwe dê, xwedêyên dîke hene? ´Bêje, ´Ez bixwe gewahiyê nadem´ Bêje,
´Ev tenê Xwe dê yeke û ez bêgunehim li her tiştê ku hûn dikene hevalê Vî.´
20 Ewên ku Me nivîsîna pîroz daye wan, evê nas diken, her wek ku ew kurên xwe
nas diken. Ewên ku rihên xwe wenda kirîne bes ew bawer naken. 21 Kê li ew kes
nerastiyeke herî meztir diket ku direwekê li dijî Xwe dê çêdiket yanjî nikoliyê li
eşkereyên Vî diket? Birastî ewên ku nerastiyê biken sernakevin. 22 Roja ku Em
hemûya kom dikene ser hew û Em dê bêjine ewên ku ´heval´ jiboy Vî peyda
kirbûn, ´Kîwene, ewên we digotin hevalê we bûn? ´ 23 Ew dê tenê bêjin, ´Bi
Xwe dê, Xwedanê me, em li wan nebûn ku ´heval´ bo Vî peyda kirbûn! ´
24 Bibîne, ew çawa li dijî riha xwe direwa diken û ewên ku wan dahênane, ew
bêxwedan hêlane. 25 Li naw ewan da hindek hene ku guhdariya te diken, lê belê
Me qepax danane ser dilê wan, lewma ew tênagehin û keratî di guhên ewan da
ye, tenanet eger ewan hemû nîşane jî dîtiban, dîsa jî ewan bawerî pê nedikirin.
Dema ewên nebawer têne bal te digel gengeşê diken dibêjin, ´Xêncî efsaneyên
ewên pêşta ewe hîç tiştek dîke nînin´ 26 Û ew pêşgîriya ewên dîke li evê[a] diken û
xwe jî li dûr radigrin. Lê xêncî riha xwe ew kesê dîke wêran naken, lê ew
tênagehin. 27 Eger tenê te karîba bibînî, dema ku wan liber agir radwestînin, ew
dê çawa bêjin, ´Eger tenê me karîba paşta vegerên, me dê nikolî[b] li nîşaneyên
Xwedanê xwe nekiriba û em dê li naw bawermenda da bana. 28 Belê! Eva ku
wan pêşta diweşart dê li wan aşkira bît, tenanet eger ew paşta vergerandibana jî,
ew dê tenê vergerana ser heman ew tişta ku li wan qedexe bû – birastî ew
direwînin! 29 Ew dibêjin, ´Xêncî jiyana me li ev dinyayê da tişteke dîke çinîne û
em nayêne vejandin ´ 30 Eger tenê te karîba bibînî, dema ew li hember Xwedanê
wan da, têne rawestandin, Ev dê çawa bêjît, ´Eve rastî nîne? ´ Ew dê bêjin,
´Belê, bi Xwedanê me.´ Ev dêbêjît, ´Bes êşê tam biken çimkî we bawer nedikir´
31 Ewan dorandiye, ewên ku nikoliyê li hevdîtina digel Xwe dê diken, ta ew
dema ku nişkda demjimêr têt, ew dê bêjin, ´Mixabinî li me ku me çi bala xwe
nedaye evê!´ Ew dê barê xwe li ser pişta xwe hilgirin. Bêguman ewa ku ew
hildigrin nebaşe! 32 Jiyana ev dinyayê xêncî leyizê û hişbelaviyê tiştek dîke nîne,
lê jiboy ewên ku hişyarê Vî ne mala Dawiyê bêhtire. Çima hûn hizira xwe bikar
naynin? 33 Em baş dizanin ku ya ew dibêjin te xemgîn diket. Ew nikoliyê li te
naken, ewên nebaşkar nikoliyê li eva Xwe dê eşkere kiriye diken.



*Her wisa dibêjine ewên ku hevala bo Xwe dê, peyda diken putperest. Moşrik*
a: Xwandin (Quran)
b: Haşa, înkar

[34] Bêguman pêş te da jî nikolî li Peyamberên dîke jî hatibû kirin û lê ew bi
bêhinferehî li hemberî nikoliyê rawestan û zirar geheşte wan taku yarmetiya
Me giheşte wan, kes nikarît gotinên Xwe dê veguherît. Bêguman pêşta hindek
zanyarî li ser peyambera bo te hatiye. [35] Eger nikoliya nebawera jiboy te gelek
dijware, bes eger tu dikarî li bindarêkekê[a] bin erdê da bigerê yanjî li pêlekanê
bo asiman ku bo wan nîşaneyekê bîne, lê eger Xwe dê xwastiba Vî dikarî bo
rênivîniyê hemûya bigehînîte yêk, lewma çi cara yêk li wan nezana nebin.
[36] Tenê ewê ku dibhên dê bersivê biden, sebaret bi miriya jî, Xwe dê, dê wan
vejînît û paşê jiboy bal Vî ew dê bêne zivrandin. [37] Her wisa ew dibêjin, ´Çima
li bal Xwedanê wî ra çi nîşane bo wî nehatine şandin xarê? ´ Bêje, ´Bêguman
Xwe dê şêyana wê heye ku nîşaneyekê bişînîte xarê´ lê piraniya wan nizanin´
[38] Hemû ew rihtiberên li ser erdê û balindeyên ku bi perên xwe difrin, mîna we
civakin. Me hîç tiştek li tomarê da pişt guhê Xwe nehavêtiye û li herî dawiyê da
ew dê bêne kom kirin bo bal Xwedanê xwe. [39] Ewên ku nikoliyê li nîşaneyên
Me diken ker û lalin û li tarîtiyê da ne. Xwe dê dihêlît herkesê ku Ev dixwazît li
rê derkevît û her kesê ku Ev dixwazît dadinête ser rêya rast. [40] Bêje, ´We li
berçav girtiye, eger sizaya Xwe dê, yanjî Demjimêr bête ser we, xêncî Xwe dê
hûn dê gazî ewê dîke biken, eger hûn dê rast bêjin? ´ [41] Belê birastî, hûn dê gazî
Vî biken, eger daxwaza Vî bît, Ev dikarît wêda bibet ewa ku bûye hokar jibo
gazî kirina we û paşê jî hûn dê bîra xwe biben ewa ku hûn niha dikene ´hevalê´
Vî. [42] Me pêş te da jiboy netewên dîke jî şandine[b] û Me bi dijwarî û hejariyê li
wan da, belke li ber hindê, ew xwe ûstîxar biken. [43] Bes çima dema ku sizaya
Me hate ser wan, ewan xwe ûstîxar nekir? Lê, dilê wan req bû û şeytan kiryarên
wan li pêş çavê wan balkêş kirin. [44] Lewma dema ku wan, ev bîreweriya ku
vergirtibûn li bîr kirin, Me deriyê hemû tişta li ser ewan da vekir. Taku paşê
ewan, li naw ewa ku bi wan hatibû dan, şadî kir. Me nişkida li wan da û ew
bêhêvî man.[45] Ew netewên nebaşkar, hatine li nav birin, pesn bo Xwe dê bît
Xwedanê hemû dinyaya! [46] Bêje ´Li berçav bigrin, eger Xwe dê bihîstin û
dîtina we la biriba û dilê we jî pêça ba, xêncî Xwe dê, dê kîjan xwedêyî karîba
ewan jiboy we bizvrînît? ´Lê binêrin ku Em çawa, bi rêbazên cuda, eşkereyên
Xwe şirove diken, hêşta jî ew pişta xwe didenê. [47] Bêje, ´Li berçav bigrin, eger
nişkida sizayê Xwe dê bête ser we, yanjî hegera wê hebît, meger xêncî neteweya
nebaşkar dê kesek dîke li nav biçît? ´ [48] Me tenê peyamber şandin ku mizgîniyê
û agahdariyê biden, lewma ewên ku bawer diken û xwe serast diken, bo wan çi
tirs çinabît, nejî ew dê xemgîn bin.



a: Tonêl.
b: Peyamberên pêş Mihemd peyamber da şandine!

[49] Sebaret bi ewên ku nikolî li nîşaneyên Me kirin, li ber xatira hindê ku ew bi
pêdagirî serkêş bûn ew dê bêne eşkence kirin. [50] Bêje, ´Ez nabêjim xizîneyên
Xwe dê li bal minin, nejî ez ewa nedîtî dizanim, nejî ez dibêjime we ku ez firişte
me, ez tenê peyrevî li eva ku bo min eşkere bûye dikem. ´ Bêje, ´Meger kore
wekheve digel ewê ku dibînît ?´ Çima hûn hizir lê naken ?´ [51] Pê evê agahdariyê
bide ewên ku ditirsin, ku dê bêne kom kirin bo pêşya Xwedanê xwe, ewan kes
çinabît bes Ev nebît ku wan biparêzît û kes jî nikarît bo wan nawbêjvaniyê biket,
belke liber hindê ew hişyar bin. [52] Ewên ku sibê û êvariya gazî Xwedanê xwe
diken û ewên ku bes li rûmetê Vî digerên li xwe dûr neke, ne Tu jibo hîç yêk li
kiryarê wan berpirsyarî, nejî ew bo hîç yêk li kiryarên te berpirsyarin, eger tu
wan li xwe dûr bikey[a], tu jî dê bibiye yêk li wan nebaşkara. [53] Bi wî şêweyî Me
hindek li wan pê ewên dîke taqî kirîne, belke nebawer bêjin, ´Ewane, ev mirovin
ku Xwe dê li naw me da qencî li wan kiriye? ´ Meger Xwe dê bêhtir nizanît ku
ewên sipasdar kêne? ´ [54] Dema ewên ku bawerî bi eşkereyên Me diken têne bal te
bêje ´Aştî li ser we bît. Xwedanê we Xwe erkdar kiriye ku birehm bît, eger her
yêk li we bi nezanî kiryarek nebaş kirbît û paşê peşîman bibît û rêya xwe serast
kirbît, bes Ev Lêbihore û Rehmê didet. ´ [55] Bi wê rêbazê Em eşkereya şirove
diken ku rêbaza tawankara aşkira bît. [56] Bêje, ´Li min qedexeye ku xêncî
Xwe dê ez biperestim, ewên ku hûn li kêleka Vî da gazî wan diken ´ Bêje, ´Ez
peyrevî li hestên we nakem, jiber ku ez dê li rê derkevim û ez li wan nabim ku
hatine rênivînî kirin.´ [57] Bêje, ´Ez li ser belgeyên zelal li bal Xwedanê xwe we
radwestim, herçend ku hûn nikoliyê lê diken. Eva hûn lêdigerên bilezînin[b] min
çinîne. Dadwerî tenê bo Xwe dê ye, Ev rastiyê dibêjît û Ev baştrîn dadwere.´
[58] Bêje, ´Eger ewa hûn lêdigerên ku bilezînin li bal min ba, dê dadwerî li ser ew
mijara li nawbera min û we da hatiba kirin, lê Xwe dê baş dizane kê
nerastkare.´ [59] kilîlên ewa nedîtî li bal Vî ne, kes wan nizanît bes Ev nebît. Ev
dizanît çi li ser erdê û deryayê daye. Bêy zanista Vî hîç pelgek naweriyêt nejî
tenê dindikek di tarîtiya erdê da heye nejî her tiştek ter bît yan hişik bûyî, ku li
tomarek zelal da nebît.[60] Ev e ku di şevê da we dibet, dizanît ku we li rojê da çi
kiriye û carek dîke we radiket, taku dema we ya dîhar kirî tejî dibît. Paşê jibo bal
Vî ye ku hûn dê vegerên û Ev dê we agahdar biket ku we çi dikir. [61] Ev serwerê
herî bilinde li ser koleyên Xwe da. Ev parêzvana dişînîte ser we taku dema mirin
tête ser her yêk li we, peyamberên me ew diben, ew lê nakevin[c].



a: Mebest mirovên hejar û belengaze, hindek nebawera pirsgrêkek gelek mezin digel wê hebû ku mirovên hejar û belengaz li dora Mihemed peyamber kom bûne û bawerî pê kirîne.
b: Roja vejiyanê, sizaya Xwe dê, mirovên nebawer hemû gavê daxwaz li peyambera dikirin ku sizaya Xwe dê bînîte ser wan. c: Peyamberê Xwe dê mirov di mirinê da diben! Ew li wê kiryarê waz naynin û ew erkê xwe bicih tînin!

[62] Paşê dê hemû bêne vegerandin bo bal Xwe dê, Xwedanê wan yê rastî.
Bêguman dadwerî ya Vî ye û Ev bi leztrîne li hisab danê da. [63] Bêje, ´Ev kêye we
li tarîtiya li ser erdê û derya yê da diparêzît, dema ku hûn bi ûstîxarî û nihênî
gazî Vî diken ´Eger Ev me li wê rizgar ket, bêguman em dê li sipasdara bin?´
[64] Bêje, ´Xwe dê we rizgar diket li ewê û hemû tengasiya, hêşta jî hûn ewên dîke
li kêleka Vî da diperestin.´ [65] Bêje, ´Vî hêz heye ku li jorî yanjî li jêrî sizayê
bişînîte ser we yanjî li bin pêyê we da yanjî we par vekete li ser aliyên xwedan
nakokî û wisa li hindeka biket ku tama tundûtîjî ya ewên dîke bikêşin.´ Lêbinêrin
Em çawa bi rêbazên curbicur eşkereyên Xwe şirove diken, jiboy ku hûn
têbigehin, [66] lê mirovino hêşta jî hûn nikoliyê lê diken, tenant ku ev rastiye jî.
Bêje, ´Ez parêzerê we nînim.´ [67] Her nûçeyekê dema xwe ya dîhar kirî heye ku
dê bête cî, hûn dê evê bizanin. [68] Dema hûn rastî ew mirova tên ku bi henek
sebaret bi eşkereyên Me dipeyvin, piştа xwe bidene ewan taku ew basê mijarek
dîke diken. Eger Şeytan bîra we bibet, bes dema hate bîra we, digel ewên ku ewa
nerast diken nerûnên. [69] Ewên ku hişyarê Vî ne bi hîç şêweyekê bo ewên dîke
nayên berpirsyar kirin, tenê erkê wan ewe ku bînine bîra wan, belke liber hindê
ew hişyarê Vî bimînin. [70] Bihêle ewên ku dînê xwe tenê weke leyiz û hişbelawî
vergirtine û pê jiyana ev dinyayê hatine lêbandin pê evê bîne bîra wan, bila hîç
rihek liber xatira ewa dest xwe êxistî, bêpayan neyête siza dan, li xêncî Xwe dê
we kes çinabît ku we biparêzît û nawbêjvaniyê jî biket, her tiştekê jî ew di şûn da
pêşkêş biken jî, ew nayête pejirandin. Ewane ewin ku li ber xatira destkevtên
xwe, dê li nav biçin, ewan bo vexwarinê dê ava kelandî û eşkenceyek bijan hebît,
çimkî ewan bawer nedikir. [71] Bêje, ´Dibya li cihê Xwe dê, da em bangê ewê
biken ku ne çi qazancê digehînîte me û nejî çi zirarê? Û piştî ku Xwe dê em
rênivînî kirîne dibya em li ser paniya xwe we bizvrin, weka kesekê gêj buyî ku
şeytana bo naw çolê han dabît, herçend ku hevalên wî bo rênivîniyê gazî wî
biken ´Were bal me?´ Bêje, ´Rênivînî ya Xwe dê ye. Ferman li me hatiye kirin
ku em xwe radestî Xwedanê hemû dinyaya biken [72] û nûbêja biken û hişyarê Vî
bin.´ Bo bal Vî ye ku hûn dê hemû bêne kom kirin. [73] Ev e afirînerê asimana û
erdê bo rastiyê. Di ew roja ku Ev dibêjît ´Bibe´ ev heye, peyva Vî raste. Di ew
Roja ku zirna[a] tê jenîn, Padişahî ya Vî ye. Ev ya nedîtî û eva dîtî dizanît, Ev
dadwerê agahdare.



a: Mizgîniya Roja Vejiyanê, dengek gelek bilinde! Di zimanê erebî da peyva sûr jiboy ew dengê bilind bikar hatiye, alawek weke zirnayê, lewma min peyva zirna bikar înaye!

74 Dema Ibrahîm gote A zer ê babê xwe, ´Çawa tu dikarî puta weke Xwe dê
vergrî´? Ez dibînim tu û netewa xwe bi zelalî li rê derketine.´ 75 Aha wisa Me
Padişahiya li ser asimana û erdê nîşanî Ibrahîm da ku ew bibîte yêk li wan ku
arxaîne[a]. 76 Dema ku tarîtiyê xwe ser wî da pêça, ew stêrkek dît û got, ´Eve
xwedanê mine,´ Lê dema ew ava bû, wî got, ´Ez hez ewên ku ava dibin nakem
77 û dema ew dît ku hevy hilat wî got, ´Eve xwedanê mine´ Lê dema ew jî ava
bû, wî got,´Eger Xwedanê min, min rênivînî neket, ez jî dê li naw ew mirova da
bim ku li rê derketine.´ 78 Paşê wî dît roj helat û got, ´Eve xwedanê mine! Eve
gelek mezintire.´ Lê dema ew jî ava bû, wî got, ´Netewa min, ez xwe li hemû
ewa ku hûn li tenişt Vî da diperestin, diparêzim.
79 Birastî min rûyê xwe zivrandiye bo aliyê Ev ê ku afirînerê asimana û erdê ye.
Yêkta perestek rastînim, ez yêk li wan nînim ku hevala jiboy Vî peyda diken. ´
80 Netewa wî digel wî da gengeşe kirin û wî got,´Hûn çawa dikarin sebaret bi
Xwe dê digel min gengeşê biken dema ku Vî ez rênivînî kirîme? Ez li hîç tiştekê
natirsim ku hûn dikene ´hevalê´ Vî, meger Xwedanê min tişteke dîke bixwazît,
Xwedanê min hemû tiştê di zanistê da dorpêç diket. Hûn çawa na înine bîra
xwe? 81 Çima dibya ez bitrsim li ewa hûn dikene ´hevalê´ Vî? Çima hûn natirsin,
hûn ew tiştên ku Vî çi desthilt bo wan neşandiye dikene ´hevalê´ Vî? Eger hûn
dizanin kê li her du aliya zêdetir maf heye ku hest bi tenahiyê biket? 82 Ewên ku
bawerî hene û baweriya xwe têklî nerastiyê naken, ewan dê tenahî hebît û ewin
ku hatine rênivînî kirin.´ 83 Wisa bû ev gengeşeya ku Me daye Ibrahîm li dijî gelê
wî, Her kesê ku Em dixwazin Em pileya wan bilind diken, Xwedanê we dadwerê
zana ye. 84 Me Ishaq û Yeqûb dane wî û Me ew rênivînî kirin, her wek Me pêşta
Nûh jî rênivînî kirbû û di naw ocaxa[b] wî da jî Dawûd, Silêman, Eyûb, Yûsif,
Mûsa û Harûn – aha wisa, Em padaş didene ewên ku karê baş diken.85 Zekerya,
Yehya, Îsa û Ilyas jî, ew hemû durustkar bûn 86 Ismaîl, Elîsa, Yûnis û Lat jî. Me
li serwey mirovên dîke qencî li wan jî kir 87 û li naw bab û bapîrên wan, ocaxa
wan û birayên wan da Me ew hilbijartin û rênivînî kirine ser rêyek rast. 88 Ewe
rênivîniya Xwe dê ye, pê evê rênivînî diket her yêk li koleyên Xwe ku Ev
dixwazît. Eger wan ewên dîke kirbana ´hevalên´ Vî, dê hemû kiryarên wan yê
pêşta pûç biban. 89 Ewane ewin ku Me nivîsîna pîroz, têgeheştin û pêşbînî daye
wan. Tenanet eger ew bawerî pê naken jî, Me eve sipartiye ew mirova ku
nebawer nînin. 90 Ewane li wanin ku Xwe dê rênivînî kirine. Lewma peyrevî li
rênivîniya ewan bike. Bêje, ´Ez jibo evê daxwaza çi padaşa li we nakem, Xêncî
bîr anînekê jiboy mirova eve tiştek dîke nîne. ´



a: Piştrast, emîn b: Nevî, paşketî

91 Ewan çi tê girtinek li pîvana rast ya Xwe dê nîne. Dema ew dibêjin, ´Xwe dê
çi tiştek bo ewê ku dê bimrît neşandiye xarê.´Bêje, ´Ev kê bû ku nivîsîna pîroz
şande xarê, eva ku Mûsa weke ronahî û rênivînîyek bo mirova îna, eva ku we
kire perên cuda, hindek aşkira kir û gelek lê veşart, hûn fêrî evê kirin ku we
nedizanî, nejî bab û bapîrên we zanîbûn?´ Bêje ´Xwe dê!´ Paşê lêbigerê bila ew
di peyvîna xwe ya bêkêr da mijûl bimînin. 92 Eve nivîsîna pîroze ku Me şandiye
xarê bo erênî kirina eva pêş evê da hatiye û jibo te ku pê dayka Gunda[a] û hemû
derdora wê agahdar bikey. Ewên ku bawerî bi Dawiyê diken, bawerî pê diken û
nûbêja diken. 93 Kê dikarît li ew kes nebaştir bît ku direwekê li dijî Xwe dê
berhem tînît, yanjî dibêjît, ´Eşkereyek bo min hatiye´ Dema ku çi eşkere bo wî
nehatine şandine xarê, yanjî ewê dibêjît, ´Ez jî dikarim tiştekê wekhev ya
eşkereya Xwe dê eşkere bikem´ Eger te karîba jana di êşa mirina ewan da
bibînî, dema ku firişte destê xwe dirêjî ewan diken ´Rihên xwe bînine der. Îro
sizayek serşorker dê bi we bête dan, ber xatira gotina tiştên derew sebaret bi
Xwe dê û nikolî kirin li eşkereyên Vî û xwe mezin kirinê ´ 94 Niha tu tenê hatî
bal Me, weka cara yêkê Me tu afirandî, hemû tiştê ku Me dabû te, te li paş xwe
we hêlaye, Em nawbêjvanê te digel te da nabînin ku te digot ew ´hevalên´ Vî ne.
Nawbera we qetiyaye û ewên ku te digotin li te bezir bûne.´ 95 Ev Xwe dê ye ku
tov û dindika meyve ker vediket, Ev zindî li mirî tînîte der û mirî li yê zindî – Ev
Xwe dê ye – ewe çawa hûn hatine xapandin? 96 Ev serê sibê dipişkivînît, Ev şev
bo bêhn vedanê çêkiriye û roj û heyv bo pîvanê, eweye darêjandina Ev ê Bihêz û
Zana. 97 Ev e ku sitêr çêkirîne ku di tarîtiyê da, li ser hişkatî û deryayê hûn bi
wan bêne rênivînî kirin, bêguman Me nîşanî şirove kirîne, jibo mirovên ku
dizanin. 98 Ev e ku li rihekê tu dahînay, herwisa cihê jiyan û bêhin vedana te jî,
bêguman Me nîşane şirove kirin jiboy ew mirovên ku têdigehin. 99 Ev e ku avê li
asiman dişîne xarê. Pê wê, Em hemû tiştekê çilû diden, paşê jî şînahiyê lê
dertêxin û li wê jî, dexil û danên tejî, di rêzên nêzîk da ku li ser pişta ewê dîke
siwar bûyî dertêxin. Li dara xurmê jî ûşiyên nizmê daliqandiyê xurmê tên û
rezên tirî, baxên zeytûna û hinara jî hene, rengê hev diden lê ciyawazin. Li
meyweyên wan binhêrin dema ku ew meyve diden û digehinê! Birastî li ewê da,
bo ew netewa ku bawer diket nîşane hene. 100 Lê ewan Cin kirîne ´hevalên´
Xwe dê, her çend ku Vî, ew afirandine û bêy hîç çeşne zanistek rast, ew kur û
kiça bi Vî we girê diden. Ev gelek li wê bilindtire ku ew bi Vî we girê diden,
101 dahênerê asimana û erdê! Çawa Ev dikarît xwedan zarûk bît, dema ku Vî
hevjîn nîne û Vî hemû tişt afirandine? Vî zanista li ser hemû tişta heye! 102 Eve
Xwe dê ye Xwedanê te, xêncî Vî çi xwedêyê dîke nînin, afrînerê hemû tişta,
lewma Vî bipereste, Ev parêzerê hemû tişta ye.



a: Şarê Mekê

[103] Çi dîtin nikarin Ev vergirin, lê Ev dîtina verdigrît, Ev Nazik û Agahdare.
[104] Li bal Xwedanê we ra bo we ronakbîrî hatiye, eger her kesek bibînît, jiboy
riha xwe dibînît, her kesek koreyê vê bît, eve li dijî wî ye û ´Ez parêzvanê we
nînim´ [105] Ahan wisa Em eşkereyên Xwe bi rêbazên cûda şirove diken, lewma
ew dibêjin, ´Te[a] xwandiye´ liber hindê Em evê jiboy ew netewa ku dizanin zelal
diken. [106] Peyrevî li evê bike ku li bal Xwedanê te ra jibo te eşkere bûye, çi xwedê
nînin, bes Ev nebît. Pişta xwe bide wan ku ewên dîke dikene ´hevalê´ Vî. [107] Eger
bi xwastina Xwe dê ba ewan heval bo Vî peyda nedkirin û Me tu nekirî
parêzvanê wan, nejî tu parêzerê ewanî.
[108] Bêrêziyê bi ewên ku ew li kêleka Xwe dê, da gazî wan diken neke! Bila ew jî
ber xatira dijminatiyê û bi nezanî bêrêziyê bi Xwe dê neken. Lemwa Me
kiryarên her civakekê li pêş çavê wan xemilandine, paşê ew dê vegerêne bal
Xwedanê xwe û Ev dê wan agahdar ket ku wan çi dikir.[109] Ew bi Xwe dê sûnd
dixwen bi sûnda xwe ya herî mezin, eger bo wan jî nîşaneyek bêt, bêguman ew jî
dê bawerî pê biken. Bêje ´Nîşane tenê li bal Xwe dê ne´ Çi tiştek dê we
têbigehînît, eger nîşaneyek jî bêt, ew bawer naken. [110] Em dê çav û dilê wan
wêda bizvrînin, her wek cara yêkê ku wan bawerî pê nekir û bihêlin ew li
serhildana xwe da kore bigerên. [111] Tenanet Em firişta jî bo wan bişînine xarê û
mirî jî digel wan bipeyvin û Me hemû tişt kom kirbana pêşya wan jî, dîsa jî wan
bawer nedikr, meger Xwe dê bixwazît lê piranîya wan nezanin.
[112] Aha wisa, Me jibo her Pêşbînekê dijminek dest nîşan kirye, mirovek şeytan û
cinek şeytan. Hindek li wan peyvên balkêş pêşniyarî ewên dîke diken ku bikarin
bilêbînin, eger ew daxwaza Xwedanê te ba, ewan venedikir, ber wê hindê waz li
wan û dahênanê wan bîne [113] lewma dilê ewên ku bawerî bi Dawiyê naken, dê
biçîtê û belke li ber hindê ew pê keyfxweş bin û her tiştê ku ew diken, ew jî
biken.[114] ´Dibît ez xêncî Xwe dê li çi dadwerên dîke bigerêm, dema ku Ev jiboy
we nivîsîna pîroz, bi zelalî şirove kirî şandiye xarê? Ewên ku Me pêşta nivîsîna
pîroz daye wan dizanin ku Xwedanê we, eve bi rastiyê şandiye xarê, liber hindê,
nebe yêk li wan ku gumanê diken.[115] Peyva Xwedanê te di rastî û dadperweriyê
da hatiye cih. Kes nikarît peyvên Vî veguherît, Ev Bihîstine Zanîne. [116] Eger tu
peyrevî li piraniya ewên ser erdê bikey, ew dê te li rêya Xwe dê, da derêxin,
xêncî texmîna, ew peyrevî li çi tiştê dîke naken, xêncî direwa jî ew çi tiştê dîke
nabêjin. [117] Birastî Xwedanê te bêhtir dizane kê li rêya Vî derdikevît û Ev bêhtir
dizane, kê rênivînî kiriye. [118] Liber wê hindê, ewa ku navê Xwe dê li ser da
hatibe gotin bixwen, eger hûn bawerî bi eşkereyên Vî diken.



a: Mihemed peyamber

[119] Çima hûn ewa ku navê Xwe dê li ser da hatiye gotin naxwen, dema ku Vî
pêşta bo we şirove kirye ka Vî çi li we qedexe kirye, xêncî ewa ku hûn neçar
man? Lê piraniya wan, bêy ku hîç zanistek hebin, pê hestê xwe, ewên dîke li rê
dertêxin, Xwedanê we ewên ku sînora dibezînin bêhtir nas diket.
[120] Xwe li guneh kirinê biparêzin, çi bi aşkira çi bi nihênî, çimkî ewên ku guneh
dest xwe êxistine, dê liber xatira ewa ku kirbûn, dê bêne siza dan [121] û ewa ku
navê Xwe dê li ser da nehatibîte gotin nexwen! Çimkî ew serkêşiyek gelek
mezine. Birastî ew Şeytanin ku peyrevên xwe han diden ku digel te gengeşê
biken, eger tu peyreviyê li wan bikey tu jî dê ´hevala´ jiboy Vî peyda bikey.
[122] Meger ewê ku mirî bû û Me vejand û ronahî dayê da ku pê li naw mirova da
bigerêt wekheve digel ewê ku li taritiyê da asê maye û çi cara têda dernakevît?
Lewma, kiryarên nebawera li pêş çavê wan hatibûne xemilandin [123] û li ber
hindê Me tawankarên herî mezin danane naw hemû gundekê ku bername
rêjiyên xwe li wêderê da biken, ew tenê bername rêjiya li dijî riha xwe diken, lê
ew tênagehin. [124] Dema ku nîşaneyek bo wan têt, ew dibêjin ´Em çi cara bawer
naken, taku nîşaneyek weka ku bi peyamberên Xwe dê hatibû dan bi me jî bête
dan´ Lê Xwe dê bêhtir dizane ku eşkereya Xwe danête kîderê, liber xatira
bername rêjiyên wan, dê serşorî li hemberî Xwe dê da û eşkenceyeke dijwar, dê
bête serê tawankara. [125] Dema Xwe dê bixwazît kesekê rênivînî biket, Ev singê
wan bo xwe radest kirina Vî vediket[a], her kesê Ev dixwazît li rê derêxît, Ev singê
wan qahîm dimçît weka ku ew hil dikêşne bo asima. Bi wî awayî ye ku Xwe dê
qirêjê didanête ser ewên ku bawera naken. [126] Ewe rêya Xwedanê te ya rast e,
Me eşkereyên Xwe jiboy ewên ku bîr tînin şirove kirîne. [127] Ewan dê li bal
Xwedanê xwe, mala aştiyê hebît û weke padaş jibo kiryarên wan, Ev dê li wan
hişyar bît [128] Ew Roja ku Ev hemûya kom dikete ser hevdu ´Koma cina! We
gelek mirov hene!´ Hevalên wan li naw mirova da dê bêjin, ´Xwedanê me,
hindek li me li ewên dîke behre biriye, lê niha em giheştine ew dema ku Te bo
me dîhar kirbû.´ Ev dê bêjît, ´Mangeha we agire û ta bêdawiyê hûn dê li wêderê
bimînin´ Meger Xwe dê cûrek dîke bixwezît, Xwedanê te Dadwere Zanaye!
[129] Li ber xatira ewa ku wan bi destê xwe êxistibû, Em hindek nebaşkara dikene
hevalê ewên dîke. [130] ´Koma cin û mirovan! Meger li naw we da peyamber
nehatin ku eşkereyên Min bo we bixwînin û we agahdar biken ku hûn dê ew
Roja xwe bibînin? Ew dê bêjin, ´Em li dijî riha xwe gewahiyê diden.´ Jiyana ev
dinyayê ew li rê derêxistin û ew dê li dijî riha xwe gewahiyê biden ku ew
nebawer bûn. [131] Lewma Xwedanê we li ber nebaşkariyê bajêra wêran naket,
eger şêniyên wê agahdar nebin. [132] Her kesekê pêka kiryarên xwe pileyek heye,
Xwedanê we bê agah nîne li her tiştê ew diken.



a: Îslam

133 Xwedanê we çi pêvîstî nînin û rehm heye. Eger Vî xwastiba, Ev dikarî we li holê raket û ewên dîke danête cihê we. Her wekû Vî, hûn li zarûkên mirovên dîke berhem înan. 134 Bêguman ewa belêniya wê bi we hatiye dan, dê bêt û hûn nikarin lê birevin. 135 Bêje, ´Netewa min, bo cihê xwe kar biken, birastî ez karkerim, hûn dê zû bizanin kanê kê li dawiyê da dê bixwe malek hebît.´ Birastî ewên nebaşkar sernakevin. 136 Ew pişkekê li berhem û ajelên ku Vî afirandine bo Xwe dê par wediken û dibêjin ´Ewe bo Xwe dê ye´ Ew gotina wane! ´Û ewe jî bo hevalên me.´ Pişka hevalên wan nagehîte Xwe dê, lê pişka Xwe dê digehîte hevalên wan, ew çend nebaş dadweriyê diken! 137 Her wisa, hevalên wan, pêş çavê gelek putperesta ciwan kiriye ku zarûkên xwe bikujin, jiboy ku wêraniyê bînine serê wan û ewan di dînê wan da gêj ken, eger Xwe dê xwastiba ewan wisa nedikir, liber wê hindê waz li wan û ewa ku wan berhem înaye bîne,
138 û ew dibêjin, ´Ew ajel û berhem qedexene û tenê ewên ku em dihêlin dê bikarin bixwen´ Pêka gotina wan! Hindek ajel hene ku wan li şol kirinê azad kirîne û hindek dîke jî ew navê Xwe dê li ser wan da nabêjin[a], Direwe, li dijî Vî. Ev dê wan siza bidet, ber xatira ewa ku wan berhem tîna 139 û ew dibêjin, ´Ewa di zikê wan ajela daye tenê bo nêrên me ye û ew li jinên me qedexeye, lê eger ew mirî ye[b] ewan dê pişkek lê hebît.´ Ev dê wan siza bidet jibo ewa ku ew bi Vî we girê diden, Ev Dadwere Zanaye. 140 Bêguman ew dê bidorînin, ewên ku li ber gêjî û bêy zanistê zarûkên xwe dikujin û qedexe diken ewa ku Xwe dê jiboy wan qanûnî kiriye û sebaret bi Xwe dê direwa berhem tînin, ew dûr li rê derketine û ew nehatibûne rênivînî kirin. 141 Ev e ku baxçeyên perêzdayî û bê parêz berhem tînît, darê xorma, çandina xwarinên ciyawaz, zeytûn, hinar, wekhev û ciyawaz. Ber wê hindê dema ew meyve digrin, hindekê lê bixwe û di roja çinînê da deynê wê biden, lê zêderewiyê[c] neken, Xwe dê hez mirovên zêderew naket 142 û ajelên ku diçerin û bara hildigrin û ewên biçûktir jî, li ewa ku Xwe dê jiboy we dabîn kiriye bixwen û şûn pêyê Şeytan neşopînin, ew bi aşkira dijminê we ye. 143 Heşt cot, li peza du û li bizina du, bêje ´Meger Vî qedexe kiriye, her duyên nêr yanjî her duyên mê, yanjî ewa di zikê her du mê ya da? Pê zanistê min agahdar biken, eger hûn rastiyê dibêjin.´ 144 Û li hêştira du û li çêla jî du, Bêje ´Meger Vî qedexe kirye her duyên nêr, her duyên mê, yanjî ewa di zikê her du mê ya da? Yanjî tu gewah bûy dema Xwe dê ew fermane dane te? Bes, kê li ew nebaştire, ewê ku bê zanist li dijî Xwe dê direwa berhem tînît ku pê mirova li rê bibete der?
Birastî Xwe dê mirovên nebaşkar rênivînî naket.´



a: Dema ew ajela ser jê diken navê Xwe dê li ser da nabêjin.
b: Eger ew zarûkê di zikê wan ajela da miriye.
c: Peywa Mesref bikar hatiye, min bi Kurî ew kiriye zêderewî! Xisar kirin, bêşol bikar înan.

145 Bêje, ´Li eva ku bo min eşkere bûye, ez çi tiştekê nabînim ku bo xwarinê
qedexekirî bît, xêncî ewa mirar bûyî, xwîna diherkît, goştê beraz ku birastî ew
pîse, yanjî qurbanîyek guneh ku li ser da her navek xêncî navê Xwe dê hatibîte
gotin.´ Lê eger li ber neçariyê, zor bo kesekê bêt, nek li ber daxwaz yanjî zêde
gaviyê, bes Xwedanê we lêbihore û birehme. 146 Me li Cihû ya qedexe kir hemû
ajelên ku çeng hene û dohnê çêl û pez jî li wan qedexe kir, xêncî ewa ku li ser
pişta wane yanjî di riwyê wan daye, yanjî ewa ku bi hêstikê wan we dizeliqît, bi
wî awayî li ber serhildana wan Me ew siza dan. Bêguman Em rast dibêjin.
147 Eger ew nikoliyê li te biken, bêje ´Xwedanê we Xwedanê rehma berferehe, lê
pêşgiriya sizaya Vî bo ser mirovên tawankar nayête kirin.´ 148 Ewên ku hevala bo
Vî peyda diken dê bêjin, ´Eger Xwe dê xwastiba me heval bo Vî ne didanan,
nejî bab û bapîrên me, nejî me dê çi tiştek qedexe kiriba.´ Her wisa, ewên pêş
wan da jî nikolî kirin taku ewan eşkenceya Me tam kirin. Bêje, ´We çi zanistek
heye ku hûn bo me derêxin? Hûn tenê peyrevî li texmîna diken û hûn tenê
direwa dibêjin.´ 149 Bêje, ´Gengeşeya tewawker tenê ya Xwe dê ye. Eger Vî wisa
xwastiba, Ev dê hûn hemû rênivînî kirban.´ 150 Bêje, ´Gewahê xwe bînin, bila
gewahiyê biden ku Xwe dê ewe qedexe kiriye.´ Eger ew gewahiyê biden, digel
wan gewahiyê nede. Peyrevî li hestê ewên ku nikolî li eşkereyên Me kirîne neken,
û ewên ku bawerî bi Dawiyê naken û dema ku wekheva jiboy Xwedanê xwe
peyda diken. 151 Bêje, ´Werin! Ez dê bêjme we ku Xwedanê we çi li we qedexe
kiriye. Çi tişta neke ´hevalê´ Vî, bo dayk û babê xwe baş bin, li ber hejariyê
zarûkê xwe nekujin ´ Em dê bo we û bo wan jî dabîn biken ´ Li bêrewiştiyê nêzîk
nebin, çi bi aşkira yanjî bi nihênî, rihê nekujin, ewa ku Xwe dê qedexe kirye,
tenê bi mafdarî nebît. Eweye ku Ev fermanê li we diket hûn biken, belke liber
hindê hûn hizra xwe bikar bînin.´ 152 Nêzîk malê sêwiya nebin, meger we baştrîn
mebest hebît, taku ew pê digehît, pêka dadperweriyê bi pîvan û kêşana tewaw
biden´ Em barê zêde li hîç rihekê naken ku nekarin hilgirin ´Dema hûn
dipeyvin, dadperwer bin, eger xizmê nêzîkê we jî bît, peymana Xwe dê bicih
bînin. Eveye, eva ku Ev fermanê li we diket hûn biken, belke li ber hindê bête
bîra we.´
153 Eve rêya Min ya raste, lewma bişopîne û rêyên dîke neşopîne, çimkî hûn dê li
rêya Vî derkevin ´ Eveye, eva ku Ev fermanê li we diket ku hûn biken, belke li
ber hindê hûn hişyar bin. 154 Paşê Me nivîsîna pîroza tewaw da Mûsa, jibo ewên
ku karê baş diken, hemû tişt bi zelalî şirove kir û weke rênivînî û rehm, bi wî
awayî belke li ber hindê ew bawer bi civîna digel Xwedanê xwe biken.

[155] Eve jî nivîsîneke pîroze ku Me şandiye xarê, peyreviyê lê biken û hişyarê Vî
bin, belke li ber hindê hûn rehmê vergirin [156] neket hûn bêjin, ´Pêş me da,
nivîsîna pîroz tenê bo du koma hatibû şandine xarê, lê me hajê nebû ku wan
perwerda çi dîtibû´ [157] yanjî neket hûn bêjin, ´Eger tenê nivîsîna pîroz bo me
hatiba şandine xarê, em dê li wan bêhtir hatibana rênivînî kirin.´ Lewma li bal
Xwedanê we ra, belgeyên zelal, rênivînî û rehm bo we hatiye. Bes kê dikarît li
ew kes nerastir bît ewê ku nikoliyê li eşkereyên Xwe dê diket û pişta xwe didete
wan? Em dê ewên ku pişta xwe didene eşkereyên Me bi eşkenceyek bijan siza
biden. Çimkî ewan pişta xwe didayê. [158] Meger ew çavnihêrin ku firişte bêne bal
wan yanjî Xwedanê we bêt, yanjî hindek li nîşaniyên Xwedanê we? Ew Roja ku
hindek nîşaneyên Xwedanê we bên, çi rih li baweriya xwe qazancê naken, eger
ewan pêşta bawer nekirbin, yanjî li rêya baweriya xwe we çi başî dest xwe we
nexistibin. Bêje, ´Çavnihêr bin, birastî em jî çavnihêrin.´ [159] Ewên ku dînê xwe
dabeş kirîne û bûyne mezheb, te çi tişt digel wan nebît. Doza wan tenê li bal
Xwe dê ye, paşê Ev dê wan agahdar biket ku ewan çi dikir. [160] Her kesê bi
kiryarek baş bêt[a] dê deh cara, hemberanê wê bidenê, lê her kesê bi kiryarekê
nebaş bêt, dê tenê hemberanê wê bidenê û nerastî li wan nayête kirin.
[161] Bêje, ´Xwedanê min ez rênivîniyê rêyek rast û dînek serast kirîme. Baweriya
Ibrahîmê yêktaperest. Ew li wan nebû ku ´heval´ jiboy Vî peyda dikirin.´
[162] Bêje, ´Nûbêjên min û rê û resmên qurbaniyên min, jiyan û mirina min, hemû
bo Xwe dê ne, Xwedanê hemû dinyaya [163] Ev çi ´heval´ nînin, eweye ev
fermana li min hatiye kirin û ez ewê yêkemînim ku xwe radestî Vî bikem.
[164] Bêje, ´Dibya ez xêncî Xwe dê li xwedanek dîke bigerêm, dema ku Ev
Xwedanê hemû tişta ye?´ Xêncî ewa li dijî xwe[b], hîç rihek tişteke dîke dest xwe
we naynît, çi barhilgirek barê barhilgrek dîke hilnagrît. Paşê, vegera we bo bal
Xwedanê we ye û sebaret bi ew tiştên ku we li ser da ciyawazî hebû, Ev dê bêjîte
we. [165] Ev e ku hûn li ser erdê kirîne cêgir û pileya hindek li we li ewên dîke
bilindtir diket ku li rêya ew tiştên ku Vî dayne we, we taqî biket. Xwedanê we
lezgîne li siza danê da, lê birastî Ev Lêbihore û Rehmê didet.



a: Basê Roja Vejiyanê ye.
b: Ewa mirov bidestê xwe kirî.

## 7. Para Bilindiya

Bi navê Xwe dê, Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Alîf Lam Mîm Sad. 2 Nivîsînek pîroz jiboy te hatiye şandin xarê. Bihêle bila liber
xatira vê, çi kelecan di singê te da çinebît ku tu evê jibo agahdarî û bîranîna
bawermenda bikar bînî 3´Peyrevî li eva ku li bal Xwedanê we ra hatiye şandin xarê
biken, li kêlek Vî da peyreviyê li çi ´hevalê´ dîke neken. Kêm tête bîra we!´ 4 Me çend
bajêr wêran kirîne! Sizaya Me li şevê da bo wan hat yanjî dema ku li piştî nîvro da ew
razabûn. 5 Dema ku sizaya Me hate ser wan, tenê gotin ´Birastî em nerastkar bûn!´
6 Liber hindê bêguman Em ê pirs biken li ewên ku Me bo wan şandibûn û bêguman
Em dê pirsyarê li peyamberan jî biken 7 û bi zanist, Em dê bêjine wan ku ewan çi
kiribû, çimkî Em hemû demê amade bûn. 8 Di wê Rojê da, dê rast bipîvên, lewma
ewên ku pîvana wan giran bikêşît, ewin ku dê serkevtî bin 9 û ewên ku pîvanên wan
siwikin, ewin ku liber bêdadiya li dijî eşkereyên Me, riha xwe wenda kirîne. 10 Me
hûn li ser erdê damezrandin û debara jiyana we dabîn kir, hûn kêm sipasdarin! 11 Me
hûn afirandin, Me şêwe da we û paşê Me gote firişta, ´Li hember A Dem serê xwe
binvînin û ewan serê xwe nivand, lê Iblîs wenekir, ew yêk li wan nebû ku serê xwe
nivand.
12 Ev got, ´Çi pêşya te girt, li ser nivandinê, dema ku Min ferman li te kirbû?´ Û wî
got, ´Ez li wî bêhtirim, Te ez li agir afirandim û ew li heriyê afirandiye.´
13 Ev got, ´Lêre here xarê!´ Lêre cihek nîne bo xwe qude kirina te. Lewma derkewe!
Tu yêk li ewên siwikî!´ 14 Wî go, ´Ta Roja Vejiyanê derfetê bide min´ 15 Ev got,
´Birastî tu yêk li ewanî ku derfet heye.´ 16 Wî go, ´Çimkî Te ez hawêtime nerastiyê,
bêguman ez dê xwe li ser rêya Te ya rast liber wan hemûya wedem, 17 ez dê li pêşya
wan da û li pişt ewan da bême wan, li aliyê wan yê rastê da û aliyê çepê da û Tu dê
bibînî piraniya wan sipasdar nînin.´ 18 Ev got, ´Têda derkewe! Tu hatî serşor kirin û
hatî derkirin! Ez dê cehnemê bi te û hemû ewên ku li naw ewan da te dişopînin pir
bikem! 19 Lê A Dem, tu û hevjîna xwe, di naw baxçe da bijîn. Hûn herdu her tiştê
hûn hez jê diken bixwen, lê nêzîkê ew darê nebin neka hûn jî dê bibine nerastkar.´
20 Şeytan bi pistepist gote wan, ku şerma wan li ewan derêxîte derê, ku li wan weşartî
bû, wî got, ´Xwedanê we tenê ew dare li we qedexe kirye ku pêşgîriya we biket ku hûn
nebine firişte yanjî nebine nemir´21 Û wî bo ewan sûnd xwar, ´Ez li wanim ku jidil we
şîretê dideme we´ 22 Wî bi direwa ew lêbandin. Dema ku ewan dar tam kirin, şerma
wan li ewan aşkira bû, ewan destpêkir pelgê baxçe pêkwe girê den û li xwe bipêçin.
Xwedanê wan bangî wan kir, ´Meger Min ew dare li we qedexe nekirbû? Meger Min
negote we ku Şeytan bi aşkira dijminê we ye?´ 23 Ewan got, ´Xwedanê me, me nerastî
li riha xwe kirye, eger Tu li me nebihorî û rehmê digel me nekey, em dê li naw ewan
da bin ku dorandine.´ 24 Ev got, ´Herne xarê! Hindek li we dijminê ewên dîke ne. We
dê li ser erdê, bo demekê cihek bo manê û debarek hebît.´ 25 Ev got, ´Hûn dê têda
bijîn, hûn dê têda bimrin û hûn dê lêrê da bêne derxistin.´

26 Zarûkên A Dem, Me cil dayne we ku weke xemil hûn pê şerma xwe weşêrin, lê,
cilên hişyariya Vî bêhtrin, eve li nîşaneyên Xwe dê ye, belke liber hindê bête bîra wan.
27 Zarûkên A Dem, nehêlin Şeytan we han bidet, weka ku wî dayk û babê we li naw
baxçe dane derêxistin, cilê wan li ber wan derêxistin ku şerma wan li ewan aşkira ket,
ew û eşîra xwe, we li wêderê ra dibînin ku hûn wan nabînin, birastî Me ewên şeytan
kirîne hevpeymanê ewên ku bawer naken. 28 Dema bêrewiştiyê diken, ew dibêjin, ´Me
dît ku bab û bapîrên me we dikirin û Xwe dê ferman li me kiriye ku em wê biken.´
Bêje ´Xwe dê fermana bêrewiştiyê naket. Hûn sebaret bi Xwe dê tişta dibêjin ku hûn
nizanin?´ 29 Bêje, ´Xwedanê min fermana dadweriyê diket. Rûyê perestîna xwe rast
bide aliyê Vî, li hemû mizgewta gazî Vî bike, dînê xwe bi tewawî radestî Vî bike´Her
wek ku Vî tu destpêkirî tu dê bizvrî, 30 Vî hindek rênivînî kirîne û hindek jî ku mafê
wane li rê derêxistine, ewan li cihê Xwe dê da, ewên şeytan weke hevpeymanê xwe
hilbijartine, hizir diken ku ew hatine rênivînî kirin. 31 Zarûkên A Dem, li hemû
mizgewta da xwe bixemlînin, bixwen û vexwen lê zêdereviyê neken Ev hez wan naket
ku zêdereviyê diken. 32 Bêje ´kêye xemilandin û xwarina baş ku Xwe dê, bo koleyên
xwe dabîn kirye qedexe kiriye?´ Bêje, ´Ew dê bo ewan bît ku, li ev dinyayê da
bawermendin û li Roja Vejîyanê da jî ew dê bo wan bi tenê bît.´ Bi wî awayî Em
eşkereyên Xwe bo ew netewa ku dizanin şirove diken. 33 Bêje ´Xwedanê min tenê
bêrewiştiyê qedexe diket, çi ew bi aşkira bêne kirin çi weşartî û guneh û tundûtîjî bêy
ku mafê wê hebît û bêy ku Xwe dê jiboy we destûr şandibîte xarê, hûn tişta dikene
´hevalê´ Vî û bêy ku hûn bizanin, hûn sebaret bi Xwe dê tişta dibêjin.´
34 Jiboy her civakekê demek hatiye dîhar kirin, gava ku dema wan têt, ew nikarin
demjimêrekê jî paşve bimînin nejî dê pêşve biben.
35 Zarûkên A Dem, dema ku li naw we da, bo we peyamber tên û eşkereyên Min
dibêjine we, ewên ku hişyarê Vî ne û xwe serast diken, bo wan çi tirs nabît, nejî ew dê
xemgîn bin. 36 Lê ewên ku nikoliyê li eşkereyên Me diken û bi qudeyî lê dinhêrin, ew
hevrêyên naw agir dane û ta bêdawiyê ew dê li wêderê da bimînin. 37 Kê li ew
nerastire ku direwa sebaret bi Xwe dê berhem tînît yanjî nikoliyê li eşkereyên Vî diket?
Ewan ew pişka ku bo wan hatiye ragehandin dê hebin, lê dema ku peyamberên[a] Me
tên ku ewan li mirinê da biben, ew dê bêjin, ´Ka kîwe ne, ewên ku te li kêleka Xwe dê,
da gazî wan dikir?´ Ew dê bêjin, ´Ewan em bêxwedan hêlane.´ Ew dê li dijî riha xwe
gewahiyê biden ku ew nebawer bûn.

a: Firişte, Milyaket

38 Dê bêjît, ´Werne jorê digel netewên cin û mirova ku pêş te da çone naw agiri da.´
Her gava ku neteweyek diçîte jor da ew dê dijûna bidete xweşka[a] xwe, paşê dema ku
hemû netewe kom bûne jorda, ewê herî dawiyê, sebaret bi ewê yêkemîn dê bêjît
´Xwedanê me, ewane bûn ku em li rê birne derê, du qata di naw agiri da sizayê bide
wan ´ Ev dê bêjît, ´Hemûya dê bayê du qata hebît, lê hûn ewê nizanin´
39 Û ewê yêkemîn dê bêjîte yê dawiyê, ´Tu li me qenctir nebûy, tam ke, ew sizayê te
dest xwe we êxistiye.´ 40 Birastî ewên ku nikoliyê li eşkereyên Me diken û li hember
evan da xwe mezin diken,  derwazên asiman bo wan navebît, nejî ew dê bişên biçine
naw baxçe da, taku bendikek histûr jî li kona derziyê da derbaz nebît. Bi wî awayî Em
tawankar siza diden. 41 Cehnem dê bibîte doşek û lihêfa wan. Bi wî awayî, ewên ku
karên nebaş diken Em siza diden.
42 Lê ewên ku bawer diken û karên baş diken û Em hîç rihekê, zêdetir li eva ku bişên
hilgrin bar naken, ew hevrêyên naw baxçe dane û ta bêdawiyê ew dê li wêderê
bimînin. 43 Em dê hemû ew hestên nexweş li singê wan da bimalin, dê li ber pêyê wan
da çem biherikin. Ew dê bêjin, ´Pesin bo Xwe dê bît ku em rênivînî kirîne bo evê, em
çi cara nedhatine rênivînî kirin eger Xwe dê em rênivînî nekirban. Bêguman
peyamberên Xwedanê me pê rastiyê hatin.´ Dê bangî wan biken, ´Ewe ev baxçeye ku
bi te hatiye dan, li ber xatira kiryarên te.´ 44 Hevrêyên naw baxçe da, dê gazî hevrêyên
naw agir da biken ´Birastî me zanî, ewa ku Xwedanê me belêniya wê dabû me rast e.
We jî zaniye ewa ku Xwedanê we belêniya wê dabu we ku rast bît?´ Ew dê bêjin´Erê´,
Bangbêjek dê li naw ewanda rabigehînît, ´Nerêniya Xwe dê li ser nebaşkara bît´
45 Ewên ku rêgirî li rêya Xwe dê kirin û hevil dan vê xar biken û nikolî[b] li Dawiyê
kirinî´ 46 Berbestek dê li nawbera ewan da bît û li ser bilindiya, ew mêrên ku hemûya,
pê navên wan nas diken, ew dê gazî ew hevrêyên baxçe biken, ´Aştî li ser we bît!´ Ew
hêşta neçone nawda, lê ew bi kelecan hêviyê ne 47 û dema çavê wan dikevîte hevrêyên
ku dê biçine naw agir da, ew dê bêjin, ´Xwedanê me, me têkelî ew netewa nebaşkar
neke!´ 48 Û hevrêyên ser bilindiya dê gazî hindek mêrên dîhar kirî biken ku ewan pê
navên wan, nas diken ´Kombûnê we û xwe mezin kirina we çi qazanc bo we çinebû´
49 Û erê, ewane ewin ku we sûnd dixwarin ku Xwe dê çi cara rehmê bi wan naket?
´Têkevne naw baxçe da! Çi tirs bo we nîne, nejî hûn dê xemgîn bin´ 50 Hevrêyên naw
agiri da dê gazî hevrêyên baxçê biken, ´Hindek avê li ser me da birêjin, yanjî her
debarekê ku Xwe dê bo we dabîn kiriye! ´ Û ew dê bêjin, ´ Xwe dê herduk li
nebawera qedexe kirîne´ 51 Ewên ku dînê* xwe weke hişbelavî û leyîzek vergirtine û bi
jiyana ev dinyayê hatine xapandin.´ Liber hindê îro, Em dê ewan li bîr biken, her wek
ku ewan hevdîtina xwe ya Roja Îro, li bîr kirbûn û eşkereyên Me nepejirandibûn.
52 Bêguman Me bo wan nivîsîneke pîroz înaye û pê zanistê şirove kiriye, weke rênivînî
û rehm bo ew mirovên ku bawer diken.



*Dîn yanî mirov xwe bi reh û koka xwe we girê det, reh û koka me Xwe dê ye.
Herwek ku li Xwandina pîroz da hatiye; Em li Xwe dê ne û em dê wegerêne bal Xwe dê.*
a: Li gor vergêrana Ebdil Helîm, her kesê ku diçîte cehnemê, dijûna didete hevalên xwe.
b: Haşa, înkara qiyametê kirin.

53 Ew çavnihêrê çi ne, xêncî bi cî hatina wê? Di Roja ku eve dê bicî bêt, ewên ku pêşta
li bîr kiribûn dê bêjin, ´Peyamberê Xwedanê me rast digot, niha çi nawbêjvan hene ku
bo me nawbêjvaniyê biken? Yanjî em dê bikarin bêne şandin ku karê ciyawaz li ew
karên ku me pêşta dikirin biken?´ Ewan birastî riha xwe bezir kiriye û ew tiştên ku
wan berhem înayî[a] dê wan bêxwedan bihêlin. 54 Xwedanê we Xwe dê ye, Ev afrînerê
asimana û erdê li şeş roja da ye, paşê Xwe li ser text damezirand, Ev şevê pê ew roja
ku bi lezgînî dişopînît dipeçêrît, roj, heyv û sitêrk peyreviyê li fermana Vî diken.
Bêguman afirandin û ferman ya Vî ye. Pîrozî ya Xwe dê ye Xwedanê hemû dinyaya!
55 Bi ûstîxarî û bi nihênî gazî Xwedanê xwe bike. Ev hez li ewan neket ku sînora[b]
dibezînin. 56 Nebine hokarê gendeliyê li ser erdê, piştî ku ev hatiye serast kirin, bi tirs û
hêvî gazî Vî biken. Rehma Xwe dê li wan nêzîke ku karên baş diken. 57 Pêş ku rehma
Xwe bişînît Ev pê baya mizgîniya wê didet û dema ewan ewrên pêgiran kom kirin,
Em, wan dişînine erdek mirî, wêderê Em baranê li wan dibarînin û hemû çeşne
berhemekê lê tînine der, aha wisa Em dê miriya bînine der, belke li ber hindê bête
bîra we. 58 Bi destûra Xwedanê we giya li ser erdê baş şîn dibît, lê li ser erdê nebaş bi
dijwarî. Jiboy ew mirovên ku sipasdarin, Em eşkereyên Xwe bi ev rêbazê şirove diken.
59 Bêguman Me Nûh jibo netewa[c] wî şand. Wî got, ´Netewa min koletiya Xwe dê
biken, xêncî Vî we çi xwedê nînin. Ez jibo we li sizaya Rojek gelek mezin ditirsim!´
60 Lê serokên netewa wî gotin, ´Em bi aşkira dibînin ku tu li rê derketî.´ 61 Wî got,
´Netewa min, ez li rê nederketime! Lê, ez peyamberekim li aliyê Xwedanê hemû
dinyaya we´ 62 Ez eşkereyên Xwedanê xwe digehînme we û jidil we şîreta dideme we.
Ez li Xwe dê dizanim eva ku hûn nizanin. 63 Hûn gelek seyr dibînin ku dibya mêrek li
naw we da, weke bîrewer li bal Xwedanê we ra jibo we bêt, ku belke we agahdar ket
ku hûn hişyarê Vî bin belke liber hindê hûn rehmê vergirin?´ 64 Lê ewan nikolî li wî
kirin, Me ew û ewên digel wî da li naw gemiyê da rizgar kirin û ewên ku nikolî li
eşkereyên Me kirbûn Me xendiqandin, birastî ew neteweyek kore bûn. 65 Jibo gelê Ad,
Me bo wan birayê wan Hûd şand. Wî got, ´Netewa min, xizmeta Xwe dê biken, xêncî
Vî we çi xwedê nînin, meger hûn hişyarê Vî nabin?´ 66 Lê serokên ew nebawerê naw
netewa wî da gotin, ´Em dibînin ku tu gêjî û em hizir diken tu yêk li wan direwînay.´
67 Wî got, ´Netewa min, çi gêjî li min da çinîne! Lê, ez peyamberekim li aliyê
Xwedanê hemû dinyaya we; 68 Ez eşkereyên Xwedanê xwe digehînme we. Ez birastî û
jidil we şîretê dideme we. 69 Hûn gelek seyr dibînin ku dibya mêrek li naw we da, weke
bîrewer li bal Xwedanê we ra jibo we bêt? Ku agahdariyê bidete we, bîra we bît ku
çawa Me hûn kirine cêgir, piştî gelê Nûh û pileya we gelek bilind kir, lewma qenciya
Xwe dê bîra we bît, belke li ber hindê hûn behremend bin.´ 70 Ewan got,´ Tu birastî
hatî ku bêjiye me tenê koletiya Xwe dê yêkta biken û ewa ku bab û bapîrên me
koletiya wan dikir bîra xwe biben? Bes eger eva tu dibêjî raste, ew belêniya te pê
hereşe kirî bîne ser me.´



a: Put, xwedêyên direw
b: Sînorên Xwe dê.
c: Qewm, milet, gel.

71 Wî got,´Her li berêda kirêtî û kerbê Xwe dê li ser we da ketiye.´ Meger hûn dê li ser
navên[a] ku we digel bab û bapîrên xwe danîne ser ewan digel min gengeşê biken. Ewa
ku Xwe dê hîç desthilatek jiboy wan neşandiye xarê? Bes çavnihêr bin, ez jî digel we
yêk li çavnihêra me.´ 72 Bi rehma Xwe, Me ew û ewên ku digel wî da bûn rizgar kirin
û reha ewên ku nikolî li eşkereyên Me dikirin û bawer nedikirin li binîda birî. 73 Jibo
netewa Semûd, Me birayê wan Salih şand. Wî got, ´Netewa min koletiya Xwe dê
biken, xêncî Vî we çi xwedê nînin. Niha, lewma li bal Xwedanê we ra jiboy we
nîşaneyek zelal hatiye, ew hêştira mê, ya Xwe dê ye, nîşaneyeke jibo we, liber hindê,
bihêlin bila ew li ser erdê Xwe dê biçerît û çi zirarê negehînînê, neka hûn dê bi
eşkenceyek bijan bêne qotan. 74 Bîra we bît ku paş gelê Ad Vî, hûn kirine cêgîr û hûn
kirine şêniyên ser erdê ku hûn bixwe koşka li ser deştên wê çêken û bixwe mala li çiya
da bikolin, bila qenciya Xwe dê bîra we bît û li ser erdê da gendeliyê belav neken´
75 Lê serokên ewê qude li naw netewa wî da gotine bawermendên çewsandî li naw
ewanda, ´Hûn dizanin ku Salih li bal Xwedanê xwe ra hatiye şandin?´ Ewan got,
´Birastî em bawerî bi eva ku bi wî ra hatiye şandin diken´ 76 Lê ewên qude gotin,
´Birastî em bawerî bi evê naken eva ku hûn bawerî pê diken,´ 77 Ber xatira hindê,
ewan hêştira mê qop kirin. Ewan serpêçî li fermana Xwedanê xwe kirin û gotin,
´Salih, bîne ser me eva ku te belêniya wê dabû me, eger tu yêk li wan peyamberanî!´
78 Lewma erdhejekê ser wan da girt û ew li naw malên xwe da bûne laşên mirî. 79 Li
ber wê hindê, wî pişta xwe da wan û got, ´Netewa min, min peyama Xwedanê xwe
gehande we û şîret da we, lê hûn hez ewan naken ku şîretê diden.´ 80 Dema Lat gote
netewa xwe, ´Hûn çawa dikarin ew bêrewiştiyê biken ku çi kesê dîke pêşta li dinyaya
da ewe nekirîne?´ 81 Birastî li şûna jina da hûn bi dilbijandin[b] li mêra nêzîk dibin! Belê,
hûn neteweyekin ku sînora dibezînin!´ 82 Tenê bersiva ku gelê wî dabûn ewe bû,
´Ewane li bajêrê xwe bike derê! Ew mêrên ku dixwazin xwe pak biparêzin!´ 83 Me, ew
û binemala wî rizgar kirin, xêncî jina wî ku li ewan bû ku li paşve ma 84 û Me li ser
ewan da baranek barand[c]. Bes lê binêrin ku dawiya tawankara çawan bû! 85 Jibo
netewa Med jî birayê wan, Şueyb! Wî got, ´Netewa min, koletiya Xwe dê biken, xêncî
Vî, we çi xwedê nînin. Nîşaneyek zelal li bal Xwedanê we ra bo we hatiye. Di kêşan û
pîvanê da bi tewawî biden û pişka mirova li wan nestînin, li ser erdê da nebine hokarê
gendeliyê, piştî ku ew hatiye serast kirin, bo we, eve bêhtire, eger hûn bawermendin.
86 Li ser hemû rêya nerûnên, ku hereşa li ew mirovên ku bawerî hene biken û rêgiriya
wan li rêya Xwe dê biken û hewil biden ku vê xar biken. Bîra we bît, dema ku hûn
çend kes bûn û Vî hûn zêde kirin. Lê binhêrin ku dawiya ewên ku gendelî belav
dikirin çi lê hat. 87 Eger komek li we bawerî bi evê diken ku ez pê hatime şandin û
komek dîke bawer naken, bes bêhin fereh bin taku Xwe dê li nawbera me da
dadweriyê diket. Ev li baştrîn dadwera ye.´



a: Navê puta
b: Şehwet
c: Baranek li kevirên kelandî

88 Serokên ewên qude naw netewa wî da gotin, ´Şueyb, em dê te û bawermendên
peyrevê te, li bajêrê xwe bikene der, meger hûn vergerine ser dînê me.´ Wî got,
´Tenanet eger kerbê me jî lê vebît? 89 Me dê sebaret bi Xwe dê direwek berhem înaba
eger em vegerana ser dînê we, piştî ku Xwe dê em lê rizgar kirine, çi rê nînin ku em
vegerinê, meger bi xwastina Xwe dê, Xwedanê me bît, Xwedanê me di zanista Xwe
da, hemû tişta têdigehît. Me pişta xwe bi Xwe dê rast kiriye. Xwedanê me, bi rastiyê li
nawbera me û netewa me da biryarê bide. Jiber ku Tu bêhtrîn biryarderî.´
90 Serokên nebawer li naw netewa wî da gotin, ´Eger hûn peyrevî li Şueyb biken,
bêguman hûn dê bidorînin ´ 91 Lewma, erdhejekê ser ewan da girt û ew li naw malên
xwe da bûne laşên mirî. 92 Wisa bû ku bêjî ewên ku nikolî li Şueyb kirî çi cara li
wêderê nejiya bûn. Ewên ku nikolî li Şueyb kirin dorandibûn 93 Liber wê hindê wî
pişta xwe da wan û got, ´Netewa min, min peyama Xwedanê xwe gehande we û şîret
da we, liber wê hindê, ez dê çawa jiboy netewa nebawer tazîdariyê bikem?´ 94 Me
jiboy çi gundekê Pêşbîn neşandiye, taku Me bi dijwarî û hejariyê, li şêniyê wê nedabît,
belke li ber hindê ew xwe ûstî xar biken 95 û Me şûna nebaşiyê veguheriye başiyê, taku
ew zêde bûn û gotin, ´Zirar û hêdîtî bi serê bab û bapîrên me hatibû´ Li ber wê hindê
nişkida ´Me serê ewan da jî îna, bêy ku ew têbigehin. 96 Eger şêniyên wan gunda
bawer kirban û hişyarê Vî ban, Me dê li asiman û erdê ra li ser wan da pîrozî
rijandiba, lê ewan nikolî lê kir û li ber xatira ewa ku wan destê xwe êxistibû Me, ew
girtin.´
97 Meger mirovên gunda hest bi tenahiyê diken ku dema ew li şevê da, razayne sizaya
Me nayête ser wan? 98 Yanjî mirovên gunda hest bi tenahiyê diken ku li dema
ronahiya rojê da, ew di leyizê dane sizaya Me nayête ser wan? 99 Meger ew hest bi
tenahiyê li bernameyên Xwe dê diken? Xêncî mirovên ku dê bidorînin, kesê dîke hest
bi tenahiyê li bernameyên Xwe dê naken. 100 Meger, jiboy ewên ku li nifşên pêş xwe
da erd bi mîrat birîne zelal nebûye ku Em dikarin ewan jî, ber xatira gunehên wan,
siza biden, eger Em bixwezin? Lê Me dilê wan pêçaye û lewma ew nabhên! 101 Me
hindek nûçeyên wan gunda gotine te, bêguman peyamberên wan pê nîşaneyên zelal
hatine bal wan, lê ewan bawerî bi eva ku pêşta nikolî lê kiribûn nekirin, bi wî awayî
Xwe dê dilê ewên nebawer dipêçît[a]. 102 Me çi peyman li bal piraniya wan nedît lê
birastî Me dît ku piraniya wan bi pêdagirî serkêş bûn. 103 Piştî wan, Me pê nîşaneyên
Xwe, Mûsa şande bal Fireûn û serokên wî, lê wan, ev nepejirandin. Lewma, dawiya
ewên ku gendeliyê belav diken bibînin.
104 Mûsa got, ´Fireûn, ez peyamberekim, li aliyê Xwedanê hemû dinyaya we, 105 erk
darim ku, xêncî rastiyê sebaret bi Xwe dê çi tiştek dîke nebêjim û ez pê nîşaneyên zelal
li bal Xwedanê te ra hatime bal te. Lewma zarûkên Israîl digel min rêke´ 106 Wî got,
´Eger tu pê nîşaneyekê hatî, ka evê derêxe, eger tu li wan rast bêjayî.´ 107 Li ber wê
hindê, Mûsa kopalê xwe havêt û nişkida ew bi zelalî bûye mar 108 û wî destê xwe
derêxist û lewma jiboy bînera ew sipî bû. 109 Serokên li naw netewa Fireûn gotin,
´Birastî ewe cadûgerek fêr bûyî ye! ´



a: Dixitimînît, girê didet.

[110] Ew dixwazît we li ser erdê we bikete derê! Hûn çi destûrê diden?´ [111] Ewan got ´Wî
û birayê wî gîro biken û nûçe gihana bişîne naw bajêra [112] ku hemû cadûgerên fêr
bûyî, bînine bal te.´ [113] Cadûger hatine bal Fireûn û gotin, ´Em dê bêne xelat kirin,
eger em serkevtî bin?´ [114] Û wî got, ´Erê, û hûn dê bêne naw ewên nêzîkê min.´
[115] Ewan got, ´Mûsa tu dê havêjî yan em havêjin?´ [116] Wî got, ´Havêjin´ Û wan
havêtin û cadûyek havêtine ser çavê mirova, tirs havêtine wan da û ewan cadûyek
mezin pêşkêş kirin. [117] Me sirûş da Mûsa ´Kopalê xwe havêje´ Û yêkcarî berhema wan
ya direw qurt kir. [118] Bi wî awayî rastî hate cih û ewa ku wan berhem înayî pûç bû,
[119] ew li wêderê hatibûne bezandin û serşor kirin. [120] Cadûger ketine ser çokên xwe û
serê xwe nivandine erdê [121] û wan got, ´Em bawerî bi Xwedanê hemû dinyay diken,
[122] Xwedanê Mûsa û Harûn!´ [123] Fireûn got, ´Hûn bawerî bi wî diken pêş ku ez
destûrê bideme we? Ewe xerîteye ku we kêşaye hûn mirova li ew gunda bikene derê!
Lê hûn dê bizanin, [124] ez dê dest û pêyê we kitangohor bibrim û paşê ez dê we hemûya
li xaçê bidem!´ [125] Ewan got, ´Birastî em dê vegerêne bal Xwedanê xwe [126] Tu tenê
tole li me diwekey çimkî em bawerî bi nîşaneyên Xwedanê xwe diken, dema ku ev bo
me tên, Xwedanê me bêhin ferehiyê li ser me da birêje û bihêle em bi xwe radest
kirina Te bimrin.´ [127] Serokên li naw netewa Fireûn gotine wî, ´Meger tu dê bihêlî
Mûsa û netewa xwe li ser erdê da gendeliyê belav biken û waz li te û xwedêyên te
bînin?´ Wî got, ´Em dê kurên wan bikujin û bihêlin jinên wan bijîn, birastî me
desthilat li ser ewan da heye.´ [128] Mûsa gote netewa xwe, ´Daxwaza yarmetiyê li
Xwe dê biken û bêhin fereh bin, erd yê Xwe dê ye! Ev dibîte hokar ku her koleyek Vî
ku Ev dixwazît bibine xwedanê wê û dawî ya ewane ku hişyarê Vî bin.´ [129] Û wan got,
´Pêş ku tu bo me bêy û piştî hatina te jî em hatine êşandin.´ Ewî got, ´Belke Xwedanê
we dê dijminê we li nav bibet û we li ser erdê cihgîr ket ku bibînît, hûn dê çi biken.´
[130] Me, bi salên hişkatî û kêmasiyê li berhemê netewa Fireûn da, belke li ber hindê
bête bîra wan [131]lê, dema ku bo wan başî hat, ewan got, ´Ewe li ber xatira me ye´ Lê
eger nebaşiyê li wan daba, ewan pêywendiya wê da, bi bûyera nebaş ya Mûsa û ewên
digel wî da, lê birastî ew ´Bûyera nebaşa´ wan li aliyê Xwe dê we bû lê piraniya wan
nizanin. [132] Ewan got, ´Girîng nîne, tu her çeşne nîşaneyekê jî berhem bînî ku pê
cadûya havêjiye ser me, em baweriyê bi te naken ´ [133] Û li ber wê hindê, Me lêmişt,
kolî, rişk, beq û xwîn berdane ser wan! Nîşaneyên ciyawaz. Lê ew qude bûn û
neteweyeke tawankar bûn. [134] Her dema karesatek hatiba serê wan, ewan dê gotiba
´Mûsa, jibo me, li ber Xwedanê xwe bipariyê, liber ew belêniya ku Vî daye te, eger tu
me li karesatê rizgar key, em dê baweriyê bi te biken û bihêlin ku zarûkên Israîl digel
te bên,´ [135] Lê dema ku Me, karesat li ser wan wêda bir û demek dîharî kirî daye wan[a],
ewan bi yêkcarî peyva xwe şikandin. [136] Lewma Me tole li wan vekir, Me ew di
deryayê da xendiqandin çimkî ewan nikolî li nîşaneyên Me kirin û çi bala xwe
nedabûnê.



a: Derfet da wan ku peymana xwe bicih bînin.

137 Û Me wisa kir ku ewên çewsandî bibine xwedanê rojhelat û rojava yê erdê ku Me
pîroz kirbû. Ber xatira bêhnferehî ya wan, belêniya baş ya Xwedanê we bo zarûkên
Israîl hatibû cihê xwe û ewa ku Fireûn û netewa xwe çêdikirin û ewa ku wan ava dikir
Me li navbir. 138 Me zarûkên Israîl li derya yê derbaz kirin, lê dema ku ew rastî gelekê
putperest hatin, ewan got, ´Mûsa bo me jî xwedêyekê mîna yê ewan çêke.´ Wî got,
´Birastî hûn neteweyeke nezanin, 139 birastî ew mirovane li navçoyî ne, ber xatira ewa
ku ew têdane û ewa ku ew diken pûçe.´ 140 Wî got ´Çima dibya ez, xêncî Xwe dê bo we
li çi xwedêyên dîke bigerêm, dema ku Vî li serwey hemû dinyayên dîke hez li we
kiriye?´ 141 Dema Me hûn li netewa Fireûn rizgar kirin, ewên ku hûn kiribûne mijara
nexweştrîn eşkenceya, kurên we dikuştin, tenê dihêlan ku jinên we bijîn, li bal
Xwedanê we ra, ew ezmûnek gelek mezin bû. 142 Me sî şev bo Mûsa destnîşan kirin,
pê dehê dîke ew bêkêmasî kir, bi wî awayî ew dema dîharî kirî li bal Xwedanê wî, li çil
şeva da tewaw bû. Mûsa gote birayê xwe Harûn, ´Li naw netewa min da cihê min
bigre, durustkar be û şopa ewên ku gendeliyê belav diken neşopîne.´ 143 Dema ku
Mûsa geheşte dema hevdîtina Me, Xwedanê wî digel wî peyvî. Ew got, ´Xwedanê
min, nîşanî min bide, bihêle ez Te bibînim!´ Vî got, ´Tu Min nabînî, lê li çiya binêre,
eger ew li cihê xwe da bimînît bes tu dê Min bibînî,´ Lê dema ku Xwedanê wî Xwe
nîşa çiya da, Vî ew herifand, Mûsa bêhiş kete xarê. Dema ew hate ser hişê xwe, wî got,
´Paye bilindî jiboy Te ye! Bi peşîmanî ez rû dikeme Te! Ez yêkemînim ku dê bawer
bikem!´
144 Vî got, ´Mûsa, bi peyam û peyvên Xwe, Min li serwey mirovên dîke da tu
helbijartî, lewma eva ku Min daye te hilgire û bibe yêk li ewên ku sipasdarin.´ 145 Me
hemû tişt bo wî li ser tabloya nivîsî ku destûr û şiroveya hemû tişta, ´Bi peytî evane
hilgire û destûrê bide netewa xwe jî ku bi qahîmî bêhtrînê vê hilgrin. Ez dê mala ewên
ku bi pêdagirî serkêşin nîşanî te bidem. 146 Ez dê ewan li nîşaneyên xwe bizvrînim,
ewên ku bêmaf, li ser erdê qude ne û tenanet eger ew hemû nîşaneya jî bibînin, ew
bawerî pê neken, eger ew rêya serast bibînin, ew weke rê nagirine ber xwe, lê eger ew
rêya şaşiyê bibînin dê weke rê bigirine ber xwe. Ewe li ber wê hindê ye ku ewan nikolî
li nîşaneyên Me kirin û ewan bala xwe nedida wan. 147 Kiryarên ewên ku nikolî li
nîşaneyên Me û hevdîtina Dawiyê kirîne bûyne çineyî, meger xêncî ewa ku wan kiriye
dê tiştek dîke bi wan bête dan?´
148 Di nebûna wî da netewa Mûsa, pê cewherên xwe[a] peykerê golikekê çêkirin, ewa ku
dengê borînê diderxist, Meger ewan nedidît ku ew digel wan nedipeyvî yanjî ew
rênivînî nedikirine rêyekê? Ewan vergirt[b], ew nebaşkar bûn. 149 Dema ku peşîmaniyê
ser ewan da girt û dîtin ku ew li rê derketine, ewan got, ´Eger Xwedanê me, rehm li
ser me nebît û li me nebihorît, bêguman em dê li naw ewan da bin ku dorandine.´
150 Dema ku Mûsa tore û êşayî vergeriya bal gelê xwe, Mûsa got, ´Çend kotiye, ewa
ku we di nebûna min da kiriye! Meger hûn hinde bi lez bûn ku dadweriya Xwedanê
xwe bînine pêş?´

a: Zêr b: Perestîn, ewan golik perestî

Wî tablo havêtine xarê û girte serê birayê xwe ra û ew rakêşa bo aliyê xwe. Wî got
´Kurê dayka min, ew mirovane zordarî li min kirin! Kêm mabû min bikujin! Ber
xatira hindê nehêle ku dujminên min li ser min şad bin! Min têklî ew mirovên
nebaşkar neke!´ 151 Ew got ´Xwedanê min, li min û birayê min bibhore, me vergire
naw rehma Xwe da. Tu Xwedanê Rehmêy Evê ku Rehmê didey. 152 Ewên ku golik
vergirtin[a], dê bi kerbê Xwedanê xwe û bi serşorî di wê dinyayê da bêne qotan.´ Aha
wisa Em sizayê didene ewên ku dahînana diken. 153 Jiboy ewên ku karên nerast diken,
paşanê peşîman dibin û bawer diken, birastî Xwedanê we Lêbihore û Rehmê didet.
154 Dema kerbê Mûsa dana ew tablo rakirin, bo ewên ku sersirmayê Xwedanê xwe ne,
li ser wan da rênivînî û rehm hatibû nivîsîn. 155 Bo hevdîtina Me, Mûsa li naw netewa
xwe da heftê mêr hilbjartin û dema wan lerzîn girt, ew got, ´Xwedanê min, eger Te
xwastiba ku ewan li nav bibey, Te dikarî pêş niha da, min û ewan li nav bibey, ber
xatira ewa ku ewên gêj li naw me da kirîne? Ewe tenê ezmûneke li aliyê Te we, bi rêya
wê, Tu dibye hokar her kesê Tu dixwazî li rê derkevît û her kesê Tu dixwazî rênivînî
dikey û Tu parêzerê meyî, lewma li me bibhore û rehmê ser me da bike. Tu bêhtrînê
lê bihoray. 156 Di vê dinyayê û di Dawiyê da jî tiştên baş pêşkêşî me bike. Birastî em
zivirîne aliyê Te.´ Vî got, ´Sizayê Xwe, Ez tînime ser her kesekê ku Ez dixwazim, lê
rehma Min, hemû tişta himbêz diket. Lewma Ez dê fermana vê bo ewan bikem ku
hişyarê Minin, ew xêra ku bo wan hatiye dîhar kirin diden û ewên ku bawerî bi
eşkereyên Me diken,157 ewên ku peyrevî li peyamber diken, ew pêşbînê nexwîndevar,
ku dibînin li Rênivînî (Torat) ê da bas lê hatiye kirin ku digel wan daye û li Mizgîniyê
(Incîlê) da, ewê ku fermanê li wan diket ku ewa rast biken û pêşgîriya wan li ewa nerast
diket, ewê ku tiştê baş bo wan qanûnî diket û tiştên nebaş li wan qedexe diket û wan li
barê wan û li leleya[b] di ûstê wan da rizgar diket. Lewma ewên ku bawerî bi wî diken,
rêz lê digrin û yarmetiya wî diken û ewên ku peyrevî li ronahiyê diken ku digel wî
hatiye şandin xarê, ewane ewin ku dê serkevtî bin.´ 158 Bêje ´Mirovino, birastî ez bo
we hemûya, peyamberê Xwe dê me, padişahiya asimana û erdê ya Vî ye. Çi xwedê
nîne, bes Ev nebît, Ev jiyan û mirinê didet.´ Li ber wê hindê, bawerî bi Xwe dê û
peyamberê Vî biken ew Pêşbînê[c] nexwîndevar ku bawerî bi Xwe dê û peyvên Vî diket,
wî bişopînin, belke liber hindê hûn bêne rênivînî kirin.´ 159 Li naw netewa Mûsa da
civakek heye ku pê rastiyê rênivînî diken û pêka vê dadperweriyê diken. 160 Me, ew li
ser dazde eşîra da- civak- dabeş kirin û dema netewa wî daxwaza avê lê kirin, Me sirûş
da Mûsa ´Bi kopalê xwe li kevir bide´ Û dazde kanî lê bilqîne derê. Hemû mirova cihê
vexwarina xwe dizanî, Me pê ewra li ser wan kire sîber û ji bo wan mena û herwêde
şandine xarê ´Bixwen ew tiştên baş ku Me jibo we dabîn kirîne.´ Ewan nerastî li Me
nekir lê ewan nerastî li xwe kir.



a: Golik weke put (xwedê direw) perestîn.
b: Zincîra ku destê mirova bi ûstê wan we girê diden, toqa asin.
c: Pêşbîn (Nebî) base Mihemed peyamber ye ku mirovek nexwîndevar bu.

161 Dema bi wan hate gotin ´Li ew gund da bijîn û her tiştê hûn hez diken bixwen û
bêjin, ´Me li barên me rizgar bike!´ Çokê xwe danên û serê xwe binvînin û li derî da
herine jorê. Em dê li gunehê we bibhorin û jibo ewên ku karên baş diken zêde biken ´
162 Nerastkarên li naw ewan da, li cihê ew gotina ku bi wan hatibû dan, gotinek dîke
cihgîr kirin, li ber wê hindê, Me li asiman ra bo nerastkariya wan sizayek şande ser
wan. 163 Sebaret bi ew gundê li bal deryayê li wan bipirse, dema ewan zêderevî li
Şembiyê da kirin, dema ku li Şembiyê da, masiyên wan bo wan ser avê ketin, ew rojên
ku Şembî nebûn ew nehatibûne bal wan. Lewma bi wî awayî Me ew taqî kirin, çimkî
ew bi pêdagirî serkêş bûn. 164 Dema civakekê li naw ewan da got, ´Çima hûn
amojgariyê didene ew mirovên ku Xwe dê, dê wan li nav bibet, yanjî dê bi dijwarî siza
bidet?´ Ewan bersiv da, ´Liber wê hindê em li gazindeya Xwedanê xwe rizgar bin û
belke liber hindê ew hişyarê Vî bin.´ 165 Dema ku ewan, ew bîranîna ku bi wan hatibû
dan li bîr kirin, ewên ku nebaşî qedexe kirbûn Me rizgar kirin û ewên ku nerastî
dikirin bi sizayeke dijwar girtin, çimkî ew bi pêdagirî serkêş bûn.166 Dema ku wan
sînorên hemû ew karê ku li wan hatibûne qedexe kirin bezandin, Me gote wan ´Bibine
meymûnên kotî!´167 Û dema Xwedanê we ragehand, ´Ta Roja Vejiyanê Ev dê bişînîte
ser wan ku bi eşkenceyek gelek dijwar li wan bidet. Birastî Xwedanê we lezgîne li
sizadanê da, birastî Ev Lêbihore û Rehmê didet. 168 Me, li ser erdê ew belav kirine
naw netewên cuda da, hindek li naw ewan da durustkarin û li naw ewan da hindek jî
weka dîke ne, liber wê hindê Me bi başî û nebaşiyê ew taqî kirin, belke liber hindê ew
vegerên 169 û ew nifş li wan paş ketin ku ewan nivîsîna pîroz bi mîrat birbûn, ewan jî
destkevtên demkiyê ev dinyaya xarê vergirtin gotin, ´Ew dê  li me bête lêbihorîn´ Û
birastî,  eger destkevtên wisa bêne ser rêya wan, ew dê vergirin. Meger li nivîsîna pîroz
da belênî li wan nehatibû vergirtin ku sebaret bi Xwe dê çi nebêjin bes rastî nebît? Û
meger ewan, naweroka vê nexwandiye? Mala Dawiyê bêhtire jiboy ewên ku hişyarê
Vî ne. ´Liber wê hindê hûn çima hişê xwe bikar naynin?´ 170 Lê jibo ewên ku xwe
qahîm bi nivîsîna pîroz we digrin û nûbêjên xwe diken, Em nahêlin padaşê ewên
durustkar heder biçin. 171 Dema ku Me çiya li ser ewan da bilind kirin, wek tu bêjî ku
ew bane û wan hizir dikir ku ew dê li ser ewan da bikewît, Me got, ´Xwe qahîm bi eva
ku Me daye we bigrin û bîra we bît ku naweroka vê çiye, belke li ber hindê hûn
hişyarê Vî bin.´ 172 Dema Xwedanê te li nawpîsiya zarukên A Dem, paşkevtiyên wan
vergirtin û sebaret bi wan, ew bixwe kirine gewah, ´Meger ez Xwedanê we nînim?´ Û
ewan got, ´Belê, me gewahî daye´ Liber wê hindê, li Roja Vejîyanê da, hûn nikarin
bêjin, ´Birastî em agahdarê vê nebûn.´ 173 Yanjî hûn bêjin, ´Ew bab û bapîrên me bûn
ku pêş me da, ´heval´ bo Vî peyda kirbûn û em tenê nevyê wanin ku em paş ewan da
hatine, bes ser xatira kiryarê ewên ku direw berhem înabûn Tu dê me li nav bibey?´
174 Bi wê rêkê Em peyamê şirove diken, belke li ber hindê ew bizvirin.

[175] Çîroka ew mêrê ku Me nîşaneyên Xwe dabûnê bêje wan, lê wî, xwe li van dûr kir,
lewma Şeytan ew weke şopînerê xwe vergirt û ew jî bû yêk li wan ku rê derket,
[176] eger Me xwastiba, Me dê karîba pê evan wî bilind biken, lê wî bala xwe da erdê û
hestên xwe şopandin, mînaka wî weke mînaka seyekê ziman hilkêşayî ye ku li bêhna
xwe dida. Çi tu bikewye dû da, ew li bêhna xwe didet, çi jî waz lê bînî, ew li bêhna
xwe didet. Ewe mînaka ewane ku nikoliyê li nîşaneyên Me diken. Lewma, ev çîroka
bêje wan, belke li ber hindê, ew têbîniyê biken. [177] Çend kirête mînaka ewên ku nikolî
li nîşaneyên Me kirin! Ewan nerastî li xwe kir, [178] her kesê ku Xwe dê rênivînî diket, ew
rênivînî kirîne û her kesê ku Ev dihêlît li rê derkewin, ewan dorandiye. [179] Me gelek cin
û mirov bo cehnemê afirandine, ewan dil hene ku pê tênagehin, ewan çav hene ku pê
nabînin, ewan guh hene ku pê nabhên, ew weka ajelên kevî ne, tenanet dûrtir li rê
derketine, ewane ewin ku bêhişin. [180] Bêhtrîn nav yê Xwe dê ne, ewan bi kar bîne ku
gazî Vî bike û ewên ku navên Vî bi nebaşî bikar tînin bicih bihêle, liber xatra ewa ku
ewan dikir, ew dê bêne siza dan. [181] Li naw ewên ku Me afirandine civakek heye ku bi
rastiyê rênivînî diken û pêka vê dadweriyê diken [182] lê, ewên ku nikoliyê li nîşaneyên
Me diken, li ew cihê ku ew nizanin Em dê hêdî hêdî rêberiya wan biken [183] Ez dê
derfetê bideme wan, lê birastî bernameya Min qahîme. [184] Meger ewan têbînî nekirye?
Ku çi cin di hevrêyê wan da nînin, ew tenê bi zelalî agahdariyê didet. [185] Meger ew
nazêndene padişahiya asimana û erdê û hemû ewa ku Xwe dê afirandiye û belke
dema wan ya dîhar kirî nêzîk bûye? Lewma paş evê, ew dê bawerî bi çi ragehandinekê
biken? [186] Ewên ku Xwe dê dihêlît li rê derkevin kes nikarît rênivînî biket, Ev dihêlît ku
ew di sînor bezandina xwe da kore bigerên. [187] Ew sebaret bi ew demê[a] li te
dipirsin,´Ew dê kengê bête cih?´ Bêje, ´Tenê Xwedanê min zanista wê heye, kes neşêt
dema wê aşkira biket bes Ev nebît, ew giraniyê didanête ser asimana û erdê. Ew
nayête ser we bes nişkida nebît.´ Ew li te dipirisn, weke bêjî ku tu baş agahdarê dema
wêy. Bêje ´Zanista wê tenê li bal Xwe dê ye, lê piraniya mirova nizanin.´[188] Bêje, ´Min
bixwe jî çi desthilat li ser qazanc ya zirarê nîne, xêncî ewa ku Xwe dê bixwazît, eger
min zanista nihêniyê heba, bêguman min dê karîba gelek serwetê dest xwe we bînim û
çi zirarê nedikarî destê xwe li min bidet. Xêncî ewê ku agahdarî û mizginiyê didete
bawermenda ez kesekê dîke nînim.´ [189] Eve ku hûn li rihekê afirandine û li ewê jî cota
wî çêkir, belke li ber hindê ew li tenahiyê da digel wê bijît, dema ew digel wê cot dibît
ew barek siwik hildigrît û pê ewê berdewam dibît, lê dema ku ew girantir dibît, ew
herduk gazî Xwe dê, Xwedanê xwe diken, ´Eger Tu yêke baş bideye me, bêguman em
dê li naw sipasdara da bin.´ [190] Û dema Ev yêke baş didete wan, ew ´hevala´ bo Vî
peyda diken, li ewa ku Vî daye wan. Lê Xwe dê gelek bilindtire li ser ewa ku dikene
´hevalê´ Vî [191] Ew wan dikene ´hevalê´ Vî ku çi tişt ne-afrandine û hatine afirandin?
[192] Û ew[b] nikarin yarmetiya wan biken, nejî yarmetiya xwe biken.

a: Demjimêra dawiyê, qiyametê



b: put, xwedêyên direw, ew hevalên ku jiboy Xwe dê, peyda diken.

193 Eger hûn ewan gazî rênivîniyê biken, ew peyreviyê li we naken, çi ciyawaziyekê
naket, çi hûn gazî wan biken yanjî hûn bêdeng bimînin. 194 Birastî ewên ku hûn li
kêleka Xwe dê, da gazî wan diken, ew jî weka we kole ne. Gazî wan biken, paşê bihêle
bila ew bersiva we biden, eger ewa hûn dibêjin raste.
195 Meger ewan pê hene ku pê pêya biçin, yanjî dest hene ku pê lêden, yanjî çave hene
ku pê bibînin, yanjî guh hene ku pê bibhên? Bêje ´Gazî ´´hevalên´´ xwe biken!´
Bername rêjiya li dijî min biken! Çi derfeta nedene min! 196 Birastî parêzerê min
Xwe dê ye, Ev ê ku nivîsîna pîroz eşkere kiriye û Ev piştîvanê durustkara ye 197 lê
ewên ku li kêleka Vî da hûn gazî diken, nikarin yarmetiya we biken, ew nikarin
yarmetiya xwe jî biken.´ 198 Eger hûn bo rênivîniyê gazî ewan biken, ew nabihên, tu
dibînî ku ew zêndidene te lê ew nabînin. 199 Lêbihorînê vergirin, fermana başiyê biken
û pişta xwe bidene nezana. 200 Eger Şeytan pêşniyara karên nebaş bi we biket, penahê
li bal Xwe dê vergirin, birastî Ev Bihîstine, Zanîne. 201 Birastî ewên ku hişyarê Vî ne,
dema ku Şeytan pê hizra ewan han didet, tête bîra wan, dest bi cih ew têbîniyê diken,
202 lê birayên wan, ewan radikêşine bo naw şaşiyê da, paşê ew çi kêmasiyê lê naken.
203 Dema tu bo wan eşkereyeke taze naynî, ew dibêjin,´ Meger tu nikarî daxwaza yêkê
bikey?´ Bêje, ´Ez peyrevî li eva ku li bal Xwedanê min we, bo min eşkere dibît dikem,
li bal Xwedanê we ra, eve têbînîne jibo we û rênivînî û rehme jibo ew mirovên ku
bawer diken.´ 204 Li ber wê hindê, dema ku Xwandin (Quran) tête xwandin, guhê xwe
bidenê da û hişê xwe bidenê, belke li ber hindê hûn rehmê vergirin.´ 205 Di sibêdê û
êvara da, bi ûstîxarî û tirsê li naw xwe da Xwedanê xwe bîr bîne, bêy ku dengê xwe
bilind bikey, nebe yêk li wan bêhişa, 206 ewên ku nêzîkî Xwedanê te ne jî, xwe mezin
kirin pêşgîriya ewan naket ku Vî biperestin, ew Vî paye bilind diken û çokê xwe li ber
Vî didanên û serê xwe dinivînin.

## 8. Para Destkevtên şer

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Ew sebaret bi destkevtên şer li te dipirisin. Bêje, ´Destkevtên şer yê Xwe dê û
peyamberê Vî ne´ Li ber wê hindê hişyarê Xwe dê bin û tişta di nawbera xwe da
serast ken. Peyrevî li Xwe dê û peyamberê Vî biken, eger hûn bawermendin.
2 Bawermend tenê ewin ku dema navê Xwe dê tê gotin, jidil da ditirsin û dema ku
eşkereyên Vî jibo wan têne xwandin, baweriya wan zêdetir dibe, pişta xwe bi
Xwedanê xwe rast diken. 3 Ewên ku nûbêjên xwe diken û li ewa ku Me bo wan dabîn
kirye didene ewên dîke. 4 Ewane, ewin ku birastî bawer diken. Ewan li bal Xwedanê
xwe pile[a], lêbihorîn û dabîn kirina bi comerdî hene.´ 5 Dema ku Xwedanê we jibo
hokarek rastî hûn li malên we înane derê, komek li bawermenda nedixwastin 6 û
sebaret bi rastiyê digel te gengeşe dikirin piştî ku ew hatiye zelal kirin, wek bêjî ku wan
bi çavê xwe didît ku ew bo aliyê mirinekê dihatine hajovtin. 7 Dema Xwe dê belênî da
we ku yêk li ew du komên dijmin dê bikevîte destê we, we dixwast ew koma bêçek jibo
we bît, lê ew daxwaza Xwe dê bû ku pêka peyva Xwe rastiyê bînîte cih û reha
nebawera bibrît 8 û dibya Ev rastiyê bicih bînît û direwê li naw bibet, herçend ku ewên
tawankar hez jê neken. 9 Dema ku hûn bo yarmetiyê li ber Xwedanê xwe pariyan, Vî
bersiva we da, ´Ez dê, bi hizar firişta li serhevda pişta we bigrim.´ 10 Xwe dê, ewe kire
mizgînî ku tenahiyê bidete dilê we, yarmetî tenê li bal Xwe dê we têt, Xwe dê Bihêze
Biryardere. 11 Dema ku Ev weke tenahiyekê li aliyê Xwe ra razan daye we û li asiman
ra av şande xarê ku pê we pak biket û pîsatiya Şeytan li we bimalît û dilê we bihêz û
pêngavên we cihgirtî biket 12 dema Xwedanê we sirûş da firişteya ´Ez digel we me,
hêzê bidene ewên ku bawer diken, Ez dê tirsê bêxime naw dilê ewên ku bawer naken,
lewma li serwey gerdena wan biden û li hemû tilyên wan biden.´13 Ewe liber wê hindê
bû ku wan dijayetiya Xwe dê û peyamberê Vî kirbûn û eger kesek dijberiya Xwe dê û
peyamberê Vî biket, birastî Xwe dê bi dijvarî siza didet 14 ´Eweye! Lewma tam biken!
´Û birastî eşkenceya agir li benda nebawerane. 15 Bawermendino, dema hûn dibînin
ewên nebawer pêşreviyê diken, pişta xwe nedene wan, 16 eger li ew rojê da, her kesek
pişta xwe bidetê, meger bo lêbandina di şer da bît, yanjî bigehîte komekê ku şer diket,
bêguman ew kerbê Xwe dê diveket û cehnem dê penahgaha ew kes bît, armanca ew
kes çend ciheke kotiye! 17 Ew hûn nebûn ku ew kuştin lê Xwe dê bû ku ew kuştin û
dema te havêt, ew havêtina te nebû lê Xwe dê havêt. Belke li ber hindê Ev
bawermenda bi ezmûneke baş taqî biket, birastî Xwe dê Dîtine û Zanîne
18 ´Wisaye ´ Û Xwe dê, dê bernameya nebawera bêhêz biket. 19 Eger hûn li
serkevtinekê digeriyan, jiboy we serkevtin hatiye, ew dê bo we baştir bît eger hûn
rawestin. Eger hûn vegerên, Em jî dê vegerên û hêzên we çi qazanc jiboy we çinabin,
eger ew zêdetir jî bin. Xwe dê digel bawermenda daye.

a: Derece (degree)

[20] Bawermendino, peyrevî li Xwe dê û peyamberê Vî biken, dema hûn guhdariya wî
diken pişta xwe nedenê, [21] weka ew mirova nebin ku dibêjin, ´Me bihîstiye,´ Dema ku
ew nabihên, [22] kotîtrîn rihtiber li pêş çavê Xwe dê da ewin ku ker û lalin, ewên ku
hizra xwe bikar naynin. [23] Eger Xwe dê zanîba başiyek di wan da heye, Ev dê wisa li
wan kiriba ku bibhên, lê tenanet Vî wel wan kirba ku bibhên jî, dîsa jî dê wan pişta
xwe daba yê da, dema ku ewan dijberî dikir. [24] Bawermendino, bersiva Xwe dê û
peyamberê Vî biden, dema ku ew gazî we dikete bo ewa ku jiyanê didete we. Bizanin
ku Xwe dê nawbêjvaniya di nawbera mêr û dilê wî diket û hûn dê jiboy bal Vî bêne
kom kirin. [25] Hişyarê ew nakokiyê bin ku tenê zirarê li nebaşkarên li naw we da nadet,
bizanin ku Xwe dê dijware li siza danê da. [26] Bîra we bît, dema ku hûn li ser erdê da
çend kesên çewsandî bûn, ditirsiyan ku belke mirov we bigrin lê Vî, penah da we û bi
yarmetiya Xwe serkevtin da we û tiştên baş bo we dabîn kirin, belke li ber hindê hûn
sipasdar bin. [27] Bawermendino, xiyanetê bi Xwe dê û peyamber neken, yanjî bi
zanebûn xiyanetê bi baweriyê xwe neken. [28] Bizanin ku serwet û zarûkên we tenê jibo
we ezmûneke û padaşê herî mezin li bal Xwe dê ye. [29] Bawermendino, eger hûn
hişyarê Xwe dê bimînin Ev dê pîvana ciyawaziyê[a] bidete we û dê kiryarên we yê nebaş
bimalît û li we bibhorît, Xwe dê Xwedanê qenciya gelek mezine. [30] Dema nebawera
xerîte kêşan ku te zîndanî bigrin, yanjî te bikujin yanjî te bikene der. Ewan bername
rêjî kir û her wisa Xwe dê jî, Xwe dê li baştrîn bername rêja ye [31] û dema eşkereyên
Me jibo wan têne xwandin, ew dibêjin, ´Me eve pêşta bihîstiye, eger me xwastiba, me
jî dikarî weka evê bêjin, xêncî efsaneyên mirovên pêşta, eve tiştek dîke nîne´ [32] Û dema
ewan got, ´Xwe dê, eger eve rastiye li aliyê Te we, bes li asimana ra kevira li ser me da
bibarîne, yanjî sizayek bijan bide me. ´[33] Lê dema ku tu[b] li naw ewan day Xwe dê
ewan siza nadet, dema ew daxwaza lêborînê biken Xwe dê ewan siza nadet [34] bo çi
Xwe dê ewan siza nedet, dema ew rêgirya mirova bo mizgewta heram diken, herçend
ku ew parêzerên wê nînin? Tenê ewên hişyarê Vî ne, parêzerên wê ne, lê piraniya wan
nizanin.[35] Li mal da nûbêja wan tenê çepik û fîtî bûn. ´Lewma, ber xatira ew
nebaweriya xwe sizayê tam biken. ´ [36] Ewên ku bawer naken, serweta xwe bikar tînin
ku rêgiriya mirova li rêya Xwe dê biken û ew dê xerc biken, paşê ew dê bo wan bibîte
peşîmanî, dê li ser ewan da bikevin û ewên ku bawer nekirîne dê naw cehnemê da
bêne kom kirin. [37] Bi wî awayî, Xwe dê dê baş û nebaşa li hevdu cûda biket, dê ewên
nebaş danête ser pişta yêk, hemûya kom bikete ser hev û ewan havêjîte cehnemê da.
Ewane ewin ku dorandîne. [38] Bêje ewên ku bawer naken, eger ew waz lê bînin, ewa
pêşta rû daye, dê li wan bête bihorîn, lê eger ew vegerên, bes mînaka mirovên ku pêş
ewan da çone pêşta hatiye cih!



a: Cuda, cûrek dîke.
b: Mihemed.

[39] Hind şerê ewan biken taku edî çi çewsandin nemînît û dînê hemûya tenê Xwe dê
bît, eger ew waz lê bînin, bes Xwe dê ewa ku ew diken dibînît, [40] lê eger ew pişta xwe
bidenê, bêguman bizanin ku Xwe dê parêzvanê we ye, baştrîn parêzvane û baştrîn
yarmetîder.[41] Bizanin ku yêk- ji pênca, destkevtên we li şer yê Xwe dê û peyamber,
xizmên nêzîk, sêwiya, bo ewên xwedan pêvîstî û rêviyane, eger hûn bawerî bi Xwe dê
û eva ku Me bo koleyê Xwe, li roja biryar danê da şande xarê diken, ew roja ku herdu
hêza di şer da hevdîtin. Xwe dê şêyan li ser hemû tişta heye. [42] Dema hûn li aliyê
nêzîkê gelî da bûn û ew li aliyê dûr bûn û karwan li bin we da bû. Eger we hevdîtin
çêkirba, we dê nekarîba wê biken, li ber hindê ku Xwe dê, dê mijarekê bînîte cih ku
pêşta fermana wê dabû, ewên ku dê li nav çoban, li nav biçin, li ser belgeyên zelal û
ewên ku jiyaban, bijîn, li ser belgeyên zelal, Xwe dê Bihîstine û Zanîne.
[43] Dema Xwe dê, li xewnê da ew kêm nîşa te[a] dan, Eger Vî gelek nîşa te daban,
bêgûman te dê bivêriya xwe li dest daba û te dê li ser mijarê gengeşe kiriba, lê Xwe dê
hûn parastin. Ev dizanît çi li naw singa da heye. [44] Dema we hevdît, Vî ew kêm nîşa
we dan û li ber çavê wan da hûn kêm hatine nîşan dan ku Ev bikarît bicih bînît ew
mijara ku Vî pêşta biryar dabû, hemû mijar dizvrine bo bal Xwe dê.
[45] Bawermendino, dema hûn hêzekê dibînin, qahîm cihê xwe da rawestin û gelek zêde
Xwe dê bînine bîra xwe, belke li ber hindê hûn serkevin. [46] Peyrevî li Xwe dê û
peyamberê Vî biken û digel hevdû gengeşê neken û ku hûn bivêriya xwe li dest biden.
Bêhin fereh bin, Xwe dê digel bêhin fereha da ye. [47] Nebine wek ewên ku pir bi xwe
bawerî li mala xwe da derketin, xwe pêş çavê mirova qude kirin û pêşya ewên dîke li
rêya Xwe dê girtin, Xwe dê ewa ku ew diken dorpêç diket.[48] Û dema Şeytan kiryarên
wan li pêş çavê wan xemilandin û got, ´Îro li naw mirova da kes we têk naşkînît, çimkî
ez dê rast li kêleka we da bim´, Lê dema ku her du leşker hatine pêş çavê hevdû, ew li
ser paniya xwe we zivrî û got, ´Lêreye ku ez we bêxwedan dihêlim, birastî eva ez
dibînim hûn nabînin û ez li Xwe dê ditirism, Xwe dê dijware li siza danê da. [49] Dema
ewên durû û ewên ku nexweşî di dilê xwe da hebûn gotin ´Dibya ew mirovane pê dînê
xwe hatibine lêbandin, ´Lê eger her kesek pişta xwe bi Xwe dê rast biket Xwe dê
desthilata wê hindê heye ku biryarê bidet.´ [50] Bes eger te karîba bibînî, dema ku firişte
riha ewên ku bawera nekirbûn diben, li ser rûmet û pişta wan diden û ´Sizaya agirê
ku dişewtît tam biken, [51] ewe li ber xatira ewêye ku we pê destê xwe pêş xwe da
şandiye. Xwe dê çi cara digel koleyên xwe bêdad nîne.´ [52] Ew weke netewa Fireûn û
ewên pêş ewan da ne ku bawerî bi nîşaneyên Xwe dê nekirn, lewma Xwe dê li ber
xatira gunehên wan ew girtin, Xwe dê Xwedan şêyane û gelek li sizayê da dijware.
[53] Eve li ber hindê ye ku Xwe dê ew başiya ku Ev li mirova diket naguherît, meger ew,
ya di naw xwe da biguherin. Xwe dê Bihîstine û Zanîne.



a: Mihemed peyamber.

54 Çanda wan weka netewa Fireûn û ewên pêş ewan da ye, ewan nikolî[a] li nîşaneyên
Xwedanê xwe kirin, liber xatira gunehên wan, Me ew li navbirin û Me netewa Fireûn
xendiqandin, ew hemû nebaşkar bûn. 55 Kotîtrîn rihtiber, li pêş çavê Xwe dê ewin ku
bawer nekirîne û ew bawer naken, 56 ewên ku, her dema tu peymanekê digel wan girê
didey, hemû cara dişkînin, çimkî ew hişyarê Vî nîn.57 Eger hûn li şer da serdestiyê li
ser ewan da peyda biken, mînakên tirsnak li wan çêken, bo ewên ku dê li piştî wan
bên, belke li ber hindê bo wan bibîte bîrewerî 58 û eger tu li xiyaneta mirova bitirsî,
havêje bal[b] wan her wek wan. birastî Xwe dê hez ewên xiyanetkar naket.
59 Nehêle nebawer hizir biken ku ew dê bikarin birewin, birastî ew nikarin têk bişkînin.
60 Li dijî ewan her hêzekê ku hûn bikarin kom biken serûber ken, digel hespên şer ku
pê dijminên Xwe dê û yê xwe bitrsînin û ewên dîke jî ku hûn nas naken lê jibo Xwe dê
nasyarin. Her tiştekê hûn li rêya Xwe dê da biden, ew dê bi tewawî bi we bête dan û
nerastî li we nayête kirinê. 61 Lê eger ew alîgiriya aştiyê biken tu jî dibya alîgiriyê bo
hindê bikey û pişta xwe bi Xwe dê rast bike, Ev Bihîstine û Zanîne. 62 Eger ew
bixwazin ku te bilêbînin Xwe dê têra te heye, Ev bû ku bi yarmetiya Xwe û
bawermenda tu bihêz kirî 63 û dilê wan aniye bal hev. Tenanet eger te hemû tiştê ser
erdê da ba, te dê nekarîba dilê wan bîniye bal hev, lê Xwe dê ew înane bal hevdu
Xwe dê şêyana wê heye ku biryarê bidet.64 Pêşbîn, Xwe dê têra te û ew bawermenda
jî heye ku te dişopînin.65 Pêşbîn, bawermenda han bide ku şer biken, eger bîstê bêhn
fereh li naw we da hebin, ew dê li ser duseda da bikevin û eger sed bêhnfereh li naw
we da hebin, ew dê ser hizara li naw nebawera da bikevin, çimkî ew li wan mirovane
ku tênagehin. 66 Niha Xwe dê bo we hêsan kiriye, Ev dizane ku li naw we da lewazî
heye, lewma sed li bêhn ferehên we, dê duseda bibezînît û bi destûra Xwe dê hizar li
we dê duhizara bibezînin, Xwe dê digel bêhn fereha ye.
67 Ew bo Pêşbîn nîne, pêş ku ew şer da serkevît zîndaniyê şer bigrît. Hûn destkevtên ev
dinyayê dixwazin, lê Xwe dê destkevtên Dawiyê dixwazît. Xwe dê Bihêze Biryardere
68 û eger pêşta fermana vê li bal Xwe dê we nehatiba dan, ber xatira ewa ku we
rakirbû dê sizayek dijwar li we daba. 69 Liber wê hindê bi rêkek qanûnî û baş tam jê
biben, ew tiştên ku we li şer da dest xwe êxistine û hişyarê Xwe dê bin birastî Xwe dê
Lêbihore û Rehmê didet. 70 Pêşbîn[c], bêje ew zînadiyên ku te ragirtine, ´Eger Xwe dê
bizanît ku li dilê we da başî heye, Ev dê tiştek baştir li ewa ku li we hatiye sitandin
bidete we û Ev dê li we bibhorît, Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. ´ 71 Lê eger ew
bixwazin xiyanetê li te biken, ewan pêşta xiyanet li Xwe dê kiriye û Ev serwere li ser
wan da, Xwe dê Zanaye Biryardere.



a: Haşa, înkar.
b: Peymana wan havêje bal wan, digel wan peymana girê nede.
b: Pêşbîn yanî Nebî, basê Mihemed peyamber bû.

72 Ewên ku bawer kirin û koç kirine û li rêya Xwe dê, da bi mal û canê xwe, li ber xwe
diden û ewên ku penah û yarmetî dan, ew hevpeymanê hevin. Bo ewên ku bawer
kirin lê koç nekirin, jibo parastina wan hûn berpirsiyar nînin, taku ew koç neken. Lê
eger ew jibo dîn daxwaza yarmetiyê li we biken, ewe erkê we ye ku yarmetiya wan
biken, xêncî ew mirovên ku we peyman digel wan hey, Xwe dê ewa hûn diken dibînît.
73 Hindek li ewên nebawer hevpeymanê hevdu ne. Eger hûn wisa neken, dê li ser erdê
çewsandin û gendeliyek gelek mezin hebît. 74 Ewên ku bawer kirin, koç kirin û li rêya
Xwe dê da li ber xwe dan û ewên ku penah û yarmetî dan, ew bawermendê rastî ne û
ewan dê lêbihorîn û dabîn kirinek jêhatî hebît 75 û ewên ku paşê bawer kirin û koç
kirin û li kêleka we da berxwe dan, ew jî li we ne, lê di nivîsîna pîroza Xwe dê da,
hêşta jî xizma mafek zêdetir li ser hevdu heye[a], Xwe dê zanist li ser hemû tişta heye.



a: Li gor qanûna Xwe dê jibo mîrat xizma mafek zêdetir li ser hevda heye.

### 9. Para Peşîmaniyê

[1] Xwe dûr kirina Xwe dê û peyamberê Vî, li ewên ku li naw
putperesta[a] da we peymaname digel wan girêdabû. [2] Lewma bo çar
heyva hûn bi serbestî ser erdê bigerên, belê bizanin ku hûn li Xwe dê
narewin û Xwe dê, dê ewên nebawer serşor biket. [3] Ragehandinek li
bal Xwe dê û peyamber Vî we bo hemû mirova di roja heca mezin da,
´Xwe dê û peyamberê Vî dûr bûne li ewên ku hevala jibo Vî peyda
diken. Lewma, ew dê bo we baştir bît ku hûn peşîman bin, lê eger hûn
pişta xwe bidenê, bizanin ku hûn nikarin li Xwe dê birewin, ´Mizgîniya
eşkenceyek bijan bide ewên nebawer, [4] xêncî ew putperestên ku rêz li
peymana xwe digel we digrin û wan piştîvaniya çi kesê li dijî we
nekirîne, peymanama xwe digel wan bi cih bînin taku digehîte dema
wê. Xwe dê hez li ewan diket ku hişyarê Vî ne. [5] Dema ku ew heyvên
qedexe tewaw bûn, herderê hûn rastî putperesta hatin, ewan bikujin,
ewan bigrin, ewan dorpêç ken, li hemû cihên nobedariyê da li benda
wan bimînin, lê eger ew peşîman bin, nûbêjên xwe biken û ew xêra ku
bo wan hatiye dîharî kirin biden, bihêlin bila ew biçine ser rêka xwe,
birastî Xwe dê, Ev ê Lêbihore û Rehmê didet. [6] Eger her putperestek
bêt û daxwaza parastinê li te biket, penahê bide wî, bila bi wî awayî ew
peyvên Xwe dê bibhêt, paşê wî bibe cihek parastî, çimkî hindek mirov
hene ku nizanin. [7] Çawa dê peymanek di nawbera Xwe dê û
peyamberê Vî digel putperesta hebît? Xêncî ewên ku di mizgewta
Heram da te peyman digel wan girêda, lewma taku ew digel te rast
bimînin, digel wan rast bimîne, Xwe dê hez ewan diket ku hişyarê Vî
ne. [8] Çawane dema ku ew serdestiyê li ser we da peyda diken, ew rêz li
hîç peymanekê xizmatiyê yanjî peymanên parastinê digel we nagirin?
Ew bi zimanê xwe, we keyfxweş diken, lê dilê wan napejirînît û
piraniya wan bi pêdagirî serkêşin. [9] Ewan eşkereya Xwe dê bi erzanî
veguheriye û rêgiriya li rêya Vî kirîne, birastî kiryara wan nebaş bû!
[10] Ew bi rêz nazêndene peymana xizmatî û peymana parastinê digel
bawermenda. Ewin ku sînora dibezînin. [11] Eger ew peşîman bin,
nûbêjê xwe biken û ew xêra ku bo wan hatiye dîhar kirin biden[b], paşê
ew birayê we yê dînî ne, jibo ew mirovên ku dizanin, Em eşkereya
şirove diken. [12] Lê eger, piştî ku wan girêbest digel te girêdayî ew sûnda
xwe bişkînin û dijûna bidene dînê te, bes şerê serkirdeyê nebawera
bike, birastî bo wan çi sûnd çinînin, liber wê hindê belke ew waz lê
bînin.



*Eve tenê para nivîsîna pîroza Xwandinê ye ku bi navê Xwe dê dest pê nekiriye!

a: Ewên ku hevala jibo Xwe dê peyda diken. (Moşrik) b: Zikat

[13] Meger hûn şerê ew mirovane naken ku sûnda xwe şikandine û biryar
dan ku peyamber der biken, ewên ewlî destpê kirbûne ser we? Hûn li
wan ditirsiyên? Ev Xwe dê ye ku mafek zêdetir heye ku dibya hûn lê
bitirsin, eger hûn bawermendin. [14] Şerê ewan biken Xwe dê, dê bi
destê we, ewan siza bidet. Ev dê wan serşor ket, Ev dê yarmetiya we
biket li dijî ewan da, ew dê singê mirovên bawermend keyfxweş biket
[15] û dê kerbê di dilê wan da raket. Xwe dê bi lêbihorîn rû dikete her
kesê ku Ev dixwazît, Xwe dê Zanaye Biryardere. [16] Hûn hizir diken ku
hûn dê bimînin, bêy ku Xwe dê aşkira biket kê li naw weda berxwe
didet û xêncî Xwe dê peyamberê Vî û bawermendên dîke nêzîkê ewên
dîke nabît? Xwe dê agahdarê ewêye ku hûn diken. [17] Bo putperesta
nîne ku mizgewta Xwe dê nûjen biken dema ku ew gewahiya
nebaweriya xwe diden, kiryarên mirovên wisa dê bîte çineyî û ta
bêdawiyê ew dê li naw agir da bimînin. [18] Tenê ew dibya mizgewta
Xwe dê nûjen ken ku bawerî bi Xwe dê û Roja herî dawiyê hene,
nûbêjê diken, ew xêra bo wan hatiye dîhar kirî diden û ewên ku li kesê
natirsin bes Xwe dê nebît, çimkî hêvî tête kirin ku ew dê li naw ewên
rênivînî kirî da bin. [19] We wisa lê kiriye ku dana avê bi haciya û nûjen
kirina mizgewta Heram weke kiryara ewane ku bawerî bi Xwe dê û
Roja dawiyê hene û li rêya Xwe dê da têkoşînê diken? Li pêş çavê
Xwe dê, da ew weke hevdu nînin. Xwe dê mirovên ku karên nebaş
diken rênivînî naket. [20] Ewên ku bawer kirîne, koç kirin û li rêya
Xwe dê, da bi mal û canê xwe we têkoşîn, li bal Xwe dê ew li pileyekê
gelek serwetir dane, ewane ewin ku dê dest xwe we bînin,
[21] û Xwedanê wan mizgîniya rehmê, keyfxweşiyê û baxçeyên ku ewan
dê têda şadiya bêpayan hebît didete wan [22] û ta bêdawiyê ew dê li
wêderê bimînin, birastî Xwe dê padaşek gelek mezin li bal Xwe heye.
[23] Bawermendino, bira û babê xwe weke hevpeyman vernegrin, eger
ew hez li nebaweriyê diken ta baweriyê, ewên ku li naw we da wisa
diken, bes ewin ku ew nerastiyê diken. [24] Bêje ´Eger babên we, kurên
we, birayên we, hevjînên we û xizmên we, serweta ku we destê xwe
êxistiye, ew danûsitandina ku hûn ditirsiyên dê kêm bît û ew avahiyên
ku hûn têda keyfxweşin, xweşevîstirn li Xwe dê, peyamberê Vî û
têkoşîna li rêya Vî da, bes li bendê bin taku Xwe dê fermana Xwe bicih
tînît.´ Xwe dê, ewên ku bi pêdagirî serkêşin rênivînî naket.´
[25] Her wisa Xwe dê li gelek erda da, yarmetiya we kiriye û li roja
Huneyn[a] ê da. Dema hûn bi hejmarên xwe yên zêde gelek keyfxweş
bûn, lê ewan jiboy we çi kêr çinebûn, rengê hindê dida ku tevî ferehiya
wê, erd bo we teng bibû û hûn pişt xwe we zivrîn û revîn.



a: Li gor gotina Ebdil Helîm base ew şeriye ku li cihekê bi navê Huneynê rû dabû.

26 Paşê Xwe dê tenahiya Xwe şande ser peyamberê Xwe û ser
bawermenda û şervanên ku we nedidîtin şandine xarê û Vî ewên
nebawer siza dan, eweye sizayê nebawera. 27 Lê paşê Xwe dê, dê
peşîmaniya her kesê ku Ev dixwazît bipejrînît û Xwe dê Lêbihore û
Rehmê didet. 28 Bawermendino, ewên putperest birastî napakin;
nehêlin paş îsal ew bêne nêzîk mizgewta Heram. Eger hûn li hejariyê
ditirsiyên, Xwe dê dê li qenciya Xwe we heyî biket, eger Ev bixwazît.
Xwe dê Zanaye Biryardere. 29 Ew mirovên ku bawerî bi Xwe dê û
Roja dawiyê naken, ewên ku qedexe naken ewa ku Xwe dê û
peyamberê Vî qedexe kirine, ewên ku dînê rastiyê li ewên ku nivîsîna
pîroz bi wan hatiye dan napejirînin, taku bi dilxwaz bacê[a] neden û xwe
radest neken şerê wan biken. 30 Cihûya got,´Uzêr kurê Xwe dê ye´ Û
Fela got, ´Mesîh kurê Xwe dê ye´ Ewan, ew gotin pê devê xwe gotin,
ew çavlêkeriya nebawera diken, belke Xwe dê ewan li nav bibet! Ew
çend xapandîne. 31 Ewan Xaxam û Qeşeyên xwe weke xwedan li
kêleka Xwe dê da vergritne û Mesîhê kurê Miryemê jî. Çi ferman li
wan nehatibûne kirin xêncî perestîna Xwe dê Yêkta! Çi xwedê nînin
bes Ev nebît, Ev gelek payebilindtire li ew tiştên ku ew weke heval bo
Vî didanên! 32 Ew dixwazin ku ronahiya Xwe dê pê devê xwe
bitemirînin, lê Xwe dê pêdagire ku ronahiya Xwe bêkêmasî biket,
herçend ku kerbê nebawer lê divebît. 33 Ev e ku peyamberê Xwe bi
rênivînî û dînê rastiyê şandiye ku serwey hemû dîna da bicih bînît,
herçend ku kerbê ewên ku hevala bo Vî peyda diken lê divebît. 34 Hûn
ku bawer diken, birastî gelek Xaxam û Qeşe bi bêdadî malê mirova
dixwen û rêgiriya wan li rêya Xwe dê diken. Ewên ku zêr û zîva kom
diken û li rêya Xwe dê, da xerc naken, mizgîniya eşkenceyek bijan bide
wan, 35 di ew Rojê da, ew[b] dê bi agirê cehnemê bête kel kirin û bo
dirûşim kirina enî, tenişt û pişta wan dê bikar bêt, dê bêjine wan, ´Ewe
bû ewa ku we bixwe kom kir! Lewma ewa ku we kom kirbû tam
biken!´ 36 Birastî hejmara manga li bal Xwe dê dazde mangin li
tomara Xwe dê da, dema afirandina asimana û erdê li wan, çar
mangên wê pîrozin, ewe dînê seraste. Lewma li ewan da nerastiyê li
xwe neken û hemû bihev ra şerê ewan biken ku ´hevala´ jiboy Vî
peyda diken, herwek ku ew hemû bihevra şerê we diken. Bizanin ku
Xwe dê digel ewane ku hişyarê Vî ne.



a: Pêka gotina Ebdil Helîm Ciziye li Cayzê hatiye yanî li şûn da diraf dan bo parastinê. Lê ew kesê ku bacê didet edî jibo parastina welatê bawermenda şervaniyê naket. (Ew kesê ku Cizyê didet edî xizmeta eskerî naket) Li şûna peyva Ciziye da min peyva Bac bikar înaye.
b: Basê zêr û zîva ye ku mirov kom diken û li rêya Xwe dê da naden.

[37] Birastî paşvedan[a] nebaweriyê zêdetir diket, ku pê wê, ewên nebawer
zêdetir li rê derdikevin, ew salekê qanûnî diken û salek dîke qedexe diken,
ji bo hindê ku digel ew hejmarê rêk bêxin ku Xwe dê qedexe kiriye û ewê
qanûnî biken ku Xwe dê qedexe kiriye. Kiryarê wan yê nebaş jibo wan
hatine xemilandin. Xwe dê mirovên nebawer rênivînî naket.
[38] Bawermendino çima dema dibêjine we, ´Herin li rêya Xwe dê da şeri
biken´ Hûn xwe qahîm bi erdê we girê diden? Hûn dilxweşin bi jiyana ev
dinyayê ta Dawiyê? Berawird digel Dawiyê, keyfxweşiya ev dinyayê gelek
kême! [39] Eger hûn neçine pêş, Ev dê bi dijwarî we siza bidet û dê
neteweyeke dîke li şûna we da cihgîr biket, lê hûn nikarin zirarê li Vî
biden, Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye. [40] Tenanet eger hûn
yarmetiya wî jî neken, Xwe dê pêşta yarmetiya wî kiriye, dema ku
nebawera ew kirine derê, dema ew herdu[b] li şikewtê da bûn, wî gote
hevalê xwe, ´Netirse, Xwe dê digel meye´ Û Xwe dê tenahiya Xwe bo wî
şand, bi hêzên ku te nedîtin yarmetiya wî kir û peyva ewên nebawer gelek
siwik kir û peyva Xwe dê eva herî serwetire, Xwe dê şêyana wê heye ku
biryarê bidet. [41] Herne pêş, çi bi siwikî yanjî bi giranî û li rêya Xwe dê, da
bi mal û canê xwe, li ber xwe biden, eve bo we baştire, bes eger tenê we
zanîba. [42] Eger destkevt têda heba û rêvîtî kurtir ba, ewan dê tu
şopandibay. Lê jiboy wan rê gelek dûr bû. Ew dê bi Xwe dê sûnd bixwen,
´Eger me karîba, bêguman em dê digel te çobana der,´ Lê ewan xwe li
nav birin, çimkî Xwe dê dizanît birastî ew direwînin. [43] Xwe dê li te
bihorî[c], te çima destûr da wan? Pêş ku bo te zelal bît ka kîjan li wan rastî
gotin û kîjan li wan derewîn bûn? [44] Ewên ku bawerî bi Xwe dê û Roja
dawiyê hene, ew daxwaza lê xweşbûnê bo têkoşîn bi mal û canê xwe li te
naken. Xwe dê dizanît kê hişyarê Vî ye. [45] Tenê ewên ku bawerî bi
Xwe dê û Roja dawiyê nînin, ew daxwaza destûra te diken, ewan guman
li dilê xwe da heye û li ber wê hindê ew arxayin nînin. [46] Eger ewan brastî
xwastiba digel te biçine derê[d], ewan dê serûberî kirban, lê Xwe dê hez
nekir ku ew biçin û lewma Vî, ew paşwe ragirtin û gotine wan, ´Digel
ewan bimîne ku dimînin.´ [47] Eger ew digel te hatibana derê, xêncî gêjiyê
ewan tiştek dîke bo te zêde nedkirin, ewan dê berxwe daba tovê nakokiyê
li naw we da biçînin û hindeka li naw we da, dê bi daxwaz guhdariya
ewan kirba, Xwe dê dizanît kê nerastkarin. [48] Birastî, ewan hewil dabû ku
bi ciyawaziyê têkdanê biken, ewan li dijî te xerîte kêşa bûn, taku rastî
aşkira bû û fermana Xwe dê hate cih dema ku ew bêzar bûn.

a: Paşvedana dema Hecê!
b: Mihemed peyamber û hevalê wî ye.
c: Mihemed peyamber
d: Biçin derê bo şer

49 Hindeka li naw ewan da gotin, ´Destûrê bide me ku em biçin, me taqî[a]
neke.´ Bêguman ew li naw taqî kariyê da ne, birastî, cehnem dê nebawera
dorpêç ket. 50 Eger başî bête serê te, ew dê wan şepirze biket, lê eger
karesat bête serê te, ew dê bêjin, ´Me li pêşta parêz kirbû´ Û bi keyfxweşî
pişta xwe didenê. 51 Bêje, ´Xêncî eva Xwe dê radigehînît çi tiştê dîke
nayête serê me. Ev parêzvanê me ye´ Û bawermend pişta xwe bi
Xwe dê rast diken.52 Bêje, ´Hûn çavnihêrê tiştekê xêncî yêk li wan du
tiştên baş bo me ne? Dema ku em jî çavnihêrin Xwe dê bi êşekê we siza
bidet, yan li aliyê Xwe, yanjî pê destê me. Li ber hindê çavnihêr bin, em jî
digel we çavnihêrin.´ 53 Bêje, ´Çi hûn bi dilxwezê xwe biden yanjî bi
nejdilî, çi cara li we nayête pejirandin, çimkî hûn li wan mirovane ku bi
pêdagirî serkêş bûne.´ 54 Tenê tişta ku pêşgîrî diket ku ewa ew diden
neyête pejirandin, ewe ku ew bawerî bi Xwe dê û peyamberê Vî naken,
ew nayêne nûbêjê bes bi bê xîretî nebît û ew naden bes bi nejdilî nebît.
55 Li ber wê hindê nehêle mal û zarûkên wan bandorê li ser te danên,
Xwe dê dixwazît pê ewan li jiyana ev dinyayê da, wan eşkence bidet û
riha wan biçît dema ku ew nebawerin. 56 Ew bi Xwe dê sûnd dixwen ku
ew digel we ne, lê ew digel we nînin. Ew mirovên tirsonekin. 57 Eger ewan
karîba penah gehekê yanjî şikevtekê, yanjî cihekê ku biçine têda, peyda
biken ew dê çobana têda, dema ku ew bêhiş direwin. 58 Li naw ewan da
hindek hene ku sebaret bi belav kirina xêrê, rexne li te digrin, ew
keyfxweşin, eger didene wan, lê dema ku nadene wan, nişkida kerbê wan
divebît! 59 Eger tenê ew keyfxweş ban, bi ewa Xwe dê û peyamber Vî
dayne wan û gotiban, ´Xwe dê têra me heye, Xwe dê li qenciya Xwe, dê
bidete me û peyamberê Vî jî. Em bi hêvî dizivirine aliyê Xwe dê.´60 Xêr
tenê bo hejara, bo ewên xwedan pêdavîstî, bo ewên ku jibo wan kom
diken, bo ewên ku pêvîste em dilê wan dest xwe we bînin, bo serbest
berdana girtiya û yarmetiya ewên ku deyn darin, bo rêya Xwe dê û bo
rêviyên xwedî pêdavîstî xêr hatiye danan. Li bal Xwe dê we eve erke.
Xwe dê zanista wê heye ku biryarê bidet. 61 Li naw ewan da, hindek hene
ku bi gotina, ´Ew dê guhdariya her tiştekê biket.´ Pêşbîn[b] diêşînin. Bêje,
´Ew bo başiya we bixwe guhdarî diket, ew bawerî bi Xwe dê û bawerî bi
bawermenda diket û ewe rehme jibo ewên ku li naw weda bawer diken.´
Eşkenceyek bijan benda ewane ku peyamberê Xwe dê diêşînin. 62 Ew bi
Xwe dê sûnd dixwen ku we keyfxweş biken, lê mafê keyfxweş kirinê
zêdetir yê Xwe dê û peyamberê Vî ye, eger ew bawermendin. 63 Meger
ew nizanin ku her kesê dijatiya Xwe dê û peyamberê Vî biken dê biçine
naw agirê cehnemê da û ta bêdawiyê dê li wir bimînin? Ewe serşoriya herî
mezine.

a: Îmtihan, ezmûn, ceribandin.
b: Nebî, basê Mihemed peyamber ye.

64 Ewên durû ditirsin ku sebaret bi ewan dê parek[a] aşkira bît û ewa di dilê
wan da derêxîte derê. Bêje,´Henekênê xwe biken, Xwe dê dê bînîte der,
ewa hûn lê ditirsin´ 65 Û eger hûn li wan bipirsin, bêguman ew dê bêjin,
´Em tenê dipeyvin, em dileyîzin.´ Bêje, ´Hûn henekê xwe bi Xwe dê,
eşkereyên[b] Vî û peyamberê Vî diken?´ 66 Çi mahna negrin. Hûn nebawer
bûne piştî ku we bawer kirbû.´ Eger Em li komeke we bibhorin, lê Em dê
komek dîke siza biden, çimkî ew tawankarin. 67 Hindek jin û mêrên durû,
li hev du ne, ew fermana ewa nerast diden û nerêniya ewa rast diken, ew
destmiçî ne. Ewan Xwe dê bîr kiriye, li ber wê hindê, Vî jî ew bîr kirîne.
Birastî ewên bi pêdagirî serkêş durû ne. 68 Xwe dê belêniya agirê cehnemê
daye jin û mêrên durû û nebawera, ta bêdawiyê ew dê li wêderê da
bimînin, ew têra wan heye. Xwe dê ew nerênî kirîne û sizayek bêdavî li
benda wane. 69 Mîna ewên pêş we da, li şêyanê da ew gelek li we bihêztir
bûn, gelek li we zêdetir mal û zarûk hebûn, ewan pişka xwe xweş
qetandin, we jî pişka xwe xweş qetandiye, herwek ewên pêş we da xweşî li
pişka xwe birin û ew jî mijûl wê bûn herwek hûn mijûlê wê ne!´ Ewên ku
li ev dinyayê û Dawiyê da jî kiryarên wan pûç bûne! Ewane ewin ku
dorandine. 70 Meger çi cara nûçeya ewên pêş wan da negeheştiye wan,
netewa Nûh, Ad, Samûd, netewa Ibrahîm, hevrêyên Med a û gundên
sernixûn buyî? Pê belgeyên zelal peyamberên wan hatine bal wan.
Xwe dê, dê çi cara nerastî li wan nekiriba, lê ewan nerastî li xwe kir.
71 Hindek bawermendên mêr û bawermendûn jin piştîvaniya hevdu
diken, ew fermana ewa raste diken û nerêniya ewa neraste diken, ew
nûbêjên xwe diken û ew xêra bo wan hatiye dîhar kirin diden, ew peyrevî
li Xwe dê û peyamberê Vî diken. Xwe dê, dê rehma xwe bidete ew
mirova. Birastî Xwe dê, Bihêze Biryardere. 72 Xwe dê belêniya baxçeyên
ku çem li bin da diherikin daye mêrên bawermend û jinên bawermend, ta
bêdawiyê ew dê li wêderê bimînin, avahiyên xweş li naw baxçeyên şadiya
bêdawî da, lê li hemûyê çêtir keyfxweşiya Xwe dê ye! Eweye serkevtina
herî mezin. 73 Pêşbîn, li dijî nebawera û durûya da şer bike û digel wan
dijwar be. Cehnem penahgeha wane. Armanca wan çend kotiye! 74 Ew bi
Xwe dê sûnd dixwen ku ewan negotibû, lê bêguman ewan peyvên
nebaweriyê gotibûn û piştî ku wan xwe radest kirbû, ewan hevila wê da ku
nekarîn dest xwe we bînin û ew xemgîn nebûn, xêncî wê ku Xwe dê û
peyamberê Vî, pê xelatên xwe, ew dewlemend kiribûn. Lewma eger ew
peşîman bin, ew bo wan bêhtire, lê eger ew pişta xwe bidenê, li ev dinyayê
û Dawiyê da jî, Xwe dê, dê bi eşkenceyekê bijan li wan bidet û kes li ser
erdê da çinabît ewan biparêzît yanjî yarmetiya wan biket.

a: Sûre. b: Ayet

75 Hindek li naw wan da hene ku belêniyê didene Xwe dê û dibêjin, ´Eger
Ev, li qenciya Xwe bidete me, bêguman em dê xêra biden û em dê bêne
naw durustkara da,´ 76 Lê dema Ev li qenciya Xwe didete wan, ew pê
qornûs[a] dibin û pişta xwe didenê û napejrînin. 77 Liber wê hindê ta Roja
ew Vî dibînin, Vî, pê durûyiyê li dilê wan da, ew siza dan. Çimkî ewan
peymana xwe digel Xwe dê şikandin û çimkî ewan direw dikirin.
78 Meger ew nizanin ku Xwe dê nihênî û hevpeyvînê wan yê nepenî
dizanît û Xwe dê ewa nedîtî dizanît? 79 Ewên ku sebaret bi xêra rexne li
ew bawermenda digrin ku bi dilxwaz diden û ewên ku xêncî berxwedana
xwe tiştek dîke çinînin biden, lewma ew henekê xwe bi wan diken,
Xwe dê, dê henekê Xwe bi wan biket û ewan dê eşkenceyek bijan hebît.
80 Daxwaza lêbihorînê bo wan bike yanjî daxwaza lêbihorînê bo wan
neke, eger tu heftê cara jî daxwaza lêbihorînê bo wan bikey, Xwe dê çi
cara li wan nabihorît, çimkî ewan bawerî bi Xwe dê û peyamberê Vî
nekirin. Xwe dê ew mirovên ku bi pêdagirî serkêşin rênivînî naket.
81 Ewên ku li paşve man, ew keyfxweşin ku ew paş peyamberê Xwe dê, ew
li paşve man, ewan kerb li hizra têkoşîn bi mal û canê xwe li rêya Xwe dê
da vedibû û gotin, ´Li wê germê da neçine derê.´ Bêje, ´Agirê cehnemê
gelek li wê germtire.´ Eger ew tenê têgeheştiban! 82 Bihêle bila ew kêmekê
bikenin, weke siza, ew dê gelekê bigiryên, ber xatira ewa ku wan dest xwe
êxistiye. 83 Eger Xwe dê te bizvrînîte bal komek wan û ew daxwaza
destûrê li te diken ku biçine derê, bêje, ´Hûn çi cara gel min nayêne derê
û digel min şerê dijmin naken, birastî cara yêkê hûn keyfxweş bûn ku
bimînin, li ber wê hindê digel wan bimîne, ewên ku li paşve dimînin.´
84 Eger ew bimrin çi cara bo hîç yêk li wan nepariyê û li ber gora wan
neraweste, birastî ewan bawerî bi Xwe dê û peyamberê Vî nekirin û ew
mirin dema ku ew bi pêdagirî serkêş bûn. 85 Nehêle mal û zarûkên wan
bandorê li ser te danên, Xwe dê dixwazît, pê wan li ev dinyayê da ewan
eşkence bidet û riha wan liber wan biçît, dema ku ew nebawerin. 86 Dema
ku parek eşkere bû, ´Bawerî bi Xwe dê biken û li kêleka peyamberê Vî da
şer biken,´ Ewên xwedan serwet li naw, wan da daxwaza destûrê li te
kirin, gotin, ´Bihêle em li paşve bimînin, digel ewên dimînin´ 87 Ew
keyfxweşin ku digel wan bin ku li paşve dimînin. Dilê wan hatiye pêçan,
lewma ew tênagehin. 88 Lê peyamber û ewên ku digel wî da bawer diken,
pê mal û canê xwe têkoşîn kirin. Ewan dê başî hebît, ewin ku dê serkevtî
bin.
89 Xwe dê jibo wan baxçeyên ku çem têda diherikin amade kirîne û ta
bêdawiyê ew dê li wêderê bimînin. Eweye destkevta herî mezin.



a: Destmiçî, ewên ku nejdil diraf diden

[90] Ewên li naw Ereban jî hatin ku mahna bigrin, daxwaza lê xweş bûnê
kirin. Ewên ku direw digel Xwe dê û peyamberê Vî kirin û rûniştin[a],
eşkenceyek bijan dê li wan bidet ku li naw ewan da bawer naken, [91] lê çi
lome li ewên bêhêz, yanjî nexweş û ewên ku çi nînin ku biden, nayê kirin,
bi li berçavgirtina wê ku ew jidil we digel Xwe dê û peyamberê Vî ne! Çi
lome li ser ewên ku başiyê diken nînin, Xwe dê Ev ê Lêbihore û Rehmê
didet [92] û nejî li ser ewane ku hatin tu ajelekê siwarê bo wan dabîn bikey û
te got, ´Ez nikarim çi tiştekê bo we peyda bikem ku tu lê siwar bî´, ew bi
çavên pir rondik ku xemgînî lê dibarîn, paşve zivrîn, liber ku ewan çi tiştek
çinebû ku ew bikarin biden. [93] Hokar[b] tenê li ser ewane ku heyî ne û
daxwaza lê xweş bûnê li te kirin, ew keyfxweşin ku digel ewên ku li paşve
mabûn bimînin. Xwe dê dilê wan pêçaye, lewma ew nizanin.
[94] Ew dê bo we mahna bigrin, dema hûn vedigerêne bal wan. Bêje,
´Mahna negrin. Em çi cara bawerî bi we naken, Xwe dê sebaret bi we
agahdarî daye me. Xwe dê û peyamberê Vî, dê niha kiryarên we binêrin
û paşê hûn dê bizvirne bal Ev ê ku ewa nedîtî û ewa dîtî dizanît, paşê Ev
dê we agahdar biket ku we çi dikir.´ [95] Dema hûn dizvirne bal wan, bo
ewê ku hûn waz li ewan bînin, ew dê bo we bi Xwe dê sûnd bixwen, li ber
wê hindê waz li wan bînin, birastî ew nepakin û weke padaşekê bo
destkevtê wan, cehnem dê penahgeha wan bît. [96] Ew dê bo we sûnd
bixwen da ku hûn digel wan keyfxweş bin, lê tenanet eger hûn jî digel wan
keyfxweş bin, Xwe dê tewî ew netewê keyfxweş nabît ku bi pêdagirî
serkêşin. [97] Ereb li nebawerî û durûyî ê da bihêztrînin. Gelek kêm rengê
hindê didet ku ew sînorên ku Xwe dê, bo peyamberê Xwe şandîne xarê
bizanin. Xwe dê, Zanîne Biryardere. [98] Hindek li naw Ereba da hene, ewa
ku ew diden weke zirarê dibînin, ew çavnihêrin ku bext li dijî te bizvrît, lê
bextê nebaş dê li dijî wan bizvrît. Xwe dê Bihîstine û Zanîne.
[99] Lê li naw Ereba da jî hindek hene ku bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê
hene û ewa ku diden wisa berçav digrin ku ewan tînîte nêzîk
Xwe dê û pariyanên peyamber. Bêguman ew dê ewan bînine nezîktir û
Xwe dê dê wan vergrîte naw rehma Xwe da, birastî Xwe dê Lêbihore û
Rehmê didet. [100] Xwe dê, dê digel yêkemîn pêşengên li naw koçber û
yarmetîdera û ewên ku pê kiryarên baş ewan dişopînin dê keyfxweş bît û
ew jî dê digel Vî keyfxweş bin û Vî baxçeyên ku çem têda diherikin bo
wan amade kirîne, ta bêdawiyê ew dê li wêderê bimînin. Eweye destkevta
herî mezin. [101] Hindek Ereb li dewr û berê we durû ne û hindek mirovên
Medînê jî, ew li durûyî ya xwe da rikuyî ne. Tu ewan nas nakey, lê Em
ewan nas diken, Em dê du cara ewan siza biden, paşê ew dê bêne
zivrandin ku eşkenceyek gelek mezintir bibînin,



a: Basê ew Ereba ye ku paşve man, neçone şer b: Hokar (sebeb) bo lome kirinê û rexne!

[102] û ewên dîke jî ku gunehên xwe gotine, ewan dirustkarî têkilî ewa
nebaşiyê kirîne. Belke Xwe dê bi lêbihorîn rû li wan biket, birastî Xwe dê
Lêbihore û Rehmê didet.[103] Jiboy ku ewan pak bikey û bibye hokarê zêde
bûnê, xêrê li malê wan rake û bo wan bipariyê, pariyana te dê bo wan
tenahî bît. Xwe dê Bihîstine Zanîne. [104] Meger ew nizanin ku Ev Xwe dê
ye, Ev ê ku peşîmaniyê li koleyên Xwe dipejirînît û ew xêra ku hatibîte
dan verdigrît? Ev Xwe dê ye ku peşîmaniyê dipejirînît, Ev ê Rehmê didet.
[105] Bêje ´Karekê biken! Xwe dê, dê karê we bibînît, her wisa dê peyamber
û bawermend jî û paşê hûn dê bêne zivrandin bo bal Ev ê ku ewa hatiye
dîtin û nehatiye dîtin dizanît û Ev dê te agahdar biket ku te çi dikir.´
[106] Û ewên dîke jî paşve hatine dan bo Xwe dê biryarê li ser wan bidet,
yanjî ewan siza bidet yanjî li wan bibhorît. Xwe dê Zanîne Biryardere,
[107]û ewên ku bi armanca hindê ku bibine hokarê zirar, nebawerî û
cudatiyê li nawbera bawermenda da, mizgewtekê bixwe digrin, weke
bingehekê bo ewên ku pêşta şerê Xwe dê û peyamberê Vî kirbûn,
bêguman ew dê sûnd bixwen, ´Me tenê baştrîn mebest hene,´ lê Xwe dê
gewahe ku ew direwînin. [108] Çi cara li ewê da neraweste, gelek baştire tu
di wê mizgewtê da rawestî ku li roja ewlî da li ser hişyariya Vî hatiye ava
kirin. Di wê da mêr hene ku hez diken xwe pak biken, Xwe dê hez li wan
diket ku xwe pak diken.[109] Ewê ku binaxa avahiyê xwe li ser hişyariya
Xwe dê û keyfxweşiya Vî raçandiye başe yanjî ewê ku binaxa avahiyê
xwe li ser lêwa kendalekê ku diherifît radiçînît ku dê weresiyête xarê bo
naw agirê cehnemê da û wî jî digel xwe bibet? Û Xwe dê netewa nebaşkar
rênivînî naket, [110] avahiyê wan raçandî, dê hemû demê li naw dilê wan da,
dê serçave ya gumanê bît, taku dilê wan bi pirtika bête ker kirin. Xwe dê
zanist heye ku biryarê bidet. [111] Xwe dê can û malê bawermenda li şûna
ewa ku dê wan li naw baxçe da hebît kiriye! Ew li rêya Xwe dê da şer
diken ew dikujin û têne kuştin, eweye belêniya rastî ku li bal Vî we di
Rênivînî (Toratê), Mizgînî (Incîlê) û Xwandinê (Quranê) da hatiye dan.
Kê dikarît di belêniya xwe da li Xwe dê zêdetir rast bît? Lewma keyfxweş
be liber ew danûsitandina te kiriye û ewe destkevta herî mezine.[112] Ewên
peşîman, ewên ku diperestin û pesinê diken, ewên ku rojî dibin, serê xwe
diçemînin û çok didanên, ewên ku fermana ewa baş diken û nerêniya ewa
nebaş diken û sînorên Xwe dê diparêzin û mizgîniyê didene bawermenda.

[113] Ew bo Pêşbîn[a] û ewên bawermend nîne ku daxwaza lêborînê bo
putperesta[b] biken, tenanet eger ew xizmê wan jî bin, piştî ku bo wan zelal
bûye ku ew hevrêyên naw guriyê ne, [114] Ibrahîm daxwaza lêborîne bo
babê xwe kir, tenê li ber hindê ku wî belênî pê dabû, lê dema bo wî zelal
bû ku babê wî dijminê Xwe dê ye edî ew xwe li wî nekire xwedan. Birastî
Ibrahîm dil nazik û bêhin fereh bû. [115] Xwe dê nahêlît neteweyek li rê
derkevît piştî ku Vî ew rênivînî kirîne, taku Ev bo wan zelal biket ku ew
dibya hişyarê çi bin. Birastî Xwe dê zanista hemû tişta heye.
[116] Padişahiya asimana û erdê ya Xwe dê ye, Ev jiyan û mirinê didet, li
xêncî Xwe dê we çi parêzvan û yarmetîder nînin. [117] Xwe dê li Pêşbîn,
koçberan û yarmetîderan xweş bûye ewên ku li demjimêra tengasiyê da,
peyrevî li wî kirin, dema ku kêm mabû hindek dil la biden. Paşê Ev li wan
xweş bûye, birastî Ev digel wan mêhrîvan û birehm bûye [118] û ew her sê
ku li paşve hêlan, dema ku erd bi hemû ferehiya xwe bo wan tengav bû û
riha wan bixwe li wan tengav bû û ew bêguman bûn ku çi penah li
Xwe dê nînin xêncî Vî bi Xwe nebît. Paşê Ev, jibo aliyê wan zivirî ku ew
bikarin peşîman bin. Birastî Xwe dê peşîmaniya dipejirînît û Rehmê
didet.
[119] Hûn ku bawer diken, hişyarê Xwe dê bin û digel ewan bin ku rastin.
[120] Şêniyên Medînê û ew Erebên li der dorê wan, nedibya li dû
Peyamberê Xwe dê da paşve bimînin nejî dibya ewan li wî zêdetir hez li
xwe kirban, eger ew çi demekê tênîtiyê, mandî bûn yanjî birsîtiyê li rêya
Xwe dê, da bikêşin her pêngavekê raken ku kerbê nebawera diveket, yan
jî bi her lêdanekê li dijmin biden, li ber xatira hindê, kiryarek baş bi
qazancê wan tête tomar kirin, Xwe dê çi cara padaşê ewên ku karên baş
diken heder nadet,[121] eger ew kêmekê yanjî gelekê biden yanjî dev geliyekê
da derbaz bin, ew bo wan hatiye tomar kirin, liber wê hindê ku
Xwe dê bikarît pêka baştrîn kiryarên wan, padaşê bidete wan. [122] Nabît
hemû bawermend digel hevda biçine derê[c], li her komek wan dibya
hindek biçine derê ku li ser dîn têgeheştinê dest xwe we bînin, bi wî awayî
dema ew zivrîn, bila ew bikarin agahdariyê bidene netewa xwe û bi wî
awayî bila wan hajê hebît. [123] Hûn ku bawer diken, şerê nebawerên nêzîkê
xwe biken û bihêlin bila ew bizanin ku hûn qahîm rawestane, bizanin ku
Xwe dê digel ewane ku hişyarê Vî ne. [124] Her dema ku parek eşkere dibît,
hindek li naw ewan da dibêjin, ´Baweriya kê pê evê zêde bûye?´ Eve
baweriya ewên ku bawer diken zêde diket û ew keyfxweş dibin [125] lê,
sebaret bi ewên ku li dilê xwe da nexweşiyek hene evê nepakî li nepakiya
wan zêde kiriye û ew dê bi nebawerî bimrin.

a: Nebî, base Mihemed peyamber bû.
b: Ewên ku hevala bo Xwe dê peyda diken, ewê ku şirîka bo Xwe dê peyda diken. (Moşrik)
c: Biçne derê ku li rêya Xwe dê da şer biken!

[126] Meger ew nabînin ku salê yêk du cara ew têne taqî kirin? Hêşta jî, ne
ew peşîman dibin û nejî tête bîra wan? [127] Her dema ku parek eşkere dibît,
ew hevdu dinhêrin û dibêjin, ´Kesek we dinhêrît?´ Û paşê rûyê xwe wêda
dizvrînin, Xwe dê dilê wan wêda zivrandiye, li ber wê hindê ku ew li
neteweyekê ne ku tênagehin. [128] Bêguman li naw we bixwe da peyamberek
jibo we hatiye, ew jana ku hûn dikêşin wî di êşînît, nîgeranê we ye û jibo
bawermenda mêhrîvane û rehmê didet, [129] lê eger ew pişta xwe bidenê,
bêje ´Xwe dê têra min heye, çi xwedê nînin xêncî Vî, min xwe sipartiye
Vî û Ev Xwedanê textê[a] herî mezine.´



a: Textê padişahiyê, Xwe dê Padişahê hebûn û nebûnê ye.

### 10. Para Yûnis

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Elîf Lam Ra, Ewane eşkereyên nivîsîna pîroza biryar derin. 2 Bo mirova
gelek sersir înere ku Me bo mêrekê li naw ewan da eşkere kiriye,
´Agahdariyê bidete mirova û mizgîniyê bidete ewên ku bawer diken ku ewan
dê ciheke birûmet li bal Xwedanê xwe hebît?´ Ewên nebawer dibêjin, ´Ewe
bi zelalî cadûye.´ 3 Birastî Xwedanê we Xwe dê ye Ev ê ku li şeş roja da
afirînerê asimana û erdê ye, paşê Xwe li ser text bicih kir, fermanderiya
hemû tiştê diket, kes nîne ku digel Vî nawbêjvaniyê biket, meger Ev pêşta
hêlabît, Ev Xwe dê ye Xwedanê we, liber wê hindê Vî biperestin. Çawa hûn
nayînine bîra xwe? 4 Jibo bal Vî ye ku hûn hemû dê bizvirin, belêniya
Xwe dê raste. Birastî Eve ku afirandinê destpê diket û paşê dubare diket,
belke bi wî awayî Ev bikarît bi dadmendî padaş bidete ewên ku bawer diken
û karên baş diken. Lê ewên nebawer dê li ewa kelandî vexwen û dê
eşkenceyek bijan hebin, liber xatira ewa ku wan nikolî lê dikir. 5 Ev e ku roj
kiriye çirayek ku diteyisît û heyv ronahiyek ku qonaxa bo wê destnîşan diket
bi wî awayî belke hûn hejmara sala bizanin û bihejmêrin. Xwe dê ewe xêncî
rastiyê neafirandine, Ev nîşaneyên Xwe bo ew mirovên ku dizanin şirove
diket.6 Birastî jiboy ew netewa ku hişyarê Vî ne li guhertina şev û rojê da û
ewa ku Xwe dê di asimana û erdê da afirandiye nîşane hene.
7 Birastî ewên ku çavnihêr nînin ku Me bibînin û keyfxweşin bi jiyana ev
dinyayê û pê hest bi tenahiyê diken, ew agahdarê nîşaneyên Me nînin, 8 liber
xatira ewa ku wan dest xwe we têxist, penahgeha wan dê agir bît. 9 Birastî
jibo ewên ku bawer kirîne û karên baş kirîne, Xwedanê wan dê liber xatira
baweriya wan, dê ewan rênivîniyê naw baxçeyên şadiyê biket ku li ber pêyê
wan da, dê çem biherikin 10 li wêderê da, dê pariyanên wan eve bît, ´Paye
bilindî jiboy Te bît Xwe dê!´ Rewş pirsîna wan, ´Aştî´ Û pişka dawiya
pariyana wan dê, ´Pesin jiboy Xwe dê, Xwedanê hemû dinyaya bît.´
11 Eger Xwe dê lez li nebaşiyê bo mirova kiriba her wek ku Ev jiboy wan lezê
li başiyê diket, dema wan dê pêşta tewaw biba. Lê Em dihêlin ewên ku
çavnihêr nînin Me bibînin, bi koretî li sînor bezandina xwe da bigerên.
12 Dema ku karesat tête serê mirovekê, ew gazî Me diket, çi xwe ser teniştê
direj kirîbît, runiştî yanjî ser pêya, lê dema Em karesata wi wêda diben, ew
berdewam dibît, wek tu bêjî ew çi cara gazî Me nekiribû, bo karesata ku
hatibû serê ew. Bi wê rêbazê, kiryarên mirovên sînor bezên jibo wan têne
xemilandin. 13 Birastî li berê da Me gelek nifiş pêş we da li naw birin ku
nerastî dikirin, peyamberên wan, bo wan belgeyên zelal înabûn, lê ewan
bawer nekiribû. Aha wisa Em netewa tawankar siza diden.

[14] Paşê Me, li ser erdê hûn kirine cihgirê wan ka Em bibînin hûn dê çi
biken.[15] Dema ku eşkereyên Me yên zelal bo wan têne xwandin, ewên ku
çavnihêr nînin ku Me bibînin, dibêjin, ´Bo me Xwandinek (Quranek) dîke
bîne, yanjî biguhere.´ Bêje, ´Ewe bo min nîne ku ez li berxweda biguherim, ez
tenê peyrevî li eva ku bo min eşkere bûyî dikem, çimkî ez li eşkenceya Rojek
mezin ditirsim, eger ez peyrevî li Xwedanê xwe nekem, ´ [16] Bêje, ´Eger
Xwe dê xwastiba, min dê bo we nexwandiba, nejî Vî dê bi we daba nas kirin.
Pêş ku eve bo min bêt, ez temenekê li naw we da jiyam, hûn hizra xwe bikar
naynin? [17] Kê dikare li wî nebaştir be ku direwa li dijî Xwe dê berhem tînît,
yanjî nikoliyê li nîşaneyênVî diket? Ewên tawankar serkevtî nabin. [18] Ew li
tenişt Xwe dê, da ew tişta diperestin ku ne dişên zirarê nejî qazancê li wan
biden û dibêjin ´Ewane nawbêjvanê me digel Xwe dê ne.´ Bêje,´Hûn sebaret
bi tiştekê di asimana û erdê da Xwe dê agahdar diken ku Ev nizanît? Ev paye
bilinde! Gelek serwey ew tiştaye ku ew bi Vî we girê diden.[19] Li destpêkê da
hemû mirovatî tenê civakek bû, lê paşê ewan nakokî peyda kir, eger li ber
xatira peyvekê li bal Xwedanê we neba, sebaret bi ciyawaziya wan, dê li
nawbera wan da, dadwerî hatiba kirin. [20] Ew dibêjin, ´Çima li bal Xwedanê
Vî ra bo wî jî çi nîşanî nehatine şandine xarê?´ Bêje ´Tenê Xwe dê ewa nedîtî
dizanît, li ber wê hindê çavnihêr bin, birastî ez jî digel we li naw çavnihêra
dame.´[21] Her ku Em dihêlin mirov rehmekê tam biken, piştî ku karesatê li wan
daye, ew demûdest bername rêjiyê li dijî eşkereyên Me diken. Bêje,
´Xwe dê hêşta bileztir bername rêjiyê diket.´ Biratsî Peyamberên[a] Me ew
bername rêjiyên we tomar diken. [22] Ev e ku dihêlît hûn li ser erdê û deryayê
bigerên, dema ku hûn pê gemiyê digerên û bi bayên baş keyfxweş dibin, dema
ku bayek xurt têt û li hemû aliya ra, şîpel têne ewên ser gemiyê û ew texmîn
diken ku ew dorpêç bûne. Paşê ew jidil we li ber Xwe dê dipariyên ku ew dê
dînê xwe radestê Vî biken ´Eger Tu me li ewê rizgar bikey, em dê li naw
sipasdara da bin.´ [23] Lê dema ku Ev, ewan rizgar diket bêy ku mafek hebin ew
dest bi bêdadiyê li ser erdê diken. Mirovino! Hûn tenê bêdadiyê li dijî xwe
diken. Keyfxweşê jiyana ev dinyayê bin, paşê hûn dê bizivirine bal Me û Em
dê we agahdar biken ku we çi dikir. [24] Tenê mînaka jiyana ev dinyayê weka
ew avêye ku Em li asiman ra dişînin û giyayên erdê wê dimjin û mirov û ajel li
wê dixwen, taku erdê baştirîn şêweya xwe li xwe kiriye û xwe xemilandiye û
mirovên wê hizir diken ku wan desthilat li ser da heye, paşê bi şevê yanjî bi
rojê ew fermana Me dayî tête ser û Em ewê weke pûşê bênirix lê diken, wek tu
bêjî dihunê ew şîn nebû, bi wî awayî Em nîşaneyên Xwe ji bo ew mirovên ku
têbîniyê diken şirove diken.



a: Basê ew firişta ye ku kiryarên mirova tomar diken.

25 Û Xwe dê gazî mala aştî yê diket û her kesê ku Ev dixwazît bo rêyek rast
rênivînî diket. 26 Ewên ku başî kirine dê bêhtir û zêdetir jî hebin. Ne rûreşî ne
jî serşorî dê rûmetê wan bipeçêrît, ewane hevrêyên baxçe ne û ta bêdawiyê ew
dê li wêderê da bimînin 27 û ewên ku nebaşî kirine, her kiryarek nebaş dê
berdêla wê da yêke wekhev hebît û rûreşî dê wan bipêçît, li dijî Xwe dê da kes
ewan naparêzît, wek bêjî ku rûyê wan bi ew xêliya peçavtibûn ku li tarîtî ya
şevê birî bûn. Ewane hevrêyên naw agir da ne û ta bêdawiyê ew dê li wê derê
da bimînin. 28 Li ew Roja ku Em dê wan hemûya kom kene ser yêk, Em dê
bêjine ewên ku ´heval´ bo Vî peyda dikirin, ´Hûn û hevalên[a] xwe, li cihê xwe
da bin.´ Paşê Em dê wan li hevdu cuda biken û hevalên wan dê bêjin, ´We em
nediperestîn, 29 Xwe dê têra Xwe li nawbera me û we da gewahe, em agahdar
nebûn ku we, em diperestîn.´ 30 Li wêderê, hemû rihek dê bête darizandin, li
ber xatira ewa ku pêşta kiribûn. Ew dê bizvirne bo bal Xwe dê, Xwedanê xwe
yê rastî û ewa ku wan berhem înayî dê wan bêxwedan bihêlin. 31 Bêje ´Ev
kêye ku li asimana û erdê ra bo we dabîn diket? Ev kêyê ku desthilat li ser
bihîstin û dîtinê heye? Ev kêye ku zindî li mirî tînîte der û ewê mirî li zindî û
Evê fermandariya hemû tişta diket? Paşê ew dê bêjin,´Xwe dê´ Lewma bêje,
´Bes çima hûn hişyarê Vî nînin? 32 Liber hindê Xwe dê ye Xwedanê we yê
Rastî. Piştî rastiyê li direwê zêdetir tiştek dîke heye? Ewe çawaye ku hûn li rê
derketine?´33 Bi wê rêbazê, peyva Xwedanê we jibo ewên ku bi pêdagirî
serkêşin hatiye cih û ew bawer naken 34 Bêje, ´Meger hîç yêk li ´´hevalên´´ we
dikarin afirandinê destpê biken û paşê dupat biken?´ Bêje, ´Xwe dê,
afirandinê destpê diket û paşê dupat diket, lewma hûn çawa hatine lêbandin?´
35 Bêje, ´Meger hîç yêk li hevalên we, we rênivîniyê rastiyê diket? ´ Bêje,
´Xwe dê rênivîniyê rastiyê diket. Lewma Evê ku rênivîniyê rastiyê diket gelek
jêhatiye ku bête şopandin yanjî ewê ku rênivînî naket, meger ew bixwe bête
rênivînî kirin? We xêre? Hûn çawa darizandinê diken?´ 36 Piraniya wan xêncî
texmînê peyrevî li çi naken, lê li dijberî rastiyê da texmîn kêrî çi nayên, birastî
Xwe dê dizane ku ew çi diken. 37 Bes Xwe dê nebît ew Xwandine (Qurane) li
bal kesekê we nedihate dahênan, ev erêniye bo eva[b] ku pêş evê da eşkere bûye
û şirove ya nivîsîna pîroze ku çi guman sebaret bi vê çinîne û eve li bal
Xwedanê hemû dinyaya we ye. 38 Yanjî ew dibêjin, ´Ew dahînaye?´ Bêje,
´Eger hûn rast dibêjin, bes parek wek vê dabînin û bes Xwe dê nebît gazî her
kesê dîke diken biken.´ 39 Lê ew nikoliyê li evê diken ku ew nikarin zanista vê
têbigehin û hêşta vergêrana evê jiboy wan nehatiye. Bi heman şêweyê jî, ewên
pêş ewan da jî nikolî lê kirbûn. Bes lê binhêrin ku dawiya ewên nerastkar çawa
bû!



a: Basê puta ye, ew tişt yanjî kesê ku ew dikene hevalê Xwe dê!

b: Basê Rênivînî (Torat) û Mizgînî (Incîlê) ye.

40 Li naw ewanda hindek baweriyê pê diken û hindek jî naken, Xwedanê we
ewên genî diken baş nas diket. 41 Eger ew nikoliyê li te diken, Bêje,´Kiryarên
min bo minin û kiryarên we jî bo we ne. Ne hûn xwe li kiryarên min bikene
xwedan, nejî ez dê xwe li kiryarên we bikeme xwedan.´ 42 Hindek li wan
guhdariya te diken, lê meger tu dê bişêy kera guhdar bikeye, herçend ku ew
hizra xwe bikar neynin? 43 Li naw ewan da hindek li te dinhêrin, lê meger tu
dê bikarî koreya rênivênî bikey, herçend ku ew nebînin? 44 Birastî Xwe dê qet
nerastiyê li mirova naket, ew bixwe ne ku nerastiyê li xwe diken. 45 Di ew Roja
ku Ev wan kom dikete ser hevda, wek tu bêjî, ew demjimêra rojekê zêdetir lêre
nebûne û ew dê hevdu nas biken. Ewên ku nikolî li hevdîtina digel Xwe dê
kirin dê bidorînin û ew nehatibûne rênivînî kirin. 46 Çi Em bihêlin ku tu
hindek li eva Me belêniya wê daye wan bibînî yanjî Em bi mirinê te biben, ew
dê bizvirne bo bal Me, Xwe dê gewahê wêye ku ew diken. 47 Her neteweyekê
peyamberek heye û dema peyamberên wan tên, ew dê bi dadperwerî bêne
darizandin, nerastî li wan nayê kirin. 48 Ew dibêjin, ´Kengê dê ew belêniye
bêt, eger tu rast dibêjî?´ 49 Bêje, ´Min çi desthilat li ser ew zirar û qazanca tête
ser min da nîne, xêncî ewa Xwe dê dixwazît. Jibo her neteweyekê demekê
dîhar kirî heye û gava ku dema wan geheştê, tenê bo demjimêrekê jî, ew ne
dikarin paşve biden, nejî pêşve biden.´ 50 Bêje, ´Berçav bigrin eger, li dema
şevê yanjî rojê da sizayên Vî hatibana ser we, dê mirovê gunehkar daxwaz
biket ku kîjan para wê bilezînît? 51 Hûn dê bawerî pê biken, dema ku ew rû
didet?´ ´Niha, ew deme ku we dixwast bilezînin!´ 52 Dê bi nerastkara bête
gotin, ´Eşkenceya bêdawî tam biken. Meger xêncî ewa te destê xwe înaye siza
bi te hatiye dan?´ 53 Ew li te dipirisn ´Ew rast e? Bêje, ´Erê, bi Xwedanê min
ew rast e û tu nikarî lê birevî.´ 54 Her rihekê ku nebaşî kiriye, eger ew xwedanê
hemû ewa li ser erdê ba dê bo qerebû pêşkêş kiriba. Dema ku ew sizayê
dibînin, ew dê bi nehênî peşîman bin, lê ew dê bi dadperwerî bêne darizandin
û nerastî li wan nayête kirin. 55 Bêguman, hemû ew tiştê di asimana û erdê da
yê Xwe dê ye, bêguman belêniya Xwe dê raste, lê piraniya wan nizanin. 56 Ev
e ku jiyanê didet û dibîte hokarê mirinê û hûn dê bêne zivrandin bo bal Vî.
57 Mirovino, li bal Xwedanê wera jibo we perwerdeyek hatiye, dermaneke bo
ewa di singa daye û jibo bawermenda rênivînî û rehme. 58 Bêje ´Bihêle bila ew
di qencî û rehma Xwe dê, da keyfxweş bin, eve li hemû ewa ku ew kom diken
bêhtire.´
59 Bêje ´Ew debara Xwe dê bo we şandiye xarê berçav bigrin, ewa ku we
qedexe û qanunî kiriye.´ Bêje, ´Meger Xwe dê destûr daye we yanjî hûn
sebaret bi Xwe dê direwa berhem tînin?´ 60 Ew mirovên ku sebaret bi Xwe dê
direwa berhem tînin dê li Roja Vejiyanê da çi texmîna biken? Birastî Xwe dê
jibo mirova gelek qencî hene, lê piraniya wan sipasdar nînin.

[61]Her tiştekê ku tu dikey û her parek li Xwandinê (Quranê) tu dixwînî, her
çeşne karekê hûn diken, Em gewahiyê li ser we diden, dema hûn wê diken.
Tenanet hindî giraniya nixteyekê[a] li ser erdê yanjî esmana da li bal Xwedanê
we bezir nabît, nejî hîç tiştek mezintir yanjî biçuktir, ew li tomarek zelal da
hatiye nivîsîn. [62] Bêguman bo alîgirên Xwe dê çi tirs nîne, nejî dê ew xemgîn
bin. [63] Jibo ewên ku bawer diken û hişyarê Ev ne [64] jibo wan di ev jiyanê da û
di Dawiyê da jî mizgîniyek heye, çi guhertin di peyvên Xwe dê, da nîne.
Eweye, destkevta herî mezine. [65] Nehêle ya ku ew dibêjin te xemgîn biket.
Birastî desthilat bi tewawî ya Xwe dê ye, Ev Bihîstine û Zanîne. [66] Bêguman
hemû ewên ku di asimana û erdê dane, yê Xwe dê ne. Ewên ku li kêleka
Xwe dê, da gazî ewên dîke diken, ew birastî peyrevî li ´hevala´ naken, ew tenê
peyrevî li texmîna diken û ew direwa diken. [67] Ev e ku şev çêkir ku hûn bikarin
têda bêhna xwe weden û ronahiya rojê ku hûn bikarin bibînin, bi rastî jibo ew
mirovên ku dibhên, di lêreda nîşane hene. [68] Ew dibêjin, ´Xwe dê, kurek
heye!´ Ev paye bilinde! Ev têra Xwe heye, hemû tiştê di asimana û erdê da yê
Vî ye. We çi desthilat nîne ku we bêjin. Hûn sebaret bi Xwe dê ewê dibêjin ku
hûn nizanin? [69] Bêje ´Birastî ewên ku sebaret bi Xwe dê direwa berhem tînin
ser nakevin.´ [70] Di ev dinyayê da ewan dê keyfxweşî hebît, paşê ew dê bizvrine
bal Me, paşê liber xatira nebaweriya wan, Em dê eşkenceyek dijwar bi wan
bidene tam kirinê. [71] Nûçeya Nûh bo wan bêje, Dema ew gote netewa xwe,
´Netewa min, eger hebûna min li naw we da û bîr anîna nîşaneyên
Xwe dê li bal min we, bo we, bar giraniyê li we diket, bes ez pişta xwe bi
Xwe dê rast dikem. Lewma pê xerîte û ´hevalên´ xwe bixwe çareseriyekê
bigerên, sebaret bi xerîteya xwe jî dudil nebin, paşê, biryara xwe li ser min
bicih bînin û çi derfetê nedene min. [72] Lê eger hûn bizvrin, min daxwaza çi
padaşa li we nekirye, padaşê min tenê li bal Xwe dê ye û ferman li min hatiye
kirin ku ez yêk li wan bim ku xwe radestî Vî kiriye[b].´ [73] Lê ewan nikolî li wî kir
lewma Me, ew û ewên digel wî jî, li ser gemiyê da parastin û Me ew kirine
cihgîr û ewên ku nikolî li eşkereyên Me kiribûn Me xendiqandin, lê binêrin ku
çi bûye dawiya ewên ku Me pêşta agahdar kirbûn! [74] Paşê, li dû wî da Me
peyamber bo mirovên wan şandin, ewên ku nîşaneyên zelal bo wan birin. Lê,
ewan bawerî bi ewê nedikirin ku wan pêşta nikolî lê kirbû, bi wê rêbazê Em
dilê sînor bezêna dipêçin. [75] Piştî wan, Me pê nîşaneyên xwe Mûsa û Harûn
şandine bal Fireûn û serokên wî, lê ew bi qudetî rabûn û rûniştin, ew
neteweyeke tawankar bûn.



a: Misqalekê, libekê, gelek kêm, dindikekê
b: Mosilman

[76] Dema ku li bal Me we rastî bo wan hat, ewan got, ´Ewe gelek bi aşkira
cadû ye.´ [77] Mûsa got, ´Hûn ewê sebaret bi rastiyê dibêjin, dema ku ew bo we
têt? Eve cadû ye? Cadûger çi cara sernakevin.´[78] Ewan got,´Meger tu hatî me
li ewa ku me dîtibû babên me peyrevî lê dikirin bizvrînî ku hûn herdu bikarin
li ser erdê serweriyê bi dest xwe we bêxin? Em baweriyê bi we naken.´
[79] Û Fireûn got, ´Bo min hemû cadûgerên fêr bûyî bînin.´ [80] Dema ku cadûger
hatin, Mûsa gote wan,´ Her tiştê hûn dê havêjin havêjine xarê.´ [81] Dema ewan
havêtibû, Mûsa got, ´Hemû tiştê we înayi cadû ye û Xwe dê, dê nîşan bidet ku
ew pûçe. Birastî Xwe dê karê gendela serast naket, [82] Xwe dê bi peyvên Xwe,
rastiyê tînîte cih, tenanet eger kerbê tawankara jî lê vebît.´ [83] Lê, xêncî
zarûkên netewa wî, kesê bawerî bi Mûsa nekir, li tirsa wê hindê ku Fireûn û
serokên wan, ewan biçewsînin. Birastî Fireûn li ser erdê desthilatdarek zordest
bû û birastî ew li wan sînor bezêna bû. [84] Mûsa got, ´Netewa min, eger we
bawerî bi Xwe dê heye pişta xwe bi Vî rast biken, bes dibya hûn xwe radestî
Vî biken[a] [85] lewma ewan got, ´Me pişta xwe bi Xwe dê rast kiriye. Xwedan!
Me neke ezmûnek jiboy mirovên nerastkar. [86] Pê rehma Xwe, me li mirovên
nebawer rizgar bike, [87] Me sirûş da Mûsa û birayê wî ku netewa xwe li Misrê
da bikene mal û ew mala bikene cihê perestînê, nûbêjê biken û mizginiyê
bidene bawermenda!´[88] Û Mûsa got, ´Xwedanê me, li ev dinyayê da Te, xeml
û heyi daye Fireûn û serokên wî û Xwedan belke ew pêşengiya li rê derxistin li
rêya Te biken. Xwedanê me, heyi yê wan li nav bibe û dilê wan req bike, bi wî
awayi bila ew bawer neken ta ku ew eşkenceya bijan dibînin. [89] Ev got,
´Bersiva pariyana te hatiye dan, li ber hindê li ser doza rast raweste û peyrevî
li rêbaza ewên ku nizanin neke.´ [90] Me zarûkên Israîl birne ew berê deryayê.
Fireûn û şervanên xwe bi serhildan û dijminatî, dû wan da çon, lê di dema ku
ew dixendiqî ew got, ´Ez bawer dikem çi xwedê nînin, xêncî Ev ê ku zarûkên
Israîl bawerî pê diken. Ez li wanim ku xwe radestî Vî diken[a].´ [91] ´Niha? Te
peyrevî nedkir û yêk li wan gendela bûy. [92] Lewma îro Em dê laşê te weke
nîşane bo nifşên Dawiyê biparêzin. Birastî gelek li naw mirova da agahdarê
nîşaneyên Me nînin.´ [93] Me zarûkên Israîl li cihekê baş niştecih kirin û tiştên
baş weke debar ji bo wan dabîn kirin. Ewan nakokî nebûn taku zanist bo wan
hat. Birastî Xwedanê te dê li Roja Vejiyanê da sebaret bi nakokiyê wan, dê li
nawebera wan da dadwer bît. [94] Li ber wê hindê eger te[b], sebaret bi eva Me ji
bo te eşkere kiriye guman heye, li ewan bipirse ku pêş te da nivîsîna pîroz bo
wan hatiye û dixwînin. Li bal Xwedanê te ra ji bo te Rastî hatiye, li ber wê
hindê nebe yêk li wan ku gumanê diken.



a: Bibne mosilman - dema Fireûn dixendiqît dibêjît ez jî moslmanim.
b: Mihemed peyamber

[95] Çi cara nebe yêk li wan kesa ku nikoliyê li nîşaneyên Xwe dê diket bila tu
nebiye yêk li wan kesa ku dê bidorînît. [96] Birastî ewên ku peyva Xwedanê te li
ser wan da hatiye cih, ew bawer naken, [97] tenanet eger hemû nîşane jî bo wan
bên, taku ew eşkenceya bijan dibînin. [98] Eger tenê gundekê bawer kirbît û
behre li baweriya xwe bir bît! Tenê netewa Yûnis bû dema ewan bawer kirbû
Me, ew li eşkenceya rûreşiya jiyana ev dinyayê rizgar kirin û Me hêla bo
demekê xweşiyê li jiyanê biben. [99] Eger Xwedanê te xwastiba, hemû ewên ser
erdê dê bawer kiriban, li ber wê hindê tu dê bişêy zoriyê li mirova bikey ku
bibine bawermend? [100] Çi rihek nikarît bawer biket bes bi destûra Xwe dê
nebît û ew nepakiyê tînîte ser ewên ku hizra xwe bikar naynin. [101] Bêje, ´Li
ewa asimana û ser erdê da heye binêrin.´ Lê jiboy ew mirovên ku bawer
neken nîşane û agahdarî kêr çi nayên. [102] Lewma xêncî, ewa ku bo ewên pêş
wan da hatibû ew çavnihêrê çi ne? Bêje, ´Bes çavnihêr bin, ez jî digel we li
naw ewên çavnihêr da me.´ [103] Paşê, Em dê peyamberên Xwe û bawermenda
rizgar biken. Çimkî ewe erkê Me ye ku bawermenda rizgar biken. [104] Bêje,
´Mirovino, eger hûn sebaret bi dînê min bigumanin, bes ez ewan naperestim
ku hûn li kêleka Xwe dê, da diperestin, lê ez Xwe dê diperestim, Ev ê ku dê
bibe hokar hûn bimrin û ferman li min hatiye kirin ku ez bibme bawermend.´
[105] Rûyê xwe bidene aliyê dînê rast, nebe yêk li ewên ku ´hevala´ bo Vî peyda
diken. [106] Di kêleka Xwe dê da li ber ewan nepare ku ne dikarin xêr ya zirarê
bigehînine te, eger tu bikey tu dê bibye yêk ji wan nerastkara. [107] Eger
Xwe dê zirarê li te bidet kes nikarît wêda bibet, bes Ev nebît û eger Ev başiyê
bo te bixwezît kes nikarît qenciya Vî wêda bizvrînît, Ev wisa diket ku bigehîte
her yêk li koleyên Xwe ku Ev dixwazît. Ev Lêbihore û Rehmê didet. [108] Bêje,
´Mirovno, li bal Xwedanê we ra bo we rastî hatiye. Her kesek bête rênivînî
kirin ew bo riha xwe tête rênivînî kirin û her kesê li rê derkevît, ew tenê li dijî
wê li rê derkevtiye û ez parêzerê we nînim.´ [109] Peyrevî li ev sirûşa[a] ku bi te
tête dan bike û bêhin fereh be taku Xwe dê dadweriya Xwe didet, çimkî Ev li
baştrîn dadwera ye.



a: Wehî

## 11. Para Hûd

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Elîf Lam Ra, nivîsîneke pîroze ku eşkereyên vê hatine bêkêmasî kirin,
paşê li bal Ev ê agahdar û biryarder we şirove kirî hatine pêşkêş kirin.
2 Kesê neperestin bes Xwe dê nebît. Birastî ez li bal Vî ra, agahdarî û
mizgîniyê dideme we. 3 Daxwaza lêbhorînê li Xwedanê Xwe bixwazin û
paşê bizvirine bo aliyê Vî, Ev dê bihêlît ta dema dîhar kirî hûn xweşiyê li
debarê Vî biben û qenciya Xwe diket li hemû ewên ku qenciya diken. Lê
eger hûn pişta xwe bidenê, ez jiboy we li eşkenceya Roja gelek mezin
ditirsim, 4 hûn dê bizvirine bal Xwe dê û Vî desthilat li ser hemû tişta
heye.´ 5 Bêguman ew singê xwe dipeçêrin ku xwe li Vî veşêrin. Tenanet
dema ku ew xwe bi cilê xwe dipeçêrin jî, Ev dizanît ku ew çi diweşêrin û
ew çi aşkira diken, birastî Ev bi başî dizanît ku çi di singa da heye. 6 Li
ser erdê da çi rihtiber nînin ku debara wan li destê Xwe dê, da nebît. Ev
cihê mangeha wan û cihê himbana[a] wan jî dizanît, ew hemû di tomarek
zelal daye. 7 Ev e ku hemû asiman û erd li şeş roja da afirandibûn û textê
Vî li ser avê bû, bi wî awayi taqî biket, kanê kê di naw we da, dê karê
bêhtir biket. Hêşta jî eger tu bêjiye wan, ´Piştî mirinê hûn dê bêne
vejandin,´ Bêguman ewên nebawer dê bêjin, ´Ewe hîç nîne bes cadûya
aşkira nebît.´8 Eger bo demekê kurt, Em sizayê li wan paşve biden,
bêguman ew dê bêjin, ´Ew çiye ku paşve radgirît?´ Lê di ew Roja ku tête
ser wan da, ew li wan nayête zivrandin, ew tişta ku wan tirane pê kirbûn
dê wan dorpêç biket 9 û eger Em tamekê li rehma Xwe bidene mirovekê
paşê lê ragirin, ew çend bêhêvî û nankor dibît! 10 Lê eger Em bihêlin ew
erêniya Me tam biket, piştî ku dijwariyê li wî daye, bêguman ew dê bêjît,
´Demên nebaş li min derbaz bûne´ Ew keyfxweş û qude dibît. 11 Nek,
ewên ku bêhin ferein û karên baş diken, ewan dê lêbihorîn û padaşek
mezin hebin. 12 Bi wî awayî, meger tu dê dest li hindek pişka li ev sirûşa
me daye te berdey, yanjî singê te liber evê teng bûye, çimkî ew dibêjn
´Çima çi xizîne bo wî nehatiye şandin xar? Yanjî çi firişte digel wî
nehatine?´ Tu tenê li wêderêy ku agahdariyê bidey, Xwe dê parêzerê
hemû tişta ye. 13 Yanjî ew dibêjin, ´Ew berhem înaye, bes bêje ´Deh
parên weka vê bînin ku hatine berhem înan û li kêleka Xwe dê, da bangî
herkesê hûn dikarin biken, eger hûn rast bêjin.´ 14 Eger ew bersiva te
neden, bes bizane ku eve pê zanista Xwe dê hatiye şandin xarê û çi
xwedê nînin bes Ev nebît. Bes hûn dê xwe radestî Vî biken[b]?

a: Embar, cihê hilgirtina tişta
b: Bibine Mosliman!

[15] Eger her kesek jiyana ev dinyayê pê xemla wê bixwezît, Em dê ber
xatira kiryarên wan bi tewawî, têda bidene wan û kêmasî li wan nayête
kirin [16] Lê ewên wisa, li Dawiyê da xêncî agir hiç tiştek çinabin, ewa wan
lêrê dikir dê bezir bît û kiryarên wan dê pûç bin. [17] Meger ew dê bêne
berawird kirin digel ewên ku belgeyên zelal li Xwedanê xwe hene? Ku li
aliyê gewahekê[a] Vî we hatiye xwandin û pêş wî da jî, di nivîsîna pîroza
Mûsa weke rehim rênivînî dikir? Ew bawerî bi evê[b] diken, lê herkesê ku
nikolî lê diket, ew dê li naw ew komê da bin ku belêniya agir bi wan tête
dan. Lewma bila we sebaret bi evê çi guman nebin, eve Rastiye li bal
Xwedanê we, herçend ku piraniya mirova bawer pê naken. [18] Kê dikare
li ew kesi zêdetir nerastiyê biket ku sebaret bi Xwe dê direwa berhem
tînît? Ewan dê bînine pêşya Xwedanê xwe û gewah dê bêjin, ´Ewane,
ewin ku sebaret bi Xwedanê xwe direw kirin.´ Bêguman dê nerêniya
Xwe dê li ser ewên nerastkar bît.´[19] Ewên ku rêgiriya ewên dîke li rêya
Xwe dê diken hewil diden ku vê xar biken û nikoliyê li Dawiyê diken.
[20] Ew nikarin li ser erdê birewin û xêncî Xwe dê kes çinabît ku wan
biparêzît. Eşkenceya wan dê duqat bît. Ewan nedikarî bibhên û nejî
ewan didît. [21] Ewane ewin ku dê rihên xwe bidorînin û ewa ku wan
berhem înayî dê wan bêxwedan bihêlît. [22] Çi guman têda nîne, ew dê li
wan bin ku dê li Dawiyê da herî zêde bidorînin. [23] Lê ewên ku bawer
kirbûn, karên baş kirbûn û li pêşiya Xwedanê xwe da, xwe ûstî-xar
kirbûn, ew dê bibine hevrêyên naw baxçe da û ta bêdawiyê ew dê li
wêderê bimînin. [24] Mînaka ew du komane weka berawirda ker û kora
digel ewane ku dibînin û dibhên, meger ew dê bikarin wekhev bin? Bes
hûn nayînine bîra xwe? [25] Me, Nûh bo netewa wî şand, ´Birastî ez
hatime ku bi aşkira agahdariyê bideme we´ [26] Kesê neperestin bes
Xwe dê nebît. Birastî ez bo we li eşkenceya Roja bi êş ditirsim.´ [27] Lê
serokê nebawerên li naw netewa wî da gotin, ´Em dikarin bibînin ku
weka me bixwe, xêncî bimirekê tu hîç tiştek dîke nînî û em dikarin
bibînin ku li naw me da, ewên herî tênegeheştî peyreviyê li te diken. Em
nikarin bibînin ku çawa tu li me qenctrî, belê em hizir diken tu direwînî.´
[28] Wî got, ´Netewa min, liber çav bigrin, eger min nîşaneyek zelal li
Xwedanê Xwe heye û Vî rehma Xwe bi min kiribît, herçend ku ew li we
weşartî bît, dibya em bi zorî li ser we da bisepînin dema ku hûn li dijî vê
ne? [29] Netewa min, bo evê, ez daxwaza çi padaşa li we nakem, padaşê
min tenê li bal Xwe dê ye. Ez bawermenda wêda nahajom, birastî ew dê
Xwedanê xwe bibînin. Lê ez dikarim bibînim ku hûn gelekê nezanin.
[30] Netewa min, kê dê bikarît yarmetiya min li dijî Xwe dê, da biket, eger
ez ewan wêda hajom? Bes hûn nayînine bîra xwe?



a: Basê Cibraîl ye, Ew firişta ku sirûş bo Mihemed peyamber îna! b: Quran (Xwandin)

31 Ez nabêjime we ku xizîneyê Xwe dê li bal minin yanjî ez ewa nedîtî
dizanim, nejî ez dibêjim ez firişte me. Nejî ez dibêjim ku Xwe dê çi
başiyê pêşkêş ewên li pêş çavên we da siwikin naket, Xwe dê baş dizanît
ku çi di riha wan da heye. Birastî ez jî dê yêk li nerastkara bam.´
32 Ewan got, ´ Nûh! Te digel me gengeşe kiriye û berdewam bûyî li
gengeşa digel me da. Ser me da bîne xarê ewa ku te pê hereşa wê li me
kirye, eger tu rastiyê dibêjî.´ 33 Ew got, ´Ev Xwe dê ye ku dê bînîte xarê,
eger Ev bixwazît û hûn nikarin birewin. 34 Amojgariyên min bo we kêrî
çi nayên, herçend ku min dixwast amojgariyê bideme we. Eger Xwe dê
bixwezît ku hûn serkêş bimînin, Ev Xwedanê we ye û jibo bal Vî hûn dê
bêne zivrandin. 35 Eger bêjin,´ Wî, eve berhem înaye,´ Bêje ´Eger min
eve berhem înaye, tawana vê li ser mine, lê ez bêgunehim li tawanên
hûn diken.´ 36 Sirûş bi Nûh hate dan ku ´Kes li naw netewa te bawer
naket, xêncî ewên ku pêşta bawer kirîne, ber xatira ewa ku ew diken
tengav nebe, 37 li bin çavdêriya Me da, pê sirûşa Me gemiyê çêke. Jiboy
ewên ku nebaşî kirîne bangî Min neke, ew dê bêne xendiqandin.´ 38 Wî
gemî çêdkir û her gava serokên netewa wî li wêderê da derbaz dibûn
ewan tiranê xwe bi wî kirin. Wî got, ´Eger hûn tiranê xwe bi me biken,
em jî dê paşê tiranê xwe bi we biken, herwek hûn tiranê xwe diken,
39 hûn dê bizanin kanê kê dê eşkenceyek serşorker vergirît û li ser kê da,
dê êşkenceya bêdawî bête xarê.´ 40 Taku fermana Me hat û tendûra
serwe hawêt, Me got, ´Li her cûrekê cotekê lê bar bike û malbata xwe jî,
xêncî ewên ku li dijî wan da destûr hatiye dan û her kesê ku bawer
kiriye, lê kesê digel wî bawer nekirbû bes çend kes nebin. 41 Wî got, ´Bi
navê Xwe dê lê siwar bin, ew dê ser avê da bimeşiyêt û rûnêt. Xwedanê
min Lêbihore û Rehmê didet.´ 42 Ew digel ewan da, weke çiya li ser
şîpela da meşiyan û Nûh gazî kurê xwe kir, ewê ku wêda mabû, ´Kurê
min digel me were ser da, digel nebawera nemîne.´ 43 Wî got, ´Ez dê ser
çiya li penahê bigerêm ku xwe li avê rizgar kem.´ Wî got, ´Îro li dijî
fermana Xwe dê çi penahgeh nînin, xêncî ewên ku Vî rehm li ser wan
heye.´ Şîpela ew li hevdu weqetandin û ew li naw ewên xendiqî da bû
44 û hatibû gotin, ´Erd ava xwe qurt ke û asiman raweste´ Û av kêm bû,
ferman hate cih û gemî li ser çiyayê Cûdî rûnişt û hat gotin, ´Çone ew
netewa nebaşkar!´ 45 Nûh gazî Xwedanê xwe kir û got, ´Xwedanê min,
kurê min yêk bû li binemala min û birastî belêniya Te raste û li naw
dadwera da, Tu Ev ê herî dadperwerî.´

[46] Vî got, ´ Nûh ew yêk li ewên binemala te nebû. Birastî kiryarên wî
serast nebûn. Lewma li Min nepirse sebaret bi ew tiştên tu çi lê nizanî.
Birastî Ez te agahdar dikem ku li naw nezana da nebî.´ [47] Wî got,
´Xwedanê min ez penahê bo Te tînim, li tiştên ez dipirsim ku ez sebaret
bi wan çi nizanim, eger Tu li min nebihorî û rehmê bi min nekey, ez dê
bibme yêk li ewên ku dê bidorînît´ [48] Û hatibû gotin, ´ Nûh bi aştî li bal
Me we here xarê, bila pîrozî li ser te û li ser netewên li ewên digel te da
bît, lê Em dê xweşiyê bidene netewên dîke, paşê dê li bal Me we
eşkenceyek bijan li wan bidet.´ [49] Eve li nûçeyên nedîtî bû ku Me bo te[a]
eşkere kir, ne te û ne jî netewên pêş aniha da ew dizanîn, li ber wê hindê
bêhin fereh be, Dawî, ya ewane ku hişyarê Vî ne. [50] Me jibo ´Ad, birayê
wan Hûd şand. Wî got, ´Netewa min, koleyên Xwe dê bin. Xêncî Vî we
çi xwedê nînin, hûn tenê berhem[b] tînin. [51] Netewa min ez daxwaza çi
padaşa li we nakem, padaşê min tenê li bal Vî ye, ku ez afirandime. Bes
çima hûn hizra xwe bikar naynin? [52] Netewa min, daxwaza lêbihorînê li
Xwedanê xwe biken û paşê peşîmaniya xwe jiboy Vî ra bigehînin. Ev dê
bo we bi firavanî li asiman ra bişînîte xarê û hêzê li hêza we zêde biket û
pişta xwe nedene tawankara.´ [53] Ewan got, ´Hûd te jibo me çi nîşaneyên
zelal ne înayne. Li ber xatira gotinên te, em waz li xwedêyên xwe naynin
nejî em dê bawerî bi te biken. [54] Em tenê dibêjin, hindek li xwedêyên me
pê nebaşiyê tu girtinî.´ Wî got, ´Ez weke gewah gazî Xwe dê dikem û
hûn jî gewahin, ez li ewan nabime xwedan ku we kirîne ´heval´ [55] li
kêleka Vî da, li ber wê hindê, hûn hemû li dijî min xerîta bikêşin û paşê
çi derfeta nedene min. [56] Birastî ez xwe dispêrime Xwe dê, Xwedanê
min û Xwedanê we. Çi rihtiber nînin ku Ev enya wan ra negrît, birastî
Xwedanê min li ser rêya raste.´ [57] Lê eger hûn li rê bizvirin, bes min ev
peyame gehandiye we ku ez pê evê hatibûme şandin bo bal we û
Xwedanê min dê neteweyeke dîke li şûna weda cihgîr biket û hûn
nikarin çi zirarê li Vî biden, birastî Xwedanê mine hemû tişta diparêzît´
[58] û dema ku fermana Me hat, liber rehma Xwe, Me Hûd û ewên ku
digel wî bawer kirbûn rizgar kirin û Me, ew li eşkenceyek dijwar
parastin. [59] Ewane ´Ad bûn, ewan nîşaneyên Xwedanê xwe
nepejirandibûn û peyrevî li peyamberên Vî nekirbûn û peyrevî li
fermana hemû zordestên rikûyî kirbûn. [60] Di vê jiyanê da û di Roja
Vejiyanê da jî nerênî li wan hatibû kirin. Bêguman, Ad, bawerî bi
Xwedanê xwe nekirin, li ber hindê, bila Ad dûr bît, gelê Hûd!



a: Mihemed
b: Direwa berhem tînin, we bixwe çêkirîne

61 Jibo Semûd, Me birayê wan Salih şand. Wî got, ´Netewa min,
koletiya Xwe dê biken, xêncî Vî we çi xwedê nînin, Ev bû ku hûn li erdê
berhem înan û hûn li ser da nîştecih kirin, li ber hindê, daxwaza
lêbihorînê li Vî biken û peşîmaniya xwe jiboy Vî rabigehînin, birastî
Xwedanê min nêzîke û bersivê didet.´ 62 Ewan got, ´Salih, pêş evê da me
hêvî li te hebû. Tu li me qedexe dikey ku em koletiyê biken bo ewa ku
berebabên me koletî bo dikir? Birastî sebaret bi eva tu gazî me dikey ku
em biken em li gumanek gelek mezin dane.´ 63 Wî got, ´Netewa min,
berçav bigrin, eger min belgeyên zelal li bal Xwedanê xwe we hebûn û
eger Vî rehma Xwe li min kiribît, kê dê bikarît min li Xwe dê biparêzît,
eger ez serkêşiyê li Vî bikem? Lewma hûn dê tenê dorandina min zêdetir
biken. 64 Netewa min, ev hêştira mê ya Xwe dê nîşaneyeke jibo we, li ber
wê hindê, bihêlin bila ew li ser erdê Xwe dê biçerît û zirarê negehîninê,
yanjî hûn dê bi zuyî bêne eşkence dan.´ 65 Lê ewan qop kir, li ber wê
hindê wî got, ´Bo sê rojên dîke xweşiyê li avahiyên xwe biben, ew
belêniye direw nabît´ 66 Û li ber hindê, dema ku fermana Me hate cih, bi
rehma Xwe, Me Salih û ewên ku digel wî bawer kirbûn, li serşoriya wê
Rojê rizgar kirin. Birastî Xwedanê te, Evê Qawet û Bihêze 67 û qêrînê li
ewên nebaşkar da û ew di malên xwe da bûne laş, 68 wek tu bêjî, ew çi
cara lêrê bextewer[a] nebibûn, Erê, Semûd nikolî li Xwedanê xwe kirbûn.
Li ber wê hindê bila Semûd dûr bît! 69 Bêguman peyamberên Me bi
mizgînî hatine bal Ibrahîm, ewan got, ´Aştî´, wî got ´Aştî´Û bêy direngî,
wî jiboy wan golikek sor kirî îna. 70 Dema wî dît ku destê wan neço bo
aliyê wê, ew bawerî bi wan nekir û ew hind seyr dît û ew li wan tirsiya.
Lê ewan got, ´Netirse, Em bo netewa Lat hatine şandin.´ 71 Jina wî
rawestabû bişirî[b], paşê Me mizgîniya Ishaq daye wê û piştî wî, ya Yeqûb.
72 Wê got, ´Hewar li min! Ez dê çawa bizêm, dema ku ez pîre jinim û
mêrê min jî pîre mêre? Birastê ewe dê tiştek seyr bît!´ 73 Ewan got,
´Meger tu sersir mayi li eva ku Xwe dê ferman lê diket? Bila rehm û
pîroziya Xwe dê li ser we mirovên ew malê bît! Birastî Ev kêrhatiyê
hemû pesna û serweriyê ye,´ 74 Dema ku tirs li Ibrahîm ço û mizgînî bo
wî hat, ew sebaret bi netewa Lat digel Me gengeşe kir,
75 çimkî, Ibrahîm pêdagir û dil nazik bû lê dizvrî.
76 ´Ibrahîm, waz li ewê bîne, birastî eva ku Xwedanê te ferman lê kiriye
hatiye cih, siza bo wan têtin û ev nikarît bête vergêrandin,´ 77 Û dema
peyamberê Me hatine bal Lat, ew bo wan bi kelecan bû, hest bi bêhêziyê
dikir ku wan biparêzît û got, ´Bi rastî ewe rojek nexweşe!´



a: Jibo peyva xenî min bextewer bikar îanye! b: Girnijî, lêv bi ken bû

78 Netewa wî bi helatin ber bi aliyê wî we hatin, ewan karên qirêj
dikirin. Wî got, ´Netewa min, ha ewe kiçên min, ew bo we paktirin, li
ber wê hindê hişyarê Xwe dê bin û min li bal mêvanên min serşor
neken. Meger tenê mêrek serast li naw we da nîne?´ 79 Ewan got, ´Tu
gelek baş dizanî, me çi maf li ser kiçên te nînin. Tu gelek baş dizanî ku
em çi dixwazin.´ 80 Wî got, ´Eger min tenê li dijî we hêza wê hindê heba,
yanjî min karîba penaha xwe bo ciheke qahîm bibem! 81 Ewan got, ´Lat,
birastî Em peyamberên Xwedanê te ne. Ew çi cara nagehine te, di
tarîtiya şevê da, digel binemala xwe, lêre bi cih bihêle û nehêle hîç yêk li
we paşve bizvirît, bes jina te nebît. Ew jî dê ew belayê bikêşît ku dê bête
serê ewên dîke. Birastî dema dîhar kirî sibê zû ye, meger sibê zû nêzîk
nîne?´ 82 Û li ber wê hindê, dema ku eva Me ferman lê kirî hate cih, Me
gundê wan serûbin kir û Me kevirên li heriya kelandî ser da barand, qat
li ser qatê, 83 nîşan kirî li bal Xwedanê we ra û ew li nebaşkara gelek dûr
nîne. 84 Û jibo Meda, birayê wan Şueyb got, ´Netewa min, koletiya
Xwe dê biken, xêncî Vî, we çi xwedê nînin. Bi kortî nepîvên û bi kêmî
nekêşin. Birastê ez dibînim hûn behremend dibin, lê ez bo we li
eşkenceya ew Rojê ditirsim ku hemû tişta dorpêç diket. 85 Netewa min,
bi dadwerî, pîvan û kêşana tewaw biden. Li mirova paşve ranegrin, ew
tiştên ku yê wanin û karên bêkêr neken û li ser erdê da gendeliyê belav
neken. 86 Ewa ku li bal Xwe dê, da dê bo we bimînît bêhtre, eger hûn
bawermendin. Ez parêzvanê we nînim.´ 87 Ewan got, ´Şueyb, meger
nûbêjên te destûrê didete te ku em dibya ewa bab û bapîrên me koletiya
wan dikir, bicih bihêlin û xwe biparêzin li ewa ku em hez diken digel
malê xwe biken? Birastî tu mêrek pêdagir û serastî.´ 88 Wî got, ´Netewa
min, meger hûn nabînin? Ez li ser nîşaneyên zelal li bal Xwedanê xwe ra
me? Ev debarên baş dayne min, ez naxwazim wê bikem eva ku ez li we
qedexe dikem ku hûn biken, hindî ez bikarim, ez tenê dixwazim ku tişta
serast bikem. Bêy yarmetiya Xwe dê ez nikarim serkevim, min xwe
sipartiye Vî û ez dê bizivrime bal Vî. 89 Netewa min, nehêlin ku dijberiya
we digel min, bînîte serê we, weka ewa hatî serê netewa Nûh, yan
netewa Hûd, yanjî netewa Salih û netewa Lat gelek li we dûr nînin.
90 Daxwaza lêbihorînê li Xwedanê xwe biken û bi peşîmanî rûyê xwe
bikene aliyê Vî, birastî Xwedanê min Rehmê didet û Dilovane.´ 91 Ewan
got, ´Şueyb, piraniya eva tu dibêjî em tênagehin û li naw xweda em te
gelek lewaz dibînin. Eger li ber binemala te neba me dê tu kevir baran
kirbay û li bal me tu gelek bihêz nînî.

[92] Wî got, ´Netewa min meger binemala min li Xwe dê zêdetir desthilat
li ser we heye? Hûn çawa dikarin Vî pişt guhê xwe we havêjin? Birast
Xwedanê min hemû tiştê hûn diken dorpêç diket. [93] Netewa min li ser
armanca xwe kar biken, birastî ez jî kar dikem. Bi zuyî hûn dê bizanin
kanê, kê dê sizayek serşorker vergirît û kê direwîne. Lewma çavdêr bin,
ez jî digel we çavdêrim.´ [94] Dema ku eva Me ferman lê kirî hate cî, pê
rehma Xwe, Me Şueyb û ewên ku digel wî bawer kirî rizgar kirin û
qêrînê li ewên nebaşkar da, bo sibê zû, ew di malên xwe da bûne laş,
[95] wek tu bêjî, ew çi cara li wêderê bextewer nebibûn. Lewma, bila dûr
bin netewa Meda, herweka Semûd dûr kirbûn! [96] Her wisa Me, Mûsa
pê nîşane û destihala Xwe ya zelal şand, [97] bo Fireûn û serokên wî, lê
ewan peyrevî li fermanên Fireûn dikirin û fermanên Fireûn serast
nebûn. [98] Di Roja Vejiyanê da, ew dê pêşberê netewa xwe bît û dê bo
naw agir da rêberiya wan biket. Jiboy çi ciheke kotî ew têne rêberî kirin!
[99] Ew li evê da bi nerênî hatibûne şopandin û li Roja Vejiyanê jî, çend
xelatekê kotî vergirtine! [100] Ewe nûçeya wan gunda ye ku Em dibêjine te,
hindek li wan mayne û hindek dî hatine dirûn[a] [101] Me nerastî li wan
nekir, ewan nerastî li xwe kir, xwedêyên wan ku ewan li kêleka Xwe dê,
da gazî wan dikir, ew bextewer nekirin, dema ku eva Xwedanê te
ferman lêkirî hate cî, ewan[b] tenê li wêranî ya wan zêde kir. [102] Bi wî
awayi Xwedanê we, ew gundên ku nerastiyê diken digrît, birastî girtina
Vî bijan û dijware.
[103] Birastî lêderê da jibo her kesê ku li sizaya Dawiyê ditirsît nîşaneyek
heye. Rojeke ku, mirov dê bêne kom kirinê, Rojeke ku dê gewahî bête
dan. [104] Em tenê ew dema destnîşan kirî bo demek kurt paşve diden [105] û
ew Roja ku têt, çi rih napeyvin, bes bi destûra Vî nebît û li naw ewan da
dê ewên xemgîn û keyfxweş hebin. [106] Ewên xemgîn dê li naw agir da
bin û li wêderê da ew dê ah û axa bikêşin, [107] ew dê li wêderê bimînin
taku hemû asiman û erd xwe ragirin, meger ku Xwedanê we cûrek dîke
bixwezît. Birastî eva Xwedanê we dixwazît bicih tînît. [108] Lê ewên ku
keyfxweş bûn, ew dê ta bêdawiyê li naw baxçeya da bin, taku hemû
asiman û erd xwe ragirin, meger ku Xwedanê we cûrek dîke bixwezît,
padaşek bêpayan. [109] Li ber wê hindê, sebaret bi ewa, ku ew mirovane
koletiya wan diken, te çi guman nebît, ew tenê koletiya ewa diken ku bab
û bapîrên wan pêş ewan da koletiya wan dikir û birastî, bêy hîç
kêmasiyekê Em dê pişka wan bi tewatî bidene wan.



a: Hatibûne li naw birin, kuştin,
b: Put, xwedêyên direw

[110] Bêguman Me nivîsîna pîroz da Mûsa, lê sebaret bi vê ciyawazî ser
hilda, eger ser xatira peyva berê[a] li bal Xwedanê te we neba, dê dadwerî
li nawbera ewan da hatiba kirin, birastî sebaret bi evê, li gumanek gelek
kûr dane. [111] Birastî Xwedanê we dê bi tewawî bidete hemûya, jibo ewa
ku wan kiriye, Ev agahdarê ew tişta ye ku hûn diken. [112] Li ber hindê li
ser doza rast da rawestin, wek ku biryar li te hatiye kirin, digel ewên ku
digel we da zivirîne. Sînora nebezînin, birastî Ev tiştên ku hûn diken
dibînît. [113] Pişta xwe bi ewên ku karên nerast diken qahîm neken bila
agir neberbîte we û paşê we li Xwe dê zêdetir kes nabît ku we biparêzît
nejî dê harî we bête kirin. [114] Nûbêjên xwe di her du serên rojê da bike û
di dema ku şev jî ser da têt, birastî karên baş, karên nebaş wêda dihajon,
ewe bîreweriyeke jibo ewên ku tête bîra wan.
[115] Bêhin fereh bin, birastî Xwe dê nahêlît padaşê ewên ku karên baş
diken bi heder biçît. [116] Çima xêncî çend kesên ku Me rizgar kirin, li naw
nifşên pêş we da, ew kes çinebûn ku li hember zordariyê berxwedan û
qedexeya gendeliyê nekirin? Lê ewên ku nerastî dikirin li dû xweşiyê da
geriyan ku dabûne wan û ew tawankar bûn! [117] Xwedanê we bi bêdadî çi
gund wêran nedkirin, dema ku mirovên wê xwe serast kiriban.
[118] Eger Xwedanê we xwastiba, Ev dê hemû mirov kirbana civakek, lê
ew dest li nakokiyê nakêşin,[119] Xêncî ewên ku Xwedanê we rehm daye
wan û jibo ev hindê Vî ew afirandine û peyva Xwedanê te dê bête cih
´Bêguman Ez dê cehnemê pê cin û mirova bihevra tejî bikem´ [120] Li ber
hindê Em nûçeya peyambera bo te dibêjin ku dilê te pê qahîm biken û li
evê da, bo te rastî, perwerde û bîranîn jî bo bawermenda hatiye. [121] Bêje
ewên ku bawer naken, ´Ser armanca xwe kar biken, birastî em jî kar
diken [122] û çavnihêr bin, em jî çavnihêrin.´ [123] Hemû ewa ku di asiman û
erdê da weşartiye ya Xwe dê ye û hemû mijar dizvrîte bal Vî. Li ber wê
hindê, koletiya Vî bike û xwe bispêre Vî, Xwedanê we bê-agah nîne li
ewa hûn diken.



a: Xwe dê li pêşta sebaret bi Roja Vejiyanê biryar daye û gotina Xwe dê nayê guhertin.

## 12. Para Yûsif

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Elîf Lam Ra, evane eşkereyên nivîsîna pîroza zelalin 2 Me weke, Xwandinek
(Quranek) Erebî şandiye xarê belke bi wî awayî hûn têbigehin.
3 Pê sirûşa ev Xwandin (Quran)ê jibo te, Em baştrîn serhata dibêjine te. Pêş
evê, tu jî li naw ewan da bûy ku agahdar nebûn. 4 Dema Yûsif gote babê xwe,
´Babo, birastî min yazdeh sitêrk, roj û heyv dîtin, min dît ku ewan serê xwe li
ber min da çewand. 5 Û wî got, ´Kurê min, sebaret bi ew dîtina xwe çi nebêje
birayên xwe, yanjî ew dê li dijî te xerîte bikêşin, birastî Şeytan bi aşkira
dijminê mirova ye. 6 Pê ew rêkê Xwedanê te, dê te hilbjêrît, te fêr ket ku çawa
serhata vergêrî û erêniya Xwe li ser te û binemala Yeqûb da bêkêmasî biket,
her wek Vî pêşta li ser berebabê te Ibrahîm û Ishaqi da bêkêmasî kirbû,
Xwedanê te zanist heye ku biryarê bidet.7 Bêguman jibo ewên ku dipirsin li
Yûsif û birayên wî da nîşane hebûn. 8 Dema ewan got ´Herçend ku em
gelekin, lê babê me zêdetir hez Yûsif û birayê wî diket, birastî babê me bi
aşkira li şaşiyê da ye, 9 Yûsif bikujin, yanjî bikene der bo welatek dîke û bala
babê we dê azad bît ku bigerête aliyê we. Piştî wê, hûn dê bibine mirovên
dirustkar.´
10 Gotinbêjekê li naw ewan da got,´ Yûsif nekujin, wî havêjine binê bîrekê da,
karwançiyek dê wî hilgrît, eger hûn dê biken.´11 Ewan got ´ Babo, tu bo çi
sebaret bi Yûsif baweriyê bi me nakey, birastî em jidil we şîretê didene wî?
12 Sibê wî digel me rêke û ew dê bixwe xweş biqetînît û bileyzît, birastî em dê
baş lê hişyar bin.´ 13 Wî got, ´Ez dê xemgîn bim eger hûn wî biben, ez ditirsim
ku gurgek wî bixwet, dema ku hûn agahdarê wî nebin.´ 14 Ewan got, ´Eger
gurgek wî bixwet, dema ku em komekin, birastî em dê bibine dorîner!´
15 Lewma dema ku ewan, ew digel xwe bir, biryar dan ku wî havêjine binê
bîrekê da, lê Me sirûş da wî, ´Bêguman tu dê sebaret bi ew mijara wan, ewan
agahdar bikey, dema ku ew tênagehin!´ 16 Û di şevê da ew bi giryan hatine bo
bal babê xwe. 17 Ewan got, ´Babo birastî, bi pêşberkêya yêkdu em wêda çon û
me Yûsif paşve hêla lalê tiştên xwe û gurgekê ew xwar lê tu bawerî bi me
nakey, herçend ku em rastiyê dibêjin!´ 18 Û ewan kirasê wi înan ku bi xwîna
direw hatibû leke dar kirin. Ew got, ´Ne! Rihên we hûn han dane ku karekê
biken! Lewma ewa ciwan ewe ku bêhin fereh bin, tenê daxwaza yarmetiyê li
Xwe dê tête kirin, li dijî ewa ku we şirove kiriye.´ 19 Hindek rêvî hatine
wêderê. Yêk şandin ku avê bikêşît û wî satila xwe dihola xarê. Wî bang kir.
´Mizgînî!´ ´Kurek wêderê ye!´ Wan, ew weka pirtikek kala[a] veşartin, Xwe dê
dizanî ku ewan çi kir 20 ewan ew bi bihayek kêm firotin, bi çend pirtikên zîv, li
ber hindê ku wan gelek bi kêmî buha dane wî.



a: Tiştê ku danûstandinê pê biken. Tiştek, Keresteyek ku bête firotin.

21 Ew Misriyê ku ew kirî bû gote jina xwe, ´Baş li wî hişar be! Belke ew kêr me
bêt, yanjî belke em wî weke kur bixwe xwedan ken.´ Bi wî awayî, Me Yûsif li
ew welat da niştecih kir û Me ew fêr kir ku çawa serhata vergêrît, Xwe dê
hemû gavê li armanca Xwe da ser dikevît, lê piraniya mirova tênagehin.
22 Dema ku ew pêgeheşt, Me dadwerî û zanist da wî, aha wisa, Em padaş
didene ewên ku başiyê diken. 23 Jina ku ew li mala wê da dijya hewil da ku wî
bilêbînît, wê, der qifil kirin û got, ´Were bal min´ Û wî got, ´Penaha Xwe dê!
Birastî Ev Xwedanê mine û cihê mana min xweş kiriye, birastî ewên nerastkar
ser nakevin.´ 24 Bêguman wê dixwast ku wî bilêbînît û wî dê xwe li hember wê
da xar kiriba, eger wî nîşaneyên Xwedanê xwe nedîtiban. Me wisa, nebaşî û
bêrewiştî li wî dûr ragirt, çimkî birastî ew, yêk li koleyên helbijartiyê Me bû.
25 Ewan bo aliyê derî pêşberkê kir, wê kirasê wî li aliyê piştê ra dirand û li naw
derî da, ewan lêrê mêrê wê dît. Wê got, ´Çi tiştek, xêncî zîndan yanjî
eşkenceyek dijwar dibya sizayê kesekê bît ku hewil da, nebaşiyê digel jina te
biket ?´ 26 Wî got, ´Wê hewil da min bilêbînît.´ Gewahekê naw mala wê da
gewahî da, ´Eger kirasê wî li pêşiyê da diryaye, bes ya wê digot rast bû û ew
direwa diket, 27 lê eger kirasê wî li aliyê piştê da diryaye, bes wê direw kiriye û
ew rastiyê dibêjît.´ 28 Lewma dema wî dît ku kiras li aliyê piştê da diryaye, wî
got, ewe xerîtê wê ye. Birastî xerîtê te gelek mezine. 29 Yûsif, ewê pişt guhê
xwe we havêje lê tu, daxwaza lêbihorîne bo guneha xwe bixweze, birastî tu
guneh kar bûy.30 Jinên bajêr gotin, ´Jina Ezîz[a] hewil didet ku kolê xwe
bilêbînît! Wî, ew bi evîna xwe gelek evîndar[b] kiriye! Em dibînin ku ew jin bi
aşkira şaşiyê diket.´ 31 Lewma dema ku wê, ew peyvîna bi kîndarî bihîst, wê bo
ewan cejnek amade kir û şande dû ewan da, kêrek daye her yêk li wan. Wê
gotê, ´Were derê û xwe nîşa ewane bide!´ Û dema ew dîtin, ew gelek kêrhatî
dîtin û destên xwe birîn û gotin ´Xwe dê Bêkêmasiye! Ewe bimir nîne! Ew
dibya firişteyek paye bilind bît!´ 32 Wê got, ´Eweye ewê ku hûn min bo
tawanbar diken. Bêguman min xwest wî bilêbînim û lê wî xwe rizgar kir, lê
eger wê neket, ewa ez niha destûr didem, ew dê bête zindanî kirin û li naw
ewên şermezar kirî da bît.´ 33 Wî got, ´Xwedanê min! min zîndan pê baştire li
ya ku ewane dixwazin ez bikem, eger Tu, min li bernameya wan neparêzî,
belke ez wê bikem û bibime yêk li wan nezana.´ 34 Lewma Xwedanê wî
bersiva paryana wî da û ew li bernama wan parast, birastî Ev Bihîstine,
Zanîne.
35 Paşê bo wan derket, piştî ku wan nîşane dîtibûn, dibya bêguman bo demekê
wî zîndanî biken. 36 Du mêrên law jî digel wî da çone zîndanê. Yêk li wan got,
´Min dît ku min tirî[c] diguhişand´ Ewê dîke got, ´Min xwe dît ku min ser serê
xwe nan hilgirtibû û balendeya lê dixwarin.´ ´Ka bêje me, wateya wan çiye?
Em dibînin ku tu li ewên dirustkarî.´



a: Navê ew kes Ezîz bûye! b: Jina Ezîz gelek evîndarê Yûsif bûye.
c: Tirî guhişand bo meyê (şerabê) vexwarina ku mirova serxweş diket.

[37] Wî got, ´Pêş ku xwarina ku dê bidene we bigehîte lêre, ez dê we agahdarê
vergêrana wê bikem, eve li vê ye ku Xwedanê min, ez fêr kirî me, birastî min
dînê ew mirova bi cih hêlaye ku bawerî bi Xwe dê naken û bawerî bi Dawiyê
naken [38] û ez peyrevî li dînê berebabê xwe Ibrahîm, Ishaq û Yeqûb dikem. Em
hîç tiştekê li kêleka Xwe dê, da naperestin. Ewe li qenciya Xwe dê li ser me û
mirova ye, lê piraniya mirova nankorin.[a] [39] Her du hevrêyên min yê zîndanî,
meger gelek xwedêyên ciyawaz dê li Xwe dê yê yêkta baştir bin, Ev ê Hemû
Hêz? [40] Ewên ku hûn li ciyê Vî da koletiya wan diken, tenê navin ku we û
berebabên we danayne ser ewan û Xwe dê jibo wan çi desthilat neşandiye
xarê. Destûr tenê ya Xwe dê ye û Ev ferman diket ku hûn koletiya kesê neken
bes Ev nebît, eve dînê rastiye, lê piraniya mirova evê nizanin. [41] Her du
hevrêyên  min yê zindanî, yêk li we dê vexwarina meyê bidete serwerê xwe,
ewê dîke jî dê li xaçê bête dan û balinde dê li ser serê wî biçerin. Ew mijare
hatiye gotin ku we li ser da pirs kir.´ [42] Û gote ewê ku wî dizanî dê serbest bît,
´Amajeya[b] min bo serwerê xwe bike, lê Şeytan wekir ku ew bîr biket, bêjîte
serwerê xwe û li ber hindê Yûsif çend sala ma zîndanê da. [43] Padişah got,
´Min dîtiy ku heft çêlên qelew li aliyê heft ên jar we bêne xwarin, heft kulîlkên
şîn û ewê[c] dîke hişik bûyî. Ho Serokino, eger hûn dikarin dîtina vergêrin,
wateya dîtina min bo min bêjin.´ [44] Ewan got, ´Ew xewne aloze û em nehatine
perwerde kirin ku xewna vergêrin [45] lê, piştî demekê hate bîra ew zîndaniyê ku
hatibû berdan û got, ´Ez dê bêjime te vergêrana wê çiye, lewma destûrê bide
min ez biçim.[46] Yûsifê rastbêj! Ka bêje me vergêrana, heft çêlên qelew li aliyê
heft çêlên jar we bêne xwarin, heft kulîlkên şîn û ewê dîke yê hişik, paşê ez
bikarim bizvirme bal mirova û belke bi wî awayî ew bizanin.
[47] ´Hûn dê bo heft salên serhevda biçînin. Hemû ewa we dirûye di gulgenim
da hilgirn, xêncî hindekê ku hûn dê bixwen. [48] Piştî wê, dê heft ên dijawr bên,
ku hûn dê hemû ewa ku we jiboy wê kom kiribû dê bixwen, xêncî hindekê
nebît ku hûn dê xwedan biken, [49] piştî wê, dê salek bêt ku dê baranê bidete
mirova û ew dê biguhişin.[d] [50] Padişah got, ´Ew bînine bal min,´ Lê dema ku
peyamnêr hate bal wî, ew got, ´Here bal serwerê xwe û lê bipirse çi serê ewan
jina hat ku destê xwe birî bûn, birastî Xwedanê min sebaret bi bernameya
wan dizanît.´ [51] Wî got, ´Çi bû, dema ku we xwest Yûsif bilêbînin?´ Wan got,
´Xwe dê bêkêmasiye! Em çi tiştê nebaş sebaret bi wî nizanin!´ Û jina Ezîz got,
´Niha ku rastî aşkira bûye, ew ez bûm ku min xwest wî bilêbînim û birastî,
ewe ku rast dibêjît.´ [52] ´Ewe bo serwerê min bû ku bizanît min li nebûna wî da
xiyanet bi wî nekir û Xwe dê rênivîniya bernameya xayina naket.



a: Nankor yanî şokor dar nebît, sipasa Xwe dê neket.  b: Bas, bêje
c: Heft kolîlkên hişik
d: Ew dê tirî û zeytûna biguhşînin! (Tirî biguhşînin bo doşab û meyê û zeytûna biguhşînin bo rûnê wê)

[53] Ez xwe bêguneh nakem, çimkî xwedî rih, mirov han didet bo karên nebaş,
meger ku Xwedanê min rehmê nîşan bidet, birastî Xwedanê min Lêbihore û
Rehmê didet.´ [54] Padişah got, ´Ew bînine bal min, ez dê her bixwe wî
destnîşan bikem´ Dema ew digel da peyvî, wî got ´Birastî li îro pêwe tu hatî
cihgîr kirin û bawerî bi te hatiye kirin.´ [55] Wî got, ´Min bike berpirsê
himbana[a] welat, birastî ez dê bi zanebûn wê biparêzim.´ [56] Bi wî awayî Me
Yûsif li ew welat damezirand ku li her derê hez dikir bijît, Em rehma Xwe li
her kesê ku Em dixwazin diken û Em padaşê ewên ku karên baş diken bezir
naken. [57] Bo ewên ku bawer diken û hişyarê Vî ne, padaşê Dawiyê bêhtirin.
[58] Birayên Yûsif hatin û li wî hatine jor, wî ew naskirin lê wan, ew nas nekir
[59] û dema ku wî, pêvîstiyê wan dayê da, wî got ´Bo min ew birayê, li babê xwe
bînin! Meger we nedît ku pîvanên tewaw bidem û bêhtrîn mêwandarim?
[60] Edî ez çi pîvana nademe we, eger hûn wî nehînine bal min û hûn li min
nêzîk jî nabin.´ [61] Gotin; ´Em dê hevil biden ku bo wî destûrê li babê xwe
bistînin û birastî em dê wê biken.´ [62] Wî gote xizmetkarê xwe, ´kalayên dan û
sitandina wan carek dîke danê naw cantê ser kurtanê wan, belke bi wî awayî
ew pê bizanin, dema ew dizvrine bal binemala xwe û belke bizvrin.´ [63] Lewma
dema ew zivrîne bal babê xwe, ewan got, ´Babo, pîvan nedayne me, lewma
birayê me digel me rêke, bila pîvanê bidene me. Birastî em dê wî biparêzin.´
[64] Wî got, ´Meger dibya, ez wî bispêrime we, weka min pêşta birayê wî siparte
we? Lê Xwe dê bêhtrîn parêzere û Ev li birehmtrîn, birehmaye.´ [65] Dema
ewan barê xwe vekirin, ewan dît ku kalayên wan bo wan hatine zivrandin û
ewan got, ´Babo! Me dê karîba edî çi bixwazin, ewe kalayê me ne ku bo me
hatine zivrandin. Em dê bo binemala xwe, pê pêdavîstiya bistînin û pê birayê
xwe biparêzin û pîvaneke zêde li barê pişta hêştirekê pê bistînin, ewe bi hêsanî
pîvaneke!´ [66] Wî got, ´Ez çi cara wî digel we narêkem, meger hûn bi Xwe dê
belêniyê bidene min ku hûn dê wî bo min bizvrînin, meger ku hûn bêne
dorpêç kirin.´ Dema ku ewan belêniya xwe dan, wî got, ´Xwe dê gewahê
gotinên me ye.´ [67] Wî got, ´kurên min, hemû li deriyekê da neçine jor, li
deriyên cuda da herine jor da. Lê ez nikarim li dijî bextê Xwe dê bo we tiştekê
bikem, biryar tenê bo Xwe dê ye. Ez xwe dispêrime Vî, bila ewên ku dixwazin
xwe bispêrin, xwe bispêrine Vî´ [68] Û dema ku ew ketine jorda, wek ku babê
wan destûr dabû wan, li dijî bextê Xwe dê ewê bo wan tiştek nekir, ew tenê
pêvîstiyek li naw riha Yeqûb da bû ku wî bi cih îna. Birastî ew xwedanê vê
zanistê bû, çimkî Me ew fêrî evê kirbû, lê piraniya mirova nizanin. [69] Dema ku
ew li Yûsif çone jor, wî birayê xwe bire bal xwe û got, ´Birastî ez birayê te me,
lewma li ber kiryarên wan yê berê xemgîn nebe,´



a: Embar, cihê hilgirtina tişta yanjî cihê hilgirtina xwarinê

70 Û dema ku wî pêdavîstiyên wan dabûye wan, wî fîncan dana naw barê
birayê xwe da. Paşê gazîkerekê gazî kir, ´Hûn karwançî birastî dizin!´
71 Û ew zivirîn û gotin, ´We çi bezir kiriye?´ 72 Ewan got, ´Me fîncana padişah
bezir kiriye,´ Û her kesê wê bizvrînît dê barekê li pişta hêştirê vergrît,´ Û ´Ez
berpirsyarê wê me.´ 73 Ewan got, ´Bo xatira Xwe dê! Hûn dibya bizanin ku
em nehatine welatê we gendeliyê biken û em diz nebûne.´ 74 Ewan got, ´Eger
hûn direwa biken, sizayê we çiye?´ 75 Û wan bersiv da, ´Siza dê ew kes bixwe
bît ku fîncan di naw cantê wî da derkevît, bi wî awayî, em nerastkara siza
diden.´ 76 Lewma dest bi lêgeryana li naw cantê ewan da kir û paşê ya birayê
xwe û li naw cantê birayê xwe da derêxist. Bi wî awayî Me bernameyek bo
Yûsif berhem îna, eger Xwe dê wisa nexwestiba, wî dê nekarîba bi dînê
padişah, weke siza birayê xwe desteser biket, Em pileya her kesê ku Em
dixwazin bilind diken, lê li serwey hemû ewên ku zanist hene, Yêk heye ku
Zaniste. 77 Ewan got ´Eger ewe diz bît, birayê wî li pêş wî da jî diz bûye,´ Lê
Yûsif nihêniya xwe parast û çi tiştek bo wan eşkere nekir. Wî got, ´Hûn li
cihek gelek nebaş dane. Xwe dê bêhtir rastiya ewa ku hûn şirove diken
dizanît.´
78 Ewan got ´Ezîz, birastî ew babek pîre mêr heye. Li şûna wî da yêke me
bibe. Birastî Em dikarin bibînin ku tu durstkarî.´ 79 Wî got, ´Xwe dê qedexe
diket ku em kesek dîke xêncî ewê ku me malê xwe lali dîtiye bigrin, birastî li
bal me, ew dê bibîte bêdadî.´ 80 Lewma dema ku ewan hêviya xwe wenda kir,
ew wêda çon ku digel hevdu rawêjê biken, ewê li hemiya bi tementir got,
´Meger bîra we nayêt ku babê we bi navê Xwe dê peyman li we sitand û pêş
wê jî sebaret bi Yûsif ew şikand? Lewma, ez wî welatî cih nahêlim, meger ku
babê min destûrê bidete min yanjî Xwe dê bo min biryarê bidet, Ev bêhtrîn
biryardere.
81 Herne lalê babê xwe û bêjinê, ´Babo, birastî kurê te dizî û em tenê gewahê
wê ne ya ku em dizanin. Em gewahê ewa nedîtî nînin. 82 Li gundê ku em têda
bûne û li karwanê ku em digel da bûn pirs bike, birastî em rastiyê dibêjin.´
83 Wî got, ´Na! Riha we hûn bo tiştekê han dayne! Lê bêhin ferehî ciwane,
belke Xwe dê hemûya bizvrînîte bal min, birastî Ev zanist heye ku biryarê
bidet,´ 84 Û wî pişta xwe da wan bi gotina, ´Hewar bo Yûsif!´ Çavên wî bi
xemgîniyê sipî bûn û ew tejî xem bû. 85 Ewan got, ´Bo xatira Xwe dê! Tu waz
li bîr anîna Yûsif naynî takû tu bo mirinê nexweş dibî yanjî dimirî.´ 86 Wî got,
´Ez tenê, gazinda êş û xemgîniya xwe bo Xwe dê dikem. Min zanist li bal
Xwe dê we heye ku we çinîne. 87 Kurên min, herin nûçeykê Yûsif û birayê wî
bigerên û li rehma Xwe dê bêhêvî nebin, birastî kes li rehma Xwe dê bêhêvî
nabît, xêncî ewên ku bawer naken.´

88 Lewma dema ku ew li wî çone jor ewan got, ´Ezîz, karesatê li me û
binemala me daye. Me tenê hindek kala înayne, lê pîvanek tewaw bide me.
Xêrê bi me bike, birastî Xwe dê padaş didete xêr xwaza,´ 89 Wî got, ´ Hûn
dizanin ewa ku we bi Yûsif û birayê wî kirî, dema hûn nezan bûn?´ 90 Û wan
got, ´Meger birastî tu Yûsifi?´ Wî got, ´Ez Yûsifim. Ewe birayê mine. Birastî
Xwe dê digel me baş bûye, her kesê ku hişyarê Vî bît û bêhin fereh bît
Xwe dê nahêlît padaşê ewên ku karê baş diken heder biçît.´91 Ewan got,
´Bo xatira Xwe dê! Birastî Xwe dê serwey me hemûya da hez li te kir û
em gunehkar bûne!´ 92 Lê wî got, ´Îro çi gazinde li we nabin. Xwe dê, dê li
we bibhorît, Ev birehmtrînê birehmaye.
93 Ew kirasê min biben û rawêxine ser rûmetê babê min, ew dê dîtina xwe
bidest we bînît. Paşê hemû binemala xwe bînine bal min.´ 94 Dema ku karwan
bi rê ket, babê wan got, ´Reng bît hûn hizir biken ku ez xirifî me, lê birastî ez
dikarim Yûsif bêhin kem´ 95 Ewan gotin, ´Bo xatira Xwe dê! Tu hêşta jî di
şaşiya xwe ya kevin dayî!´ 96 Paşê, dema ku helgirê mizgîniyê hat û kirasê Yûsif
raxiste ser rûmetê wî, ronahiya çavên wî zivrî û wî got, ´Meger min negote we,
min zanist li bal Xwe dê we heye ku we nîne?´ 97 Gotin, ´Babo, li Xwe dê
daxwaza lêbihorînê bo gûnehên me bixwaze, birastî em gunehkar bûne.´
98 Wî got, ´Ez dê li Xwedanê xwe bixwzim ku li we bibhorît, Ev Lêbihore û
Rehmê didet.´ 99 Paşê dema ku ew li Yûsif hatine jor, wî dayk û babê xwe
birne bal xwe û wî got, ´Werne Misrê, Xwe dê bixwazît parastî. ´ 100 Û wî
dayk û babê xwe bilind kirine ser textê û ewan serê xwe li ber wî da çemandin
û wî got, ´Babo, ewe vergêrana ew dîtina min ya pêşta ye. Xwedanê min ew
kire rastî û Ev bo min baş bûye dema ku Vî ez li zîndanê serbest berdam û
hûn li çolê ra înane wêderê, piştî ku Şeytan li nawbera min û birayên min da
nakokî çêkir. Birastî Xwedanê min hêdiye li bideset înana ewa ku Ev dixwazît.
Ev Zanaye Biryardere. 101 Xwedanê min! Te padişahî daye min. Te ez fêrî
vergêrana dîtina kirîme, Afrînerê asimana û erdê, li vê dinyayê û li Dawiyê da
Tu parêzerê minî. Bihêle ez bi xwe radest kirina bi Te bimrim. Min bigehîne
ewên dirustkar.´
102 Ewe li nûçeya nedîtiye ku Em bo te eşkere diken û tu digel wan da nebûy
dema ku wan xerîteyê bernameya xwe kêşan. 103 Lê, piraniya mirova naken,
herçend ku tu bixwazî ew bawer biken. 104 Bo evê tu daxwaza çi padaşa li
ewan nakey, xêncî bîreweriyekê bo dinyaya eve tiştek dîke nîne! 105 Û çend
nîşane li asimana û erdê da hene ku ew li ber da derbaz dibin û pişta xwe
didenê. 106 Piraniya wan, tenê demekê dê bawerî bi Xwe dê biken ku ewê dîke
bikene ´hevalê´ Vî. 107 Meger ew hind bêgumanin ku sizayek gelek mezin li bal
Xwe dê we ser ewan da nakevît yanjî demjimêra dawiyê nişkida nayête ser
wan da, dema ku ew tênagehin?

108 Bêje, ´Eve rêka mine, ez bi têbînî jibo Xwe dê bang dikem, ez û ewên ku
peyrevî li min diken. Xwe dê paye bilinde. Ez yêk li wan nînim ku ´hevala´
jiboy Xwe dê peyda diket.´ 109 Ew peyamberên ku Me pêş te da şandin mêr
bûn ku li naw mirovên gundên wan da Me sirûş dabû wan. Meger ewan li ser
erdê da hat û ço nekiriye ku dawiya ewên pêş xwe da çoyî bibînin? Jibo ewên
ku hişyarê Vî ne mala di Dawiyê da bêhtire. Bes çima hûn hizra xwe bikar
naynin?
110 Ta dema ku peyambera hemû hêvî wenda kirbûn û hizir kirin ku ew
nehatine pejirandin, paşê yarmetiya Me bo wan hat, her kesê ku Me xwast,
Me rizgar kir, lê sizayê Me li mirovên tawankar nayête zivrandin.
111 Birastî di serhata wan da, ji bo ewên ku têdigehin waneyek heye. Ew
eşkereye serhatek nîne ku hatibîte dahînan, lê eve erêniya evêye ku pêş vêda
hebû û şiroveyeke serûber li ser hemû tişta, bo ew netewa ku bawer diket
rênivînî û rehme.

## 13. Para Birûskê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Elîf Lam Mîm Ra, ewane nîşaneyên nivîsîna pîrozin. Eva ku Xwedanê te bo te şandiye xarê rastiye, hêşta jî piraniya mirova bawer naken. 2 Ev Xwe dê ye ku hemû asiman bi histûnên ku nayêne dîtin bilind kirine û paşê Xwe li ser text bicih kir, Vî her yêk li roj û heyv erkdar kirîne ku bo demekê dîhar kirî hêla xwe bişopînin, Ev mijara ser û ber diket û eşkereya şirove diket, belke bi wî awayî hûn li hevdîtina Xwedanê xwe bêguman bin,3 Ev e ku erd belav kirye, çiyayên qahîm û çem li ser da cihgîr kirine û li hemû meyveya cot çêkirin, Ev pê şevê rojê dipeçêrît. Birastî lêreda nîşane hene, bo mirovê ku hizr lê diken. 4 Li ser erdê zewyên cînar, rezên tirî, zevyên dexil û dana, darên xormê ku li rehekê şîn bûne û ewên dîke li gelek reha hene, hemû bi avekê têne av dan, lê Em berhema hindeka li ewên dîke bêhtir diken, birastî lêre da nîşane hene bo ew mirovên ku hizra xwe bikar tînin. 5 Eger tu sersir mayî, bes bêguman dibya tu li ber gotina wan sersir bimînî, ´Dema em dibine toz, em dê ser li nû bêne afirandin´ Ewane ewin ku bawerî bi Xwedanê xwe nekirine, ew dê lelê têkene ûstê xwe da û dê bibine hevrêyên naw agir da û ta bêdawiyê ew dê li wêderê da bimînin. 6 Ew bi lezgînî li te dixwazin ku bo wan pêş başiyê da nebaşiyê bînî, herçend ku pêş ewan da mînakên wisa rû dayne, tewî nerastkariyên wan, birastî Xwedanê we pire li lêbihorîn bo mirova û birastî Xwedanê we dijware li siza danê da. 7 Ewên nebawer dibêjin, ´Çima li bal Xwedanê wî ra çi nîşane bo wî nehatine şandin xarê?´ Lê tu tenê agahiyê didey û her neteweyekê jî rênivînek heye. 8 Xwe dê dizanît ku hemû mê, bi çi pêgiranin û pizdanê[a] wan çend diçilmisît yanjî pif didet û hemû tiştekê li bal Vî pîvana xwe heye, 9 Zanayê ewa nedîtiye û Gewahe, Ev Mezine, Bilinde.

10 Çi ciyawaziyekê naket ku her yêk li we bi nehênî yanjî bi dengek bilind bipeyvît, çi hûn xwe di şevê da weşêrin yanjî bi rojê li wan dera bigerên, 11 Ew li pêş û li pişt wî da diçin ku bi destûra Xwe dê ew biparêzin. Birastî Xwe dê revşa gelekê naguherît, meger ku ewa di naw xwe da biguherin, dema Xwe dê nebaşiyê bo gelekê bixwazît, ev nayête zivrandin, li kêleka Vî da ewan çi parêzer nînin. 12 Ev e ku berqê[b] nîşa te didet, tirs û hêvî û ewrê giran berhem tînît. 13 Ewre tirîşqe paye bilindiya pesna Vî diket, her wek ku firişte jî li tirsê Vî da diken, Ev birsûska dişînît, li her kesê bidet ku Ev dixwazît. Lê hêşta jî ew li ser Xwe dê gengeşê diken, Ev li lêdanê da dijware.



a: Dibêjine Mal biçûka ajela pizdan, ew cihê ku zarûk di zikê daykê da mezin dibît.
b: Wek ez bizanim me jibo ´Berq´ ê çi peyv li Kurdî da nînin, Bakûrî dibêjinê ceyran, Kurdê parên dîke jî dibêjinê berq (electricity), Kareba.

[14] Tenê pariyana rastî bo Vî ye, ewên ku ew li kêleka Vî da li ber
dipariyên, bersiva çi tişta nadene wan, weka ew kesê ku destê xwe dirêj
avê diket ku bigehîte devê wî, lê nagehîtê û pariyanê nebawera şaşin.
[15] Ewên di asiman û erdê da tenê bo Xwe dê serê xwe dinvîninᵃ, bi
dilxwaz yanjî bêy dilxwazî û sîbera wan jî li sibê û êvara da. [16] Bêje ´kêye
Xwedanê asimana û erdê?´ Bêje, ´Xwe dê´ Bêje, ´Te çi parêzvanên dîke li
kêleka Vî da vergirtine, ewên ku desthelat nînin ku qazanc û zirarê li xwe
biden? ´ Bêje,´Meger kore û bîner wekhevin? Yanjî meger tarîtî û ronahî
wekhevin?´ Yanjî ew ´hevalên´ ku ewan bi Xwe dê we girê dane çi tiştek
afirandine ku wek afirandina Vî bît û rengê afirandina Vî bidet? Bêje,
´Xwe dê, afirînerê hemû tişta ye, Ev Yêke, Ev ê hemû Hêz. [17] Ev, avê li
asiman ra dişîne ku pêka pîvana xwe li dev geliya da bimeşît. Rûbarᵇ digel
xwe qatek kefa ku ser rûyê wêda bilind dibît dimeşînît, kefek weka ewa ku
dema ew asin li naw agiri da dihelînin ku pê cewher yanjî keresta çêken, bi
wê rêbazê Xwe dê rastî û direwê nîşan didet, kef qirêje wenda dibît, lê ewa
ku bo mirova qazanc hebît li ser erdê dimînît, Xwe dê mînakên wisa
pêşkêş diket.
[18] Bo ewên ku bersiva Xwedanê xwe diden dê bêhtrîn hebin, ewên ku
bersiva Vî naden, eger ewan hemû tiştê di erdê da û ewa weka wê jî digel
da, heba bêguman dê weke qerebû daban, lêpirsîna wan dê nebaş bît û
cehnem dê bibîte penahgeha wan, cihek gelek kotiye bo bêhn wedanê.
[19] Meger ewê ku dizanît eva li bal Xwedanê te ra jiboy te eşkere bûye
raste, wek ewê kore ye? Tenê ewên xwedan têgeheştin dê bîra xwe da
xwedan ken, [20] ewên ku ew peymana digel Xwe dê girê dayne bicih tînin
û belêniya xwe naşkînin, [21] ewên ku eva ku Xwe dê fermana vê daye ku
bigehîte hev, digehînine hevdu û sersamê Xwedanê xwe ne û li nebaşiya
lêpirsînê ditirsin, [22] ewên ku bêhn ferehê dîtina rûmetê Xwedanê xwe
dimînin, nûbêjên xwe diken û bi nihênî û eşkere li eva ku Me bo wan
dabîn kiriye diden û nebaşiyê bi başiyê wêda diben. Li dawiyê da ewan dê
mal hebît [23] Ew dê digel berebabên xwe, hevjînên xwe û neviyên xwe yên
dirustkar biçine naw baxçên jiyana hemêşeyî da, dê li hemû derwaza da
firişte biçine bal wan [24] ´Aştî li ser we bît, çimkî hûn bêhin fereh man.
Mala we ya dawiyê bê kêmasiye!´



a: Sucde birin b: Çem, cok, ew cihê ku av têda diçît!

[25] Lê, jibo ewên ku peymana Xwe dê dişkînin piştî ku belênî dane û li hev
belav diken eva ku Xwe dê ferman daye pêkeve bête girê dan û gendeliyê
li ser erdê belav diken, jiboy wan nerênî heye û mala wan dê nexweş bît.
[26] Xwe dê bi firavanî debara didete her kesê ku Ev dixwazît û kêm diket jî,
ew li jiyana vê dinyayê da keyfxweşin, herçend ku jiyana ev dinyayê
nayête berawird kirin digel Dawiyê, ew bes keyfxweşiye. [27] Ewên nebawer
dibêjin, ´Çima li bal Xwedanê wî ra bo wî çi nîşane nehatine şandin?´
Bêje, ´Birastî Xwe dê dihêlît her kesê ku Ev dixwazît li rê derkevît û ewên
ku dizvirn, rênivînî dikete bo aliyê Xwe, [28] ewên ku bawer kirîne û
bîranîna Xwe dê dilê wan qahîm diket. Birastî bi bîranîna Xwe dê dil
qahîm dibin. [29] Ewên ku bawer kirîne û durustkariyê diken, ewan dê
maneke baş hebît û zivrîneke baş. ´ [30] Li ber wê hindê Me tu bo
neteweyekê şandî ku gelek mêjda neteweyên dîke li serda wexera dawî
kirin û belke to bo wan bixwînî eva ku Em sirûşê didene te. Dema ku ew
bawerî bi Xwedanê rehmê naken. Bêje, ´Ev Xwedanê mine, xêncî Vî çi
xwedê dîke nînin. Ez xwe dispêrime Vî û ez dê bizvrime bal Vî.´ [31] Eger çi
cara Xwandinek (Quranek) heba ku çiya karîban pê evê bimeşin yanjî erd
hûr hûr şikaba, yanjî wisa li mirî kirban ku bipeyvin, lê fermana hemû
tişta ya Xwe dê ye. Meger bawermend nizanin ku eger Xwe dê xwastiba
Vî dikarî hemû mirova rênivînî biket? Ewên nebawer li ber kiryarên wan
karesat narawestît ku li wan nedet yanjî nekevîte nêzîk mala wan taku
belêniya Xwe dê tête cih. Xwe dê, çi cara li xwedan kirina belêniya Xwe
da şikestê naxwet. [32] Bêguman tirane bi peyamberên pêş te da jî hatibû
kirin, lê Min derfet da ewên nebawer, paşê Min ew girtin, sizaya Min
çawa bû! [33] Ev ê ku serûberiya her rihekê diket û destkevtê wê dizanît?
Hêşta jî ew hevala bi Xwe dê we girê diden. Bêje, ´Navê wan bêjin´ yanjî,
´Hûn dikarin bêjine Vî sebaret bi tiştekê ku li ser erdê dijît û Ev nizanît
yanjî ewe li peyvînê da xûya ye?´ Lê, bernamê nebawera li pêş çavê wan
hatine xemilandin û pêşgîriya wan li rê hatiye kirin, her kesê ku Xwe dê
dihêlît li rê derkevît, ew çi rênivîn çinabin, [34] bo wan li jiyana ev dinyayê
da eşkenceyek heye, lê eşkenceya Dawiyê dê dijwartir bît, ewan li dijî
Xwe dê çi parêzer nabin. [35] Ewe mînaka baxçeye ku belêniya wê bi ewên
ku hişyarê Vî ne hatiye dan, çemên ku diherikin û xwarina bêpayan û
sîber. Eweye dawiya ewên ku hişyarê Vî ne, dawiya nebawera jî agire.
[36] Bo ewên ku Me nivîsîna pîroz daye we, bi eva ku bo te hatiye şandin şad
be, li naw ewên ku nikoliyê li hindek parê vê diken. Bêje, ´Ferman li min
hatiye kirin ku tenê koleyê Xwe dê bim û çi ´hevala´ bo Vî peyda nekem,
jibo bal Vî ez bang[a] didem û ez dê vegerime bal Vî.´



a: Gazî kirin, ez gazî we dikeme bob al XWE DÊ tene!

37 Li ber wê hindê, Me eve weke destûrek Erebî  şandiye xarê. Eger tu
peyrevî li hestên wan bikey, piştî ev zanista ku bo te hatiye kes çinabît ku li
dijî Xwe dê piştîvaniya te biket û te biparêzît.
38 Bêguman Me pêş te da peyamber şandin û Me jin û zarûk dane wan,
jibo hîç peyamberekê nebû ku bêy destûra Xwe dê nîşaneyekê bînît. Jibo
her demekê nivîsîneke pîroz hebû. 39 Xwe dê her tiştê ku Ev dixwazît li
nav dibet yanjî erênî diket û dayka[a] nivîsîna pîroz li bal Vî ye. 40 Çi Em
bihêlin tu pişkekê li eva ku Me belêniya wê daye wan bibînî, yanjî bi
mirinê te biben, erkê te eve ku peyamê bigehînî û hisab pirsîn jî erkê Me
ye. 41 Meger ew nabînin ku Em çawa têne ser erdê û li sînorên wê kêmtir
diken? Xwe dê biryarê didet, kes nikarît destêverdana biryara Vî biket û
Ev li lêpirsînê da lezgîne. 42 Bêguman ewên pêş wan da jî bername rêjî
kirbûn, lê bername rêjiya giştî ya Xwe dê ye. Ev dizanît her rihek çi dest
xwe tînît û nebawer dê bizanin mala dawiyê dê bo kê bît.
43 Ewên nebawer dibêjin, ´Tu nehatî şandin.´ Bêje, ´Xwe dê têra Xwe li
nawbera min û we da gewahe û her wisa her kesê ku zanista nivîsîna pîroz
heye.´



a: Serçaveya nivîsîna pîroz li bal XWE DÊ ye!

## 14. Para Ibrahîm

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Alîf Lam Ra, nivîsînek pîroze ku Me bo te şandiye xarê, li ber wê hindê bi
destûra Xwedanê wan, bila tu mirova li tarîtiyê da bîniye ber ronahiyê, bo ser
rêya Ev ê Bihêz, Ev ê Kêrhatiyê Pesnê[a]. 2 Ewa di asimana û erdê da yê Xwe dê yê.
Heware bo nebawera li ber ew eşkenceya dijwar. 3 Ewên ku zêdetir li Dawiyê hez
li jiyana ev dinyayê diken û pêşgîrî li rêya Xwe dê diken, hevil diden ku vê xar
biken, ew gelek dûr li rê derketine. 4 Me çi cara bo gelekê peyamber neşandiye ku
zimanê wan bixwe bikar ne înabît ku bo wan zelal biket, lê hêşta jî Xwe dê, dê
bêhlît her kesê ku Ev dixwazît li rê derkevît û rênivînî biket her kesê ku Ev
dixwezît, Vî desthilat heye ku biryarê bidet. 5 Li ber wê hindê, Me Mûsa bi
nîşaneyên Xwe şand ´Netewa xwe li tarîtiyê da bîne ber ronahiyê. Rojên Xwe dê
bîne bîra wan, birastî lêreda nîşane hene jibo hemû ewên ku bêhn fereh û
sipasdarin.´ 6 Û dema Mûsa gote netewa xwe, ´Erêniya Xwe dê li ser we bîra we
bît, dema ku Vî hûn li netewa Fireûn rizgar kirin, ewên ku bi eşkenceyek nebaş
hûn diêşandin, kurên we serjê dikirin û tenê jinê we zindî dihêlan, ew li bal
Xwedanê we ra ezmûnek gelek mezin bû! 7 Û dema Xwedanê we ragehand,´Eger
hûn sipasdarin bêguman ez dê zêde bideme we, lê eger hûn bawer neken, birastî
sizaya Min dijware.´ 8 Û Mûsa got, ´Eger hûn digel hemû ewên ser erdê da bawer
neken Xwe dê têra Xwe heye, hêjayê hemû pesnê ye.´ 9 Meger we nûçeya ewên
ku pêş we da çoyne nebihîstiye? Netewa Nûh, Ad, Semûd û ewên paş ewanda, kes
ewan nas naket bes Xwe dê nebît. Peyamberên wan bi belgeyên zelal hatine bal
wan, lê ewan destê xwe danane ser dewên xwe û gotina, ´Birastî em bawerî bi evê
naken ku bi te ra hatiye şandin. Birastî me gumanên perîşanker hene, sebaret bi
eva tu bangî me dikey ku em biken´ 10 Peyamberên wan gotin, ´Meger dibît,
sebaret bi Xwe dê çi guman hebin, afirînerê asimana û erdê? Ev bangî we diket ku
Ev li we bibhorît û ta demjimêra dîhar kirî derfetê didete we.´ Ewan got, ´Hûn
tenê wek me bimirin. Hûn dixwazin pêşgîriya me, li ewa ku berebabê me koletiya
wan dikirin biken. Lewma desthilateke zelal bo me bînin.´ 11 Payemberên wan
gotine wan,´Raste ku em tenê weka we bimirin, lê Xwe dê dispêrîte her yêk li
koleyê Xwe ku Ev dixwazît. Li ser me nîne ku em bo we çi desthilatê bînin, meger
Xwe dê bihêlît, lewma bila bawermend xwe bispêrine Xwe dê. 12 Bo çi nabît, em
xwe bispêrine Xwe dê dema ku Ev e, em rênivînî rêyên me kirîne, bêguman em
dê bêhn fereh bin li her çeşne êşa hûn bigehînine me. Bila ewên xwe dispêrin bila
xwe bispêrine Xwe dê.´ 13 Ewên nebawer gotine peyamberên xwe, ´Em dê we li
welatê xwe bikene der, meger hûn vegerêne ser dînê me.´ Lê Xwedanê wan, sirûş
da wan ´Bêguman Em dê nerastkara li nav biben,



a: Jibo peyva Hemd min peyva Pesn bikar înaye! Hemîd yanî kêrhatiyê pesnê.

[14] û bêguman Em dê bihêlin piştî wan, hûn li ser erdê nîştecih bin. Ewe bo ewane
ku li desthilata Min ditirsin û li hereşeyên Min ditirsin.´[15] Ewan daxwaza
serkevtinê kirin û hemû zordarên rikûyî bêhêvî kirin. [16] Cehnem li benda her yêk
li wane, dê ava qirêj bidene wan ku vexwen, [17] ew dê hevil biden ku fir ken, lê ew
dê gelek kêm bişên qurt ken, mirin dê li hemû aliya da li wan nêzîk bît, lê ew
namirin, dê êşkenceyek gelek bi zext li benda ewan bît. [18] Kiryarên ewên ku
bawerî bi Xwedanê xwe naken weka xaliyê ye ku di roja bagirê da, ba bi xurtî
dibet, ewan çi desthilat ser hîç tiştekê nîne ku wan bi dest xwe we êxistiye. Ewe ye
gelek dûr li rê derketin. [19] Meger tu nabînî ku Xwe dê hemû asiman û erd birastiyê
afirandine? Eger Ev bixwazît, Ev dikarît we wêda bibet û afirandinek nû berhem
bînît, [20] ewe bo Xwe dê dijwar nîne. [21] Dema ku ew hemû derdikevine pêşberî
Xwe dê, ewên bêhêz dê bêjine ewên qude, ´Birastî em şopînerê we bûn.´ Lewma
hûn dê bikarin, me li hîç yêk li sizayên Xwe dê biparêzin?´ Ew dê bêjin, ´Eger
Xwe dê em rênivînî kirban, me jî dê hûn rênivînî kirban. Jibo me herwek yêke, çi
em bêhin çik bin yanjî bi bêhin ferehî hêviyê bin, me çi cihê helatinê nîne.´
[22] Dema ku biryara mijarê bête dan, Şeytan dê bêjît, ´Birastî Xwe dê belêniyek
rastî da we, min jî belênî da we, lê min xiyanet li we kir, min çi desthilat li ser we
nebûn, xêncî wê hindê ku gazî we bikem û we bersiva min da, li ber wê hindê min
tawanbar neken, xwe tawanbar biken. Ez nikarim yarmetiya we bidem, nejî hûn
dikarin yarmetiya min biden. Birastî ez nikoliyê li wê dikem ku we pêşta ez
kirbûme ´hevalê´ Xwe dê.´ Birastî eşkenceyek bijan li benda nerastkara daye,
[23] lê ewên ku bawer kirin û karên baş kirine, dê bînine naw baxçeyên ku li bin wan
da çem diherikin, dê bi destûra Xwedanê xwe ta bêdawiyê li wêderê bimînin, rewş
pirsîna wan dê ´Aştî´ bît. [24] Meger tu nabînî ku Xwe dê mînakên çawa tînîtin?
Gotinek baş weke darek başe ku rehên wê qahîmin û çiqêt wê di asiman da, [25] û bi
destûra Xwedanê xwe, hemû dema meyve berhem tînît, Xwe dê mînakên wisa bo
mirova tînît, belke bi wî awayî ew bîr bînin [26] û mînaka gotinek nebaş weka darek
nebaşe, rehên wê derketine ser erdê, çi hêz nîne ku xwe ragirît. [27] Xwe dê
qahîmiyê didete ewên ku pê gotinên qahîm bawer diken, li vê dinayê û Dawiyê da
jî Xwe dê dihêlît ku ewên nerastkar li rê derkewin, Xwe dê her tiştê ku Ev
dixwazît diket. [28] Meger te ew li berçav negirtine ku erêniya Xwe dê digel
nebaweriyê veguhertin û mirovên xwe li naw mala wêran da nîştecih kirin.
[29] Cehneme ku ew dê têda bişewtin! Mangeha wan çend cihek kotiye! [30] Ewan ku
jibo Xwe dê wekhev damezirandine ku li rêya Vî derêxin. Bêje, ´Bixwe xweş
biqetînin, çimkî birastî armanca we dê naw agir da bît.´ [31] Bêje koleyên Min ku
bawer kirîne, bila nûbêjê xwe biken û bi nehênî û aşkira biden, li ewa ku Me bo
wan dabîn kiriye, pêş ku Rojek bêt ku çi dan û sitandin û hevaletî nabît. [32] Ev
Xwe dê ye ku hemû asiman û erd afirandine, Ev ê ku av li asiman ra şandiye ku
pê wê debara berhem bînît ku xwarinê bidete we û bo we gemî bikêr kirîne ku bi
destûra Vî ser deryayê da biçin, çem jî bo we bikêr kirîne.

[33] Vî, roj û heyv bo we bikêr kirîne ku berdewamin li ser hêla xwe, Vî şev û roj jî
bo we bikêr kirîne [34] û her tiştên ku we daxwaza wan li Vî kirîne dayne we. Eger
we xwastiba ku erêniyên Xwe dê bihejmêrin, we dê çi cara nekarîba ewan
bihejmêrin, birastî mirov bêdad û nankorin. [35] Dema ku Ibrahîm got, ´Xwedan,
ew gundî ewleh bike! Min û zarûkên min li putperestiyê biparêze, [36] Xwedan,
birastî ewan gelek li naw mirova da li rê derêxistine! Her kesek ku peyreviyê li min
biket digel mine, lê ewên ku peyrevî yê li min naken birastî, Tu Lêbihorî û
Rehmê didey. [37] Xwedanê me, min hindek li paşketiyên[a] xwe li geliyê neçandî da
cihgîr kirîne, nêzîk mala Te ya pîroz, Xwedan, belke li ber hindê ew nûbêjê biken.
Dilê mirova bizvrîne bo aliyê wan û debarê bide wan, belke li ber hindê ew
sipasdar bin. [38] Xwedanê me, birastî Tu dizanî ku em çi diveşêrin û çi aşkira
diken, hîç tiştek li ser erdê yanjî di esman da li Xwe dê weşartî nîne. [39] Pesn bo
Xwe dê bît, Ev ê ku di temenê pîriyê da, Ismaîl û Ishaq dayne min, birastî
Xwedanê min, pariyana dibhêt! [40] Xwedanê min, min bike damezrênerê nûbêja û
pariyanê min û paşketiyên min bipejirîne. Xwedanê me, daxwazên min bipejirîne.
[41] Xwedanê me, di Roja Hisabê da, li min û dayk û babê min û bawermenda xweş
be.´
[42] Hizir neken ku Xwe dê li ewa ku nebawer diken bê-agahe, Ev tenê derfetê
didete wan ta Rojekê ku çavê wan zil dibin. [43] Jibo pêşve direwin, serê xwe bilind
kirîne, çavê wan nazvrît ku ewan bibînît û dilê wan wala ye.
[44] Agahdariyê bide mirova li ew Roja ku dê siza bête ser wan, paşê ewên ku
nerastî kirin dê bêjin, ´Xwedanê me kêmekê dîke, zêde dem bide me, em dê
bersiva banga Te biden û peyrevî li peyambera biken.´ Meger we pêşta sûnd
nexwaribû ku hûn dê bêdawî bin? [45] Hûn li naw avahiyên ewan da jiyan ku nerastî
li xwe kiribûn û bo we zelal bibû ku Me çi rabûn û rûniştinek digel ewan da kirbû
û Me bo we mînak jî înan! [46] Ewan xerîtê xwe kêşabûn, lê xerîtê wan li bal
Xwe dê ye tenanet eger xerîtê wan jibo wêbû ku çiyaya wêda biben.
[47] Lewma hizir neken ku Xwe dê, dê peymana Xwe digel peyamberên Xwe
bişkînît, birastî Xwe dê bihêze û şêyana toleyê heye. [48] Roja ku dê erd bibîte erdek
dîke û hemû asiman û hemû dê derkevine pêşya Xwe dê, da Ev ê Yêkta, Evê
hemû hêz, [49] li ew Rojê da tu dê ewên tawankar bibînî ku bi zincîra pêkve hatine
girêdan, [50] cilên qîrê li ber ewan da ne û agir rûmetê wan peçavtiye.
[51] Li ber wê hindê ku Xwe dê padaş bidete her rihekê, pêka ewa ku dest xwe înaye,
birastî Xwe dê li hisab pirsînê da lezgîne.
[52] Eve ragehandineke bo mirovan, belke ew pê evê bêne agahdar kirin û belke ew
bizanin ku Ev Xwe dê yê Yêkta ye û bête bîra ewên ku têdigehin.

a: Zarûk, nevî û zarûkên wan.

### 15. Para Gundê Kevira

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Elîf Lam Ra, evane eşkereyên nivîsîna pîrozin, Xwandinek (Quranek) zelal.
[2] Belke ewên nebawer dê xweziyê bixwezin ku wan xwe radestî Xwe dê
kiriba[a]. [3] Li ber wê hindê, bihêle bila ew bixwen û bixwe xweş biqetînin.
Bihêle bila bi hêvî ewan li rê derêxin, ew dê bizanin. [4] Me çi gund wêran
nekirbûn ku ewan ragehandineke aşkira çinebû [5] Çi netewe nikarin dema xwe
ya dîhar kirî pêşve biden, nejî paşve biden. [6] Ew dibêjin´Ewê ku ev bîranîne
jiboy te hatiye şandin, birastî Tu cin girtî. [7] Çima tu bo me firişta naynî, eger
tu rastiyê dibêjî?´ [8] Em tenê bo cihbicih kirina dadweriyê firişta dişînine xarê
û derfet bi ewan nayête dan. [9] Birastî Me bîranîn şande xarê û birastî Em dê
evê biparêzin. [10] Bêguman pêş te da jî Me bo naw civakên ciyawazên berê da
şandibû, [11] lê ewan tiranê xwe bi hemû ew peyamberên ku hatine bal wan
kirin, [12] bi wê rêbazê, Em dihêlin bikewîte dilê tawankara da. [13] Ew bawerî pê
naken, ewe heman ewe ku bo mirovên pêşta rû dabû [14] û tenanet eger Me bo
wan dergehek di esman da vekirba ku li wêderê da biçine serê, [15] hêşta jî ew
dê bêjin, ´Çavên me xeyala dibînin, em ew mirovin ku hatine cadû kirin.´
[16] Me, komstêr danayne asiman da û jibo ewên ku lê dinhêrin Me
xemilandine [17] û Me ew li hemû şeytanên der kirî parastiye [18] ewê xwe ber
wedet û guhê xwe bidetê, dê bi guriyekê[b] ku bi zelalî dîhare bête şopandin.
[19] Û Me erd belav kiriye û çiyayên qahîm danayne ser da û Me wisa lê kiriye
ku hemû tişt bi hevsengî li ser da şîn bin. [20] Me di wê da bo we xwarin dabîn
kiriye û bo ewên ku hûn bo wan dabîn naken. [21] Çi tiştek çinîne ku himbana[c]
wê bal Me nebît. Em tenê pêka pîvanên pêvîst dişînine xarê, [22] Em baya
dişînin ku avas biken û Em bo we li asiman ra avê dişînine xarê û li wê
vexwarinê didene we, cihê hilgirtina wê, li destê we da nîne. [23] Birastî Em in,
ku jiyanê diden û dibine hokarê mirinê, Emin mîratgir. [24] Me ewên pêş we
da, li naw we da, nas dikirin û ewên ku dê paşê jî bên nas kirîne. [25] Birastî Ev
xwedanê teye ku dê ewan kom kete ser hevdu da, birastî Ev dadwereke ku
dizanît. [26] Her wisa, Me mirov li heriya kelpûça ya hişik bûyî ku zingên lê
dihat, berhem hatî li heriya reş afirand [27] Me, pêşta Cin li agirê bayê ku
dişewitand afirandbûn. [28] Dema ku Xwedanê we gote firişta, birastî ´Ez dê
bimirekê li heriya hişik bûyî ya kelpûça, berhem hatî li heriya reş bi-afrînim.
[29] Dema ku Min ew dahîna û Min riha Xwe pif kire wî da, çokê xwe li ber wî
danên û serê xwe binvînin[d]´



a: Xwezî xwastiban ku ew jî Mosliman ban.
b: Pê guriyeke agir li asiman
c: Mak, Embar, Xizîne.
d: Di zimanê erebî da dibêjine ew kar sujde, Xwe dê dibejîte firişta sujde bo A Dem biben.

[30] Û hemû firişta çokê xwe danan û serê xwe nivandin. [31] Lê Iblîs nepejirand
digel ewan da bît ku çokê xwe danêt û serê xwe binvînît. [32] Ev got ´Iblîs te
xêre, tu digel ewan da nînî ku çokên xwe danan û serê xwe nivandin?´ [33] Wî
got, ´Ez li ber bimirekê ku Te li heriya kelpûça ya hişik bûyî ku zingên lê têt,
berhem hatî li heriya reş afirandiye çokê xwe nadanêm û serê xwe nanvînim.´
[34] Ev got ´Bes lêreda derkeve, birastî tu derkirî,´ [35] Birastî ta Roja padaşê dê
nerênî li ser te bît ´ [36] Wî got, ´Xwedanê min, ta Roja ew dê bêne vejandin
derfetê bide min.´ [37] Ev got, ´Birastî tu yêk li wanî ku te derfet heye, [38] ´Ta
Roja ku dema wê hatiy zanîn.´ [39] Wî got ´Xwedanê min, çimkî Te, ez
lêbandim, ez dê ewa li ser erdê bo ewan bixemlînim û hemûya bilêbînim,
[40] xêncî ew koleyên Te yên hilbijartî.´ [41] Vî got ´Eve Rêya bo bal Mine, raste,
[42] birastî te dê çi desthilat li ser koleyên Min da nabît, xêncî li ser ewên ku li
rê der dikevin û te dişopînin. [43] Birastî cehnem ciheke ku belêniya wê bi wan
hemûya hatiye dan, [44] ewê heft derî hene, bo pişka her deriyekê jî hindek
hatine terxan kirin. [45] Birastî ewên hişyarê Vî dê li naw baxçe û kanî ava da
bin.[46] ´Herne naw da bi aştî û tenahî!´ [47] Û Em dê hemû taliyekê li singê wan
da wêda biben, bira ne, li ser texta rû bi rûyê hevdû. [48] Ew li wêderê da
mandî nabin nejî dê li wêderê da bêne der kirin.´ [49] Koleyên Min agahdar
bike ku Ez Lêbihorim, Rehmê didem, [50] Lê eşkenceya Min eşkenceyeke gelek
dijware. [51] Sebaret bi mêvanê Ibrahîm ewan agahdar bike, [52] dema ku ew li
wî hatine jorda û gotinê ,´Aştî´ wî got,´Birastî em li we ditirsin.´
[53] Ewan got ´Netirsin, birastî Em mizgîniya kurekê zana bo we tînin.´
[54] Wî got, ´Hûn dê mizgîniyê bidene min, herçend ku pîrî hatiye ser min?
Ewe çi cûre mizgîniyeke?´ [55] Ewan got, ´Me mizgîniyeke rast daye te, li ber
wê hindê nebe yêk li ew kesa ku bêhêvî ne.´ [56] Wî got, ´Kê li rehma Xwedanê
xwe bêhêvî dibît xêncî ewên ku li rê derketine?´
[57] Wî got, ´Peyamberino, erkê we çiye ?´ [58] Ewan got, ´Birastî em jiboy
neteweyeke tawankar hatine şandin.´ [59] Xêncî binemala Lat, birastî Em dê
ewan hemûya rizgar ken, [60] xêncî jina wî Me ferman daye ku ew dê yêk li
wan bît ku dê li paşve bimînît. [61] Dema ku peyamber hatine mala Lat da,
[62] Wî got, ´Birastî hûn mirovên bîhanî ne.´ [63] Ewan got, ´Em pê eva ku wan li
ser da gengeşe dikirin hatine bal te, [64] Em pê dadweriyê hatine bal te. Em
rastiyê dibêjin, [65] lewma digel binemala xwe di tarîtiya şevê da lêre bicih
bihêle û li dû ewan da here. Nehêle hîç yêk li we zêndete pişt xwe. Here ew
cihê ku ferman li te tête kirin.´ [66] Me, ev fermane gehande wî, reha ewên dîke
jî dê bo sibê zû bête birîn. [67] Û mirovên bajêr bi şadî hatine wêderê, [68] wî got
´Birastî ewane mêvanê minin, lewma şermê neynine rûyê min. [69] Hişyarê
Xwe dê bin û min xemgîn neken.´ [70] Ewan got, ´Meger me mirov li te qedexe
nekirîne?´

71 Wî got, ´Ewane Kiçên minin, eger hûn dibya biken.´ 72 Bi jiyana te, ew di
serxweşiya xwe da kore digeriyan, 73 lewma dema rojhelatê da qêrînê ser wan
da girt, 74 Me ew ser û bin kir û barandek li kevirên heriya hişik li ser ewan da
barand. 75 Birastî lêreda nîşane hene bo ewên ku têdigehin. 76 Birastî ew li ser
rêya serekî ne, 77 birastî lêreda nîşaneyek heye bo ewên ku bawer diken. 78 Ew
hevrêyên naw daristan da jî, nerastkar bûn 79 û Me tole li wan wekir, birastî
her du li ser rêya serekî ne. 80 Her wisa hevrêyên naw Kevira da jî, nikolî li
peyamberê xwe kirin, 81 Me nîşaneyên Xwe dane wan, lê ewan pişta xwe
danê da. 82 Ewan bixwe li çiya da mal dikolan û hest bi tenahiyê dikirin
83 lê di sibeyek zû da qêrînê ser ewan da girt. 84 Ewa ku wan dest xwe êxistibû
bo wan kêrî çi nehat. 85 Me, ne-afirandine hemû asiman û erd û hemû tiştên
li nawbera ewan da, xêncî dadweriyê, bêguman dê demjimêr bêt, li ber wê
hindê bi lêbihorîn û mêhrevanî li wan xweş be. 86 Birastî Xwedanê te,
afrînerê Zana ye. 87 Me, heft li evên ku gelek cara têne dupat kirin dayne te û
Xwandina (Qurana) Bihêz. 88 Çavên xwe li ev tişta negêre ku Me dayne
hindek li wan ku pê xweş biqetînin. Ber xatra wan xemgîn nebe, lê baskên
xwe li ser bawermenda ra şor ke 89 û bêje, ´Birastî ez bi aşkira agahdariyê
didem,´ 90 Her wek eva ku Me bo ewên xwe li ser aliya da, dabeş kiribûn
şande xarê 91 ewên ku Xwandin (Quran) li ser pişka da dabeş kirbûn
92 bi Xwedanê te, Em dê lêpirsînê li hemûya biken 93 sebaret bi ewa ku wan
dikir. 94 Li ber wê hindê, ev fermana li te hatiye kirin aşkira rabigehîne û pişta
xwe bide putperesta[a]. 95 Em têra te hene, li dijî ewên ku tirana diken, 96 ewên
ku xwedêyek dîke li tenişt Xwe dê da, dadmezrînin, ew dê bizanin. 97 Em
berê da dizanin ku singê te girtiye liber ewa ku ew dibêjin. 98 Bi pesna
Xwedanê xwe paye bilind bike û li naw ewan da be ku çokê xwe dadiden û
serê xwe dinvînin. 99 Xwedanê xwe bipereste taku bêgumanî bo te têt.



a: Ewên ku hevala jibo XWE DÊ peyda diken.

### 16. Para Mêşa Hingvînê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Destûra Xwe dê têtin, lewma jiboy vê bêhn çik nebin. Ev paye bilinde! Ev
gelek serwey her tiştekê ye ku ew dikene ´hevalê´ Vî! 2 Ev Firişta bi fermana
riha Xwe, bo her yêk li koleyên Xwe ku Ev dixwazît dişînîte xarê ku
agahdariyê bidete wî, ´Çi xwedê dîke nînin xêncî Min, lewma hişyarê Min
be.´ 3 Vî hemû asiman û erd bo dadweriyê afirandin û Ev gelek serwey her
tiştekê ye ku hûn dikene ´hevalê´ Vî! 4 Vî mirov li dilopek avikê çêkir, hêşta
jî ew bi aşkira dijberiyê diket. 5 Vî ajelên kevî jî bo we afirandine. Hûn
germahî û berjewendiyên dîke li wan werdigrin û hûn li wan dixwen, 6 hûn
di ewan da ciwaniyê dibînin, dema hûn ewan tînine jor da û dibene derê.
7 Ew barê we dibene wan welata ku bêy dijwariyeke zor we bixwe nedikarî
bigehinê da. Birastî Xwedanê we Mêhrîvane û Rehmê didet. 8 Hespa,
hêstira û kera bo we ku hûn bo siwar û xemlê bikar bînin û Vî ew tişt
afirandine ku hûn nizanin. 9 Li ser Xwe dê ye ku rêyê nîşan bidet, li naw
ewan da hindek xarin, eger Ev xwastiba Ev dê karîba we hemûya rênivînî
biket. 10 Ev e ku bo we li asiman ra avê dişîne xarê, li wê vexwarin heye û
şînkatî ku hûn didene ajelên xwe. 11 Pê wê, Ev bo we dexil û dana, zeytûna,
darên xurmê, rezên tirî û hemû çeşne berhemên dîke jî tînît. Birastî bo ew
mirovên ku têbîniyê diken lêreda nîşaneyek heye. 12 Vî şev û roj bo we bikêr
kirin û pê destûra Xwe roj û heyv û stêrik jî bo we bikêr kirin. Birastî bo ew
mirovên ku hizra xwe bikar tînin, di evê da nîşane hene. 13 Û her tiştê bi
rengê cuda ku Vî jibo we li ser erdê zêde kirîne. Birastî bo ew mirovên ku bi
bîr tînin, di evê da nîşane hene. 14 Ev e ku bo we derya bikêr kir, hûn goştê
taze lê dixwen û cewhera lê derdixin ku bi xwe veken, hûn dibînin ku gemî
şîpelên wê dibrin, belke bi wê rêyê hûn biçin li qenciyên Vî bigerên û belke
hûn sipasdar bin. 15 Vî çiyayên qahîm danane ser erdê ku nehêlît digel we
da biguherît û çem û rê, belke bi wî awayî hûn bêne rênivînî kirin 16 û
nîşaneyên ser erdê û sitêrka ku pê têne rênivînî kirin.
17 Meger Ev ê ku diafrînît wekheve digel ewê ku na afrînît? Çima bîra we da
namînît? 18 Eger we xwastiba erêniyên Xwe dê bihejmêrin we dê nekarîba
ewan bihejmêrin, birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet.
19 Xwe dê dizanît hûn çi diweşêrin û hûn çi aşkira diken. 20 Ewên ku ew li
kêleka Xwe dê, da bangî ewan diken, çi tişta na-afrînin, ew hatine afirandin.
21 Ew mirî ne, ew najîn û ew tênagehin ku dê kengê bêne vejandin.
22 Xwe dê te tenê Xwe dê yeke. Lê ewên ku bawerî bi Dawiyê naken dilê
wan napejirîne û ew qude ne.



*Di zimanê Erebî da, peyva mêşa hingivînê mê ye. Niha em dizanin ku tenê mêşa mê hingivînê çêdiket. Her wisa di ev eşkereyê da dibêjît mêşa hingivînê du zik hene, niha em dizanin ku mêşa hingivînê du zik hene!

[23] Çi guman têda nîne Xwe dê dizanît ku ew çi diweşêrin û çi aşkira diken.
Birastî Ev hez li qude ya naket. [24] Dema ku dibêjine wan, ´Xwedanê we çi
şandiye xarê?´ Ew dibêjin, ´Efsaneyên ewên pêşta ne.´ [25] Di Roja Vejiyanê
da, ew dê hemû giraniya barê xwe hilgirin, her wisa li barê ewên ku wan bi
nezanî li rê derêxistin. Bêguman ewa ku ew hildigirn nebaşe!
[26] Ewên ku pêş ewan da çon jî, her wisa bername rêjî kiri bûn, lê Xwe dê
hêriş kire ser binêşeya ewa ku wan çêkirbû lewma ban li ser ewan da kete
xarê, li aliyekê da siza hate ser wan da ku ew tênedgeheştin. [27] Paşê, li Roja
Vejiyanê da, Ev dê wan serşor biket û bêjît, ´Kîvene ew ´hevalên´ Min,
ewên ku we bikar tînan ku dijayetiyê biken? Ewên ku zanist bi wan hatiye
dan dê bêjin, ´Birastî îro serşorî û nebaşî li ser nebawera ye!´ [28] Ewên ku
Firişte li mirinê da ewan diben ku nerastiyê li xwe diken, dê bixwazin xwe
radest biken ´Me çi nebaşî nedikir.´ ´Belê, birastî we dikir, Xwe dê dizanît
we çi dikir, [29] li ber wê hindê, li dergehên cehnemê da herne jor ku ta
bêdawiyê li wêderê da bimînin, mangeha ewên qude çend kotiye.´ [30] Dê
bêjine ewên ku hişyarê Vî bûn, ´Xwedanê we çi şande xarê?´ Ew dê bêjin,
´Başî.´ Bêhtire bo ewên ku li jiyana ev dinyayê da başiyê diken û mala baş
di Dawiyê da bêhtire, çend erêniye mala ewên ku hişyarê Vî ne. [31] Ta
bêdawiyê ew dê biçine naw baxçeya ku li naw ewan da çem diherikin.
Wêderê da, dê ewan hemû tiştekê ku dixwazin hebît. Bi wê rêbazê Xwe dê
padaş didete ewên ku hişyarê Vî ne, [32] ewên pak ku Firişte di mirinê da
ewan diben. Dê bêjine wan, ´Aştî li ser we bît. Werne naw baxçe da, liber
ewa ku we kiriye.´ [33] Meger ew çavnihêrin xêncî wê ku Firişte bêne bal wan
yanjî destûra Xwedanê we? Ewên ku pêş ewan da çon jî, her wisa kirin.
Xwe dê nerastî li wan nekir lê ewan nerastî li xwe kirbû. [34] Li ber wê hindê,
ew nebaşiya ku ewan kirbû, li wan dabû û ew tişta ku ewan tirane pê kirbû,
doralî li wan girtibû. [35] Ewên ku ewên dîke kirbûne ´hevalê´ Xwe dê dibêjin,
´Eger Xwe dê xwastiba, xêncî Vî me dê koletiya çi tiştê dîke nedikir, ne me
nejî berebabên me. Bêy Vî me dê hîç tiştek qedexe nekirba.´ Ewên pêş wan
da jî heman ew tişt gotin. Meger li ser peyambera ye, xêncî ragehandina
zelal? [36] Me jibo her neteweyekê peyamberek şand ku ´Koletiya Xwe dê
biken û xwedêyên direw li xwe dûr biken.´ Li naw ewan da hindek hebûn
ku Xwe dê rênivînî kirbûn û li naw ewan da, bi maf li ser wan hindek dîke
rê wenda kirin. Li ber wê hindê, li ser erdê da bigerê û dawiya ewên ku
nikolî kirbûn bibîne. [37] Her çend ku tu dixwazî ewan rênivînî bikey, birastî
Xwe dê ewan rênivînî naket ku li rê derdêxît, ewan çi yarmetîder jî çinabin.

38 Ew bi Xwe dê sûnd dixwen, bi sûnda xwe ya herî bihêz ku Xwe dê ewê
mirî navejînît. Lê, eve belêniya dadweriyê ye li ser Vî, herçend ku piraniya
mirova nizanin. 39 Ev dê bo wan zelal biket, ewa ku wan li ser da ciyawazî
hebûn, li ber hindê belke ewên nebawer bizanin ku ew direwîn bûn.
40 Birastî dema ku Em bixwazin tiştek bibît, Em tenê peyva´Bibe´ dibêjin û
ew heye. 41 Ewên ku bo Xwe dê koç kirine, piştî ku nerastî li wan hatiye
kirin, birastî li ev dinyayê da Em dê ewan li ciheke baş nîştecih biken, lê
padaşa Dawiyê dê gelek mezintir bît, tenê eger ewan zanîba. 42 Ewane li
wanin ku bêhn ferehn û xwe sipartine Xwedanê xwe. 43 Me pêş te da bes
mêr şandin ku Me sirûş dabûye wan, lewma li mirovên peyamê bipirse, eger
tu nizanî. 44 Me, ew bi nîşaneyên zelal û destûrên nivîsî şandin. Me bo te jî
peyam şandiye xarê, bi wî awayî tu jî bo mirova zelal bikey ku çi bo wan
hatiye şandin, belke li ber wê hindê ew têbîniyê biken. 45 Meger ewên ku
xerîteyên nebaş dikêşin gelek arxaînin ku Xwe dê wisa li erdê naket ku
ewan qurt ket yanjî siza li cihekê ra nayête ser wan ku ew tênagehin, 46 yanjî
Ev li nawbera hat û çona da nişkida ewan nagirît û ew nikarin birewin?
47 Yanjî Ev hêdî ewan nagrît? Lê birastî Xwedanê we gelek Dilovane û
Rehmê didet. 48 Meger ew li berçav nagirin, ew tiştên ku Xwe dê afirandine,
çawa sîbera wan dibzivît bo rast û çepê û bi ûstî xarî çok dadiden û serê xwe
li ber Xwe dê dinvînin? 49 Hemû tiştek di asimana û erdê da çok didanêt û
serê xwe li ber Xwe dê dinvînît, rihtiberên ku dibzivin û Firişte jî ew qude
nînin, 50 ew li Xwedanê hinda serê Xwe ditirsiyên û ew, wisa diken weka ku
destûr bi wan tête dan. 51 Xwe dê got ´Du xwedê ya vernegrin, çimkî Ev
tenê Xwe dê yê Yêkta ye, Ez tenê, Xwe dê Yektame, lewma tenê li Min
bitirsin.´ 52 Hemû tiştê di asimana û erdê da yê Vî ye, perestîna bêpayan bo
Vî ye. Meger xêncî Xwe dê hûn dê hişyarê ewê dîke bin? 53 Her tiştek erênî
ku we heye, ew li Xwe dê we têt û dema ku karesat li we didet, jibo Vî hûn
bo yarmetiyê digiryên, 54 dema ku Ev, we li karesata we rizgar diket, binêrin
û bibînin! Hindek li we ´hevala´ bo Xwedanê xwe peyda diken. 55 Mgere ew
dê nikoliyê li eva ku Me daye wan biken? Bes xweş biqetînin, hûn dê
bizanin.´ 56 Pişkek li ewa ku Me jibo wan dabîn kiriye bo ewên ku wan çi
zanistek li ser da nîne destnîşan diken. Bo xatira Xwe dê! Bêguman dê
sebaret bi dahênanên we lêpirsîn li we bête kirin. 57 Ew bo Xwe dê kiça
destnîşan diken, Paye bilindî ya Vî ye! Û jibo ewane, ewa ku ew dixwazin.
58 Dema ku mizgîniya li dayîk bûna kiçekê didene yêk li wan, rûmetê wî
tarî dibît û ew tejî kol û xem dibît.

[59] Li ber ew mizgîniya nexweş ku daynê, ew xwe li mirovên xwe diveşêrît.
Dibya ew, bi serşorî wê xwedan ket yanjî wê li naw tozê da çal ket?
Bêguman ew biryara wan nebaşe! [60] Mînakek nebaş heye bo ewên ku
bawerî bi Dawiyê naken, mînaka herî bilind ya Xwe dê ye, Ev Bihêze
Biryardere. [61] Eger Xwe dê ber xatira kiryarên wan, mirov tawanbar
kiriban, Ev nedihêla tenê rihtiberek li ser da bibzivît, lê Ev ta demek dîhar
kirî derfetê didete wan, gava ku dema wan têt, ew nikarin bo demjimêrekê
jî paşve bimînin, nejî ew dikarin pêş bêxin. [62] Ew, wê jibo Xwe dê destnîşan
diken ku bixwe hez lê naken, dema ku zimanê wan bixwe direwê diket ku
ewa bêhtr bo ewane. Bêguman ewan dê agir hebît û ew dê bêxwedan bêne
hêlan. [63] Bi Xwe dê, Me pêş te da jî, bo neteweyên pêş te da şand, lê Şeytan
kiryarên wan li pêş çavên wan xemilandin, îro ew piştîvanê wane û sizayek
bijan çavnihêrê ewane. [64] Me tenê bo te nivîsîna pîroz şandiye xarê ku bo
wan zelal bikey ewa ku wan li ser da ciyawazî heye û weke rênivînî û rehm
bo ew netewa ku bawer diket. [65] Ev Xwe dê ye ku avê li asiman ra dişîne
xarê û pê wê, erdê vedijîne, piştî mirina wê. Birastî li evê da nîşaneyek heye,
bo ew mirovên ku guhdarî diken. [66] Birastî jibo we li ajelên kevî da jî,
waneyek heye, Em vexwarinekê li naveroka ewa di zikê wan daye didene
we. Di navbera rêx û xwînê da, şîrê pake, şirîne bo ewên ku divexwen. [67] Li
berhemên dara xurmê û tirî, hûn serxweşker û xwarinê baş verdigrin.
Birastî li evê da nîşaneyek heye bo ew netewa ku hizra xwe bikar tînît. [68] Û
Xwedanê we sirûş da mêşa hingvînê,´Bixwe di çiya da mala çêken û di dara
û ewa ku ew ava diken. [69] Paşê li hemû çeşne berhema[a] bixwen û ew rêyên
ku Xwedanê we, jibo we dîhar kirîne bişopînin.´ Li zikên wan ra
vexwarinek bi rengên cuda têt ku bo mirova di ewan da derman heye.
Birastî li evê da nîşaneyek heye bo ew mirovên ku têbîniyê diken. [70] Ev,
Xwe dê ye ku hûn afirandine û paşê dê pê mirinê we bibet, li naw we da ew
dê hebît ku li temenê pîriyê da bi ketinek gelek dijwar dê bête şepirze kirin,
lewma piştî zanistê, ew dê hîç tiştekê nezanît, birastî Xwe dê Zanist û Hêze.
[71] Ev, Xwe dê ye ku pê debara li ser hindeka ra qencî li ewên dîke kiriye. Lê
ewên ku qencî bi wan hatiye kirin, naxwazin ku debara xwa bidene ewên ku
bi destê rastê yê wanin, ku ew jî li wê da bibine weke wan. Meger ew
qenciya Xwe dê napejrînin? [72] Û Ev, Xwe dê ye ku li we bixwe hevjîn
dayne we û li hevjînên we jî Vî zarûk û nevî dayne we û tiştên baş bo we
dabîn kirîne. Ew çawa dikarin bawerî bi direwê biken û bawerî bi erêniya
Xwe dê neken? [73] Û li kêleka Xwe dê da koletiya ewê biken ku çi hêz nîne
li asimana û li erdê ra tişta bo wan dabîn biket û ew nikarin çi biken.



a: Min peyva ´semere´ vergêraye Berhem. Hindek vergêra bi meyve wergêrane.

74 Lewma çi mînaka bo Xwe dê çêneken Xwe dê dizanît û hûn nizanin·
75 Xwe dê ew mînakê pêşkêş diket, koleyekê ku xwedan heye û nikarît çi
biket û ewê ku Em li debarên Xwe baş debara didene wî, lewma ew bi
nihênî û aşkira didet. Meger ew dê bikarin wekhev bin? Hemû pesn bo
Xwe dê ye lê piraniya wan nizanin. 76 Xwe dê mînakek dîke pêşkêş diket; du
mêr, yêk li wan şête û nikare hîç tiştekê biket, ew bo serwerê xwe bare, bo
her aliyekê ku ew raste rê tête kirin, ew çi tiştek baş bi dest naynît, meger
dibît ku ew wekhev bête berçavgirtin digel ewê ku fermana dadperweriyê
diket û ew li ser rêya raste? 77 Hemû ewa weşartî di asimana û erdê da ya
Xwe dê ye. Hatina demjimêra sizayê weka miqîna çave, yanjî nêzîktire,
Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye. 78 Ev Xwe dê ye ku hûn li zikê
dayka we da înabûne der, bêy ku çi bizanin. Ev bihîstin, dîtin û hiş da we,
belke li ber hindê hûn sipasdar bin. 79 Meger ew balinda nabînin ku pê
hewa li asiman da hatine firandin? Xêncî Xwe dê çi tiştek dîke ewan
ranagrît. Birastî li evê da nîşane hene bo ew netewa ku bawer diket.
80 Ev, Xwe dê ye ku jibo we li mala we, cihê bêhin wedanê çêkiriye û li
kewilê ajelên kevî bo we kon çêkirine ku siwikin, bo roja hûn diçine geryanê
û bo roja hûn nîştecih dibin, bo demekê li hirî, kewil û mûyê wan rawêx û
xweşî heye. 81 Ev, Xwe dê ye ku li ewa Vî afirandiye, bo we sîber çêkiriye û
bo we li çiyaya da cihên penah gehê çêkiriye, bo we cilên ku we li germê
biparêzin çêkirîne û cilên ku we li şer da jî biparêzin. Pê ew rêbazê, Ev
erêniya Xwe li ser we da bêkêmasî diket, belke li ber hindê hûn xwe radestî
Vî biken. 82 Lê eger ew piştа xwe bidenê, tenê li ser teye ku bi zelalî
rabigehînî. 83 Ew erêniyên Xwe dê nas diken, lê paşê ew nikolî[a] lê diken û
piraniyê wan bawer naken. 84 Ew Roja ku Em dê li her neteweyekê
gewahekê vejînin, paşê derfet bi ewên nebawer nayête dan, nejî dê li wan
bête pirsîn ku serastkariyê biken. 85 Dema ewên ku nerastî kirîne sizayê
dibînin, ew bo wan nayête kêm kirin, nejî dê çi derfet bi wan bêne dan.
86 Dema ewên ku ´heval´ bo Xwe dê peyda dikirin, ´´Hevalê´´xwe dibînin
ew dê bêjin, ´Xwedanê me, ewane hevalên me ne ku em li kêleka Te da li
ber ewan dipariyan,´ Lê ´´heval´´ dê bêjin, ´Birastî hûn direwînin,´
87 Û li wê Rojê da, dê bi xwe radest kirinê pêşkêşî Xwe dê biken û ewa ku
wan berhem tîna dê li wan bezir bît. 88 Jibo ewên ku bawer nekirbûn û
rêgirî li li rêya Xwe dê kirbûn, Em dê eşkencê li ser eşkenceya wan zêde
biken, li ber xatira ew gendeliya ku ewan belav kirbû. 89 Li ew Roja ku Em
dê li her neteweyekê li naw ewan bixwe da gewahekê vejînin û Em dê te
weke gewah bo ewane bînin û Me jibo te nivîsîna pîroz şandiye xarê ku
hemû tişta zelal diket û rênivînî, rehm û mizgîniye bo ewên ku xwe radestî
Vî kirîne[b].



a: Jibo peyva înkar û haşa min peyva Nikolî bikar înaye.
b: Mosliman.

90 Xwe dê destûra dadweriyê, kiryarên baş û danê bi xizma diket û Ev
bêrewiştî, kiryarên nebaş û zordariyê qedexe diket. Ev we agahdar diket
belke bi wî awayî bîra we da bimînît. 91 Peymana Xwe dê bicih bînin piştî
ku we girê da û sûndên xwe neşkînin, piştî ku ew pejirandin, çimkî we
Xwe dê kiriye gewahê xwe, birastî Xwe dê dizanît ku hûn çi diken.
92 Nebine weka ew jina ku bendikê peyt rêstî bû diverêşînît, sûnda xwe bikar
tînin ku hevdu bixapînin, çimkî hejmara neteweyeke we li neteweyek dîke
zêdetirin. Xwe dê bi wê hindê we taqî diket û li Roja Vejiyanê da ew dê bo
we, wan tişta zelal biket ku we li ser ewan da nakokî hebûn. 93 Eger Xwe dê
xwastiba Ev dê hûn hemû kirbana neteweyek, lê Ev dihêlît, ew li rê
derkevin, her kesê ku Ev dixwazît û rênivînî diket herkesê ku Ev dixwazît.
Bêguman dê sebaret bi kiryarên te, dê lêpirsîn li te bête kirinê. 94 Sûnda xwe
bikar neynin ku hevdû bixapînin, bila çi pêyek nezelît, piştî ku bi qahîmî
hatiye cih kirin û bila hûn nexweşiyê tam neken, li ber xatira ewa ku we
rêgirî li rêya Xwe dê kiriye û we eşkenceyek gelek mezin hebît. 95 Peymana
digel Xwe dê bi bihayeke kêm nefroşin, birastî eva li bal Xwe dê bo we
bêhtire, tenê eger we zanîba. 96 Her tiştê li bal we ye dê tewaw bît, lê her
tiştê li bal Xwe dê heye bêpayane û bêguman Em dê pêka bêhtrîn kiryarên
wan padaş bidene ewên ku bêhn ferehn. 97 Jibo her kesê, nêr ya mê ku
karên baş diket û bawer diket, bêguman Em dê jiyanekê baş bidenê da û
Em dê pêka bêhtrîn kiryarên ewan padaş bidene wan. 98 Lewma, dema ku
tu Xwandinê (Quranê) dixwînî, penahê li Xwe dê bixwaze li dijî Şeytanê
der kirî. 99 Birastî ew çi desthilat, li ser ewên ku bawer kirîne û xwe sipartine
Xwedanê xwe nîne 100 desthilata wî tenê li ser ewane ku xwe dikene
hevpeymanê wî û ewên ku ´hevala´ bo Vî peyda diken. 101 Dema ku Em,
cihê eşkereyekê digel eşkereyek dîke vedguherin û Xwe dê baş dizanît ku Ev
çi dişînîte xarê, ew dibêjin, ´Tu tenê berhem tînî,´ Lê piraniya wan nizanin.
102 Bêje ku Riha Pîroz bi rastiyê, li bal Xwedanê we ra înaye xarê ku ewên
bawer diken bihêz biket û weke rênivînî û mizgînî bo ewên xwe radestê Vî
kirîne.103 Bêguman Em dizanin ku ew çi dibêjin, ´Ew bimireke[a] ku wî fêr
diket,´Lê zimanê ew kesê ku bas lê diken bîhaniye, lê zimanê evê erebiyek
zelale.104 Birastî ewên ku bawerî bi eşkereyên Xwe dê naken Xwe dê ewan
rênivînî naket û eşkenceyek bijan li benda wane. 105 Ew tenê direwa berhem
tînin, ewên ku bawerî bi eşkereyên Xwe dê nînin û ewin ku direwînin.



a: Peyva beşer hem bi mirov hatiye wergêran hem jî bimir. (ewê ku dê rojekê bimre)

106 Ewên ku bawerî bi Xwe dê naken piştî ku bawerî pê kirbûn, xêncî ewên
ku zext li wan hatiye kirin, herçend ku dilê wan di baweriyê da qahîm
dimînît, lê ewên ku singê xwe vedikene nebaweriyê, ewan dê kerbê
Xwe dê li ser xwe hebît û sizayek gelek mezin li benda ewane. 107 Çimkî ew
zêdetir hez li jiyana ev dinyayê diken ta Dawiyê û Xwe dê mirovên nebawer
rênivînî naket. 108 Ewane, ewin ku Xwe dê dil, bihîstin û dîtina wan girê
dane û ew bê agahin 109 û çi guman têda nîne ku di Dawiyê da, ew dê
bidorînin. 110 Paşê birastî bo ewên ku malên xwe bicih dihêlin, piştî ku
hatine tepeser kirin, paşê ew berxwe diden û bêhn fereh dimînin, birastî
piştî wê Xwedanê we, Lêbihore û Rehmê didet . 111 Di ew Roja ku her
rihek, dê bixwe bipariyêt û bi her rihekê, ber xatra kiryarên wan, dê bi
tewawî bête dan û nerastî li wan nayête kirin. 112 Xwe dê mînaka gundekê
pêşkêş diket ku di tenahiyê da parastî bû, bi firavanî, li hemû ciha ra debar
dihatine naw da. Paşê nikolî li erêniya Xwe dê kirin. Li ber wê hindê,
Xwe dê bi kolp û xela û tirsê lêda, li ber xatra ewa ku wan dikir.
113 Bêguman peyamberek ku yêk li wan bû hate bal wan, lê ewan gote wî
direwîn. Li ber wê hindê, sizayê li ser ewan da dagirt, di dema ku wan
nerastî dikir. 114 Lewma li ewa baş û qanûnî li wan tişta bixwen ku Xwe dê
bo we dabîn kirîne û sipasdarê erêniya Xwe dê bin. Eger Ev tenê ye ku hûn
diperestin. 115 Vî tenê ew tiştane li we qedexe kirîne, mirar, xwîn, goştê
beraz û ewa ku bi her tiştekê dîke xêncî Xwe dê hatibîte pêşkêş kirin. Lê
eger zor li her kesekê bête kirin, nek li ber dilxwazî û zêdegaviyê, Xwe dê
Lêbihore û Rehmê didet. 116 Nebêje ewa ku zimanê te bi direw dibêjît,
´Ewe qanûniye û ewe qedexe ye,´ Ku direwekê sebaret bi Xwe dê berhem
bînî, birastî ewên ku sebaret bi Xwe dê direwa berhem tînin, ew behremend
nabin, 117 ewan dê kêmek keyfxweşî hebît, lê eşkenceyek bijan li benda
wane. 118 Me li ewên Cihû qedexe kir eva ku Me pêşta gotibû te. Me nerastî
li wan nekir, lê ewan nerastî li xwe kir. 119 Paşê birastî Xwedanê we jibo
ewên ku bi nezanî tiştekê diken û paşê peşîman dibin û serastiyê diken,
birastî Xwedanê we piştî wê Lêbihore û Rehmê didet. 120 Bi rastî, Ibrahîm
neteweyek bû ku jidil we peyrevî li Xwe dê dikir û ber bi aliyê rast we diço.
Ew yêk li wan nebû ku ´heval´ bo Vî peyda dikirn, 121 sipasdarê erêniya Vî
bû û Vî ew hilbijart û rênivîniyê rêya rast kir. 122 Me di wê dinyayê da baş
da wî û birastî di Dawiyê da ew li naw dirustkara daye. 123 Paşê Me sirûş da
te ku ´Peyrevî li dînê Ibrahîm bikey ku ber bi aliyê rast we diço. Ew yêk li
wan nebû ku ´heval´ bo Vî peyda dikirn.´ 124 Tenê Şembî bo ewan hatiye
destnîşan kirin ku li serda nakokî hebûn. Birastî li Roja Vejiyanê da
Xwedanê we, dê sebaret bi nakokiyên wan, li nawebera ewan da dadweriyê
biket.

[125] Bi têgeheştin û waneyên baş gazî ewan bike bo ser rêya Xwedanê xwe. Gelek birêz digel wan da gengeşê bike, birastî Xwedanê te dizanît kanê kê li rêya Vî da derketiye û dizanît kê hatiye rênivînî kirin. [126] Eger hûn dê siza biden, sizayeke weka wê biden ku pê wê siza dabûne we, lê eger hûn bêhn fereh bin, ew bo ewên bêhn fereh bêhtire [127] û bêhin fereh be, bêhin ferehiya te, tenê li bal Xwe dê we têt. Ser xatirê wan xemgîn nebe û li ber xatira bername rêjiyên wan şepirze nebe, [128] birastî Xwe dê digel ewane ku hişyrê Vî ne û başiyê diken.

## 17. Para Rêvîngiya Şevê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Paye bilindî jiboy Vî ye ku di şevê da koleyê Xwe li mizgewta Heram ra bire
Mizgewat Eqsa, ewa ku Me doraliyê wê pîroz kiriye ku Em nîşaneyên Xwe pêşanî wî
biden, Ev Bihîstin û Dîtine. [2] Me nivîsîna pîroz dabû Mûsa jî û ev kirbûye rênivînî bo
zarûkên Israîl. ´Xêncî Min xwe nespêrine kesê, [3] paşketiyên ewanin ku Me digel
Nûh hilgirtin, birastî ew koleyek sipasdar bû.´ [4] Me di nivîsîna pîroz da bo zarûkên
Israil ragehand ´Bêguman hûn dê du cara gendeliyê li ser erdê da belav biken û
bêguman hûn dê gelek xwe mezin biken.´ [5] Dema ku yekemîn belênî hate cih Me
koleyên Xwe bi hêzek gelek mezin li dijî we şandin û ew hatine naw malên we da. Ew
belênî hate cih, [6] lê paşê Me hêla hûn li ser wan da serkevin. Me bi mal û kurên we
yarmetiya we kir û hejmarên we zêde kirin. [7] Eger hûn başiyê biken, hûn başiyê bixwe
diken, eger hûn nebaşiyê biken ew jibo we bixwe ye, paşê dema ku belêniya dawî hate
cih, xemgînî înane rûyê we û çone naw mizgewtê da, her wek ku ew cara yêkê çobûne
naw da û her tiştê ku kete ber hêza wan bi tewawî wêran kirin.
[8] Çavnihêrî têtê kirin ku Xwedanê we rehm li ser we da hebît, lê eger hûn bizvrin Em
jî dê bizvrinê, jiboy nebawera Me cehnem kiriye doşega zîndanê. [9] Birastî ev
Xwandine (Qurane) rênivînî diket jibo ewa herî jêhatî û mizgîniyê didete
bawermenda, ewên ku karên durust diken, ewan dê padaşek mezin hebît [10] û hişyariyê
didete ewên ku bawerî bi Dawiyê naken, Me eşkenceyek bijan jibo wan amade kiriye.
[11] Hêşta jî mirov bo nebaşiyê dipariyên, her wek ku ew bo başiyê dipariyên, mirov
gelek bi lezin. [12] Me şev û roj kirine du nîşane û paşê nîşana şevê malî û roj kire nîşane
jibo dîtinê ku hûn li qenciyên Xwedanê xwe bigerên ku hûn bizanin sala bihêjmêrin û
hisab biken. Me hemû tiştek bi hûrî şirove kiriye. [13] Me çarenûsa her mirovekê
havêtiye ûstê wî da. Di Roja Vejiyanê da Em dê tomarekê bo wi bînine derê ku dê
bibînît bête vekirin, [14] ´Tomara xwe bixwîne. Îro, riha te bixwe têrê heye ku hisaba te
biket.´ [15] Her kesê ku hatiye rênivînî kirin, ew tenê bo riha xwe hatiye rênivînî kirin û
her kesê ku li rê derkevît, ew tenê li dijî wê li rê derdikevît. Hîç bar hilgirek barê yêke
dîke hilnagrît, nejî Em siza diden, taku Em peyamberekê neşînin.
[16] Dema ku Em dixwazin gundekê wêran biken, Em destûrê didene ewên dewlemend
lê ew bi pêdagrî serkêşiya wê diken. Lewma gotin têtê cih û Em wê bi wêraniyê, wêran
diken. [17] Me çend nifiş li nav birîne piştî Nûh! Weke Agahdar û Bîner Xwedanê we
sebaret bi gunehên koleyên Xwe têrê heye. [18] Her kesê ku daxwaza ewa demûdest
biket, Em jibo wi dilezînin li ewa ku Em dixwazin, jibo her kesê ku Em hez diken, paşê
Me jiboy wî cehnem amade kiriye ku têda bişewtît, bi serşorî û der kirî.
[19] Her kesê ku daxwaza Dawiyê biket û bo aliyê wê xebatê biket, wek ku dibya ew
xebatê biket û bawermend bît, dê sipasiya xebata wan bête kirin.

[20] Em xelatê Xwedanê te dirêj aliyê her kesê diken, ewane û ewan jî. Xelatê Xwedanê
te sînordar nînin. [21] Lêbinêre ku Me çawa li serwey hindeka qencî li ewên dîke kiriye,
lê pileyên di Dawiyê da gelek mezintrin û qenciyên wê gelek mezintrin.
[22] Çi xwedêyên dîke nedanêne kêleka Xwe dê da bila hûn serşor û bêxwedan nebin.
[23] Xwedanê we ferman daye ku hûn nabît koleyê ewên dîke bin bes Ev nebît û digel
dayk û babên xwe baş bin. Eger yêk yanjî her du digel te bigehine temenê pîriyê, Paşê
nebêje ewan of jî, ewan nekene derê û bi gotinên giran buha digel wan bipeyvin [24] û bi
rehmê baskên xwe yên ûstî xariyê li ser ewan da şor ken û bêjin, ´Xwe dê, rehmê bi
wan bike, her wek ku ewan ez mezin kirim, dema ez biçûk bûm.´ [25] Xwedanê we
dizanît ku di riha we da çi heye. Eger hûn dirustkar bin, Ev bêpayan lêbihore bo ewên
ku gelek cara dizvirine bal Vî. [26] Mafê xizma bidenê da û ewên hejar û rêviya jî û bi
heder dan xerc neken, [27] ewên ku heder diden, birayê Şeytani ne û Şeytan jibo
Xwedanê xwe nankore bûye. [28] Lê eger tu pişta xwe bideye ewên ku hêviya rehma
Xwedanê te ne, ewa ku tu jî çavnihêriyê dikey, bes bi gotinek nerm digel wan bipeyve.
[29] Destê xwe bi qirka xwe we zincîr neken, nejî destê xwe hemûyê dirêj biken ku hûn
bêne tawanbar kirin û bê diraf bimînin. [30] Birastî Xwedanê we bi firavanî didete her
kesê ku Ev dixwazît û bi kêmî jî, birastî Ev Agahdar ê koleyên Xwe ye û ewan Dibînît.
[31] Li tirsê hejariyê da zarûkên xwe nekojin, Em dê bo wan jî dabîn biken, bo we jî,
birastî kuştina wan gunehek gelek mezine. [32] Û bi hîç şêweyekê li gana qedexe[a] nêzîk
nebin, birastî ew bêrewiştiye û rêyek nebaşe. [33] Rihê nekujin[b], ewa ku Xwe dê qedexe
kiriye, bes bi mafdarî nebît, eger kesek bi bêdadî hatiye kuştin Me desthilat daye
mîratgirên wî, lê nabît ew li kuştinê da sînora bibezînin, birastî yarmetiya wî hatiye
kirin.
[34] Nêzîkî malê sêwiya nebin, meger bi bêhtrîn rêbazê bît, taku ew pêdigehin û belêniya
xwe bicih bînin, birastî sebaret bi belêniyê lêpirsîn tête kirin. [35] Dema hûn dipîvên
pîvanên tewaw biden û bi kêşanên serast bikêşin, ewe bêhtire û berhema wê baştire.
[36] Li dû ewa ku te çi zanist li ser da nîne neçe, guh çav û dil, sebaret bi wan hemûya
dê lêpirsîn bête kirinê. [37] Bi qudetî li ser erdê negerê, birastî tu nikarî erdê bidrînî, nejî
tu dê hindî çiya bilind bî. [38] Ew hemû nebaşe û li bal Xwedanê we kirête[c]. [39] Eve li ev
têgeheştinê ye ku Xwedanê te sirûş daye te, xwedayek dîke nedanê bal Xwe dê bila te
nehavêjine cehnemê da, tawanbar û derkirî. [40] ´Bes Xwedanê we hûn bo kura
hilbijartine û li naw firişta bi Xwe kiç hilgirtine? Birastî hûn gotineke gelek mezin
dibêjin! [41] Me di ev Xwandinê (Quranê) da, bi rêbazên cuda şirove kiriye, belke li ber
wê hindê bête bîra wan, lê eve tenê ewan dûrtir li rê derdêxît. [42] Bêje, ´Eger digel Vî
da xwedêyên dîke heban, weka ku ew dibêjin hene, bes ew dê lê geriya ban ku rêkekê
bo bal Xwedanê text[d] ê peyda biken.´ [43] Paye bilindî bo Vî ye! Ev gelek bilindtir li
serwey ewê ye ku ew dibêjin!



a: Tenê digel kesekê ganê biken ku we jiyana hevbeş digel da pêk înabît. (jin û mêr)
b: Mirov nekujin! c: Jibo peyva Mekrûh min kirêt bikar îna d: Textê Padişahiya Xwe dê, Yêkta

44 Heft asiman û erd û hemû ewa di wan da Vî paye bilind diken. Hîç tiştek çinîne ku
pesna Vî paye bilid neket, her çend ku hûn paye bilind kirina wan tênagehin, birastî
Ev, Pêdagir û Lêbihore. 45 Dema ku tu Xwandinê (Quranê) dixwînî, Em perjînek
weşartî didanêne nawbera te û ewên ku bawerî bi Dawiyê naken.
46 Me qepaxek havêtiye ser dilê wan ku nahêlît ew, evê têbigehin û di guhê wan da
keratî heye. Dema ku tu di Xwandinê (Quranê) da bi tenê amaje bi Xwedanê xwe
dikey, ew bi kerbek gelek mezin pişta xwe didenê da. 47 Em dizanin ku ew çawa guhê
xwe didenê da, dema ku ew guhê xwe didene te û dema ku ew bi nehênî dipeyvin,
ewên nerastkar dibêjin, ´Hûn bes peyrevî li mêrekê diken ku hatiye cadû kirin.´ 48 Lê
binhêre, ew bo te mînakên çawa tînin! Lewma ew bezir bûne û nikarin biçine rêkekê.
49 Ew dibêjin, ´Dema ku em dê bibine hêstik û pirtikên hûr hûr, meger birastî em dê bi
afirandineke nû bêne vejandin?´ 50 Bêje, ´Bibe ber yanjî asin, 51 yanjî her afirandineke
dîke ku di singê te da mezine. Ew dê bêjin ´Kê dê me nûjen biket?´ Bêje, ´Ev ê ku cara
yêkê hûn afirandin.´ Paşê ew dê serê xwe li te bihejînin û bêjin, ´Dê kengê bît?´ Bêje,
´Renge wan zûyane! 52 Di ew Roja ku dema Ev gazî we diket û hûn bi pesn bersiva Vî
diden û hûn dê hizir biken ku hûn tenê bo demek kurt lêre mayne.´ 53 Bêje koleyên
Min tenê ewa ku başe bêjin. Birastî Şeytan tovê nakokiyê li nawbera ewan da diçînît,
birastî Şeytan bi aşkira dujminê mirova ye. 54 Xwedanê we, we nas diket, eger Ev
bixwazît Ev dê rehmê bi we biket yanjî eger Ev bixwazît Ev dê we siza bidet. Me tu
neşandî ku li ser ewan bibye parêzer. 55 Xwedanê we ewên li asimana û erdê da jî nas
diket. Me zêdetir li ewên dîke qencî li hindek Pêşbîna[a] kiriye, Me destûra nivîsî[b] da
Dawûd. 56 Bêje, ´Li ber ewan bipariyên ku we li kêleka Vî da wergirtine, ewan
desthilat çinîne ku karesatê wêda biben yanjî biguherin.´ 57 Ewên ku ew li ber ewan da
dipariyên, ew bixwe li keresteyekê digerên bo bal Xwedanê xwe, li ewên ku herî
nêzîkin li Vî, hêviya rehma Vî dixwazin û li sizaya Vî ditirsin. Birastî sizaya Xwedanê
we cihê tirsê ye, 58 çi gundek nîne ku pêş Roja vejiyanê Em wêran neken yanjî bi
dijwarî siza neden, eve di nivîsînê da hatiye tomar kirin. 59 Hîç tiştek pêşgîriya Me li
şandina nîşaneya naket xêncî wê ku, ewên pêşta bawerî pê nekiribûn. Me hêştira mê
weke nîşaneyek zelal dabû netewa Semûd, lê ewan nerastî lê kirin. Em nîşaneya
naşînin, xêncî bo agahdariyê nebît. 60 Dema Me gote te, ´Birastî Xwedanê te mirov
dorpêç kirîne´ Ew dîtina ku Me pêşanî te dayî, tenê ezmûnek bû bo mirova û ew dara
nerênî kirî, di Xwandinê (Quranê) da. Me, ew tirsandin jî, lê ew hindê, tenê li sînor
bezandina wan zêde kir.61 Dema ku Me gote firişta, ´Li ber A Dem çokê xwe danên û
serê xwe binvînin,´ Ewan çokê xwe danan û serê xwe nivandin, lê bes Iblîs nebît. Wî
got, ´Çima dibya ez çokê xwe li ber kesekê danêm û serê xwe binvînim ku Te li heriya
kelpûça afirandiye?



a: Jibo peyva Nebî min Pêşbîn bikar înaye! a: Ew nivîsîna pîroz ku navê wê Zebûr e!

[62] Wî got, ´Tu, ew dibînî ku Te li serwey min rêz lê girtiye? Eger Tu, ta Roja Vejiyanê
derfetê bideye min, bêguman ez dê paşketiyên wî li nav bibem bes hindek nebin.´
[63] Ev got ´Here! Her kesê li naw ewan da peyrevî li te biket, bes birastî dê cehnem
padaşê we bît, padaşeke kêr hatî! [64] Her kesê li naw ewan da ku tu dikarî, pê dengê
xwe han bide, pê leşkerên xwe yên siwar û piyade li wan bide, serwet û zarûkên wan
digel wan da par weke û belêniya bide wan, lê Şeytan çi belêniya nadete wan, xêncî
xeyala [65] birastî te dê çi desthilat li ser koleyên Min da nabît, Xwedanê te têra Xwe
parêzerê ewane.´ [66] Xwedanê we ye ku bo we gemiyê li ser deryayê da dihajot ku hûn
bikarin li qenciyê Vî bigerên, birastî Ev rehmê didete we. [67] Dema ku hûn li ser
deryayê ne û karesat tête serê we, ewên ku hûn li ber wan da dipariyên bezr dibin, bes
Ev nebît, lê dema ku Ev, we bi ewlehî dizvrînîte ser hişkatiyê hûn pişta xwe didenê û
mirov nankorin. [68] Meger hûn hest bi tenahiyê diken ku Ev wel erdê naket ku we qurt
biket, yanjî bahoza kevira naşînîte ser we? Paşê hûn kesê peyda naken ku we biparêzît.
[69] Yanjî hûn dikarin hest bi tenahiyê biken ku Ev carek dîke we naşînîte naw da û
bahozek tund naşînîte ser we ku we bixendiqînît, çimkî we bawer nekirbû, paşê hûn li
dijî Me çi kesê peyda naken ku toleya we veket. [70] Bêguman Me rêz li zarûkên
A Dem girtiye û Me ew li ser hişkatî û derya da hilgirtine, Me debarên baş bo wan
dabîn kirîne û Me qencî li wan kir li serwey gelek ewên ku Me afirandine û qencî li
wan kiriye. [71] Di ew Roja ku Em gazî hemû mirova diken, ewên ku tomara wan dayne
destê wan yê rastê da, ew dê tomara xwe bixwînin. Bêdadî li wan nayête kirin, hema
hindî pûşekê jî, [72] ewên ku lêreda kore bûn ew dê li Dawiyê da jî kore bin û tenanet
dûrtir li rê derketî. [73] Birastî ew li ber da bûn ku te han biden li eva ku Me sirûş daye te
wêda biben ku tu ewên dîke sebaret bi Me berhem bînî, paşê ewan dê tu weke heval
vergirtibay. [74] Eger Me tu bihêz nekirbay, hind nemabû ku tu kêmekê xwe bo aliyê
wan xar bikey. [75] Paşê Me dê wekirba ku tu du jiyana tam bikey û du mirina jî, paşê te
dê kes peyda nekirba ku li dijî Me yarmetiya te biket. [76] Birastî ew li ber da bûn ku te
li ew welat bitrsînin û te lê bikene der, lê piştî te ew li demek kurt zêdetir namînin.
[77] Rêbaza damezrandî bo ew peyamberên Me ku Me pêş te da şandin û tu çi
guhertina li rêbazên Me da nabînî. [78] Li ew dema ku roj geheştiye ser elendê, ta tarî
bûna şevê nûbêjê bike û di serê sibê da Xwandinê (Quranê). Gewahî li Xwandina
(Qurana) serê sibê tête dan[79] û di dema şevê da bo ewa zêdetir li xewê rabe, belke li
ber hindê Xwedanê we, we vejînîte ciheke pesn kirî [80] û bêje, ´Xwedanê min, wisa li
min bike ku ez birastî biçime jorê û birastî bême derê û bi desthilata Xwe yarmetiya
min bike.´ [81] Û bêje, ´Rastî hatiye û direw li nav çoye, birastiyê dê direw li nav biçît.´
[82] Me bi Xwandinê (Quranê) derman û rehm bo ewên ku bawer diken şande xarê, lê
jibo ewên ku bawer naken ew tenê zirara wan zêde diket. [83] Dema ku Em qenciyê bi
mirov diken ew pişta xwe didetê û xwe dûr diket, lê dema ku nebaşî li wî didet ew
bêhevî dibît.

[84] Bêje, ´Her kesek bi rêbaza xwe kar diket, lê Xwedanê we dizanît kanê kê rênivîniyê
rê hatiye kirin.´ [85] Ew sebaret bi rihê li te dipirsin. Bêje, ´Rih, destûra Xwedanê
mine. Li ser wê tenê kêmek zanist bi we hatiye dan.´ [86] Eger Me xwastiba, bêguman
Me dê ew sirûşa ku daye te wêda biriba, paşê te dê kes peyda nekirba sebaret bi vê li
dijî Me te biparêzît, [87] xêncî rehma Xwedanê te li ser te, birastî qenciya Vî li set te
mezine. [88] Bêje,´Eger hemû mirov û cin hatibana bal hev ku Xwandinêkê (Quranekê)
weka evê berhem bînin, ewan dê nekarîba yêke weka evê bînin, tenanet eger hindek li
ewan yarmetiya hindek ewên dîke jî kiriba.´ [89] Di vê Xwandinê (Quranê) da, Em bo
mirova hemû mînaka şirove diken, lê piraniya mirova napejrînin xêncî nebaweriyê.
[90] Ew dibêjin, ´Em bawer bi te naken taku tu bo me kaniyekê li erdê da nebilqînî
[91] yanjî taku te baxçeyekê darê xurmê û rezê tirî nebît û wisa li çema bikey ku li naw
da bi firavanî biherikin [92] yanjî wisa li asiman bikey ku pirtî pirtî ser me da bikevît, her
wek ku te ragehandibû, yanjî pêşta Xwe dê û firişta bîne [93] yanjî te malek li cewhera
çêkirî hebît yanjî hilkêşe asiman, em çi cara bawerî bi hilkêşana te naken, ta ku tu
nivîsîneke pîroza bo me neyniye xarê ku em bixweînin.´
Bêje, ´Paye bilindî bo Xwedanê min bît! Meger xêncî peyamberek bimir, ez tiştek dîke
me?´ [94] Çi tiştekê pêşgîrî li mirova kir ku bawer nekirin, dema ku rênnivînî bo wan hat,
xêncî evê ku wan gotibû, ´Xwe dê peyamberek bimir şandiye?´
[95] Bêje, ´Eger li ser erdê firişte heban ku bi tenahî geriyaban, bêguman Me dê bo ewan
li asiman ra firişteyek peyamber şandiba.´ [96] Bêje, ´Xwe dê di nawbera min û we da
têra Xwe gewahe. Birastî Ev Agahdar û Bîner ê koleyên Xwe ye.´ [97] Her kesê ku
Xwe dê rênivînî biket bes ew rênivînî kiriye û her kesekê ku Ev bihêlît li rê derkevit tu
çi cara bo wan parêzvana li kêlek Vî da peyda nakey. Di roja vejiyanê da, Em dê wan
kom bikene ser rûmetên wan, kore, lal û ker. Cehnem dê penahgeha wan bît, çend
cara ew kêm bît, Em bi guriyeke xurtir diteyîsînin.[98] Eweye padaşê wan, çimkî ewan
bawerî bi eşkereyên Me nekirin û gotina,´ Dema ku em dê bibine hêstik û pirtikên hûr
hûr, meger birastî em dê bi afirandineke nû bêne vejandin?´ [99] Meger ew nabînin ku
Xwe dê afrînerê asimana û erd ye û dikarît ewên mîna wan biafrînît û Ev demek bo
wan dîhar kiriye ku çi guman sebaret bi wê hindê nîne, lê ewên nebaşkar napejrînin
xêncî nebaweriyê. [100] Bêje, ´Eger tu xwedanê himbanên[a] rehama Xwedanê min bay,
te dê tirsê danê da, ew paşve xwedan kirban, mirov qornûse[b].´ [101] Me neh nîşaneyên
zelal dabûne Mûsa, lewma li zarûkên Israîl bipirse. Dema ku ew hate bal wan, Fireûn
gote wî, ´Mûsa ez hizir dikem tu hatî cadû kirin.´ [102] Wî got, ´Bêguman tu dizanî kesê
ewane weke belge neşandine xarê xêncî Xwedanê asimana û erdê, Fireûn ez birastî
hizir dikem tu li nav çoyî.´
[103] Lewma wî dixwast ku ewan li welat bikete der, lê Me ew û ewên digel wî da bihevra
xendiqandin. [104] Piştî wî, Me gote zarûkên Israîl, ´Li welat bijîn û dema ku belêniya
Dawiyê hate cih, Em dê we li komeke têkel da bînin.´



a: Mexzen, Depo, cihê hilgirtina tiştan b: Hez naket bidet, dest miçî

105 Me bi rastiyê şandiye xarê û bi rastiyê hatiye xarê, Me tenê tu şandî ku mizgînî û
agahdariyê bidey, 106 Xwandinek (Quranek) ku Me ciyawaz kiriye, belke tu bi
bêhnok[a] bo mirova bixwînî û Me şandiye xarê di qonaxa[b] da 107 Bêje, ´ Bawer pê
biken yanjî bawer neken, birastî ewên ku pêş evê da zanist bi wan hatibû dan, dema
ku ev bo wan têtе xwandin, ew bi ser nivandin dikevine ser rûmetê xwe 108 û dibêjin,
´Paye bilindî bo Xwedanê me ye! Birastî belêniya Xwedanê me hatiye cih.´ 109 Ew li
ser rûmetê xwe ra dikevine xarê, digiryên û ev ûstî-xarî ya wan zêdetir diket.´ 110 Bêje
´Li ber Xwe dê bipariyê, yanjî li ber Xwedanê rehmê bipariyê, bi her navekê tu li ber
Vî bipariyê, baştrîn nav yê Vî ne.´ Li nûbêjên xwe da, bilind deng neke, nejî bêdeng
be, lê rêkekê di nawberê da bigre 111 û bêje ´Pesn bo Xwe dê ye, Evê ku li padişahiya
Xwe da çi kur û ´heval´ nevergirtine û Ev parêzrvan nînin li ber bêhêziyê.
Mezinahiya Vî Mezintir bike!´



a: Jibo peyva Meks di zimanê Erebî da min bêhnok bikar înaye! Dema bi rawestan nawberê dideye xwandina peyva, ( , ) jî heman bandor heye. b: Jibo peyva Tenzîl li erebî da min peyva Qonax bikar înaye. Hemberanê wê li Inglîzî da peyva ´stage´ e. nawber.

## 18. Para Şikevt ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Pesn bo Xwe dê ye Ev ê ku bo koleyê Xwe nivîsîna pîroz şande xarê û têda
xarî çênekirye, [2] seraste ku agahdariya sizaya giran li bal Vî bidet û mizgîniyê
didete bawermenda, ewên ku karên baş diken, ewan dê padaşeke baş hebît
[3] ta bêdawiyê ew dê li wêderê da bimînin. [4] Ew agahdariyê didete ew mirova
ku dibêjin ´Xwe dê kurek heye.´ [5] Ewan li ser wê çi zanyarî nînin, nejî
berebabên wan hebû, peyvek gelek mezine ku li devê wan da diderkevît, ewa
ku ew dibêjin çi nîne, bes direw nebin. [6] Lê, meger tu dê ser xatirê wan, xwe
bo mirinê perîşan bikey ku ew bawerî bi ev gotûbêjê naken?
[7] Birastî Me ewa li ser erdê xemilandiye, belke Em ewan pê taqî biken ku
bizanin kîjan li wan ewa baş diket, [8] birastî Em dê ewa li ser da bikene zewya
rût. [9] Meger tu hizir dikey ku li naw nîşaneyên Me da hevrêyên di şikevtê da û
ew hejmar seyrin? [10] Dema ew law helatine şikevtê da û gotin,´ Xwedanê me,
li rehma Xwe bide me û rêyeke rast bo pirsgirêka me peyda bike,´ [11] Me, di
naw şikevtê da bo hejmarek sala havête ser guhê wan. [12] Paşê, Me ew rakrin, li
ber hindê ku Em bidene zanîn kanê kîjan li her du aliya dê bikarît li naw yêk
derêxît ka çend demê ew li wêderê bûne. [13] Em dê serhata wan birastî bo te
bêjin, birastî ew law bûn ku bawerî bi Xwedanê xwe hebûn û Me ew zêdetir
rênivînî kirin.[14] Me dilê wan qahîm kir, dema ew rabûne ser pêya û gotin,
´Xwedanê me, Xwedanê asimana û erdê ye. Em çi cara li ber çi xwedêya
xêncî Vî napariyên, çimkî ew gotin dê sînor bezandinek gelek mezin bît.
[15] Ew netewa me li kêleka Vî da xwedêyên dîke vergirtine. Çima ew bo wan
desthilateke aşkira naynin? Kê dikarît li ewi bêdadtir bît ku sebaret bi
Xwe dê direwekê berhem tînît?
[16] Dema ku hûn li ewan û ewa ku wan xêncî Xwe dê diperestîn dûr bûn,
birewine şikevtê da. Xwedanê we dê rehma Xwe li ser we da bibarînît û dê
reyek hêsan bo pirsgrêka we çêket. [17] Te dê karîba rojê bibînî, weka ku ew
hilat, wêda ço li aliyê rastê şikevta wan û dema ku ew ava bû, wêda ço li aliyê
çepê şikevta wan, dema ku ew li naw ewê da bûn, eve li nîşaneyên Xwe dê bû,
herkesê ku Xwe dê rênivînî diket, ew hatiye rênivînî kirin û herkesê ku Ev
dihêlît li rê derkevît, tu çi cara nikarî bo wî parêzvanek rênivîn peyda bikey.
[18] We dê hizir kirba ku ew hişyarin, dema ku ew razayî bûn. Me ew
zivirandine rast û çepê, seyê wan her du lepên xwe rakêşabûne naw derî da.
Eger te zêndaba wan, tu dê zivrîba û reviyaba, tu dê bi wan tejî tirs biba.

[19] Her wisa Me, ew rakirin belke ew lêpirsînê li hevdu biken. Yêkê li naw wan
da got, ´Çend zemane ku hûn mayne?´ Ewan got, ´Em rojekê yanjî danekê
rojê lêre da mayne,´ Ewan got, ´Xwedanê we dizanît ku hûn çend lêre da
mayne. Lewma yêkê li we rêke naw bajêr, bi ew dirafê xwe yê zîv, bila ew cihê
ku paktrîn xwarin lêye peyda biket û bo we xwarinê lê bînît. Bila lê hişyar bît
ku çi kes agahdarê te nebît, [20] birastî eger ew bizanin tu kêy, dê te bidene ber
kevira, yanjî dê te vegerînine ser dînê xwe û çi cara tu serkevtî nabî.´ [21] Her
wisa Me wekir ku ew bêne nas kirin, belke ew bizanin ku belêniya Xwe dê
raste û sebaret bi demjimêrê[a] çi guman nîne, dema ku ewan li ser mijara xwe
li nawbera xwe da gengeşe kirin û ewan gotin,´Avahiyekê li ser ewan da
çêken, Xwedanê wan sebaret bi wan dizanît.´ Ewên ku di mijara xwe da
serketin gotin, ´Bêguman em dê mizgewtekê li ser ewan da çêken.´ [22] Ew
dibêjin, ´ Sê, seyê wan yê çarê bû,´ Ew dibêjin, ´Pênc, seyê wan yê şeşê bû´
Texmîna li ser eva nedîtî diken û ew dibêjin, ´Heft û bi seyê xwe we bûne
heşt.´ Bêje ´Xwedanê min hejmara wan dizanît.´ Kes nizanît bes hindek
nebin, lewma xêncî gengeşeyek aşkira sebaret bi wan gengeşê neken û sebaret
bi wan li kesê nepirsin, [23] bo çi tişta nebêje, ´Birastî ez dê sibê ewê bikem´
[24] Bêy ku, ´Eger Xwe dê bixwazît´ Û Xwedanê xwe bîr bîne dema bîra te ço
û bêje, ´Belke Xwedanê min li evê zêdetir min rênivînî kiryara rast biket.´
[25] ´Ewên razayî sê sed sala di şikevta xwe da man û neh lê zêde kirin.´
[26] Bêje ´Xwe dê dizanît ku ew çend dirêj man.´ Ewa nedîtî li asimana û erdê
da ya Vî ye, Ev vê Dibînît û Dibhêt! Li kêlek Vî da ewan çi parêzvan nînin,
Ev destûra Xwe digel kesê dîke par naveket. [27] Bêje, ev sirûşa ku bo te li
nivîsîna pîroza Xwedanê te eşkere bûye, çi guhertin di peyvên Vî da çinînin,
nejî tu dikarî çi penahekê li kêleka Vî peyda bikey. [28] Bêhna xwe bi ewan bînin
ku sibêdê û êvara li ber Xwedanê xwe dipariyên û daxwaza rûmetê Vî diken,
nehêlin ku ew li ber çavên we bezir bin, li ber daxwaza xemla jiyana ev
dinyayê peyrevî li ewan neke ku Me dilê wan bêhişê bîranîna Xwe kiriye,
ewên ku hestên xwe dişopînin, ewên ku mijara wan zêdehiye.
[29] Bêje, ´Rastî ya Xwedanê we ye, lewma her kesê ku dixwazît bihêle bila
bawer biket û her kesê ku naxwazît bihêle bila bawer neket.´ Me bo
nerastkara agirek amade kiriye ku guryên wê dê ewan dorpêç biket. Eger ew
daxwaza rizgariyê biken, ew dê bi avekê, weka mîsê heliyayî ku rûmetê wan
bişiqtînît dê bêne rizgar kirin. Vexwarinek kotiye û cihê bêhin vedana
nexweşe!



a: Jibo peyva Saet ê min peyva Demjimêr bikar înaye, mebest ev demjimêra dawiyê!

30 Birastî ewên ku bawer kirin û karên durust kirine, Em nahêlin padaşê her
kesekê ku karê durust diket bi xorayî biçît, 31 ewan dê baxçeyên jiyana
bêpayan hebin ku çem li bin ewan da diherikin. Wêderê da, ew dê bi bazinê
zêr bêne xemilandin. Wêderê da, ew dê cilên li armûşê kesk û peroyên zêrkêş
kirî bikene ber xwe. Wêderê da, ew dê bi tenahî li ser bermalên nerm rûnên.
Padaşê wan erêniye û cihê bêhin wedan wan xweşe! 32 Mînaka du mêran bêje
wan, Me du baxçên rezê tirî dane yêk li wan û Me bi darên xurmê dorpêç
kirin û dexil û dan li nawbera wan da çandin 33 her du baxçeya xwarin
berhem înan û bi hîç awayekê têk neçon, Me wekir ku çemek li naw wan da
biherkît 34 û li ber hindê, wî bi firavanî berhem hebûn. Ew gote hevrêyê xwe,
dema ku ew digel da dipeyvî ´Min gelek li te zêdetir mal heye û li te zêdetir
mêr pişta minin.´ 35 Ew ço naw baxçê xwe da, dema ku ew digel xwe nerast
bû, wî gotina, ´Ez hizir nakem ku ewe çi cara li nav biçît, 36 ez hizir nakem dê
demjimêr çi cara bêt, eger ez bême zivrandin bo bal Xwedanê xwe jî,
bêguman li berdêl da ez dê li ewê bêhtir peyda bikem.´ 37 Hevrêyê wî gote wî,
dema ku digel wî dipeyvî ´Tu bawerî bi Ev nakey ku tu li tozê afirandî paşê li
avikê paşê şêweyê mêrekê da te? 38 Lê, jibo min Ev, Xwe dê ye Xwedanê
mine, ez çi cara ´hevala´ bo Xwedanê xwe peyda nakem. 39 Çima dema tu
çoye naw baxçê xwe da, te negot, ´Eve Xwe dê xwastiye, xêncî Xwe dê, çi
hêzê dîke nînin. Herçend ku tu dibînî min li te kêmtir mal û zarûk hene,
40 belke Xwedanê min, li baxçê te bêhtir bidete min û li asiman ra karesatekê
bişînîte ser da ew bibîte erdê rût 41 yanjî ava wê niqom bît ku tu çi carê dîke
nekarî lê bigerêy.´ 42 Berhemên wê hatine dorpêç kirin û ew destpêkir destê
xwe li ser ewa ku wî dabû zivrand, dema ku ew li ser darbestê xwe da hil
diveriyan, wî got´ Xwezî min bo Xwedanê xwe çi ´´heval´´ peyda nekirban.´
43 Xêncî Xwe dê, ew çi kom çinebûn ku yarmetiya wî biken, nejî wî karî xwe
biparêzît. 44 Wêderê da parastina Xwe dê raste, Ev bêhtrîn padaşe û bêhtrîn
dumahîke.

45 Mînakekê jiyana ev dinyayê bide wan. Em li asimana ra avê dişînine xarê û
giyayên erdê hil dimijin, paşê dibîte pûşikê hişik ku ba belav dikete wan dera,
Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye. 46 Mal û zarûk xemla jiyana ev
dinyayê ne, lê kiryarên durustê mayinde padaşeke bêhtir li bal Xwedanê we
heye û hêviyeke bêhtir. 47 Di ew Roja ku Em dibine hokar ku çiya bimeşin û
hûn erdê weke zewyek rast dibînin, Em dê ewan kom bikene ser hevda û çi
kesê li wan paşve nahêlin. 48 Li pêşya Xwedanê we da, ew dê li rêza da bêne
pêşkêş kirin, ´Bêguman hûn hatine bal Me, weka cara yêkê ku Me hûn
afirandibûn, herçend ku we gotibû, ´Me bo we hevdîtin çênekirbû.´

[49] Dê Tomar bête danan û hûn dê bibînin ku tawankar dê li naveroka wê
bitirsin. Ew dê bêjin, ´Hewar li me! Ewe çi tomareke! Ne ewa biçûk dihêlît
ne ewa mezin ku nehejmartibît!´ Ew dê peyda biken, ewa ku ewan kiribû
têdaye, Xwedanê we bêdadiyê digel kesê da naket. [50] Dema Me gote firişta,
´Li hember A Dem da çokê xwe danên û serê xwe binvînin´ Û ewan çokê xwe
danandin û serê xwe nivandin xêncî Iblîs, ew yêk li wan cina bû û wî li dijî
destûra Xwedanê xwe serhilda. Meger hûn dê li cihê Min da wî û paşketiyên
wî, weke parêzvan vergirin, herçend ku ew dijminê we ne? Nerastkar
danûsitandinekê kotî diken! [51] Min ew nekirine gewahên afirandina asimana û
erdê, nejî bo afirandina ewan bixwe, Min ewên li rê derketî weke yarmetîder
wernedgirtin. [52] Di Roja ku Ev dê bêjît, ´Li ber ewan bipariyê ku te gotibû
´´hevalên´´ Minin,´ Ew dê li ber ewan bipariyên, lê ew bersiv naden, Em dê
berbestekê danêne nawbera ewan da. [53] Ewên tawankar dê agir bibînin û dê
bêguman bin ku ew dê bikevine naw da û çi rêya helatinê li wê peyda naken.
[54] Di vê Xwandinê (Quran) da, Me bo mirova hemû çeşine mînakek şirove
kiriye, lê mirov li ser gelek tişta gengeşê diken. [55] Hîç tiştekê pêşgîrî li mirova
nekiriye ku bawer neken dema ku rênivînî bo wan hatiye ku daxwaza
lêbihorînê li Xwedanê xwe biken, xêncî ewê ku rêbaza[a] ewên berê bo wan têt,
yanjî eşkence bête pêşiya wan? [56] Em tenê peyambera dişînin ku mizgîniyê
bînin û agahdariyê biden. Ewên nebawer pê direwê gengeşê digel rastiyê
diken ku nepejirînin, tiranê xwe bi eşkere[b] û agahdariyê Min diken. [57] Kê li
ew mirov bêdadtire ku dema bîranîna eşkereya Xwedanê wî bi wî tê kirin, ew
pişta xwe didetê û bîra wî diçît ku destên wî bo wî çi şandiye pêş? Birastî Me
qepax havêtiye ser dilê wan ku ew tênegehin û di guhê wan da keratî heye,
eger tu bo rênivîniyê ewan gazî bikey jî, ew çi cara nayêne rênivînî kirin.
[58] Xwedanê we Lêbihore û tejî Rehme, eger Vî ber xatira ewa ku wan bi dest
xwe înaye ew girtiban, bêguman Vî dê lez li sizaya ewan kiriba. Lê ewan
dema hevdîtinê heye ku hatiye destnîşan kirin û ew nikarin lê birevin. [59] Ew
gundên ku Me li ber nerastiyê wêran kirin, Me bo wêran kirina wan demek
destnîşan kirî danaye. [60] Dema ku Mûsa gote xizmetkarê xwe, ´Ez narawestim
taku ez negehime ew cihê ku her du derya digehine hev, yanjî bo demekê dirêj
berdewam bim!´ [61] Lê dema ku ew geheştine cihê nawbera wan, ewan
masiyên xwe li bîr kirbûn û wan rêya xwe bo naw deryayê peyda kirbûn û li
wan dûr ketibûn. [62] Dema ku ew lê derbaz bibûn gote xizmetkarê xwe, ´Ka
têşta me bo me bîne! Bêguman ew rêvîngiyê, em gelek westandin.´
[63] Wî got, ´Te dît dema ku me li bal razeber[c] bêhna xwe diweda? Birastî Min
masî li bîr kir, kesê wel min nekir ku ez bîr bikem bes Şeytan nebît, ewê dibya
ez bêjim. Seyre[d], ewê rêya xwe girtibû bo naw deryayê da.´



a: Jibo peyva Sunet min peyva Rêbaz bikar înaye! b: Jibo peyva Aye, min Eşkere bikar înaye!
c: Jibo peyva sexre min peyva Razeber bikar înaye! d: Ecêb

64 Wî got, ´Eveye ku em lê digerên.´ Li ber hindê, ewan, şunpêyê xwe
şopandin û paşve zivrîn 65 û li naw koleyên Me da koleyek peyda kirin ku Me
rehama Xwe dabûyê da û Me ew fêrî zanistek Xwe kiribû.
66 Mûsa gote wî, ´Ez dê bikarim peyrevî li te bikem ku tu min fêrî ew
rênivîniya rast bikey ku tu hatî fêr kirin ?´ 67 Ew got, ´Birastî Tu çi cara nikarî
digel min bêhin fereh bimînî. 68 Çawa tu dê bikarî digel ewê bêhn fereh bî ku
te zanista wê nîne?´ 69 Wî got, ´Xwe dê bixwazît tu dê min bêhin fereh bibînî.
Ez serpêçiyê li destûra te nakem.´ 70 Wî got, ´Eger tu peyreviyê li min bikey,
sebaret bi hîç tiştê ku ez dikem pirsa li min neke taku ez sebaret bi wê bêjime
te.´ 71 Paşê herdu ya dest bi rêvîtiyê kir taku ew çone naw gemiyekê da, mêrik
kunek têda vekir, wî gotê, ´Te eve kun kir ku mirovê wê bixendiqînî?
Bêguman te tişteke gelek kotî kir! 72 Wî got, ´Meger min negote te, digel min
da, tu çi cara nikarî bêhin fereh bî?´ 73 Wî got, ´Min tawanbar neke jibo ewa
min bîr kir. Lê, barê ew mijara min ya dijwar giran neke!´ 74 Paşê herdu ya
dest bi rêvîtiyê kir taku ewan kurek dît, paşê mêrik ew kuşt, wî got, ´Çawa te
karî riheke pak bikujî xêncî riheke dîke[a]? Bêguman te tişteke gelek kirêt kir!´
75 Wî got, ´Meger min negote te, tu çi cara digel min da, nikarî bêhin fereh
bî?´ 76 Wî got, ´Eger piştî ewê, ez li ser her tiştekê lêpirsînê li te bikem, min
weke hevrê xwedan neke. Bêguman te mahneyek li min êxiste destê xwe.´
77 Paşê herdu ya dest bi rêvîtiyê kir taku dema ew geheştine mirovên gundekê,
ewan daxwaza xwarinê li mirovên wê kir, lê ew weke mêwan nepejirandin.
Paşê ewan têda dîwarek dît ku li ser hilweşyanê bû, mêrik ew nûjen kir. Wî
got, ´Eger te xwastiba, bêguman te dê karîba bo nûjen kirina wê padaşekê
vergirî.´ 78 Wî got, ´Eveye cudahiya nawbera min û te. Ez dê wateya ew tiştê
ku te nekarî digel wan da bêhin fereh bî bo te bêjim: 79 gemî ya mirovên hejar
bû ku pê, li ser deryayê da kar dikirin, lewma min xwast li kar bêxim, çimkî
padişahek li dû ewan da têt ku bi zordestî hemû gemiya dibetin. 80 Sebaret bi
kurik, dayk û babên wî bawermend bûn û Em tirsiyan ku ew dê bi zêdegavî û
nebaweriyê barê wan girantir biket, 81 lewma me xwast ku Xwedanê wan jibo
wan veguherîte yêke li wî bêhtir, paktir û li rehmê nêzîktir. 82 Sebaret bi dîwar,
ew yê du lawên sêwî li naw bajêr da bû û li bin da, jibo wan xizîneyek çal kirî
bû. Babê wan dirustkar bû, liber hindê, Xwedanê te xwast ku ew pê bigehin,
paşe ew xizînê xwe bikolin û derêxin, weke rehmek li bal Xwedanê te. Min
serbixwe ew nekirin, eve vergêrana evê ye ku te nekarî digel da bêhin fereh
bî.´ 83 Sebaret bi Zol Qerneyn li te dipirsin. Bêje, ´Ez dê sebaret bi wî
bîreweriyekê bêjime we.´



a: Li gor gotina Ebdil Helîm, Ew kes nekûştiye, lewma te nediba kuştiba!
b: Gelek vergêr dibêjine Zol Qerneyn Cot Şax, lê pêka têgeheştina min ew mêreke ku Tac li ser serê wî ye! Ez hizir dikem peyva Qern li koron a latîn hatiye, bi watyea taca padişahiyê.

84 Birastî Me, ew li ser erdê damezirand û ji bona her tiştekê Me rêyek da wî.
85 Wî peyrewî li rêyekê kir 86 taku, ew geheşte Rojava, wî dît ku ew li kaniyek
şêlu da ava bû. Nêzîkatiya da wî neteweyek dît û Me got ´ Zol Qerneyn, yan
ewan siza bide yanjî başiyê digel wan bike.´87 Wî got, ´Ewên ku nerastî kirîne
em dê siza biden û dema ku ew zivrîne bo bal Xwedanê xwe, Ev jî dê, bi
dijwarî ewan siza bidet, 88 lê ewê ku bawer diket û durustkare, ew dê baştrîn
padaş hebin, em dê bêjine wi, li destûra Me, ewa hêsan bike.´ 89 Wî rêyek
şopand 90 paşê, dema ew hate Rojhilatê, wî dît ku ew li ser gelekê da hilatiye
ku Me çi penah li wê nedaye wan 91 û bi wî awayî bû Me deshilat li ser hemû
zanista wî hebû. 92 Paşê wî rêyek şopand 93 paşê, dema ew geheşte berbesta[a] li
nawbera du çiyaya, wî li kêleka wan da neteweyek dît ku hema hema[b] li
gotinê têdigeheştin. 94 Ewan got, ´ Zol Qerneyn, Cûc û Mecûc, ew erd gendel
diken. Eger em debarekê[c] bidene te, tu dê li nawbera me û ewan da
berbestekê çêkey?´ 95 Wî got, ´Ew cihê ku Xwedanê min daye min bêhtire, lê
pê hêza xwe yarmetiya min biken, ez dê li nawbera we û ewan da perjînekê
çêkem, 96 bo min perên asin bînin!´ Takû wî, nawbera her du berbesta weka
hev lê kirin. Wî got ´Pif ken!´ Ta ew dema wî kire agir, wî got, ´Bo min bînin
ser da birêjin, pak bûyî!´ 97 Lewma ewan nedikarîn lê hilkêşin, nejî dikarîn
biçine têda, 98 û wî got, ´Eve rehmeke li Xwedanê mine. Lema dema ku
belêniya Xwedanê min têtin, Ev dê, wê wekhev lê biket, belêniya Xwedanê
min raste.´ 99 Di wê Rojê da, Em dê bihêlin ku hindek li wan ser ewên dîke da
bikevin û zirnajen dê pif ketê da û Em dê hemûya kom kene ser hevda. 100 Wê
Rojê da Em dê li ser pêşangehê cehnemê pêşkêşî nebawera biken, 101 ewên ku
çavên wan li bîranînên Min hatibûne peçavtin û nedikarîn bibhên. 102 Meger
ewên nebawer hizir dikirin ku ew dê bikarin koleyên Min, weke parêzvan li
kêlek Min da vergirin? Birastî Me cehnem weka cihê bêhin wedana nebawera
amade kiriye. 103 Bêje, ´Em te agahdar biken, kê dê pê kiryarên xwe gelekê
bidorînît? 104 Ewên ku xebatên wan li jiyana ev dinyayê da xwerayî[d] çone,
dema ku ew hizir diken ku ew karên durust diken. 105 Ewin ku bawerî bi
eşkereyên Xwedanê xwe naken û dîtina Vî.´ Lewma kiryarên wan bûne qed
çineyî. Lewma di Roja Vejiyanê da Em çi buhayê nadene giraniya wan.
106 Eve Padaşê wane: cehnem! Çimkî ewan bawer nekir û trane bi eşkere û
peyamberên Min kirin. 107 Birastî, ewên ku bawer kirîne û karên durust diken,
dê baxçeyên parêzdayî bibe mangeha wan. 108 Ta bêdawiyê ew dê li wêderê
da bimînin û çi cara naxwazin ku bicih bihêlin. 109 Bêje, ´Eger bo peyvên
Xwedanê min derya hibir ba, ew dê tewaw ba, pêş ku ew peyvên Xwedanê
min tewaw ban, tenanet eger Me ewên weka wê jî înaban ku lê zêde biken.
110 Bêje,´Ez jî weke we tenê bimirekim ku sirûş bi min hatiye dan, ´Xwe dê yê
we Yêke. Her kesê ku hêvî diket Xwedanê xwe bibînît, dibya karê durust biket
û nabît di perestîna Xwedanê xwe da yêke dîke bikete ´hevalê´ Vî.

a: Jibo peyva Sed, min Berbest bikar înaye.
b: Hema hema yanî kêm mabû.
c: Jibo peyva Xerc min Debar bikar înaye.
d: Xwerayî ço yanî bezir bû, pûç bû.

## 19. Para Miryemê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Kaf Ha Ya Eyn Sad 2 Bîranîna rehma Xwedanê te bo koleyê Xwe Zekerya,
3 dema ku ew bi nihênî li ber Xwedanê xwe pariya, 4 Wî got, ´Xwedan, birastî
hêstikên min lewaz bûne û pirça serê min sipî bûye, belê Xwedan çi cara ez dil
nexweş li ber Te nepariyame, 5 ez li cêgrên xwe ditirsiyêm, piştî nemana xwe,
çimkî jina min nezoke, li ber hindê li aliyê Xwe we cêgirekê bide min 6 ku
bibîte mîratgirê min û mîratgirê binemala Yeqûb. Xwedan, wî xweşevîst bike.´
7 ´Zekerya, birastî Em bo te mizgîniya kurekê tînin ku dê navê wî Yehya bît,
navê ku pêşta Me nedanaye ser kesê.´ 8 Wî got, ´Çawa ez dê bikarim bibime
xwedan kur, dema ku jina min nezoke û ez gelek pîr bûme?´ 9 Wî got
´Xwedanê te wisa gotiye´ ´Ew bo Min hêsane, Min tu afirandî, herçend ku
pêşta tu çinebûy.´ 10 Wî got, ´Xwedan, nîşaneyekê bide min.´ Vî got, ´Nîşaneya
te eve ku bo sê şeva tu digel kesê napeyvî.´ 11 Ew li sitargeha pîroz derket û ço
bal neteweya xwe û bi hêmaya[a] gote wan ku di sibêdê û êvar da pesna Xwe dê
biken. 12 ´Yehya, xwe qahîm bi nivîsîna pîroz we bigre.´ Me têgeheştin daye
zarûk 13 û dilovanî û pakî li bal Me we, ew hişyarê Vî bû. 14 Di xizmeta dayk û
babê xwe da bû, zordest û serkêş nebû 15 û aştî li ser wî bû roja ku ew li dayîk
bû, roja mirinê da jî û di roja ku carek dîke, dê zindî bête rakirin.16 Bîranîna
serhata Miryemê di nivîsîna pîroz da bike. Dema ku wê xwe li binemala xwe
vekêşa cihekê li aliyê Rojhelatê 17 û paşê wê perjîn[b] li ewan girt, Me riha Xwe
di şêweya bimireke asayî da şand ku derkevîte pêşberî wê. 18 Wê got, ´Birastî ez
li dijî te penaha xwe jiboy Xwedanê rehmê dibem, eger tu hişyarê Vî. 19 Wî
got, ´Ez tenê peyamberekê Xwedanê te me ku kurekê pak bideme te.´ 20 Wê
got, ´Min dê çawa kurek hebît, dema ku çi bimira destê xwe li min nedaye û ez
dawên pîs nebûme,´ 21 Wî got ´Xwedanê te eve gotiye´ Ew bo Min hêsane, Em
dê wî bo mirova bikene nîşaneyek û rehmek li bal Me we.´ Ev destûre hatiye
dan. 22 Lewma ew pê giran bû û wê xwe digel wî vekêşa ciheke dûr 23 û dema
ku êşa zanê, ew hajote bin qola darek xurmê, wê got, ´Xwezî pêş ewê da, ez
miri bam û li bêhişiyê da bîr kiriba!´ 24 Lê ew, li bin wê da gazî wê kir,
´Xemgîn nebe, Xwedanê te li bin te da cokek dabîn kiriye, 25 qola dara xurmê
bo aliyê xwe bihejîne, ew dê bo te xurmên taze geheştî biwerînît, 26 lewma
bixwe, vexwe û keyfxweş be û bêje her bimirekê ku tu dê bibînî ´Birastî min
belêniya rojiyekê daye Xwedanê rehmê û ez îro digel kesê napeyvim.´ 27 Paşê
wê, ew hilgirt bire naw netewa xwe da. Ewan got, ´Miryem! Bêguman te tiştek
gelek tirsnak kiriye! 28 Xweşka Harûn! Babê te mirovekê nebaş nebû û dayka te
jî dawên pîs nebû!´



a: Bi nîşane, bi îşare b: Jibo peyva Hicab min peyva Perjîn bikar înaye.

[29] Wê destê xwe dirêjî wî kir. Ewan got, ´Em çawa digel zarûkekê naw landkê
da bipeyvin?´ [30] Ew got, ´Ez koleyeke Xwe dê me, Vî nivîsîna pîroz daye min û
ez kirîme Pêşbîn [31] Vî ez pîroz kirîme, ez her derê bim. Vî tembî li min kiriye
ku nûbêja bikem û xêra bidem, taku ez bijîm [32] xizmeta dayka xwe bikem. Vî
ez nekirime zordest û bêrehm. [33] Aştî li ser mine, di roja ku ez dayîk bûme û di
roja ku ez dê bimrim û di roja ku carek dî ez dê zindî bême rakirin.´ [34] Eweye
Îsa kurê Miryemê, gotinek rast ku ew li ser da gengeşê diken [35] ew bo Xwe dê
nabît ku kurek hebît. Ev paye bilide, dema ku Ev destûrekê radgehînît, Ev tenê
dibêjîtê, ´Bibe´ û ev heye. [36] ´Birastî Xwe dê Xwedanê mine û Xwedanê we ye,
lewma Vî biperestin, eve rêyeke raste.´ [37] Lê komên, li naw ewan da nakokî
hene. Lewma heware li ewên nebawer li dîtina Roja gelek mezin!
[38] Ew dê çawa bibînin û bibhên, roja ku ew dê bêne bal Me, çimkî ewên
nerastkar îro bi aşkera di şaşiyê da ne! [39] Ewan li Roja peşîmaniyê agahdar
bike, dema ku dê destûr li ser mijarê bête ragehandin, çimkî ew bê agahin û ew
bawer naken. [40] Birastî Em in, ku dê bibine Xwedanê erdê û ewên li ser dane,
ew dê bizvrine bal Me. [41] Di nivîsîna pîroz da bîranîna Ibrahîm bike. Birastî ew
mêrê rastiyê û pêşbînek bû. [42] Dema ew gote babê xwe, ´Babo, çima tu
koletiya ewê dikey ku ne dikarît bibhêt, ne bibînît nejî dikarît çi behreyekê
bidete te? [43] Babo, birastî zanista ku bo min hatiye, ew bo te nehatiye, lewma
peyrevî li min bike, ez dê te rênivîniyê reyek serast bikem. [44] Babo koletiya
Şeytan neke, birastî Şeytan peyrevî li Xwedanê rehmê naket. [45] Babo, birastî ez
ditirsim ku li bal Xwedanê rehmê we sizayek li te bidet, lewma tu dê bibye
´hevalê´ Şeytan.´ [46] Wî got, ´Ibrahîm, kerbê te li xwedêyên min divebît?
Bêguman eger tu nerawestî, bêguman ez dê te kevirbaran bikem. Lewma bo
demek dirêj li min dûr bikeve!´[47] Wî got, ´Aştî li ser te bît, ez dê li ber Xwedanê
xwe bipariyêm ku li te bibhorît, Ev her dem digel min başe, [48] ez dê te û ewên
ku tu li kêlek Xwe dê, da li ber ewan dipariyê bicih bihêlim û ez dê li ber
Xwedanê xwe bipariyêm. Ez li pariyana xwe bêhêvî nabim. Xwedanê min
bêrehm nîne.´ [49] Lewma dema ku wî, ew û ewên ku wan li kêleka Xwe dê, da
koletiya wan dikir bicih hêlan, Me Ishaq û Yeqûb dane wî û her yêk li wan jî
kire Pêşbîn[a]. [50] Me rehma xwe da ewan û nav û dengê wan baş û bilind kir.
[51] Di nivîsîna pîroz da bîranîna Mûsa jî bike. Birastî ew hatibû hilbijartin, ew
peyamber û Pêşbîn bû. [52] Me li aliyê çiya da gazî wî kir û li aliyê rastê da ew
îna nêzîk bo civînê. [53] Li rehma Xwe Me Harûn ê birayê wî, weke Pêşbîn da
wî. [54] Di nivîsîna pîroz da bîranîna Ismaîl jî bike. Birastî ew digel belêniya xwe
rast bû, ew peyamber û Pêşbîn bû. [55] Wî destûr dida binemala xwe ku nûbêja
biken, xêra biden û li bal Xwedanê xwe xweşevîst bû.



a: Jibo peyva Nebî min Pêşbîn bikar înaye.

56 Di nivîsîna pîroz da bîranîna Idrîs jî bike. Birastî ew pêşbînek rastbêj bû.
57 Me ew bo pileyek serê bilind kir. 58 Ewane ew Peşbîn bûn ku li naw Pêşbîna
da Xwe dê erênî dabû ewan, li paşketiyên A Dem û li ewên ku Me li ser
gemiyê da digel Nûh hilgirtin û ewên li paşketiyên Ibrahîm û Israîl û li ewên ku
Me rênivînî kirin û hilbijartin. Dema ku eşkereyên Xwedanê rehmê bo wan
hatine xwandin, ew ketine ser çokê xwe, serê xwe nivandin û giriyan,
59 lê li paş ewan da, cêgir hatin ku xemsarî li nûbêjên xwe kirin û peyrevî li
dilbijînê[a] kirin. Lewma ew dê bi zûyî nebaşiyê bibînin. 60 Xêncî ewên ku
peşîman bûn bawer kirin û karên durust kirin, bes ew dê biçine naw baxçe û çi
nerastî li ewan nayête kirinê, 61 baxçeyên şadiya bêpayan ku Xwedanê rehmê,
belêniya wan daye koleyên Xwe ku li wir nînin. Birastî belêniya Vî dê bête cih.
62 Di wêderê da, xêncî aştiyê ew gotûbêja nebaş nabhên, wêderê da, dê sibêdê
û êvar dê xwarinê bidene wan. 63 Ewe baxçeye ku Em dê mîrat bidene ew
koleyê Xwe ku hişyarê Vî ye. 64 Em nayêne xarê, xêncî bi destûra Xwedanê te
nebît, ewa li pêşya me da û ewa li dû me da û ewa li nawberê da, ya Vî ye û
Xwedanê te çi cara li bîr naket. 65 Xwedanê asimana erdê û ewa li nawberê da
ye, lewma Vî bipereste, li perestîna Vî da berdewam be. Meger hûn yêke weka
Vî nas diken? ´ 66 Mirov dibêjît, ´Dema ez mirim, carek dîke ez dê bême
vejandin?´ 67 Lê nayête bîra mirov ku Me ew afirandin, dema ku pêşta ew
çinebûn? 68 Bi Xwedanê te, Em dê ewan û şeytana kom kene ser hev û paşê li
ser çoka ewan bînine dora cehnmê. 69 Paşê Em dê li naw her mezhebekê da,
ewên herî serhildêr li dijî Xwedanê rehmê rakêşine derê 70 paşê bêguman Emin
ku bêhtir nas diken, ewên ku zêde hêjayê wêne ku têda bişewtin 71 û jibo we
nîne, lê li ser da derbaz bin, ew li ser Xwedanê we ye ku bêguman rabigehînît.
72 Paşê Em dê ewên ku hişyarê Vî ne rizgar biken û ewên nerastkar bihêline
wêderê da, li ser çoka. 73 Dema ku eşkereyên Me, bi zelali bo wan têne
xwandin, ewên nebawer dibêjine ewên ku bawer kirî,´Kîjan alî ciheke bêhtir
heye û pêwendiyên baştir hene?´ 74 Çend nifiş li pêş ewan da Me li nav birin,
ewên ku li mal û ciwaniyê da, li ewan baştir hebûn! 75 Bêje ´Her kesê li şaşiyê
daye, bêguman Xwedanê rehmê dê bo ew zêde dirêj biket, ta dema ku ew dê
bibînin çi belêniyek dabûne wan, yan siza yanjî Demjimêr. Paşê ew dê bizanin
kanê kê li cihek nebaş daye û şervanên bêhêz hene.´
76 Lê Xwe dê rênivîniya zêdetir didete ewên ku rênivîniyê dipejirînin. Li bal
Xwedanê te kiryarên başê mayinde bêhtirin û padaşê baştir dizvrînin. 77 Paşê
te ew dîtiye ku bawerî bi eşkereyên Me nekir û got, ´Bêguman dê heyî û zarûk
bi min bêne dan?´ 78 Meger ew zêndaye eva nedîtî yanjî belêniyek li Xwedanê
rehmê vergirtiye?

a: Şehwet

79 Na! Em dê, ewa ku ew dibêjît tomar biken û sizaya dirêja wî dirêjtir biken,
80 Em dê, ewa ku ew bas lê diket mîrat biben û ew dê bi tenê bête bal Me.
81 Ewan li kêleka Xwe dê, da xwedêyên dîke vergirtine ku hêzê bidete wan.
82 Ne, ew dê nikoliyê li perestîna ewan biken û ew dê li dijberî ewan derkevin.
83 Meger tu nabînî Me şeytan şandine ser nebawera ku bi han dana ewan han
diden. 84 Lewma li dijî wan lezê lê neke, Em tenê bo wan jimareyekê
dihejmêrin. 85 Roja ku Em dê ewên hişyar bicvînine bal Xwedanê Rehmê
86 û ewên tawankar tênî hajone cehnemê da, 87 kesê desthilata nawbêjvaniyê
çinabît, xêncî ewên ku digel Xwedanê Rehmê peyman girê dane. 88 Ew
dibêjin, ´Xwedanê Rehmê kurek heye´ 89 Çend tirsnake ew tişta ku hûn
dibêjin. 90 Wêderê da kêm dimînît hemû asiman bidiryên û erd ker bît û li ber
wêraniyê çiya biherifin 91 ku ew kurekê bi Xwedanê Rehmê we girê diden.
92 Ew kêrhatiyê Xwedanê Rehmê nîne ku bi Xwe kurekê wergrît. 93 Çi kes di
asimana û erdê da nîne ku weke kole neyête bal Xwedanê Rehmê.
94 Vî, ew jimare kirîne û pê jimara hejmartine 95 û li Roja Vejiyanê da hemû bi
tenê têne bal Vî. 96 Birastî Xwedanê Rehmê dê xweşevîstiyê bidete ewên ku
bawer kirîne û karên baş kirine. 97 Lewma Me, eve tenê bi zimanê te hêsan
kiriye, belke li ber hindê tu mizgîniyê bideye ewên hişyar û agahdariyê bideye
neteweya dujmin. 98 Me çend nifiş li pêş ewan da li nav birîne! Meger tu niha
kesekê li wan nas dikey yanjî dengekê li wan dibhêy?

## 20. Para Ta Ha

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Ta Ha. 2 Me bo te Xwandin (Quran) neşande xarê ku te perîşan
biken 3 lê tenê weke bîranîn bo ewên ku ditirsin, 4 eşkereyek li bal Ev
ê ku erd û asimanên bilind afirandine, 5 Xwedanê rehmê, ser text
damezrayî. 6 Ewa li asimana û ewa li erdê da û ewa li nawberê da û
ewa li bin axê da ya Vî ye. 7 Eger tu bilind bêjî, birastî Ev nihêniyê
dizanît û ewa zêdetir weşartî. 8 Xwe dê, çi xwedê nînin bes Ev nebît,
navên herî baş yê Vî ne. 9 Meger serhata Mûsa bo te hatiye?
10 Dema wî agirek dît, paşê gote binemala xwe, ´Wêderê rawestin,
birastî min bi agirekê zaniye, belke ez li wê bo we çirûskekê bînim,
yanjî li agir da rênivîniyê peyda kem.´ 11 Paşê ew hate vê, gazî wî hate
kirin ´Mûsa! 12 Birastî ez Xwedanê te me. Lewma solikê xwe bêxe,
birastî tu di gelyê pîrozê Tuwa dayî. 13 Min tu hilbijartî, lewma guhê
xwe bide eva ku eşkere dibît. 14 Birastî Ez Xwe dê me, çi xwedê nînin
bes Ez nebim, lewma Min bipereste, nûbêjê bike bila tu Min bîr bînî.
15 Birastî Demjimêr têtin, Min hema hema[a] weşartiye, jibo ku her
rihek pêka xebata xwe padaşê wergirît. 16 Nehêle ew pêşgîriya te lê
biket, ewê ku bawerî pê naket û peyrevî li hestê xwe diket, bila tu li
nav neçî.´ 17 ´Mûsa, ew çiye di destê te yê rastê da?´ 18 Wî got ´Ew
kopalê mine, ez pala xwe didemê, pê pezê xwe dihajom û bo tiştê
dîke jî bikar tînim.´ 19 Ev got, ´Mûsa, havêje xarê.´ 20 Lewma wî
havête xarê, ew bûye marek ku bi lez xwe xoşand. 21 Vî got, ´ Bigre,
lê netirse, Em dê wê weka pêşta lê biken. 22 Destê xwe nêzîkê teniişta
xwe bike û ew dê sipî bête der, bêy ku zirarê bibînît, eve nîşaneyek
dîke. 23 Belke Em mezintrîn nîşaneyên xwe pêşanî te biden. 24 Here
bal Fireûn, birastî ew sînor bezandine.´ 25 Wî got, ´Xwedanê min, bo
min singê min fereh bike 26 û erkê min bo min hêsan bike 27 û girêya
ser zimanê min veke, 28 belke li ber hindê ew gotinê min têbigehin
29 û yarmetiderekê li binemala min bide min, 30 Harûnê birayê min,
31 di rêya wî da min bihêz bike. 32 Bihêle bila ew erkê min par veket
33 bila em zêdetir Te paye bilind biken 34 û zêdetir Te bîr bînin,
35 birastî Tu hemû dema me dibînî.´ 36 Ev got, ´Mûsa, bêguman
daxwaza te hate pejirandin. 37 Birastî, Me careke dîke jî qencî digel te
kiribû. 38 Dema ku Me sirûş dabû dayka te, ev sirûşe, 39 ´Ku wî danê
naw sandiqê da, paşê wî danê naw çem da. Bihêle bila çem bibete ser
lêwarê xwe û dijminê Min û wî dê ew biben.´ Min, evîna Xwe dana
ser te, belke tu li bin çavdêriya Min da bêye mezin kirin.



[a]: Bi tewawî neweşartiye.

[40] Dema xweşka te ço û got ´Ez yêkê pêşanî we bidem ku nojdariya
wî biket?´ Bi wî awayî Me tu zivrandiye bal dayka te ku ew çavên wê
fênik biket û ew xemgîn nebît. Paşê te rihek kuşt, lê Me tu li
xemgêniyê rizgar kirî û Me tu bi ezmûnê taqî kirî. Paşê tu bi sala li
naw netewa Med da may. Mûsa paşê tu li dema destnîşan kirî da
hatî. [41] Min, bo Xwe tu hilbijartî. [42] Tu û birayê xwe herin, bi
nîşaneyên Min û li bîranîna Min da bê xîretiyê neken. [43] Hûn herduk
herine bal Fireûn, birastî ew sînor bezandine. [44] Gotinek nerm bêje
wî, belke li ber hindê bîra wî bimînît, yanjî bitrsîyêt.´ [45] Ewan got,
´Xwedanê me, birastî em ditirsiyên ku ew li dijî me lezê lê biket yanjî
sînora bibezînît.´[46] Vî got, ´Netirsin, birastî Ez digel we herdu ya da
me, Ez dibhêm û Ez dibînim. [47] Lewma herine bal wî û bêjinê,
´Birastî em peyamberên Xwedanê te ne, lewma zarûkên Israîl digel
me rêke û ewan eşkence nede. Her wisa em pê nîşaneyekê li bal
Xwedanê te ra hatine bal te. Dê aştî li ser ew kes bît ku peyrevî li
rênivîniyê diket.
[48] Birastî ew bo me hatiye eşkere kirin ku dê siza bikevîte ser her
kesekê ku bawer neket û pişta xwe bidetê.´ [49] Wî got, ´Mûsa, Ev
Xwedanê we kêye? ´ [50] Wî got, ´Xwedanê me, Ev e ku şêweya hemû
tiştî dayê da, paşê rênivînî kir.´ [51] Wî got, ´Çarenûsa nifşên berê
çiye?´ [52] Wî got, ´Xwedanê min tenê li ser wan zanist heye, li
tomarekê da, Xwedanê min ne şaşiyê diket nejî li bîr diket.´ [53] Eve
ku erd bo we kiriye mangeh û bo we rê danane ser da û li asiman ra
av şande xarê, paşê Me pê wê cotê gihayên[a] ciyawaz derêxistin,
[54] bixwen û ajelên xwe yên kevî biçerînin. Birastî li evê da bo ewên
xwedan têgeheştin nîşane hene. [55] Me hûn li ewê afirandine û Em dê
we bizvrîne têda û Em dê carek dîke we têda derêxin. [56] Bêguman
Me hemû nîşaneyên Xwe pêşanî wî dan, lê wî bawer nekirin û
nepejirandin. [57] Wî got, ´Mûsa, meger tu hatî pê cadûyê xwe, me li
welatê me bikeye der?´[58] Bêguman Em dê cadûyek weka wê jibo te
berhem bînin, lewma li nawbera me û li nawbera we da hevdîtinekê
çêke ku ne, em nekarin bicih neynin, nejî hûn nekarin bicih neynin,
ciheke wekhev da.´ [59] Wî got, ´Hevdîtina we dê li roja xemlandî da
bît, dema ku pêş nîvro da mirov kom dibin.´ [60] Fireûn wêda ço û
bernameya kiryara xwe darêşt, paşê ew hat. [61] Mûsa gote wan,
´Hewar li we, li dijî Xwe dê direwa berhem neynin, nexa Ev dê pê
sizaya Xwe we li nav bibet. Bêguman ewê ku berhem bînît dê şikestê
bixwet.´ [62] Paşê ewan li ser bernameya xwe li nawbera xwe da
gengeşe kirin û ciwîna xwe ya nihênî weşartin. [63] Ewan got, ´Birastî
ew her du cadûgerin. Ew dixwazin pê cadûyên xwe, we li welatê we
bidene der kirin û dawiyê bi rêbaza jiyana we ya birûmet bînin.

a: Rûwek, ewa li ser erdê şîn dibît, giya

64 Lewma, bernama kiryara xwe serûber biken û paşê li rêzekê da
werin. Bêguman her kesê îro bibet, ew dê serkevît.´ 65 Ewan got,
´Mûsa yan tu havêje yanjî em ewlî havêjin?´ 66 Wî got, ´Ne hûn
havêjin, paşê bi rêya cadûya wan, ber çavên wî wisa xûya dikir ku
bendik û kopalên wan dibzivîn. 67 Mûsa di naw xweda tirsiya bû,
68 Me got, ´Netirse, birastî tu serdestî. 69 Ewa li destê te yê rastê daye
havêje, ew dê qurt biket, ewa ku wan berhem înaye. Ewan tenê lêbê
cadûgera berhem înayne û cadûger ser nakevît her cihekê ew hatê.´
70 Lewma cadûgera çokê xwe danandin û serê xwe nivandin û goting
´Em bawer bi Xwedanê Harûn û Mûsa diken.´ 71 Wî got,´Hûn
bawerî bi wî diken, pêş ku ez destûr bideme we? Birastî ew mezinê we
ye. Ewê ku hûn fêrî cadûgeriyê kirine. Bêguman ez dê dest û pêyê we
kitan gohor bibrim, paşê we li ser qola dara xurmê li xaçê bidem.
Bêguman hûn dê hingê bizanin kanê sizaya kîjan li me dijwartir û
dirêjtire.´ 72 Ewan got, ´Em çi cara te li serwey nîşaneya zelal ku bo
me hatiye pesend naken, nejî serwey Ev ê ku em afirandine. Li ber
hindê biryarê bide, her biryarekê tu dê bide, tu dê tenê bikarî biryarê
li ser jiyana ev dinyayê bidey. 73 Birastî em bawerî bi Xwedanê xwe
diken, belke Ev li gunehên me û ew cadûgeriya ku te zor li me kir ku
em taqî biken xweş bît, Xwe dê Bêhtir û Mayîndetire.´ 74 Birastî her
kesê ku weke tawankar bête bal Xwedanê xwe, birastî ew dê cehnem
hebît, ne ew dê têda bijît nejî dê bimrît. 75 Lê her kesê weke
bawermend hate bal Vî ku kiryarên baş kiribûn, ewan dê bilindtrîn
paye hebin, 76 baxçeyên şadiya bêpayan ku li bin wan da çem
diherikin û ew dê ta bêdawiyê li wir bimînin. Eweye padaşê ewên ku
xwe pak diken. 77 Bêguman Me sirûş da Mûsa, ´Şevê digel koleyên
Min da here û li naw deryayê da bo wan rêkek hişik lêde. Tu li
girtinê natirsî, nejî bitirse.´ 78 Fireûn pê şervanên xwe li dû ewan da
ço, lê ser ewan da girt ava deryayê, ewa ku ser wan da girt.
79 Fireûn neteweya xwe li rê derêxist, rênivînî nekirin. 80 Zarûkên
Israîl, bêguman Me hûn li dijminê we rizgar kirin. Li destê rastê ser
jêheliyê da, Me digel we peyman girê da. Me jibo we mena[a] û
herwêde[b] şandine xarê, 81 ´Bixwen li ew tiştên baş ku Me ji bo we
dabîn kirîne, lê wêderê sînora nebezînin, bila kerbê Min li ser weda
neyête xarê. Herkesê ku kerbê Min li ser da hatî, bêguman ketiye.
82 Lê birastî Ez herî lêbihorim bo her kesê ku peşîman dibît û bawer
diket, karên durust diket û rêniwînî kirî dimînin.´ 83 ´Mûsa, çi wel te
kir ku tu lezê li neteweya xwe bikey?´ 84 Wî got, ´Ew bi nêzîkî şûn
pêyê min dişopînin. Ez bi lezgînî hatime bal Te, Xwedanê min, ku
Tu keyfxweş bî.´

a: Xwarinek wek nan
b: Balindeyek biçûke, weke kevê!

85 Vî got, ´ Lê birastî paş te, Me neteweya te taqî kir, Samirî ew li rê
derêxistine.´ 86 Mûsa zivriye bal neteweya xwe, tûre û xemgîn wî got,
´Neteweya min, meger Xwedanê we belêniyek baş neda we? Meger
belênî bo we dirêj bû yanjî we xwast kerbê Xwedanê we li ser we da
bikevît lewma we peymana xwe şikand?´ 87 Ewan got, ´Me bi dilê
xwe peymana digel te neşkand. Lê wel me kirin ku em barê
cewherên[a] netewê helgirin, lewma me havêtinê[b] û her wisa Samirî jî
havêtê,´ 88 lê wî, laşê golikekê bo ewan lê berhem îna, ewê dengê
orênê diderêxist û ewan got, ´Ewe xwedêyê we û xwedêyê Mûsa ye,
lê wî ji bîr kiriye.´ 89 Meger paşê ewan nedît ku ew bo wan çi peyva
nazvrînît û wê desthilat nîne ku çi zirar yanjî çi qazancê li wan bidet?
90 Bêguman Harûn pêşta gotibû wan, ´Neteweya min, hûn tenê pê
wê têne taqî kirin, birastî Xwedanê we Xwedanê Rehmê ye, lewma
min bişopînin û peyrevî li destûrê min biken.´ 91 Ewan gotibû, ´Em
waz li xwe sipartin bi wê naynina taku Mûsa dizvrîte bal me.´ 92 Wî
got, ´Harûn, dema te dît ew li rê derketine, çi rêka te girt 93 ku tu
peyrevî li min nekey, bes te peyrevî li destûrên min nekiriye?´ 94 Wî
got ´Kurê dayka min, negire rêdîna min yanjî pirça min! Birastî ez
tirsiyam ku tu dê bêjî, ´Tu bûye hokarê duberekiyê li nawbera
zarûkên Israîl û tu çavnihêrê gotina min nemay.´ 95 Wî got, ´Samirî,
pirsgrêka te bû?´ 96 Wî got, ´Min dît ewa ku wan têda nedît, lewma
min mistek li kerxa[c] peyamber rakir û paşê ew havêt, riha min bi ew
rêbazê pêşniyarê min kir.´ 97 Wî got ´Bes here! Birastî jibo te ye li ev
dinyayê da ku tu dê bêjî, ´Destê xwe nedê´ Birastî te hevdîtinek heye
ku tu çi cara nikarî lê birewî. Zênde xwedê xwe ku te xwe sipartiyê
da, bêguman em dê wê bişewtînin, paşê, bêguman em dê pirtikê wê
belav kene naw deryayê da. 98 Tenê Xwe dê te Xwe dê ye. Çi xwedê
nînin bes Ev nebît. Ev hemû tişta bi zanist dorpêç diket.´
99 Bi ew rêbazê Em dibêjine te ku pêşta çi rû dabû. Bêguman Me li
bal Xwe ra bîranînek daye te. 100 Her kesê ku rûyê xwe lê bizvrînît,
bêguman dê li Roja Vejiyanê da barekê hilgrît 101 ta bêdawiyê ew dê
têda da bimînît. Di Roja Vejiyanê da barek bo ewan nebaşe!
102 Roja ku dê zirna bête pif kirin û Em dê ewên tawankar û kore
kom biken, 103 ew li nawbera xwe da piste pistê diken,´Birastî tu mayî
xêncî deh.´ 104 Em, dizanin ku ew dê çi bêjin, dema mînaka wan li
rêbazê da dê bêjît, ´Birastî tu mayî xêncî rojekê.´105 Û Sebaret bi
çiyaya ew li te dipirsin, lewma bêje ´Xwedanê min dê pif kete pirtikê
wê´ 106 Paşê Ev dê cihek serast bihêlît, 107 hûn têda çi xar û xêçiyê
nabînin.



a: Zêr û zîv b: havêtine naw agir da ku bihelînin. c: dews, şûmpê, şop

108 Di wê Rojê da, ew dê peyrevî li gazîker biken, çi xarî têda nîne û
deng dê li ber Xwedanê Rehmê bipariyên, lewam tu nabihêy xêncî
dengek nizim. 109 Di wê Rojê da, çi qazanc nagehînît nawbêjvan,
xêncî ewên ku Xwedanê Rehmê destûr daye wan û Ev peyvek bo wî
pejirandiye 110 Ev dizanît ku çi li pêşî û çi li pişt ewane, lê ew pê
zanistê dorpêç naken 111 û rûmet dê li pêşberî Ev ê herdem Zindî
bêne ûstî xar kirin. Bêguman ewên ku nerastî hilgirtine dê bikevin.
112 Lê ewê ku kiryarên durust diket dema ku ew bawermende, paşê
ew li bêdadiyê natrsît nejî li hejariyê.´ 113 Bi vê rêkê Me, ev Xwandina
(Qurana) Erebî şandiye xarê û Me têda şiroveya hereşê kiriye, belke li
ber hindê ew hişyar bin yanjî bibîte hokarê bîranîna wan.114 Lewma
Xwe dê gelek bilinde, Padişahê rast. Pê Xwandinê (Quranê) lezê lê
neke, pêş ku sirûşa vê jibo te tewaw bît. Bêje ´Xwedanê min zanista
min zêde bike!´ 115 Me, pêş te da, peyman digel A Dem jî girêdabû, lê
wî ji bîr kir û Me pêdagirî li wî da nedît. 116 Dema ku Me gote firişta,
´Çokê xwe li ber A Dem danên û serê xwe binvînin,´ Ewan çokê xwe
danan û serê xwe nivandin. Xêncî Iblîs, wî nepejirand 117 paşê Me
got, ´A Dem, birastî ewe dijminê te û jina te ye, lewma bila ne ew, we
li baxçe da bikete der. Çimkî hûn dê janê bikêşin 118 Birastî hûn li
naw da, çi cara birsî nabin, nejî hûn dê rût bin, 119 birastî hûn lêrê da
tênî nabin, nejî dê têna rojê li we bidet.´ 120 Paşê Şeytan pistepist digel
da kir. Wî got ´A Dem, gelo ez te raste rêyê dara bêdawiyê û
padişahiya ku çi cara li nav naçît bikem?´ 121 Paşê her duya li wê
xwarin. Lewma şerma wan li wan aşkira bû û dest pê kirin pelgên
baxçe bi xwe girê den. A Dem serpêçî li Xwedanê xwe kirbû û li rê
derketibû. 122 Paşê Xwedanê wî, ew hilbijartibû û zivrîbûye aliyê wî û
rênivînî kirbû. 123 Vî got ´Hûn hemû lê herine xarê, hindek li we
dujminê ewê dîke ne.´ Lê eger paşê li bal Min we bo te rênivînî bêt,
paşê herkesê peyrevî li rênivîniya Min biket, paşê ew li rêkê
naderkevît nejî dê janê bikêşît, 124 lê herkesê rûyê xwe li bîranîna Min
bizvrînît, birastî paşê ew kes dê jiyaneke gelek bi dijwarî hebît û Em
dê ew kes kore bînine kombûna Roja Vejiyanê da 125 û ew dê bêjît,
´Xwedanê min, Te çima ez kore rakirme, dema ku min didît!?´
126 Ev dêbêjît, ´Çimkî nîşaneyên Me jibo te hatin, lê te li bîr kirin,
liber hindê îro tu dê bêy li bîr kirin.´ 127 Bi wî awayî Em padaş didene
ewên ku sînora dibezînin û bawerî bi nîşaneyên Xwedanê xwe naken
û sizaya di Dawiyê da dijwartir û mayendetire.

128 Bes evê, ew rênivînî nekirîne!? Me çend nifşên li pêş ewan da li
nav birine, ew li naw awahiyên wan da digerên? Birastî li evê da, bo
her kesê xwedan hiş nîşane hene! 129 Eger li ber gotinek pêşta lê
derbaz bûyî li bal Xwedanê te neba, bêguman dema dîhar kirî dê
biba erk, 130 lewma digel ewa ku dibêjin bêhin fereh be, pêş rojhela û
rojava yê pê pesna paye bilindiya Xwedanê xwe rabigehîne û di
demên şevê da jî paye bilind bike û li der dorê rojê da jî, belke li ber
hindê tu dilxweş bî 131 û çavê xwe li ewa ku Me bo xweşiyê daye cotê
wan negêre, jiyana dinyayê ciwane ku Em, ewan têda taqî diken, lê
debara Xwedanê te bêhtir û mayindetire.132 Destûrê bide binemala
xwe ku nûbêja biken û têda bêhin fereh be. Em debara li te
naxwazin. Em debara didene te û dawî bo ewên hişyare. 133 Ew
dibêjin, ´Çima ew li bal Xwedanê xwe ra bo me nîşaneyekê naynît?´
Meger belge bi wan nehatine dan ku çi di nivîsînên pîrozê pêşta da
bûn? 134 Eger pêş wî da, Me bi rêya sizayê ew li nav birban, bêguman
ewan dê gotiba, ´Xwedanê me, Te çima bo me peyamberek neşand
ku me karîba peyrevî li nîşaneyên Te biken, pêş ku em hatibana
serşor û siwik kirin! 135 Bêje her kesê ku çavnihêre bila çavnihêr bît,
paşê tu dê bizanî kanê kê hevrêyê rêya seraste û kê hatiye rênivînî
kirin.

## 21. Para Pêşbîna

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Lêpirsîna mirova nêzîk bûye, hêşta jî ew bêagahin û rûyê xwe lê dizvrînin,
2 Bîranînek taze li bal Xwedanê wan ra bo wan nayêt, xêncî wê ku ew guhê
xwe didenê, dema ku ew dileyîzin, 3 pê dilên hiş belaw û ew gotubêja nehênî
diweşêrin ´Ewên nerastkar, meger eve[a] xêncî bimirekê weke we bixwe nîne?
Lewma hûn dê li cadûyê nêzîk bin dema ku hûn dibînin?´ 4 Wî got, ´Xwedanê
min gotina li asimana û erdê da dizanît û Ev Bihîstine Zanîne.´ 5 Ne, ew
dibêjin, ´Xewnê alozin, ne wî bixwe berhem înaye, ne ew helbestvane, bihêle
bila ew bo me nîşaneyekê bînît, weka ewên pêşta hatibûne şandin.´ 6 Hîç şarekê
ku li pêş ewan da Me wêran kirin bawer nekirbûn. Lewma ew dê li ber hindê
bawer biken? 7 Me pêş te neşandin, xêncî mêra ku Me sirûş dabû wan, lewma
li mirovên bîranînê bipirse eger tu nizanî 8 Me bo wan beden çê nekirin ku
xwarin nedixwarin, nejî ew nemir bûn. 9 Paşê Me belêniya wan bicih îna û
ewên ku Me dixwastin Me rizgar kirin û ewên ku sînor bezandin, li nav birin.
10 Birastî Me bo te nivîsînek pîroz şandiye xarê ku têda amaje bi te hatiye kirin
paşê tu hizra xwe bikar naynî? 11Me çend şar pirt pirt kirin ku bêdad bûn û paş
wan neteweyek dîke berhem îna! 12 Paşê dema ku ewan hest bi eşkenceya Me
kir, lêbinêre ku ew çawa lê direwiyan! 13 ´Nerewin, lê bizvirine ew cihê ku
xweşî dabûne we û malên we, belke li ber hindê lêpirsîn li we bête kirin.´
14 Ewan got, ´Hewar li me! Birastî em nerastkar bûn!´ 15 Paşê ev pariyana wan
nerawesta, taku Me ew kirine pûşê hişik. 16 Me hemû asiman, erd û hemû tiştê
li nawbera wan da di leyîzê[b] da ne afirandin. 17 Eger Me daxwaza dem derbaz
kirinê kiriba, bêguman Me dê karîba li naw xwe da peyda biken, eger Me wisa
kirba.
18 Na! Em rastiyê dihavêjine direwê û ev serê wê dişkînît, binêrin ew çawa
wenda dibît! Li te heware bo ewa ku tu pênase dikey! 19 Hemû ewên li asimana
û erdê da yê Vî ne û ewên ku nêzîk Vî ne qude nînin ku Vî biperestin, nejî ew
lê diwestiyên, 20 ew bê mandî bûn bi şev û roj Vî paye bilind diken. 21 Meger
ewan li erdê xwedê wergirtine ku divejînin? 22 Eger li herdu ya da jî li kêlek
Xwe dê da xwedê heban bêguman ew dê genî ban, li ber hindê Xwe dê paye
bilinde, Xwedanê textê çi pênase diken. 23 Nabît lêpirsîn li Vî bête kirin,
sebaret bi eva ku Ev diket, lê dê lêpirsîn li ewan bête kirin.

a: Mihemed peyamber
b: Bo leyîzê, dem derbaz kirin, bêhna xwe pê înan.

[24] Yanjî ewan li kêlek Vî da xwedêyên dîke wergirtine? Bêje, ´Belgeyên xwe
bînin. Eve bîranîneke bo ewên ku digel minin û bîranîneke bo ewên li pêş
min.´ Lê piraniya wan rastiyê nizanin, lewma ew pişta xwe didenê.
[25] Me pêş te da çi peyamber neşandin, xêncî ku Em sirûşê bidene wî
´Çi xwedê nînin, xêncî Min, lewma Min bipereste´ [26] Û ew dibêjin, ´Xwedanê
Rehmê kurek vergirtiye.´ Ev paye bilinde! Ne, koleyên birûmetin, [27] ew pêş
gotina Vî nakevin û ew bi destûra Vî kar diken. [28] Ev dizanît ku çi li pêşiya
wane û çi li pişt wane û ew nawbêjvaniyê naken, xêncî bo ewê ku Ev dipejrînît,
ew li tirsê Vî da sersam radwestin. [29] Eger her kesek li wan bêjît
´Birastî ez xwedê me, li kêleka Vî da,´ Ewê wisa Me dê padaşê cehnemê
dabayê, bi wî awayî Em padaş didene nerastkara. [30] Meger ewên nebawer li
ber çav nagirin ku hemû asiman û erd pêkve bûn, paşê Me ew li hevdu cuda
kirin û Me hemû tiştê zindî li avê çêkir? Bes ew bawer naken? [31] Û Me çiyayên
qahîm danane ser erdê, neket ku digel ewan da bihejiyêt û Me rêkên pan li ser
da çêkirin, belke li ber hindê, ew bêne rênivînî kirin [32] û Me asiman kire banek
parastî, lê ew rûyê xwe li nîşaneyên Me dizvrînin. [33] Ev e ku şev û roj
afirandine, roj û heyv, her yêk li ser hêla xwe da dizvrît. [34] Me, nemirî neda çi
bimirên pêş te da jî, lewma eger tu bimrî, ew dê nemir bin? [35] Hemû rihek dê
mirinê tam biket Em te bi ezmûna nebaş û baş taqî diken û hûn dê hemû
vegerêne bal Me. [36] Dema ewên ku bawer naken te bibînin, ew te wernagirin
xêncî bi henek nebît ´Eweye ku basê xwedêyên we diket?´ Ew bawerî pi
bîranîna Xwedanê Rehmê naken. [37] Mirov li lezê hatibû çêkirin, Ez dê
nîşaneyên Xwe pêşanî te bidem, li ber hindê, bi bêhin çikî li Min nexwaze ku
bilezînim. [38] Ew dibêjin, ´Ew belêniye kengê ye, eger tu rast bêjî?´
[39] Eger ewên bawer nekirî bes zanî ban, Dem, ew gave ku ew dê nekarin agir li
rûmet yanjî li pişta xwe vemirînin û yarmetiya ewan nayê kirin. [40] Ne, ew dê
nişkida bo wan bêt û ewan gêj biket, paşê ew dê nekarin paşve biden, nejî dê
derfet bi wan bête dan. [41] Henek bi peyamberên pêş te da jî hatibû kirin, paşê
ewên ku trane kirbûn hatibûne dorpêç kirin, bi heman ew tişta ku wan henek
pê kirbû. [42] Bêje, ´Kê bi şevê û bi rojê te li Xwedanê Rehmê diparêzît?´ Hêşta
jî, ew li bîranîna Xwedanê xwe rûyê xwe dizvrînin. [43] Meger ewan xwedê hene
ku dê ewan li Me biparêzin? Ew nikarin yarmetiya xwe biken, nejî ew dikarin li
Me bêne parastin. [44] Lê Me tiştên baş bo ewane û berebabên wan dabîn kirin
taku jiyana wan dirêj bû. Meger ew nabînin ku Em têne ser erdê û li tenişta ra
diqermçînin. Lewma meger ew dê ser bikevin? [45] Bêje, ´Ez tenê li rêya sirûşa
ra agahdariyê dideme we. Lê ewên ker gaziyê nabihên, dema ku ew têne
agahdar kirin.

46 Eger tenê pifek sizaya Xwedanê te li wan bidet, bêguman ew dê bigiryên,
´Hewar li me, birastî em nerastkar bûne!´ 47 Bo Roja Vejiyanê Me pîvanên
dadmendiyê damezrandine, liber hindê, bêdadî li hîç rihekê neyête kirin,
tenanet eger hindî giraniya dindika xerdelê jî bît, Em dê bînine der, Em bo
hisabê têrê hene. 48 Me cudaker[a] dabû Mûsa û Harûn û ronahiyek û bîranînek,
bo ewên hişyar 49 Ewên ku li Xwedanê xwe, li neditiyê da ditirsin û sersamê
Demjimêrê ne, 50 eve bîranîneke pîroze ku Me şandiye xarê. Paşê tu evê
napejrînî? 51 Bêguman Me dadweriya serast pêşta da Ibrahîm û Me ew nas
dikir. 52 Dema wî gote bab û netewa xwe, ´Ew wênane[b] çine ku hûn xwe
dispêrinê?´ 53 Ewan got,´Me berebabên xwe dîtin ku ew diperestîn.´ 54 Wî got,
´Bêguman hûn û berebabên xwe bi aşkira li rê derketine.´ 55 Ewan got, ´Meger
tu pê rastiyê hatî bal me yanjî tu li ewanî ku yariya diken?´ 56 Wî got, ´Ne!
Xwedanê we, Xwedanê asimana û erdê ye, Ev e ku ew afirandine û li ser ewê,
ez li gewaha me. 57 Bi Xwe dê bêguman ez dê bernameyekê bo potê we
darêjim, paş ku hûn pişta xwe bidenê û biçin. 58 Lewma wî, hemû hûr hûr
kirin, xêncî ewê herî mezin li naw ewan da, li ber hindê belke ew bo bizvrin.
59 Ewan got, ´Kê ewe digel xwedêyên me kiriye? Birastî ew li nerastkara ye!´
60 Ewan got, ´Me bihîst, lawekê ku dibêjinê Ibrahîm, sebaret bi wan dipeyvî.´
61 Ewan got, ´Bes ew bînine pêş çavê mirova, belke liber hindê gewahiyê
biden.´ 62 Ewan got, ´Ibrahîm, te ewe digel xwedêyên me kiriye?´ 63 Wî got,
´Na, ewê mezinê wan we kiriye, aha ewi. Lewma li wan bipirsin, eger ew
dipeyvin.´ 64 Lewma ew, li xwe zivrîn û gotin, ´Birastî tu nerastkarî´
65 Paşê ewan serê xwe şor kirin û gotin,´Bêguman tu dizanî ewane napeyvin.´
66 Wî got, ´Bes hûn li kêlek Xwe dê da, ewa ku ne qazancekê li we didet, nejî
zirarê biperestin? 67 Of bo we û ewa hûn li kêlek Xwe dê, da diperestin. Paşê
hûn hizra xwe bikar naynin?´ 68 Ewan got, ´Wî bişewtînin û yarmetiya
xwedêyên xwe biken, eger hûn dê biken.´ 69 Me got, ´Agir, bo Ibrahîm fênik û
ewleh be.´ 70 Ewan dixwast ku bernameyekê bo wî darêjin lê, Me wekir ku ew
bidorînin. 71 Me, ew û Lat rizgarî ew erd kirin ku Me bo hemû mirova pîroz
kiriye 72 û Me, Ishaq û Yeqûb zêde dane wî û Me hemû kirine durustkar.
73 Me, ew kirne rêber, ew pê destûra Me rênivînî dikirin û Me sirûş da wan ku
karên baş biken, nûbêja biken û xêra ku bo wan hatî destnîşan kirin biden[c],
ewan Em diperestîn. 74 Me, dadwerî û zanist da Lat û Me ew, li ew bajêr rizgar
kir ku kiryarên qirêj dikirin, birastî ew neteweyek nebaş bûn û bi pêdagrî serkêş
bûn! 75 Me, ew vergirte rehma Xwe, da, birastî ew li durustkar bû 76 û
Nûh, dema pêşta wî gazî kir, lewma Me bersiva wî da û Me, ew û binemala wî
li kerbek gelek mezin rizgar kirin 77 û Me, yarmetiya wî kir, li neteweya ku
bawerî bi nîşaneyên Me nekirbûn, birastî ew neteweyek nebaş bûn, lewma Me
hemû bi hewra xendiqandin.



a: Mebest nivîsîna pîroza Rênivîniyê (Torat)e ku rastî û nerastiyê li hev cuda diket.
b: şikil, eks, sûret

78 û dema ku Dawûd û Silêman sebaret bi zewiya neteweyekê dadwerî kirbûn,
dema pez çobûne naw da çerandibûn û Em gewahê dadweriya wan bûn 79 û
Me têgeheştina wê da Silêman, Me dadwerî û zanist dabû her yêk li wan. Me
çiya erkdar kirin ku digel Dawûd Me paye bilind biken û balinde jî, Me we
dikir 80 Me, ew fêr kir qapûtê asin çêket, bo te ku te li şerên te da biparêzît,
paşê tu sipasdar nabî? 81 Bi destûra Silêman ba bi xurtî dihatine erdê da, ku Me
pîroz kirbû. Me zanista hemû tişta heye 82 û li şeytana jî, ewên ku bo wî
melevaniyê biken û karên dîke jî di kêlekê da biken û Em parêzerê wan bûn.
83 Û Eyûb, dema ku wî gazî Xwedanê xwe kir, ´Birastî karesatê li min daye û
Tu birehmê birehmayî.´ 84 Lewma Me bersiva wî da û Me karesata wî wêda
bir û binemala wî dayê da, digel ewên weka wan, rehmekê li bal Me we û
bîranînek bo ewên ku diperestin 85 û Ismaîl, Idrîs û Zulkifl ew hemû bêhin
fereh bûn. 86 Me, ew vergirtine rehma Xwe, da, birastî ew durustkar bûn.
87 Û mêrê digel masiya mezin[a] da, dema ku ew tûre[b] ço, hizir dikir ku Em çi
cara li ser wî ra nagehînin, paşê ew li tarîtiyê da gazî kir, ´Çi xwedê nînin bes
Tu nebî, payebilindî bo Te ye, Birastî ez li nerastkara bûme.´ 88 Lewma Me
bersiva wî da û Me ew li xemê rizgar kir, bi ew rêbazê Em bawermenda rizgar
diken. 89 Û Zekerya, dema wî gazî Xwedanê xwe kir, ´Xwedanê min, min bi
tenê nehêle, dema ku Tu li bêhtrîn mîratgiray.´ 90 Lewma Me bersiva wî da û
Me Yehya da wî û Me jina wî derman kir, birastî ewan lez, li kirina karên baş
dikirin û bi hêvî û tirs li ber Me dipariyan û jibo Me ûstî-xar bûn. 91 Û ewa ku
dawêna xwe bi pakî parast. Me, li riha Xwe pif kire wê da û Me ew û kurê wê
bo hemû mirova kirine nîşane. 92 Birastî eve koka[c] te ye û koka te Yêke û Ez
Xwedanê te me, lewma Min bipereste. 93 Ewan destûra xwe li nawbera xwe da
parpar kirîne, ew dê hemû vegerêne bal Me. 94 Paşê her kesek karê durust
biket, dema ku ew bawermende, têkoşîna wî nayête nepejirandin, birastî Em
ewê tomar diken. 95 Û qedexe li ser ew şar ye ku Me li nav biriye û ew nazivrin,
96 û ta dema ku Cûc û Mecûc hatine berdan û li hemû bilindiya ser jorda
hatin, 97 dema ku belêniya rastî nêzîk bûye, paşê lê binêrin, dê çavên nebawera
li tirsa da zil bibînin, ´Hewar li me! Bêguman em li ewê bêagah bûne. Belê em
nerastkar bûn.´ 98 Birastî hûn û ewa hûn li kêleka Xwe dê, da diperestin, darin
bo sotinê li cehnemê da, hûn dê bêne têda 99 eger ew xwedê ban, ew dê
nehatibana têda û hemû dê, ta bêdawiyê têda bimînin. 100 Wêderê da, ew dê
binalin û ew li wêderê da nabihên. 101 Birastî, ewên ku li bal Me we bo wan
pêşta baş çoye, ew dê li wêderê dûr bêne ragirtin. 102 Ew mizemizêkê jî lê
nabihên û ew dê li wêda bin ku riha wan bêpayan dixwazît.



a: Ew peyamberê ku masiya mezin qurt kirbû. Yûnis peyamber!
b: bi kerb ço. c: Bin axe, dîn!

103 Ew li ber tirsa herî mezin xemgîn nabin, dê firişte ewan bibînin,´Ewe Roja
te ye ku belênî bi te hatibû dan!´104 Roja ku Em dê asiman bipêçin her wek ku
perê tênûsê dipêçin bo nivîsînê. Her weku ku Me, afirandina cara yêkê destpê
kiribû, Em dê dubare biken, belêniyeke li ser Me. Birastî, Em dê biken.
105 Bêguman Me, pêşta li Destûra nivîsî (Zebûrê) da niwîsî bû, piştî bîranînê,
´Koleyên Min yê durustkar dê erd bi mîrat biben.´ 106 Birastî li evê da bo
neteweya ku diperestît ragehandinek heye! 107 Me tu neşandî, xêncî rehmekê
bo hemû mirova. 108 Bêje, ´Tenê sirûş bi min hatiye dan ku xwedê we tenê
Xwe dê Yêke, lewma hûn dê xwe radestî Vî biken[a]?´ 109 Lê eger ew pişta xwe
bidenê, paşê bêje, ´Min bi wekhevî bo we ragehandiye. Ez nizanim, ew
belêniya ku bi we hatiye dan, nêzike yan dûre, 110 Birastî Ev dizanît ku çi li
gotinê hatiye ragehandin û Ev dizanît hûn çi diweşêrin. 111 Ez nizanim, belke
ew, bo we ezmûnek bît û keyfxweşiyek bo demekê.´ 112 Wî got, ´Xwedanê min,
pê rastiyê dadweriyê diket´ Û Xwedanê me Xwedanê rehmê ye, Ev ê ku em
yarmetiya Vî dixwazin, li dijî ewa ku hûn şirove diken.

a: Bibine Mosliman.

## 22. Para Hecê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Mirovino, hişyarê Xwedanê xwe bin, birastî erdheja Demjimêrê tiştek
gelek mezine. [2] Roja ku tu dê bibînî hemû ew daykên ku memik diden, dê li
bîr biken ewa ku memik didanê, hemû ewên pêgiran dê barê xwe havêjin,
tu dê bibînî ku mirov serxweşin, dema ku ew serxweş nînin, lê eşkenceya
Xwe dê gelek dijware. [3] Li naw mirova hene ku bê zanist sebaret bi Xwe dê
gengeşê diken û peyrevî li hemû şeytanên serkêş diken, [4] eve hatiye
ragehandin bo her kesê ku hevaletiya wî biket, paşê birastî ew dê wî li rê
derêxît û dê ew bo naw eşkenceya guriya bi çirûsik da rênivînî biket.
[5] Mirovino, eger we guman li Vejiyanê heye, birastî paşê Me hûn li tozê
afirandine, paşê li avikê, paşê li navikekê[a] ku pêve dimînît, paşê li kolmek
goşt, şêwe girtî û bê şêwe, ku belke Em bo we zelal biken. Em dibine hokar
ku li malbiçûkê[b] da bimînît, ewa ku Em dixwazin, bo demek dîhar kirî, paşê
Em te sawa tînine derê, paşê belke tu pê bigehî. Li naw we da hindek
dimrin û hindek jî dimînin ku bo temenek herî dirêj bijîn, lewma ew paş
ewê nizanît, piştî ku tiştek zanîbû. Tu erdê rût dibînî, paşê dema ku Me av
bo şande xarê, ew dilerize û diweşîne û hemû çeşne cotên ciwan digehînîtê,
[6] eve li ber Xwe dê ye Ev raste û Ev jiyanê didete mirî û Ev desthilat li ser
hemû tiştê heye, [7] ew Demjimêr dê bêtin, çi guman têda nîne, Xwe dê dê
vejînît ewên li naw gora da. [8] Li naw mirova da, ewê ku sebaret bi
Xwe dê gengeşê diket, bêzanist û rênivînî û pirtûkek ronakbîriyê, [9] ûstê xwe
ba didet ku li rêya Xwe dê da derêxît, bo wî li vê dinyayê da serşorî heye û
li Roja Vejiyanê da jî, Em dê eşkenceya agirê bişewat bi wî bidene tam
kirin. [10] ´Eweye ku destên te bo te pêşta şandiye û Xwe dê digel koleyên
Xwe bêdad nîne.´ [11] Li naw mirova da jî, ewê ku li ser lêwê Xwe dê
diperestît, eger baş bête ser wî ew keyfxweşe, lê eger ezmûn bête serê wî, ew
li ser rûyê xwe we dizvrît, ew hem ev dinyayê, hem jî ya Dawiyê didorînin,
ewe dorandina zelale. [12] Li kêlek Xwe dê, da ew gazî wê diket, ku ne zirarê
li wî didet, nejî ew qazancê didet wî, eveye gelek dûr li rê derketin. [13] Ew
gazî ew diket ku zirara wî li qazancê wî nêzîktire, bêguman parêzvaneke
kotî û bêguman hevaleke kotî. [14] Birastî Xwe dê dê ewên ku bawer diken û
karên baş diken vergrîte naw baxçeyên ku li bin ewan da çem diherikin.
Birastî Xwe dê her tiştê ku Ev dixwazît diket.



a: Made. Tiştek ku weke avê şil nebît yanjî weke gazê hewa nebît.
b: Cihe zarûk teda mezin dibit.

[15] Her kesê ku hizir diket li ev dinyayê da û Dawiyê da jî Xwe dê yarmetiya
wî naket, paşê bihêle bila bendikekê dirêj asiman biket û paşê bila bibrît û
paşê bihêle bila bibînît kanê ew bernameya wî, dê hokara kerb li nav
bibet.[16] Bi wî awayî, Me eve weke eşkereyên zelal şande xarê û
Xwe dê her kesê ku Ev dixwazît rênivînî diket. [17] Birastî ewên ku bawer
kirîne û ewên ku Cihû bûn, ewên Şîbayê[a], Fele û Megiya[b] û ewên ku
´hevala´ bo Vî peyda diken, birastî Xwe dê, dê li Roja Vejiyanê da, dê li
nawbera ewan da, dadweriyê biket. Birastî Xwe dê li ser hemû tişta gewahe.
[18] Meger tu nabînî ku ewên di asimana û ewên di erdê da çokê xwe dadnên
û serê xwe li ber Xwe dê dinvînin? Roj, heyv, histêr û çiya, dar, rihtiberên
ku dibzivin û gelek mirov jî! Lê li ser piraniya wan eşkence bi maf hatiye
dîtin. Her kesê ku Xwe dê serşor ket, kes çinabît ku rêz li wî bigrît, birastî
Xwe dê her tiştê ku Ev dixwazît diket. [19] Ewane du cûre dijberin ku sebaret
bi Xwedanê xwe nakokî hene. Lê ewên ku bawer nekirin dê bo wan cilên
agiri ker ken û dê ava kelandî ser serê wan da daken, [20] pê wê, dê ewa naw
zikê wan da biheliyêt û pêst jî. [21] Dê bo wan kopalê asin jî hebin.
[22] Hemû carê ku ew bixwazin li naw da derkevin li ber janê, ew dê paşwe
bêne zivrandin bo naw da, ´Eşkenceya agirê bişewat tam biken!´ [23] Birastî
Xwe dê ewên ku bawer diken û karên durust diken werdigrîte naw
baxçeyên ku çem li naw ewan da diherikin, wêderê da ew dê bi bazinên zêr
û mirvariya bêne xemilandin û wêderê da, cilên wan armûşin [24] û ew
hatibûne rênivînî kirin bo gotina baş û ew hatibûne rênivînî kirin bo ser
rêka Ev ê ku kêrhatiyê hemû pesna ye. [25] Birastî ewên ku bawer nekirin û
rêgiriya rêya Xwe dê kirin û li mizgewta Heram ku Me bo hemû mirova
wekhev çêkir, bo niştecihê wê û ewên ku seredan diken û herkesê ku
dixwazît têda bi nerastiyê li rê derkevît, Em dê wel ew biken ku eşkenceyek
bijan tam biket. [26] Dema ku Me cihê malê pêşanî Ibrahîm da, ´Çi tiştekê
neke ´hevalê´ Min, mala Min pak bike bo ewên ku li dora wê digerên û
ewên ku radiwestin û ewên ku xwe diçemînin û ewên ku çokên xwe didanên
û serê xwe dinvînin. [27] Bo mirova Hecê rabigehîne. Ew dê bi pêya û bi
hemû hêştirên zirav bêne bal te, li hemû rêkên çiyayê dûr we [28] ku belke
bixwe qazanca bibînin û navê Xwe dê bînin, di rojên dîhar kirî da, li ser ew
ajelên ku Vî bo we dabîn kirîne, lewma li wan bixwen û xwarinê bidene
reben û hejar. [29] Paşê bihêlin rêûresmên ku bo wan hatine dîhar kirin bicih
bînin, belêniyên xwe bicih bînin û li dora mala gelek kevin da bizvrin.´



a: Mirovên Xwe dê perest, gelê Şîbayê.
b: Megî mamostayê olê Behdînî ne, pîrê Zerdeştiya ne! Zerdeştî Xwe dê perestin!

[30] Ewe û her kesê ku rêz li reûresmên pîrozê Xwe dê digrît, paşê ew bo wî
bêhtire, li bal Xwedanê wî. Ajelên kevî bo we hatine qanûnî kirin, xêncî
ewa ku bo we hatiye ragehandin lewma xwe li qirêja puta dûr bêxin û xwe
li gotina direw dûr bêxin. [31] Serast digel Xwe dê be û çi ´hevala´ bo Vî
peyda neke, her kesê ku ´hevala´ bo Xwe dê peyda biket weka wî ye ku li
asiman ra ketiye xarê û li bal balindeya we hatiye dizîn, yanjî ba biriye
ciheke dûr.[32] Ewe û her kesê ku rêz li nîşaneyên Xwe dê digrin, paşê birastî
li hişyariya dilê wî ye. [33] Bo we li ewan da qazanc hene, bo demek dîhar kirî.
Paşê cihê qurbaniya wan nêzîkê mala kevne, [34] Me, bo hemû neteweya
rêûresmek Xwe dê perestiyê dîhar kiriye, belke li ber hindê ew navê
Xwe dê bînine ser ewa ku Ev bo wan dabîn diket li ajelên kevî, xwedê we
Xwe dê Yêke! Li ber hindê xwe radestî Vî biken û mizgîniyê bide ewên ûstî-
xar. [35] Ewên ku dema bîranîna Xwe dê tête kirin dilê wan bi-tirs dibît û
ewên ku bi bêhin ferehî xwe li ber her tiştê ku serê wan têt radigrin û nûbêja
diken û li ew debara ku Me bo wan dabîn kiriye diden. [36] Me hêştir û çêl bo
te li naw nîşaneyên Xwe dê da dîhar kirîne. Bo te gelek başî di wan da heye,
li ber hindê dema ew têne rêz kirin, li ser wan da navê Xwe dê bêje, paşê
dema ku ew ketine ser teniştê[a], li wan bixwen û pê xwarinê bidene ewên ku
naxwazin û her wisa ew hejarên ku dixwazin. Bi wî awayî, Me ew bo te
bikêr kirîne, belke li ber hindê tu sipasdar bî. [37] Ne goştê wan nejî xwîna
wane nagehîte Xwe dê, lê hişyariya li we digehîte Vî, bi wî awayî Vî ew bo
we bikêr kirîne, belke li ber hindê hûn Xwe dê gelek mezin biken, bo ewa
ku Vî hûn rênivînî kirînê û mizgîniya xweş bide ewên ku karên baş diken.
[38] Birastî Xwe dê ewên ku bawer diken diparêzît, birastî Xwe dê hez ew
xayînên nankor naket. [39] Destûr bi wan hatiye dan ku şerê wan têtе kirin,
çimkî nerastî li wan hatiye kirin, birastî Xwe dê dikarît serkevtinê bidete
wan. [40] Ewên ku bi bêdadî li malên xwe hatine der kirin, xêncî evê ku
gotine, ´Xwedanê me, Xwe dê ye.´ Eger Xwe dê hindek mirov bi destê
ewên dîke paşve nedaban dê Perestgeh, Dêr, Kenîşte û Mizgewt ku navê
Xwe dê gelek zêde lê têtе gotin, hatibana wêran kirin. Bêguman Xwe dê, dê
yarmetiya wan biket ku yarmetiya Vî diken, birastî Xwe dê Bihêz û
Bidesthilate. [41] Ewên ku eger Em li ser erdê damezrînin, nûbêjên xwe diken,
ew xêra ku bo wan hatiye dîhar kirin diden, fermana ewa ku raste diken û
ewa neraste qedexe diken, bo Xwe dê ye ku dawiya hemû bûyera dîhar
biket. [42] Eger te nepejrînin, bêguman pêş ewan da jî netewa Nûh, Ad û
Semûd [43] û netewa Ibrahîm û netewa Lat [44] û li şêniyên Medya, Mûsa jî
nehatibû pejirandin, lewma Min derfet da nebawera, paşê Min ew girtin û
eşkenceya Min çawa bû!



a: Piştî serjê kirinê, bi mirî ketine ser teniştê.

[45] Çend cara dema şarekê nerastî dikir Me hildiweşandin, lewma ew dikete
ser banên xwe, bîra avê bêxwedan hêlayî û koşkên xweş! [46] Meger ew li ser
erdê negeryane, meger ew pê dilên xwe hizir diken yanjî ew guhên ku
dibhên? Birastî çav kore nebûne, lê dilin ku kore bûne di singê ewan da.
[47] Û ew li te dipirsin ku sizayê bilezînî, lê Xwe dê li belêniya xwe da nakevît,
birastî rojek digel Xwedanê te weke hizar sala ye ku tu dihejmêrî. [48] Çend li
wan şara Min derfet dayê da, dema ku nerastî dikirin û paşê Min ew girt û
armanc jibo bal Mine. [49] Bêje, ´Mirovino, ez tenê bi zelalî agahdariyê
bideme we.´ [50] Lewma ewên ku bawer diken û karên durust diken, ewan dê
lêbihorîn û dabîn kirinek giran buha hebît, [51] lê ewên ku dijatiya eşkereyên
Me diken, dibine hokar ku bikewin, ew hevrêyên agirê cehnemê ne. [52] Me
pêş te da çi Peyamber yanjî Pêşbîn neşandine, xêncî dema ew xwand
Şeytan hawête naw xwandina wî da, lê Xwe dê ewa ku Şeytan dihawête
naw da radiket, paşê Xwe dê eşkereyên Xwe qahîm diket.
Xwe dê Zanaye Biryardere [53] ewa şeytan dihawête naw da bikete ezmûn,
bo ewên ku li dilê wan da nexweşiyek heye û dilê wan req bûye, birastî
ewên nerastkar li nakokiyeke gelek kûr dane [54] û ewên ku zanist bi wan
hatiye dan belke bizanin eve Rastiye li bal Xwedanê we û bawerî pê biken û
bi ûstî xarî dilê xwe radestê evê biken, birastî ewên ku bawer diken Xwe dê
rênivîniyê rêyek rast diket.[55] Ewên nebawer dê sebaret bi evê di gumanê da
bimînin, taku nişkida Demjimêr têtе ser ewan, yanjî eşkenca roja ku çi pêwe
nayêt têtе ser ewan. [56] Padişahiya ew Rojê ya Xwe dê ye, Ev dê li nawbera
wan da dadweriyê biket. Lewma ewên ku bawer kirîne û karên durust
kirîne, dê li naw baxçeyên şadiyê da bin, [57] ewên ku bawer nekirin û
eşkereyên Me nepejirandin, ewan dê eşkenceyeke serşorker hebît [58] û ewên
ku li rêya Xwe dê, da koç kirîbûn û paşê hatibûne kuştin yanjî miribûn,
bêguman Xwe dê, dê debarek baş bo wan dabîn biket, birastî Xwe dê, li
baştirîn dabînkare ye. [59] Bêguman ew dê wan li derekê da bînîte jorda ku dê
wan dilxweş biket, birastî Xwe dê Zanîne Pêdagiriye. [60] Eve û her kesê ku
tole wekiriye pê ewa weka wê ku zirar lêda bûn, paşê zordestî li wî kiribûn,
bêguman Xwe dê dê yarmetiya wî biket, birastî Xwe dê lê xweş dibît û lê
dibihorît. [61]Ewe li ber hindê ye ku Xwe dê dibîte hokar[a] şev biçîte naw rojê
da û dibîte hokar roj biçîte naw şevê da, birastî Xwe dê Bihîstine, Dîtine.
[62] Ewe li ber hindê ye ku Xwe dê Ev ê Raste û ewa, ew li kêlek Vî da li ber
da dipariyên direwe, Xwe dê Ev ê herî Bilind û herî Mezine.
[63] Meger tu nabînî ku Xwe dê li asiman ra avê dişînîte xarê, paşê erd şîn
dibît? Birastî Xwe dê Hêdî û Agahdare [64] ewa di asimana da û ewa di erdê
da ya Vî ye, birastî Xwe dê çi pêvîstî nînin û kêrhatiyê hemû pesna ye.



a: Sebeb, delîl

[65] Meger tu nabînê ku Xwe dê ewa li ser erdê bo te bikêr kiriye? Û ew
gemiya ku li ser deryayê da bi destûra Vî dimeşiyêt? Û Ev asiman radigrît
ku nekevîte ser erdê, xêncî destûra Vî, birastî Xwe dê bo mirova Dilovan û
Birehme, [66] Ev e ku jiyan dabû te û paşê dê bibîte hokar ku tu bimrî û paşê
dê jiyanê bidete te, birastî mirov nankorin.[67] Me bo hemû neteweya
rêûresmek Xwe dê perestiyê dîhar kiriye û ew birêve diben, lewma nehêle
ew li ser wê mijarê digel te gengeşê biken. Lê gazî wan bike bo bal
Xwedanê xwe, birastî tu li ser rênivîniya rastî [68] û eger ew digel te gengeşê
biken jî paşê bêje, ´Xwe dê dizanît hûn çi diken.´ [69] Xwe dê, dê li Roja
Vejiyanê da, dê li nawbera we da, sebaret bi nakokiyên we dadweriyê biket.
[70] Meger tu nizanî ku Xwe dê dizanît çi di asiman û erdê daye? Birastî ew li
tomarekê da ye, birastî ew bo Xwe dê hêsane. [71] Hêşta jî ew li kêleka
Xwe dê, da wê diperestin ku Vî çi desthilat bo neşandiye û li ser hindê ewan
çi zanist nîne û bo ewên nerastkar çi yarmetîder çinabin û [72] dema ku
eşkereyên Me bi zelalî bo wan têne xwandin, tu dê nikoliyê[a] li ser rûmetê
ewên nebawer da bibînî, hind namînît ku ew li wan biden ku bo ewan
eşkereyên Me dixwînin. Bêje, ´Ez we agahdarê ewa herî nebaştir bikem?
Ew agirê ku Xwe dê belêniya wê daye nebawera! Ew armanc çend kotiye!´
[73] Mirovino, eve bo we mînakeke, lewma guhê xwe bidenê: birastî ewên ku
hûn li kêleka Xwe dê da gazî wan diken, ew çi cara pêşûyekê jî na afrînin,
eger ew jibo wê kom bibine ser hevda û eger pêşû tiştekê jî li wan bidizît, ew
dê nekarin lê bistînin, şop û ewên dişopînin lewazin! [74] Ewan pê pîvana rast
Xwe dê nepîvane, birastî Xwe dê Ev ê Qawete û Bihêze.
[77] Xwe dê li firişta peyambera hildibjêrît û li mirova jî. Birastî Xwe dê
Bihîstine, Dîtine, [76] Ev dizanît ku çi li pêş û li pişt wan heye û mijar dê
bizvrine bal Xwe dê. [77] Tu ku bawer dikey, xwe biçemîne, çokê xwe danê,
serê xwe binvîne, koletiya Xwedanê xwe bike û başiyê bike, belke li ber
hindê tu ser bikevî.[78] Bi berxwedanekê bo Xwe dê li ber xwe biden ku mafê
Vî ye, Ev hûn hilbijartine û çi dijwarî nedanayne dînê we da, dînê Ibrahîmê
berebabê we. Ev navê we danaye, ´Xwe radest kiriyê Xwe dê´[b] Pêşta û li
evê da jî, belke peyamber bibîte gewah li ser we û belke hûn jî li ser mirova
bibine gewah. Lewma nûbêjên xwe biken, ew xêra ku bo we hatiye dîhar
kirin biden[c] û xwe qahîm bi Xwe dê we bigrin, Ev parêzerê we ye,
Parêzerek erêniye û Yarmetîderek erêniye.



a: Înkar, haşa kirin b: Mosliman c: Zikat (ew xêra ku bo we hatiye dîhar kirin biden)

## 23. Para Bawemenda

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bêguman bawermend serkevtîne, 2 ewên ku bi ûstî-xarî nûbêjê diken,
3 ewên ku xwe li peyvîna pûç dûr diken, 4 ewên ku xêra bo wan hatiye
dîhar kirin diden, 5 ewên ku dawêna xwe pak xwedan diken 6 xêncî
hevjînên xwe yanjî ewên ku bi destê rastê yê wanin, paşê birastî ew nayêne
tawanbar kirin, 7 lê ewên ku li derwey ewê digerên, paşê ew sînora
dibezînin, 8 ewên ku pêdagirê bawerî û belêniya xwe ne 9 û ewên ku
nûbêjên xwe diparêzin, 10 ewin mîratgir 11 ewên ku dê Parêzdayî ê bi
mîrat biben û ew dê ta bêdawiyê li wêderê da bimînin. 12 Bêguman Me
mirov li cewhera heriya kelpûça afirand, 13 paşê Me ew dilopa avikê dana
ciheke qahîm da, 14 paşê Me ew dilopa avikê kire şêweyek ku xwe pêwe
digrît afirand û Me li ew şêwê kolmek afirand û Me li ew kolmê hêstik
afirand, paşê Me ew hêstik pê goşt cil kirin, paşê Me ew afirandinek dîke
berhem îna, lewma Xwe dê pîroze, bêhtrînê afrînera! 15 Birastî paş ewê tu
dê bimrî, 16 paşê birastî, li Roja Vejiyanê da tu dê carek dîke bêye
vejandin. 17 Bêguman Me li ser te heft rêbaz afirandine, Em li afirandinê
bê agah nînin. 18 Me li asiman ra pê pîvanên pêvîst av şande xarê û di erd
da bicih kir, birastî Me hêza wê heye ku raken. 19 Paşê Me pê wê, bo we
baxçên darê xurmê û rezên tirî berhem înan, bo we li naw da gelek meyve
hene û hûn li wan dixwen 20 û darek ku li çiyayê Sînayê şîn dibît ku rûn û
biharatê berhem tînît, bo ewên ku dixwen. 21 Birastî li ajelên kevî da bo we
waneyek heye, Em vexwarinê li ewa ku di zikê wan daye didene we û jibo
we li ewan da gelek qazanc hene û hûn li ewan dixwen 22 û hûn li wan û
gemiya siwar dibin. 23 Bêguman Me Nûh şande bo bal netewa wî û wî got,
´Netewa min Xwe dê biperestin, we çi xwedê nînin xêncî Vî. Paşê hûn
hişyar nabin?´ 24 Lê serokên ewên nebawer li naw netewa wî da gotin,
´Ew, weke we tenê bimireke, ew dixwazît serweriyê li ser we da peyda
biket. Eger Xwe dê xwastiba bêguman Ev, dê firişte şandibana xarê, me
ewe li naw berebabên xwe da nebihîstibû. 25 Ew nîne xêncî mêrekê ku cin
têda ne, lewma digel da bêhn fereh bin taku demekê.´
26 Wî got, ´Xwedanê min yarmetiya min bide! Çimkî ew nikoliyê li min
diken´ 27 Û li ber hindê, Me sirûş da wî ku ´Li jêr çavdêriya Me da û bi
sirûşa Me gemiyê çêke, dema ku destûra Me têt û av li tendûra da
dibilqîte derê, paşê li her cotekê bibe gemiyê da û binemala xwe jî, xêncî
ewên ku li pêşta bo wan peyv derbaz bûye û sebaret bi ewên nerast gazî
Min neke, birastî ew dê bêne xendiqandin 28 û dema ku tu lê siwar bûy û
herkesê digel te ye li ser gemiyê, paşê bêje, ´Pesn bo Xwe dê bît ku em li
neteweya nerastkar rizgar kirin´

29 Û bêje, ´Xwedanê min, bihêle ez danême ser ciheke pîroz, Tu bêhtrînî
ku bîte hokar danête ser erdê´ 30 Birastî lêreda nîşane hene, birastî Em
bêguman taqî diken. 31 Paşê, Me piştî wan nifşek dîke berhem îna 32 û Me,
li naw ewan da, jibo wan peyamberek şand, ´Xwe dê biperestin, we çi
xwedê nînin xêncî Vî. Paşê hûn hişyar nabin?´ 33 Lê serokên ewên
nebawer li naw netewa wan da ku nikolî li hevdîtina li Dawiyê da kiribûn,
dema ku Me li jiyana ev dinyayê da xweşî dabû wan gotin ´Ew tenê wek
we bimireke, ew dixwet li ewa hûn dixwen û divexwet li ewa hûn
divexwen, 34 bêguman eger hûn peyrevî li bimireke weke xwe biken,
birastî hûn dê paşê bidorînin. 35 Ew belêniyê didete we, dema hûn mirine
û hûn bûne toz û hêstik, hûn dê bêne derêxistin? 36 Ewa belênî dayne we
heyhat heyhate. 37 Çi nîne, xêncî jiyana me li ew dinyayê da, em dimrin û
em dijîn û em nayêne vejandin. 38 Ew nîne, xêncî mêrekê ku sebaret bi
Xwe dê direwek berhem înaye û em bawerî bi wî naken.´ 39 Wî got,
´Xwedanê min, yarmetiya min bike! Ew nikoliyê li min diken,´ 40 Vî got,
´Piştî demek kurt, bêguman ew dê peşîman bin.´ 41Lewma, qêrînekê, pê
rastiyê ew girtin û Me terahî li wan birand û neteweya nerastkar wêda
hajot! 42 Paşê Me, piştî wan nifşên dîke berhem înan. 43 Hîç neteweyek
nikarît dema xwe pêş bêxît nejî bidete paş. 44 Paşê Me peyamberên Xwe li
dû hevda şandin, herdema ku bo neteweyekê peyamberê wê hat, ewan
nikolî lê kirin, lewma Me, wekir hindek ewê dîke bişopînin û Me ew kirine
serhat. Wêda hajot neteweya ku bawer nekir! 45 Paşê Me, Mûsa û Harûnê
birayê wî pê nîşaneyên Xwe û desthilatek zelal şandine 46 bal Fireûn û
serokên wî, lê ewan xwe mezin zanîn, ew neteweyek şanaz bûn. 47 Paşê
ewan got, ´Meger dibya em bawerî bi du bimirên weke xwe biken? Dema
ku neteweya wan koleyên me ne?´ 48 Lewma, nikolî li wan kirin û ew jî
bûne li ewên li nav çoyî. 49 Bêguman Me nivîsîna pîroz da Mûsa, belke li
ber hindê ew bêne rênivînî kirin. 50 Me, kurê Miryemê û dayka wî kirine
nîşaneyek û Me li ser tepikekê da penahgehek ewleh da wan ku li berda
kanî av diherikîn. 51 ´Peyamberno, tiştên baş bixwen û karên baş biken,
birastî Ez dizanim hûn çi diken.´ 52 Birastî ewe neteweya te ye, yêk
neteweye û Ez Xwedanê te me, lewma hişyarê Min be. 53 Lê ewan destûra
xwe, li nawbera xwe da pirt pirt kirîne ser mezheba, her partek bi ewa
xwe dilxweşe. 54 Lewma, bihêle bila bo demekê ew li gêjiya xwe da
bimînin. 55 Meger ew hizir diken ku bi dana mal û zarûka 56 Em lezê lê
diken ku tiştê baş bidene wan? Belê ew tênagehin! 57 Birastî ewên ku li
tirsa Xwedanê xwe hişyarin 58 ewin ku bawerî bi nîşaneyên Xwedanê xwe
diken,

59 ewin ku çi ´hevala´ jibo Xwedanê xwe peyda naken 60 ewin ku diden li
ewa diden, dema ku dilê wan ditrsiyêt, çimkî ew dê bizvirine bal Xwedanê
xwe 61 ewin ku lezê lê diken ku karên baş biken û ew têda pêş dikevin.
62 Em, bar li hîç rihekê naken xêncî şêyana wî, li bal Me ye tomarek ku bi
rastiyê dipeyvît û nerastî li wan nayête kirin. 63 Belê dilê wan li ser evê
gelek şepirze bûye û ewan kiryar hene ku ew li kêleka ewane da diken.
64 Ta dema ku Em dewlemendê wan pê sizayê digrin, demûdest ew dê bo
yarmetiyê bigiryên, 65 ´Îro bo yarmetiyê negiryê, birastî tu çi yarmetiyê li
Me navergirî. 66 Bêguman eşkereyên Min bo te hatine xwandin, lê tu ser
paniyên xwe we zivrî 67 û bi xwe mezin kirin, te şevên xwe, bi tirane kirin
sebaret bi evê derbaz kirin.´ 68 Paşê, ew têbîniyê li peyvê naken? Yanjî bo
wan hatiye ewa ku bo berebabên wan nehatibû? 69 Meger ew peyamberê
xwe nas naken? Çima ew, nikoliyê li wî diken? 70 Çima ew dibêjin ´Li wî
da cinek heye?´ Belê ew bo wan rastî înaye û kerbê piraniya wan li rastiyê
divebît, 71 lê eger rastî pêka hestên wan ba, bêguman dê hemû asiman û
erd û ewên têda, dê genî ban. Belê Me bo wan bîranîna wan înaye lê ew
pişta xwe didene bîranîna xwe. 72 Meger tu daxwaza diraf li wan dikey?
Lê padaşê Xwedanê te bêhtre, Ev li baştrîn dabînkeraye. 73 Brastî tu wan
gazî rêya rast dikey 74 û birastî ewên ku bawerî bi Dawiyê naken, li rê
diderkevin. 75 Tenanet eger Me rehm li ser ewan da heba û ew li tengasiyê
derêxistiban, ewan dê bi koretî pêdagirî li sînor bezandina xwe kirban.
76 Me, pê eşkencê li wan da, ne ewan xwe radest Xwedanê xwe kirin, nejî
xwe ûstî-xarî kirin 77 takû Em, deriyekê bo wan veken ku têda eşkenceya bi
jan bidene wan, demûdest ew têda bêhêvî ne. 78 Eve ku bihîstin dîtin û
hest dayne we, çend bi kêmî hûn sipasdariyê diken!
79 Ev e ku hûn li ser erdê zêde kirîne û jibo bal Vî ye ku hûn dê bêne kom
kirin 80 Ev e ku jiyanê didet û dibîte hokarê mirinê û bo Vî ye guhertina
şevê û rojê, paşê hûn hizrên xwe bikar naynin? 81 Belê, ew jî dibêjin weka
ewên ewilî, 82 ew dibêjin, ´Dema em mirin û em bûne toz û hêstik, rastî
em dê bêne vejandin? 83 Bêguman pêşta belêniyên evê bi me û berebabê
me hatiye dan, eve nîne xêncî çîrokên kevnar.´84 Bêje, ´Kêye Xwedanê
erdê û hemû ewên ku têda ne, eger tu dizanî? 85 Û ew dê bêjît ´Xwe dê.´
Bêje, ´Paşê tu nayniye bîra xwe?´ 86 Bêje, ´Ev ê Xwedanê heft asimana
kêye û Xwedanê textê bi desthilat kêye?´ 87 Û ew dê bêjin, ´Xwe dê´ Bêje,
´Paşê hûn hişyar nabin?´ 88 Bêje, ´Padişahiya hemû tişta li destê kê daye?
Ev ê ku diparêzît, dema ku çi parastin li dijî Vî nîne, eger tu dizanî?´ 89 Û
ew dê bêjin, ´Xwe dê´ Bêje, ´Paşê çawa hûn hatine lêbandin?´ 90 Belê, Me
bo wan rastî înaye û birastî ew direwa diken.

[91] Xwe dê çi kur wernegirtine nejî çi xwedê li bal Vî da hene, eger heban,
her xwedêyekê dê afirandina xwe wêda birba û bêguman hindek li wan dê
hewil daban li ser ewên dîke da bikevin. Paye bilindî ya Xwe dê ye serwey
ewa ku ew şirove diken! [92] Ewa ku nehatiye dîtin dizanît û gewahe, Ev
gelek serwey ew ´hevala´ ye ku bo Vî peyda diken. [93] Bêje, ´Xwedan, eger
tu dê pêşanî min bidey ewa ku belênî bi wan hatiye dan, [94] Xwedanê min,
paşê min têkel nebaşkara neke!´ [95] Birastî Em dikarin pêşanî te biden, ewa
ku Me belênî daye wan. [96] Nebaşiyê bi ewa başiyê paşwe bide, Em dizanin
ku ew çi şirove diken [97] û bêje, ´Xwedanê min, ez li dijî han dana şeytana
li bal Te penahê verdigrim, [98] Ez li bal Te penahê dixwazim, Xwedanê
min, li ber hindê bila ew digel min nebin.´ [99] Taku dema mirin tête ser
yêke wan, ew dibêjît, ´Xwedanê min, min paşta bizvrîne [100] belke ez
bişêm serast kirinê li ew tiştên ku min paş xwe we hêlan bikem.´ Ne! Ewe
tenê peyveke ku ew dibêjît û perjînek li pêşberî ewane, ta Roja, ew têne
vejandin. [101] Lewma, dema ku pif dikene zirnayê, paşê li wê Rojê da çi
pêwendî li nawbera ewan da namînît û ew li hevdu napirsin, [102] ewên ku
hewsenga[a] wan giran dikêşît, ew dê ser bikevin, [103] lê ewên ku hewsenga
wan siwike, paşê ewan dê riha xwe bo bêdaviyê dorandibît û ew dê
cehnemê da bimînin [104] dê agir rûmetê wan bişewitînît û lêwên wan, dê
êşê da girnijî bin. [105] ´Meger peyamên Min bo te nehatine xwandin û te
nikolî li wan nekirin?´ [106] Ew dê bêjin, ´Xwedanê me, kotîbûna me, li ser
me da ket û em neteweyek li rê derketî bûn. [107] Xwedanê me, me li ewê da
derêxe, paşê eger em bizvirinê, bes birastî em dê nerastkar bin.´ [108] Ev dê
bêjît, ´Li wêderê da kerb lê webûyî bimînin û digel Min nepeyvin!´
[109] Birastî naw koleyên Min da, komek hebûn ku gotin, ´Xwedanê me, me
bawer kiriye, lewma li me bibhore û ser me da birehm be, Tu bêhtrînê
birehmayî. [110] Lê we henekê xwe bi wan kirin, taku ewan wel we kir hûn
bîranîna Min li bîr biken û hûn bi ewan dikenîn. [111] Birastî îro Min li ber
bêhinferehiya wan, padaş daye wan, ew serkevtî ne.´ [112] Ev dê bêjît, ´Hûn
çend sala li ser erdê man, bi hejmara sala?´ [113] Ew dê bêjin, ´Em rojekê
yanjî danê rojekê man, lê li wan bipirse ku hisabê digrin.´ [114] Ev dê bêjît,
´Hûn tenê kêmekê man, eger tenê we zanîba. [115] Meger te hizir dikir ku
Me tu bêçine afirandî û tu nayê zivrandin bo bal Me?´ [116] Lewma bilindî
ya Xwe dê ye Padişahê rastîn, çi xwedê nînin bes Ev nebît, Xwedanê textê
giran buha! [117] Her kesê ku li ber xwedêyek dîke li kêleka Vî da bipariyêt
ku çi belge bo nînin, paşê tenê hisab pirsîna wî li bal Xwedanê wî ye.
Ewên ku bawer naken, sernakevin. [118] Û bêje, ´Xwedanê min, bibihore û
Te rehim hebît, Tu bêhtrînê birehmay.



a: Pîvan, Terazû, olçek

## 24. Para Ronahiyê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Parek, ku Me şandiye xarê û kiriye erk, Me li evê da, eşkereyên zelal şandine,
belke li ber hindê bête bîra te. [2] Sed cara li jina zinakar[a] biden û sed cara li
mêrê zinaker biden[b]. Nehêlin ku dilovanî bo wan, we li bicih înana dînê
Xwe dê paşve ragirît, eger hûn bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê diken, bihêlin
bila komek bawermend gewahê sizaya ewan bin. [3] Mêrê zinaker jiyana hevpar
pêk naynît xêncî digel jinek zinaker yanjî ewên ku ´hevala´ bo Vî peyda diken
û jina zinaker jiyana hevpar pêk naynît xêncî digel mêrê zinaker yanjî ewên ku
´hevala´ bo Vî peyda diken û ewe li bawermenda qedexe ye.
[4] Ewên ku jinên dawên pak tawanbar diken û paşê çar gewaha naynin, paşê
heştê cara li wan biden û çi cara gewahiya wan nepejrînin, ew li wanin ku bi
pêdagirî serkêşin, [5] xêncî ewên ku paşê peşîmaniya xwe radgehînin û serast
kariyê diken, paşê birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet.[6] Ewên ku hevjînên
xwe gunehbar dizanin, lê ewan xêncî xwe, jibo wan çi gewah nînin, paşê
gewahiya her yêk li wan çar gewahîne li ser Xwe dê, ku ew (mêr) li rastbêja ye
[7] û cara pêncê, nerêniya Xwe dê li ser wî bît, eger ew (mêr) li direwîna ye [8] lê
ew dê pêşgêriya sizayê li wê (jinê) biket, eger ew gewahiyê bidet, çar cara
gewahî bi Xwe dê, ku bêguman ew (mêr) li direwîna ye [9] û cara pêncê, kerbê
Xwe dê li ser wê (jin) bît, eger ew (mêr) li rastbêja ye.[10] Eger li ber qenciya
Xwe dê bo ser we neba û rehma Vî, eger wisa neba ku Xwe dê peşîmaniyê
dipejirînît û biryarê didet! [11] Birastî ewên ku direw înan komek li naw weda
bûn, hizir neken ku ew bo we nebaş bû, belê ew bo we baş bû û bo her kesê li
naw ewan da, dê ew hebît ewa ku li gunehê dest xwe êxistiye û ewê ku li naw
ewan da pişka zêde dest xwe we êxist, ew dê sizayeke gelek mezin hebît.
[12] Çima dema we bihîst, jinên bawermend û mêrên bawermend hizra bêhtir
bo xwe nekirin û negotin ku ´Ewe bi aşkira direwe?´ [13] Û çima ewan çar
gewah bo ne înan? Dema ew gewaha naynin, paşê ewin ku li bal Xwe dê
direwînin. [14] Eger li ber qenciya Xwe dê li ser we neba û rehma Vî, li ev
dinyayê û Dawiyê da, bêguman ber xatira ewa ku we bê hiş lezgînî têda kir dê
sizayek gelek mezin li we daba. [15] Dema ku we bi zimanê xwe ew tiştên ku we
çi zanist li ser da nebûn hilgirtin û we bi dewê xwe got, we hizir dikir ku ew
girîng nîne, dema ku li bal Xwe dê, ew gelek mezine. [16] Dema ku we bihîst,
çima we negot, ´Ew bo me nîne ku li ser ewê bipeyvin, Paye bilindî bo Te bît!
Ewe boxtanek gelek mezine?´ [17] Xwe dê agahdariyê didete we ku çi carê
nezivrine mînakên wisa, eger hûn bawermendin. [18] Xwe dê eşkereyên Xwe bo
we zelal diket, Xwe dê Zanîne, Têgeheştine.



a: Zina, yanî gana qedexe: digel kesekê ganê bikey ku hevjînê te nebît!
b: Di zimanê Erebî da peyva Celade jibo lêdanê bikar hatiye, yanî pê dest yanjî tiştek dîke li pêstê laşê mirov bidey.

[19] Birastî ewên ku hez diken bêrewiştî belav bîte naw ewên ku bawer diken da,
ewan li ev dinyayê da eşkenceyek bijan heye û li Dawiyê da jî, Xwe dê dizanît
û hûn nizanin. [20] Eger li ber qenciya Xwe dê li ser we neba û rehma Vî, çimkî
Xwe dê Dilovane û Rehmê didet [21] Hûn ku bawer diken, peyrevî li şûn pêyê
Şeytan neken, her kesê peyrevî li şûn pêyê Şeytan biket, paşê birastî ew dê
destûra bêrewiştî û kiryarên kirêt li we biket. Eger li ber qenciya Xwe dê bo
ser we neba û rehma Vî, li naw weda kesê nedikarî çi cara pak bît. Lê Xwe dê
pak diket her kesê ku Ev dixwazît, Xwe dê Bihîstine, Dîtine. [22] Ewên ku li naw
weda qencî li wan hatiye kirinê û ewên heyî, nabît bersiwa ne bidene xizma,
hejara, ewên ku li rêya Xwe dê da koç kirîne, bihêle bila ew lê xweş bin û
lêbibhorin. Meger hûn hez naken ku Xwe dê li we xweş bît? Xwe dê Lêbihore
û Rehmê didet. [23] Birastî ewên ku jinên bawermendê birûmet û bê agah
tawanbar diken, li vê jiyanê da û Dawiyê da jî ew hatine nerênî kirin û
eşkenceyek bijan çavnihêrê wane [24] di ew Roja ku ziman, dest û pêyê wan dê,
sebaret bi ewa ku ewan kiriye dê li dijî ewan gewahiyê bidet, [25] di wê Rojê da,
Xwe dê, dê deynê ku mafê wane bi tewatî bidete wan û ew dê bizanin ku
Xwe dê li dadweriyê da bêkêmasiye. [26] Jinên nebaş bo mêrên nebaşin û mêrên
nebaş bo jinên nebaşin, jinên baş bo mêrên başin û mêrên baş bo jinên başin.
Ew bêgunehin li ewa ku li dijî wan hatiye gotin, ewan dê lêbihorîn û dabîn
kirinek giran buha hebît.
[27] Bawermendino, xêncî mala xwe neçine mala ewên dîke, taku we destûr
nestandiye ku biçine jor da û silav û hal pirsiya ewên jor da nekirye, ewe
bêhtire jibo we, belke bête bîra we. [28] Eger we kes li jorda peyda nekir, neçine
jorda taku destûr bi we bête dan. Eger bêjine we ´Herine derê´ bes herine
derê, ewe ji bo we paktire û Xwe dê dizanît ku hûn çi diken. [29] Hûn nayêne
tawanbar kirin, eger hûn biçine ew mala da ku kes têda najît û li ewan da, dê
jibo we tenahî hebît, Xwe dê dizanît ku hûn çi aşkira diken û hûn çi diweşêrin
jî [30] bêje mêrên bawermend ku çavê xwe newî biken û dawêna xwe pak
biparêzin, ewe bo wan paktire, birastî Xwe dê hajê heye ku ew çi diken
[31] û bêje jinên bawermend, ku ew dibya çavê xwe newî biken, dawêna xwe
pak biparêzin û xemla xwe nederêxine derê, xêncî ewa lê dîhare, ew dibya pê
desmala serê xwe gerden û singê xwe bipeçêrin û ew nabît xemla xwe nîşan
biden, xêncî bo mêrên xwe yan babên xwe yan xezûrên xwe yan kurên xwe
yan korên mêrên xwe yan birayên xwe yan biraziyên xwe, yan xwarziyên xwe
yan jinên xizim yan ewên ku bi destê rastê yê wanin[a] yanjî ew mêrên ku
xizmeta wan diken û li wan narabît, yanjî ew zarûkên ku hêşta hişyarê rûtiya
jina nebûne, ew nabît pêyê xwe biqutin ku xemla xwe ya veşartî bidene aşkira
kirin. Bawermendino, hûn hemû bi peşîmanî bizvrine bo aliyê Xwe dê, belke
li ber hindê hûn behremend bin.



a: Ewên ku desthilata wan di destê te daye, wergêrên ereb ew bi mirovên kole wergêrane, lê li gor destûra Quranê mirov nikarin xwedan kole bin. Em mirov koleyê Xwe dê ne!

[32] Bo ewên bi tenê, li naw xwe da, jiyana hevpar pêk bînin û bo ew jin û
mêrên kole ku li naw we da drustkarin, jiyana hevpar pêk bînin. Eger ew
hejarin Xwe dê dê li qenciya Xwe bidete wan, Xwe dê bêpayan Berfereh û
Zana ye . [33] Ewên ku nikarin jiyana hevpar pêk bînin, bila dawêna xwe pak
biparêzin, taku Xwe dê li qenciyên Xwe, hindî pêvîst bidete wan. Eger her
yêk li ew kesên ku hûn bi destê rastê xwedanê wanin[a], daxwaza niwîsînê li we
biken, paşê niwîsînê bidene wan, eger hûn dizanin ku li wan da başî heye û li
ew malê ku Xwe dê daye we bidene wan û zordestiyê li kiçên* xwe neken ku
xwe bifroşin[b] eger ew dixwazin pak dawên bimînin, li têkoşîna we, bo bidest
xistina destkewta, bo demek kurtê ev dinyayê. Eger kesekê zor li wan kir, paşê
Xwe dê piştî zor kirin li wan Lêbihore û Rehmê didet. [34] Bêguman Me, bo we
eşkereyên zelal şandine xarê û mînakên ewên ku li pêş we da mirîne û
perwerde bo ewên ku hişyarê Vî ne. [35] Xwe dê ronahiya asimana û erdê ye.
Mînaka ronahiya Vî, mîna ciheke arame ku çirayek têdaye, çira li naw
şuşeyekê daye, şuşeya ku weke stêrkekê geş hilbûye, li dar zeytûnek pîroz ku
ne li Rojhelatê ye nejî li Rojava ye, eva ku rûnê wê hema hema ronahiyê
didet, tenanet eger agir jî neberbîtê, ronahî li ser ronahiyê ye, Xwe dê her kesê
ku Ev bixwezît, bo ronahiya Xwe rênivînî diket. Xwe dê mînakên wisa bo
mirova tînît, Xwe dê zanista li ser hemû tişta heye. [36] Xwe dê destûr daye ku
mal bêne bilind kirin û navê Vî têda bête bîranîn û sibêde û êvara li wan da
Vî paye bilind biken, [37] mêrên ku firotin û bazirganî hişê wan belav naket ku
Xwe dê bînine bîra xwe û nûbêja biken û ew xêra ku bo wan hatiye dîhar
kirin biden. Ew li Rojekê ditirsin ku çav û dilê wan dê, têda bizvirin
[38] ku Xwe dê, dê pêka baştrîn kiryarên wan dê padaş bidete wan û Ev dê
zêdetir li qenciyê Xwe bidete wan, Xwe dê bêpayan bo her kesê ku Ev
dixwazît dabîn diket. [39] Lê kiryarên ewên nebawer weke rewrewka[c] di çolê
dane, ewê tênî hizir diket ku av e, lê dema ku ew digehîte wêderê, ew hîç
tiştekê li wêderê peyda naket lê ew Xwe dê li pêşberî xwe peyda diket, ku
hisaba wî bi tewawî didetê da û Xwe dê lezgîne li hisab danê da.[40] Yanjî weke
taritiya di deryaya kûr da ku bi şîpel li ser şîpela hatiye peçavtin ku li ser wan
da jî ewir hene, tarîtiya hindeka li ser ewên dîkeye, dema yêk destê xwe dirêj
biket, ew gelek bi dijwarî dikarît bibînît û ewê ku Xwe dê çi ronahî nedayê, ew
çi ronahî nîne. [41] Meger tu nabînî, ewên ku di asimana û erdê da ne,
Xwe dê paye bilind diken, her weke balindeyên ku baskên xwe pan kirîne?
Her yêk li wan nûbêja xwe û paye bilind kirina Vî dizanin, Xwe dê zanist
heye ku ew çi diken.



* Wergêrên Ereb dibêjin base kiçên koleye, ew kiçên ku desthilata wan destê we daye.
a: Li gor gotina vergêrên Ereb basê mirovên kole ye! Ew mirovê ku desthilata wan destê te daye.
b: Fehşa, dawên pîsî. Gawa mirov digel kesekê razêt ku hevjîna wî nebît.
c: Dema mirov hest diket ku di çolê da avê dibînît, lê gava lê nêzîk dibît dizanît av nîne!

[42] Padişahiya asimana û erdê ya Xwe dê ye û armanc bo bal Xwe dê ye.
[43] Meger hûn nabînin ku Xwe dê ewra dihajot? Paşê ewan tînîte bal hev û
paşê ewan dihavêjîte ser hevda, paşê hûn dibînin baran li naw ewan da
diderkewît? Û Ev li asiman ra çiyaya ra, dişîne ku têda teyrok heye û pê wê li
ew didet ku Ev dixwazît û wêda dibet li ew kesê ku Ev dixwazît û ronahiya
birûska wê, hema hema dîtinê li çava distînît. [44] Xwe dê şev û rojê diguherît,
birastî di ewêda waneyek[a] heye, bo ewên ku dîtin hene [45] û Xwe dê hemû
rihtiber li avê afirandine, hindek li wan, xwe li ser zikê xwe dixweşînin, hindek
li wan ser du pêya rêwe diçin û hindek jî li ser çara. Xwe dê diafrînît her tiştê
ku Ev dixwezît, birastî Xwe dê desthilat li ser hemû tişta heye.
[46] Bêguman Me eşkereyên zelal şandine. Xwe dê, her kesê ku Ev dixwazît,
rênivîniyê rêyek rast diket. [47] Ew dibêjin, ´Em bawerî bi Xwe dê û peyamber
diken û em peyrevî diken,´Lê paşê komek li wan pişta xwe didenê, ew
bawermend nînin [48] û dema ku, ew bo bal Xwe dê û peyamberê Vî têne gazî
kirin ku li nawbera ewan da dadweriyê biket, demûdest komek li wan pişta
xwe didenê. [49] Lê eger mafê yê ewane, ew demûdest peyrevî diken û tên.
[50] Meger li dilê ewan da nexweşiyek heye? Yanjî ewan guman heye? Yanjî ew
ditirsiyên ku Xwe dê digel wan bêdad bît û peyamberê Vî jî? Belê ewin ku
nerastkarin.[51] Dema ku bawermend têne gazî kirin bo bal Xwe dê û
peyamberê Vî, ku ew li nawbera ewan da dadweriyê biket, ew tenê dibêjin,
´Em dibhên û em peyreviyê diken.´ Ewane, ewin ku dê behremend bin,
[52] her kesê ku peyrevî li Xwe dê û peyamberê Vî biket, li Xwe dê bitirsiyêt û
hişyarê Vî bît, ew dê dest xwe bînît. [53] Ew bi Xwe dê sûnd dixwen, bi sûnda
xwe ya herî bihêz ku eger te ferman li ewan kiriba, bêguman ew dê
derketiban. Bêje, ´Sûnd nexwen, peyrevî hatiye dîtin, birastî Xwe dê haj ewê
heye ku hûn diken.´ [54] Bêje, ´Peyrevî li Xwe dê biken, peyrevî li peyamber
biken, eger hûn pişta xwe bidenê, paşê li ser wî ye ewa ku li ser pişta wî ye û li
ser we ye, ewa ku li ser pişta we ye. Eger hûn peyrevî li wî biken hûn dê bêne
rênivînî kirin, lê li ser peyamber nîne, xêncî ewê ku bi zelalî peyamê
bigehînît.´ [55] Xwe dê belêniyek daye ewên ku li naw we da, bawer diken û
karên durust diken, bêguman Ev dê wan li ser erdê bikete cêgir her wek ku,
Vî, ewên pêş wan da hatî kirine cêgir û bêguman Ev dê bo wan dînê wan
damezrînît, ku Vî jibo wan pejirandiye û bêguman paşê Ev dê, tirsa wan
vegoherîte tenahiyê. ´Ew dê, Min biperestin û çi tişta nakene ´´hevalê´´ Min´
Lê her kesê ku piştî ewê bawer neket, bes ew bi pêdagirî serkêşe. [56] Nûbêjê
bike, ew xêra ku bo te hatiye dîhar kirin[b] bide û peyrevî li peyamber bike,
belke li ber hindê, rehm bi te bête dan.

a: Ders, îbret
a: Zikat (Ew xêra ku bo te hatiye dîhar kirin bide)

[57] Hizir neke ku ewên nebawer dê bikarin li ser erdê birevin, dê penahgeha
wan agir bît, armanca wan çend kotiye. [58] Hûn ku bawer diken, ewên ku hûn
bi destê rastê we xwedanê wanin û her kesê ku hêşta pê negeheştiye, sê cara di
rojê da, dibya daxwaza destûra we biken, pêş nûbêja sibê, dema ku di germa
nîvro da hûn cilê xwe li ber xwe derdêxin û piştî nûbêja şevê. Ewane bo we sê
demên nihênî ne, di demên dîke da, ne çi barê gunehê li ser weye nejî li ser
ewane, çimkî hindek li we bi berdewamî li dora ewên dîke digerên.
Bi wî awayî, Xwe dê eşkereya zelal diket û Xwe dê zanist heye ku biryarê
bidet. [59] Dema ku zarûkên we digehine pêgeheştinê, ew dibya daxwaza
destûra we biken, her wek ewên pêş wan da kirine. Bi wî awayî Xwe dê
eşkereyên Xwe bo we zelal diket, Xwe dê zanista wê heye ku biryarê bidet.
[60] Çi guneh li jinên stewir[a] nayête bar kirin, ewên ku edî hez naken ku jiyana
hevpar pêk bînin, eger ew cilên xwe yên serwe derêxin, bêy ku xemla xwe
nîşan biden, lê ew bo wan bêhtire ku bi ûstî xarî veneken, Xwe dê Bihîstine,
Dîtine. [61] Bo koreya guneh lê nayêt, nejî bo qopa guneh lê têt û nejî bo
nexweşa guneh lê têt, nejî li ser we, çi hûn li malê xwe da xwarinê bixwen,
yanjî li mala babê xwe yanjî mala dayka xwe, yanjî mala birayê xwe, yanjî
mala xweşka xwe, yanjî mala xalê xwe, yanjî mala xaleta xwe, yanjî mala
mamê xwe, yanjî mala meta xwe, yanjî ew malên ku we kilîlê wan hene, yanjî
mala her yêk li hevalên xwe, hûn nayêne gunehbar kirin, eger hûn digel komê
yanjî bi tenê bixwen. Lê dema hûn diçine her malekê silav û halê hevdu bi
aştiyê bipirsin, hal pirsînek li bal Xwe dê baş û pîroz. Ahan wiha Xwe dê
eşkereyên Xwe bo we zelal diket, belke li ber hindê hûn têbigehin.
[62] Tenê ew Bawermendin, ku bawerî bi Xwe dê û peyamberê Vî diken, dema
ku li ser mijarên giştî digel wî kom dibin, ew naçin taku ew daxwaza destûra
wî neken, birastî ewên ku daxwaza destûra te diken, ewin ku bawerî bi
Xwe dê û peyamberê Vî diken. Dema ew daxwaza destûra te diken ku
bigehine karûbarên xwe, destûrê bide her kesê tu dixwazî û daxwaz li Xwe dê
bike ku li wan bibhorît, birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. [63] Li naw
xwe da gazî kirina peyamber wisa lê neken weka hindek li we gazî ewê dîke
diken, bêguman Xwe dê haj ewan heye ku li naw we da bi dizî we diçin,
lewma ewên ku li dijî biryara wî diçin bila hişyar bin, neket ku ew bêne taqî
kirin, yanjî eşkenceyek bijan li wan bidet.[64] Bêguman hemû tiştê di asimana û
erdê da yê Xwe dê ye bêguman Ev dizanît hûn di çi rewşekê da ne, di ew
Roja ku hemû dê bizvirine bal Vî, Ev dê wan agahdar biket ku ewan çi kiribû,
Xwe dê zanista li ser hemû tişta heye.



a: Ew jinên ku pîr bûne û nakevine naw rewşa mangane da. (êdî xwîn rêjiyê naken)

## 25. Para Cudaker

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Pîroze Ev ê ku cudaker[a] bo koleyê Xwe şandiye xarê, belke li ber hindê ew
agahdariyê bidete hemû mirova. 2 Ev e ku Padişahiya asimana û erdê heye û çi kur
wernegirtine, nejî kes digel Vî li padişahiya Vî da ´hevalê´ Vî ye û Ev ê ku hemû tişt
afirandin û çarenûsa wan dîhar kiriye. 3 Lê ewan li kêlek Vî da, xwedê vergirtine, ku çi
tişta na afrînin û bixwe hatine afirandin û nedikarin çi zirarê li xwe biden, nejî çi
qazancê û çi desthilat li ser mirin, jiyan û vejiyanê da nînin. 4 Ewên ku bawer naken
dibêjin, ´Eve[b] tenê direweke ku wî berhem înaye û mirovên dîke yarmetiya wî kiriye,´
lê ewan bêdadî û direw kirîne 5 û ew dibêjin, ´Eve tenê çîrokên kevnarin ku wî bixwe
nivîsîn e û sibêdê û êvarê ew li wî têne ferman kirin.´ 6 Bêje, ´Eve li bal Vî hatiye
şandin ku nihêniyên asimana û erdê dizanît, birastî Ev Lêbihore û Rehmê didet.´
7 Ew dibêjin, ´Boçi ew peyambere xwarinê dixwet û li naw bazarê da digerêt! Çima
firişteyek neşandine xarê ku digel wî agahdariyê bidet? 8 Yanjî çima çi xizîne nedayne
wî yanjî baxçeyek ku xwarinê lê bixwet?´ Û nebaşkar dibêjin, ´Hûn tenê peyrevî li
mêrekê diken ku li bin bandora cadûyê daye.´ 9 Lê binêre, ew mînakên çawa bo te
tînin! Ew li rê derketine û neşên bêne ser rêkê. 10 Pîroze Ev ê ku dikare, eger bixwaze
tiştê li wane baştir bidete te, baxçeyên ku çem li bin wan da diherikin û Ev dikarît
koşka jî bidete te.11 Belê ewan nikolî li Demjimêrê kiriye, bo ewên ku nikolî li
Demjimêrê diken, Me agirek bi gurî amade kirye. 12 Dema ku ew[c], wan li dûr we
dibînît, ew dê bibhên ku ew bi harî gore gorê diket 13 û dema ew bi hevra zincîr kirî li
aliyê tengê wê da têne dakirin, ew dê bo li nav çonê bipariyên. 14 Îro bo li nav çonekê
nepariyên, lê bo gelek li nav çona bipariyên.´ 15 Bêje, ´Ewe baştire yanjî baxçê
bêpayan ku belêniya wê bi ewên ku hişyarê Vî ne hatiye dan, ew dê bibîte padaş û
armanca wan?´ 16 Wêderê da hemû tiştê ku ew dixwazin heye û ew dê bêpayan
wêderê da bimînin. Ewe li bal Xwedanê te we peymanek girêdayî ye. 17 Di ew Roja ku
Ev dê wan hemûya digel ewên ku wan li kêleka Xwe dê, da diperestin kom bikete ser
hevda. Ev dê bêjît, ´Hûn bûn ku we, ew koleyên Min li rê derêxistin, yanjî ew bixwe li
rê derkevtin?´ 18 Ew dê bêjin, ´Tu paye bilindî! Kêrhatiyê me nîne ku li kêleka Te da,
çi piştîvana vergirin. Lê Te, tenahî daye wan û berebabê wan taku ewan bîreweriyên
Te li bîr kirin û bûyne neteweyek wêran.´ 19 ´Lewma ew dê, ewa ku hûn dibêjin direw
derêxin, ne hûn dikarin dûriyê lê biken, nejî yarmetiyê!´ Eger her kesek li naw we da
nerastiyê biket, Em dê eşkenceyek mezin bi wî bidene tam kirin. 20 Me çi peyamber
pêş te da neşandin ku xwarin nedixwarin û li naw bazara da nedgeriyan. Me hindek li
we kirîne hokarê taqî kirina ewên dîke, tu dê bêhin fereh bimînî? Xwedanê te dibînît.



a: Xwandin (Quran), zêde navê wê Furqan e, yanî cudaker, rastî û nerastiyê li hev cuda diket.
b: Xwandin (Quran)
c: Cehnem

21 Ewên ku çavnihêrê dîtina Me nînin dibêjin, ´Çima firişte bo me neşandine xarê?´
yanjî ´Em dê Xwedanê xwe bibînin?´ Birastî ew xwe gelek mezin dibînin û di
lewçetiya xwe da gelek mezin lewçe dibin.
22 Di wê Roja ku ew firişta dibînin bo tawankara çi mizgînî çinabin û ew dê bêjin,
´Parêzdayî û qedexe ye ´ 23 Û Em dê, rû bikene kiryarên wan û weke tozê belav biken.
24 Lê di wê Rojê da, hevrêyên li naw baxçe da, dê avahiyek bêhtir û cihek baştir bo
bêhin wedanê hebin.
25 Di ew Roja ku asiman dê pê ewra bête ker kirin û firişte dê li dû hevda bêne
şandine xarê. 26 Di wê Rojê da, padişahiya rastî ya Xwedanê rehmê ye û jibo
nebawera ew dê Rojek dijwar bît. 27 Di wê Rojê da, ewê nerastkar dê destê xwe leq det
û dê bêjît, ´Xwezî ez jî digel peyamber ew rêkê da çobam.´ 28 Hewar li min! Xwezî
min ew kes weke heval vernegirtiba 29 wî, ez li bîranînê wêda birim, piştî ku ew bo min
hat, Şeytan hemû gavê xiyanet bi mirov kiriye.´ 30 Peyamber gotiye, ´Xwedan, birastî
neteweya min, ev Xwandine (Qurane) pişt guhê xwe we havêtine´ 31 Bi wî awayî Me,
li naw tawankara da bo hemû Pêşbîna dujminek destnîşan kiriye lê Xwedanê we, weke
rênivîn û yarmetîder têrê heye. 32 Her wisa, ewên nebawer dibêjin, ´Çima hemû
Xwandin (Quran) li carekê da bo wî nehate şandin?´ Belke bi wî awayî Em pê dilê te
qahîm biken û Me dubare xwandiye û nawber daye xwandinê. 33 Ew pê mînakekê
nayêne bal te, bêy ku Em bo te rastî û bêhtrîn şiroveya bînin.
34 Ewên ku li ser rûmetê xwe li cehnemê da hatine kom kirin ewin ku dê li nebaştrîn
cih da bin û herî dûrin li rê. 35 Bêguman Me nivîsîna pîroz da Mûsa û Me bo wî,
Harûnê birayê wî destnîşan kir ku yarmetiya wî bidet. 36 Me got, ´Hûn herduk herine
bal ew netewê ku nikolî li nîşaneyên Me kirîne.´ Paşê Me pê mirinê ew li nav birin.
37 Neteweya Nûh jî, dema ku wan nikolî li peyamberên xwe kirin, Me ew xendiqandin
û Me ew bo mirova kirine nîşane û Me eşkenceyek bijan bo nerastkara amade kiriye
38 û Ad, Semûd û Res û gelek nifşên li nawbera ewan da. 39 Me, mînak dabûne her
yêk li wan û her yêk li wan Me pê mirinê li nav birin. 40 Bêguman ew, hatine ser ew
gundê ku Me baranek nebaş li ser da barandibû, meger ewan nedîtiye? Belê ew
çavnihêr nînin ku bêne vejandin. 41 Dema ew te dibînin, ew tirana bi te diken, ´Eweye
ku Xwe dê weke peyamber rêkirye? 42 Kêm mabû ku ew, me li rêya xwedêyên me
derêxît, eger em bêhn fereh nebana.´ Ew dê bizanin dema ku ew eşkenceyê dibînin
kêye ewê herî dûr li rê. 43 Te ew dîtiye, ewê ku hestê xwe kirîne xwedê xwe, meger tu
dê bibye parêzerê ew kesî? 44 Yanjî tu hizir dikey ku piraniya wan dibhên yanjî
têdigehin? Ne, ew her weke ajelên kevî ne! Belê, ew gelek dûrtir li rê derketine.
45 Meger tu nabînî ku Xwedanê te çawa sîberê dirêj diket? Eger Vî xwastiba, bêguman
Ev dikarî wisa lê biket ku li cihê xwe da rawestît. Me roj kire destikê demjimêra wê,
46 paşê Em kêm kême ewê hêdî hêdî dikêşine bal Xwe.

47 Ev e ku bo te şev kiriye cil, razan kiriye bêhin wedan û roj kiriye vejiyan.
48 Ev e ku baya weke nûçegehanê mizgîniya, pêş rehma Xwe da dişînît û Me, ava pak
li asiman ra şande xarê, 49 belke Em, pê erdê mirî zindî biken û Me weke vexwarin da
gelek ajelên kevî û mirovên ku Me afirnadine.50 Me gelek cara, eve bo mirova dupat
kiriye, belke li ber hindê bîra wan bimînît, lê piraniya mirova napejrînin xêncî
nebaweriyê 51 Eger Me xwastiba, her gundekê Me dê, yêk şandiba ku agahiyê bidetê,
52 li ber hindê peyreviyê li nebawera neke û li dijî wan têbikoşe û pê evê[a] têkoşîna
mezin bike. 53 Ev ê ku her du derya berdan, yêk şirîne bo vexwarinê ewê dîke şor û tale
û Vî perjînek dana nawbeyana wan da ku dabeşkirina wan qedexe diket.
54 Ev e ku bimir li avikê afirand, paşê ew bi xwîn û jiyana hevbeş kirine xizim,
Xwedanê we Ev ê herî bihêze! 55 Lê ew li kêleka Xwe dê, da ew tişta diperestin ku ne
dikarin qazancê li wan biden nejî zirarê, ewê nebawer hemêşe li dijî Xwedanê xwe
yarmetîdere. 56 Me, tu şandî ku tenê mizgînî û agahdariyê bidey. 57 Bêje, ´Ez daxwaza
çi padaşa bo nakem, lê her kesê ku hez diket, bila rêkekê bo bal Xwedanê xwe bigrîte
ber xwe.´ 58 Xwe bispêre Evê herdem zindî, Ev ê ku namirît û pesna paye bilindiya Vî
bike. Ev têrê heye ku gunehê koleyên xwe bizanît 59 Ev e ku hemû asiman û erd û ewa
li nawbera wan da, li şeş roja da afirandin û paşê Xwe li ser text damezirand, Ev
Xwedanê Rehmê ye, lewma pirsa Ev bike, Evê agahdar. 60 Dema ku dibêjine wan,´ Li
ber Xwedanê Rehmê çokê xwe biçemînin û serê xwe binvînin´ Ew dibêjin, ´Xwedanê
Rehmê çiye? Meger dibya em li ber her tiştê tu destûrê didey çokê xwe biçemînin û
serê xwe binvînin?´ Û ew dûrtir li rê derdikevin. 61 Pîroze Ev ê ku komsitêr danane
asiman da û çirayek ku diteyîsît û heyvek ku ronahiyê didet.
62 Ev e, ku şev û roj çêkirin ku hevdu bişopînin, liber hindê, her kesê ku hez diket, bila
bîra xwe da xwedan ket yanjî hez diket sipasdar bît. 63 Koleyên Xwedanê rehmê ewin
ku bi ûstî-xarî li ser erdê da rê diçin û ewên ku tenanet dema ewên nezan jî gazî wan
diken, bi gotinên aştiyê bersiv diden, 64 ewên ku şevê bi çok danan û xwe çemandin,
ser nivandin yanjî ser pê rawestanê derbaz diken, 65 ewên ku dipariyên, ´Xwedanê me,
eşkenceya cehnemê li me dûr bike, birastî eşkenceya wê her berdewam dibît. 66 Birastî
ew mal û ciheke nebaşe bo bêhin wedanê!´ 67 Ewin ku dema diden ne zêde diden nejî
qurnûsin, hevsengiyek wekhev li nawberê da diparêzin, 68 ewên ku li kêleka Xwe dê da
gazî çi xwedêyên dîke naken nejî rihê dikujin, ewa ku Xwe dê qedexe kiriye xêncî bi
maf darî nebît. Nejî zinayê diken. Her kesê ew karane biket dê rûbirûyê sizayê bît,
69 di Roja Vejiyanê da, dê eşkenceya wan dê du qat bît û ta bêdawiyê ew dê li wêderê
da serşor bimînin, 70 xêncî ewên ku peşîmaniya xwe radgehînin, bawer diken û karên
durust diken, Xwe dê dê kiryarê nebaşê wan bikete kiryarên baş. Xwe dê Lêbihore û
Rehmê didet.



a: Xwandin (Quran)

71 Ewên ku peşîmaniya xwe radgehînin û kiryarên durust diken, birastî bi peşîmanî
dizivirine bal Xwe dê. 72 Ewên ku gewahiya direw naden û dema siwikatiyê dibhên, bi
rûmet we li ber da derbaz dibin, 73 ewên ku dema bîreweriya eşkereyên Xwedanê wan
li wan tête kirin, xwe lê ker û kore naken, 74 ewên ku dipariyên, ´Xwedanê me, hevjîn
û zarûkên me bike aramî li ber çavê me. Me bike mînakek bo ewên ku hişyarê Te ne.´
75 Ewên wisa, li ber bêhin fereh bûna wan, dê bi koşka bêne xelat kirin. Wêderê da, dê
bi silav û halpirsîna aştiyê dê pêşwazî li wan bête kirin. 76 Ew dê, ta bêdawiyê li
wêderê da bimînin, cihê bêhin wedan û mala wan xweşe!
77 Bêje,´Eger li ber paryana we nebît, Xwedanê min girîngiyê nadete we, jiber ku we
nikolî lê kiriye, lewma ewa bêguman dê rû bidet.´

## 26. Para Helbestvana

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Ta Sîn Mîm [2] Ewane eşkereyên nivîsîna pîroza zelalin. [3] Meger tu dê xwe
bikujî, eger ew nebine bawermend? [4] Eger Me xwastiba, Me dê karîba bo wan
li asiman ra nîşaneyekê bişînin ku pi wê ûstiyê wan xar maba. [5] Hergava ku li
bal Xwedanê Rehmê we eşkereyek taze bo wan tête şandin, ew pişta xwe
didenê [6] ew nikoliyê lê diken, lê nûçeya eva ku wan henekê xwe pê dikir, dê bi
zûyî bo wan bêt. [7] Meger ewan nezêndaye erdê ku Em çi cûre tiştên giran
buha têda berhem tînin? [8] Birastî lêreda nîşaneyek heye, lê piraniya wan
bawermend nînin. [9] Birastî Xwedanê te Evê Bihêze û Rehmê didet.
[10] Dema Xwedanê te bangî Mûsa kir, ´Here bal neteweya nerastkar,
[11] neteweya Fireûn. Meger ew hişyarê Vî nabin? [12] Wî got, ´Xwedanê min,
birastî ez ditirsiyêm ku ew nikoliyê li min biken [13] û singê min dê teng bît û dê
zimanê min bigrît, lewma rêke dû Harûn, [14] ewan gunehek li ser min hene
lewma ez ditirsiyêm belke ew min bikujin.´ [15] Wî got, ´Ne, hûn herduk jî pê
nîşaneyên Me herin, birastî Em dê digel we bibhên. [16] Hûn herduk jî herine
bal Fireûn û bêjin, ´Birastî Em peyamberên Xwedanê hemû dinyaya ne,
[17] zarûkên Israîl digel me rêke.´ [18] Wî got, ´Meger me tu weke zarûk li naw
xwe da mezin nekirî? Meger tu bo gelek sala, li bal me nemay? [19] Paşê te ew
kiryara xwe kir ku te kiribû, tu li wan nankora bûy.´[20] Wî got, ´Dema ku min
vekir, ez yêk li wan bûm ku li rê derketibûm [21] û ez li ber we helatim, dema ez
li we tirsiyam, paşê Xwedanê min têgeheştin da min û ez kirime yêkek li
peyamberan. [22] Û eweye ew erêniya tu tîniye bîra min ku te zarûkên Israîl
kole kirîne? ´ [23] Fireûn got, ´Ev, Xwedanê hemû dinyaya çiye?´ [24] Wî got,´Ev,
Xwedanê asimana û erdê û hemû tiştê li nawebera wan daye, eger te bawerî
hebît!´ [25] Wî gote ewên li der dorê xwe, ´Hûn nabhên?´ [26] Wî got, ´Ev,
Xwedanê we û Xwedanê berebabê we ye.´ [27] Wî got, ´Birastî ew peyamberê
ku bo we hatiye şandin cin girtiye.´ [28] Wî got, ´Xwedanê rojhelat û rojava û
ewa li nawbera wan da, eger tu hizra xwe bikar bînî!´ [29] Wî got, ´Eger tu li
xêncî min xwedêyeke dîke vergirî, ez dê te danême naw zîndaniya da,´
[30] Wî got, ´Tenanet eger ez belgeyek aşkira bo te bînim?´ [31] Wî got, ´Bes bîne,
eger tu li rast bêjayî.´ [32] Li ber hindê, wî kopalê xwe havête xarê, lêbinêrin û
bibînin, nişkida ew bûye mar! [33] Paşê wî destê xwe derêxist, lêbinêrin û
bibînin! Bo temaşeçiya ew sipî bû. [34] Wî gote serokên derdorê xwe, ´Birastî
ewe cadûgerek fêr bûyî ye! [35] Ew dixwazît pê cadûyên xwe, we li ser erdê we
bikete der! Lewma hûn çi pêşniyar diken?´ [36] Ewan got, ´Ew û birayê wî bo
demekê gîrû bike û nûçe gehana bişîne hemû bajêra, kom ken [37] hemû
cadûgerê fêr bûyî ku bînine bal te.´

38 Lewma cadûger hatibûne kom kirin, bo dema hilbijartî li roja dîhar kirî da,
39 û gotibûne mirova ´Gelo hûn dê kom bin?´ 40 Belke em peyrevî li cadûgera
biken, eger ew ser bikevin!´ 41 Dema ku cadûger hatin, ewan gote Fireûn, ´Dê
padaşek bi me bête dan eger em serkevin?´ 42 Wî got, ´Erê, bêguman hûn dê
paşê nêzîk bin.´ 43 Mûsa gote wan, ´Havêjine xarê ewa ku hûn dê havêjin.´
44 Lewma ewan bendik û kopalên xwe havêtin û gotin, ´Bi hêza Fireûn,
birastî em dê serkevtî bin.´ 45 Paşê Mûsa kopalê xwe havêt, lêbinêrin û bibînin!
Ewê lêba wan qûrt kir 46 lewma cadûger ketine ser çokên xwe û serê xwe
nivandin, 47 Ewan got, ´Em bawerî bi Xwedanê hemû dinyaya diken,
48 Xwedanê Mûsa û Harûn.´ 49 Ew got, ´Pêş ku ez destûrê bideme we, we
bawerî bi wî kir?´ Bêguman ew dibya mezinê we bît, ewê ku hûn fêrî
cadûgeriyê kirîne! Bi zûyî hûn dê bizanin, ez dê dest û pêyê we kitan gohor
bibrim û paşê bêguman we hemûya li xaçê bidem!´ 50 Ewan got ´Çi zirar nîne,
birastî em dê bizivrine bal Xwedanê xwe. 51 Birastî em hêvîdarin ku Xwedanê
me dê li gunehên me bibhorît, çimkî em yêkemîn bawermendin.´ 52 Paşê Me
sirûş da Mûsa, ´Di şevê da, digel koleyên Min herin, birastî dê bikevine dû we
da!´ 53 Paşê Fireûn şandine bajêra ku kom biken, 54 ´Birastî ewane komek
biçûkin 55 û birastî ewane kerbê me diveken 56 û birastî em hemû amade ne.´
57 Lewma, Me, ew li naw baxçe û kanî ava da derêxistin, 58 xizîne û cihê giran
buha. 59 Aha wisa Em bibûne hokar ku zarûkên Israîl mîrat biben, 60 lewma li
dema rojhelatê da ew ketine dû wan da, 61 dema ku her du alî hatine pêş çavê
hevdû, hevrêyên Mûsa gotin, ´Birastî em dê bêne girtin´ 62 Ew got, ´Ne, birastî
Xwedanê min digel mine, Ev dê min rênivînî biket,´63 Paşê Me sirûş da Mûsa,
´Pê kopalê xwe li deryayê bide.´ Ew par vebû û her parek, hindî çiyayek gelek
mezin lê hat 64 û Me ewên dîke înane nêzîk 65 Me Mûsa û hemû ewên digel wî
da rizgar kirin 66 paşê Me ewên dîke xendiqandin.
67 Birastî lêreda nîşaneyek heye, lê piraniya wan bawermend nînin.
68 Birastî Xwedanê we, Evê Bihêze û Rehmê didet. 69 Dubare nûçeya Ibrahîm
bo wan bêje,70 dema ku wî gote bab û netewa xwe, ´Hûn çi diperestin?´
71 Ewan got, ´Em puta diperestin û em dê xwe radest kiriyê ewan bimînin.´
72 Wî got, ´Ew, we dibhên dema hûn li ber wan dipariyên?
73 Yanjî ew qazancê li we diden yanjî zirarê diden?´ 74 Ewan got, ´Belê me dît
ku berebabên me we dikirin.´ 75 Wî got,´Hûn dibînin ku we çi perestiye?´
76 Hûn û berebabên we yên kevnar, 77 birastî ew dijminê minin, xêncî
Xwedanê hemû dinyaya nebît, 78 Ev ê ku ez afirandim û Ev e ku min rênivînî
diket 79 Ev e ku xwarinê didete min û vexwarinê didete min, 80 dema ku ez
nexweşim paşê Ev min derman diket, 81 Ev e ku dê bibîte hokar ez bimrim û
paşê min bînîte jiyanê 82 û Ev e, ez hêvî dikem, di Roja dadweriyê da li şaşiyê
min xweş bît. 83 Xwedanê min, têgeheştinê bide min û min bigehîne dirustkara
84 û li naw nifşên Dawiyê da nav û dengek birêz bide min,

85 min danê naw şêniyên baxçê şadiyê da 86 li babê min bibhore, birastî ew
yêk li wane ku li rê derketiye 87 û di Roja ku ew hatine Vejandin min serşor
neke 88 di ew Roja ku ne mal nejî zarûk dê çi qazanc hebin, 89 lê tenê ewên ku
ji dil we xwe radest kirî têne bal Xwe dê.´ 90 Û baxçe dê bînine nêzîkê ewên
hişyarê Vî 91 û agirê cehnemê dê bînine pêşya ewên ku li rê derketine, 92 dê
bêjine wan, ´Kîwene ewên te diperestîn 93 li kêleka Xwe dê da? Meger ew dê
bikarin yarmetiya te biden, yanjî yarmetiya xwe biden?´ 94 Û paşê dê bêne
firedane naw da, ew digel ewên ku li rê derketibûn 95 û şervanên Iblîs, hemû bi
hevra . 96 Dema ku ew têda digel hev gengeşê diken, ew dê bêjin 97 ´Bi
Xwe dê, birastî em bi aşkira li şaşiyê da bûn 98 dema ku me hûn kirine
hemtayê Xwedanê hemû dinyaya. 99 Xêncî tawankara kesê em li rê
nederêxistin 100 û niha me çi nawbêjvan nînin 101 nejî hevalek dilsoj. 102 Eger
tenê me derfetek dîke heba, me dê karîba bibane bawermend!´ 103 Birastî li
evê da nîşaneyek heye, lê piraniya wan nabine bawermend 104 birastî
Xwedanê te bêguman Bihêze û Rehmê didet. 105 Neteweya Nûh jî nikolî[a] li
peyambera kirin. 106 Dema ku birayê wan Nûh gote wan, ´Meger hûn hişyarê
Xwe dê nabin? 107 Birastî ez peyamberek bawer pê kirî me ku bo we hatime
şandin,108 lewma hişyarê Xwe dê bin û peyrevî li min biken. 109 Ez daxwaza çi
padaşa li we nakem, padaşê min tenê li bal Xwedanê hemû dinyaya ye,
110 lewma hişyarê Xwe dê bin û peyrevî li min biken.´111 Ewan got, ´Çima
dibya em bawerî bi te biken dema ku ewên kêm buha[b] peyrevî li te diken?´
112 Wî got, ´Min çi zanistek heye ku wan pêşta çi dikir? 113 Hisaba wan tenê li
ser Xwedanê mine, eger hûn têbigehin.114 Ez bawermenda dûr nakem. 115 Ez
tenê bi zelalî agahdariyê didem.´ 116 Ewan got, ´ Nûh, eger tu evê nerawestînî,
tu dê yêk li wan bî ku dê bêye kevirbaran kirin.´ 117 Wî got, ´Xwedanê min,
birastî neteweya min nikolî li min kirîne, 118 li ber hindê, dadweriyek qahîm li
nawbera min û ewan da bike û min û ewên ku digel min bawer kirîne rizgar
bike.´119 Li ber hindê Me ew û ewên digel wî da, li gemiyeke tejî da rizgar
kirin, 120 paşê ewên mayî xendiqandin. 121 Birastî, li evê da nîşaneyek heye, lê
piraniya wan nabine bawermend, 122 birastî Xwedanê te Evê Bihêze û Rehmê
didet. 123 Neteweya Ad jî nikolî li peyamberên xwe kirin. 124 Dema Hûd ê
birayê wan gote wan, ´Meger hûn hişyarê Vî nabin?
125 Birastî ez peyamberek bawer pê kirî me ku bo we hatime şandin,
126 lewma hişyarê Xwe dê bin û peyrevî li min biken. 127 Ez daxwaza çi padaşa
li we nakem, padaşê min tenê li bal Xwedanê hemû dinyaya ye. 128 Hûn li ser
her ciheke bilind, nîşaneyekê dadmezrînin ku xwe pê keyfxweş biken? 129 Hûn
bixwe keleha çêdiken belke hûn ta bêdawiyê bimînin? 130 Dema hûn lê diden
hûn weke zordesta lê diden? 131 Lewma hişyarê Xwe dê bin û peyrevî li min
biken, 132 hişyarê Vî bin ku hemû tiştê hûn pê dizanin bo we dabîn kiriye.



a: Haşa kirin, bawerî pê nekirin, gotinê direwîn b: Mirovên hejar û belengaz

133 Vî, ajelên kevî û zarûk dayne we 134 baxçe û kanî jî 135 birastî ez ditirsiyêm
ku eşkenceya Roja gelek mezin dê li ser weda bigrît.´ 136 Ewan got, ´Ew çi
ciyawaziyekê bo me naket, çi tu şîreta li me bikey yanjî şîretê li me nekey,
137 eve tiştek nîne xêncî çanda mirovên berê 138 em nayêne siza dan.´ 139 lewma
ewan nikolî li wî kirin û li ber hindê, Me ew li nav birin. Birastî lêreda
nîşaneyek heye, lê piraniya wan nabine bawermend, 140 birastî Xwedanê we
Evê Bihêze û Rehmê didet. 141 Semûd jî nikolî li peyambera kirin. 142 Dema
birayê wan Salih gote wan, ´Meger hûn hişyarê Vî nabin? 143 Birastî ez jibo we
peyamberek bawer pêkirî me, 144 hişyarê Xwe dê bin û peyrevî li min biken.
145 Ez bo vê daxwaza çi padaşa li we nakem, padaşê min tenê li bal Xwedanê
hemû dinyaya ye. 146 Hûn dê bi tenahî di ewa ku we lêre heye bêne hêlan 147 li
naw baxçe û kaniya da 148 û zevyên dexl û dahna, darên xurma ku meyveyên
nerm pêwe hatine 149 û hûn bi hostatî malên xwe di çiyay da dikolin?
150 Hişyarê Xwe dê bin û peyrevî li min biken 151 peyrevî li destûra sînor
bezêna neken 152 û ewên ku gendeliyê li ser erdê da belav diken û serast kariyê
naken.´ 153 Ewan got, ´Tu li ewanî ku hatî cadû kirin! 154 Xêncî bimireke wek
me tu hîç tiştek dîke nînî, lewma nîşaneyekê pêşanî me bide, eger tu li rast
bêjayî.´ 155 Wî got, ´Ewe hêştirek mêye, bo wê vexwarinek heye, bo we jî
vexwarinek heye li roja destnîşan kirî da, 156 zirarê negehînine wê, neket ku
eşkenceya Roja gelek mezin we bigrît.´ 157 Lê ewan, ew qop kir û ew xemgîn
bûn 158 lewma eşkencê ew girtin. Birastî lêreda nîşaneyek heye, lê piraniya
wan nabine bawermend. 159 Birastî Xwedanê te Evê Bihêze û Rehmê didet.
160 Netewa Lat jî nikolî li peyamberên xwe kirin. 161 Dema ku birayê wan Lat
gote wan, ´Meger hûn hişyarê Vî nabin?´ 162 Birastî ez peyamberekê bawer
pêkiriyê we me 163 hişyarê Xwe dê bin û peyrevî li min biken. 164 Ez bo vê
daxwaza çi padaşa li we nakem, padaşê min bal Xwedanê hemû dinyaya ye.
165 Hûn li naw mirova da xwe digehînine mêra 166 û ewên ku Xwedanê we bo
we weke cot afirandine bêxwedan dihêlin? Belê hûn neteweyekin ku hemû
sînora dibezînin´ 167 Ewan got, ´Lat, eger tu wê nerawestînî, bêguman tu dê li
ewan bî ku dê bêye der kirin.´ 168 Wî got, ´Birastî bêzê min divebît, li ewa ku
hûn diken, 169 Xwedanê min, min û binemala min li ewa ku ew diken rizgar
bike.´ 170 Lewma Me ew û hemû binemala wî rizgar kirin, 171 xêncî pîre jinekê
ku yêkek li wan bû ku paşve ma 172 paşê Me ewên dîke li nav birin,
173 û Me baranek li ser ewan da barand. Bo ewên ku pêşta hatibûne agahdar
kirin baranek nebaş bû. 174 Birastî lêreda nîşaneyek heye lê piraniya wan
nabine bawermend, 175 birastî Xwedanê te Evê Bihêze û Rehmê didet.
176 Ewên naw daristana da jiyan dikirin jî, nikolî li peyamberên xwe kirin.
177 Dema Şueyb gote wan, ´Meger hûn hişyarê Vî nabin? 178 Birastî ez bo we
peyamberekê bawer pê kirî me 179 hişyarê Xwe dê bin û peyrevî li min biken.

[180] Ez daxwaza çi padaşa li we nakem, padaşê min tenê bal Xwedanê hemû
dinyaya ye. [181] Pîvanên tewaw biden, nebine li wan ku dibine hokarê
dorandinê. [182] Bi pîvanên serast bipîvên, [183] mirova li pişka wan bêpar neken.
Ser erdê da nebaşiyê neken û gendeliyê belav neken. [184] Hişyarê Ev bin ku
hûn û nifşên berê afirandine,´ [185] Ewan got, ´Tu yêk li wanî ku hatiye cadû
kirin! [186] Weka me, tu li bimirekê zêdetir hîç tiştek dîke nînî. Birastiyê, em
hizir diken tu li wan direwînayî, [187] bes we bike ku pirtikên asiman li ser me da
bikevin, eger tu li rastbêjayî.´ [188] Wî got, ´Xwedanê min dizanît hûn çi diken.´
[189] Gotine wî direwîn û li ber hindê eşkenceya Roja sîberê ew girtin, birastî ew
eşkenceya Rojek gelek mezin bû. [190] Birastî lêreda nîşaneyek heye, lê piraniya
wan nabine bawermend [191] birastî Xwedanê te Evê Bihêze û Rehmê didet.
[192] Birastî, eve[a] li bal Xwedanê hemû dinyaya we hatiye şandine xarê, [193] riha
bawer pê kirî[b] îna xarê [194] bo ser dilê te, belke tu bibiye yêk li wan ku
agahdariyê bidey [195] bi zimanê zelalê Erebî, [196] birastî eve li nivîsînên pîrozê
mirovên pêşta hatî jî heye. [197] Meger ewe bo wan nîşane nîne ku mamostayên
zarûkê Israîl eve nas kirîne? [198] Eger Me bo ewê ku Ereb neban şandiba xarê
[199] û wî bo ewan vexwanda, hêşta jî ewan dê bawerî pê nekirban. [200] Li ber
hindê, Em welê diken ku li dilê tawankara da derbaz bît, [201] ew bawerî pê
naken taku ew eşkenceyek bijan dibînin, [202] ew dê nişkida li wan bidet, dema
ku ew tênagehin [203] û ew dê bêjin, ´Em dê bikarin paşve biden?´ [204] Çima ew
bo sizaya Me bêhn çikin? [205] Te liberçav girtiye, eger Em bihêlin ew bo hindek
sala xweş biqetînin [206] û paşê ewa ku belêniya wê dabûne wan, bête ser wan,
[207] ew xweşiyên berê çi yarmetiya wan naken. [208] Me çi gund wêran nekirin,
xêncî ku agahîderek hebît, [209] li bal Me we bîranînê bidet, Em çi cara bêdad
nînin. [210] Şeytana eve neînane xarê, [211] eve ne kêrhatiyê wane û nejî di şêyana
ewan daye, [212] birastî pêşgîrî li wan hatiye kirin ku ew guhê xwe bidenê. [213] Li
ber hindê, li kêleka Xwe dê da li ber xwedêyek dîke nepariyê, bila nebiye li
wan ku dê eşkencê bibînin. [214] Agahdariyê bide xizmên xwe yê nêzîk [215] û
baskên xwe li ser ew bawermendên ku peyrevî li te diken şor bike.
[216] Paşê eger ew peyrevî li te neken bêje, ´Ez bêgunehim li ewa hûn diken,´
[217] Xwe bispêre Ev ê Bihêz ku Rehmê didet, [218] Ev ê ku te dibînît dema tu
radibiye ser xwe [219] û bizvîna te jî, li naw ewên ku serê xwe diçemînin da,
dibînît [220] Birastî Ev Bihîstine, Zanîne.



a: Xwandin (Quran)
b: Cibraîl firişte

[221] Ez te agahdar bikem ku şeytan li ser kê têne xarê? [222] Ew li ser hemû
direwînên gunehkar têne xarê [223] bihîstinê derbaz diken û piraniya wan
direwînin [224] û helbestvanên li rê derketî peyrevî li wan diken.
[225] Meger tu nabînî ku ew çawa li hemû dew geliya da digerên [226] û ewê
dibêjin, ewa ku ew naken? [227] Xêncî ewên ku bawer diken, karên durust diken,
gelek cara Xwe dê bîr tînin û piştî ku nerastî li wan hatiye kirin xwe diparêzin
û ewên ku nerastî kirîne dê bizanin ku bo çi zivrînekê ew dê bizvrin.

## 27. Para Mêrû ya

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Ta Sîn, evane nîşaneyên Xwandinê (Quranê) ne, nivîsîneke pîroza zelal,
[2] rênivînî û mizgîniyeke bo bawermenda [3] ewên ku nûbêjê diken, ew xêra ku bo
wan dîhar kirîne diden û jidil we bawerî bi Dawiyê diken. [4] Birastî ewên ku bawerî
bi Dawiyê naken, Me kiryarên wan li pêş çavê wan xemilandine, li ber hindê ew bi
koretî digerên, [5] ewin ku dê eşkencê bikêşin û ew dê bin ku li Dawiyê da, dê ya
herî zêde bidorînin. [6] Birastî te Xwandin (Quran) li Ev vergirtiye ku Biryardere û
Dizanît. [7] Dema Mûsa gote binemala xwe ´Birastî min bi agirekê zaniye, ez dê bo
we nûçeyekê li wê derê bînim yanjî ez dê bo we darikekê hilkirî bînim ku belke
hûn xwe pê gerim ken.´[8] Dema ku ew hate bal, gazî wî kir, ´Pîroze ewê ku li ev
agirî nêzîke û ewê ku li der dorê vê ye û paye bilindî ya Xwe dê ye Xwedanê
hemû dinyaya.[9] Mûsa, birastî Ezim Xwe dê, Evê Bihêz û Biryarder. [10] ´Kopalê
xwe havêje xarê´ Lê dema ku wî dît weke marekê xweşiya, ew zivirî û rewiya û
nezênda pişt xwe, ´Mûsa netirse! Birastî peyamber li pêşberî Min natirsin,
[11] xêncî ewê ku nerastiyê diket û paşê nerastiya xwe digel rastiyê veguherît, birastî
Ez Lêbihorim û Rehmê didem. [12] Destê xwe têke paxela xwe da û ew dê sipî bête
derê, bêy ku zirarê bibînît, li naw ew neh nîşaneyane bo Fireûn û netewa wî,
birastî ew neteweyekin ku bi pêdagrî serkêşin´ [13] Dema ku nîşaneyên Me yên
aşkira bo wan tên, ew dibêjin, ´Bi zelalî eve cadûye!´ [14] Ewan li ber qudetî û
bêdadiyê nikolî lê kirin, herçend ku riha wan zanî ku ew rastiye. Lêbinêre dawiya
ewên ku gendelî belav dikirin çawa bû! [15] Bêguman Me zanist da Dawûd û
Silêman û wan herduya got, ´Pesn bo Xwe dê bît ku serwey gelek koleyên xwe yên
bawermend, qencî digel me kirye.´ [16] Silêman bo mîratgirê Dawûd. Wî got,
´Mirovino, em fêrî zimanê balindeya hatine kirin û pişkek li her tiştekê bi me
hatiye dan, birastî eve qenciyeke aşkiraye.´ [17] Û şervanên Silêman yê cin, mirov û
balinde kom bûn û di rêzê da rûniştin [18] û dema ew geheştine geliyê mêrû ya,
mêrûyekê got, ´Mêrû! Herine avahiyên xwe da, neket ku Silêman û şervanên xwe
we pêpes ken, dema ku ew tênagehin.´ [19] Ew, li ber gotinên wê berfireh bişirî[a] û
got, ´Xwedanê min, hêzê bide min ku ez sipasdarê erêniya Te bim, ew erêniya ku
Te li min û dayk û babên min kiriye ku ez karên baş bikem, Te keyfxweş bikem,
min vergire rehma Xwe da li naw rêza koleyên Xwe yên dirûstkar da.´ [20] Wî
lêkolîn li balindeya kir û got, ´Ez çima pepûkê nabînim? Meger ew lêre nîne?
[21] Ez dê bi dijwarî wî siza bidem yanjî wî serjê kem, meger ku ew hokarek zelal
hebît.´ [22] Lê pepûk bo demek dirêj dûr nema, ew hat û got, ´Min ew dorhêl kiriye
ewa ku te dorhêl nekiriye, ez li Şîbayê ra bi nûçeyek durust hatime bal te.

a: ken hate ser lêvê wê

[23] Birastî min jinek dît ku desthilat li ser wan da heye, ku parek li hemû tişta bi wê
hatiye dan, ewê textek bihêz heye, [24] min dît ku ew û netewa xwe, li şûna
Xwe dê da çokê xwe li ber rojê diçemînin û serê xwe dinvînin. Şeytan kiryarên
wan li pêş çavê wan xemilandine û ew li rê derêxistine, lewma ew nehatine
rênivînî kirin. [25] Meger nabît ku ew çokê xwe li ber Xwe dê biçemînin û serê xwe
binvînin, Ev ê ku ewa li asimana û erdê da veşartiye tînîte der û dizanît ku tu çi
diveşêrî û çi dibêjî? [26] Xwe dê heye çi xwedê çinînin xêncî Vî, Xwedanê textê
bihêz.´ [27] Wî got, ´Em dê bibînin kanê tu rast dibêjî yanjî tu li direvîna bûy. [28] Ew
nameya min bigire û bo wan bibe, paşê ewan bicih bihêle û bibîne ka dê çi
bizvrînin.´ [29] Wê got, ´Serokno, birastî nameyek giran buha geheştiye destê min.
[30] Birastî ew li bal Silêman we ye û birastî ew, ´Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê,
Ev ê ku Rehmê didet, [31] xwe li serwey min negire û bi xwe radest kirin were bal
min.´[32] Wê got, ´Serokno, li ser ew mijara min, amojgariyê bidene min, ez li ser
mijara biryarê nadem taku hûn gewah nebin.´ [33] Ewan got, ´Em mêrên qawetin û
me leşkerek gelek bihêz heye, lê destûr ya te ye, lewma lê binêre ka tu dê çi
destûrê bideye me.´ [34] Wê got, birastî dema ku padişah diçine naw gundekê, ewê
wêran diken û nîşteciyê birûmetê wê serşor diken, eweye ya ku ew diken [35] birastî
ez dê bo wan dîhariyekê rêkem û lêbinêrim ku şanda min dê bi çi bizvrînin.´
[36] Dema ku ew hatine bal Silêman wî got, ´Hûn serwetê[a] pêşkêşî min diken? Ewa
ku Xwe dê daye min bêhtire li ewa ku daye we, herçend ku hûn pê dîhariya xwe
keyfxweş dibin. [37] Bizvrin herine bal wan, bêgûman em dê bi şervana ser wan da
dagirin û ewan hêz nabît ku pêşiya wan bigrin û bêguman em dê wan bi serşorî
bikene derê û ew dê siwik bin.´ [38] Wî got, ´Serokno, kîjan li we dikare textê wê bo
min bînît, pêş ku ew bi xwe radest kirin têne bal min?´ [39] Cinek bihêz û şol ji dest
hatî got, ´Ez dê bo te bînim, pêş ku tu bikarî li cihê xwe da rabî. Birastî ez jibo wê
bihêz û bawer pêkirî me,´ [40] Lê yêkê ku zanista nivîsîna pîroz hebû got, ´Ez dê bo
te bînim pêş ku tu çavê xwe bimiqî.´ Dema wî dît ku li hember wî hate danan, wî
got, ´Ewe qenciyeke li bal Xwedanê min we ku min taqî biket, kanê ez sipasdarim
yanjî nankorim, her kesek sipasdar bît, ew bo riha xwe sipasdare, her kesek nankor
bît, paşê Xwedanê min çi pêvîstî nînin û giran buhaye.´ [41] Wî got, ´Textê wê, bo
wê binoximînin û em dê bibînin kanê ew dê bête rênivînî kirin yanjî ew dê li wan
bît ku nayête rênivînî kirin.´ [42] Li ber hindê dema ku ew hat, hat gotin, ´Textê te
weka winê ye? Wê got, ´Ewe rengê wê didet.´ ´Berî wê da, zanist bi me hatibû dan
û me xwe radest kirbû[b] [43] pêşgîrî li wê dikir ewa ku wê li kêlek Xwe dê, da
diperestî, birastî ew li neteweyek nebawer bû.´ [44] Paşê bi wê hatibû gotin, ´Were
holê da,´ Paşê dema ku wê dît, wê hizir kir ku ew gomek avê ye û lingê xwe rût
kirin. Wî gotê,´Ewe tenê holeke ku pê şûşê hatiye siwaxt kirin,´ Wê got, ´Xwedanê
min, min nerastî li xwe kiriye, ez digel Silêman xwe radestê Xwe dê dikem,
Xwedanê hemû dinyaya.´



a: Mal, heyî, serwet b: Mosliman (xwe radest kirin bi XWE DÊ)

[45] Bêguman Me bo neteweya Semûd birayê wan Salih şand ku ´Tenê Xwe dê
biperestin,´ Ew demûdest bûne du komên nakok. [46] Wî got, ´Neteweya min, çima
hûn lezê lê diken ewa nebaşe pêş ewa baş bînin? Çima hûn daxwaza lêborînê li
Xwe dê naken, belke li ber hindê rehm bi we bête dan?´ [47] Ewan got, ´Em te bi
şûm dibînin û ewên digel te jî.´ Wî got, ´Şûm bûna we li bal Xwe dê ye, belê hûn
neteweyekin ku têne taqî kirin.´ [48] Li naw şar da neh malxê mal hebûn ku li ser
erdê gendelî belav dikirn û serast karî nedikirin. [49] Ewan got, ´Bo yêk bi Xwe dê
sûnd bixwen, em dê bi şevê hêrişî wî biken û binemala wî jî, paşê em dê bêjine
xizmên wî, ´Me li nav birina binemala wî nedît û bêguman em rastiyê dibêjin.´
[50] Bi wî awayî, ewan bernameya xwe darêşt, Me jî bernameyek darêşt dema ku
ew tênedgeheştin. [51] Paşê lêbinêrin ku dawiya bernameya wan çawa bû, paşê Me
ew û netewa wan bi hevra li nav birin. [52] lewma ewane malên wanin, kavilene,
çimkî ewan nerastî kir, birastî lêreda nîşaneyek heye bo neteweyekê ku dizanît.
[53] Me rizgar kirin ewên ku bawer kirbûn û hişyarê Vî bûn, [54] Û Lat dema ku wî
gote netewa xwe, ´Hûn bêrewiştiyê diken dema hûn dibînin? [55] Hûn çima bi
dilbejanî[a] li şûna jina nêzîkê mêra dibin? Belê hûn neteweyek nezanin!´ [56] Tenê
bersiva ku netewa wî dan, ew bû ku gotin, ´Binemala Lat li gundê xwe bikene der!
Birastî ew mirovane xwe pak xwedan diken!´ [57] Me, ew û binemala wî rizgar kirin,
tenê jina wî nebît, Me çarenûsa wê dîhar kir ku yêk li wan bît ku paşve ma [58] û Me
baranek li ser wan da barand, baranek nebaş bû jibo ewên ku hatibûne agahdar
kirin! [59] Bêje, ´Pesn bo Xwe dê bît û aştî li ser koleyên ku Vî helbijartine. Kê
bêhtire, Xwe dê yanjî ewa ku dikene ´hevalê´ Vî? [60] Kê hemû asiman û erd
afirandin? Kê li asiman ra bo we avê dişînîte xarê, bibîte hokar ku pê wê baxçeyên
ciwan şîn bin, we çi hêz nebû ku li naw wan da dara şîn biken, meger xwedêyek
dîke li kêleka Xwe dê da heye? Belê, neteweyek heye ku wekheva peyda diket.
[61] Kêye Ev ê ku erd kire mangehek qahîm û çem danane naw da û çiya bo çêkirin
û li nawbera her du deryaya da perjînek çêkir? Meger çi xwedê dîke digel
Xwe dê hene? Belê piraniya wan nizanin. [62] Kêye ku bersiva ewên tengav didet,
dema ku li ber Vî dipariyên û nebaşiya wan wêda dibet û we li ser erdê dikete
cêgir? Meger xwedêyek dîke li kêleka Xwe dê da heye? Kêm tête bîra we! [63] Kêye
ku we li naw tarîtiya li ser hişkatî û derya yê da rênivînî diket? Kê baya weke nûçe
gihanê mizgîniyê pêş rehma Xwe, da dişînît? Meger xwedêyek dîke li kêleka
Xwe dê da heye? Xwe dê gelek serwey, ew ´hevala´ ye ku bo Vî peyda diken!
[64] Kêye ku afirandin destpê kiriye û carek dîke dubare diket? Kêye ku li asimana
û erdê ra bo we debara dabîn diket? Meger xwedêyek dîke li kêleka Xwe dê da
heye? Bêje, ´Ka belgeyên xwe nîşanî min biden, eger hûn li rastbêja ne.´
[65] Bêje,´Kes li asimana û erdê da, ewa nedîtî nizanît xêncî Xwe dê.´ Ew tênagehin,
ew dê kengê bêne vejandin,

a: Şehwet

66 belê, ew pê zanista xwe nikarin Dawiyê têbigehin belê, sebaret bi hindê ew di
gûmanê dane, belê ew sebaret bi wê kore ne. 67 Û ewên nebawer dibêjin, ´Dema
ku em û berebabên me dibine toz, em dê carek dîke bêne derêxistin? 68 Bêguman
pêşta ew belêniye dayne me û berebabê me jî. Evane[a] tenê efsaneyên ewên pêşta
ne.´ 69 Bêje, ´Erdê da bigerê û bibîne ku dawiya tawankara bûye çi.´ 70 Ser xatira
wan xemgîn nebe û li ber bername rêjiyê wan tengav nebe. 71 Ew dibêjin, ´Ew
belêniye kengê ye, eger tu rastbêjî?´ 72 Bêje, ´Belke ew nêzîke li pişt we, hindek
ewa ku hûn bêhin çikê wê ne.´
73 Birastî Xwedanê we tejî qenciye bo mirova, lê piraniyê wan sipasdar nînin.
74 Birastî Xwedanê we dizanît ku singê wan çi diweşêrît û ew çi aşkira diken,
75 û çi tiştek weşartî di asimana û erdê da çinîne ku li tomarek zelal da nebît.
76 Birastî, ev Xwandine (Qurane) dibêjîte zarûkên Israîl, piraniya eva ku li ser da
nakokî hene 77 û birastî eve rênivînî û rehme bo ewên ku bawer diken. 78 Birastî,
Xwedanê we dê, li nawbera wan da biryarê bidet, pê dadweriya Xwe, Ev Bihêze û
Zanîne 79 Li ber hindê xwe bispêre Xwe dê tu li ser rastiya aşkiray.
80 Birastî tu nikarî wel miriya bikey ku bibhên, nejî tu dê bikarî wel kera bikey ku
guhê xwe bidene pariyanê, dema ku ew pişta xwe didenê û paşta diçin 81 tû nikarî
rênivîniya kora bikey li şaşiya wan da, tu dê tenê wel ewan bikey ku guhê xwe
bidene te, ewên ku bawerî bi nîşaneyên Me diken, li ber hindê ku ewan xwe radest
kiriye[b]. 82 Dema ku li dijî wan da peyv tête cih, Em dê jibo wan li erdê da
rihtiberekê derêxin ku dê digel ew mirovên ku guman li nîşaneyên Me hebûn,
bipeyvît. 83 Li ew Roja ku, Em dê li her neteweyekê, komekê li ewên ku bawerî bi
nîşaneyên Me nekirbûn bicivînin û ew dê bêne rêz kirin 84 ta dema ew digehinê,
Ev dê bêjît, ´We nikolî li nîşaneyên Min kirbûn, dema ku we zanist li ser wan
nebû, yanjî we çi dikir?´ 85 Dê li dijî wan belênî bête cih, liber kiryarên wan yên
nerast û ew napeyvin. 86 Meger ew nabînin ku Me şev daye wan ku têda bêhna
xwe weden û roj bo dîtinê? Birastî lêreda nîşane hene bo ew netewa ku bawer
diket. 87 Di roja ku dê pif bikene zirnayê da, hemû ewên di asimana û erdê dane,
dê bibizdiyên, xêncî ewên ku Xwe dê bixwazît û hemû dê bi ûstî-xariya bêne bal
Vî. 88 Hûn dê çiyaya bibînin û hizir biken ku ew reqin, lê ew dê bimeşin her weke
ewr wêda dimeşin, karê Xwe dê! Evê ku hemû tişt bêkêmasî kiriye. Birastî Ev
agahdarê wê ye ku hûn diken, 89 her kesê ku bi kiryareke baş bêt, ew dê ya li wê
bêhtir hebît û ew dê li tirsa ew Rojê da, parastî bin, 90 lê her kesê ku bi kiryarên
nebaş bêt, dê serûser bête hawêtine naw agir da. ´Meger dê padaş bi we bête dan
xêncî jiboy ewa ku we kiriye?´ 91 Tenê destûr bi min hatiye dan ku Xwedanê ew
şar biperestim, Evê ku bo we pîroz kiriye û hemû tişt yê Vî ye û ferman li min
hatiye kirin ku ez yêk li wan bim ku xwe radest kirîne[c]

a: Basê eşkereyên Xwandinê (Quranê) ye.
b: Mosliman (ewên ku xwe radestê XWE DÊ kirîne)
c: Mosliman

[92] û ez Xwandinê (Quranê) bixwînim.´ Her kesê rênivîniyê bipejrînêt, ew tenê
bixwe rênivîniyê dipejrînît û her kesê ku li rê derkevît, bêje ´Ez tenê yêk li wanim
ku agahdariyê didet.´ [93] Û bêje, ´Pesn bo Xwe dê ye, Ev dê nîşaneyên Xwe pêşanî
te bidet û li ber hindê tu dê wan nas bikey.´ Xwedanê te li ewa ku tu dikey, bê
agah nîne.

## 28. Para Çîrok ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Ta Sîn Mîm 2 Evane eşkereyên nivîsîna pîroza zelalin, 3 Em bo te li nûçeya
Mûsa û Fireûn bi rastiyê dibêjin, bo ew netewa ku bawer diket. 4 Birastî
Fireûn li ser erdê xwe paye bilind û bihêz kir û mirovên wê li ser komên cuda
da dabeş kirin, ew komek li naw ewan da tepeser kirin, kurên wan serjê kirin
û li jinên wan xweş bû, birastî ew yêk li ewên gendel bû 5 lê Me xwast qenciyê
biken li ewên ku ser erdê da hatibûne tepeser kirin, wan bikene rêber û wan
bikene mîratgir. 6 Ku wan li ser erdê da damezrînin û li rêya wan da, nîşanî
Fireûn, Haman û şervanê wan biden, ew tişta ku ew lê ditirsiyan.
7 Me sirûş da, dayka Mûsa, gotê,´Memik bidê, paşê dema ku tu bo ewlehiya
wî tirsiyay, ew havêje naw çem da, netirse û xemgîn nebe, birastî Em dê wî
bo te bizvrînin û wî bikene yêk li wan peyambera.´ 8 Paşê binemala Fireûn
ew hilgirtin ku ew jibo wan bibîte dijmin û xemgînî, birastî Fireûn û Haman
û şervanên wan gunehkar bûn 9 û jina Fireûn got, ´Ew tenahiyek jibo berçavê
min û te! Wî nekuje, belke ew bo me qazanc hebît, yanjî belke em, wî weke
kurekê bixwe xwedan ken.´ Ew tênedgeheştin. 10 Roja paştir, dilê dayka Mûsa
wala bû, kêm mabû ku ew sebaret bi wî aşkira biket, eger Me dilê wê bihêz
nekirba ku ew bibîte yêk li wan ku bawer biket 11 û wê gote xweşka wî, ´Wî
bişopîne.´ Li ber hindê, wê li dûr we ra çavdêriya wî kir, dema ku ew
tênegeheştin. 12 Me, daye li wî qedexe kirbûn pêşta. Lewma wê got, ´Ez we
bibeme bal mirovên malekê ku dê bikarin bo we mezin biket û bo we baş lê
hişar bît?´ 13 Bi wî awayî Me, ew ziwirande bo bal dayka wî, belke li ber
hindê, wê tenahî dîtibît û xemgîn nebît û belke ew bizanît ku belêniya
Xwe dê raste lê piraniya wan, nizanin. 14 Dema ku ew mezin bû û pêgeheşt,
Me têgeheştin û zanist da wî, bi wî awayî Em padaş didene ewên ku başiyê
diken. 15 Ew hate naw şar da, dema ku mirovên wê agahdar nebûn û dît ku
du mêr têda şerê yêk diken, yêk li wan li netewa wî bû û ewê dîke li dujminê
wî bû. Ewê ku li netewa wî bû, bi hewar li dijî ewê dijmin daxwaza yarmetiyê
li wî kir. Lewma Mûsa mistek lêda û ew kuşt. Wî got, ´Ewe dibya karê şeytan
bît, birastî ew dijmineke ku bi aşkira li rê derdêxît.´ 16 Wî got, ´Xwedanê min,
birastî min nerastî li riha xwe kiriye. Liber hindê li min bibhore,´ Paşê Ev li
wî bihorî bû, birastî Ev Lêbihore û Rehmê didet.
17 Wî got, ´Xwedanê min, li ber ew erêniya Te li ser min, ez êdî çi cara
yarmetiya tawankara nakem.´ 18 Roja paştir, ew bi tirs û hişyarî li naw bajêr
da bû, dema ku nişkida ew mêrê ku roja pêştir yarmetî li wî xwastibû, bi
hewar daxwaza yarmetiyê li wî kir. Mûsa gote wî, ´Birastî tu bi zelalî li rê
derketî.´

19 Paşê dema ku wî dixwast li ewê ku dujminê wan her du ya bû bidet, wî got,
Mûsa, tu dixwazî min jî bikujî, her wek ku te dihunê kesek kuşt? Tu tenê
dixwazî li ser erdê bibiye zordest, tu naxwazî bibiye li wan ku tişta serast
diken.´ 20 Paşê, mêrek bihelatin li ew serê dîke şar da hat û got, ´Mûsa, ewên
serok basê kuştina te diken, li ber hindê here! Birastî ez jidil we şîretê dideme
te.´ 21 Li ber hindê bi tirs û hişyarî, wî bicih hêla û wî got, ´Xwedanê min,
min li ew neteweya ku nerastiyê diken biparêze.´ 22 Û dema ku wî berê xwe
daye aliyê Medya, wî got, ´Belke Xwedanê min, min rênivîniyê rêya baş
biket.´ 23 Dema ew geheşte ser avên Meda, wî komek mirova dîtin ku avdanî
dikirin û li kêleka wan da, du jin hebûn ku xwe, li paşve ragirtibûn, wî got,
´We her du ya xêre?´ Ewan got, ´Em nikarin av biden, taku şivan wêda
neçin, babê me mêreke gelek pîre.´ 24 Liber hindê wî, bo wan av dan, paşê ço
bin sîberê û got, ´Xwedanê min, birastî min pêvîstî bi her başiyekê heye ku
Tu bo min bişînî´ 25 Û yêk li wan du jina, bi şermînî hate bal wî û got ´Birastî
babê min gazî te diket, ew dixwazît padaş bidete te, li ber ku te bo me av
dane[a].´ Dema ku ew hate bal wî û serhata xwe bo wî got, wî got, ´Netirse, tu
li ew neteweya ku nerastiyê diket rizgar bûyî.´ 26 Yêkek li wan got, ´Babo, wî
kirê bigre, ew bêhtirîne bo kirê girtinê, bihêz û bawer pêkirî.´27 Wî got,
´Birastî ez dixwazim yêk li wan her du kiçên xwe bideme te, eger tu heşt sala
xizmeta min bikey, lê eger tu deh sala tewaw bikey, ew dê bi daxwaza te bît.
Ez naxwazim ku tişta bo te dijwar bikem, Xwe dê hez biket tu dê min li naw
durustkara da bibînî.´ 28 Wî got, ewe li nawbera min û te da ye, her yêk li
wan duya ez bicih bînim, bila çi bêdadî li min neyête kirin, Xwe dê gewahê
wê ye ku em dibêjin.´ 29 Paşê dema ku Mûsa merc bicih îna û digel binemala
xwe rêvîngî dikir, wî di kêleka çiya da, bi agirekê zanî û wî gote binemala
xwe, ´Lêre rawestin, birastî min bi agirekê zaniye, belke ez dê bo we li wêderê
zaniyariya bînim yanjî darikekê hilkirî ku hûn xwe pê gerim biken.´ 30 Lê
dema ku ew giheştê, dengekê li destê rastê gelî da gazî kirê, li ciheke pîroz ra,
li ser darekê ra ´Mûsa, birastî Ez Xwe dê me, Xwedanê hemû dinyaya.
31 Kopalê xwe havêje xarê.´ Lê dema ku dît kopalê wî weke marekê xoşiya,
ew li tirsa da pişta xwe dayê û helat û nezivrî. ´Mûsa! Nêzîk be û netirse,
birastî tu yêkek li wanî ku ewlehe. 32 Destê xwe têke naw berîka[b] xwe da û ew
dê sipî bête derê, lê zirar nedîtî, bêy hîç tirsekê, destê xwe li kêleka xwe nêzîk
bike. Ewane dê li bal Xwedanê te we, du nîşane bin, bo Fireûn û serokên wî,
birastî ew neteweyekin ku bi pêdagirî serkêşî kirîne.´ 33 Wî got, ´Xwedanê
min, birastî min kesek li wan kuştiye û ez ditirsiyêm belke ew min bikujin.



a: Mûsa peyamber, ajelê wan jibo wan av dabûn! Heyvanê wan jibo wan av dabûn.
b: Paxel, pêşiya kiras, ber singe xwe.

34 Harûnê birayê min, li min rewanbêjtire, lewma wî digel min bişîne ku
yarmetiya min biket û gotinên min piştrast biket, birastî ez ditirsim ku ew
bêjine min direwîn.´ 35 Vî got, ´Em dê destê te bihêz biken, li rêya birayê te
we, Em dê desthilatê bidene we her du ya ku li ber hindê, ew nekarin destê
xwe bidene we. Pê nîşaneyên Me tu û ewên ku peyrevî li te diken dê
serkevin.´ 36 Lê dema ku Mûsa bi nîşaneyên Me yên aşkira we ço bal wan
ewan got,´Xêncî cadûyên berhem înayî, ewane tiştek dîke nînin û sebaret bi
wê, me çi cara li berebabê xwe nebihîstibûn.´ 37 Mûsa got, ´Xwedanê min
bêhtir dizanît ku çi kesek bi rênivînî li bal Vî ra hatiye û çi kesekê dê mala
dawiyê hebît, birastî ewên nerastkar sernakevin.´ 38 Fireûn got, ´Serokno,
xêncî min we çi xwedêyên dîke ku ez bizanim çinînin. Haman, bo min li ser
heriya kelpûça avahiyeke bilind ava bike ku ez zêndeme Xwe dê Mûsa,
birastî ez hizir dikem ku ew li naw direvîna daye.´
39 Ew û şervanên xwe bêy ku maf hebin, li ser erdê qude bûn, ewan hizir dikir
ku ew nayêne zivrandin bo bal Me, 40 li ber hindê Me, ew û şervanên wî
girtin û ew havêtine naw deryayê da. Lêbinêrin ku dawiya nerastkara çawa
bû! 41 Me, ew kirine rêberên ku gazî naw agiri biken û li Roja Vejiyanê da
yarmetiya wan nayê kirin. 42 Me vekir ku nerêniya Me di ev dinyayê da,
ewan bişopînît û di Roja Vejiyanê da, ew dê li naw ewên kerb lê vebûyî da
bin. 43 Piştî ku Me nifşên berê li nav birin, Me nivîsîna pîroz da Mûsa ku
ronakbîrî, rênivînî û rehmê bidete mirova, belke li ber hindê bête bîra wan.
44 Tu li destê rojava amade nebûy, dema ku Me destûr dane Mûsa, tu li naw
gewaha da nebûy 45 Me, gelek nifiş berhem înan ku demek dirêj jiyan û tu li
naw neteweya Med da nejiya ku eşkereyên Me bo wan bixwînî lê, Me
şandibûn, 46 nejî tu li kêleka çiya da amade bûy, dema ku Me bang kirê. Lê
weke rehm li bal Xwedanê xwe we hatî şandin ku agahiyê bideye neteweyekê
ku pêş te da bo wan çi agahîder nehatine, belke li ber hindê bête bîra wan,
47 eger ne, dê karesatek bête serê wan, ber xatira ewa ku wan bi destê xwe
bixwe pêşta şandiye û ew dê bêjin, ´Xwedanê me, Te çima bo me
peyamberek neşand ku me peyrevî li eşkereyên Te kiriban û em dê bibana
naw bawermenda?´ 48 Lê dema ku li bal Me we bo wan rastî hatiye, ew
dibêjin, ´Çima nedayne wî, wek ewên ku bi Mûsa hatibûne dan?´ Meger
ewan nikolî li evê nekirin ku pêşta bi Mûsa hatibû dan? Ewan gotibû, ´Du
cûre cardûgerî yarmetiya hevdu diden, ´ Û ´Birastî Em bawerî bi herdu ya jî
naken.´ 49 Bêje, ´Bes nivîsîneke pîroz li bal Xwe dê bînin ku rênivîniyên
bêhtir li evane herduya didet û ez dê peyrevî lê bikem, eger hûn rast dibêjin.´
50 Lê eger ew bersiva te neden, bes bizane ku ew peyrevî li hestên xwe diken.
Çi kesek li wî zêdetir li rê dûr ketiye, ewê ku peyrevî li hestên xwe diket, bêy
ku hîç çeşne rêniwîniyek li bal Xwe dê we hebît? Birastî Xwe dê, ew netewa
ku nerastiyê diket rênivînî naket.

[51] Birastî Me jiboy wan gotin[a] şandiye belke li ber hindê bîra wan bimînît,
[52] Ewên ku Me, pêş evê da nivîsîna pîroz da wan, ew bawerî pê diken [53] û
dema ku eve bo wan tête xwandin, ew dibêjin, ´Em bawerî pê diken, eve
rastiye li bal Xwedanê me we. Birastî pêş ku eve bêt, me xwe radest kiribû[b].´
[54] Dê du cara padaş bidene wan, çimkî ew bêhn ferehin û nebaşiyê pê başiyê
wêda diben, didene ewên dîke, li ewa ku Me daye wan [55] û dema ku ew
peyvîna pûç dibhên, pişta xwe didenê, dibêjin ´Kiryarên me bo me ne û
kiryarên we jî bo we ne. Aştî li ser we bît! Em nezana nagerên.´ [56] Birastî tu
nikarî ewên ku tu hez lê dikey rênivînî bikey, Ev Xwe dê ye ku dê rênivîniya
her kesê ku Ev dixwazît biket, Ev bêhtir ewên rênivînî kirî nas diket. [57] Ew
dibêjin, ´Eger me digel te peyrevî li rênivîniyê kiriba, em dê li ser erdê xwe
hatibana derêxistin.´ Meger Me bo wan mangehek tenah nedamezirandibû,
cihê ku hemû çeşne berhemekê tîninê, weke debar li bal Me we? Lê piraniya
wan nizanin. [58] Me çend gund wêran kirîne ku xweşî li berhemê jiyana xwe
dibirin! Û piştî wan, bes bo demek kêm nebît kes li avahiyên wan da ne
jiyaye, Emin ku mîratgirin. [59] Xwedanê we çi cara gunda wêran naket bêy ku
despêkê da, peyamberekê li naw ewan da raket ku eşkereyên Me bo wan
bixwînît, nejî Me dê gund wêran kiriban, eger mirovên wê nerastkar neban.
[60] Û her tiştek ku bi we hatiye dan, ew tenê bo keyfxweşiya jiyana ev dinyayê
û xemla vê ye û eva ku bal Xwe dê ye bêhtir û zêde mayandetire, liber hindê
çima hûn hizr lê naken? [61] Meger ewê ku bicih hatina belêniya baş ku Me
dabûyê dê bibînît bête berawrd kirin, digel ewê ku xweşiyên ev dinyayê bi wî
hatine dan, paşê li Roja Vejiyanê da, ew dê li naw ewên gazî kirî[c] da bît?
[62] Di ew Roja ku Ev dê gazî wan biket bêjît, ´Kîwene, ewên ku te digot
hevalê Minin?´ [63] Û ewên ku dê li ser wan da peyv bête cih, dê bêjin,
´Xwedanê me ewane, ewin ku me li rê derêxistin. Me ew li rê derêxistin, her
wek ku em bixwe li rê derketibûn, lê em ewan li pêşya Te da bêxwedan
dihêlin, ewan em nedperestîn.´
[64] Paşê dê bi wan bête gotin ´Liber ´hevalên´ xwe bipariyên û ew dê
bipariyên´ Lê ew bersiva wan naden. Ew dê, sizayê bibînin. Tenê eger ew
hatibana rênivînî kirin. [65] Di ew Roja ku Ev dê gazî wan biket û bêjît,´We çi
bersiv daye peyambera?´ [66] Di wê Rojê da, dê zaniyarî bo wan bêwate bin,
lewma ew li hevdu naprsin.
[67] Lê her kesê ku peşîmaniya xwe ragehandiye, bawer kiriye û karên baş
kirîne, ew dê bikarît hêvîdar bît ku xwe li naw koma ewên ku serkevtî bûne
da bibînît. [68] Xwedanê te her tiştê ku Ev dixwazît diafrînît û hildibjêrît, ewan
çi çare nînin, Paye bilindî ya Xwe dê ye Ev li serwey ew ´hevala´ ne ku bo Vî
peyda diken!



a: Peyam, eşkere, aye
b: Mosliman
c: Gazî biken jibo siza yê.

69 Xwedanê te dizanît ku singê wan çi diweşêrît û çi aşkira diket. 70 Ev
Xwe dê ye çi xwedêyên dîke nînin bes Ev nebît, di ev dinyayê û ya dawiyê da,
pesn bo Vî ye, dadwerî ya Vî ye û tu dê bizivriye bal Vî.
71 Bêje, ´Berçav bigire, eger Xwe dê ta Roja Vejiyanê şeva bêdawî înaba ser
te, çi xwedêyekê xêncî Xwe dê, dê karîba bo te ronahiyê bînît? Meger tu
nabihê?´ 72 Bêje, ´Berçav bigire, eger Xwe dê ta Roja Vejiyanê, bêdawî roj
înaba ser te, çi xwedêyekê xêncî Xwe dê, dê karîba bo te şevê bînît ku tu têda
bêhna xwe wedey? Meger tu nabînî? 73 Li ber rehma Xwe, Ev şev û roj dayne
te, belke tu têda bêhna xwe vedey û belke tu li qenciyên Ev bigerêy û belke li
ber hindê tu sipasdar bî.´ 74 Ew Roj dê bêt ku Ev gazî wan biket, bêjît,
´kîwene ew ´´hevalên´´ Min, ku we digotin?´ 75 Em dê li her neteweyekê gazî
gewahekê biken û bêjin, ´Belgeyên xwe bînin´ Û ew dê bizanin ku rastî ya
Xwe dê ye ewa ku wan berhem înabû, dê ewan bêxwedan bihêlît. 76 Birastî
Qarûn li netewa Mûsa bû lê wî, ew tepeser dikirin. Me xizîneyên wisa
dabûne wî ku kilîlên wan bar giranî li komek mêrên bihêz dikirin. Dema ku
netewa wî gotinê da, ´Xwe qude neke, birastî Xwe dê hez ewan naket ku xwe
qude diken. 77 Pê ewa ku Xwe dê daye te li jiyana ku dê bêt bigerê, lê di ev
dinyayê da xemsariyê li pişka ku mafê te ye neke. Başiyê bike, her wek ku
Xwe dê başî digel te kiriye. Lênegerê ku gendeliyê li ser erdê da belav bikey,
birastî Xwe dê hez gendela naket´ 78 Wî got, ´Ewe tenê li ber xatira zanista ku
min heye, bi min hatiye dan.´ Meger wî nedizanî ku Xwe dê li pêş wî da
gelek nifiş li nav bir bûn, ewên ku gelek li wî zêdetir hêz hebûn û gelek zêdetir
kom kiribûne ser hevda? Lê sebaret bi gunehê wan pirsyar li tawankara
nayête kirin. 79 Ew pê xemla xwe derkete pêşiya netewa xwe, ewên ku
daxwaza jiyana ev dinyayê dikirin gotin, ´Eger me jî heba, weka ewa bi
Qarûn hatiye dan, birastî ew bextek gelek mezin heye´ 80 Lê ewên ku zanist
bi wan hatibû dan gotin, ´Hewar li we! Padaşê Xwe dê bêhtirin bo ewên ku
bawer diken û karên baş diken, nadene kesê xêncî ewên ku bêhin fereh
nebin´ 81 Em bûne hokar ku erd wî û mala wî qurt ket, paşê ew çi kom
çinebûn ku li kêlek Xwe dê, da yarmetiya wî biken, nejî ew li wan bû ku
yarmetiya xwe biket. 82 Ewên ku roja pêştir xwazî kirbûn ku li cihê wî da ban,
gotin, ´Heware! Ev Xwe dê ye ku bi firavanî debarê Xwe didete her yêk li
koleyên Xwe ku dixwazît û lê distînît jî.´ Eger Xwe dê qencî li me nekirba, Ev
dê biba hokar ku ew me jî qurt biket! Heware! Ewên ku bawer naken
sernakevin. 83 Me mala Dawiyê daye ewan ku li ser erdê da li serweriyê
nagerên yanjî gendeliyê belav naken, dawî jibo ewên hişyare.
84 Her kesê bi kiryarekê baş bêtê, ew dê yêke bêhtir li wê hebît, her kesê ku bi
yêke nebaş bêt: paşê ewên ku karên nebaş dikirin, nayêne siza dan xêncî ewa
ku wan dikir.

[85] Birastî Ev ê ku Xwandin (Quran) li ser te kiriye erk, ev dê te bibete cihê
zivrînê. Bêje, ´Xwedanê min dizanît ku çi kesekê rênivînî înaye û kê bi aşkira
li şaşiyê daye.´ [86] Te bixwe jî nedikarî çavnihêrî kiriba ku dê nivîsîneke pîroz
bo te bête şandin, xêncî rehmekê li bal Xwedanê xwe ra. Li ber wê hindê,
nebe yarmetîderê nebawera. [87] Nehêle ku ew te li eşkereyên Xwe dê wêda
bizvrînin, piştî ku ew bo te hatine eşkere kirin. Gazî bike bo bal Xwedanê
xwe û nebe yêkek li ewên ku hevala bo Vî peyda diken. [88] Gazî çi xwedêya li
kêleka Xwe dê da neke, çi xwedê nînin bes Ev nebît. Hemû tiştek dê li nav
biçît, bes rûyê Vî nebît. Dadwerî ya Vî ye û tu dê bizvriye bal Vî.

**29. Para Pîrê**

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Elîf Lam Mîm 2 Meger mirov hizir diken ku dê waz li wan bête înan, eger ew
bêjin ´Em bawer diken´ Bêy ku ew bêne taqî kirin? 3 Bêguman Me ewên pêş
wan da çon jî taqî kirin, bêguman Xwe dê, dê aşkira biket, kanê kîjan rast
dibêjin û bêguman Ev dê aşkra biket kanê kîjan direwa diken. 4 Meger ewên
ku karên nebaş diken hizir diken ku dê bikarin li ber Me birewin? Dadweriya
wan nebaşe! 5 Lê ewên ku hêviya hevdîtina Xwe dê diken, bêguman dema ku
Xwe dê dîhar kiriye dê bêt, Ev Bihîstine û Zanîne. 6 Her kesê ku têkoşînê diket
ew bo xwe têkoşînê diket, birastî Xwe dê pêvîstî bi dinyaya nîne. 7 Ewên ku
bawer diken û karên baş diken, bêguman Em dê nebaşiyên wan bimalin û Em
dê pêka baştrîn kiryarên wan padaş bidene wan. 8 Me ferman li mirova kiriye
ku başiyê digel dayk û babê xwe biken, lê peyreviyê li wan neke, eger ew hewil
biden ku wel te biken tu ewên dîke bikeye ´hevalê´ Min ku te çi zaniyarî ser
wan nîne, tu dê bizivriye bal Min û Ez dê bêjime te ku te çi kiriye.
9 Bêguman Em dê ewên ku bawer diken û karên durust diken wergirine naw
durustkara da. 10 Hindek mirov hene ku dibêjin, ´Em bawerî bi Xwe dê diken´
Lê dema ku ew bo Xwe dê zirarê dibînin, ew hizir diken ku taqî kirina mirova
eşkenceya Xwe dê ye. Lê, eger yarmetiyek li bal Xwedanê te we bo te bêt,
bêguman ew dê bêjin, ´Bêguman Em digel te bûne.´ Meger Xwe dê nizanît ku
çi di singê hemû mirova daye?
11 Bêguman, Xwe dê, dê aşkira biket kanê kê bawer diket û Ev dê aşkira biket
kanê kê durû ye. 12 Ewên ku bawer naken, dibêjine ewên ku bawer diken,
´Rêka me bişopînin û em dê barê gunehê we hilgirin´ Lê ew tiştekê li gunehê
wan hilnagrin, birastî ew direwînin. 13 Bêguman ew dê barê xwe û barên dîke
jî ser da hilgirin û di Roja Vejiyanê da, dê sebaret bi ewa ku wan berhem tîna
dê lêpirsîn li wan bête kirin. 14 Bêguman Me Nûh şande bo bal netewa wî, ew
pênce sala kêmtir li hizar sala li naw ewan da ma, paşê lêmiştê ew girtin dema
ku ewan nerastî dikir. 15 Me, ew û hevrêyên naw gemiyê da rizgar kirin û Me
ewe bo hemû mirova kire nîşaneyek. 16 Û Ibrahîm, dema wî gote netewa xwe,
´Xwe dê biperestin û hişyarê Vî bin, ewe bo we bêhtire, eger hûn bizanin.
17 Hûn tenê li kêlek Xwe dê, da bota diperestin û hûn direwa diafrînin. Birastî
ewên ku hûn li kêlek Xwe dê, da diperestin, ewan jibo we çi debar nînin, li ber
hindê daxwaza debara li Xwe dê biken û Vî biperestin û sipasdarê Vî bin, hûn
dê bizivrine bal Vî. 18 Eger hûn nikoliyê biken, bêguman neteweyên pêş we da
jî nikolî kirin û li ser peyamber nîne, xêncî ku bi zelalî agahdar biket.´
19 Meger, ew nabînin ku Xwe dê çawa afirandinê destpê diket û paşê dubare
diket? Birastî ewe bo Xwe dê hêsane.

20 Bêje, ´Li ser erdê da bigerê û bibîne ku Ev çawan afirandin destpêkir, paşê
Xwe dê, dê afirandina dawiyê berhem bînît. Birastî Xwe dê desthilat li ser
hemû tişta heye. 21 Ev, her kesê ku Ev dixwazît siza didet û rehmê li her kesê
ku Ev dixwazît diket. Hûn dê bêne zivrandine bal Vî. 22 Hûn ne dikarin li ser
erdê, nejî li asimana li ber Vî birewin, li xêncî Xwe dê we ne parêzer hene nejî
dê kes yarmetiya we biket.´ 23 Ewên ku nikoliyê li nîşaneyên Xwe dê û
hevdîtina Vî diken, ewan çi hêviya wergirtina rehma Min çinabin û ewan dê
eşkenceyek bijan hebît. 24 Tenê bersiva ku gelê Ibrahîm dan ewe bû, ´Yan wî
bikujin, yanjî wî bişewtînin!´ Lê Xwe dê ew li agir rizgar kir, birastî lêreda
nîşane hene bo netewa ku bawer diket. 25 Û wî got, ´We li şûna Xwe dê, da
put wergirtine, lê evîna we jibo wan dê tenê di vê dinyayê da bît, paşê li Roja
Vejiyanê da, hûn dê nikoliyê li yêk û du biken û nerêniyê li hevdu biken û dê
penahgeha we agir bît û we çi yarmetîder çinabin.´ 26 Lat bawerî bi wî kir û
got, ´Birastî ez dê koç bikeme bal Xwedanê xwe, birastî Ev Bihêz û Zana ye.´
27 Me, Ishaq û Yeqûb dane wî û Pêşbînî û nivîsîna pîroz danane naw zarûkên
wî da. Di ev jiyanê da Me, padaşê wî danê da û bêguman di jiyana dawiyê da,
ew dê li naw dirustkara da bît. 28 Û Lat, dema ku wî netewa xwe, ´Birastî hûn
kiryarên qirêj diken ku çi mirova pêş we da nekirîne´ 29 Birastî hûn digehine
mêra û rêya wan digrin, li hevdîtinê xwe da hûn karê nebaş diken, tenê
bersiva ku netewa wî dan ewe bû ku gotin, ´Sizaya Xwe dê bîne ser me, eger
tu li rast bêjayî.´ 30 Wî got, ´Xwedanê min, li dijî ew netewa ku gendeliyê
belav diket, yarmetiya min bide.´ 31 Dema ku peyamberên Me mizgînî bo
Ibrahîm înan, ewan got, ´Birastî Em dê şêniyên ew gund li nav biben, birastî
şêniyên wê nerastkarin.´ 32 Ew got, ´Birastî Lat li wêderê ye.´ Ewan got, ´Em
dizanin kê li wêderê ye. Bêguman Em dê wî û binemala wî rizgar biken, xêncî
jina wî, ew dê digel wan bît ku dê li paşve bimînin.´ 33 Dema ku peyamberên
Me hatine bal Lat, ew li ber xatira wan tenagv bû û bo wan ditirsiya. Ewan
got, ´Ne bitirse, nejî xemgîn be, birastî Em dê te û binemala te rizgar biken,
xêncî jina te, ew dê digel ewan da bît ku dê li paşve bimînin, 34 birastî Em dê li
asiman ra sizayekê bînine ser ew şêniyên ew gundî, çimkî ew bi pêdagirî serkêş
bûne. ´ 35 Bêguman Me nîşaneyek li wê hêlaye wêderê jibo neteweya ku hizra
xwe bikar tînît. 36 Bo Meda birayê wan Şueyb. Wî got, ´Netewa min, Xwe dê
biperestin û çavnihêrê Roja dawiyê biken. Kiryarên nebaş neken û li ser erdê
gendeliyê belav neken.´ 37 Lê ewan nikolî li wî kirin, li ber hindê, Me bi erd
hejekê ser wan da girt û bo sibêdê ew naw malê xwe da bûne laş.
38 Ad û Semûd jî, bo we pê avahiyên wan[a], hatiye zelal kirin. Şeytan kiryarên
wan, liber çavê wan xemilandin û rêgiriya wan li rê kiribû, herçend ku ewan
dikarî bibînin.



a: Dîrok û serhata wan pê awahiyê wan da hatiye şirove kirin.

39 Qarûn, Fireûn û Haman jî, bêguman Mûsa bo wan belgeyên zelal birin, lê
ew li ser erdê da qude bûn lê ewan nekarî li ber Me birewin 40 û Me, her yêk li
wan liber gunehên wan girtin paşê Me pê tofana kevirên hûr li hindeka da,
Me hindek dîke jî pê qêrînekê girtin, Me wel hindeka jî kir ku erd ewan qurt
biket û Me hindek jî xendiqandin. Ev Xwe dê nebû ku nerastî li wan kiribû
ewan nerastî li xwe kirbû. 41 Mînaka ewên ku xêncî Xwe dê, bo xwe parêzerên
dîke digrin, weke pîrêyane ku bixwe mala çêdiken. Birastî mala pîrê li
lewaztrîn mala ye, tenê eger ewan zanîba. 42 Birastî Xwe dê dizanît ew li
kêleka Vî da gazî çi tiştê dîke diken, Ev Bihêz û Zana ye. 43 Em ew mînakane
pêşanî mirova diden, lê kes tênagehît bes ewên xwedan zanist nebin.
44 Xwe dê hemû asiman û erd di rastiyê da afirandin, birastî lêreda nîşaneyek
heye bo ewên ku bawer diken. 45 Bêje, eva ku li nivîsîna pîroz da bo te eşkere
bûye, nûbêja bike, birastî nûbêj pêşgiriya kiryarên nebaş û bedrewiştiya qirêj
diket, bîranîna Xwe dê mezintire, Xwe dê ewa tu dikey dizanît. 46 Xêncî
baştrîn rêbazê nebît digel mirovên nivîsîna pîroz gengeşê neke, xêncî ewên ku
li naw wan da nerastiyê diken. Bêje, ´Me bawerî bi eva[a] ku bo me eşkere bûye
heye û eva ku bo we jî eşkere bûye, Xwe dê me û Xwe dê we Yêke, me xwe
radestê Vî kiriye[b].´ 47 Lewma Me bo te nivîsîna pîroz şandiye. Ewên ku Me
nivîsîna pîroz dabû wan bawerî pê diken, her wisa hindek li naw ewane da jî
bawerî pê diken. Kes nikoliyê li eşkereyên Me naket bes nebawer nebin.
48 Te li pêş evê da çi nivîsînên pîroz nexwandibûn, nejî te yêk bi destê xwe
nenvîsîbû, li rewşek wisa da ewên direwîn dê guman kirban. 49 Belê evane
eşkereyên zelalin di singê ewên ku zanist bi wan hatiye dan û nerastkar nebin
kes nikoliyê li eşkereyên Me naket. 50 Ew dibêjin, ´Çima li bal Xwedanê wî ra,
çi nîşane bo wî nehatine şandin?´Bêje, ´Nîşane tenê li bal Xwe dê ne, ez tenê
bi aşkira agahdariyê didem.´ 51 Meger têra wan naket ku Me bo te nivîsîna
pîroz şandiye ku bo wan tête xwandin? Birastî li evê da rehm û bîranîn heye
bo neteweya ku bawer diket. 52 Bêje, ´Li nawbera min û we da Xwe dê têra
Xwe gewahe, Ev dizanît di asimana û erdê da çi heye û ewên ku bawerî bi
direwê diken û bawerî bi Xwe dê naken, ewin ku dê bidorînin.´ 53 Ew te han
diden ku sizayê bilezînî, eger liber demek dîhar kirî neba, dê siza hatiba ser
ewan, lê bêguman nişkida, dê bête serê wan, dema ku ew tênagehin. 54 Ew te
han diden ku sizayê bilezînî, birastî cehnem dê nebawera li xwe bigrît, 55 di ew
Roja ku li ser we û li bin ewan da, dê siza ewan bipêçît û dê bête gotin,
´Tam biken ewa ku we dikir.´ 56 Koleyên min yê bawermend! Birastî erdê Min
ferehe, liber hindê tenê Min biperestin.



a: Xwandin (Quran)
b: Mosliman

[57] Hemû rihek dê mirinê tam biket, paşê bo bal Me ye ku tu dê bêye
zivrandin. [58] Ewên ku bawer kirîne û karên baş kirîne, bêguman Em dê li naw
baxçe da avahiya bidene wan ku li bin wan da çem diherikin. Ta bêdawiyê ew
dê li wêderê bimînin. Padaşê xebatkaran erêniye [59] Ewên ku bêhn ferehin û
xwe sipartine Xwedanê xwe! [60] Çendin ew rihtiberên ku debara xwe xwedan
naken! Xwe dê hem bo wan hem jî bo we dabîn diket, Ev Bihîstine, Zanîne.
[61] Eger tu li wan bipirsî, kêye afirînerê asimana û erdê û heyv û roj bikêr
kirîne, bêguman ew dê bêjin, ´Xwe dê´ bes ew çawa hatine xapandin?
[62] Xwe dê, bi firavanî debara didete her yêkek li koleyên Xwe ku Ev dixwazît
û lê jî distînît, birastî Xwe dê zanist li ser hemû tişta heye. [63] Eger tu li wan
bipirsî, ´Ev kêye ku li asiman ra avê dişînît û pê jiyanê didete erdê, piştî ku ew
mirî ye?´ Bêguman ew dê bêjin, ´Xwe dê´ Bêje, ´Pesn bo Xwe dê ye!´ Lê
piraniya wan hizra xwe bikar naynin. [64] Jiyana ev dinyayê xêncî leyîz û hiş
belawiyê tiştek dîke nîne, birastî mala dawiyê bo jiyanê ye, tenê eger ewan
zanîba. [65] Dema ku ew gemiyekê siwar dibin, ew jidil we li ber Vî dipariyên û
tenê baweriya xwe bi Vî diken, lê dema ku Ev, wan digehînîte ser hişkatiyê,
her demûdest ew ´hevala´ bo Vî peyda diken! [66] Aha wisa ew nankoriya xwe
bo ewa ku Me daye wan nîşan diden û xweş diqetînin, lê ew dê bizanin.
[67] Meger ew nabînin ku Me penahgehek ewleh çêkirye, dema ku li hemû
derdorê wan mirova diben? Bes ew bawerî bi direwa diken û nikoliyê li
erêniya Xwe dê diken? [68] Kê dikarît li ew mirov bêdadtir bît ku sebaret bi
Xwe dê direwekê berhem tînît, yanjî nikoliyê li rastiyê diket, dema ku bo wî
têt? Meger cehnem mangeha nebawera nîne? [69] Lê bêguman, ewên ku bo Me
têkoşînê diken, bêguman Em dê ewan rênivîniyê rêyên Xwe biken. Birastî
Xwe dê digel ewane ku başiyê diken.

### 30. Para Romê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Elîf Lam Mîm [2] Rom hatiye têk şikan [3] di erdê herê nêzîk da, lê piştî têk
şikanê ew dê serkevin. [4] Di dema çend sala da, Xwe dê fermandare li
destpêk û dawiyê da. Di wê rojê da, dê bawermend keyfxweş bin [5] Bi
yarmetiya Xwe dê, Ev yarmetiyê didete her kesê ku Ev dixwazît, Ev Bihêze
û Rehmê didet, [6] belêniya Xwe dê ye û Xwe dê belêniya Xwe naşkênît, lê
piraniya mirova nizanin, [7] ew tenê rûyê derwey jiyana ev dinyayê nas
diken û lê ew agahdarê Dawiyê nînin. [8] Meger ewan çi têbînî sebaret bi
xwe nekirîne? Meger Xwe dê hemû asiman, erd û hemû tiştê li nawbera
wan da ne afirandine, xîncî di rastiyê da û bo demek dîhar kirî,
lê birastî gelek mirov bawer naken ku ew dê Xwedanê xwe bibînin.
[9] Meger ew li ser erdê da negeriyane û ewên pêş xwe da nedîtine ku
dawiya wan çi bû. Ew gelek li wane bihêztir bûn, ewan zêdetir erd kola
bûn û li wan zêdetir li ser da ava kiribûn. Peyamberên wan jî bi belgeyên
zelal hatibûne bal wan, lewma Xwe dê nerastî li wan nekirbû lê ewan
nerastî li xwe kiribû. [10] Paşê, nerastkara dawiyek nebaş dîtin, çimkî ewan
nikolî li nîşaneyên Xwe dê kirin û henekê xwe pê kiribûn. [11] Xwe dê
afirandinê dest pê diket paşê Ev dubare diket, paşê tu dê bizvrî bal Vî.
[12] Di ew Roja ku Demjimêr digehitê da, ewên tawankar dê bêhêvî bin
[13] û ewan çi nawbêjvan li naw ´hevalên´ xwe da çinabin, edî ew dê bawerî
bi ´hevalên´ xwe neken. [14] Di ew Roja ku Demjimêr digehitê da, ew dê li
hewdu bêne cuda kirin, [15] ewên ku bawer kirin û karên durust kirîne, ew dê
li naw baxçe da keyfxweş bin, [16] lê ewên ku bawer nekirî û nikolî li
nîşaneyên Me û hevdîtina Dawiyê kirin, ewan dê bînine naw eşkencê da.
[17] Li ber hindê, di dema êvar û di dema sibe zûya da, payebilindiya
Xwe dê rabgehînin, [18] di asimana û erdê da, di şevê û dema tu nîvrojê day
pesn bo Vî ye. [19] Ev, yê zindî li mirî da der dêxît û yê mirî li zindî da der
dêxît. Ev jiyanê didete erdê, piştî mirina wê û tu jî dê her wisa bêye
derêxistin. [20] Li nîşaneyên Vî ewe ku Vî hûn li tozê afirandine û lê binêrin
û bibînin! Hûn bimir belav bûne. [21] Li nîşaneyên Vî, ewe ku Ev, li we
bixwe, jibo we cot çêkirin ku hûn tenahiyê li wan da peyda biken, Vî rehm
û evîn dana nawbera we da. Birastî lêreda nîşane hene bo netewa ku hizr
lê diket. [22] Li nîşaneyên Vî, afirandina asimana û erdê û ciyawaziya zimanê
we û rengê we ye. Birastî lêreda, bo ewên ku dizanin nîşane hene.
[23] Li nîşaneyên Vî, razana we di şevê da û geriyana we li qenciyên Vî di
rojê da ye. Birastî lêreda nîşane hene bo ewên ku guhê xwe didenê.

[24] Li nîşaneyên Vî, Ev ronahî tirs û hêviyê nîşa we didet û Ev avê li asiman
ra dişînîte xarê ku piştî mirina wê carek dîke jiyanê didete erdê. Birastî
lêreda nîşane hene, bo ewên ku hizra xwe bikar tînin. [25] Li nîşaneyên Vî,
ewe ku hemû asiman û erd bi destûra Vî, li cihê xwe da rawestane.
Paşê, dema ku Ev bi gaziyekê li ser erdê, gazî we diket, hûn dê demûdest
derkevin. [26] Hemû ewên li asimana û erdê da yê Vî ne û hemû jidil we
peyrevê Vî ne. [27] Ev e, afirandinê dest pê diket û Ev dê paşê dupat biket,
ewe bo Vî, hêsantire jî. Paye bilindtrîn şiroveya di asimana û erdê da ya Vî
ye, Ev Bihêze Biryardere. [28] Ev, wê mînakê li we bixwe didete we, meger
hûn ewên ku bidestê rastê hûn xwedanê wanin[a], pê pişka wekhev bi tewawî
dikene hevalên xwe, li eva ku Me daye we? Meger hûn li wan ditirsin,
weka ku hûn li hevdu ditirsin? Bi wî awayî Em eşkereyên Xwe bo neteweya
ku hizra xwe bikar tînît şirove diken. [29] Belê nebawer bêy her çeşne
zanistekê peyrevî li hestê xwe diken. Kê dikarît rênivîniya ewan biket ku
Xwe dê dihêlît li rê derkevin? Ewan çi yarmetîder çinabin.
[30] Li ber hindê, rûyê xwe bide aliyê dînê serast, bi awayek sirûştî Xwe dê
wisa mirov afirandine. Çi guhertin di afirandina Xwe dê da çênabît. Eve
dînê seraste, lê piraniya mirova nizanin. [31] Bi peşîmanî bizvrine bal Vî.
Hişyarê Vî bin, nûbêjên xwe biken û nebine li wan ku ´hevala´ bo Vî
peyda diken, [32] ewên ku dînê xwe dabeş diken û dibine mezheb û her
komek bi aliyê xwe keyfxweş dibe. [33] Dema ku karesat li mirova didet, ew
bi peşîmanî rû li Vî diken û li ber Xwedanê xwe dipariyên, paşê dema ku
Ev dihêlît, ew Rehma Vî tam biken, lêbinêrin û bibînin! Komek li wan
´hevala´ bo Xwedanê xwe peyda diken, [34] bi wî awayî, ew nikoliyê li ewa
ku Me daye wan diken. Bes, ´Xweş biqetînin! Hûn dê bizanin.´
[35] Meger Me bo wan çi desthilat şandiye xarê ku basê hindê diket ku ewan
çi dikire ´hevalê´ Vî? [36] Dema ku Em, dihêlin mirov rehmê tam biken, ew
keyfxweş dibin, lê eger nebaşiyek bête serê wan, liber xatira ewa ku destê
wan bixwe pêşta şandiye, lêbinêrin û bibînin, ew bêhêvî dibin. [37] Meger ew
nabînin ku Xwe dê bi firavanî debara didete her kesê ku Ev dixwazît û
dibirît jî? Birastî lêreda nîşane hene bo neteweya ku bawer diket. [38] Li ber
hindê mafê ewê xizm bidê û ewê xwedan pêvîstî û ewê rêvî, ewe bêhtire bo
ewên ku dixwazin rûyê Xwe dê bibînin. Ewane ne ku dê ser bikevin.
[39] Her tiştekê ku tu bi sûd bidey ku li malê mirovên dîke da buhayê peyda
biket, ew li bal Xwe dê zêde naket, lê ewa ku tu li ew xêra ku jibo te hatiye
dîhar kirin bidey[b] bo daxwaza dîtina rûyê Xwe dê, ew dê zêde biken.



a: Wergêrên ereb dibêjin base mirovê koleye, lê peyva kole bikar nehatiye. Basê ew mirovane ku desthilata wan di destê te daye.
b: Zikat (xêra ku jibo te hatiye dîhar kirin)

40 Ev Xwe dê ye ku hûn afirandine paşê xwarinê didete we paşê Ev e ku dê
bibîte hokar hûn bimrin û paşê dê jiyanê bidete we. Meger hîç yêk li
´hevalên´ we dikarin çi tiştê wisa biken? Payebilindî bo Vî ye û Ev
bilindtire serwey ew ´hevala´ ku ew bo Vî peyda diken. 41 Li ser hişkatî û
deryayê gendelî peyda bûye, li ber ewa ku mirova bixwe bi destê xwe kiriye
û li ber hindê belke Ev bihêlît, ew hindek li ya ewan kirî tam biken, belke li
ber hindê ew bizvirin. 42 Bêje, ´Li ser erdê bigerên û bibînin ku dawiya
ewên pêş we da çawan bû, piraniya wan ´heval´ bo Vî peyda kiribûn.´
43 Li ber hindê, rûyê xwe bide aliyê dînê serast, pêş ku Rojek bêt ku li bal
Xwe dê we çi zivrîn lê çinabît, dê li ew Rojê da dê li hevdu bêne cuda
kirin. 44 Ewên ku bawer nekirbûn, nebaweriya wan li dijî wane û ewên ku
karên durust kiribûn, ewan serûberiya xwe kiriye.45 Ev dê li erêniyên Xwe
padaş bidete ewên ku bawer kirîne û karên durust diken, birastî Ev hez
nebawera naket. 46 Li nîşaneyên Vî, ewe ku Ev baya dişînît ku mizgîniya
tînin ku hûn li rehma Vî tam biken, lewma wel gemiyê diket ku bi destûra
Vî bimeşiyêt ku hûn bikarin li qenciyên Vî bigerên, belke li ber hindê hûn
sipasdar bin. 47 Pêş te da, Me peyamber şandine bo netewên wan, ewan
jiboy wan belgeyên zelal birin û paşê Me tole li ewan wekir ku tawan
dikirin, pêvîst bû ku Em piştîvaniya bawermenda biken. 48 Ev Xwe dê ye
ku baya dişînît ku ewra kom ken, paşê Ev, wan li ser asimana da belav
diket weka ku Ev dixwazît, Ev wel wan diket ku hûr bin û hûn dibînin ku
baran li naw ewan da dibarîte xarê, paşê dema ku Ev dibîte hokar ku li ser
her yêk li koleyên Xwe, da ku dixwazît dibarînît, lê binêrin û bibînin! Ew
keyfxweş dibin 49 herçend pêş ku ew li ser wan da bête şandin, ew bêhêvî
bibûn. 50 Li ber hindê, li bandora rehma Xwe dê binêrin ku Ev çawa
jiyanê didete erdê, piştî mirina wê, bêguman Ev dê jiyanê bidete miriya, Vî
desthilat li ser hemû tişta heye. 51 Lê eger Me bayek şandiba û ewan dîtiba
ku zer dibît, bêguman piştî hindê jî, ew dê berdewam ban li nebaweriya
xwe. 52 Li ber hindê birastî tu nikarî wel miriya bikey ku bibhên û nejî tu
dê bikarî wel kera bikey ku guhdariya gaziyê biken, dema ku ew pişta xwe
didenê û paşve diçin, 53 tu nikarî rênivîniya koreya li şaşiya wan bikey,
tenê ewên ku tu dikari wel wan bikey ku guhdarî biken, ewin ku bawerî bi
eşkereyên Me diken û xwe radest kirîne[a]. 54 Ev Xwe dê ye ku we li
bêhêziyê diafrînît, paşê piştî bêhêziyê, hêzê didet, paşê piştî hêzê bêhêzî û
pirçê sipî diket, Ev diafrînît ya ku Ev dixwazît, Ev Zanîne, Şêyane. 55 Di ew
Roja ku Demjimêr têt, ewên gunehkar dê sûnd bixwen ku ew li
demjimêrekê zêdetir gîro nebûne, ew wisa hatibûne xapandin 56 lê ewên ku
zanist û bawerî bi wan hatiye dan, dê bêjin, ´ Bêguman pêka fermana
Xwe dê taku Roja Vejiyanê tu gîro bûy, ewe Roja Vejiyanê ye, lê te
nedizanî.´



a: Mosliman

[57] Ber hindê li wê Rojê da, mahneyên ewên nerastkar, kêr ewan nayên û
nahêlin ku ew serast kirinê biken. [58] Bêguman di wê Xwandinê (Quranê)
da Me bo mirova hemû çeşne mînak înane, lê eger tu bo wan nîşaneyekê
bînî, bêguman ewên nebawer dê bêjin, ´Tu tenê direwînî´ [59] Bi wî awayî
Xwe dê qepaxê dihawête ser dilê ewên ku nizanin, [60] li ber hindê bêhin
fereh be, çimkî belêniya Xwe dê raste, nehêle ewên ku baweriya qahîm
çinînin te swik biken.

## 31. Para Luqman

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Elîf Lam Mîm 2 Evane eşkereyên nivîsîna pîroza biryarderin, 3 rênivînî û
rehme bo ewên durust kar, 4 ewên ku nûbêja diken, ew xêra ku bo wan hatiye
dîhar kirin diden û çi guman li Dawiyê nînin, 5 ewane li bal Xwedanê xwe we li
ser rênivîniyê ne û ew yê, behremendin. 6 Û ew mirovên ku çîrokên bêkêr
dikirin ku li rêya Xwe dê derêxin, bêy ku zanist hebin û henekê xwe pê diken,
ewan dê eşkenceyek serşorker hebît. 7 Dema ku eşkereyên Me bo wî têne
xwendin, ew bi qudetî pişta xwe didetê da, wek tu bêjî wî nebihîstiye, wek tu
bêjî ker bûn di guhê wî daye, lewma mizgîniya eşkenceyek bijan bide wî!
8 Birastî ewên ku bawer diken û karên durust diken, dê baxçeyên şadiyê hebin,
9 ew cihê ku ta bêdawiyê dê lê bimînin, belêniya Xwe dê raste û Ev Bihêze û
Biryardere. 10 Vî hemû asiman bêy hîç çeşne histûnên ku dîhar diken
afirandine û çiyayên qahîm li ser erdê bicih kirîne, meger ku digel we da
bihejiyêt û Vî hemû çeşine rihtiberek li ser wê belav kirine. Me, li asiman ra av
şande xarê, paşê Me pê wê hemû cûre tiştên giran buha şîn kirin, 11 Eve
afirandina Xwe dê ye. Lewma ka nîşanî Min bide xêncî Vî, ewên dîke çi
afirandine. Belê, ewên nerastkar bi aşkira li şaşiyê dane. 12 Bêguman Me,
têgeheştin dabû Luqman ku sipasdarê Xwe dê bît, her kesê ku sipasdar bît, bo
riha xwe sipasdare û her kesê ku nankor bît Xwe dê çi pêvîstî nînin û jêhatiyê
hemû pesna ye. 13 Dema ku Luqman gote kurê xwe, gava ku wî şîret didane wî
´Kurê min çi ´hevala´ bo Xwe dê peyda neke, birastî peyda kirina ´hevala´ bo
Xwe dê bêdadiyek gelek mezine.´ 14 Me, dayk û bab li mirova kirîne ferman,
dayka we bi bêhêzî li ser bêhêziyê hûn hilgirtine û du sal dikêşît taku we li şîr
veket. Sipasdarê Min û dayk û babê xwe bin, armanc bo bal Mine. 15 Eger ew
hewil biden ku wel we biken ku hûn ewê bikene ´hevalê´ Min ku we çi zanist li
ser da çinîne, bes peyreviyê li wan neken, lê di vê dinyayê da bi mêhrevanî
ewan xwedan ken û peyrevî li rêya ewan biken ku dizivrine aliyê Min. Paşê tu
dê bizvriye bal Min û Ez dê bêjime te ewa ku te dikir. 16 ´Kurê min, birastî eger
hindî giraniya dindika xerdelê jî li raze berekê[a] da veşartî bît, yanjî li li asimana
yanjî li ser erdê, Xwe dê dê ewê bînîte der, birastî Xwe dê Hêdî û Agahdare.
17 Kurê min nûbêjên xwe bike, fermana ewa raste bike û ewa neraste qedexe
bike û digel ewa serê te têt bêhin fereh be, birastî ev mijarê pêvîstî bi pêdagiriyê
heye. 18 Rûyê xwe li mirova nezivrîne, nejî bi qudetî li ser erdê bigerê, birastî
Xwe dê hez mirovê xwe lêbandî û xwe mezinzan naket. 19 Bi navînî[b] rê here û
dengê xwe nizim ke, birastî dengê herî kirêt dengê zirîna kera ye.´



a: Raze ber, ew kevirê bilind û asê (li zimanê erebî da peyva Sexre bikar tînin)
B: Ne gelek taw ne gelek hêdî.

[20] Meger hûn nabînin ku Xwe dê çawa eva li asimana û erdê da bo we bikêr
kiriye û bi têr û pirî hem li rû da hem di naw da erêniya Xwe bi we kiriye? Lê
mirov bêy zanist, rênivînî û pirtûkek ronahîker sebaret bi Xwe dê gengeşê
diken. [21] Dema ku dibêjine wan, ´Peyrevî li eva Xwe dê şandiye xarê biken,´
Ew dibêjin ´Ne, em dê peyrevî li ewê biken ku me dît berebabên me dikirin.
´Tenanet eger Şeytan ew gazî kirbana bo eşkenceya naw guriyê da?´
[22] Her kesê ku rûyê xwe bidete aliyê Xwe dê dema ku karê durust diket, birastî
ew destgira herî peyt girtiye û dahatiya hemû tişta dê li bal Xwe dê bît. [23] Lê
ewên ku bawer naken, nehêle nebaweriya wan te xemgîn biket, ew dê bizivrine
bal Me û Em dê ewan agahdar biken ku wan çi kiriye, birastî Xwe dê dizanît
ku li singa da çi heye [24] Em, dihêlin ku, bo demekê xweş biqetînin, lê paşê Em
dê zextê li wan biken bo naw eşkenceyek dijwar da. [25] Eger hûn li wan bipirsin
kê afrînerê asimana û erdê ye, bêguman ew dê bêjin, ´Xwe dê´ Bêje, ´Pesn bo
Xwe dê ´ Lê piraniya wan nizanin. [26] Ewa li asimana û erdê da ya Xwe dê ye
birastî Xwe dê çi pêvîstî nînin û jêhatiyê hemû pesna ye. [27] Eger hemû darên li
ser erdê pênûs bana û paşê derya jî bi heft deryaya tejî kirban, hêşta jî peyvên
Xwe dê tewaw nedibûn, birastî Xwe dê Bihêze Biryardere. [28] Afirandin û
vejandin, tenê wek ya rihekê ye, birastî  Xwe dê Bihîstin û Dîtine. [29] Meger hûn
nabînin Xwe dê dibîte hokar ku şev têkelî rojê dibît û roj têkilî şevê dibît û roj û
heyv kêrhatî kirîne ku bo demek dîhar kirî bigerên? Xwe dê haj hemû tişta
heye ku tu dikey. [30] Ewe li ber hindê ye ku Xwe dê raste û ewa ku ew li kêleka
Vî da li ber dipariyên direwe û Xwe dê Ev ê herî Bilinde, herî Mezine.
[31] Meger tu nabînî ku pê qenciya Xwe dê gemî li naw deryayê da diçît ku Ev
nîşaneyên Xwe pêşanî te bidet? Birastî lêreda nîşane hene, bo hemû ewên
bêhin fereh û sipasdar.[32] Dema ku şîpelek, weke kona li ser wan da dadigrît, ew
liber Xwe dê dipariyên û jidil we dîndariyê diken. Lê, dema ku Ev wan rizgar
dikete ser hişkatiyê, li naw wan da, hindek li nawberê da ne, kes nikoliyê li
nîşaneyên Me naket xêncî ewên xiyanetkar û nankor. [33] Mirovino, hişyarê
Xwedanê xwe bin û li wê Rojê bitirsin ku çi dayk û bab cihê zarûkên xwe
nagirin, nejî bi hîç şêweyekê zarûk dê cihê dayk û babê xwe bigirin. Birastî
belêniya Xwe dê raste, li ber hindê nehêlin jiyana ev dinyayê we bixapînît, nejî
bihêlin ewên ku sebaret bi Xwe dê dixapînin we bixapînin. [34] Birastî zanista
Demjimêrê[a] li bal Xwe dê ye û  Ev baranê dişînîte xarê û dizanît çi di pizdana[b]
da heye. Hîç rihek nizanît ku sibê dê çi dest xwe we bînît û hîç rihek nizanît ku
dê, li çi erdekê bimrît, birastî Xwe dê Dizanît û Agahdare.



a: Saet a dawiya jiyanê!
b: Malbiçûkê ajela, ew cihê ku zarûk têda mezin dibît

## 32.Para Ser nivandin bo Perestînê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Elîf Lam Mîm 2 ev nivîsîna pîroz ku çi guman têda nîne li bal Xwedanê
hemû dinyaya ra hatiye. 3 Yanjî ew dibêjin, ´Wî eve berhem înaye.´ Ne! Eve
rastiye li bal Xwedanê te ra ji bo te, belke tu agahdariyê bideye neteweyekê ku
pêş te da çi agahîder bo wan nehatine, belke ew bêne rênivînî kirin. 4 Ev,
Xwe dê ye afirînerê asimana, erdê û hemû tiştê di nawbera wan da li şeş roja
da. Paşê Vî, Xwe li ser text bicih kir. Xêncî Vî, te kes çinîne ku te biparêzît û
kes jî çinîne ku nawbêjvaniyê bo te biket, liber hindê, tu nayîniye bîra xwe?
5 Ev serûberiya karûbarê asiman û erdê diket û li dawiyê da, paşê dê li Rojekê
da hilkêşîte bal Vî ku bi hejmara te, dê hizar sala bikêşît. 6 Wisa ye, Ev ê ku
ewa nedîtî û ya dîtî dizanît, Ev xwedan Şêyane û Rehmê didet,
7 Ev ê ku hemû tişt baş afirandiye û destpêkê da mirov li heriya kelpûça çêkir,
8 paşê Vî neviyên wî li avikek siwik çêkirin ku dirêjiyêt. 9 Paşê Ev, şêwe da wî û
li riha Xwe pif kire wî da û bihîstin, dîtin û hest dane te! Tu çend kêm
sipasdarî! 10 Ew dibêjin, ´Dema ku em di erdê da bezir bûn, birastî em dê
carek dîke bêne afirandin?´ Lê, ew bawerî bi hevdîtina digel Xwedanê xwe
naken. 11 Bêje, ´Firişteya mirinê ku tu pê hatî sipartin dê te bibet û paşê tu dê
bêy zivrandin bo bal Xwedanê xwe.´ 12 Eger tenê te karîba tawankara bibînî
ku serê xwe li hember Xwedanê xwe şor diken ´Xwedanê me, me dîtiye û
bihîstiye, me bişîne û em dê durustkariyê biken, em piştrastin.´ 13 ´Eger ew
daxwaza Me ba, bêguman Me dê rênivînî daba hemû rihekê, lê gotina Min
raste.´ Bêguman, Ez dê pê cina û mirova, digel hevda cehnemê tejî bikem´
14 Li ber hindê tam bike çimkî te ev roja hevdîtina xwe li bîr kir, birastî Me tu
li bîr kirî, eşkenceya bêpayan tam bike, ber xatira ewa ku te dikir.´ 15 Tenê, ew
mirov bawerî bi eşkereyên Me diken, dema ku tînine bîra wan, bo perestînê
çokên xwe dadnên û serê xwe dinvînin, bi paye bilindî pesna Xwedanê xwe
diken û ew xwe mezin naken. 16 Tenîştê wan, doşegê bêxwedan dihêlin, bi tirs
û hêvî li ber Xwedanê xwe dipariyên û li ewa ku Me daye wan, ew diden.
17 Hîç rihek nizanît ku çi tiştek li xweşiya berçavê wan hatiye weşartin, weke
padaş jibo ewa ku wan dikir. 18 Liber hindê, meger ewê ku bawer diket
wekheve digel ewê ku bi pêdagirî serkêşiyê diket? Ew wekhev nînin. 19 Ewên
ku bawer diken û karên durust diken, dê baxçên penahgeh bibine mala wan
jibo ewa ku wan kiriye.

[20] Lê ewên ku bi pêdagirî serkêşin, penahgeha wan dê agir bît. Her gava ku ew
bixwazin ku naw da derkevin, dê ewan bizvrînine naw da û dê bêjine wan,
´Eşkenceya agir tam biken ya ku we nikolî lê dikir.´ [21] Bêguman, Em ê,
eşkenceya nêzîk bi wan bidene tam kirin, pêş eşkenceya herî mezin, belke li
ber hindê, ew bizivrin. [22] Kê li ew kes bêdadtire, ewê ku nîşaneyê Xwedanê wî
tînine bîra wî, paşê ew pişta xwe didete wan? Birastî Em dê toleyê li ewên
tawankar weken. [23] Bêguman Me nivîsîna pîroz[a] da Mûsa, liber hindê gumanê
li wergirtina evê[b] neke û Me, ev[c] kire rênivîn bo zarûkên Israîl. [24] Me li naw
wan da rêber çêkirin û pê destûra Xwe rênivînî kirin, dema ku ew bêhinfereh
bûn û bawerî bi eşkereyên[d] Me kirin, [25] birastî Ev, Xwedanê te ye ku dê li
Roja Vejiyanê da, sebaret bi nakokiyê wan, dê li nawbera wan da dadweriyê
biket. [26] Meger, ew jibo wan nebûye rênivînî ku Me pêş ewan da çend nifiş li
nav birîne û ew li naw avahiyên wan da dimeşin? Birastî lêreda nîşane hene,
meger ew paşê nabihên? [27] Meger ew nabînin ku Em avê dihajone erdê hişik
û pê wê çandinê berhem tînin ku ew û ajelên wan yê kevî lê dixwen. Meger
ew paşê nabînin? [28] Û ew dibêjin, ´Ew serkevtine dê kengê bêt, eger tu rast
dibêjî?´ [29] Bêje, ´Li Roja serkevtinê da baweriya nebawera çi qazancê
nagehînîte wan nejî dê çi derfet bi wan bête dan.´ [30] Li ber hindê pişta xwe
bide wan û çavnihêr be, birastî ew jî çavnihêrin.



a: Payeva kitab bikar hatiye, min Kitab bi Nivîsîna pîroz vergêraye, basê Rênivînî (Toratê) ye.
b: Basê Xwandin (Quranê) ye!
c: Basê Rênivîniyê (Toratê) ye!
d: Jibo peyva Ayet min eşkere bikar înaye!

## 33. Para hêzên hevkar

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Pêşbîn, hişyarê Xwe dê be û peyrevî li nebawer û durûya neke, Xwe dê
Zanîne Biryardere. 2 Peyrevî li ev sirûşa[a] ku Xwedanê te jibo te dişînît bike,
Birastî Xwe dê agahdarê kiryarên te heye, 3 xwe bispêre Xwe dê, bo xwe
sipartinê Xwe dê têrê heye. 4 Xwe dê, du dil nedanane naw bedenê mêrekê da,
nejî Ev hevjînên ku we li xwe qedexe kirîne, kirîne daykên we, nejî Ev ew
kurên ku we bo xwe xwedan kirîne, kirîne kurên we. Ewe gotina dewê we ye, lê
Xwe dê rast dibêjît û Ev rênivîniya rê diket.
5 Pê babê wan gazî wan biken, ewe li bal Xwe dê hewsengtire, lê eger hûn
nizanin ku babê wan kêye, bes ew birayê we yê dînî û sipartiyê destê we ne,
hûn gunehbar nabin eger hûn şaşiyekê têda biken bes tenê bo ewa ku dilê we
bi zanebûn diket! Xwe dê, Lêbihore û Rehmê didet. 6 Pêşbîn li bawermenda
zêdetir li wan nêzîktire û jinên wî, daykê wanin. Di nivîsîna pîroza Xwe dê da
daxwaza ewên ku xizmên hevin, li bawermend û koçera bihêztire, bes eger tu
bixwazî ku mêhrevaniyê digel hevalê xwe bikey, eve li nivîsîna pîroz da hatiye
nivîsîn. 7 Dema Me digel Pêşbîna peyman girê da û digel te, Nûh, Ibrahîm,
Mûsa, Îsayê kurê Miryemê, Me peymanek gelek qahîm digel wan girê da,
8 Ev, dê lêpirsînê li rastbêja biket, sebaret bi rastiya wan û Ev eşkenceyek bijan
bo nebawera amade kiriye. 9 Hûn ku bawer diken, erêniya Xwe dê li ser we
bîra we bît, dema ku leşker hatine ser we. Me bayek xurt û leşkerê ku we nedît
şandine ser wan. Xwe dê ewa ku hûn diken dibînît. 10 Dema ku ew li jêr û li jor
we hatine ser we, dema ku çavê we zil bûn û dilê we hate qirka we da û we
texmîn sebaret bi Xwe dê texmîn kirin. 11 Wêderê bawermend hatine taqî kirin
û bi lerzîneke dijwar ew lerizîn, 12 dema ku ewên durû û ewên ku li dilê xwe da
nexweşî hene gotin, ´Xwe dê û peyamber xêncî xeyala belêniya hîç tiştekê
nedane me!´ 13 Dema ku komekê li wan got, ´Gelê Yesrîbê[b], we çi xwe ragirî
nîne, li ber hindê bizvirin!´ Komek li wan daxwaza destûra Pêşbîn kirin,
gotin,´Malên me bêparêzin lê ew bê parêz nebûn, ewan tenê dixwast birewin,
14 eger li hemû aliya da hatibana ser wan û li wan xwastiban ku xiyanetê biken,
bêguman ewan dê wisa kiriba, bêy ku dudiliyê lê biken, bes bi kurtî nebît!
15 Bêguman ewan belênî dabû Xwe dê ku ew pişta xwe nadenê û dê lêpirsîn li
belêniya bi Xwe dê bête kirin. 16 Bêje, ´Rewiyan çi cara qazancê nagehînîte
we, eger hûn li mirin û kuştinê direwin, tenê bo demeke kurt dê bête hêlan ku
hûn xweş biqetînin.´ 17 Bêje, ´Ew kêye ku dikarît te li Xwe dê biparêzît eger Ev
bixwazît zirarê li te bidet yanjî bixwazît rehmê bi te biket?´ Ew xêncî Xwe dê
jiboy xwe kesê peyda naken ku wan biparêzît yanjî yarmetiya wan biket.



a: Vehî
b: Navê şarê Medînê, pêş ku Mihemed peyamber biçîte têda Yesrîb bû.

18 Bêguman Xwe dê dizanît kê li naw we da rêgiriyê diket, ewê ku dibêjîte
birayên xwe, ´Were bal me,´ Û neçine şer, xêncî hindeka.19 Çavnebariya te
diken, lê dema ku tirs têtin, tu dibînî ku ew bi çavên ku dizvirin te dinhêrin
weka kesekê ku ber xatira mirinê li xwe we diçît, lê dema ku tirs derbaz dibît,
ew bi zimanê dijwar hêrişî te diken û çavnebariya başiyê diken. Mirovên wisa
bawer naken û Xwe dê kiryarên wan pûç diket, ewe bo Xwe dê hêsane. 20 Ew
hizir diken ku hêzên hevbeş[a] neçoyne û eger hêzên hevbeş hatin ew dê xweziyê
bixwezin ku ew li çolê jiyaban, naw Ereba da û sebaret bi we nûçeyek
pirsîban. Tenanet eger, ew digel we jî da ban, ewan şer nedkirin, bes kêmekê
nebît. 21Bêguman Peyamberê Xwe dê bo we mînakek bê kêmasiye, bo ew kesê
ku hêviya wî Xwe dê û Roja dawiyê ye û gelek cara Xwe dê bîr tînît. 22 Dema
ku bawermenda hêzên hevbeş dîtin ewan got, ´Eve ya ku Xwe dê û peyamberê
Vî belênî dabûne me, belêniya Xwe dê û peyamberê Vî raste´ Û tenê bawerî û
xwe radest kirina wan zêde kir. 23 Li naw bawermenda da mêr hene ku digel
belêniya xwe bo Xwe dê rastin, li naw wan da, ewê wisa heye ku belênî bicih
înaye û hindek li wan hêşta jî çavnihêrin. Ew bi çi guhertina nehatine guherîn.
24 Li ber wê hindê belke Xwe dê, ber xatira rastiya wan padaş bidete rastbêja û
ewên durû siza bidet, eger Ev bixwazît, yanjî belke peşîmaniya wan bipejirînît,
birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet.
25 Xwe dê ewên nebawer bi kerbê wan we paşve zivirandin, ewan çi qazanc
dest xwe nexistin û li şer da Xwe dê têra bawermend kir. Xwe dê Bihêz û Bi
desthilate. 26 Vî, ew mirovên nivîsîna pîroz ku piştîvaniya ewan dikirin, li
kelehên wan da înane xarê û tirs êxiste dilê wan da, komek te kuştin û te komek
jî êxsîr kirin. 27 Ev bûye hokar ku tu bibiye mîratgirê erd, welat û malê wan û
ew erdê ku hêşta te pêyê xwe nedanaye ser da. Xwe dê desthilat li ser hemû
tişta heye. 28 Pêşbîn, bêje hevjînên xwe, ´Eger hûn jiyana ev dinyayê û xemla
vê dixwazin, bes werin ez dê bo we dabîn bikem û we berdem, berdanek ciwan
29 lê eger hûn Xwe dê, peyamberê Vî û mala dawiyê dixwazin, bes birastî
Xwe dê padaşek gelek mezin bo ewên ku karên baş diken amade kiriye.´
30 Hevjînên Pêşbîni, eger yêk li we bêrewiştiyek aşkira biket, dê sizayek duqat bi
wê bête dan, ewe bo Xwe dê hêsane 31 lê eger her kesek li we, peyrevî li
Xwe dê, peyamberê Vî biket û karên durust biket, Em dê padaşek duqat
bidene wi û Me debarek giran buha jibo wi amade kiriye.
32 Hevjînên Pêşbîni[b], li naw jina da hûn weka kesê nînin. Eger hûn hişyarê Vî
ne, bi nermî nepeyvin, bila ewên ku di dilê xwe da nexweşin, dilbijaniya[c] we
neken. Lê bi şêwazek jêhatî bipeyvin,



a: Jibo peyva Ehzab, min Hêzên hevbeş bikar înaye.
b: Hevjînên Mihemed peyamber, min bo peyva Nebî peyva pêşbîn bikar înaye!
c: Hewesa we neken, dilê wan neçîte we, şehweta wan bo we nerabît.

[33] mala xwe da bimînin û xwe pêşan neden, weka nîşan dana demên nezaniya
berê[a] û nûbêjên xwe biken, ew xêra ku bo we hatiye dîhar kirin biden û
peyrevî li Xwe dê û peyamberê Vî biken. Xwe dê tenê dixwazît ku napakiyê li
we dûr ket û we mirovên malê[b] pê pakiyê pak biket. [34] Bîra we bimînît ku li
malên we da li eşkereyên Xwe dê çi hatiye xwandin û li têgeheştina Vî.
Birastî Xwe dê Hêdî û Agahdare. [34] Bo ew mêrên ku xwe radestî Xwe dê
kirîne[c], bo ew jinên ku xwe radestî Xwe dê kirîne û mêrên bawermend û jinên
bawermend, mêrên peyrev û jinên peyrev, mêrên rastbêj û jinên rastbêj, mêrên
bêhin fereh û jinên bêhin fereh, mêrên ûstîxar û jinên ûstîxar, mêrên xêrxwaz
û jinên xêrxwaz, mêrên ku rojî dibin û jinên ku rojî dibin, mêrên ku dawêna
xwe pak diparêzin û jinên ku diparêzin, mêrên ku gelek cara Xwe dê bîr tînin
û jinên ku bîr tînin, Xwe dê bo wan lêbihorîn û padaşek gelek mezin amade
kiriye. [36] Dema ku Xwe dê û peyamberê Vî li ser mijarekê birayrê diden ku
pêwendî bi wan heye, kêrhatiyê jinên bawermend û mêrên bawermend nîne ku
xwe xwedan biryar bizanin, ewê ku peyreviyê li Xwe dê û peyamberê Vî neket
bêguman ew bi aşkra dûr li rê derketiye. [37] Dema te gote ewê ku li aliyê
Xwe dê we erênî lê hatibû kirin û li aliyê te we erênî lê hatibû kirin, ´Jina xwe
xwedan ke û hişyarê Xwe dê be lê´ Te di dilê xwe da weşart, eva ku Xwe dê,
dê paşê eşkere kirba, tu li mirova ditirsiyay, lê eva herî serast ewe ku tu li
Xwe dê bitirsî. Dema ku Zeyd edî ew nedixwast[d], Me bo jiyana hevbeş ew da
te, liber hindê ku jibo bawermenda çi nexweşî neyête pêş sebaret bi jinên ew
kurên ku bixwe xwedan kirî, piştî ku edî ew, wan naxwazin. Dibya fermana
Xwe dê bête cihbicih kirin, [38] nabît Pêşbîn di hîç çeşne tengasiyekê da bît,
sebaret eva ku Xwe dê bo wî kiriye erk. Rêbaza damezirandiya Xwe dê ye bo
ewên ku pêşta mirîne. Fermana Xwe dê çarenûsa nivîsiye! [39] Ewên ku
peyamên Xwe dê digehînin û li Vî ditirsin û xêncî Xwe dê çi kesê dîke natirsin,
jibo lêpirsînê Xwe dê têrê heye. [40] Mihemed babê we hîç mêrekê nîne, lê ew
peyamberê Xwe dê ye û ew Pêşbînê herî dawiyê ye û Xwe dê hemû tişta
dizanît. [41] Hûn ku bawer diken Xwe dê bîr bînin, gelek cara bîr bînin [42] û
sibêdê û êvara Vî paye bilind biken, [43] Ev e ku pîroziya dişînîte ser we û
firişteyên Vî jî, bo hindê ku Ev, we li tarîtiyê da derêxîte ber ronahiyê. Ev digel
bawermenda Birehme, [44] Roja ku Vî dibînin, dê bi ´Aştî´ rewşa Vî bipirsin û
Ev padaşek giran buha bo wan amade kiriye. [45] Pêşbîn, birastî Me tu weke
gewah şandî ku mizgînî û agahiyê bidey,



a: Dema berê ku Xwe dê peyamê bidete Mihemed peyamber, dema put perestiyê.
b: Mala Mihemed peyamber.
c: Mosliman.
d: Mihemed peyamber kurek xwedan dikir ku navê wî zeyd bû, Zeyd jina xwe nexwast, bi destûra Xwe dê, Mihemed peyamber jiyana hevbeş digel ew jinê pêk îna. Xwe dê, jiyana Mihemed peyamber jibo bawermenda kiriye mînak.

[46] ewê ku bangî mirova bo bal Xwe dê diket bi destûra Vî û çirayeke
ronahîder. [47] Mizgîniyê bide bawermenda ku ewan li bal Xwe dê, dê qenciyek
gelek mezin hebît. [48] Peyreviyê li nebawera û durûya neke, guhê xwe nede
zirara wan û xwe bispêre Xwe dê, bo sipartinê Xwe dê têrê heye.
[49] Bawermendino, dema ku we jiyana hevbeş digel jinên bawermend pêk îna û
pêş ku hûn destê xwe bidene wan, we, ew berdan, mafê we nîne ku dema
rawestanê bo wan bihejmêrin. Lewma, bo wan dabîn biken û ewan berden,
berdaneke ciwan. [50] Pêşbîn, birastî Me hevjînên te bo te qanûnî kirîne, ewên ku
te xelatê bûkiniya wan daye û ewên ku bi destê rastê yê te ne[a] û ewên ku
Xwe dê dayne te û kiçên mamên te û kiçên metên te, kiçên xalên te, kiçên
xaletên te, ewên ku digel te koç kirine û jineke bawermend eger xwe pêşkêşî
Pêşbîn biket û Pêşbîn bixwazît digel da jiyana hevbeş pêk bînît, tenê bo te ye û
bo bawermenda nîne, Em tam dizanin ku Me bo wan çi tiştek kiriye erk,
sebaret bi hevjînên wan û ewên ku bi destê rastê yê wanin. Bo hindê ku te çi
tengasî çinebît. Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. [51] Tu dikarî paşve bidey her
yêkê li wan ku tu dixwazî û bibeye bal xwe her yêkê tu dixwazî û her kesê tu
hez dikey li ewên ku te paşve dabûn, çi tawan li ser te nîne, ewe gelek jêhatîtire,
ew dê dilxweş bin û xemgîn nabin û bi ewa ku te daye wan hemûya ew dê têr
bin. Xwe dê dizanît ku di dilê we da çi heye, Xwe dê Zanîne, Pêdagiriye.[52] Piştî
ewê jin bo te qanûnî nînin, nejî ewan weguherî bi hevjîna, tenanet eger
ciwaniya wan jî te dilxweş biket. Xêncî ewên ku bi destê rastê yê te ne, Xwe dê
çavdêriyê li ser hemû tişta diket. [53] Bawermendino, bo xwarinê neçine malên
Pêşbîn da, meger ku bo xwarinê destûr bi we hatiye dan, bêy ku xwe gîro biken
taku amade bît. Lê dema hûn têne gazî kirin paşê herne jor, piştî ku we
xwarina xwe xwar, herine derê. Wêderê nemînin ku bipeyvin, birastî ewê
Pêşbîn diêşand û ew şermê li we diket. Lê Xwe dê şermê li rastiyê naket û
dema tu tiştekê li wan dixwazî, li pişt perjînekê li wan bixwaze, ewe bo dile te û
dilê ewan jî paktire. Bo we nîne ku hûn peyamberê Xwe dê bêşînin, hûn nabît
çi cara piştî wî jiyana hevbeş digel hevjînên wî pêk bînin, birastî ewe dê li bal
Xwe dê gelek mezin bît! [54] Çi tu tiştekê aşkira bikey yanjî ewê weşêrî, birastî
Xwe dê sebaret bi hemû tişta dizanît. [55] Çi guneh li ser wan nîne sebaret bi
babê wan, kurên wan, birayên wan, kurên birayên wan, kurên xweşkên wan,
jinên wan yanjî ewên ku bi destê rastê yê wanin, hişyarê Xwe dê bin. Birastî
Xwe dê li ser hemû tişta gewahe. [56] Birastî Xwe dê û firişteyên Vî, pîroziya
dişînine ser Pêşbîn, hûn ku bawer diken hûn jî wî pîroz biken û li rewş pirsînê
da aştiyê bidene wî. [57] Birastî ewên ku bêrêziyê bi Xwe dê û peyamberê Vî
diken, Xwe dê ew nerênî kirîne li vê dinyayê û Dawiyê da jî û eşkenceyek
serşorker bo wan amade kiriye,



a: Li gor gotina vergêrên ereb base mirovên koleye, herçend ku peyva kole bikar nehatye. Ew mirovên ku desthilata wan destê te daye.

[58] û ewên ku bêrêziyê bi mêrên bawermend û jinên bawermend diken jibo
xêncî ewa ku wan dest xwe înaye, bêguman ew barê boxtanê hildigrin û
gunehê bicih tînin. [59] Pêşbîn, bêje hevjînên xwe û kiçên xwe û jinên
bawermend ku cilên xwe yê derê li ser xwe da bînine xarê. Ew hinde dê bibîte
hokarek zêdetir ku ew bêne naskirin û bêrêzî bi wan neyête kirin û Xwe dê
Lêbihore û Rehmê didet.[60] Eger ewên durû û ewên ku li dilê xwe da nexweşî
hene û ewên ku li naw şar da direwa belav diken nerawestin, Em dê te li dijî
wan biazrînin û paşê ew dê tenê bo demeke kurt cînarê te bimînin. [61] Ew dê
bêne nerênî kirin, li her derê ew bêne peyda kirin, ew dê bêne desteser kirin û
bi kuştinê bêne li nav birin. [62] Xwe dê bo ewên ku pêşta çoyne ew rêbaze
damezranidiye û tu çi guhertinê li rêbaza Xwe dê, da nabînî, [63] Mirov sebret bi
Demjimêrê li te dipirsin, bêje, ´Xwe dê bi tenê zanista vê heye.´ Çi dê te
têbigehînît? Belke Demjimêr gelek nêzîk bît. [64] Birastî Xwe dê ewên nebawer
nerênî kirîne û agirek geş bo wan amade kiriye. [65] Ew dê ta bêdawiyê wêderê
da bimînin, bêy ku hîç kesek pişta wan bigrît yanjî yarmetiya wan bidet.
[66] Roja ku rûyê wan di naw agir da dizvrît, ew dê bêjin, ´Xwezî me peyrevî li
Xwe dê û peyamber kiriba´ [67] Û ew dê bêjin, ´Xwedanê me! Birastî me
peyrevî li serok û serwerê xwe kirbû û ewan em li rê derêxistin. [68] Xwedanê
me! Eşkenceyeke duqat bide wan û bi nerêniyeke mezin ewan nerênî bike.´
[69] Bawermendino, weke wan nebin ku bêrêzî bi Mûsa kiribûn, Xwe dê ew li
gotinên wan pak kir û li bal Xwe dê birûmet we rêz lê hatibû girtin.
[70] Bawermendino hişyarê Xwe dê bin û bi peyvên rast bipeyvin [71] û Ev dê
kiryarê we bo we serast biket û dê li gunehê we bibhorît. Her kesê peyrevî li
Xwe dê û peyamberê Vî biket bêguman ew dê serkevtineke gelek mezin dest
xwe bêxît.[72] Birastî Me bawerî pêşkêşî asimana, erdê û çiyaya kir, ewan
nepejirand ku hilgirin û lê tirsiyan, lê mirov hilgirt, birastî ew bêdad û nezan
bû. [73] Liber hindê belke Xwe dê sizayê bidete mêrên durû, jinên durû, mêrên
ku ´hevala´ bo Vî peyda diken û jinên ku ´hevala´ bo Vî peyda diken û belke
Xwe dê peşîmaniya mêrên bawermend û jinên bawermend bipejrînît.
Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet.

## 34. Para Şîbayê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Pesn bo Xwe dê ye, Evê ku ewa di asimana û ewa di erdê da ya Vî ye û pesn
bo Vî ye di Dawiyê da, Ev dadwerekê agahe. 2 Ev dizanît ku çi diçîte erdê da û
çi lê tête der û çi li asiman ra tête xarê û çi diçîtê da. Ev Rehmê didet û
Lêbihore. 3 Lê ewên nebawer dibêjin, ´Demjimêr nayête ser me.´ Bêje, ´Belê
bi Xwedanê min, bêguman ew dê bête ser we! Zanayê ewa nedîtiye! Tenanet
giraniya nixteyekê jî li asimana û erdê da jî bezir nabît, nejî li wê biçûktir yanjî
mezintir ku li tomarek aşkira da nebît. 4 Bi wî awayî Ev belke padaş bidete
ewên ku bawer diken û karên durust diken, ewan dê lêbihorîn û debarek giran
buha hebît.´ 5 Lê ewên ku li dijî eşkereyên Me dixebitin ku wan têk bişkînin,
ewan dê eşkenceya êşek bijan hebît. 6 Ewên ku zanist bi wan hatiye dan, ew
dibînin eva li bal Xwedanê te ra bo te hatiye şandin rastiye û ev rênivîniyê
rêya Ev ê Bihêz û hêjayê hemû pesnê diket. 7 Lê nebawer dibêjin, ´Em te
bibene bal mêrekê ku te agahdar biket dema ku tu di pirt pirt bûnê da, bi
tewawî pirt pirt bûy tu dê ser li nû bêye afirandin? 8 Meger wî sebaret bi
Xwe dê direwek çêkirye yanjî cinek di wî daye?´ Belê ewên ku bawerî bi ew
Dawiyê neken, ew dê eşkencê bikêşin û şaşiyek gelek mezine. 9 Meger, ew
nazêndene ewa ku li pêşya wan daye û ewa ku li pişt wan daye li asiman û
erdê da? Eger Em bixwezin Em dikarin wel erdê biken ku wan qurt biket yanjî
bihêlin ku li asimana ra pirtik berbine ser wan, birastî lêreda nîşaneyek heye
bo hemû ew koleyên ku dizivrin. 10 Bêguman Me li qenciyên Xwe dane
Dawûd. Me got, ´Çiyano, pesna Xwe dê digel wî dupat biken û hûn balinde jî
wisa biken.´ Me bo wî asin nerim kir. 11 ´Qapûta li rêza zincîra çêke û
nawbera wan jî baş bipîvên, serast kar biken, ewa hûn diken Ez dibînim.´
12 Jibo Silêman jî ba. Danê wê yê sibêdê mangekê û danê wê yê nîwro mangek
bû. Me, wel kaniyeke birinc[a] kir ku bo wî biherikît û li naw cina da jî ew
hebûn ku pê destûra Xwedanê Vî li bin desthilata wî da kar dikirin. Eger yêkê
li wan li destûra Me la daba, Me dihêla ku ew eşkenceya guriya geş tam biket.
13 Ewan bo wî, her tiştê ku wî dixwast çê dikirin, koşk, şêwe, hewzên ku hindî
gerên avê mezin bûn û mencel jî çêdikirin. ´Binemala Dawûd bi sipasdarî
bixebitin, lê hindek li koleyên Min sipasdarin.´
14 Paşê dema ku Me mirina wî ragehand, hîç tiştekê nîşa ewan neda ku ew
miriye, bes rihtiberek erdê nebît ku kopalê wî dixwar. Lê dema ku ew kete
xarê bo cina aşkira bû, eger ewan ya nedîtî zanîba, ew di eşkenceya serşorker
da nediman.



a: Birinc jî wek mîs û zîv ye, lê rengê wê sipî ye!

15 Bêguman bo Şîbayê jî di cihê jiyana wan da nîşaneyek hebû, du baxçe, yêk
li destê rastê, yêk li destê çepê ´Li ew debarên ku Xwedanê we bo we dabîn
kirîne bixwen û sipasdarê Vî bin, erdekê baş û Xwedanê we Lêbihore.´
16 Lê ewan rûyê xwe lê zivrand, li ber hindê Me li bendavê ra lêmişt berda ser
wan û Me her du baxçeyên wan digel baxçeyên ku meyveyên tal berhem
tînan veguhertin û ´Temrîsk´ û çend tiştên li darên ´Lote´ ê.
17 Bi wî awayî Me ew siza dan, çimkî ewan bawer nekir. Meger Em dê kesek
dîke xêncî nankora siza biden? 18 Gundên ku pêş çava xûya dikirn, Me
danabûne li nawbera ewan û ew gundên ku Me pîroz kirbûn, Me rêwîngiya li
nawbera wan da dîhar kiribû, ´Şev û roj bi tenahî li nawber da hatûçonê
biken.´ 19 Lê ewan got, ´Xwedanê me, nawbera hatûçona me dirêj bike!´
Ewan nerastî digel xwe kir Me ew kirine serhat û Me bi tewawî ew belav kirin.
Birastî lêreda nîşane hene bo hemû ewên bêhin fereh û sipasdar.
20 Bêguman Iblîs li rêya wan da texmîna xwe rast dêrêxist, li ber hindê, ewan
peyrevî li wî kirin xêncî komek bawermenda nebît 21 Herçend ku wî çi
desthilat li ser ewan da nebû, xêncî hindê ku Em aşkira biken, ewên ku bawerî
bi Dawiyê hene li ewên ku gumanê lê diken, Xwedanê te parêzerê hemû tişta
ye. 22 Bêje, ´Gazî ewên ku tu li kêleka Xwe dê, da li ber wan dipariyê bike!´
Ne li asimana û nejî li erdê da ew xwedanê nixteyekê jî nîne, nejî ewan hîç
pişkek di wan da heye, nejî bo Vî li naw ewan da yarmetîder hene.
23 Digel Vî da, nawbêjvaniyê çi qazanc nîne, xêncî ewên ku Ev destûrê didete
wan.´Piştî ku tirs li dilê wan tête hildan, ew dê bêjin, ´Xwedanê we çi got?´
Ew dê bêjin, ´Rastî´ Ev herî Bilinde, herî Mezine. 24 Bêje, ´Kêye li asimana û
erdê ra bo te dabîn diket?´ Bêje, ´Xwe dê, birastî yan em yanjî hûn li ser
rênivîniyê ne, yanjî bi aşkira şaşin.´25 Bêje, ´Sebaret bi gunehên ku em diken
lêpirsîn li te nayête kirin, nejî sebaret bi ewa tu dikey dê lêpirsîn li me bête
kirinê.´ 26 Bêje, ´Xwedanê me dê me kom kete serhev, paşê dê bi rastiyê li
nawbera me da dadweriyê biket, Ev Dadwerê Zanaye.´
27 Bêje, ´Ka nîşanî min biden ewên ku we, weke heval bo Vî peyda kirîne,
belê birastî Ev Xwe dê ye Bihêz û Têgeheştiye.´ 28 Me tenê tu şandî ku bi
taybetî mizgînî û agahdariyê bideye mirova, lê piraniya mirova nizanin.
29 Û ew dibêjin, ´Eger tu rast dibêjî, ev belêniye dê kengê bête?´30 Bêje, ´We
bo Rojekê hevdîtin heye ku hûn nikarin tenê bo demjimêrekê jî paşve biden,
nejî bidene pêş.´ 31 Ewên nebawer dibêjin,´Em çi cara ne bawerî bi ev
Xwandinê (Quranê) nejî bi ewên pêş evê da diken.´ Eger tenê te karîba bibînî
dema ku dê nerastkara li hember Xwedanê wan bidene rawestandin, hindek
wan dê gotinê ewê dîke direw derêxin. Ewên ku hatibûne tepeser kirin dê
bêjine ewên xwe mezinzan, ´Eger li ber xatira we neba em dê bibana
bawermend.´

32 Ewên xwe mezinzan dêbêjine ewên tepeser, meger em bûn ku rêgiriya we li
rênivîniyê kir, piştî ku ew bo we hatibû? Belê hûn her bixwe tawankar bûn.´
33 Ewên tepeser dê bêjine ewên xwe mezinzan, ´Belê, ew bernamerêjiya we
bû, şev û roj ferman didane me ku bawerî bi Xwe dê neken û me wekhev bo
Vî damezrandin. ´Lê dema ku ew eşkencê dibînin, ew dê li peşîmaniyê da,
mat bin û Em dê lelê[a] havêjine ûstê nebawera. Meger ew dê bo hîç tiştekê
dîke padaşê wergirin xêncî ewa ku wan dikir? 34 Me çi cara agahîderek
neşandiye naw gundekê da, bêy ku ewên heyî bêjin, ´Birastî em bawerî bi ev
peyama ku digel te hatiye şandin naken´ 35 Û ew dibêjin ´Me gelek li we
zêdetir mal û zarûk hene û em nayêne siza dan.´ 36 Bêje, ´Birastî Xwedanê
min bi firavanî debara didete her kesê ku Ev dixwazît û distînît jî, lê piraniya
mirova nizanin. 37 Ne malê we, nejî zarûkên we dê we bînîte ciheke nêzîkê
Me, lê her kesê ku bawer diket û karên durust diket, ewan dê duqat[b] padaş
hebin, ber xatira ewa ku wan kiriye û ew dê bi tenahî di avahiyên bilind da
bijîn, 38 lê ewên ku li dijî eşkereyên Me xebatê diken, hewil diden ku wan têk
bişkînin dê ewan bînine naw eşkencê da.´ 39 Bêje, ´Birastî Xwedanê min, bi
firavanî debara didete her yêk li koleyên xwe ku Ev dixwazît û lê jî distînît û
her tiştekê ku hûn bi xêrê diden, Ev dê padaşê wê bidet, Ev bêhtrîne ku
debara didet.´
40 Di ew Roja ku Ev dê wan hemûya kom bikete ser hevda paşê Ev dê bêjîte
firişta, ´Meger ewane hûn diperestîn?´ 41 Ew dê bêjin, ´Paye bilindî ya Te ye!
Tu piştîvanê me yî li dijî ewane da! Belê, ewan cin diperestîn û piraniya ewane
bawerî bi wan dikirin.´ 42 Lê Îro hîç yêkê li we desthialt li ser ewên dîke da
nîne ku ne qazancê nejî zirarê bigehînin,´ Em dê bêjine ewên ku nerastî kirin,
´Tam biken eşkenceya agirê ku we nikolî lê dikir.´ 43 Dema ku eşkereyên Me
zelal bo wan têne xwandin, ew dibêjin, ´Ewe tenê mêreke ku dixwazît rêgiriya
we li ewa ku we û berebabê we diperestîn biket û ew dibêjin eve li xêncî
direwekê tiştek dîke nîne ku wî bixwe berhem înaye.´ Ewên ku bawer
nekiribûn sebaret bi rastiyê gotibûn, dema ku bo wan hatibû, ´Xêncî cadûyek
aşkira eve tiştek dîke nîne,´ 44 Me, çi nivîsînê pîroz nedaye wan ku bixwînin
nejî Me li pêş te da, çi kes şandin ku agahiyê bidete wan.
45 Ewên pêş wan da jî nikolî lê kirin, ewane tenanet yêk li deha ku Me dabûye
ewên ku pêş wan da, dest xwe nexistine, lê ewan jî nikolî li peyamberên Min
kirin û nepejirandina Min çawa bû! 46 Bêje, ´Ez tenê bo tiştekê şîretê dideme
we, li pêşya Xwe dê rawestin, bi cot yan jî bi tenê û hizir biken: çi cin li
hevrêyê we da nînin, ew tenê agahdariyê didete we, pêş eşkenceya dijwar.´



a: Toqa asin, gerdenbendiya asin ku destê mirov bi ûstê wî we girê den.
b: Du cara hind

[47] Bêje, ´Eger min daxwaza çi padaşa li we kiribît, ew bo we ye. Padaşê min
tenê li bal Xwe dê ye û Ev gewahê hemû tişta ye.´ [48] Bêje, ´Birastî Xwedanê
min rastiyê pêşan didet. Zanayê ewa nedîtî ye.´ [49] Bêje, ´Rastî hatiye û direw
ne dikarît destpê biket nejî dikarît dubare bît. [50] Bêje, ´Eger ez şaşiyê bikem, ez
tenê şaşiyê li riha xwe dikem, lê eger ez hatime rênivînî kirin, ewe li ber ew
sirûşa[a] ku Xwedanê min bo min kiriye, birastî Ev Dibhêt û Nêzîke.´
[51] Eger te karîba bibînî, dema ew dê bitirsin lê ew nikarin birewin, ew dê li
cihê nêzîk da bêne girtin, [52] ew dê bêjin, ´Em bawerî pê diken´ Lê ew dê çawa
biken, li ciheke hinde dûr da, [53] bêguman her li pêşta ewan bawerî pê nekirbû
û li ciheke gelek dûr da, hêriş kirbûne ser ewa nedîtî,[54] dê perjînek li nawbera
wan û ewa ku wan dixwast bête danandin, her wek ya ku digel ewên weke
wan li pêşta hatibû kirin. Birastî ew bi nigeranî di gumanê da bûn.



a: Vehî

## 35. Para Destpêker

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Pesn bo Xwe de ye, destpêkerê asimana û erdê, Ev ê ku firişteyên peyamber
bi du per, sê û çar pera çêkirin. Ev li afirandinê zêde diket, ewa ku Ev
dixwazît, birastî Xwe dê desthilat li ser hemû tişta da heye. 2 Ewa Xwe dê li
rehma Xwe bidete mirova kes neşêt pêşiyê lê bigrît û her tiştê ku Ev pêşgîriyê
lê biket, kes neşêt paşê berdet, Ev Bihêze Biryardere. 3 Mirovino, qenciya
Xwe dê bo ser xwe li bîr neken. Meger xêncî Xwe dê çi afrînerek dîke heye
ku li asimana û erdê ra debara bidete we? Çi xwedêyek dîke çinîne bes Ev
nebît. Hûn çawa hatine xapandin? 4 Eger dibêjine te direwîn, pêş te da
gotibûne peyamberên dîke jî direwîn û mijar dê bizvrine bo bal Xwe dê.
5 Mirovino, birastî belêniya Xwe dê raste, ber xatira hindê nehêlin ku jiyana
ev dinyayê we bixapînît. Nehêlin ku xapîner sebaret bi Xwe dê we bixapînin,
6 birastî Şeytan dijminê we ye, liber hindê ew weke dijmin wergirin, ew tenê
koma xwe gazî diket ku li naw hevrêyên guriya agir da bin.
7 Ewên ku bawer naken, dê eşkenceyek dijwar hebin û ewên ku bawer diken û
karên durust diken, ewan dê lêbihorîn û padaşek gelek mezin hebît.
8 Bes ewê ku kiryarê wi yê nebaş li ber çavê wî hatiye xemilandin, ber xatira
hindê ew hizir diket ku başin? Birastî Xwe dê dihêlît her kesê ku Ev dixwazît
li rê derkevît û her kesê ku Ev dixwazît rênivînî diket. Pê xemgîniyê, bo wan
riha xwe heder nede, birastî Xwe dê tam dizanît ku ew çi diken.
9 Ev, Xwe dê ye ku ba ya dişînît û ew ewra kom diken, Em wan dihajone
erdek mirî û Em pê wan erdê zîndî diken, piştî mirina wê, Vejiyan dê wisa
bît! 10 Eger her kesk hêzê bixwezît hemû hêz ya Xwe dê ye, gotinên baş bilind
dibine bal Vî û kiryarên durust bilind diken, lê ewane ku xeriteyên nebaş
dikêşin eşkenceyeke dijwar çavnihêrê wane û xerîtê wan dê li nav biçin.
11 Xwe dê hûn li tozê afirandin paşê jî li dilopek avikê, paşê jî hûn kirine cot,
hîç mêyek bêy zanista Vî, ne pêgiran dibît nejî dizêt, ne jiyan tête bexşîn bi
mirovek pîr, nejî jiyana wî têtе kurt kirin, meger pêka tomarê nebît, birastî
ewe bo Xwe dê hêsane. 12 Du derya wekhev nînin, eve şirîn û xweşe bo
vexwarinê û ew şor û tale, lê hûn li herduya jî goştê taze dixwen û hûn xemila
derdêxin ku xwe veken û hûn gemiya dibînin ku naw da diçin, belke li ber
hindê hûn li qenciyên Vî bigerên û belke li ber hindê hûn sipasdar bin. 13 Ev,
wel şevê diket ku biçîte naw rojê da û wel rojê diket ku biçîte naw şevê da, Vî
roj û heyv kêrhatî kirîne, her yêk li wan bo demeke dîhar kirî berdewam
diket. Wisa ye Xwe dê, Xwedanê we, Padişahî ya Vî ye, ewên ku hûn li
kêleka Vî da, li ber wan dipariyên, ewan tenanet desthilat li ser kewlê dindika
xurmê da jî nîne,

[14] eger tu li ber wan bipariyê, ew pariyana te nabihên, eger ew bibhîsin jî, ew
nikarin bersiva te biden, di Roja Vejiyanê da, ew dê nikoliyê li hevaletiya te
biken. Kes nikarît agahdariyê bidete te, wek Ev ê Agahdar. [15] Mirovino,
hûnin ku we pêvîstî bi Xwe dê heye Xwe dê pêvîstî bi hîç tiştekê nîne û
jêhatiyê hemû pesna ye [16] eger Ev bixwazît, Ev dikarît we li nav bibet û
afirandinek nû bînîte der, [17] ewe bo Xwe dê dijwar nîne. [18] Hîç bar hilgirek,
barê yêke dîke hilnagrît, tenanet eger ewê ku barek giran lê hatibîte kirin
bipariyêt jî, hîç tiştek lê nayête hilgirtin, tenanet eger xizmek nêzîk jî bît. Tu
tenê dikarî agahdariyê bideye ew kesên ku nedîtî li Xwedanê xwe ditirsin û
nûbêjên xwe diken, her kesê ku xwe pak biket, ew bo riha xwe, xwe pak diket,
armanc bo bal Xwe dê ye. [19] Ewên kore û bîner wekhev nînin, [20] nejî tarîtî û
ronahî [21] ne sîber nejî germahî, [22] nejî ewên zindî weke miriya ne. Birastî
Xwe dê dibîte hokar, ew kesê ku Ev dixwazît bibhêt, lê tu nikarî wel ewê naw
gorê da bikey ku bibhên, [23] tu tenê bes agahîderî [24] birastî Me, tu bi Rastiyê
şandî ku mizgînî û agahdariyê bidey, çi netewe nemane ku agahîder li naw
ewan da derbaz nebibin. [25] Eger ew bêjine te direwîn, ewên pêş ewan da çoyî
jî gotibûn direwîn, peyamber pê nîşaneyên zelal, nivîsînên pîroz û pirtûkên
ronahîker hatine bal wan [26] û piştî hingê Min ewên nebawer girtin,
nepejirandina Min çawa bû!
[27] Meger tu nabînî ku Xwe dê çawa avê li asiman ra dişînîte xarê û pê wê Em
berhemên rengaûreng tînine der û li çiyaya da xet hene sipî û sorên bi rengê
ciyawaz û gelek reş hene, [28] li naw mirova, rihtibera û ajelên kevî jî rengên
cuda hene? Her wisa li naw koleyên Xwe dê da, tenê ewên ku zanist hene li
Vî ditirsin. Birastî Xwe dê Bihêze û Lêbihore. [29] Ewên ku nivîsîna pîroza
Xwe dê dixwînin, nûbêja diken, li ew debarê ku Me bo wan dabîn kiriye bi
aşkira û veşartî diden, hêviya danûsitandinekê diken ku çi cara tewaw nabît
[30] Ev dê bi tewawî bidete wan û dê li qenciyên Xwe jî zêde bidete wan. Ev
Lêbihor û Sipasdare. [31] Eva ku Me li nivîsîna pîroz da sirûş daye te, Rastiye û
ewên pêş wê da piştrast diket, birastî Xwe dê agahdarê koleyên Xwe ye û
Dibînît! [32] Paşê Em bûne hokar, ewên ku Me li naw koleyên Xwe da
hilbijartin nivîsîna pîroz bi mîrat biben, li naw ewan da ewe ku nerastî li riha
xwe kiriye û li naw ewan da li nawberê daye û li naw ewan da jî bi destûra
Xwe dê di kiryarên baş da rêbere, ewe qenciya mezine.
[33] Ew dê biçine naw baxçeyên bêdawiyê, li wêderê ew dê bi bazinên zêr û
mercana bêne xemilandin, wêderê da dê cilên wan li armûşê bin.
[34] Ew dibêjin, ´Pesn bo Xwe dê bît Ev ê ku xemgînî li me maliye! Birastî
Xwedanê me Lêbihore û Sipasdare.

[35] Ev ê ku li ber qenciya Xwe, em li mala bêdaviyê da bicih kirîne, wêderê da
bêhalî destê xwe nadete me, wêderê da westiyan destê xwe nadete me.´ [36] Lê
ewên ku bawer naken dê biçine naw agirê cehnemê da, ne destûr bi wan tête
dan ku bimrin nejî dê eşkenceya wê bo wan kêm bît. Bi wî awayî Em padaşê
didene hemû nankora. [37] Ew dê wêderê da bigiryên, ´Xwedan me, me bîne
derê û em dê kiryarên durust biken, nek ewên ku me pêşta dikirin!´ Meger,
Me, jiyanek têra xwe dirêj nedabû we ku her kesê bînîte bîra xwe têda
bîreweriyê wergirît, eger we dê hişyarî vergirtiba? Meger agahîder bo we
nehatibûn? Ber xatira hindê tam biken.´ Bo ewên nerastkar çi yarmetîder
çinabin. [38] Birastî Xwe dê bi ewa ku di asimana û erdê da weşartiye dizanît,
birastî Ev dizanît ku di singa da çi heye, [39] Ev e ku hûn li ser erdê kirinê cêgir
û her kesê ku bawer neket, dê nebaweriya wî li ser wî bît û nebaweriya
nebawera xêncî kerb nebît bo wan li bal Xwedanê wan zêde naket.
Nebaweriya nebawera xêncî dorandinê bo wan zêde naket.
[40] Bêje, ´We ´hevalên´ xwe berçav girtine, ewên ku hûn li kêleka Xwe dê, da
li ber wan dipariyên, ka nîşanî min biden! Ewan çi tiştek li erdê da
afirandiye? Yanjî ewan çi pişkek li asimanana da heye?´ Yanjî Me çi nivîsînên
pîroz dayne wan, lewma ew li ser belgeyên aşkira ne? Belê hindek ewên
nerastkar belêniya xapandinê didene ewên dîke. [41] Birastî Xwe dê asimana û
erdê  xwedan diket ku nerawestin, eger ew rawestin piştî Vî kesê dîke nedikarî
ewan xwedan ket. Birastî Ev Pêdagir û Lêbihore. [42] Ewan bi Xwe dê sûnd
xwaribûn, sûnda xwe ya herî bihêz, eger agahîderek jibo wan hatiba, ew dê li
her neteweyekê zêdetir hatibana rênivînî kirin, lê dema ku agahîderek bo wan
hat, xêncî li rê derketinê tiştek dîke li wan zêde nekir.
[43] Li ser erdê qude bûn û xerîtên nebaş kêşan, lê xerîtên nebaş kêşan tenê
dizvrîte ser mirovê ewên ku xerîta dikêşin. Meger ew çavnihêrê rêkek dîke ne,
xêncî ewa mirovên berê? Hûn çi cara hîç çeşne algorekê li rêbaza Xwe dê, da
nabînin. Hûn çi cara, hîç çeşine rê derketinekê li rêbaza Xwe dê da nabînin.
[44] Meger ew li ser erdê da negeryane û dawiya ewên ku pêş wan da çoyne
nedîtine? Ew li hêzê da gelek li wan bihêztir bûn! Lê, hîç tiştekê li asimana
yanjî li ser erdê nabît bibîte hokarê têk çona Xwe dê. Birastî Ev Zanîne û
Bihêze. [45] Eger Xwe dê mirov siza daban, ber xatira ewa ku wan dest xwe
êxistiye, Vî çi rihtiber li ser piştê nedhêlan, lê Ev bo demeke dîhar kirî derfetê
didete wan û gava ku dema wan hat, paşê birastî Xwe dê li koleyên Xwe
dinhêrît.

## 36. Para Ya Sîn ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Ya, Sîn [2] Bi Xwandina (Qurana) biryarder, [3] birastî tu li naw peyambera dayî
[4] ser rêya rastî, [5] eşkereyek li bal Ev ê Bihêze û Rehmê didet, [6] ku belke tu
neteweyekê agahdar bikey ku berebabê wan nehatibûne agahdar kirin û li ber
hindê ew agahdar nînin. [7] Li dijî piraniya wan gotin rast bûye, liber hindê ew
bawer naken. [8] Birastî Me lele[a] têkiriye ûstê wan da, ew ta bin çena wane, liber
hindê serê wan jêhel radwestît [9] û Me berbestek danaye pêşya wan û berbestek
danye pişt wan û ew peçavtine, lewma ew nabînin. [10] Ew bo wan wekheve, çi tu
agahdariyê bideye wan, çi agahdariyê nedey, ew bawer naken. [11] Tu tenê dikarî
agahdariyê bideye ewê ku peyrevî li bîranînê diket û nedîtî li xwedanê rehmê
ditirsît, lewma mizgîniya lêbihorînê û padaşek giran buha bide wî. [12] Birastî, Em
dê jiyanê bidene miriya û ewa ku wan pêşta şandiye Me tomar kiriye û şûn pêyê
wan jî, Me hemû tiştek di tomarek zelal da jimare kiriye. [13] Mînaka hevrêyên gund
bo wan bîne, gava peyamber hatine têda, [14] dema ku Me bo wan du şandin, lê
ewan nikolî li her du ya kir. Paşê Me bi ewê sêyemîn piştîvaniya wan kir, ewan
got, ´Birastî em bo we peyamberin,´ [15] Ewan got, ´Hûn tenê weke me bimirin û
Xwedanê rehmê hîç tiştek neşandiye, hûn tenê direwa diken.´
[16] Ewan got ´Xwedanê Me dizanît ku em peyamberê we ne. [17] Erkê me, tenê ewe
ku em bi zelalî rabigehînin,´ [18] Ewan got, ´Birastî em hokarê nebaşiyê li we da
dibînin, eger hûn nerawestin, em dê we kevir baran biken û em dê pê sizayek
gelek bijan li we biden.´ [19] Ewan gotin, ´Hokarê nebaşiyê di naw we bixwe da ye.
Ewe li ber hindê ye ku înayne bîra we? Hûn neteweyeke sînor bezênin. [20] Paşê, li
aliyê herî dûr şar da, mêrek bi helatin hat, wî got, ´Netewa min, peyreviyê li
peyambera biken. [21] Peyreviyê li ewan biken ku daxwaza çi padaşa li we naken û
ew hatine rênivînî kirin. [22] Çima ez Ev ê ku ez berhem îname neperestim, hûn dê
bizvrine bal kê? [23] Dibya Ez li kêleka Vî da xwedêyên dîke vergirim?! Eger
Xwedanê rehmê bo min zirarê bixwazît, nawbêjvaniya wan çi yarmetiya min
naket û ew nikarin min biparêzin! [24] Birastî paşê ez dê bi zelalî li şaşiyê da bim.
[25] Birastî min bawerî bi Xwedanê we kiriye, li ber hindê gûhê xwe bidene min.´
[26] Hatibû gotin, ´Were naw baxçe da,´ Wî gotibû, ´Xwezî netewa min zanîba,
[27] ku Xwedanê min çawa li min bihoriy û ez li naw ewên birûmet da bicih kirîme.´
[28] Piştî wî, Me li asiman ra li dijî netewa wî çi leşker neşandin, nejî Em li ber da
bûn ku bişînin, [29] ew li qêrînekê zêdetir nebû û demûdest ew wemirîn.
[30] Mixabinî bo koleya! Her gava ku peyamberek bo wan hat, ewan henekê xwe pê
kirin. [31] Meger ew nabînin ku Me pêş ewan da çend nifiş li li nav birîne ku ew çi
cara nazivrine bal wan?



a: Lele ew toqa asin ye ku dikene ûstê girtiya da.

[32] Bêguman dê ewan hemûya bînine pêşya Me. [33] Bo wan nîşaneyek heye di erdê
mirî da, Em jiyanê didenê û li wê dexil û dahna der dêxin û hûn lê dixwen,
[34] Me baxçên darê xurma û rezên tirî danayne têda û Me we kiriye ku kanî av
têda bilqa havêjin. [35] Belke ew li berhema wê bixwen ku destê ewan berhem ne
înaye bes liber hindê ew sipasdar nabin? [36] Paye bilindî bo Vî ye ku hemû ewa erd
şîn diket cot afirandiye û li ewan bixwe jî û tiştên dîke ku ew nizanin. [37] Şev jî bo
wan nîşaneyeke ku Em rojê lê radiken û li ber hindê ew di tarîtiyê da ne [38] û roj jî,
diçîte cihê dema xwe ya destnîşan kirî ku destûra Evê Bihêz û Zana ye [39] bo heyvê
jî Me qonax destnîşan kirîne taku ew dizvrît weke pûşikê kevnê xurmê lê têt.
[40] Nayête hêlan ku roj ser heyvê da bigrît, nejî şev dikartî pêş rojê bikevît, lê hemû
li ser hêla xwe da dizvrin. [41] Nîşaneyek dîke bo wan ewe ku Me berebabê wan di
naw gemiyeke tijî da hilgirtin [42] û Me ewên ku rengê wê diden bo wan afirandin
ku ew lê siwar dibin. [43] Eger Em bixwazin Em dikarin ewan bixendiqînin û kes jî
nîne ku bersiva hewara wan bidet, nejî ew dê bêne rizgar kirin. [44] Tenê weke
rehma li bal Me we û debar jibo demekê. [45] Dema dibêjine wan,´Hişyarê ewa ku li
pêşya we ye û ewa ku li pişt xwe bin belke li ber hindê rehm bi we bête dan,´
[46] Çi nîşane li nîşaneyên Xwedanê wan bo wan nayên, xêncî ewên ku ew pişta xwe
didenê [47] û dema ku dibêjine wan,´Bidene ewên dîke, li ewa ku Xwe dê bo we
dabîn kiriye´ Ewên nebawer dibêjine ewên bawer kirî ´ Dibya Em xwarinê bidene
ewên ku Xwe dê dikarî xwarinê bidete wan, eger Vî xwastiba? Hûn di şaşiyek
zelal da ne. [48] Ew dibêjin, ´Kengê dê ew belêniye bête cih, eger tu rast dibêjî ?´
[49] Lê hemû eva ku ew çavnihêrê wê ne tenê qêrîneke ku dê ser wan da bigrît,
dema ku ew gengeşê diken.
[50] Ewê nekarin çi şîreta biken, nejî ew dê vegerêne bal mirovên xwe. [51] Dê zirna
bête jenîn û demûdest li gorên xwe ra, ew dê lezê biken bo bal Xwedanê xwe.
[52] Ew dibêjin, ´Hewar li me! Kê em li cihê razana me, em vejandine?´ ´Ewe ya ku
Xwedanê rehmê belêniya wê dabû û peyamber rast digot.´ [53] Li qêrînekê zêdetir
nabît ku demûdest hemû dê pêşya Me amade bin. [54] Lewma ´Îro çi nerastî li hîç
rihekê nayête kirin û çi padaş bi te nayête dan, xêncî ewa ku te kirî.
[55] Birastî hevrêyên naw baxçe da îro bi keyfxweşî mijûlin [56] ew û hevjînên xwe bin
sîberê da, li ser bermala rûniştîne. [57] Wederê da, bo wan meyve hene û bo wan
her tiştê ku ew dixwazin heye. [58] ´Aştî´ peyveke li bal Xwedan ku Rehmê didet.
[59] Lê ewên tawankar, hûn îro xwe bidene wêda. [60] Zarûkên A Dem, meger Min
ferman li we nekirbû ku Şeytan neperestin, birastî ew bi aşkira dijminê we yê, [61] lê
Min biperestin? Eve rêyek raste! [62] Bêguman ew hejmarek gelek zor li we, li rê
derêxistine. Meger we hizra xwe bikar ne-îna? [63] Ewe, ew agire ku belêniya wê bi
we hatibû dan.

[64] Îro têda bişewitin, çimkî we bawer nedikir.´ [65] Ew Rojê, Em dê devê wan
bipeçêrin, lê destê wan digel Me dipeyvin û pêyê wan gewahiya ew tişta diden ku
ewan dest xwe êxistbû. [66] Eger Me xwastiba Me dikarî çavê wan derêxin. Ew dê
rewiya ban bo rêke, lê ewan dê çawa karîba ku bibînin? [67] Eger Me xwastiba Me
dê karîba ewan li ew cihê wan da şeple[a] biken, liber hindê ewan ne dê karîba pêşve
biçin, nejî paşve biçin. [68] Eger Em jiyana her kesê dirêj biken, di afirandinê da Em
wî berevajî diken. Meger ew hizra xwe bikar naynin?
[69] Me, ew fêrî helbesta nekiriye, nejî ew bi qazancê wî ye, eve çi nîne xêncî
bîranîn û Xwandina (Qurana) zelal nebît [70] ku agahdariyê bidete her kesê ku
zindiye û peyvê li dijî nebawera piştrast biket. [71] Meger ew nikarin bibînin, li naw
ew tiştên ku bi destê Me çêbûne Me ajelên kevî afirandine ku ew xwedanê wanin?
[72] Û Me ew bo wan kevî kirîne, lewma li hindek wan siwar dibin û hindek wan jî
dixwen [73] bo ewan li wan da qazanc hene û vexwarin jî, meger ew sipasdar
nabin? [74] Lê ewan li kêleka Xwe dê, da xwedêyên dîke vergirtine ku belke
yarmetiya wan biden, [75] ew nikarin yarmetiya wan biken, lê ew jibo wan şerwanên
amade ne.
[76] Lewma ber xatira ewa ku ew dibêjin tengav nebe, birastî Em dizanin ku ew çi
diveşêrin û çi radgehînin. [77] Meger mirov nabînît ku Me, ew li dilopa avikê
afirandiye? Lêbinêrin û bibînin, ew bi zelalî dijberiyê diket, [78] Ew bo Me mînakekê
tînît û afirandina xwe li bîr diket. Ew dibêjît ´Kê dê jiyanê bidete hêstika, dema ku
ew rizîne?´ [79] Bêje, ´Ev ê ku cara yêkê ew afirandine dê jiyanê bidete wan, Ev
zanist li ser hemû afirandinê da heye. [80] Ev ê ku bo we li dara kesk agir çêkir,
lêbinêrin û bibînin û hûn li wê hil diken. [81] Meger Ev ê ku afrînerê asimana û erdê
ye, dikarît ewên weke wan jî biafrînît? Belê, Ev Afrînerê Zana ye,
[82] Dema ku Ev dixwazît ku tiştek bibît, Ev tenê dibêjêt ´Bibe´ û ev Dibît!
[83] Li ber hindê Paye bilindî bo Vî ye ku Padişahiya hemû tişta li destê Vî daye û
bo bal Vî ye ku tu dê bêye zivrandin.



a: Ew kesê ku neşêt serast rêkê biçît, qop, şil.

### 37. Para Di Rêza da Rêz kirî

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bi ewên ku di rêza da rêz kirî [2] û ewên ku bi xurtî dihajon [3] û ewên ku
bîranînê dibêjin, [4] birastî Xwe dê we yêke, [5] Xwedanê asimana û erdê û ewa
li nawbera wan da ye û Xwedanê rojhilata. [6] Birastî Me asimanê dinyayê pê
sitêrka xemilandiye [7] û li dijî hemû çeşne şeytanên serhildêr parastiye, [8] ew
nikarin guhê xwe bidene bilindtrîn civatê, li hemû aliya we dihavêjine wan,
[9] Têk şikandî, ewan dê êşkenceyek bêpayan hebît [10] xêncî ewê ku bi dizîwe
dibet, lê pê çirûskekê ku kun diken dikewine dû da. [11] Li ber hindê, li wan
bipirse afirandina wan dijwartire yanjî ewên ku Me afirandine? Birastî Me ew
li heriya kelpûça ku dizeliqît afirandine. [12] Lê tu seyr dimînî dema ku ew
heneka diken, [13] dema ku tînine bîra wan, nayête bîra wan [14] û dema ku ew
nîşaneyekê dibînin ew heneka diken [15] û dibêjin, ´Li cadûyek zelal zêdetir
eve hîç tiştek dîke nîne´ [16] ´Piştî ku em mirine û bûne toz û hêstik, em dê
careke dîke bêne vejandin [17] berebabên me jî?´ [18] Bêje, ´Belê û hûn dê bêne
serşor kirin,´ [19] Paşê tenê dê yêk qêrîn bît! Lêbinêrin û bibînin! Ew dê
zêndenê [20] û dê bêjin, ´Hewar li me! Ewe Roja Dadweriyê ye.´ [21] Ewe Roja
Darizandinê ye ku te nikolî lê dikir. [22] Ewên ku nerastî kiribûn kom kene ser
hevda û ewên ku weke wanin û ewa ku wan diperestîn [23] li kêleka Xwe dê da.
Pêşengiya wan biken bo rêya naw agir da [24] û wan ragirin, birastî dê lêpirsîn
li wan bête kirin [25] ´We xêre, hûn çima yarmetiya hevdu naken?´
[26] Belê wê Rojê da, ew dê xwe radest biken [27] û ew dê bigehine hevdu û
lêpirsînê li hevdu biken. [28] Ew dê bêjin, ´Birastî hûn li aliyê rastê we dihatine
bal me.´ [29] Ew dê bêjin, ´Belê we bawer nedikir, [30] me çi desthilat li ser we da
nebû belê her pêşta hûn neteweyek sînorbezên bûn. [31] Li ber hindê belêniya
Xwedanê me li ser me hatiye cih û birastî em dê tam biken.
[32] Me hûn li rê derêxistin, birastî em bixwe li rê derketî bûn.´ [33] Liber hindê
birastî li wê Rojê da, ew dê digel hevda eşkencê par veken, [34] Birastî Em, ewê
digel tawankara diken. [35] Birastî dema ku gotibûne wan, ´Çi xwedê nînin
xêncî Xwe dê ´ Xwe mezin kirbûn [36] û gotibûn, ´Meger dibya em waz li
xwedêyên xwe bînin ser xatira helbestvaneke cingirtî?´ [37] Belê ew rastî înaye û
peyamberên berê jî piştrast kirîne, [38] birastî hûn dê eşkenceya bijan tam
biken [39] û padaş bi we nayête dan, xêncî ewa ku we dikir.´ [40] Xêncî koleyên
hilbijartiyê Xwe dê. [41] Ewan dê debarek destnîşan kirî hebît.
[42] Meyve û dê rêz li wan bête girtin [43] li naw baxçeyên şadiyê da, [44] li ser
texa, rû bi rû yê hevdu. [45] Dê fîncanek li naw ewan da bête gêran, li kanî
avekê ku diherike, [46] sipî û tam xweşe bo ewên ku divexwen, [47] ti wê da çi
nexweşi nîne, nejî ew pê ser xweş dibin.

[48] Dê hewrê digel wan da hebin, pê çavên ciwan li ber xwe dinêrin, [49] weka
hêkên parastî[a]. [50] Hindek li wan dê bi pirsiyara li hevdu nêzîk bin,
[51] Gotinbêjek dê li naw ewan da bêjît ´ Birastî min hevrêyek hebû [52] ewê ku
dipirsî, ´Birastî tu yêk li wanî ku bawer diket, [53] dema ku em bimrin û bibine
toz û hêstik, em dê bêne înan bo dadweriyê?´ [54] Ew dê bêjît, ´Tu dê zêndêy?´
[55] Ew dê zêndetê û wî li naw guriya agir da bibînît [56] û ew dê bêjîte wî, ´Bi
Xwe dê kêm mabû tu min li nav bibey! [57] Eger li ber erêniya Xwedanê min
neba, ez jî dê yêk li wan bam ku biribama naw da.´ [58] Paşê em dê çi carê dîke
nemirin?´ [59] Xêncî mirina me ya cara yêkê, edî em nayêne eşkence kirin?
[60] Birastî eve destkevtekê herî mezine!´ [61] Jiboy eva mîna wê bila krêkar kar
biken.
[62] Meger eve mêvandariyeke başe yanjî dara Ziqomê, [63] birastî Me bo
nerastkara ew kiriye ezmûnek! [64] Birastî ew dare li bin guriya agir da şîn dibît,
[65] û meyveyên ku pêve tên weke serê şeytana ne [66] û birastî ew dê li wan
bixwen û zikê xwe pê têr biken, [67] paşê birastî ew dê têkelekê ava kelandî li
ser da vexwen, [68] birastî paşê ew dê bêne zivrandin bo naw agirê bi gurî da.
[69] Birastî ewan berebabê xwe li rê derketî dîtine [70] û li ser şûnpêyê wan lez lê
kirîne [71] bêguman piraniya ewên pêş wan da li rê derketin. [72] Bêguman Me,
pêşta agahîder şandine naw ewan da.[73] Lêbinêrin dawiya ewên ku bi wan
agahî hatibû dan çawa bû! [74] Xêncî koleyên hilbijartiyê Xwe dê!
[75] Bêguman Nûh gazî Me, baştrîn bersivdera[b] kiribû! [76] Me, ew û mirovên wî
li kerbê herî mezin rizgar kirin. [77] Me hêlaye nevîyên wî bimînin, [78] û Me bo
wî hêlane naw nifşên paşê da, [79] ´Aştî li ser Nûh bît li naw hemû dinyaya da!´
[80] Birastî Em wisa padaş didene ewên ku başiyê diken, [81] birastî ew yêk li
koleyên Me yên bawermend bû, [82] paşê Me ewên dîke xendiqandin.
[83] Birastî li naw ewên weka wî da Ibrahîm jî hebû [84] dema ew bi dilekê radest
kirî hate bal Xwedanê xwe, [85] dema wî gote babê xwe û netewa xwe, ´Hûn çi
diperestin? [86] Xêncî Xwe dê hûn xwedêyên direw dixwazin? [87] Li ber wê
hindê hûn li ser Xwedanê hemû dinyaya çi hizir diken?´ [88] Paşê wî zêndaye
sitêrka [89] û wî got, ´Birastî ez nexweşim´ [90] Li ber hindê, ewan pişta xwe dane
wî û çon.
[91] Paşê ew li xwedêyên wan zivrî û got, ´Meger hûn naxwen?´
[92] We xêre, hûn çima napeyvin? [93] Paşê ew li wan zivrî û pê destê rastê li wan
da. [94] Ew bi helatin hatine bal wî,



a: Şêwazek pesn kirinê di zimanê Erebî da bo jinên ciwan, bedev, xweşik, rind.
b: Gabriyel (Cibraîl) dibêjît Em li aliyê Xwe dê we baştrîn bersiva diden!

[95] wî got, ´Hûn evê diperestin ku we bixwe kolaye[a] [96] Xwe dê hûn afirandine
û hûn ewê diken!´ [97] Ewan got, ´Bo wî avahiyekê[b] çêken û wî havêjine naw
agirê geş da.´ [98] Ewan dixwast ku xerîteyekê bo wî bikêşin, lê Me, ew gelek
serşor kirin. [99] Wî got, ´Birastî ez dê biçime bal Xwedanê xwe, Ev dê min
rênivînî biket. [100] Xwedanê min, li naw durustkara da bide min´
[101] Li ber hindê, Me mizgîniya kureke pêdagir dayê. [102] Paşê dema ku ew
hind mezin bû ku digel wî kar biket wî got, ´Kurê min, birastî min xewnê da
dît ku ez te qurbanî dikem, lewma lê binêre tu çi dibînî?´ Wî got, ´Babo, bike
weka ku ferman li te hatiye kirin û Xwe dê hez biket tu dê min bêhin fereh
bibînî.´ [103] Piştî dema ku ewan herdûya xwe radest kirin, wî ew dana ser
tenişta rûmetê wî, [104] Me gazî wî kir, ´Ibrahîm, [105] bêguman te dîtin bicih
îna.´ Birastî bi wî awayî Em padaş didene ewên ku başiyê diken,
[106] birastî eve ezmûnek zelal bû [107] û Me ew digel qurbaniyeke gelek mezin
veguherî [108] û Me bo wî hêlane naw ewên dawiyê da [109] ´Aştî li ser Ibrahîm
bît!´ [110] Aha wisa Em padaş didene ewên ku başiyê diken, [111] birastî ew yêk li
koleyên Me yê bawermend bû. [112] Me mizgîniya Ishaq dayê, pêşbînek li naw
durustkara da [113] Me ew û Ishaq jî pîroz kirin, li naw paşketiyê ewan da
durustkar hene û nerastkar jî, bi zelalî bo xwe. [114] Bêguman Me qenciyên
Xwe li Mûsa û Harûn jî kirin [115] Me, ew û netewa wan li kerbek gelek mezin
rizgar kirin [116] Me yarmetiya wan kir, lewma ew serkevtin, [117] Me nivîsîna
pîroza zelal da wan, [118] Me li ser rêya rast ew rênivînî kirin [119] û Me bo wan
hêlane naw ewên dawiyê da [120] ´Aştî li ser Mûsa û Harûn bît!´ [121] Aha wisa
Em padaş didene ewên ku başiyê diken, [122] birastî ew li koleyên Me yên
bawermend bûn.[123] Birastî Ilyas jî, yêk li wan peyambera bû [124] dema wî gote
netewa xwe,´Hûn hişyarê wî nabin? [125] Hûn li ber Bal[c] dipariyên û waz li
baştrînê Afrînera tînin, [126] Xwe dê, Xwedanê we û berebabên we yê berê?´
[127] Lê ewan nikolî li wî kirin ber xatira hindê, ew dê ewan bînin[d] [128] xêncî
koleyên hilbijartiyê Xwe dê [129] û Me bo wî hêlane naw ewên dawiyê da,
[130] ´Aştî li ser Ilyas bît!´ [131] Aha wisa Em padaş didene ewên ku başiyê diken,



a: Basê puta ye, ku put peresta pê destê xwe, ewan li dar û kevira dikolan û berhem tînan
b: Avahiyekê li dara çêken ku Ibrahîm peyamber naw da bişewtînin. Koçikê dara, lê gelek mezin.
c: Navê putekê ye, xwedêyeke direwe, serê çêla bi şax!
d: Ew dê bêne înan bo siza danê, çimkî ewan gotina Xwe dê nepejirandiye!

[132] birastî ew yêk li koleyên Me yê bawermend bû. [133] Birastî Lat jî li naw
peyambera da bû. [134] Dema Me ew û hemû binemala wî rizgar kirin
[135] xêncî pîre jinek nebît ku li naw ewên paşve mayî da ma [136] paşê Me ewên
dîke wemirandin [137] û birastî di sibe zûya da hûn li ber ewan da derbaz dibin
[138] û di şevê da jî, meger hûn hizra xwe bikar naynin? [139] Birastî Yûnis jî li
naw peyambera da bû [140] dema ew helate ser gemiya tejî [141] paşê wî pişk
havêt, ew li naw ewên dorandî da bû [142] paşê masiyekê ew qurt kir, dema ku
ew tawanbar bû [143] eger ew yêk li wan neba ku Ev paye bilind dikir, [144] ew dê
di zikê wê da maba ta Roja ku ew têne vejandin, [145] lê Me ew nexweş havête
ser deravekê [146] û Em bûne hokar ku dara şemamokê li ser wî da şîn bît.
[147] Me ew şande bo bal yêk sed hezara yanjî zêdetir. [148] Ewan bawer kir, ber
xatira hindê Me hêla ew bo demekê xweş biqetînin. [149] Li ber hindê li wan
bipirse, ´Meger Xwedanê we kiç hene, dema ku we bixwe kur hene?
[150] Meger Me firişte mê afirandin, dema ku ew gewah bûn?
[151] Bêguman ew li direwê wanin ku dibêjin, [152] ´Xwe dê zaye.´ Birastî ew
direwa diken! [153] Meger Vî kiç li serwey kura da hilbijartin? [154] We xêre, hûn
çawa dadweriyê diken? [155] Paşê hûn nayinine bîra xwe?
[156] Yanjî we desthilatek zelal heye? [157] Bes nivîsîna xwe ya pîroz bînin eger
hûn rast dibêjin.[158] Ewan ragehandiye, ´Li nawbera wî û cina da pêwendiyek
heye, bêguman cin bixwe jî dizanin ku dê wan jî bîninê da´ [159] Xwe dê paye
bilinde serwey ewa ku ew şirove diken [160] xêncî koleyên hilbijartiyê
Xwe dê [161] li ber hindê, birastî tu û ewa tu diperestî [162] nikarin li ser Vî da han
biden, [163] xêncî ewê ku dê li naw agirê geş da bişewitît. [164] Li naw me da nînin
xêncî, ewê ku cihek dîhar kirî heye, [165] birastî em li rêzê da radwestin.
[166] Birastî em Vî payebilind diken.´ [167] Birastî ewan digotin, [168] ´Eger me jî
bîranînek li ewên berê heba, [169] bêguman em jî dê bibana koleyên hilbijartiyê
Xwe dê,´ [170] Lê ewan bawerî pê nekir, ew dê gelek zû bizanin.
[171] Peyva Me geheştiye bi koleyên Me yên peyamber. [172] Bi rastî, ew dê li wan
bin ku dê serkevtinê bidene wan [173] û birastî, şervanên Me dê li wan bin ku dê
serkevin. [174] Lewma, bo demekê pişta xwe bide wan. [175] Ewan bibîne, ew dê
bibînin. [176] Meger ew sizaya Me ye ku ew dixwazin bilezînin?
[177] Dema ku ew dikevîte derdorê wan da, nebaşe sibe zû bo ewên ku hatibûne
agahdar kirin! [178] Lewma bo demekê pişta xwe bide wan. [179] Ewan bibîne, ew
dê bibînin. [180] Xwedanê te paye bilinde, Xwedanê hêzê, gelek serwey ewêye
ku bo Vî şirove diken. [181] Û aştî li ser peyambera bît [182] û pesn bo Xwe dê bît
Xwedanê hemû dinyaya.

## 38. Para Sad ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1]Sad, Bi Xwandina (Qurana) pir li bîranîn! [2] Belê ewên nebawer di qudetî û
dijberiyê da ne. [3] Me çend nifiş li pêş wan da li nav birîne, ewan gazî kir lê ew
dema rewiyanê nebû. [4] Ew sersir[a] mane ku li naw ewan bixwe da
agahîdereke û ewên nebawer dibêjin, ´Ewe tenê cadûgerek e direwîne,
[5] meger wî hemû xwedê kirîne Xwe dê Yêk? Birastî ewe tiştek sersirkere!
[6] Serokê li naw ewan da çone pêş, ´Berdewam bin! Digel xwedêyên xwe
bêhin fereh bin, birastî ewe tişteke ku hatiye xwastin.´ [7] Me eve li dînên
dawiyê da nebhîstiye, eve xêncî berhem înanê tiştek dîke nîne. [8] Li naw me
hemûya da tenê bo wî bîranîn hatiye şandin?´ Belê ewan guman li bîranîna
Min heye belê ewan hêşta eşkenceya Min tam nekirye. [9] Meger ewan
xizîneyên Xwedanê rehma we hene, Ev ê Bihêz û Bexşende? [10] Yanjî
padişahiya asimana û erdê û ewa li nawbera wan da, ya wane? Bes bihêle bila
ew li mijara xwe we serkevin, [11] şervanên wan yê li naw hêzên hevkar da
hatine têkşikandin.[12] Neteweya Nûh, pêş ewan da nikolî lê kirin, Ad û Fireûn
ê xwedanê sing[b] jî [13] û Semûd, netewa Lat û hevrêyên naw daristan da, ew
hêzên hevkarin! [14] Her yêk li wan nikolî li peyambera kirin lewma bi durustî
hatine siza dan, [15] ew çavnihêrê çi nînin bes qêrînek nebît, bo wê jî direng
nabît. [16] Ew dibêjin, ´Xwedanê me bo me lezê li pişka me bike, pêş Roja
Hisab ê. [17] Bêhin fereh be digel ewa ku ew dibêjin, Dawûd ê koleyê Me bîra
te bît, xwedanê hêzê, birastî ew berdewam zivrî, [18] Me wel çiyaya kir ku digel
wî li rojhilat û rojava da paye bilind biken [19] û balinde jî bi ref bûn, hemûya
digel wî deng wedan. [20] Me padişahiya wî bihêz kir, Me têgeheştin da wî û li
peyvînê da rêbaza biryar danê. [21] Meger bo te hatiye nûçeya ew dozvana,
dema ku li ser dîwar da çone odê da? [22] Dema, ew li Dawûd çone jor, ew li
wan tirsiya, ewan got, ´Netirse, em du dozvanin, yêk li me nerastî li ewê dîke
kiriye, pê rastiyê li nawbera me da dadweriyê bike, bêdad nebe û me
rênivîniyê rêya rast bike. [23] Birastî ewe birayê mine, ew nehwêd û neh mih
hene û min tenê mihek heye û wî got, ´Wê bispêre min´ Û pê peyvên xwe
serdestî li min kir[c].´ [24] Wî got, ´Ew nerastî li te kiriye ku xwastiye miha te
bibete naw mihên xwe. Birastî gelek hevkar hevdu tepeser diken, xêncî ewên
ku bawer diken û karên durust diken, ew jî kêmin.´ Dawûd serweço ku Em wî
taqî diken, liber hindê wî daxwaza lêbihorînê li Xwedanê xwe kir, kete ser
çokên xwe û peşîmaniya xwe ragehand, [25] Em li wî xweş bûn. Birastî ew dê
nêzîkî Me bît, ciheke baş ku bizvrîtê.

a: Ecêb
b: Alawek (kevir, asin, dar) 3ê goşe ku di erd da dikotin, bo nîşane!
c: Min Rênivîniyê (Toratê) da xwand, Dawûd peyambere digel jina Uriya yê Hîtatî raza bû. Navê ew jinê Besşeba bû. Besşeba pêgiran bû, paşê Dawûd peyamber Uriya da kuştin û Besşeba bixwe îna. Besşeba dayka Silêman peyamber ye.

26 ´Dawûd, birastî Me tu li ser erdê kirî cêgir. Lewma bi dadmendî li nawbera
mirova da dadweriyê bike, peyrevî li hesta neke, bila tu li rêya
Xwe dê nederkevî, birastî ewên ku li rêya Xwe dê derdikevin dê eşkenceyek
bijan hebin, çimkî ewan Roja Hisabê li bîr kirine.´ 27 Me asiman, erd û tiştên
li nawbera wan da bêşol ne-afirandin. Ewe texmîna ewên nebawere. Lewma
heware li ewên ku bawer bi agir naken! 28 Yanjî dibya Em wekhev rabûn û
rûniştinê biken digel ewên ku bawer diken û karên durust diken û ewên ku li
ser erdê gendeliyê belav dikene? Yanjî dibya Em wekhev rabûn û rûniştinê
digel ewên ku hişyarê Vî û ewên ku nebaşin biken? 29 Me nivîsîneke pîroz bo
te şandiye xarê belke tu hizira xwe li ser eşkereyên vê bikey û bîreweriyek bît
bo ewên xwedan têgeheştin. 30 Me Silêman da Dawûd, koleyeke erênî, ewê
ku berdewam dizivrî. 31 Dema ku li pişt nîvro da hespên ciwan nîşa wî dan,
32 wî got, ´Birastî evîna min bo tiştên ciwan, serwey bîranîna Xwedanê mine,
taku ew pişt perde da wenda bûn. 33 ´Ewan bizvrînin!´ Û destpêkir destê xwe
daye ûst û lingên wan, 34 bêguman Me Silêman taqî kir, Me cendekek[a] dana
ser textê wî, paşê ew zivrî. 35 Wî got; ´Xwedanê min, li min bibhore!
Padişahiyekê bide min ku kesê piştî min çinebît, birastî Tu bexşendey.´ 36 Li
ber hindê Me, ba jibo wî bikêr kir ku li ser daxwaza wî hêdî çoye her derê ku
wî rêkirê 37 û şeytan jî, hemû avaker û melevan. 38 Û ewên dî ku pê zincîra
pêkwe girêdayî bûn. 39 Ewe xelatê Me ye, li ber hindê bê hisab bide û bistîne.´
40 Birastî ew dê nêzîkî Me bît û ciheke başe bo zivrînê. 41 Eyûb ê koleyê Me
bîne bîra xwe, dema ku wî gazî Xwedanê xwe kir ´Şeytan pê tengasî û êşê li
min daye.´ 42 ´Pê pêyê xwe lêde, ewe ava sar bo te ku tu xwe pê bişoy û
vexwoy´ 43 Me binemala wî pêşkêşî wî kir, digel weke wan jî, rehmek li bal
Me we û bîranînek bo ewên ku têdigehin. 44 ´Çepekê[b] bigre destê xwe û pê[c]
lêde û sûnda xwe neşkîne.´ Birastî Me, ew bêhin fereh dît, koleyeke erênî!
Bêguman ew berdewam zivrî[d]. 45 Koleyên Me, Ibrahîm, Ishaq û Yeqûb bîra
te bin, xwedan hêz û dîtin. 46 Birastî Me taybetî ew hilbijartin, bîr anîna malê,
47 birastî jiboy Me, ew li naw ewên hilbijartî û bêhtir dane 48 û koleyên Me,
Ismaîl, Elîsa û Zol kifl (ewê piştîvan) bîr bîne, hemû li naw ewên bêhtir dane.

a: Laş, beden, cenaze
b: Tejî destekê, mistekê
c: Li gor Rênivînî (Toratê), dema Eyûb peyamber nexweş bû, jina wî dijûn danê. Eyûb peyamber sûnd xwar eger ew çêbît, ew dê sed qamçiya li jina xwe bidet, lê dema ew çêbû, ew li sûnda xwe peşîman bû, Xwe dê, got ´Mistek li giya bigre destê xwe û pê giya li jina xwe bide bila sûnda te neşkêt. Giya nazike, mirov na êşînît!
d: Dizvrî bo bîranîna Xwe dê.

[49] Ewe bîranîneke, birastî ewê hişyar dê ciheke baş hebît ku bizvrîtê,
[50] baxçeyên bêdawiyê, derê wan dê li ser wan vekirî bin.
[51] ew dê têda rûnên, ew dê daxwaza meyve û vexwarina firavan biken,
[52] dê hevrêyên ku berxwe dinhêrin û kêrhatiyê ewanin dê digel ewan da bin.
[53] ´Eweye ku bo Roja Hisabê belêniya wê bi te hatiye dan, [54] birastî ew dabîn
kirina Me çi cara bi dawî nayêt.´ [55] Eweye! Lê ewên sînor bezên dê cihek
nebaş hebin ku bizivrinê, [56] Cehnem ku têda bişewtin, ciheke nebaş bo bêhin
wedanê, [57] eweye! Bihêlin bila tam biken, aveke kelî û bi edab[a] [58] û cûreyên
dîke weka wan jî. [59] ´Komeke dîke jî digel te hene ku hêriş dikenê, ew xêr
nehatine! Birastî ew dê li naw agir da bişewitin.´ [60] Ew dê bêjin, ´Belê hûn xêr
nehatine! Hûn bûn ku we eve serê me îna, ciheke gelek nebaş bo manê,´
[61] Ew dê bêjin, ´Xwedanê me, her kesê eve serê me îna bo wî eşkenceya li naw
agir da, du qata zêde bike ´ [62] Ew dê bêjin, ´Çima em ew mêra nabînin ku me
li naw ewên nebaş da dihejmartin û [63] henekê xwe bi wan dikirin?´ Yanjî dîtin
li wan zivriye?´ [64] Ewe rastiye, şerê şêniyên[b] agir. [65] Bêje, ´Ez tenê agahîderim.
Çi xwedê nînin bes Xwe dê Yêkta nebît, Ev ê Herî Bihêz,
[66] Xwedanê asimana, erdê û ewa li nawbera wan da, Bihêz û Lêbihor.´
[67] Bêje, ´Ew nûçeya gelek mezin, [68] hûn pişta xwe didenê. [69] Min çi zanist
sebaret bi serokên serwer da nîne, dema ku ewan gengeşe dikir, [70] sirûş[c] bi min
nehatiye dan, xêncî evê ku ez bi zelalî agahdariyê bidem.´[71] Dema Xwedanê
we gote firişteya,´Birastî Ez dê bimirekê li heriya kelpûça çêkem. [72] Dema ku
Min şêwe daye wî û li riha Xwe pif kire wî da, çokê xwe li ber wî biçewînin û
serê xwe binvînin. [73] Lewma hemû firişteya digel hevdû çokê xwe li ber wî
çemandin û serê xwe nivandin, [74] xêncî Iblîs, ew xwe mezin kir û bûye
nebawer. [75] Vî got, ´Iblîs, çi tiştekê pêşya te girt ku çokê xwe li ber ewê ku Min
pê destê Xwe afirandî biçemînî û serê xwe binvînî? Meger tu mezinî? Yanjî tu
li naw ewên qude dayî´ [76] Wî got, ´Ez li wî bêhtirim, Te ez li agir afirandime û
ew li heriya kelpûça afirandiye.´
[77] Ev got ´Têda derkeve, birastî tu hatî der kirin, [78] birastî ta Roja Dadweriyê
dê nerêniya Min li ser te bît!´ [79] Lê wî got, ´Xwedanê min, ta Roja ku ew têne
vejandin, derfetê bide min,´ [80] Ev got, ´Birastî tu yêk li ewanî ku derfet heye
[81] ta ew Roja ku dema wê baş dîhare.´ [82] Ew got, ´ Bes bi hêza Te! Ez dê
hemûya li rê derêxim [83] xêncî koleyên hilbijartiyê Te li naw ewan da nebin.´
[84] Ev got, ´Bes rastiye û Ez rastiyê dibêjim, [85] bêguman Ez dê cehnemê bi te û
hemû ewên ku te dişopînin tejî bikem.´ [86] Bêje, ´Ez bo evê[d] daxwaza çi padaşa
li we nakem, nejî ez dibêjim, ez ewim yê ku ez nînim, [87] eve tenê bîranîneke bo
hemû dinyaya. [88] Bêguman piştî demekê tu dê zaniyariyên evê bizanî.´



a: Ava pîs ku li birîna têtin, çirk av, Ava genî.
b: Xelk, ehl, akincî.
c: Gotina Xwe dê, Vehî!
d: Xwandin (Quran)

## 39. Para Kom ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Nivîsîna pîroz li bal Xwe dê we hatiye şandin, Ev ê Bihêz û Biryarder.
2 Birastî Me nivîsîna pîroz birastiyê bo te şandiye, li ber hindê Xwe dê
bipereste û jidil we dîndar be, 3 bêguman dîndariya tewaw tenê bo Xwe dê ye.
Ewên ku parêzerên dîke li kêleka Vî da digrin, ´Em tenê ber xatira hindê
ewan diperestin, belke ew me bînine ciheke nêzîk Xwe dê,´ Xwe dê, dê
sebaret bi nakokiyê wan, dê li nawbera ewan da dadweriyê biket. Birastî
Xwe dê direwînên nebawer rênivînî naket.
4 Eger Xwe dê xwastiba ku kurekê wergrît, Ev dê karîba li her yêk li
afirandinên Xwe hilbjêrît, her tiştê ku Ev dixwast, payebilindî bo Vî bît! Ev
Xwe dê Yêktaye, herî bi Hêze. 5 Ev afrînerê asimana û erdê bi rastiyê ye, Ev
şev ê dora rojê dipêçît û rojê dora şevê da dipêçît, Vî roj û heyv bikêr kirîne ku
bo demeke dîhar kirî birewin, bêguman Ev Bihêz û Lêbihore. 6 Ev, hûn li
rihekê afirandine, paşê Ev li wê cot bo wî çêkir, Ev heşt cûr ajelên kevî dane
we. Ev, we di mal biçûka dayka we da diafrînît, afirandin piştî afirandinê, di sê
tarîtiyê da, Eve Xwe dê ye, Xwedanê we, padişahî ya Vî ye, çi xwedê nînin
bes Ev nebît. Hûn çawa pişta xwe didenê? 7 Eger hûn bawer naken Xwe dê çi
pêvîstî bi we nîne, Ev digel koleyên Xwe yê nankor keyfxweş nîne, eger hûn
sipasdar bin Ev digel we keyfxweşe. Hîç bar hilgirek barê yêke dîke hilnagrît.
Paşê hûn dê bizivrine bal Xwedanê xwe û paşê Ev dê bêjîte we ku we çi dikir,
Ev dizanît ku di naw singa da çi heye. 8 Dema ku karesatek tête serê mirov, ew
li ber Xwedanê xwe dipariyêt û dizivrîte aliyê Vî, paşê dema ku Ev li bal Xwe,
we erêniyekê bi wî diket, ew li bîr diket, Ev ê ku ew pêşta li ber da dipariya û
dijbera bo Xwe dê dadmezrînît ku li rêya Vî bibete der. Bêje,´Bo demekê kurt
xweşiyê li nebaweriya xwe biben, birastî hûn hevrêyên naw agir da ne.´ 9 Ew
kesê ku di şevê da, jidil we peyreviyê diket, serê xwe dinvînît, radwestît, li
Dawiyê ditrsît, hêvîdarê rehma Xwedanê xwe ye, bêje, ´Meger ewên ku
dizanin, wekhevin digel ewên ku nizanin?´ Tenê ewên ku têgeheştin hene dê
bînine bîra xwe!
10 Bêje, ´Koleyên Min ewên ku bawer kirîne, hişyarê Xwedanê xwe bin! Ewên
ku li ev dinyayê da başiyê diken başe, erdê Xwe dê ferehe û birastî, ewên
bêhin fereh dê bêhejmar padaşê wan bi wan bête dan.´
11 Bêje, ´Birastî destûr bi min hatiye dan ku Xwe dê biperestim û jidil we
dîndar bim, 12 destûr bi min hatiye dan ku yêkemîn bim ku xwe radest bikem.´
13 Bêje, ´Ez li eşkenceya Roja gelek mezin ditirsim, eger ez peyrevî li Xwedanê
xwe nekem.´

[14] Bêje, ´Ez Xwe dê diperestim û ji dil we dîndarê Vî me, [15] liber hindê her
tiştê hûn dixwazin li kêlek Vî da biperestin, bêje, ´Ewên ku bi rastî dorandine,
ew kesin ku dê xwe û binemala xwe jî, li Roja Vejiyanê da bidorînin,
bêguman ewe dorandina herî zelale. [16] Ewan dê konên agir li serwey xwe
hebin û li bin xwe da jî dê bi wê bêne peçawtin.´ Xwe dê pê evê koleyên Xwe
ditrsînît, koleyên Min hişyarê Min bin.
[17] Ewên ku dûriyê li xwedêyên direw diken, bila ewan neperestin û bizvrine
bal Xwe dê! Jibo wan mizgînî hene, lewma mizgîniyê bide koleyên Min,
[18] ewên ku guhê xwe didene gotinê û peyreviyê li ya herî bêhtir diken, ewane
ewin ku Xwe dê rênivînî kirîne, ewane mirovên xwedan têgeheştinin.
[19] Her wisa yêke wisa jî heye ku sizaya ragehandî ser xwe kiriye maf. Meger tu
dê bikarî ewê li naw agir da rizgar bikey? [20] Lê ewên ku hişyarê Xwedanê xwe
ne, jibo wan avahiyên bilind li serwey avahiyên bilind ava kirîne ku çem li bin
wan da diherikin. Belêniya Xwe dê ye, Xwe dê belêniya Xwe naşkênît.
[21] Meger tu nabînî ku Xwe dê avê li asiman ra dişînîte xarê û wê weke kaniya
di erdê da diherkînît, paşê pê wê giyayên rengên cuda berhem tînît, ewa ku
paşê hişik dibît û tu dibînî zer dibît û paşê ew wan dikete pûş?
Birastî lêreda bîr anînek heye bo ewên ku têgeheştin hene. [22] Lewma ewê ku
Xwe dê singê wi bo xwe-radest kirinê[a] vekiriye, li ber wê hindê ew li ser
ronahiyekê ye li bal Xwedanê xwe, lewma heware li ewê ku dilê wi bi bîr
înana navê Xwe dê req dibît! Ew bi zelalî şaşin. [23] Xwe dê bêhtrîn vegotin
şandine xarê, nivîsîneke pîroz ku rengê hev diden û dupat[b] diket, liber vê
gorûzme[c] li cendekê[d] ewan diçît ku li Xwedanê xwe ditirsin, paşê bi bîranîna
Xwe dê pêst û dilê wan aram dibît, eve rênivîniya Xwe dê ye, Ev pê vê
rênivînî diket, her kesê ku Ev dixwazît, ewê ku Xwe dê dihêlît li rê derkevît, bo
wi çi rênivînî nîne. [24] Yêke wisa jî heye ku dê bi rûmetê xwe pêşgîriya
nebaştrîn eşkenceya Roja Vejiyanê biket û dê bêjine nerastkara, ´Tam biken,
ewa ku we dest xwe diêxist.´ [25] Ewên li pêş wan da jî nikolî[e] kirin û li cihekê ra,
siza kete ser wan ku ew tênegeheştin, [26] li jiyana ev dinyayê da Xwe dê serşorî
bi wan daye tam kirin, bêguman sizaya di Dawiyê da mezintire, bes eger ewan
zanîba.
[27] Bêguman li ev Xwandinê (Quranê) da Me bo mirova hemû çeşne mînak
înayne, belke li ber hindê ew bînine bîra xwe [28] Xwandineke (Quraneke)
Erebî, bê hîç xar û xêçiyekê, belke li ber hindê ew hişyar bin. [29] Xwe dê, ew
mînakê tînîtin: mêrek ku çend heval li ser da şer diken û mêrekê jî ku tenê
xizmeta mêrekê daye, meger ew li berawird kirinê da wekhevin? Pesn bo
Xwe dê ye lê piraniya wan nizanin.



a: Îslam b: Dubare
c: gava pêstê bedenê mirov dilerzît, d: Beden, laş, kelex e: haşa, înkar, nepejirandin.

[30] Birastî tu dê bimrî û birastî ew jî dê bimrin [31] paşê di Roja Vejiyanê da, tu
dê pêşya Xwedanê xwe gengeşê bikey. [32] Kê dikarît li ew bêdadtir bît ku
sebaret bi Xwe dê direwa berhem tînît û nikoliyê li rastiyê diket, dema ku bo
wî têt? Meger di cehnemê da, avahiyek bo nebawera çinîne? [33] Ewê ku rastî
îna û bawerî pê kirine, ew hişyarin [34] ewan dê hemû tiştek hebît ku ew li
Xwedanê xwe dixwazin, ewe padaşê ewên durustkare [35] Xwe dê dê kiryarê
wan yê herî nebaş bimalît û pêka baştrîn kiryarê wan dê padaş bidete wan.
[36] Meger Xwe dê têra koleyên Xwe nîne? Ew pê ewên xêncî Xwe dê hereşa li
te diken. Her kesê Xwe dê bihêlît li rê derkevît ew kes çi rênivînî nabît.
[37] Her kesê Xwe dê rênivînî biket kes çinabît wî li rê derêxît. Meger Xwe dê
Bihêz û Xwedan tole nîne? [38] Eger tu li wan bipirsî,´Kê afrînerê asimana û
erdê ye?´ Bêguman ew dê bêjin, ´Xwe dê´ Bêje, ´Tu dibînî ewên ku tu li
kêleka Xwe dê da li ber wan dipariyê eger Xwe dê xwastiba ziyarê li min
bidet, ew dê bikarin zirarê pûç biken? Yanjî eger Vî xwastiba rehmê bi min
biket, meger ew dê bikarin pêşgîriya rehma Vî biken? Bêje, ´Xwe dê têra min
heye, xwe dispêrine Vî, ewên xwe dispêrin. [39] Bêje, ´Netewa min, pêka cihê
xwe kar biken birastî ez jî kar dikem, hûn dê bizanin [40] Kanê eşkence dê kê
serşor biket û eşkenceya bêpayan dê bête serê kê.´ [41] Birastî Me, ji bo te
nivîsîna pîroz şandiye xarê, bi rastiyê bo mirova. Her kesê ku hatiye rênivînî
kirin, ew jibo riha xwe ye, her kesê li rê derkevît, ew bo xwe li rê diderkevît.
Tu parêzerê ewan nînî, [42] Xwe dê di dema mirinê da riha dibet û ewên ku
dema razanê da namrin, Ev wan dibet ku Vî fermana mirina wan daye û
ewên dîke berdidet bo demeke dîhar kirî, birastî lêreda nîşane hene bo ew
netewa ku hizir lê diket. [43] Meger ewan li kêlek Xwe dê, da nawbêjvan
vergirtine! Bêje, ´Her çend ku ne ew xwedanê tiştekê ne nejî têgeheştinê?´
[44] Bêje, ´Hemû nawbêjvanî ya Xwe dê ye. Padişahiya asimana û erdê ya Vî
ye, paşê tu dê bêye zivrandin bo bal Vî.´ [45] Dema ku bi tenê amaje[a] bi
Xwe dê têt kirin, ewên ku bawerî bi Dawiyê naken, dilê wan di nefretê da
diqermiçît, lê dema ku amaje bi ewên dîke li kêlek Vî da têt kirin, ew
demûdest keyfxweş dibin.
[46] Bêje, ´Xwe dê! Destpêkerê asimana û erdê! Zanayê ewa veşartî, Gewah, Tu
dê li nawbera koleyên Xwe, da dadweriyê bikey, sebaret bi ewa ku wan li ser
da nakokî hebûn [47] Eger ewên ku nerastî kirine, hemû eva li ser erdê û ewa
weke wê jî, digel da, ya ewan ba, dê bo serbestiya xwe biden, ta ku xwe li
eşkenceya Roja Vejiyanê rizgar biken, dê bo wan zelal bît li bal Xwe dê we,
ewa ku wan hisaba wê nekirbû, [48] dê bo wan zelal bît nebaşiya ku wan dest
xwe înabû û ewa ku wan henekê xwe pê dikir dê ewan dorpêç biket.

a: bas kirin, bîr înan, îşare pê kirin.

49 Dema ku mirov zirarê dibînît, ew liber Me dipariyêt, lê dema ku Em
erêniyekê bi wî diken ew dibêjît, ´Ewe tenê li ber xatira zanista min bi min
hatiye dan.´ Belê ew tenê ezmûneke, lê piraniya wan tênagehin. 50 Birastî
ewên pêş wan da jî, her wisa gotin, lê ewa ku wan dest xwe înabû çi qazanc bo
wan nebû 51 û nebaşa ya ku ewan dest xwe êxist bû li wan da û ewên ku
nerastî kirîne, dê li wan bin ku nebaşiya ku ewan dest xwe êxistiye dê li wan
bidet û ew nikarin birewin.52 Meger, ew nizanin ku Xwe dê bi firavanî debara
didete her kesê ku Ev dixwazît û distînît jî? Birastî di ewê da nîşane hene bo
ew netewa ku bawer diket. 53 Bêje, ´Koleyên Min, ewên ku zêdegavî li dijî
xwe kirîne, bila li rehma Xwe dê bêhêvî nebin, birastî Xwe dê li hemû guneha
dibihorît, birastî Ev Lêbihore û Rehmê didet. 54 Bizivrine bal Xwedanê xwe û
xwe radestê Vî biken pêş ku siza li ser we da bigrît paşê yarmetî bi we neyête
kirin. 55 Peyrevî li bêhtrînê eva ku li bal Xwedanê we ra bo we eşkere bûye
biken, pêş ku nişkida siza li ser we da bigrît, dema ku hûn tênagehin, 56 bila
rihek nebîjît, ´Mixabinî li min ku min guhê xwe nedaye eva sebaret bi
Xwe dê û ez li naw ewan da bûm ku henekê xwe pê dikirin!´
57 Yanjî bêjît, ´Eger Xwe dê ez rênivînî kiribam ez jî dê li naw hişyara da
bam!´ 58 Yanjî bêjît, dema ku ew eşkencê dibînît, ´Eger min tenê derfetek dîke
heba, ez dê li naw ewan da bam ku başiyê diken!´
59 Belê bêguman, eşkereyên Min bo te hatin, lê te nikolî lê kirin, tu qude bûy û
tu li naw nebawera da bûy. 60 Di Roja Vejiyanê da, tu dê ewan bibînî ku
sebaret bi Xwe dê direw gotibûn, rûmetê wan reş bûye. Meger ewên qude li
cehnemê da mangehek çinîne? 61 Lê ewên ku hişyarê Vî bûn Xwe dê, dê ewan
rizgar kete cihê tenahiyê, çi nebaşî li wan nadet, nejî ew dê xemgîn bin.
62 Xwe dê afrînerê hemû tişta ye û Ev parêzerê hemû tişta ye,
63 kilîlên asimana û erdê yê Vî ne. Ewên ku bawerî bi eşkereyên
Xwe dê naken ewin ku dê bidorînin. 64 Bêje,´Hûn destûrê didene min ku xêncî
Xwe dê ewên dîke biperestim, hey nezanino?´ 65 Bêguman sirûş bi te û ewên
pêş te da jî hatiye dan ´Eger hûn ´hevala´ bo Vî peyda biken, kiryarên we dê
pûç bin û hûn dê biçine naw ewên ku dê bidorînin. 66 Belê Xwe dê bipereste û
li naw ewên sipasdar da be,´ 67 Ew, Xwe dê pê pîvana serast napîvên. Di Roja
Vejiyanê da, dê hemû erd li naw destê Vî da bît. Dê hemû asiman di destê Vî
yê rastê da bêne badan. Paye bilindî bo Vî bît! Ev gelek serwey ew hevala ye
ku ew bo Vî peyda diken! 68 Dê pif kene zirnayê[a] da û ewên di asimana û erdê
da, dê bê hest bikevine xarê, xêncî ewên ku Xwe dê dixwazît. Dê careke dîke
jî pif kenê û dem û dest ew dê li ser pêyê xwe bin û dê zêndenê.



a: Jibo peyva ´Sûr´li erebî da, min zirna bikar înaye!

69 Erd dê bi ronahiya Xwedanê xwe bibriqît, dê tomarê bînin, dê Pêşbîn û
gewaha bînin û dê bi dadmendî li nawbera wan da dadweriyê biken û nerastî
li wan nayête kirin 70 û bi tewawî dê, bi hemû rihekê bête dan, jibo ewa ku
kiriye, Ev dizanît ku ew çi diken. 71 Ewên nebawer dê bi koma hajone
cehnemê da, komê xwe we, pêşengiya wan bête kirin bo naw cehnemê da.
Taku dema ew digehinê, dê derê wê vebin û dergevanê wê dê bêjin, ´Meger li
we bixwe peyamber bo we nehtibûne şandin ku eşkereyên Xwedanê we bo we
bixweînîn û agahdariyê biden bo ev Roja hevdîtina we?´ Û ew dê bêjin,´Belê´
lê peyva sizayê li ser nebawera hatiye cih. 72 Dê bête gotin, ´ Li deryên
cehnemê da herine jor, ta bêdawiyê wêderê da bimînin, mangeha ewên qude[a]
nexweşe!´ 73 Ewên ku hişyarê Xwedanê xwe bûn, dê koma da hajone bo naw
baxçe da, ta dema ku ew digehinê da, dê deriyê wê vebin û dergevanên wê dê
bêjine wan, ´Aştî li ser we bît, we başî kiriye, lewma werne têda û ta bêdawiyê
têda bimînin,´ 74 Û ew dê bêjin, ´Pesn bo Xwe dê ye ku belêniya Xwe înaye
cih û wel me kir ku em erd mîrat biben, em dê naw baxçe da li her derê ku em
dixwazin bijîn.´ Erêniye padaşê karkera.
75 Hûn dê bibînin ku firişte doraliyê Text digrin, bi pesna Xwedanê xwe paye
bilind diken, pê rastiyê dê li nawbera wan da dadwerî bête kirin û dê bête
gotin, ´Pesn bo Xwe dê bît Xwedanê hemû dinyaya.´



a: Jibo peyva ´Motakabir´ xwe mezin zan, min peyva qude bikar înaye!

## 40. Para Lêbihori

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Ha Mîm 2 Ew nivîsîna pîroz li bal Xwe dê Bihêz û Zanîn we hatiye şandin
xarê, 3 lêbihorê guneha û pejirînerê peşîmaniya, gelek dijware li siza danê û
Xwedanê eva bêpayane. Çi xwedê nînin bes Ev nebît, armanc jibo bal Vî ye.
4 Kes gengeşê li ser eşkereyên Xwe dê naket bes ewên nebawer nebin, liber
hindê, nehêle hatûçona wan li ser erdê te bilêbînît.
5 Pêş wan da, neteweya Nûh jî nikolî lê kirbû û komên piştî wan jî, hemû
neteweya bername rêjî kirin ku peyamberên xwe bigrin û têkoşîn ku pê direwê
rastiyê li nav biben, lê Min ew girtin û sizaya Min çawa bû! 6 Bi wî awayî peyva
Xwedanê te li dijî nebawera da hate cih ku ew hevrêyên naw agir da ne.
7 Ewên ku Text hildigrin û ewên ku li derdorê wê ne, bi pesna Xwedanê xwe
paye bilind diken û bawerî bi Vî hene û daxwaza lêbihorînê bo bawermenda
diken, ´Xwedanê me, Tu hemû tişta bi rehm û zanist himbêz dikey, lewma li
ewên ku peşîman dibin û peyrevî li rêya Te diken bibihore û ewan li êşkenceya
cehnemê biparêze 8 û Xwedanê me, ewan vergire naw baxçeyên bêdawiyê ku
Te belênî daye wan û ewên durustkar li naw berebabên ewan da, hevjînên wan
û paşkevtiyê wan, birastî Tu Bihêz û Biryarderî. 9 Ewan li nebaşiyê biparêze,
ewên ku Tu dê li nebaşiyên ew Rojê diparêzî, Tu dê rehmê bideye wî û ewe
destkevta herî mezine.´ 10 Birastî dê gazî ewên nebawer biken, ´Kerbê Xwe dê
gelek zêdetir li we divebû ku we bixwe kerb li xwe divebû, dema ku hûn hatine
gazî kirin bo baweriyê lê we nepejirand.´ 11 Ew dê bêjin, ´Xwedanê me, Te du
cara mirin da me û du cara jiyan da me û me gunehên xwe gotine, çi rêkê bo
derketinê hene?´ 12 ´Ewe li ber xatira hindê ye dema ku bi tenê gazî Xwe dê
hate kirin, we bawerî pê nekir, lê dema ku ewên dîke kirine ´hevalên´ Vî, we
bawerî pê kir.´ Lewma dadwerî ya Xwe dê Bilind û Mezine. 13 Ev ê ku
nîşaneyên xwe pêşanî we didet û li asiman ra bo we debara dişînîte xarê, lê kes
nayînîte bîra xwe xêncî ewê ku zivriye. 14 Li ber hindê, li ber Xwe dê bipariyên
û ji dil we dîndarê Vî bin, herçend ku nebawer hez lê neken.
15 Serwey pileya ye Xwedanê Text ê, Ev sirûşa destûra Xwe didanête ser her
yêk li koleyên Xwe ku Ev dixwazît ku sebaret bi Roja Hevdîtinê agahdariyê
bidet, 16 ew Roja ku ew dê bêne derê û hîç tiştek sebaret bi wan li Xwe dê
weşartî nabît. ´Padişahiya ew Rojê bo kêye?´ ´Xwe dê Yêkta! Ev ê heri Bihêz.´
17 Ew rojê dê padaş bidene her rihekê bo her tiştekê ku dest xwe êxistiye, îro çi
bêdadî nayête kirin Xwe dê lezgîne li hisab danê da.´

[18] Agahdariyê bide wan, li ew Roja ku nêzîk dibît, dema ku dilê wan di qirka
wan daye û ewan dixendiqînît, ewên nebaşkar çi hevalê dilsoj nabin, nejî
peyrewî li hîç navbêjvanekê tête kirin. [19] Ev agahdarê nêrînên dizîwe ye û ewa
ku sing diveşêrin, [20] Xwe dê bi rastiyê dadweriyê diket lê ewên ku li kêleka Vî
da gazî wan diken bi hîç tiştekê dadweriyê naken, birastî Xwe dê ye Ev ê
Bihîstine, Dîtine. [21] Meger, ew li ser erdê da negeriyane ku bibînin dawiya
ewên pêş wan da çibû? Ew li wane bihêztir bûn û hêmayeke bi bandor danane
ser erdê, lê Xwe dê li ber gunehê wan, ew girtin û ewan kes çinebûn ku wan li
Xwe dê biparêzît.
[22] Çimkî peyamberên wan pê belgeyên aşkira hatine bal wan lê ewan bawer
nekir, lewma Xwe dê ew girtin, birastî Ev gelek bihêze û bi dijwarî siza didet.
[23] Bêguman Me pê nîşaneyên Xwe û desthilata zelal Mûsa şande [24] bal Fireûn,
Haman û Qarûn û ewan gotê, ´Cadûgerek direwîn! [25] Dema ku wî li bal Me
we rastî bo wan bir ewan got, ´kurên ewên ku digel wî bawer diken bikujin û
bihêlin jinên wan zindî bimînin´ Bername rêjiya ewên ku bawer naken xêncî
şaşiyê tiştek dîke nîne. [26] Fireûn got, ´Bihêlin ez Mûsa bikujim, bihêlin bila ew
li ber Xwedanê xwe bipariyêt! Birastî ez ditirsiyêm ku ew dînê we biguherît,
yanjî ew bibîte hokarê gendeliyê li ser erdê.´
[27] Mûsa got, ´Birastî ez penaha xwe bo Xwedanê xwe û Xwedanê te dibem, li
ber hemû ewên xwe mezinzan ku bawerî bi Roja hisabê naken.´[28] Mêrekê li
binemala Fireûn ku baweriya xwe weşartibû got, ´Tu dê mêrekê bikujî çimkî
ew dibêjît Xwedanê min Xwe dê ye?´ Bêguman ew nîşaneyên zelal li bal
Xwedanê te ra bo te înayne, eger ew direwîne bila ew ser serê wî bît û eger ew
rast dibêjît, hindek li eva ku wî hereşe pê kiriye dê bête serê te, birastî
Xwe dê ewê sînor bezên û direwîn rênivînî naket. [29] Netewa min, îro padişahî
ya weye, desthilatdar li ser erdê, lê eger sizaya Xwe dê bête ser me dê kê
yarmetiya me biket?´ Fireûn got, ´Ez pêşanî we nadem xêncî ewa ku ez
dibînim, meger ez li ser rêya rast da we rênivînî nakem.´ [30] Ewê bawermend
got, ´Netewa min birastî ez bo we ditirsiyêm weka roja koma [31] weke çarenûsa
netewa Nûh, Ad, Semûd û ewên ku li paş wan da hatin. Xwe dê bêdadiyê bo
koleya naxwazît. [32] Netewa min, birastî ez bo we li Roja gazî kirinê ditirsiyêm,
[33] ew Roja ku hûn dê pişta xwe bidenê û birewin, bêy ku kesek hebît we li
Xwe dê biparêzît! Herkesê ku Xwe dê bihêlît li rê derkevît bo wî çi rênivînî
çinabît. [34] Bêguman pêşta, Yûsif jî pê nîşaneyên zelal hatibû bal we, lê hûn çi
cara li guman kirin li eva ku wî bo we îna bû nerawestan, taku dema ew mir,
we got, ´Xwe dê çi cara piştî wî peyamberekê naşînît.´ Bi wî awayî Xwe dê
dihêlît ku ewên gumandar û sînorbezên li rê derkevin.

[35] Ewên ku gengeşê li ser eşkereyên Xwe dê diken, bêy ku hîç çeşne desthilatek
bi wan hatibîte dan, kerbek gelek mezine li bal Xwe dê û ewên ku bawer
diken jî lê divebît. Bi wî awayî Xwe dê dilê hemû zordestên xwe mezin zan
girê didet. [36] Fireûn got, ´Haman bo min kelehekê çêke, belke pê wê ez
bigehime rêya, [37] rêyên naw asimana ku belke ez zêndeme Xwe dê Mûsa.
Belê birastî ez hizir dikem ku ew direwîne.´ Bi wî awayî Me kiryarên Fireûn yê
nebaş li pêş çavên wî xemilandin û pêşgîrî li wî hate kirin bo ser rê û
bernameyên Fireûn xêncî wêraniyê tiştek dîke nebûn. [38] Ew ê bawermend got
´Netewa min, peyreviyê li min biken! Ez dê we rênivîniyê rêya rast bikem.
[39] Netewa min, jiyana ev dinyayê tenê xweş qetandine, birastî Dawî mala
manê ye . [40] Herkesê nebaşiyê biket, dê ya weka wê bi wî bête dan û herkesê
ku karê durust biket, çi jin bît yanjî mêr bît û bawer biket, ew dê biçine naw
baxçe da û bêpîvan dê jibo wan bête dabîn kirin. [41] Netewe min, çima ez bo
rizgariyê gazî we dikem lê hûn min gazî naw agir diken? [42] Hûn gazî min
diken ku bawerî bi Xwe dê nekem û bikeme ´hevalê´ Vî, ewa ku min çi zanist
li ser nîne, ez gazî we dikem bo bal Ev ê Bihêz û Lêbihor. [43] Çi guman têda
nîne, ewê ku hûn min gazî dikenê çi pariyan bo nîne, ne ev dinyayê û nejî li
Dawiyê da û zivrîna me, jibo bal Xwe dê ye û ewên sînor bezên dê bibine
hevrêyên naw agir da. [44] Dê bête bîra we ku ez çi dibêjime we, li ber hindê, ez
karûbarê xwe dispêrime Xwe dê, birastî Xwe dê koleya dibînît.´
[45] Lewma, Xwe dê ew li bername rêjiya nebaşa wan parast û sizayeke nebaş
mirovên Fireûn di xwe da pêça, [46] sibêdê û êvara dê agir berbîte wan. Ew
Roja ku Demjimêr têt, ´Mirovên Fireûn dê biçine naw eşkenceya herî dijwar
da.´ [47] Dema ku ew li naw agir da gengeşê diken, ewên lewaz dê bêjine ewên
qude, ´Birastî em peyrevê te bûn, li ber hindê tu dê bikarî me li pişkek e, ew
agir rizgar bikey?´ [48] Lê ewên ku qude bûne dê bêjin, ´Birast em hemû di
ewinê da ne, birastî Xwe dê li nawbera koleyên Xwe, da dadwerî kiriye.´
[49] Ewên naw agir da, dê bêjine parêzvanê cehnemê, ´Li ber Xwedanê xwe
bipariyê bila bo rojekê eşkenceya me kêm biket,´ [50] Ew dê bêjin,´Meger
peyamberên we bi belgeyên zelal nehatine bal we?´ Ew dê bêjin, ´Belê´ Û ew
dê bêjît, ´Eger werenge bipariyê, lê pariyanê nebawer xêncî şaşiyê tiştek dîke
nîne.´ [51] Birastî Em yarmetia peyamberên Xwe diken û ewên ku bawer diken
li jiyana ev dinyayê da û li ew Roja ku dê gewah rabin.
[52] Di ew Roja ku mahna çi qazanc bo ewên nerastkar çinabin, ewan dê nerênî
hebît û ewan dê mala nebaş hebin. [53] Bêguman Me rênivînî da Mûsa û Em
bûne hokar ku zarûkên Israîl nivîsîna pîroz mîrat biben, [54] rênivînî û bîranînek
bo ewên xwedan têgeheştin.

55 Li ber hindê, bêhin fereh be, belêniya Xwe dê raste û jibo gunehên xwe
daxwaza lêbihorînê bike, pê pesna sibêdê û êvara Xwedanê xwe paye bilind
bike. 56 Birastî ewên ku li ser eşkereyên Xwe dê gengeşê diken bêy ku hîç
desthilatek bo wan hatibît çi tiştek di singê ewan da nîne, bes xwe mezin kirin
nebît ku ew nagehinê. Liber hindê penaha xwe bo Xwe dê bînin, Ev Bihîstine,
Dîtine. 57 Afirandina asimana û erdê mezintre li afirnadina mirova, lê piraniya
mirova nizanin. 58 Ewên kore û bîner wekhev nînin û nejî ewên bawer diken,
karên durust diken û ewên ku karên nebaş diken, çend kêm tête bîra we!
59 Birastî dê Demjimêr bêt û çi guman têda nîne, lê piraniya mirova bawer
naken. 60 Xwedanê we dibêjît, ´Gazî Min biken Ez dê bersiva we bidem,
birastî ewên ku qude ne ku Min biperestin dê serşor biçine cehnemê da.´ 61 Ev
Xwe dê ye ku şev daye we ku hûn têda bêhna xwe weden û roj daye we ku
hûn têda bibînin. Birastî Xwe dê bo mirova bêpayan qencî hene, lê piraniya
mirova nankorin[a]. 62 Wisa ye Xwe dê Xwedanê we, Afrînerê hemû tişta, çi
xwedê nînin bes Ev nebît, bes hûn çava hatine xapandin?
63 Bi wî awayî ewên ku hatibûne xapandin, nîşaneyên Xwe dê nepejirandibûn.
64 Ev Xwe dê ye ku bo we erd kiriye mangehek û asiman jî kiriye konek û şêwe
daye we û şêweyê we bêkêmasî kir û tiştên baş bo we dabîn kirine, Ev e
Xwe dê ye Xwedanê we, bes Xwe dê pîroz e, Xwedanê hemû dinyaya.
65 Ev herdem Zindî ye û çi xwedê nînin bes Ev nebît, lewma liber Vî bipariyên
û ji dil we dîndarê Vî bin, pesn bo Xwe dê ye Xwedanê hemû dinyaya.
66 Bêje, ´Birastî li min qedexe hatiye kirin ku ewan biperestim ku hûn di kêleka
Xwe dê da li ber wan dipariyên, dema ku li bal Xwedanê min we, belgeyên
zelal bo min hatine û ferman li min hatiye kirin ku xwe radestê Xwedanê
hemû dinyaya bikem.´ 67 Ev e ku tu li tozê afirandî, paşê li dilopeke avikê,
paşê li şêweyekê ku dizeliqît, paşê tu sawa înane derê, paşê Vî hêla tu pê
bigehî, paşê Vî hêla tu pîr bî û li naw we da ew hene ku pêşta li mirinê da
diben û tu digehiye dema xwe ya destnîşan kirî, belke li ber hindê tu hizra xwe
bikar bînî. 68 Ev e ku jiyan û mirinê didet û dema ku Ev fermana tiştekê didet,
Ev tenê dibêjîtê, ´Bibe´ û ew heye. 69 Tu nabînî, ewên ku li ser eşkereyên[b]
Xwe dê gengeşê diken çawa li rê derketine!? 70 Ewên ku nikoliyê[c] li nîvîsîna
pîroz û eva ku Me peyamberên Xwe pê şandine diken? Ew dê bizanin!
71 Dema ku dê lele[d] li ûstiyê wan da bît û zincîr, dê ewan radikêşine
72 naw ava kelandî, paşê li naw agir da bişewitînin 73 û paşê dê bêjine wan,
´Ew kiweye ewê te dikire ´heval´ 74 di kêleka Xwe dê da?´ Ew dê bêjin, ´Ewan,
em bêxwedan hêlane, belê pêşta em liber çi tişta nedipariyan.´ ´Bi wî awayî
Xwe dê dihêlît ku ewên nebawer li rê derkevin, 75 ewe li ber hindê ye ku we li
ser erdê xweş qetand bêy ku we maf hebît û hûn bi lewçetî rabûn û rûniştin.

a: Sipasdar nebûn. b: Ayet
c: Haşa kirin, direw derêxistin, bawer nekirin. d: Qeyda asin li ûstiyê mirovê girtî

76 Li derwazên cehnemê da herine jor û ta bêdawiyê li wêderê bimînin, ciheke
nebaşe bo ewên qude.´ 77 Li ber hindê bêhin fereh be, birastî belêniya Xwe dê
raste, çi Em pişkek li ewa ku Me belêniya wê daye wan pêşanî te biden yanjî
Em pê mirinê te biben, jibo bal Me ye ku ew dê bêne zivirandin.
78 Bêguman Me pêş teda jî peyamber şandine, li naw ewan da ew hene ku Me
bo te basê wan kiriye û li naw ewan da ew jî hene ku Me bo te basê wan
nekiriye û jibo hîç peyamberekê nîne ku çi nîşaneyekê bînît bêy destûra
Xwe dê! Lewma dema ku fermana Xwe dê bêt, dê bi rastiyê dadwerî bête
kirin û ewên ku direwîn bûn dê bidorînin. 79 Ev Xwe dê ye ku bo we ajelên
kevî çê kirîne ku hûn li hindeka siwar bin û hindeka jî hûn dixwen 80 di wan
da jibo we qazanc hene û belke li rêya ewan da hûn bigehine pêvîstiya di singê
xwe da û li ser wan û ser gemiyên hûn têne hilgirtin. 81 Ev nîşaneyên Xwe
pêşanî te didet lewma tu dê nikoliyê li kîj nîşaneyên Xwe dê bikey? 82 Meger
ew ser erdê da negeriyane ku bibînin dawiya ewên pêş wan da çawa bû?
Ew gelek li wan zêdetir bûn li wan bihêztir bûn û şûnewar danane ser erdê, lê
ewa ku ewan bidestê xwe êxist bû çi qazanc jibo wan çinebû. 83 Dema ku
peyamberên wan pê belgeyên zelal hatine bal ewan, ew keyfxweşê ew zanistê
bûn ku wan hebû û li ber hindê ewa ku wan henekê xwe pê kiribûn ew dorpêç
kirin, 84 lewma dema ku wan sizaya Me dît ewan got, ´Em tenê bawerî bi
Xwe dê diken û bawerî bi ewa ku me kirbû ´hevalê´ Vî naken,´
85 Lê baweriya wan çi qazanc jibo wan nebû dema ku sizaya Me dîtin.
Rêbaza[a] Xwe dê ye ku li nawbera koleyên Vî da berdewam diket û piştî hingê
nebawer dê bidorînin.



a: Jibo peyva sunet min rêbaz bikar înaye.

## 41. Para Bi Hurî Hatî Şirove Kirin

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Ha Mîm 2 Aşkira bûnek li bal Xwedanê Rehmê we, Ev ê ku Rehmê didet,
3 nivîsîneke pîroz ku eşkereyên vê hatine şirove kirin, Xwandineke (Quranek)
erebî bo neteweyekê ku têdigehît, 4 Mizgînî û agahdariyê didet, lê piraniya
wan pişta xwe didenê û li ber hindê ew nabihên. 5 Ew dibêjin, ´Dilê me li dijî
eva ku tu me gazî dikeyê hatiye pêçan û di guhê me da keratî heye û li
nawbera me û te da perdeyek heye. Li ber hindê tu kar bike, birastî em jî kar
diken.´ 6 Bêje, ´Ez jî tenê weke we bimirekim sirûş[a] bi min hatiye dan ku
Xwe dê we Yêke lewma rêya serast bigirine pêşya xwe bo bal Vî û daxwaza
lêbihorîna Vî biken! Hewar li ewên ku jiboy Vî ´hevala´ peyda diken,
7 ewên ku ew xêra bo wan hatiye dîhar kirin[b] naden û bawerî bi Dawiyê
naken! 8 Birastî ewên ku bawer diken û karên durust diken dê padaşê bêpayan
hebin.´ 9 Bêje, ´Birastî tu bawerî bi Ev ê ku li du roja da erd afirand nakey?
Te jî bo Vî hemta damezirandine? Ev Xwedanê hemû dinyaya ye!´
10 Ev çiyayên qahîm danane ser da û Ev pîroz kirin, li çar roja da bijêviya
jiyana wan dabîn kir, bê ciyawazî, jibo ewên ku dipirsin, 11 Paşê Ev berê Xwe
daye asimanê ku dukel bû, Ev gote wê û erdê, ´Werne hebûnê, bi dilxwaz
yanjî bi zorê´ Ewan got, ´Em bi dilxwaz tên´ 12 Û li du roja da, Ev heft asiman
tewaw kirin û bi sirûş destûra hemû asimana dayê da û Me asimanê dinyayê
bi çiraya xemiland û ewê diparêzin. Ewe çarenûsa Ev ê Bihêz û Zana ye.
13 Eger ew pişta xwe bidenê, bêje, ´Min hûn agahdarê birûskê kirîne, wek ew
birûska Ad û Semûdê 14 dema ku peyamberên wan li pişt wan ra û li pêşiya
wan ra hatine bal wan, ´Xêncî Xwe dê neperestin,´ Ewan got, ´Eger Xwedanê
me xwastiba, dê Vî firişte şandibana xarê, liber hindê birastî em bawerî bi eva
ku digel te hatiye şandin naken.´ 15 Netewa Ad, bêy ku mafê wê hindê hebin li
ser erdê qude bûn û gotin, ´Kê li me bihêztire?´ Meger ewan nedidîtin ku
Xwe dê ew afirandî gelek li wan bihêztir bû, lê ewan nîşaneyên Me
nedpejirandin,16 li ber hindê, li rojên bextreşiyê da Me bayeke bi qêrîn şande
ser wan ku li jiyana ev dinyayê da sizaya serşoriyê bi wan bidene tam kirin, lê
sizaya Dawiyê gelek serşortire û yarmetiya wan jî nayête kirin.
17 Sebaret bi Semûd jî, Me ew rênivînî kirin lê ewan li rênivîniyê zêdetir hez li
koretiyê kirin, li ber hindê sizaya birûska ûstî xar ker ew girtin, ber xatira ewa
ku wan dest xwe êxistibû. 18 Ewên ku bawer dikirin û hişyarê Vî bûn Me
rizgar kirin. 19 Di ew Roja ku dujminên Xwe dê bo naw agir da têne kom kirin
û di rêza da têne rêz kirin, 20 ta dema ku ew têne têda, dê guhê wan li dijî wan
gewahiyê biden û çavê wan û pêstê wan jî, li ber xatira ewa ku wan dikir.



a: Vehî b: Zikat (ew xêra ku bo wan hatiye dîhar kirin)

[21] Ew dê bêjine pêstê xwe, ´Çima we li dijî me gewahî da?´ Ew dê bêjin,
´Xwe dê wel me kir ku em bipeyvin, Ev ê ku wel hemû tişta diket ku bipeyvin
Ev bû ku bo cara yêkê tu afirandî û jibo bal Vî tu dê bêye zivrandin, [22] te xwe
li bihîstin, dîtina û pêstê xwe neweşart ku ew li ser te gewahiyê neden, lê te
texmîn kir ku Xwe dê piraniya ewa tu dikey nizanît, [23] li ber xatira ew
texmîna ku te sebaret bi Xwedanê xwe texmîn kirî, ewê tu wêran kirî û tu
bûye li naw ewên ku dorandine.´ [24] Her çend ew xwe bêhin ferh ken jî, dê
mangeha wan agir bît û eger ew bipariyên ku bihêlin ew serast kariyê jî biken,
destûr bi wan nahête dan ku ew serastkariyê biken. [25] Me ji bo wan hevrê
peyda kirîne ku ewa li pêşya wan bû û ewa li pişt wan bû pêş çavê wan
xemilandine û peyv li ser wan hatiye cih li naw netewên cin û mirova ku li pêş
ewan da mirîne, birastî ewan dorandibû. [26] Ewên nebawer dibêjin, ´Guhê xwe
nedene ev Xwandinê (Quranê). Li dema vê da bikene deng belke bi wî awayî
hûn serkevin.´ [27] Bêguman Em dê bibine hokar[a] ewên ku bawer naken
sizayeke dijwar tam biken. Bêguman Em dê pêka kiryarên wan yê herî nebaş
padaş bidene wan, [28] eweye padaşê dujminên Xwe dê, agir! Jibo wan dê
wêderê da mala bêdawiyê hebît, padaşek jibo ewa li eşkereyên Me
nepejirandin. [29] Dê ewên nebawer bêjin, ´Xwedanê me, ew cin û mirovên ku
em li rê derêxistin pêşanî me bide, belke em ewan danêne bin pêyê xwe da ku
ew li naw ewên herî nizim bin.´ [30] Birastî ewên ku gotine ´Xwedanê me
Xwe dê ye û pêdagir mane, dê firişte bêne xarê bo bal wan ´Ne bitrsin nejî
xemgîn bin, lê mizgîniya baxçe[b] wergirin ku belêniya wê bi we hatiye dan.
[31] Di ev dinyayê û di Dawiyê da jî, Em hevpeymanê we ne û her tiştê ku riha
we hez lê biket dê wê derê da hebît û her tiştê ku hûn bixwazin we dê li
wêderê da hebît. [32] Xêr hatinek li bal Ev ê Lêbihore Rehmê didet.´
[33] Kê li ew bêhtir dipeyvît, ewê ku gazî diket bo bal Xwe dê, karê durust diket
û dibêjît, ´Birastî ez li wanim ku min xwe radestê Xwe dê kiriye[c]? [34] Baş û
nebaş wekhev nînin, pê ewa baş wêda bide û paşê lê binhêre û bibîne nawbera
dujminê te digel te dê weka hevalê te yê nêzîk lê bêt. [35] Lê nadene kesê xêncî
ewê bêhin fereh û nadene kesê xêncî ewê xwedanê bexteke gelek mezin.
[36] Eger Şeytan pê piste pistê[d] pêşniyareke nebaş bi we biket, penaha xwe bo
Xwe dê bînin, birastî Ev Bihîstine, Zanîne.[37] Şev û roj, tav[e] û heyv li
nîşaneyên Vî ne, çokên xwe nedanên û serê xwe li ber rojê nenivînin nejî li
ber heyvê, lê çokên xwe biçemîne û serê xwe li ber Xwe dê binvînin, Evê ku
ew afirandine, eger tu tenê Ev diperestî. [38] Lê eger ew xwe mezin diken, ewên
ku nêzîkê Xwedanê te ne, şev û roj Vî paye bilind diken û nawestiyên jî.



a: Sebeb, delîl, heger
b: Biheşt
c: Misliman
d: Dengê bêdeng li serê we da bo we hizra çêket!
e: Roj, hetav

39 Li naw nîşaneyên Vî da tu dibînî ku erd çole, lê dema ku Em bo wê avê
dişînine xarê, ew dibzivît û şîn dibît, birastî Ev ê ku jiyanê didetê, bêguman dê
jiyanê bidete miriya, birastî Ev desthilat li ser hemû tişta heye.
40 Birastî ewên ku eşkereyên[a] Me têk[b] diden, li Me weşartî nînin, lewma meger
ewê ku tête havêtin bo naw agir başe yanjî ewê ku bi tenahî têtê Roja
Vejiyanê da? Her tiştê ku hûn dixwazin biken, birastî Ev dibînît ewa hûn
diken. 41 Ewên ku bawerî bi bîranînê naken, dema ku jibo wan têt, birastî ev
nivîsîna pîroz gelek bihêze, 42 direw nayête têda ne li pêşve û ne li paşve,
eşkereyeke li bal Ev ê Biyarder û Jêhatiyê Pesnê. 43 Çi bi te nayê gotin xêncî
eva ku bi peyamberên pêş te da hatibû gotin, ´Birastî Xwedanê te Xwedanê lê
bihorînê ye û Xwedanê sizaya dijware. 44 Eger Me kiriba Xwandineke
(Quraneke) bîhanî, ewan dê gotiba, ´Çima eşkereyên wê bi hûrî nehatine
şirove kirin? Bîhanî û Ereb?´ Bêje, ´Eve bo ewên ku bawer diken rênivînî û
dermaneke, lê ewên ku bawerî pê naken li guhên wan da keratî heye û jibo
wan têda koretî heye, li ciheke dûr we gazî ewan diken.´ 45 Bêguman Me
nivîsîna pîroz da Mûsa, lê têda nakokî peyda bû, eger li ber xatira peyvekê ku
pêşta li bal Xwedanê te da hatiye ragehandin neba, her li pêşta dê li nawbera
wan da dadwerî hatiba dan, lê birastî ew li gumanê da ne û sebaret bi evê[c],
guman hene. 46 Her kesê kiryarên durust diket, ew jibo riha xwe diket û her
kesê nebaşiyê diket, ew li dijî wê diket û Xwedanê we digel koleya bêdad nîne.
47 Zanista Demjimêrê tenê ya Vî ye, hîç berhemek li naw qalikê xwe da
naderkevît, nejî bêy zanista Vî hîç mêyek pêgiran dibît nejî dizêt. Di Rojê da,
Ev dê gazî wan biket, ´´hevalên´´ Min li kîwe ne?´ Ew dê bêjin, ´Em bo Te
radgehînin ku li naw me da çi gewah nînin´ 48 Ewên ku ew pêşta, liber wan
dipariyan, dê li wan wenda bin û ew dê arxayîn bin ku ewan çi cih nîne ku
birewinê. 49 Mirov çi cara li pariyan jibo başiyê nawestiyêt, lê eger nebaşî
destê xwe bidete wî, ew hêviya xwe li dest didet û bêhêvî dimînît. 50 Bêguman
eger Em bihêlin, ew li rehma Me tam biket, piştî ku zirarê li wî daye,
bêguman ew dê bêjît, ´Ewe bo mine, ez hizir nakem ku Demjimêr dê bêt,
tenanet eger min bizvrînine bal Xwedanê min jî, birastî dê li bal Vî jibo min
baş hebît,´Bêguman Em dê ewên ku nebawer bûn agahdar biken ku ewan çi
kiribû û Em dê eşkenceya herî dijwar bi wan bidene tam kirin. 51 Dema ku
Em erêniyê bi mirov diken, ew pişta xwe didetê û xwe dûr diket, lê dema ku
nebaşî lê didet, ew dûr û dirêj dipariyêt. 52 Bêje, ´We liber çav girtiye eger eve[d]
li bal Xwe dê we bît û hûn bawerî pê naken? Kê dikarît li ew kesê ku bi tundî
dijatiyê diket dûrtir li rê derkevît?

a: Aye
b: Wateya eşkereya diguherin.
c: Xwandin (Quran)
d: Xwandin (Quran)

53 Em dê li ser elendê[a] û di naw ewan bixwe da nîşaneyên Xwe pêşanî wan biden, taku ew bo wan zelal bît ku eve[b] Rastiye. Meger, ewe têrê naket ku Xwedanê we gewahiyê li ser hemû tişta didet?
54 Birastî ew bi gumanin ku ew dê Xwedanê xwe bibînin, bêguman Ev hemû tişta dorpêç diket.



a: Cihê ku erd û asiman digehine hevdu, cihê ku roj hildidet û diçîte ava, Aso, ofoq
b: Xwandin (Quran)

## 42. Para Ravêj ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Ha Mîm, 2 Eyn Sîn Qaf 3 bi wî awayî bo te û ewên pêş te da eşkere bûye,
Xwe dê Bihêze Biryardere. 4 Hemû ewa di asimana û erdê da ya Vî ye,
Ev ê Bilind û Gelek Mezine. 5 Kêm maye hemû asimanê serê têk bişkên,
firişte pesna paye bilindiya Xwedanê xwe radigehînin û daxwaza
lêbihorînê bo ewên li ser erdê dixwazin, bêguman Xwe dê Ev ê Lêbihore
û Rehmê didet. 6 Ewên ku li xêncî Vî piştîvanê dîke verdigrin, Xwe dê
çavdêriya wan diket û tu parêzerê wan nînî.
7 Li ber hindê Me Xwandineke (Quraneke) Erebî bo te eşkere kiriye,
belke bi wî awayî tu agahdariyê bideye dayka gunda û ewên li derdorê wê
û sebaret bi Roja kombûnê agahdariyê bidey ku çi guman têda nîne,
komek dê li naw baxçe da bît û komek jî dê li naw agirê geş dabît.
8 Eger Xwe dê xwastiba Vî dê karîba ewan bikete neteweyek, lê Ev her
kesê ku Ev dixwazît verdigrîte naw rehma Xwe da û nerastkara kes nînin
ku wan biparêzin yanjî yarmetiya wan biden.
9 Yanjî ewan li kêlek Vî da piştîvan wergirtine? Lê Xwe dê ! Ev piştîvane
Ev jiyanê didete miriya û Ev desthilat li ser hemû tişta heye.
10 Her tiştekê ku we li ser da nakokî hebît bo Xwe dê ye ku biryarê li ser
bidet. ´Ev Xwe dê ye Xwedanê min, ez xwe dispêrime Vî û ez dê
bizivirme bal Vî, 11 Destpêkerê asimana û erdê.´ Ev li we bixwe jibo we
cot çêkirin û jibo ajelan jî cot, Ev bi wî awayî we zêde diket. Çi tiştek weke
Vî nîne, Ev Bihîstine, Dîtine. 12 Kilîlên asimana û erdê yê Vî ne, Ev bi
firavanî jibo her kesê ku Ev dixwazît dabîn diket û distînît jî, Vî zanista li
ser hemû tişta heye. 13 Vî li ser dîn destûr dayne te ku dabûna
Nûh û eva ku Me bo te eşkere kiriye û eva ku Me destûr dabû Ibrahîm,
Mûsa û Îsa jî ku ´Dîn damezrînin û li ser da nebine parçe parçe[a]´ jibo
ewên ku ´hevala´ bo Vî peyda diken dijware ewa ku tu gazî wan dikey
biken, Xwe dê her kesê ku Ev biXwe dixwazît bi Xwe hildibjêrît û
rênivîniyê aliyê Xwe diket, herkesê ku dizivrît,14 ew nebibûne parçe parçe
ta piştî dema ku zanist jibo wan hatibû, kêberkêya nawbera wan! Eger li
ber xatira peyvekê neba ku pêşta li bal Xwedanê te we hatibû ragehandin,
jibo demek dîhar kirî dê li nawbera wan da dadwerî hatiba kirin. Birastî
ewên ku piştî wan nîvîsîna pîroz bi mîrat birîne, guman têda hene û
sebaret bi vê gumandarin.



a: Li yêk belaw nebin, yêk bigrin, yêkitiya xwe biparêzin.

[15] Jibo wê hindê gazî bike û pêdagir be, her wek ku ferman li te hatiye
kirin û peyrevî li hestê wan neke, lê bêje, ´Ez bawerî bi eva di nivîsîna
pîroz da dikem ku Xwe dê şandiye xarê û destûr bi min hatiye dan ku
dadweriyê bînime nawbera we da. Xwe dê Xwedanê me û Xwedanê we
ye, kiryarên me bo me ne û kiryarên we jî bo we ne, li ber hindê bila çi
gengeşe li nawbera me û we da çinebît Xwe dê, dê me kom bikete ser
hevda û armanc jibo bal Vî ye.´
[16] Ewên ku sebaret bi Xwe dê gengeşê diken, piştî bersiva ku dayne Vî,
gengeşeya wan digel Xwedanê wan pûçe, kerb dê bikevîte ser wan da û
ewan dê eşkenceyek bijan hebît. [17] Ev Xwe dê ye ku nivîsîna pîroz birastî
û hevsengiyê[a] şandiye xarê. Çi tiştek dê we tê bigehînît? Belke Demjimêr
nêzîk bît, [18] lê digerên ku bilezînin ewên ku bawerî pê naken, lê ewên ku
bawer diken sersamê wê ne. Ew dizanin ku ew Rastiye, bêguman ewên ku
li ser Demjimêrê gengeşê diken bêguman gelek dûr li rê derketine.
[19] Xwe dê digel koleyên Xwe da herî nerme, Ev debara didete her kesê ku
Ev hez diket, Ev Bi şêyan û Bihêze.
[20] Eger her kesek berhema jiyana Dawiyê bixwazît, Em dê bo ew kes li
berhema wê zêde biken lê her kesê berhema ev dinyayê bixwazît, Em dê
lê bidenê, lê di Dawiyê da ew çi pişik nabin. [21] Yanjî ewan ´heval´ hene
ku li ser dîn destûra didene wan ku Xwe dê fermana kirina wan nedaye?
Eger li ber peyvek biryarder neba, dê li nawbera wan da dadwerî hatiba
kirin, birastî ewên nerastkar dê eşkenceyek bijan hebin.
[22] Tu dê bibînî ku ewên nerastkar dê bitirsiyên, li ber xatira ewa ku wan
dest xwe êxistiye û dê bête serê wan, lê ewên ku bawer diken û karên
durust diken, dê li naw mêrgên şîn li naw baxçeya da bin. Ewan her tiştê
ku ew li Xwedanê xwe dixwazin dê hebin, eve mezintrîn qenciye [23] li ber
xatira wê hindêye ku Xwe dê mizgîniyê didete koleyên Xwe ku bawer
diken û karên durust diken. Bêje, ´Ez li ber hindê daxwaza çi padaşa li we
nakem xêncî dilsoziyeke naw xizma da nebît.´ Her kesek başiyê dest xwe
bînît, Em dê bo wî têda baş zêde biken, birastî Xwe dê Ev ê Lêbihor û
Sipasdare. [24] Yanjî ew bêjin, ´Ew sebaret bi Xwe dê direwek berhem
înaye?´ Eger Xwe dê xwastiba Vî dikarî dilê we bipêçît. Xwe dê direwa li
nav dibet û pê peyvên Xwe rastiyê dadmezrînît. Birastî Ev dizanît ku çi
tiştek di singa da heye, [25] Ev e ku peşîmaniyê li koleyên Xwe dipejrînît û li
kiryarên nebaş xweş dibît, Ev dizanît tu çi dikey. [26] Ev bersivê didete ewên
ku bawer diken û karên durust diken û li qenciyên Xwe zêdetir didete
wan, lê nebawera dê eşkenceyek bijan hebît.

a: Teraz, Terazû.

[27] Eger Xwe dê debarên firavan dabane koleyên xwe, bêguman ewan dê
li ser erdê serhildan kiriba, lê Ev hindî pêvîst dişînîte xarê, her tiştê ku Ev
dixwazît, birastî Ev Agahdarê koleyên Xwe ye û ewan Dibînît [28] Ev e ku
baranê dişînîte xarê, piştî ku wan hêviya xwe wenda kiriye û rehma Xwe
belav diket. Ev Paiştîvane Jêhatiyê Hemû Pesna ye.
[29] Li naw nîşaneyên Vî da, afirandina asimana û erdê û ew rihtiberên ku
Vî li nawbera ewan da belav kirine, Vî şêyana wê hindê heye ku ewan
hemûya kom bikete ser hevda, her demekê ku Ev bixwazît. [30] Her çeşne
çarereşiyek bi serê we bêt, li ber hindê ye ku we destê xwe înaye, lê Ev li
piraniyê dibhorît [31] hûn nikarin li ser erdê birewine cihekê, we li kêleka
Xwe dê da çi piştîvan yanjî yarmetîder nînin. [32] Di naw nîşaneyên Vî da,
gemiyên weke çiyaya li naw deryayê da hene [33] eger Ev bixwazît, Ev
dikarît ba di cih da rawestînît û ew dê li ser rûyê wêda bê bizvîn
rawestabana, birastî lêreda nîşane hene, bo hemû ewên ku bêhin fereh û
sipasdarin [34] yanjî Ev dikarît ewan li nav bibet, ber xatira ewa ku wan
destê xwe êxistiye, lê Ev li piraniyê xweş dibît, [35] ewên sebaret bi
nîşaneyên Me gengeşê diken, pêvîste bizanin ku bo wan çi cihê rewiyanê
nîne.[36] Lewma her tiştê ku bi we hatiye dan, tenê keyfxweşiya bo jiyana ev
dinyayê, eva li bal Xwe dê baştir û mayendetire, jibo ewên ku bawer
diken û xwe dispêrine Xwedanê xwe, [37] ewên ku xwe li gunehê mezin û
bêrewiştiyê diparêzin û dema ku ew tore ne, ew lê dibhorin [38] û ewên ku
bersiva Xwedanê xwe diden û nûbêja diken û karûbarên xwe bi ravêjê
diken û li ewa ku Me bo wan dabîn kiriye diden [39] û ewên ku dema
zordest li wan diden xwe diparêzin. [40] Padaşê kiryareke nebaş, kiryareke
nebaş weka wê ye, lê her kesê lêbibhorît û aştiyê biket, dê padaşê wî li bal
Xwe dê bît, birastî Ev hez nerastkara naket. [41] Her kesê ku xwe biparêzît,
piştî ku nerastî li ew hatiye kirin, paşê li dijî wan çi rêke nîne, [42] tenê rê li
dijî ewane ku mirova diçewsînin[a] û bê maf li ser erdê da serhildanê diken,
ewan dê, eşkenceyeke bijan hebît. [43] Her kesê ku bêhin ferehe û lê
dibibhorît, ewe liber pêdagirî li ser mijarê ye. [44] Her kesê Xwe dê bihêlît
ku li rê derkevît, ew çi piştîvan çinabin piştî Vî hûn dê nerastkara bibînin,
dema ku ew sizayê dibînin, dê bêjin, ´Jibo zivrînê çi rêke hene?´



a: Têne tepe ser diken, bêdadiyê digel wan diken.

[45] Hûn dê ewan bibînî ku dê berbîte wan, liber serşoriyê ew ûstîxar bûne û
dê bi dizî we zêndenê. Ewên ku bawer kirîne dê bêjin, ´Birastî ewên
dorandî, ewin ku xwe û mirovên xwe di Roja Vejiyanê da dorandine.´
Bêguman, ewên nerastkar li naw eşkenceya bêpayan da ne, [46] ewan çi
piştîvan çinabin ku li kêleka Xwe dê, da yarmetiya wan biden û ewê ku
Xwe dê li rê derêxît, ew çi rê çinabin, [47] bersiva Xwedanê xwe biden, pêş
ku ew Roja Xwe dê bêt ku nayête paşve dan, di wê Rojê da, we çi
penahgeh çinabît û jibo we çi nikolî jî lê nayête kirin. [48] Lê eger ew pişta
xwe bidenê, Me tu neşandî ku bibiye parêzerê wan, xêncî ku evê
rabigehînî. Birastî dema ku Em dibine hokar mirov li rehma Me tam
biket, ew pê keyfxweş dibît, lê dema ku nebaşî têt serê wî, berxatira ewa
ku wî pêşta bixwe pê destê xwe rêkiriye, birastî paşê mirov nankor dibît.
[49] Padişahiya asimana û erdê ya Vî ye, Ev diafrînît ewa ku Ev dixwazît, Ev
ewên mê didete her kesê ku Ev dixwazît û Ev ewên nêr didete her kesê ku
Ev dixwazît [50] yanjî didete wan, mê û nêra û her kesê ku ew dixwazît
nezok[a] diket, birastî Ev Zaniste û Şêyane.[51] Bo hîç bimirekê nîne ku dibya
Xwe dê digel wan bipeyvît, xêncî sirûşê, yanjî li pişt perdeyekê ra, yanjî bi
şandina peyamberekê ku bi destûra Xwe sirûşê bidet ewa ku Ev dixwazît,
birastî Ev Bilind û Zana ye.
[52] Bi wî awayî Me pê destûra Xwe sirûşek[b] jibo te eşkere[c] kiriye, ne te
nivîsîna pîroz dizanî nejî bawerî, lê Me ev kire ronahiyek ku pê vê rênivînî
biken, ewê ku Em bixwazin li naw koleyên Xwe, da û birastî tu rênivîniya
rêya rast bike, [53] rêya Xwe dê, Evê ku her tiştê di asimana û her tiştê di
erdê da, ya Vî ye, bêguman hemû mijar digehine bal Xwe dê.



a: Jibo peyva eqîm, min nezok bikar înaye, ewa ku nikarît bizêt.
b: Vehî, gotina Xwe dê.
c: peyva Rûh bikar hatibû ku bi Vehî, gotina Xwe dê hatiye vergêran, min peyva eşkere bikar înaye.

## 43. Para Xemla li Zêra

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Ha Mîm [2] Bi nivîsîna pîroza zelal, [3] birastî Me ev kiriye Xwandineke
(Quranek) Erebî, belke hûn têbigehin,[4] birastî eve di dayka nivîsîna pîroz[a], li
bal Me da ye, Bilind û Biryardere. [5] Meger dibya Em bîranînê li we bistînin û
guhê Xwe nedene we, çimkî hûn neteweyekê sînor bezênin?
[6] Me çend Pêşbîn şandine bo naw mirovên berê [7] lê çi Pêşbînek bo wan nema
ku bo wan neçît ku ew henekê xwe pê neken, [8] li ber hindê Me ewên gelek li
wan bihêztir li nav birin û mînaka ewên pêşta derbaz bûyî hatiye.
[9] Eger hûn li wan bipirsin, ´Kêye afrînerê asimana û erdê?´ Bêguman ew dê
bêjin, ´Ew li bal Ev ê Bihêz û Zanîn we hatine afirandin.´ [10] Ev e ku bo we
erd kiriye doşeg û jibo we li ser da, rêk çêkirîne belke liber hindê hûn bêne
rênivînî kirin, [11] Ev ê ku hindî pêvîst, li asiman ra avê dişînîte xarê, paşê Em
pê erdek mirî vedjînin û bi wî awayî jî, hûn dê bêne derêxistin [12] Ev ê ku
hemû cot afirandine û jibo we gemî û ajel çêkirîne ku hûn lê siwar dibin,
[13] belke liber hindê hûn li wan siwar bin û erêniya Xwedanê xwe bîr bînin û
dema ku hûn li wan siwar bûne bêjin, ´Paye bilindî bo Vî bît ku ewe bo me
bikêr kirîne, me bixwe nedikarî wê biken. [14] Birastî, bo bal Xwedanê xwe ye
ku em dê bizvrin.´ [15] Lê, ew pişkekê li koleyên Vî, bo Vî destnîşan diken!
Birastî mirov bi zelalî nankorin! [16] Meger Vî li naw afirandinê Xwe da kiç
birîne û hûn jî bo kura hilbijartine? [17] Dema ku mizgîniya ewê[b] didene wî ku
ewan bi Xwedanê rehmê we girê dabûn rûyê wî tarî dibît û ew tejî kul dibît,
[18] ´Yanjî ewê ku li naw cewhera da mezin bûye, ewê ku li gengeşê da zelal
nîne?´ [19] Ewên ku firişteyên koleyê Xwedanê rehmê kirîne mê. Meger ew
gewahê afirandina wan bûn? Ew gotina wan dê bête tomar kirin û dê lêpirsîn
li wan bête kirin. [20] Ew dibêjin, ´Eger Xwedanê Rehmê xwastiba me ew
nedperestîn´ Ewan çi zanist li ser hindê nîne, ew bes direwa diken.
[21] Yanjî pêş evê da Me nivîsîneke pîroz daye wan ku ew xwe qahîm pê we
digrin? [22] Belê ew dibêjin, ´Birastî Me berbabên xwe li ser dînekê dîtin û
birastî em li ser şûn pêyê wan têne rênivînî kirin.´ [23] Her wisa pêş te da Me
agahîder neşande naw gundekê, bêy ku dewlemendê wê bêjin, ´Birastî me
berebabên xwe li ser dînekê dîtin û birastî em li ser şûn pêyê wan têne
rênivînî kirin.´ [24] Ew got ´Eger ez bo we rênivîniyeke bêhtir li ya ku we dîtibû
ku berebabên we li ser dabûn bînim?´ Ewan got, ´Birastî em bawerî bi eva ku
tu pê hatî şandin naken.´[25] Liber hindê Me tole li wan vekir, paşê lêbinêrin
dawiya ewên ku nikolî kiribûn çawa bû. [26] Dema ku Ibrahîm gote babê xwe
û netewa xwe, ´Birastî ez dest li ewa ku hûn diperestin, diberdem.



a: Tabloya Destûra Xwe dê li biheştê da.
b: Mizgîniya li dayik bûna kiçekê

[27] Xêncî Ev ê ku ez destpê kirîme û birastî Ev e ku dê min rênivînî biket´
[28] Û wî ew kire peyveke mayinde li naw paşketiyên xwe da, belke ku ew
bizivrin. [29] Min xweşî daye ewane û berebabên wan taku rastî bo wan hat û
peyamberek zelal, [30] dema ku rastî bo wan hat ewan got, ´Ewe cadûye û
birastî em bawerî pê naken´ [31] Û ewan got, ´Çima ev Xwandine (Qurane) bo
mêreke gelek mezin li yêk ji wan her du gundane nehate şandine xarê?´
[32] Meger ewin ku rehma Xwedanê te belav diken? Emin ku pişka pêxwarina
wan li ev dinyayê da li naw ewan da belaw diken û Me pê pileya hindek li wan
li ser ewên dîke bilindtir kirîne, belke li ber wê hindê, hindek li wan, ewên dîke
vergirine xizmeta xwe, lê rehma Xwedanê we li ewa ku ew kom diken baştire.
[33] Eger ew neba dê mirov bibana yêk netewe û jibo ewê ku bawerî bi
Xwedanê Rehmê nekirba, Me dê jibo malên wan ban û pêlekanên zîv
çêkirban ku serkevinê, [34] jiboy malên wan derî û bermal ku li ser da rûnên
[35] û xemlên li zêr, lê ewane hemû tenê keyfxweşiyên jiyan ev dinyayê ne û
Dawî digel Xwedanê we, jiboy ewên hişyare[a]. [36] Her kesê ku pişta xwe bidete
bîranîna Xwedanê rehmê, Em bo wî şeytanekê hildibjêrin û jibo wî, ew hevrê
ye, [37] birastî ew pêşgîriya wan diken bo ser rê û ew hizir diken ku ew hatine
rênivînî kirin. [38] Ta dema ku ew tête bal Me, ew dê bêjît, ´Xwezî nawbera min
û nawbera te hindî Rojhilat û Rojava ba, çend hevrêyeke kotî bûy.´ [39] Û di wê
rojê da çi berjewenîdiyê nagehînîte we, dema ku we nerastî kiriye û hûn dê
sizayê par veken. [40] Meger tu dikarî, wel ewê ker bikey ku bibhêt? Yanjî
rênivîniya ewê kore bikey, yanjî ewê ku di şaşiya zelal daye?
[41] Çi jî Em te biben, birastî Em dê tole li wan veken [42] Yanjî Em pêşanî te
biden ewa ku Me belêniya wê dabû wan, birastî Me desthilat li ser ewan da
heye. [43] Li ber hindê, xwe qahîm bi eva ku Me sirûş daye bigre, birastî tu li ser
rêya rastî, [44] birastî eve jibo te û netewa te bîranîneke û dê lêpirsîn li te bête
kirin.
[45] Li ewan bipirse ku Me pêş te da jibo wan peyamber şandibûn, ´Kanê Me
ewên dîke çêkirbûn ku li kêleka Xwedanê Rehmê da bêne perestîn?´
[46] Bêguman Me, pê nîşaneyên Xwe Mûsa şande bal Fireûn û serokên wî û wî
got, ´Birastî ez peyamberê Xwedanê hemû dinyaya me´ [47] Lê dema ku wî
nîşaneyên Me bo wan birin ew demûdest pê kenîn, [48] Me çi nîşane pêşanî
ewan nedan, xêncî ewa ku li xweşka wê mezintir nebû û Me pê eşkenceyê ew
girtin, belke li ber hindê ew bizvirin. [49] Ewan got, ´Cadûger bo me liber
Xwedanê xwe bipariyê, pê eva ku Vî belênî daye te û birastî em dê bêne
rênivînî kirin´ [50] Lê dem ku Me eşkence li ser wan rakir, ewan demûdest
şikand[b].



a: Ewên ku hişyarê hebûna Xwe dê, ne! b: peymana xwe şikand.

51 Fireûn li naw netewa xwe da gazî kir, wî got, ´Netewa min, Meger
padişahiya Misrê ya min nîne û ew çemên ku li bin min da diherikin yê min
nînin, meger hûn nabînin? 52 Yanjî ez li ew baştirim, ewê qed çineyî ku gelek
bi dijwarî dikarît xwe zelal biket? 53 Çima çi bazinên zêr bi wî nehatine
wekirin, yanjî çi firişte nehatine ku hevrêtiya wî biken?´ 54 Bi wî awayî, ew
henekê xwe bi netewa xwe kirin û ewan peyrevî li wî kirin, birastî ew
neteweyek bûn ku bi pêdagirî serkêş bûn. 55 Lewma dema ku ewan kerbê Me
vekir, Me tole li wan vekir û hemû xendiqandin, 56 Me ew bo mirovên paşê
kirine wane û mînakek. 57 Dema ku kurê Miryemê weke mînak tête anîn,
netewa te demûdest bilind pê dikenin 58 û ewan got, ´Meger xwedêyên me
başin yanjî ew?´ Ew tenê ew mînakê tînin ku gengeşê digel te biken, belê ew
neteweyekê gengeşe kerin,59 lê ew tenê koleyeke ku Me erêniya Xwe pê kir û
Me ew kire mînak bo zarûkên Israîl, 60 Eger Me xwastiba, Me dikarî li we
firişta çêken ku li ser erdê cêgriyê biken. 61 Birastî ev zanista Demjimêrê ye,
lewma gumanê lê neke û peyrevî li Min biken, eve rêya raste, 62 nehêle ku
Şeytan pêşya te bigrît, birastî ew bi zelalî dujminê te ye. 63 Dema ku Îsa bi
nîşaneyên zelal hat, ew got, ´Bêguman Min jibo we dadwerî înaye û jibo we
hindek li ewa ku we nakokî têda heye zelal bikem, lewma Hişyarê Xwe dê bin
û peyrevî li min biken,64 Birastî Xwe dê, Xwedanê min û Xwedanê we ye jî,
lewma Vî biperestin, eve rêyeke raste.´ 65 Lê aliyên cuda, li nawbera wan da,
nakok bûn, heware li ewên nerastkar li eşkenceya Roja bijan!
66 Meger ew çavnihêrin xêncî Demjimêrê ku dê nişkida bête ser ewan dema
ku ew tênagehin? 67 Di wê Roj ê da, hindek hevalên nêzîk, dê bibine dujminê
ewên dîke, xêncî ewên hişyar 68 ´Koleyên Min, ew Rojê da bo we çi tirs
çinîne, nejî hûn dê xemgîn bin´ 69 Ewên ku bawerî bi nîşaneyên Me kiribûn û
xwe radest kiribûn[a]. 70 ´Werine naw baxçe da, hûn û hevjînên xwe bi şadî.´
71 Dê aman û tasên zêr jibo wan bêne gêran û têda ewa ku rih dixwazît û çavê
we pê şad dibît. ´Hûn dê bêpayan wêderê bimînin, 72 ew baxçeye ku mîrat bi
te hatiye dan, li ber xatira ewa ku te dikir 73 û jibo te têda gelek meyve hene ku
tu bixwey.´ 74 Birastî ewên tawankar ta bêdawiyê dê eşkenceya cehnemê da
bimînin 75 û jibo wan kêm nabît û ew têda bêhêvî ne, 76 Me nerastî li wan
nekir, lê ew bixwe nerastkar bûn. 77 Ew dê gazî biken, ´Malîk[b], bila Xwedanê
te dawî bi me bînît,´ Ew dê bêjît ´Birastî hûn dê bimînin.´ 78 Bêguman Me
jibo we rastî îna, lê kerbê piraniya we li rastiyê diwebû.
79 Yanjî ewan bo mijarê bernamerêjî kirîne? Birastî Em bernamerêjiyê diken!
80 Yanjî ew hizir diken ku Em nikarin sirê[c] wan û ravêjên wan yên weşartî
bibhên? Belê, peyamberên Me li bal tomar diken.



a: Mosliman
b: Malik navê firişteyeke parêzerê cehnemê ye!
c: Gotina weşartî, gotina nihênî, gotina nepenî.

[81] Bêje, ´Eger Evê Xwedanê rehmê kurek heba, ez dê yêkem kes bam ku
biperestim, [82] Paye Bilinde Xwedanê asimana û erdê, Xwedanê Textê, serwey
ewa ku şirove diken.´ [83] Bihêle bila bixwe pûç bipeyvin û bileyzin, taku ew
Roja xwe dibînin ku belênî bi wan hatibû dan. [84] Ev e Xwe dê, di asiman da û
Xwe dê ser erdê, Ev Dadwerê Zana ye, [85] Pîroze, Ev ê ku padişahiya asimana
û erdê û ewa li nawberê da ya Vî ye û zanista Demjimêrê li bal Vî ye û hûn dê
bêne zivrandin bo bal Vî. [86] Ewên ku ew li kêleka Vî da liber dipariyên, ewan
desthilata nawbêjvaniyê nînin, xêncî ewên ku gewahiya rastiyê dane û ew
dizanin. [87] Eger tu li wan bipirsî kê ew afirnadine, bêguman ew dê bêjin
´Xwe dê´ Liber hindê ew çawa xapandîne? [88] Û gotinên wî, ´ Xwedanê min,
birastî ewane neteweyekin ku bawer naken,´ [89] Liber hindê pişta xwe bide wan
û bêje, ´Aştî´, Ew dê bizanin!

**44. Para Dûkelê**

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1]Ha Mîm [2] Bi nivîsîna pîroza zelal, [3] birastî Me ev di şeveke pîroz da şande
xarê, birastî Me dê agahdarî daba, [4] têda pê dadweriyê hemû mijar hatine
cuda kirin [5] fermanek li bal Me we, birastî Me dê şandiba, [6] weke rehm li bal
Xwedanê we ra, birastî Ev Bihîstine, Zanîne [7] Xwedanê asimana, erdê û
hemû ewa di nawbera wan da, eger tu arxayîn bî, [8] çi xwedêyên dîke çinînin,
bes Ev nebît, Ev jiyanê didet û dibîte hokarê mirinê, Xwedanê te û Xwedanê
berebabê te yê destpêkê jî, [9] belê ew di gumanê da ne û bixwe dileyizin.
[10] Hişyarê ew Rojê be ku asiman dê bi zelalî dûkelê bînît. [11] Ew dê mirova di
xwe da bipêçin. ´Ewe eşkenceyeke bijane! [12] Xwedanê Me, eşkencê li ser me
rake, birastî em bawer diken!´ [13] Ew dê çawan jibo wan bîranînek bît? Dema
ku bi zelalî peyamberek bo wan hatibû, [14] paşê ewan pişta xwe dane wî gotin,
´Hatiye fêr kirin, cingirtiye!´ [15] Birastî bo kêmekê, Em dê eşkenceyê raken,
birastî hûn dê bizvrin [16] û di Roja ku Em dê bigrin pê girtina mezin, birastî
Em dê tolê veken.
[17] Birastî Me pêş ewan da netewa Fireûn taqî kir û peyamberek giranbuha bo
wan hatibû, [18] ´Koleyên Xwe dê radestê min bike! Birastî ez jibo we
peyambereke bawer pê kirî me. [19] Xwe li serwey Xwe dê negirin! Birastî ez bi
desthilatek zelal hatime bal we. [20] Birastî min penaha xwe bo Xwedanê xwe û
Xwedanê we înaye, bila hûn min kevir baran neken! [21] Eger hûn baweriyê bi
min naken, bes waz li min bînin.´ [22] lewma ew liber Xwedanê xwe pariya,
´Ewane neteweyeke tawankarin!´ [23] ´Bes digel koleyên Min di şevê da
derkewe, birastî dê te bişopînin. [24] Deryayê rawestayî bihêle, birastî leşkerê
wan xendiqiye.´ [25] Çenda baxçe û kanîav li paş we hêlan [26] û zewyên dexil û
dahna û cihên giran buha [27] û erêniyên ku pê keyfxweş dibûn, [28] Aha wisa Em
bûne hokar ku neteweyek dîke bi mîrat bibet. [29] Ne asiman nejî erd bo wan
negiryan, nejî çi derfet bi wan hatibû dan. [30] Bêguman Me zarûkên Israîl li
eşkenceya serşorker rizgar kirin [31] li Fireûn, birastî ew zordestek bû li naw
ewên ku sînor dibezandin. [32] Bêguman Me bi zanist ew li serwey hemû
dinyaya hilbijartin [33] û Me nîşane dane wan ku di ewê da taqî kirinek zelal
hebû. [34] Birastî ewane dibêjin, [35] ´Hîç tiştek li pişt yêkem mirina me nîne û em
nayêne vejandin. [36] Bes berebabên me bîne, eger tu rast dibêjî.´ [37] Meger ew li
netewa Tuba yê û ewên li pêş wan da bêhtirin? Me ew li nav birin, birastî ew
tawankar bûn. [38] Me hemû asiman, erd û ewa li nawbera wan da di leyîzê da
ne- afirandin [39] Me, ew ne- afirandin xêncî di rastiyê da, lê piraniya wan
nizanin. [40] Birastî Roja dadweriyê, demeke ku bo hemûya hatiye dîhar kirin,
[41] Rojekê ku çi piştîvan nikarin çi qazancekê bigehînine piştîvanek dîke, nejî
dê yarmetiya wan bête kirin,

[42] xêncî ewên ku Xwe dê rehmê bi wan diket, birastî Ev Bihêze, Rehmê didet.
[43] Birastî dara Ziqumê [44] xwarina gunehkaraye [45] weke asinê heliyayî, ew dê
zikê wan da bikelît, [46] weka kelîna ava kel. [47] ´Ew bigrin û rakêşine naw nîveka
agirê cehnemê da! [48] Paşê ser serê wî da birêjin li eşkenceya ava kelandî!´
[49] ´Tam bike, birastî tu bihêz û giran bûhayî! [50] Birastî eve ye ku te guman lê
dikir.´ [51] Birastî ewên hişyar li ciheke tenah da ne, [52] naw baxçe û kaniya da,
[53] armûşê baş û armûşê gul wehînayî[a] li ber kirîne, rû li hevdu kirîne, [54] ew dê
wisa bît. Em dê wan digel hevjînên çav ciwan bidene zewcandin. [55] Di wêderê
da bi tenahî ew dê bo hemû meyveyekê gazî biken.
[56] Ew di wêderê da mirinê tam naken, xêncî mirina ewlî. Ev dê wan li
eşkenceya agirê cehnemê biparêzît, [57] qenciyek li bal Xwedanê te we. Ewe
destkevta herî mezine.
[58] Birastî Me ev pê zimanê te hêsan kiriye belke li ber hindê bête bîra te.
[59] Li ber hindê lê hişyar[b] be birastî ew jî lê hişyar bin.



a: Armûşê ku pê dest li ser da gul û wêneyên ciwan didrûn. (Armûş =Ebrîşem, silk)
a: Jibo peyva Moraqib, min peyva hişyarî bikar înaye, anku pê zêndanê lê hişyar bî!

## 45. Para Çok dananê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Ha Mîm [2] Nivîsîna pîroze li bal Xwe dê we hatiye şandin xarê ku Bihêz
û Biryardere. [3] Birastî di asimana û erdê da nîşane hene jibo ewên ku
bawer diken [4] di afirandina we da û rihtiberên ku Vî belav kirine nîşane
hene, jibo netewa ku arxayîne, [5] di guhertina şev û rojê da, di ew debara
ku Xwe dê li asiman ra dişînîte xarê û erdê mirî pê vejîn diket û di araste
kirina ba ya da jî nîşane hene, jibo neteweyekê ku hizir lê diket.
[6] Ewane eşkereyên Xwe dê ne ku Em bi rastî bo te dibêjin. Bes piştî
Xwe dê û eşkereyên Vî ew dê bawerî bi çi serhatekê[a] biken? [7] Hewar li
hemû ewên direwîn û gunehkar [8] ewên ku dibhên, eşkereyên Xwe dê bo
wan têne xwandin, paşê li xwe mezin kirinê da pêdagîriyê diken wek tu
bêjî ewan nebihîstine, lewma mizgîniya eşkenceya bijan bide wan! [9] Û
dema, ewê ku tiştekê li eşkereyên Me dizanît, ew henekê xwe pê diket,
ewan dê eşkenceyeke serşorker hebît, [10] cehnem pêşya wane û destkevtên
wan çi qazancê nagehînîte wan, nejî ew piştîvanên ku wan li kêleka
Xwe dê da vergirtin, ewan dê eşkenceyeke gelek mezin hebît. [11] Eve
rênivîniye! Ewên ku bawerî bi eşkereyên Xwedanê xwe naken, ewan dê
eşkenceyeke gelek kirêt hebît. [12] Xwe dê ye ku bo we derya kêrhatî kiriye
ku bi destûra Vî, gemî li ser da diçin belke hûn li qenciyên Vî bigerên,
belke li ber hindê hûn sipasdar bin [13] Vî, hemû eva di asimana û erdê da,
bo we bikêr kiriye, hemû li bal Vî we, birastî lêreda nîşane hene, bo
neteweyekê ku hizra xwe bikar tînît. [14] Bêje ewên ku bawer diken, bila li
ewên ku çavnihêrê Rojên Xwe dê nînin bibhorin, belke liber hindê Ev
padaş bidete neteweyekê jibo ewa ku wan dest xwe existibû. [15] Her kesê ku
karek durust diket ew jibo riha wî ye û herkesê nebaşiyê diket, ew li dijî wê
ye, paşê tu dê bêye zivrandin bo bal Xwedanê xwe. [16] Bêguman Me
nivîsîna pîroz da zarûkên Israîl, dadwerî û Pêşbînî[b] jî û Me debarên baş
bo wan dabîn kirin û li serwey dinyaya hez li wan kir [17] Me li ser mijara,
belgeyên zelal dane wan, ewan nakokî çinebû, taku piştî ewa li zanistê jibo
wan hat, ber xatira çavnebrariya li nawbera ewan da, birastî Xwedanê we
dê li Roja Vejiyanê da li nawbera wan da dadweriyê biket sebaret bi
nakokiyên wan.
[18] Paşê li ser mijarê Me tu danaye ser rêbaza destûrê[c], lewama bişopîne û
hestê ewên ku nizanin neşopîne. [19] Birastî ew çi cara nikarin li dijî
Xwe dê çi qazancekê li te biden, birastî hindek li ewên neraskar piştîvanê
ewê dîke ne û Xwe dê piştîvanê ewên hişyare.

a: Jibo peyva Hedîs min serhat bikar înaye.



a: Jibo peyva Nebovet, min peyva Pêşbînî bikar înaye, anku dê Nebî (Pêşbîn) li naw ewan da rabin

a: Jibo peyva Şerîet ê min peyva destûr bikar înaye.

[20] Eve bo mirova ronahiye û rênivînî û rehme bo neteweyekê ku
arxayînin[a]. [21] Yanjî ewên ku karên nebaş diken, hizir diken ku Em dê
ewan digel ewên ku bawer diken û karên durust diken li jiyan û mirina
wan da bikene wekhev? Ew dadweriya wan nebaşe! [22] Xwe dê afrînerê
asimana û erd li rastiyê daye û belke her rihek pêka destkevtên xwe padaşê
wergrît û nerastî li wan nayête kirin!
[23] Te ew dîtiye, ewê ku hestê xwe weke xwedê wergirtine û Xwe dê bi
zanist dihêlît ew li rê derkevît, guh û dilê wî dipêçît û xêliyekê ser çavê wî
dadidet, bes kê dê piştî Xwe dê ew rênivînî biket? Bes hûn nayînine bîra
xwe? [24] Ew dibêjin, ´Tenê jiyana me di ev dinyayê da heye, em dimrin û
em dijîn, tenê dem nebît hîç tiştek dîke me li nav nabet.´ Ewan çi zanista li
ser ewê nînin, ew tenê texmîna diken [25] û dema ku eşkereyên Me weke
belgeyên zelal bo wan têne xwandin, tenê gengeşeya wan ewe ku dibêjin,
´Berebabê me bîne, eger tu rast dibêjî.´ [26] Bêje, ´Xwe dê jiyanê didete te,
paşê dibîte hokar ku tu bimrî, paşê Ev dê we kom bikete Roja Vejiyanê,
ku çi guman têda nîne, lê piraniya mirova nizanin.´ [27] Padişahiya asimana
û erdê da ya Xwe dê ye, roja ku Demjimêr tête cih, ewên direwîn dê
bidorînin. [28] Tû dê bibînî ku hemû neteweyekê çok dadane, dê gazî ewan
biken bo tomara wan ´Îro dê padaş bi we bête dan, jibo ewa ku we
kiribû.´ [29] Ewe tomara Me ye ku bi rastiyê sebaret bi te dipeyvît, birastî
Me dinwîsî ewa ku te dikir.´
[30] Lewma ewên ku bawer kirin û karên durust kirin, Xwedanê wan dê
ewan vergrîte naw rehma Xwe da, ew destkevta zelale! [31] Lê ewên ku
bawer nekirin, ´Meger eşkereyên Me bo we nehatine xwandin, lê we xwe
mezin kir û hûn bûne neteweyek tawankar.´ [32] Dema ku gotin ´Birastî
belêniya Xwe dê raste û Demjimêrê çi guman têda nîne, we got ´Em
nizanin Demjimêr çiye, em tenê pê texmîna, texmîn diken û em piştrast
nînin´ [33] Dê nebaşiya kiryarên wan, bo wan aşkira bît û ewa ku wan
henekê xwe pê dikirin dê wan dorpêç biket.
[34] Dê bête gotin, ´Îro Em dê te li bîr biken, herweka ku te hevdîtina xwe
ya ev rojê li bîr kir û dê agir bibîte penahgeha te û te çi yarmetîder
çinabin, [35] ewe liber hindê ye ku we tiranê xwe bi eşkereyên Xwe dê kirin
û jiyana ev dinyayê tu xapandî.´Lewma di wê Rojê da ew li naw da
nayêne derêxistin, nejî dê li wan bipirsin ku serast kariyê biken.
[36] Lewma pesn bo Xwe dê ye Xwedanê asimana û erdê, Xwedanê hemû
dinyaya. [37] Mezinahî jiboy Vî ye, di asimana û erdê da, Ev Bihêze
Biryardere.

a: Piştrastin, dizanin ku raste

## 46. Para Girên Lîm ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

[1]Ha Mîm [2] Nivîsîna pîroz li bal Xwe dê we hatiye şandin, Ev ê Bihêz û Biryarder.
[3] Em afrînerê asimana û erd û ewa di nawbera wan da ne, bes jibo rastiyê û
demeke destnîşan kirî, lê ewên ku bawer bi ew agahiya ku bi wan hatiye dan naken
pişta xwe didenê. [4] Bêje,´Tu dibînî ewên ku li kêlek Xwe dê, da tu li ber wan
dipariyê! Pêşanî min bide! Kanê ewan çi li erdê da afirandiye? Yanjî ewan pişkek li
asimana da heye? Kanê bo min nivîsîneke pîroze ya pêş evê da bîne yanjî bermayê
zanistê, eger tu rast dibêjî.´ [5] Kê dikarît li ew zêdetir li rê derketibît, ewê ku li kêlek
Xwe dê da li ber ewên dîke dipariyêt, ewên ku ta Roja Vejiyanê, bersiva wî naden
û ew agahdarê pariyanê wan nînin [6] û dema ku mirov têne kom kirin, ew dê bibine
dijminê wan û ew dê nikoliyê li perestîna wan biken? [7] Dema ku weke belgeyên
zelal eşkereyên Me bo wan têne xwandin, ewên ku bawer naken dibêjine rastiyê,
dema ku jibo wan têt, ´Ewe bi zelalî cadûye,´ [8] Yanjî ew dibêjin, ´Ew her bixwe
berhem înaye.´ Bêje, ´Eger min berhem înaye te jibo min desthilata hîç tiştekê
çinîne li dijî Xwe dê. Ev bêhtir dizanît ku tu sebaret bi vê çi dibêjî, bo li nawbera
min û we da Ev, weke gewah têrê heye, Ev Lêbihore û Rehmê didet.´
[9] Bêje, ´Ez li naw peyambera da yêke taze nînim. Ez nizanim ku dê çi li min bête
kirin û nejî digel we, ez tenê peyreviyê li ev sirûşa ku bi min tête kirin dikem, ez
tenê bi zelalî agahiyê didem.´[10] Bêje, ´Meger te li berçav girtiye ku eger eve li aliyê
Xwe dê we bît û tu bawerî pê nekey? Be eger yêk li zarûkên Israîl, sebaret bi
wekhev bûna evê gewahiyê bidet û paşê bawerî pê biket, dema ku tu xwe mezin
dikey? Birastî Xwe dê rênivîniya neteweya nerastkar naket.´
[11] Ewên ku bawer naken dibêjine ewên ku bawer diken, ´Eger ev[a] baş ba, ew jibo
evê pêş me nedketin,´ Û dema ku ew pê evê nehatine rênivînî kirin, ew dibêjin,
´Eve direweke kevnare.´ [12] Pêş evê da nivîsîna pîroza Mûsa weke rênivînî û rehm
hebû û ev nîvîsîna pîroz pê zimanê Erebî piştrast diket ku agahdariyê bidete ewên
ku nerastiyê diken û mizgîniyê didete ewên ku karên baş diken. [13] Birastî ewên ku
dibêjin, ´Xwedanê me Xwe dê ye´ Û paşê pêdagir dimînin, bes jibo wan çi tirs
çinîne û ew xemgîn jî nabin, [14] Ew hevrêyên baxçene, weke padaş bo ewa ku wan
kiriye, ta bêdawiyê ew dê li wêderê da bimînin. [15] Me fermana dayk û baba li
mirov kiriye ku digel dayk û babên xwe baş bît, dayaka wî di pêgiraniya wî da
dijwarî keşa û di zana wan da jî dijwarî kêşa, pêgiranî û li şîr vekirin sih manga
dikêşît û dema ku ew pê digehît û digehîte temenê çil saliyê ew dibêjît, ´Xwedanê
min, desthilatê bide min ku bo ew erêniyên[b] Te bi min û dayk û babê min kirîne ez
sipasdarê Te bim û ez karên baş bikem ku Te keyfxweş diken, jibo min li naw
paşketiyên min da bike durustkar. Birastî ez dizivirime aliyê Te, birastî ez li wanim
ku xwe radest diken[c].´



Girê Lîm yanjî tepikê qûm ê. Bilindahiya ku li xizê hûr weke tozê çêbûye.
a: Xwandin (Quran)
b: Jibo peyva Nemet min erênî bikar înaye
c: Moslimîn

[16] Ewane li wanin ku Em dê baştrîn kiryarên wan li wan bipejirînin û
çavpoşiyê li kiryarên wan yê nebaş biken li naw hevrêyên naw baxçe da,
belêniya rastî ku belênî bi wan hatibû dan. [17] Lê ewên ku dibêjine dayk û
babên xwe, ´Of li destê we, hûn belêniyê didene min ku ez dê bême
derêxistin, dema ku nifşên pêşta mirine û pêş min da çone?´ Dayk û babên wî,
bo yarmetiyê, li ber Xwe dê dipariyên, ´Hewar li te! Bawer bike! Birastî
belêniya Xwe dê raste´ Lê ew dibêjît, ´Eve xêncî efsaneyên ewên ewlî tiştek
dîke nîne.´ [18] Ewane li wanin ku peyv li ser wan rast bûye, li naw ew netewên
cin û mirova da ku li pêş ewan da mirine, birastî ewan dorandibû.
[19] Jibo hemûya pile hene, jibo ewa ku wan kiribû û belke Ev bi tewawî bidete
wan, li ber xatira kiryarê wan û nerastî li wan nayête kirin.
[20] Di Roja, ewê ku bawer nekiribû tînine ber agir, ´Te li jiyana xwe ya dinyayê
da, tiştên xwe yê baş bi heder dan û te xweşiyên xwe li wêderê birin, li ber
hindê, Îro da, eşkenceyeke serşorker dê padaş bi te bête dan, çimkî tu li ser
erdê qude bûy, bêy ku te maf hebît, çimkî tu bi pêdagirî serkêş bûy.´ [21] Amaje
bi birayê Ad bike, dema ku wî agahdarî daye netewa xwe li naw girên lîm da.
Agahîderên dîke jî miri bûn li pêş wî û li paş wî ´Neperestin xêncî Xwe dê,
birastî ez bo we ditirsiyêm li eşkenceya Roja gelek mezin´ [22] Ewan got, ´Meger
tu hatî me li xwedêyên me bizvrînî? Eva ku tu pê hereşa vê li me dikey bîne
serê me!´ Eger tu li rastbêjayî, [23] Wî got, ´Zanist tenê li bal Xwe dê ye ez bi
we radigehînim eva ku ez pê hatime şandin, lê ez dibînim ku hûn neteweyeke
nezanin.´ [24] Dema ku wan dît ewrek nêzîkê geliyê wan dibît ewan got, ´Ew
ewre dê bo me baranê bînît!´ Belê eve, ewa ku we dipirsî bilezînin! Bayeke ku
eşkenceyeke bijan têdaye, [25] pê destûra Xwedanê xwe, dê hemû tişta li nav
bibet.´ Di sibê zû da nehate dîtin, xêncî avahiyên wan, aha wisa Em padaş
didene neteweya tawankar.
[26] Bêguman Me ew damezirandibûn, di ewa ku Me hûn têda
nedamezirandine û Me bihîstin, dîtin û dil bo wan çêkirbûn, lê ne bihîstinê,
ne dîtinê û nejî dilê wan çi qazanc jibo wan çinebû, dema ku ewan nikolî li
nîşaneyên Xwe dê dikirin û eva ku wan henekê xwe pê kiribûn, ew dorpêç
kirin. [27] Bêguman Me li nav birin ewa ku li derdorên gunda ye û Me nîşane
ciyawaz kirîne, belke liber hindê ew bizivrin, [28] bes çima ewên ku wan li
kêleka Xwe dê, da weke xwedê wergirtibûn, weke rêbaza nêzîk bûnê,
yarmetiya wan nekirin? Belê ew li wan bezir bibûn, ewe direwa wan bû û ewa
ku wan berhem înabû.
[29] Dema ku Me komeke cina rêkirne bal te ku guhê xwe bidene Xwandinê
(Quranê), dema ku ew amadeyê vê bûn, ewan got ´Bê deng guhdarî biken!´
Dema ku ev tewaw bû, ew zivirîne bal netewa xwe weke agahîder.

[30] Ewan got, ´Netewa me, birastî me guhê xwe daye nivîsîneke pîroz ku li paş
Mûsa da hatiye şandin xarê, eva li pêş xwe da piştrast diket û rênivîniya
rastiyê diket û jibo rêbazek serast. [31] Netewa me, bersiva gazîkerê Xwe dê
biden û bawerî bi wî biken, Ev dê li gunehên we bibhorît û we li eşkenceya
bijan biparêzît.´ [32] Her kesê ku bersiva gazîkerê Xwe dê nedet ew nikarît li ser
erdê birewît, nejî ew dê li kêlek Vî da çi piştîvan hebin, ew bi zelalî di şaşiyê da
ne.
[33] Meger, ew nabînin ku Xwe dê ye Ev ê afrînerê asimana û erd û li afirandina
wan newestiya û dişêt ku jiyanê bidete miriya? Belê birastî! Vî desthilat li ser
hemû tişta da heye. [34] Di Roja ewê ku bawer nekiribû tînine ber agir, ´Eve
rastî nîne?´ Ew dê bêjît ´Belê bi Xwedanê me,´ Û Ev dê bêjît, ´Bes eşkenceyê
tam bike, çimkî te bawer nedikir.´
[35] Lewma bêhin fereh be, herwek ku ew peyamberên xweragir bêhin fereh
bûn, lê negerê ku jibo wan bilezînî, di Rojê da, ew dê bibînin ewa ku belênî bi
wan hatiye dan, ew li demjimêrekê zêdetir ya rojekê da, gîro nebûne.
Agahdariyeke û xêncî neteweya ku bi pêdagirî serkêşin dê bêne li nav birin?

## 47. Para Mihemed

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Ewên ku bawer naken û rêgiriya rêya Xwe dê diken, Ev dê kiryarê wan pûç
biket, 2 Ewên ku bawer diken û karên durust diken û bawerî bi eva ku bo
Mihemed hatiye şandine xarê diken û ev rastiya li bal Xwedanê wan we û Ev
dê kiryarên wan yê nebaş li wan bimalît û rewşa wan serast biket.
3 Ewe li ber xatira wê hindê ye ku ewên nebawer peyrevî li direwê diken û
ewên ku bawer diken peyrevî li rastiya li bal Xwedanê xwe we diken. Bi wî
awayî Xwe dê mînaka mirova nîşanî wan didet. 4 Li ber xatira hindê, dema ku
tu nebawera dibînî li ûstiyê wan bide û ta dema ku te ew têkşikandine, paşê
girtiya qahîm girêde, paşê yan weke qencî yanjî bo qerebû[a], ta ku dawî bi
dijwariya şer têt. Eveye! Eger Xwe dê xwastiba Vî dikarî tole li wan weket, lê
hindek li we pê ewên dîke taqî biket, ew kesên ku li rêya Xwe dê da hatine
kuştin Ev çi cara kiryarên wan pûç naket 5 Ev dê wan rênivînî biket û rewşa
wan baştir biket, 6 dê wan vergrîte naw baxçe da ku Vî pêşta bi wan dayne
nasandin. 7 Hûn ku bawer diken! Eger hûn yarmetiya Xwe dê biden, Ev dê
yarmetiya we bidet û dê we pêdagir biket.
8 Ewên ku bawer naken, ewan dê li nav çon hebît û Ev dê kiryarên wan pûç
biket. 9 Çimkî kerbê wan li eva ku Xwe dê şandiye xarê divebû û lewma Ev
wel kiryarên wan kirîye ku bi xorayî biçin. 10 Meger ew li ser erdê negeriyane
ku bibînin dawiya ewên berî wan da çawa bû? Xwe dê ew li nav birin,
mînaka nebawera jî dê ew bît. 11 Ewe li ber xatira hindê ye ku Xwe dê
piştîvanê ewane ku bawer diken, lê ewên nebawer çi piştîvan çinînin,
12 Birastî Xwe dê, dê ewên ku bawer kirîne û karên durust kirîne dê vergrîte
naw baxçeyên ku çem li bin da diherikin, lê ewên nebawer xweş diqetînin û
dixwen weka ku ajelên kevî dixwen û agir dê bibîte mangeha wan.
13 Çend gundên ku li ew gundê tu kiriye derê bihêztir bûn Me wêran kirin û
ewan çi yarmetîder çinebûn?! 14 Meger ewê ku li bal Xwedanê xwe we li ser
belgeyên zelal e, wekheve digel ewê ku kiryarên wî yên nebaş li pêş çavên wî
hatine xemilandin û ew peyrevî li hestên xwe diket? 15 Ewe wêneyeke li baxçe
ku belêniya wê bi ewên hişyar hatiye dan, têdane çemên avê ku pîs nebûne û
çemên şîr ku tama wan naguherît û çemên meya tam xweş jibo ewên ku
divexwen û çemên hingivîna pak kirî, wêderê da dê jibo wan hemû berhem û
lêbihorîn li bal Xwedanê wan we hebît, meger weka ewane ku dê ta bêdawiyê
li naw agir da bimînin û dê ava kelandî bidenê vexwen ku roviyê wan pirt pirt
biket?



a: Bedel, li şûn da, li cihê wê da.

[16] Li naw ewan da, ewin ku guhê xwe didene te, lê dema ku ew li bal te diçin,
ew dibêjine ewên ku zanist bi wan hatiye dan, ´Ew çibû ku wî niha got?´
Ewane li wanin ku Xwe dê dilê wan pêçaye û ew peyrevî li hestên xwe diken.
[17] Ewên ku rênivîniyê dipejirînin, Ev wan li rênivîniyê da zêde diket û
hişyariya wan didete wan. [18] Meger ew çavnihêrin xêncî Demjimêrê ku dê
nişkida bête ser wan? Lê birastî nîşaneyên wê hatine, bes jibo wan çawane,
dema ku bîreweriya wan jibo wan hatiye? [19] Li ber hindê, bizane xêncî
Xwe dê çi xwedê nînin û jibo gunehên xwe daxwaza lêbihorîne bike û jibo
mêrên bawermend û jinên bawermend. Xwe dê bizvîna we û cihê mangeha
we jî dizanît. [20] Ewên ku bawer diken dibêjin ´Çima çi par[a] nehatine şandine
xarê, lê dema ku pareke biryarder ku têda amaje bi şer diket tête şandine xarê,
tu dibînî ewên ku di dilê ewan da nexweşiyek heye bi çavê ewên ku li ber
hegera mirinê ji xwe we diçin li te dinhêrin, lê bo wan bêhtire [21] peyrevî û
peyvên baş! Dema ku biryar li ser mijarê hate dan, eger ew digel Xwe dê rast
bana, bêguman ew dê jibo wan bêhtir ba. [22] ´Liber xatira hindê belke eger
desthilat dabana te, dibît ku tu gendeliyê li ser erdê belav bikey û tayên
xizmatiya xwe bibrî?´ [23] Ewe li ewanin ku Xwe dê nerênî[b] kirîne, lewma Ev
ew ker kirîne û dîtina wan kore kiriye. [24] Meger ew têramanê li Xwandinê
(Quranê) naken? Yanjî qifil li ser dila hene? [25] Birastî ewên ku li ser paniyên
xwe we dizvirin, piştî ku eva li rênivîniyê jibo wan zelal bûye, Şeytan ewan
han didet û hêviyê jibo wan dirêjtir diket, [26] ewe li ber hindê ye ku ewan
gotibûne ewên ku kerbê wan li eva Xwe dê şandiye xarê divebît, ´Li ser parek
li mijarê, em dê peyreviyê li we biken´ Lê Xwe dê nihêniyên[c] wan dizanît.
[27] Ew çawane, dema ku firişte di mirinê da ewan diben, rûmet û piştên wan
diqutin, [28] ewe li ber hindê ye ku ewan peyrevî li ewê kir ku kerbê Xwe dê
vekir û keyfa wan bi xweşiyên Vî nehat. Li ber hindê Vî kiryarên wan bê
qîmet kirin. [29] Yanjî ewên ku li dilê xwe da nexweşî hene hizir diken ku
Xwe dê çi cara kîna [d] wan nayînîte derê? [30] Û eger Me xwastiba Me dikarî
ewan pêşanî te biden, te jî dê ew nas kiriban, pê dirûşmê [e] wan, lê bêguman tu
dê ewan nas bikey pê şêwaza gotina wan, Xwe dê kiryarên te dizanît.
[31] Bêguman Em dê we taqî biken, taku Em dizanin kê li naw we da têkoşînê
diket û ewên bêhin fereh, Em dê deng û basê we jî taqî biken. [32] Birastî ewên
ku bawer naken û rêgiriyê li rêya Xwe dê diken û dijayetiya peyamber diken
piştî ku eva li rênivîniyê jibo wan hatiye zelal kirin, bi hîç tiştekê zirarê li
Xwe dê naden û Ev dê kiryarên wan bêqîmet biket, [33] hûn ku bawer diken
peyrevî li Xwe dê biken û peyrevî li peyamber biken û kiryarên xwe pûç
neken.



a: Sûrê Quranê
b: Lenet
c: Sir, tiştê weşartî d: kerbê mezin û kûr e: Nîşane ku pê kesekê nas bikey

34 Birastî ewên ku bawer naken û rêgiriyê li rêya Xwe dê diken û bi nebawerî
dimrin, Xwe dê çi cara li wan nabihorît. 35 Liber wê hindê bêhêz nebe û jibo
aştiyê gazî bike, dema ku tu serdestî û Xwe dê digel te ye û te li kiryarên te
bêpar naket,36 jiyana ev dinyayê tenê leyizeke, dem derbaz kirine, eger tu
bawer bikey û hişyar bî, Ev dê padaşê te bidete te, Ev jibo malê te li te napirsît
37 eger Ev jibo wan li te bipirsît û zextê li te biket û tu nedey, Ev dê kîna te
derêxît 38 hûn lêrene, ewên ku gazî we diken ku li rêya Xwe dê da, biden lê li
naw we da naden û her kesê ku nedet, ew tenê nadene riha xwe, Xwe dê çi
pêvîstî çinînin, lê hûn xwedan pêvîstî ne. Eger hûn pişta xwe bidenê, Ev dê we
digel neteweyeke xêncî we weguherît û paşê ewên weka we çinabin.

## 48. Para Serkevtinê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Birastî Me serkevtin daye te, serkevtinek zelal, 2 belke Xwe dê li ew gunehên
te yên berê û ewa paşê bibhorît û erêniya Xwe li ser te tewaw biket û te
rênivîniyê rêyeke rast biket 3 û belke Xwe dê yarmetiya te bidet, bi yarmetiyek
gelek bihêz. 4 Ev e ku tenahî şande naw dilê bawermenda da ku belke
baweriyê li baweriya wan zêde biket û şervanên[a] asimana û erdê yê
Xwe dê ne û Xwe dê Zanîne Biryardere 5 û mêrên bawermend û jinên
bawermend vergirîte naw baxçeyên ku li bin wan da çem diherikin û ta
bêdawiyê li wêderê da bimînin û kiryarên wan yê nebaş li wan bimalît û ewe li
bal Xwe dê destkevteke gelek mezine 6 û eşkence bidet, mêrên durû û jinên
durû û mêrên ku ´hevala´ bo Vî peyda diken û jinên ku ´hevala´ bo Vî peyda
diken û ewên ku texmînên nebaş sebaret bi Xwe dê texmîn diken, ewin ku dê
bi nebaşiyê bêne dorpêç kirin û kîna[b] Xwe dê, dê li ser wan bît û Vî ew nerênî
kirîne û jiboy wan cehnem amade kiriye, armanceke nebaş! 7 Şerwanên
asimana û erdê yê Xwe dê ne û Xwe dê Bihêze Biryardere. 8 Birastî Me tu
gewah şandî û mizgînîder û agahîder, 9 belke tu bawerî bi Xwe dê û
peyamberê Vî bikey û wî birûmet bikey û rêz lê bigrî. Ev paye bilind bike
sibêde û êvara.
10 Birastî ewên ku digel te peymanê girê diden, tenê peymanê digel Xwe dê
girê diden, destê Xwe dê li ser destê wan, bes her kesek bişkînît, ew tenê li dijî
xwe dişkînît, herkesê ku bicih bînît ewa ku belênî daye Xwe dê bi zûyî Ev dê
padaşek gelek mezin bidetê da. 11 Dê bêjine te, ewên ku li paşve man li ereba
´Malê me û binemala me, em mijûl kirin lewma jibo me daxwaza lêbihorînê
bixwaze.´ Ew dibêjin bi zimanê xwe, ewa ku di dilê wan da nîne! Bêje, ´Kê
jibo we, çi desthilatek li dijî Xwe dê heye, eger Ev zirarê jibo we bixwazît,
yanjî Ev qazancekê jibo we bixwazît´ Belê Xwe dê deng û basê ewa hûn diken
dizanît. 12 Belê we texmîn kir ku peyamber û bawermend çi cara nazivirine bal
binemalên xwe û ewe li dilê we da hatibû xemilandin û we texmînên nebaş
texmîn kirbûn û hûn bûne neteweyeke wêran 13 û her kesê ku bawerî bi
Xwe dê û peyamberê Vî nekirye, bes birastî Me jibo nebawera agirê geş
amade kiriye. 14 Padişahiya asimana û erdê ya Xwe dê ye û Ev li her kesê ku
Ev dixwazît dibihorît û her kesê ku Ev dixwazît siza didet, Xwe dê Lêbihore û
Rehmê didet. 15 Ewên ku li paşve man dê bêjin, ´Dema ku hûn rê dikevine
aliyê deskevtên şer ku bistînin, bihêlin ku em we bişopînin.´ Ew dixwazin ku
peyvên Xwe dê biguherin, bêje, ´Hûn çi cara me naşopînin, Xwe dê pêşta eve
gotiye.´ Paşê ew dê bêjin, ´Belê çavê we li me bar nagirît[c]´ Belê ew li kêmekê
zêdetir tênagehin!



a: Li şûna peyva cund min şervan bikar înaye. b: kerbê mezin
c: Jibo peyva Hesûd, min çav bar negirtin bikar înaye!

[16] Bêje ewên ku li paşve man li ereba, ´Dê gazî we bête kirin, bo neteweyekê
xwedan şêyana gelek mezine leşkerî ku hûn şerê wan biken yanjî ew dê xwe
radest biken, bes eger hûn peyrevî biken Xwe dê, dê padaşeke baş bidete we,
lê eger hûn pişta xwe bidenê, weka ku we berê pişta xwe dabûyê, Ev dê bi
eşkenceyeke dijwar we siza bidet. [17] Çi guneh bo ewê kor nayên nejî çi guneh
dê bo ewê qop bên û nejî dê çi guneh bo ewê nexweş bên û her kesê ku
peyrevî li Xwe dê û peyamberê Vî biket, Ev dê wan vergirîte naw baxçeyên ku
li bin wan da çem diherikin, lê her kesê ku pişta xwe bidetê, Ev dê wan bi
eşkenceyeke dijwar siza bidet.[18] Bêguman Xwe dê digel bawermenda keyfxweş
bû, dema ku ewan li bin darê da peyman digel te girê dan û Vî dizanî ku di
dilê wan da çi heye, lewma Vî tenahî şande ser wan da û pê serkevtineke nêzîk
ew xelat kirin [19] û ew dê gelek destkevtên şer biben! Xwe dê Bihêze
Biryardere. [20] Xwe dê belênî daye te ku tu dê gelek destkevtên şer bistînî, Vî
jiboy te lez li evê kiriye û Vî destê mirova li te ragirtiye û belke ew bibîte
nîşaneyek jibo ewên bawermend û belke Ev te rênivîniyê rêya rast biket.
[21] Ewên dîke jî ku te çi desthilat li ser ewan da çinîne, bêguman Xwe dê ew
dorpêç kirîne û Xwe dê desthilat li ser hemû tişta da heye. [22] Eger ewên ku
bawer nekirîne şerê te kiriban, bêguman ewan dê pişta xwe dabayê û paşanê
ewan piştîvanek peyda nedkirin nejî yarmetîderek, [23] Rêbaza Xwe dê ye ku
pêşta derbaz bûye û tu çi cara çi guhertina li rêbaza Xwe dê, da nabînî.
[24] Ev e ku li naw Mekê da destên wan li te paşve girt û destên te li wan, piştî
wê Ev serdestî li ser ewan da, da te û Xwe dê ewa ku tu dikey dibînît. [25] Ew
bûn ewên ku bawer nekirin û pêşgîriya te bo mizgewta Heram kirin û nehêlan
ku tiştên pêşkêş kirî bigehine cihê xwe yê qurbaniyê. Eger li ber mêrên
bawermend û jinên bawermend neba ku te nas nedkirin, te dê ew li bin pêyê
xwe da pêpes kiriban û bê zanist liber wan dê şerm hatiba ser te, Xwe dê her
kesê ku dixwazît tînîte naw rehma Xwe, da. Eger ew li hev cuda ban Me dê pê
eşkenceyeke bijan li nebawerên li naw ewan da, daba.
[26] Dema ku ewên nebawer kelecan kirbûne dilê xwe da, kelecana nezaniyê,
paşê Xwe dê tenahiya Xwe şande ser peyamberê Xwe û li ser bawermenda û
wel wan kir ku xwe bi peyva hişyariya Vî we bigrin û ev zêdetir mafê ewan bû
û ew jêhatiyê wê bûn û Xwe dê zanista li ser hemû tişta heye. [27] Bêguman
Xwe dê pê rastiyê dîtina peyamberê Xwe bicih înaye ´Bêguman tu dê biçiye
naw mizgewta Heram da, eger Xwe dê hez biket di ewlehiyê da serê xwe
tiraşî û kurt kirî û bê tirs!´ Lê Ev dizanî ewa te nedizanî û Vî li kêleka ewê da
kiriye serkevtina nêzîk. [28] Ev e ku peyamberê Xwe bi rênivînî û dînê rast
şandiye ku li serwey hemû dîna bêxît û Xwe dê weke gewah têrê heye.

29 Mihemed peyamberê Xwe dê ye û ewên ku digel wî ne, bi pêdagirî li dijî nebawera ne û li nawbera xwe da jî bi rehmin. Tu dibînî ku ew çok diçevînin û serê xwe dinvînin, daxwaza qencî û dilxweşiya Xwe dê diken.
Nîşaniya ku ew serê xwe dinvînin li ser rûmetê wane. Ewe mînaka ewane di Rênivîniyê (Toratê) da û mînaka ewane di Mizgîniyê (Incîlê) da.
Weke tovekê ku çilû ya xwe dişînîte derê, paşê bihêz diket û paşê sitûr dibît û ser koka xwe radwestît û ewê diçînît keyfxweş diket û Ev pê vê gelek kerbê nebawera diveket, Xwe dê belêniya lêbihorîn û padaşek gelek mezin daye ewên ku li naw ewan da bawer diken û karên durust diken.

## 49. Para Odeyên Taybet

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Hûn ku bawer diken nehawêjine pêşiya Xwe dê û peyamberê Vî, hişyarê
Xwe dê bin, birastî Xwe dê Bihîstine û Zanîne 2 Hûn ku bawer diken dengê
xwe bilindî ser dengê Pêşbîn neken û bi dengek bilind digel wî nepeyvin, her
wek deng bilindiya hindek li we digel ewên dîke, bila kiryarên we pûç nebin,
dema ku hûn tênagehin. 3 Birastî ewên ku li pêşberî peyamberê Xwe dê, da
dengên xwe nizim diken, ewane li wanin ku Xwe dê dilê wan bo hişyariyê
taqî kiriye, ewan dê lêbihorîn û padaşek gelek mezin hebît 4 lê birastî ewên ku
li derwey odeyên taybetî da gazî te diken, piraniya wan hizra xwe bikar
naynin. 5 Eger ew bêhin fereh bana taku tu jibo wan hatibaya derê, ew dê
jibo wan baştir ba, Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. 6 Hûn ku bawer diken,
eger ajawegêrek[a] bi zaniyariya bête bal we, lê bikolin, bila hûn bi nezanî
zirarê li neteweyekê neden û liber xatira ewa we kirî, hûn peşîman nebin
7 û bizanin ku peyamberê Xwe dê li naw we da ye, eger wî li gelek mijara da
peyrevî li we kiriba, bêguman hûn dê li dijwariyê da ban, lê Xwe dê bawerî li
we xweşevîst kiriye û li dilên we da xemilandiye û Vî kerbê we li nebawerî,
têkdan û serkêşiyê vekiriye. Ewane ewên rênivînî kirîne.
8 Qencî li bal Xwe dê we û erêniya Xwe dê Zanîn û Biryardere. 9 Eger du
kom li naw bawermenda da şer biken, bes aştiyê li nawbera ewan da çêke, lê
eger yêkek li wan, ewê dîke biçewsînît, bes şerê ew bike ku diçewsînît taku ew
dizvrîte ser destûra Xwe dê, paşê eger ew zivrî, li nawbera wan da bi destê
hevseng aştiyê çêke û bi serastî kar bike, birastî Xwe dê hez ewan diket ku bi
serastî kar diken. 10 Tenê bawermend bira ne, li ber xatira hindê li nawbera
birayên xwe da aştiyê çêke û hişyarê Xwe dê be, belke li ber hindê rehm bi te
bête dan. 11 Hûn ku bawer diken, nabît çi neteweyek henekê xwe bi
neteweyek dîke biket, belke ew li wan bêhtir bin, nabît jin jî, bi jina biken,
belke ew li wan bêhtir bin û bêrêziyê bi xwe neken û bi zêde nava gazî hevdu
neken. Nebaşe navê serkêşiyê piştî baweriyê û her kesê ku peşîman nebît, bes
ew nerastkare.12 Hûn ku bawer diken, xwe li piraniya texmîna biparêzin,
birastî li hindek texmîna da guneh heye û sîxuriyê neken û bila hindek li we
pişt serê ewên dîke nepeyvin, meger kesek li we dixwazît goştê birayê xwe yê
mirî bixwet? Ne, dê kerbê we lê vebît, hişyarê Xwe dê bin, birastî Xwe dê
peşîmaniya dipejrînît û Rehmê didet. 13 Mirovino birastî Me hûn li nêrekê û
mêyekê afirandine û Me hûn kirine netewe û hoz[b], li ber xatira hindê hûn
hevdu nas biken. Birastî ewên herî bi rûmetê we li bal Xwe dê, ewên hişyarê
Vî ne, Xwe dê Zanîne, Agahdare.



a: Kesek ku dibîte hokarê şer, beko, kesek ku nûçeyên direw digêrît.
b: Qebîle, tire.

14 Ereb dibêjin, ´Em bawer diken,´ Bêje ´Hûn bawer naken, lê bêjin, ´Me
xwe radest kiriye´ Hêşta bawerî nehatiye dilê we da,´ Lê eger hûn peyrevî li
Xwe dê û peyamberê Vî biken, Ev we li hîç yêk li kiryarên we bêpar naket,
Birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet.
15 Tenê ewên ku bawer diken ewin ku bawerî bi Xwe dê û peyamberê Vî
diken, paşê gumanê neken û bi mal û riha xwe li rêya Xwe dê, da têkoşanê
biken, ewane, ewên rastin. 16 Bêje ´Hûn dê dînê xwe bi Xwe dê bidene nas
kirin, dema ku Xwe dê ewa di asimana da û ewa di erdê da dizanît û Xwe dê
zanist li ser hemû tişta heye?´
17 Ew hizir diken ku li ber xatira, xwe radest kirinê, wan qenciyek bi te kiriye.
Bêje, ´Xwe radest kirina xwe weke qenciyekê jibo min berçav negirin, Ev
Xwe dê ye ku bi rênivînî kirina we bo baweriyê qencî bi we kiriye. Eger hûn
rast bêjin.´ 18 Birastî Xwe dê nepeniyên[a] asimana û erdê dizanît,
Xwe dê eva tu dikey Dibînît.

a: Weşartî, sir

### 50. Para Qaf ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Qaf, bi Xwandina (Qurana) pîroz! 2 Belê ew sersam[a] mayne ku agahîderek li naw
ewan da hatiye û ewên nebawer dibêjin, ´Eve tişteke sersir înere! 3 Dema ku em
mirine û bûne toz? Eve zivrîneke dûre!´ 4 Em, baş dizanin ku erd çi tiştekê li wan dibet
û li bal meye tomareke parastî. 5 Belê ew nikoliyê li rastiye diken, dema ku ev bo wan
têt û ew di rewşa gêjiyê dane. 6 Meger ew asimanê serwey xwe nabînin ku Me çawa
ava kiriye û xemilandiye, bêy ku hîç çeşine dirandinek têda hebît 7 û erd, Me belav
kirye û çiyayên qahîm danane ser da û Em bûne hokar ku hemû cûreke ciwan têda şîn
bît, 8 têbînî û bîranînê didene hemû koleyekê ku dizvrît 9 û Me ava pîroz li asiman ra
şande xarê û pê baxçe şîn kirin, dexil û dan û dirûn 10 û darên bilindên xurmê ku di
rêza da ûşî pê we ne, 11 debarek jibo koleya û Me pê jiyan daye erdeke mirî, Aha wisa
dê derkevin!
12 Neteweya Nûh pêş ewan da nikolî lê kiribû û hevrêyên Ras û Semûd jî,
13 Ad, Fireûn û birayên Lat jî, 14 hevrêyên daristana da û neteweya Tuba jî, hemûya
nikolî li peyamberên xwe kirin û li ber xatira hindê hereşa Min hate cih.
15 Meger Em li afirandina ewlî westiya bûn? Belê ew sebaret bi afirandinek nû li
gumanê dane. 16 Bêguman Me mirov afirand, Em dizanin ku riha wi bi piste pist çi
dibêjîtê, Em li reha gerdena[b] wi li wi nêzîktirin, 17 dema ku her du vergir verdigrin, li
aliyê rastê û li aliyê çepê rûniştî 18 ew çi gotinekê nabêjît xêncî ku çavdêrek digel wî
amade nebît. 19 Serxweşiya[c] ber mirinê dê rastiyê bînît ´Eveye ewa ku te hewil[d] dida
xwe lê dûr bikey.´ 20 Dê zirna bête jenîn ´Eve Roja hereşê ye.´ 21 Hemû rihek dê bêt,
digel daye hajovanek[e] û gewahek 22 ´Bêguman tu bê agahê evê bûy û Me xêliya te
rakiriye, lewma îro dîtina te zelale.´ 23 Çavdêrê wî dê bêjît, ´Eva li bal min amadeye´
24 hemû nebawerên rikoyî havêjine naw cehnemê da, 25 rêgirê başiyê, sînor bezên û bi
guman 26 ewê ku digel Xwe dê xwedêyeke dîke çêkir, lewma ew havêjine naw
eşkenceya dijwar da!´ 27 Çavdêrê wî dê bêjît, ´Xwedanê me, min wel ew nekir ku
sînora bibezînît, lê ew gelek li şaşiyê dabû.´ 28 Ev dê bêjît, ´Li pêşya Min da gengeşê
neke, birastî Min bo te hişyariyek şandibû 29 û digel Min peyv nayête guhertin û Ez
digel zixmetkarên Xwe bêdad nînim.´ 30 Di wê Rojê da Em dê bêjine cehnemê,´Tu
tejî bûy?´ Û ew dê bêjît, ´Çi yê dîke hene?´

a: Ecêb



b: Reha qirikê, şah demara ku xwîn têda diçît
c: Sekerat, dema ku mirov ber mirinê ye, hişyare lê nikarît bêjît.
d: Xebat dikir, têkoşîn dikir.
e: Kesek ku hajot, kesek ku bibet

31 Lê dê baxçe bînine nêzîkê ewên hişyarê Vî, ne dûr 32 ´Eveye ewa ku belêniya wê bi
te hatibû dan, jibo hemû ewên ku dizvrin û xwedan diken!
33 Ewê ku nedîtî li xwedanê rehmê tirsiya û bi dileke zivrî hat, 34 bi aştî werne têda, îro,
roja bêpayane´
35 Ewan dê wêderê da, hemû ewa ku ew dixwazin dê hebin û li bal Me zêdetire.
36 Me çend nifş li pêş ewane da li nav birin ku li wan bihêztir bûn û li welata geriya
bûn, meger çi cihê reviyanê heye? 37 Birastî li evê da, jiboy herkesê ku dil heye
bîranînek heye yanjî ewê ku guhê xwe didetê dema ku gewahe.
38 Bêguman Me di şeş roja da, bê westiyan, hemû asiman, erd û ewa li nawbera wan
da afirandin. 39 Lewma bêhin fereh be sebaret bi ewa ku ew dibêjin û paye bilindiya
pesna Xwedanê xwe bike, pêş rojhilat û pêş rojava bûnê 40 û di şevê da jî Vî paye
bilind bike û piştî çok danan û ser nivandinê 41 û guhê xwe li ser wê Rojê ragirin,
dema ku gazîker dê li ciheke nêzîk da gazî biket. 42 Di ew Rojê da ew dê qêrînê li
rastiyê da bibhên, ew Roja derkevtinê ye. 43 Birastî Emin ku jiyanê diden û dibine
hokarê mirinê û wegera dawiyê jibo bal Me ye 44 di ew Rojê da dê erd bi lezgînî liber
wan ker[a] bît û ev kom kirine dê jibo Me hêsan bît. 45 Em dizanin ku ew çi dibêjin û tu
li ser ewan da zordest nînî, lê pê Xwandinê (Quranê) bîne bîra ewên ku li hereşeya
Min ditirsin.



a: şeq bûna erdê.

## 51.Para Belavker

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bi ewên ku hûr diken, belav diken 2 û ewên ku barekê hildigrin 3 û ewên ku bi
hêsanî li ser avê da diçin 4 û ewên ku destûrê dabeş diken, 5 birastî ewa ku belêniya
wê bi te hatiye dan raste 6 û birastî dê darizandin rû bidet, 7 bi asimanê tejî rêk,
8 birastî hûn li gotinê da ciyawazin, 9 li evê hatiye xapandin, ewê ku hatiye
xapandin. 10 Ewên direwîn li nav çoyne, 11 ewên ku li naw lêmiştekê[a] dane û hajê
nînin! 12 Ew dipirsin, ´Kengê dê Roja Darizandinê bêt?´ 13 Di Roja ku ew dê li ser
agir bêne taqî kirin. 14 ´Taqî kirina xwe tam bike! Eweye, ewa ku tu lêdigeriyay
bilezînî.´ 15 Birastî ewên hişyarê Vî li naw baxçe û kaniya da ne, 16 werdigrin ewa
ku Xwedanê wan daye wan, birastî pêş ewê da ewan karê baş dikirin 17 tenê
kêmekê di şevê da dirazan, 18 pêş serê sibê da bo lêbihorînê dipariyan 19 û pişkek
li malê wan mafê ewan bû ku dixwastin û ewên hejar. 20 Bo ewên arxayîn, li ser
erdê da nîşane hene 21 û li we bixwe da jî, meger hûn nabînin? 22 Debara te li
asiman daye û eva ku belêniya wê bi te hatiye dan. 23 Bes bi Xwedanê asiman û
erdê! Birastî ev raste, her wek ewa tu dipeyvî. 24 Meger serhata mêvanên birûmetê
Ibrahîm jibo te hatiye? 25 Dema ku ew lê çone jorda û ewan got, ´Aştî´ Wî got,
´Aştî mirovên bîhanî.´ 26 Paşê ew ço bal binemala xwe û pê golikek qelew zivrî
27 û dana nêzîkê wan û ew got ´Meger hûn naxwen?´ 28 Paşê ew hest bi tirsê li wan
kir, ewan got, ´Netirsiyê.´ Ewan mizgîniya kurekê fêr bûyî dane wî. 29 Paşê jina wî,
bi giryaneke bilind hate pêş û li rûmetê xwe da û got, ´Pîrejineke nezok?´ 30 Ewan
got, ´Xwedanê te eve gotiye, birastî Ev Biryardere Zanîne.´ 31 Ew Got,
´Peyamberino, erkê we çiye?´ 32 Ewan got, ´Birastî em bo neteweyeke tawankar
hatine şandin 33 ku kevirên li heriyê li ser ewan da bînine xarê, 34 ku li bal Xwedanê
te we, jibo ewên ku sînora dibezînin hatine nîşan kirin.´ 35 Lewma ewên ku têda
bawermend bûn Me înane derê 36 lê Me têda peyda nekir xêncî binemaleyekê ku
xwe radestê Vî[b] kiribûn 37 û Me nîşaneyek hêla têda, jibo ewên ku li eşkenceya
bijan ditirsiyên 38 û li Mûsa da jî, dema ku Me pê desthilatek zelal ew şande bal
Fireûn. 39 Lê ew digel piştîvanên xwe, pişta xwe dayê û got, ´Cadûgere, yanjî cin
girtî,´ 40 Lewma Me ew û şervanên wî girtin û ew havêtine naw deryayê da, dema
ku ew tawankar bû.
41 Û li Ad, dema ku Me bayê nezok li dijî wan şand 42 û her tiştek ku hate ser rêka
wê nehêla ku wêran neket 43 û li Semûd da jî, dema ku gotibûne wan, ´Bo demekê
xweş biqetînin,´ 44 Lê ewan li dijî destûra Xwedanê xwe serhildan, lewma birûskê
ew girtin, dema ku wan lê dinhêrî 45 û ewan nedikarî li ser pêya rawestin, nejî ewan
dikarî yarmetiya xwe biden. 46 Pêşta jî neteweya Nûh. Birastî ew neteweyek bi
pêdagirî serkêş bûn! 47 Me pê hêzê, asiman ava kir û birastî Em fereh diken 48 û Me
erd rawêxistiye, erêniye Evê amadekar!



a: Lehî, sêlav
b: Mosliman

49 Û Me hemû tiştek cot afirandine, belke li ber hindê bête bîra te. 50 ´Lewma
birewe aliyê Xwe dê, birastî ez li bal Vî we, bi zelalî agahdariyê dideme te 51 û
xwedêyek dîke digel Xwe dê da çêneke, birastî ez li bal Vî we, bi zelalî agahdariyê
dideme te!´
52 Herwisa pêş ewan da jî çi peyamber ku hatin, nema ku nebêjine ewan jî
´Cadûger yanjî cin girtî!´ 53 Meger ewan pêşniyar bi wan kiribûn? Belê ew
neteweyekin ku sînora dibezînin 54 lewma pişta xwe bide wan bila tu nehêye
gunehbar kirin 55 û bîr bîne, birastî bîranîn berjewendiyê digehînîte bawermenda.
56 Min cin û mirov afirandin ku tenê Min biperestin, 57 Ez çi debara li wan
naxwazim, ne jî Ez dixwazim ku ew xwarinê bidene Min, 58 birastî Xwe dê Ev e
ku dabîn diket, Xwedanê Hêza, Bi şêyane.
59 Lewma birastî jibo ewên ku nerastiyê diken, dê pişkek weke pişka hevrêyên xwe
hebin, li ber hindê bila ew li Min nepirsin ku lezê lê bikem 60 û heware li ewên ku
bawerî bi roja xwe naken ku belênî bi wan hatiye dan.

## 52. Para Çiya

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bi çiya, 2 bi nivîsîna pîroza[a] nivîsî 3 di tênûsa rawêxistî[b] da, 4 bi mala ku gelek
seredana wê tête kirin, 5 bi banê bilind kirî, 6 bi deryaya tujî, 7 birastî dê
eşkenceya Xwedanê te rû bidet 8 û çi tişt pêşiya wê nagrît 9 di ew Rojê da
asiman dê bi hejiyanê bihejiyêt 10 û çiya dê biçin û derbaz bin. 11 Di wê Rojê
da heware li ewên ku nikolî kiribûn, 12 ewên ku bêhna xwe pê peyvînê tînin,
13 di wê Rojê da, dê bi havêtinê ew dê bêne havêtine naw agirê cehnemê da.
14 ´Eweye, ew agirê te nikolî lê dikir. 15 Meger ewe cadûye yanjî tu nabîn? 16 Di
wêderê da bişewte, bêhin fereh be yanjî bêhin çik be, jiboy te her wek yêke,
tenê padaşê ewê bi te tête dan ku te dikir.´ 17 Birastî ewên ku hişyarê Vî ne, li
naw baxça û şadiyê dane, 18 xweşiyê li ewa ku Xwedanê wan daye wan diben
û Xwedanê wan, ew li eşkenceya agirê cehnemê parastine, 19 ´Bi keyfxweşî
bixwen û vexwen, ber xatira ewa ku we dikir.´ 20 Ew dê li ser textên ku hatine
rêz kirin rûnên û Em dê ewan digel hevjînên çav ciwan bidene zewicandin,
21 Ewên ku bawer kiribûn û paşketiyê wan ku li baweriyê da ew şopandibûn
Em dê paşketiyê wan bigehînine wan û Em ewan li hîç yêk li kiryarên wan
bêpar naken, li wan we paşta ranagrin. Her kesek jiboy ewa ku destê xwe
êxistiye têtê xwedan kirin. 22 Em dê meyveya bidene wan û goştê her tiştê ku
ew dixwazin. 23 Ew dê fîncanekê bidene destê hevda ku çi gotinên nexweş têda
nînin nejî guneh. 24 Dê rêncber[c] li dora wan bigerên, wek tu bêjî ew mercanên
gelek parastî ne. 25 Hindek wan dê li ewên dîke nêzîk bin û bipirsin, 26 ew dê
bêjin ´Birastî pêşta em li naw mirovên xwe da ditirsiyan 27 lê Xwe dê bo me
baş bû û em li eşkenceya guriya agir rizgar kirin. 28 Birastî em pêşta li ber Vî
dipariyan, birastî Ev gelek Mêhrîvane Rehmê didet.´ 29 Lewma bîr bîne, li ber
erêniya Xwedanê xwe, tu ne kesekî ku pêşbêjiyê[d] dikey, nejî cingirtî.
30 Yanjî ew bêjin, ´Helbestvaneke, em dê jiboy wî çavnihêrê dema bextreşiyê
bin´ 31 Bêje, ´Çavnihêr bin, birastî ez jî digel we li naw çavnihêra da me ´
32 Yanjî hizra wan jibo evê destûrê didete wan, yanjî ew neteweyeke sînor
bezênin? 33 Yanjî ew bêjin, ´Ew her bixwe berhem înaye?´ Belê ew bawer
naken. 34 Bihêle bila ew jî serhateke[e] weka evê bînin, eger ew rast dibêjin.
35 Yanjî ew li qedçineyiyê hatibûne afirandin? Yanjî ew afrîner bûn?
36 Yanjî ew afrînerê asimana û erdê bûn? Belê ew arxayîn nînin.
37 Yanjî xizîneyê Xwedanê te li bal wanin yanjî ew desthilatdarin?



a: Xwandin (Quran)
b: ew nîvîsîna lûl dayî hatî wekirin ku bixwînin.
c: Kurên law ku xizmeta biheştiya diken
d: kesê ku li ber xwe da texmîna paşe rojê diket, kesê ku bi direw dibêjît ew zanista nedîtî heye, Kahin.
e: Hedîs.

[38] Yanjî  bo ewan pêlekanek heye ku ew li ser da guhê xwe didenê? Bihêle bila
guhdarê wan desthilatek zelal bînît. [39] Yanjî Ev kiç hene dema ku we kur
hene? [40] Yanjî tu padaşekê li wan dixwazî, lewma  ew li bin barê deynê da
mayne? [41] Yanjî ewan ewa nedîtî heye? Lewma ew wê binvîsin? [42] Yanjî ew
dixwazin bernameyekê birêjin? Lê ewên nebawer her bixwe bername ne.
[43] Yanjî ewan xwedêyeke dîke xêncî Xwe dê heye? Paye bilindî  jibo Xwe dê
ye li ewa ku ew dikene ´hevalê´ Vî. [44] Eger ewan dîtiba ku pirtikek asiman jî
ketiba, ew dê bêjin, ´Komek ewrin´ [45] Lewma waz li wan bîne, taku ew Roja
xwe dibînin ku ew dê têda li xwe we biçin, [46] ew Roja ku bernamê wan, çi
berjewendiyê nagehînine wan nejî dê yarmetiya wan bête kirin. [47] Birastî jibo
ewane ku karên nerast diken, eşkenceyek pêş ewê daye, lê piraniya wan
nizanin. [48] Lewma bi bêhin ferehî çavnihêrê biryara Xwedanê xwe be, çimkî
birastî tu li çavê Me dayî. Dema ku tu radibî, paye bilind bike pesna Xwedanê
xwe. [49] Di şevê da Vî paye bilind bike û piştî sitêrka.

## 53. Para Sitêrk ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bi sitêrkê, dema ku ew ava dibît, [2] hevrêyê we li rê nederketiye, nejî ew şaşî
kiriye [3] nejî ew pê hestê xwe dipeyvît, [4] eve tenê sirûşeke[a] ku sirûş hatiye dan.
[5] Ew fêr kir, ewê gelek bihêz [6] ewê hişyar û rabû serxwe [7] dema ku ew li ser
elendê[b] herî bilind bû [8] paşê ew nêzîk bû û hate xarê [9] taku ew hindî du ketine
ser çoka û ser nivandina dûr bû yanjî nêzîktir [10] û wî sirûş da koleyê Xwe, eva
ku ew sirûş dabû. [11] Dil direw nekir ku çi dît. [12] Meger tu dê digel wî da
gengeşê bikey ka ew çi dît? [13] Bêguman careke dîke jî wî dît ku ew hate xarê,
[14] nêzîk dara Lotê ya xwedan sînorê gelek fereh [15] nêzîkê baxçê bêhin wedanê,
[16] dema ku dara Lotê dagirtibû, ewa ku dadigrît [17] Ne dîtin xar û xêç bû nejî
sînor derbaz kirin [18] bêguman ew li mezintrîn nîşaneyên Xwedanê xwe dîtin.
[19] We Al-lat[c] û Al-Uza liber çav girtine [20] û Manat ewê sê yê, ewê dîke.
[21] Meger nêr bo we ne û mê jibo Vî? [22] Bes ewe par vekirinek bêdade!
[23] Xêncî nava ew çinînin, navên ku we danayne ser ewan da, we û berebabên
we, Xwe dê çi desthilat bo wê neşandiye. Ew tenê peyrevî li texmîna diken û
ewa ku rih dixwazin, bêguman li bal Xwedanê wan ra jibo wan rênivînî
hatiye. [24] Yanjî bo mirov her tiştê ku ew dixwazît heye, [25] lê jibo Xwe dê ye
Dawî û ya ewlî. [26] Çend firişteyên li asimana da hene ku nawbêjvaniya wan çi
qazancê nagehînît, xêncî piştî ku Xwe dê destûrê didete ewên ku Ev dixwazît
û dipejirînît. [27] Birastî ewên ku bawerî bi Dawiyê naken navê mêyîne didanêne
ser firişta. [28] Ewan çi zanist li ser hindê nîne, ew tenê peyreviyê li texmîna
diken. Birastî li dijî rastiyê da texmîn hîç qazancekê nagehînît.
[29] Lewma pişta xwe bide ewên ku pişta xwe didene bîranîna Me û naxwazin
xêncî jiyana ev dinyayê.
[30] Zanista wan ew hinde ye, birastî Xwedanê te dizanît kanê kê li rêya Vî
derdikevît û Ev dizanît kanê kê rênivînî kiriye. [31] Jibo Xwe dê ye ewa di
asimana û erdê da, belke Ev padaş bidete ewên ku karên nebaş diken pêka
ewa ku wan kiriye û padaş bidete ewên ku karên baş diken pê bêhtrîna
[32] ewên ku dûriyê li gunehên gelek mezin diken û bê rewiştiyê[c], xêncî şaşiyên
biçûk, birastî Xwedanê we gelek berîne li lêbihorînê. Ev sebaret bi we dizanît,
li dema ku Vî hûn li erdê berhem înayne û dema ku hûn biçûk bûne li mal
biçûkên daykên xwe da, lewma pêdagiriyê li ser pakiya xwe neken, Ev dizanît
kanê kê hişyarê Vî ye. [33] Tu ew dibînî ku pişta xwe didetê? [34] û kêmekê didet
û dest radgrît. [35] Meger ew zanista nedîtî heye, lewma ew dibînît?

a: Wehî, gotina Xwe dê, peyama Xwe dê.
b: Cihê ku erd û asiman hev digrin, Aso, ofoq
c: Navê putên şarê Mekê bûn
d: fehşa

[36] Yanjî ew agahdar nekirîne ku çi di nivîsîna pîroza Mûsa da heye [37] û ewa
Ibrahîm da ku bicih îna, [38] ku hîç bar helgirek, barê yêke dîke hilnagrît, [39] ku
jibo mirov nabît, xêncî ewa ku jibo xebatê diket [40] û xebata wi dê bête dîtin,
[41] paşê, dê li ber hindê padaş bi wî bête dan, padaşek tewaw! [42] Dawiya wê bo
bal Xwedanê we ye [43] û Eve ku dikenînît û digrînît [44] û Ev e ku dibîte hokarê
mirinê û jiyanê didet [45] û Eve ku cot afirandine, nêr û mê, [46] li dilopek avikê
dema ku ew dirêjiyêt [47] û li ser Vî ye ku yêke dîke berhem bînît [48] û Ev e ku
serwetê didet û têr diket [49] û Ev e xwedanê Sîrosê[a] [50] û Ev ê ku Ad ê ewlî li
nav bir [51] û Semûd jî, Ev nehêlan [52] û li pêş wan da jî neteweya Nûh, birastî ew
zêdetir bêdad û serhildêr bûn [53] û gundên kavile, Ev ser û bin kirin [54] û
pêçabûn pê ewa ku Ev pêçabûn. [55] Bes hûn gumanê li kîjan yêk li qenciyên
Xwedanê xwe diken?
[56] Eve agahîdereke li agahîderên ewlî [57] roja ku nêzîk dibît, nêzîk bûye
[58] û xêncî Xwe dê kes nikarît wêda bibet. [59] Meger hûn li ew rûdawê[b] sersir[c]
mayne? [60] Û hûn pê dikenin û nagiryên? [61] Dema ku hûn bêhna xwe pê tînin?
[62] Lewma çok daden û serê xwe binvînin ku Xwe dê biperestin.



a: Sîros navê sitêrkekê li asiman daye! Hindek put perest Sîrosê weke Xwe dê diperestin!
b: Hedîs
c: Ecêb

## 54. Para Heyv ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Demjimêr hatiye nêzîk û heyv ker[a] bûye. 2 Eger ew nîşaneyekê dibînin,
ew pişta xwe didenê û dibêjin, ´Cadûya berdewam´ 3 Û ewan nikolî lê kir
û peyrevî li hestên xwe kirin, lê hemû mijarek tête cihê xwe, 4 bêguman
pêşta li zaniyariyê jibo wan hatiye ku li wêderê da pêşgîriyê lê diken,
5 têgeheştina tewaw, lê ew rêgiriya agahdariyê naket, 6 lewma pişta xwe
bide wan, di Roja ku Gazîker dê gazî tişteke gelek nebaş biket, 7 bi çavên
ku zêndidene ber xwe[b], ew dê li gora da derkevin, weke bêjî ew kolî ne
belav dibin, 8 pêşve direwin, bo aliyê Gazîker, nebawer dê bêjin, ´Eve
Rojek dijware!´
9 Neteweya Nûh pêş ewan da û nikolî li koleyê Me kiribûn û gotibûn,
´Mêrek cingirtî´ Û ew paşve dabûn, 10 Û li ber hindê, ew gazî Xwedanê
xwe kiribû, ´Min şikest xwariye, lewma yarmetiya min bike!´
11 Lewma, Me deriyên asiman vekirin pê ava ku dirijiya xarê 12 û Em bûne
hokar ku erd pê kaniya biteqît û lewma ava hevdîtin, li ber mijarekê ku
pêşta çarenûsa wê hatibû nivîsîn. 13 Me, ew hilgirte ser ewa li texte û
bizmara 14 ku li jêr çavdêriya Me da ew ser avê da diherikî, weke padaşekê
jibo ewên ku nikolî li wan hatibû kirin.
15 Bêguman Me ew weke nîşane hêla, lewma kesek heye ku bînîte bîra
xwe? 16 Lewma sizaya Min çawa bû û agahdarî? 17 Bêguman Me Xwandin
(Quran), jibo bîr înanê hêsan kiriye, lewma kesek heye ku bînîte bîra xwe?
18 Ad jî nikolî lê kir û sizayê Min çawa bûn û agahdarî? 19 Birastî Me
bayek bi qêrîn şande ser ewan da, li roja bextreşiya berdewam da,
20 mirov hildikêşan wek bêjî darên xurmê li rehê da derketibûn 21 û sizayê
Min çawa bûn û agahdarî? 22 Bêguman Me Xwandin (Quran), jibo bîr
înanê hêsan kiriye, lewma kesek heye ku bînîte bîra xwe? 23 Semûd jî,
nikolî li agahdariyê kir 24 ewan got, ´Meger tenê miroveke li naw me da ku
dibya em peyreviyê lê biken, bes birastî em dê di şêtî û şaşiyê da bin!
25 Meger li naw me da, bîranîn bi wî hatiye dan? Belê ew direwîneke lewçe
ye!´
26 ´Sibê, ew dê bizanin kanê kê, direwîneke lewçe ye, 27 birastî Em hêştira
mê weke taqî[c] karî jibo wan rêdiken, lewma li wan binêre û bêhin fereh be
28 û ewan agahdar bike ku dibya av li nawbera wan da bête par vekirin,
hemû amade vexwen.´ 29 Lê wan gazî hevrêyê xwe kirin, ew rakir û qop
kir 30 û sizayê Min çawa bûn û agahdarî?
31 Birastî Me tenê qêrînek şande ser wan û ew weke darikên hişkê çîtê[d] lê
hatin. 32 Bêguman Me Xwandin (Quran), jibo bîr înanê hêsan kiriye,
lewma kesek heye ku bînîte bîra xwe? 33 Neteweya Lat jî nikolî li
agahdariyê kir.

a: Şeq bûye, tîş bûye b: ûstî xar bûne c: îmtihan, ceribandin
d: dîwarê ku li darika hatî çêkirin

34 Bi rastî Me tofana kevira şande ser ewan da xêncî binemala Lat nebît,
pêş serê sibê da Me ew rizgar kirin 35 weke erêniyekê[a] li bal Me we, aha
wisa Em padaş didene sipasdara. 36 Û bêguman ew pêşta, li girtina Me
agahdarî dabûye wan, lê ewan gengeşe li agahdariyê kirin 37 û bêguman
ewan daxwaza mêvanên wî jî, li wî kiribûn, lewma Me çavên wan
nixumandin[b]´ Lewma eşkenceya Min tam biken û agahdariyê!´ 38 Û
bêguman di sibeya zû da, sizaya ku dimînît li ser ewan da girt 39 ´Lewma
eşkenceya Min tam biken û agahdariyê!´
40 Bêguman Me Xwandin (Quran), jibo bîr înanê hêsan kiriye, lewma
kesek heye ku bînîte bîra xwe? 41 Bêguman jibo gelê Fireûn jî agahdarî
hat. 42 Ewan nikolî li hemû nîşaneyên Me kirin, lewma Me pê girtineke
bihêz û şêyan ew girtin. 43 ´Meger hûn nebawer li ewan bêhtirin? Yanjî di
nivîsîna pîroz da, jibo we lê xweş bûn heye?´ 44 Yanjî ew dibêjin, ´Em
komekin ku yarmetiyê diden?´ 45 Bi zûyî dê Koma wan bête têk şikandin û
ew dê pişta xwe bidenê. 46 Belê Demjimêr, dema wan ya dîharî kiriye û
demjimêr gelek dijware û gelek tale. 47 Birastî ewên tawankar di şaşî û
şêtiyê da ne 48 di ew Roja ku ew li ser rûmetên xwe da têne rakêşan bo
naw agir. ´Dest lêdana cehnemê tam biken.´ 49 Birastî Me, hemû tişt pê
çarenûsa nivîsî[c] afirand 50 û destûra Me tenê yêke, wek miqîna çavekê.
51 Bêguman Me pêşta ewên mîna we li nav birîne, lewma kesek heye ku
bînîte bîra xwe? 52 Hemû tiştê ku ewan dikir li tomara nivîsî daye, 53 hemû
biçuk û mezin nivîsiye. 54 Birastî ewên hişyarên Vî li naw baxçeya û çema
da ne, 55 li ser kursiyek rûmetê, nêzîkê Padişahê Herî Bihêz.



a: Li şûna peyva Nemet min peyva Erênî bikar înaye.
b: Peçavtin, kor kirin ku nebînin.
c: Li şûna peyva Qederê da min peyva çarenûsa nivîsî bikar înaye.

## 55. Para Xwedanê Rehmê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Xwedanê rehmê, 2 Xwandin (Quran) fêr kir 3 Mirov afirand 4 ew
fêrî axawtinê kir 5 Roj û heyv jî pê hisaba serast, 6 Sitêrk û dar serê
xwe dinvînin 7 Ev asiman bilind kiriye û Ev havsengî[a] damezrandiye
8 bila li ber hindê tu sînorên hevsengê nebezînî, 9 bi dadwerî bipîvê û
li hewsengê kêm neke.10 Jibo rihtibera Ev erd danaye,
11 têda meyve hene û darên xurmê ku destik pêwe ne 12 û dexl û
dahnên ku kewil hene û giyayên bêhin xweş. 13 Lewma hûn her du
nikoliyê[b] li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 14 Ev mirov li
heriya hişik bûyî ya kelpûça afirand, weke siwax kariyê[c] 15 û Ev cin jî
li guriya agirê bê dûkel afirand. 16 Lewma hûn her du[d] nikoliyê li
kîjan yêk ji qenciyên Xwedanê xwe diken? 17 Xwedanê du rojava û
Xwedanê du rojhilata ye. 18 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li
qenciyên Xwedanê xwe diken? 19 Ev du derya berdan, hevdu dibînin,
20 li nawbera wan da perjînek heye, ew nabezînin.
21 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe
diken? 22 Li her du ya jî mirwarî û mercan diderkevin. 23 Lewma hûn
her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 24 Yê Vî
ne ew gemiyên ku li ser deryayê da weke çiyaya diçin.
25 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk ji qenciyên Xwedanê xwe
diken? 26 Hemû ewên li ser da dê li nav biçin 27 û rûmetê Xwedanê te
dê bimînît, Xwedanê Bêpayan bilind, Bêpayan birûmete.
28 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe
diken? 29 Hemû ewên di asimana û erdê da li Vî dipirsin, her rojê Ev
mijarekê tînîte pêş. 30 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li
qenciyên Xwedanê xwe diken?
31 Em dê bi we ra bigehin, hûn her du pol[e] 32 lewma hûn her du
nikoliyê li kîjan yêk ji qenciyên Xwedanê xwe diken?
33 Komên cin û mirova, eger hûn dikarin li nawçeyên asimana û erdê
da derbaz bin bes derbaz bin, lê hûn derbaz nabin bêy desthilata Me.
34 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk ji qenciyên Xwedanê xwe
diken? 35 Dê guriyeke agir û dukelê havêjine ser we û kes nayête
yarmetiya we. 36 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên
Xwedanê xwe diken? 37 Dema ku asiman ker[f] dibît û rengê wê sorê
tarî dibît weka çermê sor. 38 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li
qenciyên Xwedanê xwe diken? 39 Di ew Rojê da, sebaret bi gunehên
wan ne dê lêpirsîn li cina nejî mirova bête kirin.

a: Mîzan, alava pîvanê b: Haşa,nepejirandin c: Mîna çêkirina kasik û cera li heriyê.
d: Cin û Mirov e: Kilas, taqim, kom f: Şeq dibît

40 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe
diken? 41 Ewên tawankar dê pê dirûşmên xwe bêne nas kirin û ew dê
pê pora ser û pêyên wan bêne girtin. 42 Lewma hûn her du nikoliyê li
kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 43 Ewe cehneme ku
tawankar nikoliyê lê diken, 44 ew dê li der dorê wê bigerên û li
nawbera ava kel, kelandî. 45 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li
qenciyên Xwedanê xwe diken? 46 Bo ewê ku ditirsiyêt, bo Xwedanê
xwe rawestît, du baxçe hene. 47 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan
yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 48 Çiqil hene. 49 Lewma hûn her
du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 50 Li her du
ya da du kanî hene ku diherikin. 51 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan
yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 52 Li ewan her duya da hemû
çeşne meyveyek cot hene. 53 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li
qenciyên Xwedanê xwe diken? 54 Ew dê li ser rawêxa rûnên ku
bermalên wan li armûşên gul wehînayîne[a] û meyveyên her du
baxçeya li ber desta daliqandî ne. 55 Lewma hûn her du nikoliyê li
kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 56 Li naw ewan da
hevrêyên ku li ber xwe dinhêrin hene ku çi mirov û cina destê xwe
nedayne wan. 57 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên
Xwedanê xwe diken? 58 Weke bêjî ku ew yaqût û mercanin. 59 Lewma
hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken?
60 Meger padaşê başiyê bes başî nîne? 61 Lewma hûn her du nikoliyê li
kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 62 Û li kêleka ewan da du
baxçe hene. 63 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên
Xwedanê xwe diken? 64 Keskê tarî. 65 Lewma hûn her du nikoliyê li
kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe diken? 66 Li her dû ya da jî cotek
kanî dibilqine derê. 67 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li
qenciyên Xwedanê xwe diken? 68 Li naw her dû ya da meyve, darên
xurmê û darên hinara hene. 69 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk
li qenciyên Xwedanê xwe diken? 70 Li naw ewan da, ewên baş û
ciwan hene. 71 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên
Xwedanê xwe diken? 72 Çaw ciwanên[b] parastî li naw şaneşînê da.
73 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe
diken? 74 Pêşta li bal mirov yanjî cina we destê xwe nedaynê da.
75 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe
diken? 76 Ew li ser doşekçeyên kesk û ravêxên ciwan rûniştine.
77 Lewma hûn her du nikoliyê li kîjan yêk li qenciyên Xwedanê xwe
diken? 78 Pîroze navê Xwedanê we, Xwedanê bêpayan Bilind û
bêpayan Birûmetê.

a: Armûşê ku pê desta gul li ser da dirûne



b: Min peyva Hûrî bi çav ciwan vergêraye.

### 56. Para Rûdan ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Dema ku rûdaw rû didet, 2 nikolî li rûdana wê nayê kirin, 3 dê bînîte xarê û
bilind biket. 4 Dema ku dê erd bi lerzînê bihejiyêt 5 û çiya dê bi herifînê
biherifin 6 û weke tozê dê belav bin 7 û hûn dê bibine sê cûre. 8 Hevrêyên li
aliyê rastê, hevrêyên li aliyê rastê kêne? 9 Û hevrêyên aliyê çepê, hevrêyên li
aliyê çepê kêne? 10 Û pêş ketî, pêş ketî! 11 Ew nêzîktirînin 12 li naw baxçên
şadiyê da, 13 komek li ewên ewlî 14 û hindeka jî li ewên dawiyê. 15 Li textên
xemilandî 16 li ser da rûniştine, li hemberî hevdu, 17 kure rêncberên nemir dê li
dora wan bigerên 18 pê aman, avxwor û fincanên li kaniyên diherikin 19 lewma
ne ewan dê ser êşe hebît nejî ew dê serxweş bin 20 û meyveyên ku ew hildibjêrin
21 û goştê her balindeyekê ku ew hez lê diken 22 û ciwanên çav mezin 23 weke
mercanên parastî 24 padaşeke jiboy ewa ku wan dikir. 25 Ew, wêderê da çi
peyvîneke nebaş yanjî gunehbar nabihên, 26 xêncî gotinekê ´Aştî û aştî.´
27 Hevrêyên li aliyê Rastê, hevrêyên li aliyê rastê kêne? 28 Li naw darên Lotê[a],
bêqelem da ne 29 û Ekêyşiyayên[a] bi ûşî we 30 û sîberên pan, 31 û av diherikîte
der 32 û meyveyên firavan, 33 ne sînordar nejî qedexe, 34 bermalên bilind kirî,
35 birastî Me pê berhem înanê ew berhem înane 36 û Me ew kirîne pakîze[b]
37 xwe radest kirî û hevtemen, 38 bo hevrêyên li aliyê rastê, 39 komek li ewên
ewlî 40 û komek jî li ewên dawiyê 41 û hevrêyên li aliyê çepê, hevrêyên aliyê
çepê kêne? 42 Li naw guriya agir û ava kelandî da 43 û sîberek li dûkela reş 44 ne
fênike nejî xweşe. 45 Birastî pêş ewê da, ew li xweşiyeke firavan da bûn 46 û li
gunehên gelek mezin da pêdagir bûn 47 û digotin, ´Dema ku em bimrin û
bibine toz û hêstik, meger birastî em dê bêne vejandin? 48 Û berebabên me yên
berê jî?´ 49 Bêje, ´Birastî ewên ewil û dawiyê jî, 50 dê bêne kom kirin bo
hevdîtina Rojekê ku pê dizanin 51 paşê birastî hûn jî, ewên ku li rê derketî û
nikolîker 52 dê li dara Ziqumê bixwen, 53 dê zikê xwe pê tujî ken 54 û dê li ser da
ava kelandî vexwen, 55 dê vexwen herwek hêştirên tênî divexwen.´
56 Ewe dê xêrhatina wan bît, di Roja dadweriyê da. 57 Me tu afirandî, liber
hindê çima tu bawer nakey? 58 Te dîtiye ewa ku tu dirêjî ? 59 Ew tuyî ku
diafrînin, yanjî Emin afirîner? 60 Me çarenûsa mirinê li naw weda nivîsiye[c] û
ew pêş Me nakevît 61 Em dê li ewê da mînaka te biguherin û te berhem bînin li
ewa ku tu pê nizanî. 62 Bêguman tu ava bûna ewlî dizanî, lewma tu nayniye
bîra xwe? 63 Tu dibînî ewa ku tu diçînî? 64 Ew tuyî ku dibiye hokar ku ew mezin
bît yanjî Em mezin diken?



a: Cûrê dara ne! min navê wan yê kurdî nezanîn, min navê wan yê Inglîzî nivîsîn
b: Ew mirovê ku çi cara gan nedaye, Pakîze (bakîre).
c: Min peyva qeder bi çarenûsa nivîsî wergêraye.

[65] Eger Me xwastiba, Me dikarî bikene pûş û tu dê sersam mabay,
[66] ´Birastî em deyn darin [67] belê em bêpar mayne.´ [68] Te ew ava ku te
vexwariye dîtiye? [69] Meger tu bûy ku li ewra şande xarê, yanjî Ev ê ku şandî
Em bûn? [70] Eger Me xwastiba Me dikarî ewê şor biken, bes çima tu sipasdar
nînî? [71] Û tu agir dibînî ku tu hil dikey [72] meger ew tuyî ku darê wê berhem tînî
yanjî Em berhem tînin? [73] Me ew kire bîranînek û debarek jibo rêviya,
[74] lewma navê Xwedanê xwe yê herî mezin paye bilind bike.
[75] Bes Ez bi ava bûna sitêrka sûnd dixwem [76] û birastî ev sûnde, eger te
zanîba gelek mezine, [77] birastî eve Xwandineke (Quraneke) giran buhaye,
[78] di nivîsîneke pîroza parastî daye [79] kes destê xwe nadetê xêncî pak bûyî ya,
[80] hatiye şandine xarê, li bal Xwedanê hemû dinyaya we.
[81] Bes tu guhê xwe nadeye ew serhatê[a]? [82] Û debara xwe çêdikey ku tu nikoliyê
lê dikey? [83] Bes çima dema ku ew digehîte qirikê [84] û di wê demê da tu lê
dinhêrî [85] û Em li we nêzîktirê wî ne lê hûn nabînin. [86] Bes çima ne, eger padaş
bi we nayête dan [87] paşwe bizvrîne, eger tu rast dibêjî?
[88] Bes eger ew li wane ku dê bînine nêzîk [89] bes bêhin wedan, xelat û baxçeyê
şadiyê [90] eger ew li hevrêyên aliyê Rast ê ye, [91] bes ´Aştî li ser te bît,´ li
hevrêyên aliyê rastê, [92] lê eger ew li wane ku nikolî kiriye û li rê derkevtiye,
[93] bes xêr hatin bi ava kelandî [94] û şewtîn li agirê cehnemê da. [95] Birastî eve
rastiya bêgumane [96] liber hindê, paye bilind bike navê Xwedanê xwe yê gelek
Mezin.



a: Jibo peyva hedîsê min peyva serhat bikar înaye.

## 57. Para Asin

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1]Her tiştê di asimana û erdê da Xwe dê paye bilind diket, Ev Bihêze
Biryardere. [2] Padişahiya asimana û erdê ya Vî ye, Ev jiyanê didet û dibîte
hokarê mirinê, Ev desthilat li ser hemû tişta da heye. [3] Ev Destpêk û
Dawiye, Ev Naw daye, Derweye û Ev hemû tişta dizanît.
[4] Eve afrînerê asimana û erd, di şeş roja da û paşê Xwe li ser texte
damezirand. Ev dizanît ku çi diçîte erdê da û çi têda der dikewît, çi bilindî
asiman dibît û çi lê tête xarê. Ev digel teye, tu li her derekê bî,
Xwe dê ewa ku tu dikey dibînît. [5] Padişahiya asimana û erdê ya Vî ye û
mijar dê bizvrîte bo bal Xwe dê. [6] Ev şevê têklî rojê diket û Ev rojê têklî
şevê diket û Ev dizanît ku di naw singa da çi heye.[7] Bawerî bi Xwe dê û
peyamberê Vî biken û biden li ewa ku Vî wisa kiriye ku bigehîte destê we,
ewên ku li naw we da bawer diken û diden, ewan dê padaşek mezin hebin.
[8] Hûn çima bawerî bi Xwe dê naken, dema ku peyamber gazî we diket ku
bawerî bi Xwedanê xwe biken û bêguman Ev digel we peyman girê daye,
eger hûn bawer diken? [9] Ev e ku eşkereyên zelal bo koleyên Xwe dişînît,
belke li ber hindê Ev, we li tarîtiyê da bînîte naw ronahiyê da, birastî
Xwe dê bo we Mêhrîvane û Rehmê didet. [10] Çima hûn li rêya Xwe dê, da
naden, dema ku mîratê asimana û erdê bo Xwe dê ye? Wekhev nînin li
naw we da, ewên ku li pêş serkevtinê da dan û şer kirin, ew li pileya xwe
da gelek mezintirin li ewên ku paştir dan û şer kirin.
Lê Xwe dê belêniya baş daye hemûya û Xwe dê agahdarê ewa hûn diken
heye. [11] Ew kêye dê deyneke baş bidete Xwe dê, lewma Ev dê bo ew zêde
ket û ew dê padaşeke giran buha hebît. [12] Di Roja ku tu dê mêrên
bawermend û jinên bawermend bibînî ku ronahiya wan pêş wan ketiye û
li destê wan yê rastê, ´Mizgîniya we îro, hûn dê ta bêdawiyê li naw baxça
da bimînin ku çem li bin da diherikin, eve destkevteke gelek mezine!´
[13] Di wê Rojê da, mêrên durû û jinên durû dê bêjine ewên ku bawer kirî,
´Li benda me rawestin, bila me li ronahiya we hebît!´ Dê bête gotin,
´Paşve bizivrin û li ronahiyê bigerên.´ Paşê dê dîwarek ku deriyek pêveye
dê li nawbera wan da bête danan, li naw da rehm heye lê derwey wê rû li
eşkencê diket. [14] Dê gazî ewan biken, ´Meger em digel we nebûn?´ Ew dê
bêjin, belê lê we hêla hûn bêne taqî kirin û hûn bêhn fereh man û we
guman kir û xeyalên direw hûn xapandin taku destûra Xwe dê hat û ewê
xapîner sebaret bi Xwe dê hûn xapandin.

15 Lewma îro, çi qerebû li we nayêne pejirandin, nejî li ewên ku bawer
nekirbûn, penahgeha we agire, ew gelek kêrhatiyê we ye û armanceke
nebaşe!´ 16 Meger dem jibo ewan nehatiye ku bawer kirbûn pê bîranîna
Xwe dê dilê wan nizim bît û eva ku li rastiya hatiye xarê û weke ewên pêş
xwe da nebin ku nivîsîna pîroz bi wan hatibû dan, dema wan hate dirêj
kirin lewma dilê wan req bû û piraniya wan bi pêdagirî serkêşin?
17 Bizanin ku Xwe dê jiyanê didete erdê, piştî mirina wê, bêguman Me
jibo te nîşane zelal kirîne, belke liber hindê tu hizra xwe lê bikey.
18 Birastî mêrên ku xêra diden û jinên ku xêra diden û ewên ku deyneke
baş didene Xwe dê, ew dê jibo wan zêde bît û ewan dê padaşek giran
buha hebît. 19 Ewên ku bawerî bi Xwe dê û peyamberên Vî diken, ew yên
rastbêjin û şehîd li bal Xwedanê xwe ne, jibo ewane padaşê wan û
ronahiya wan, lê ewên kû bawer naken û nikoliyê li eşkereyên Me diken
ew hevrêyên naw agirê cehnemê dane.
20 Bizanin ku jiyana dinyayê leyize, rê derketineke, xemilandineke bo
xwe mezin kirinê li naw we da û kêberkêya zêde kirina mal û zarûka.
Weke baranekê ku cotkarê çandinê keyfxweş diket, paşê ew hişik dibît û
hûn dibînin ku ew zer dibît û paşê ew dibîte pûş û li Dawiyê da eşkenceya
dijwar û lêbihorîn li bal Xwe dê ye û keyfxweşî. Lê jiyana dinyayê xêncî
keyfxweşiyeke xeyalî nîne. 21 Lewma birewe bo bal lêbihorîna Xwedanê
xwe û baxçeyekê ku hindî asiman û erdê pane û jibo ewên ku bawerî bi
Xwe dê û peyamberên Vî hene hatiye amade kirin, ewe qenciya Xwe dê
ye ku Ev didete her kesê ku Ev dixwazît û Xwe dê Xwedanê qenciya gelek
mezine. 22 Hîç karesatek li erdê da rû nadet nejî li we bixwe da ku ew
pêşta li tomarê da nebît ku Em tînine hebûnê da, birastî ewe jiboy
Xwe dê hêsane. 23 Lewma belke tu xemgîn nebî sebaret bi ewa ku li dest te
çoye û xwe mezin nekey liber ewa ku Vî daye te, Xwe dê hez li ewên xwe
xapandî û qude naket 24 û ewên ku qurnûsin[a] û destûra qurnûs bûnê
didene mirova û her kesê ku pişta xwe bidetê, bes birastî Xwe dê çi pêvîstî
nînin û jêhatiyê pesnê ye.
25 Bêguman Me peyamberên Xwe bi belgeyên zelal şandin û Me digel
wan nivîsîna pîroz şand û havsengî, belke liber hindê mirov dadweriyê
damezrînin û Me asin şande têda bi hêza wê ya gelek bi qawet û
berjewendî bo mirova, li ber hindê ku Xwe dê bidete zanîn kanê kê dê
neditî yarmetiya Vî û peyamberên Vî biket. Birastî Xwe dê Qewiyê û
Gelek Bihêze. 26 Bêguman Me Nûh û Ibrahîm şandin û Pêşbînî û nivîsînên
pîroz dana naw paşketiyê ewan da, li naw ewan da, ewên rênivînî kirî
hene lê piraniya wan bi pêdagirî serkêşin.

a: Mirovê destmiçî, ewê ku nadet

[27] Paşê Me peyamberên dîke şandin ku şûna pêyê wan bişopînin û Me pê
Îsayê kurê Miryemê şopand û Me Mizgînî (Incîl) dayê da û Me mêhrevanî
û rehm danaye dilê ewên ku peyrevî li wî diken, lê rêbaza waz înan li
xweşiyên dinyayê û xwe radest kirina Xwe dê tiştek bû ku ewan bixwe
berhem înaye[a] û Me destûra wê nedabû wan, tenê li ber hindê ku
keyfxweşiya Xwe dê bidest xwe we bînin, lê ewan bi serûberî çavdêriya wê
jî nekir. Lewma Me padaşê ewên ku li naw ewan da bawer kiribûn daye
wan, lê piraniya wan bi pêdagirî serkêşin.
[28] Hûn ku bawer diken hişyarê Xwe dê bin û bawerî bi peyamberê Vî
biken, Ev dê du qata li pişka rehma Xwe bidete we û Ev dê ronahiyekê
jibo we çêket ku hûn pê rêkê biçin û Ev dê li we bibhorît, Xwe dê
Lêbihore û Rehmê didet. [29] Belke liber hindê Mirovên nivîsîna pîroz
bizanin ku ewan çi desthilat li ser hîç yêk li qenciyên Xwe dê, da çinînin û
qencî li destê Xwe dê daye. Ev didete her kesê ku Ev dixwazît û
Xwe dê Xwedanê qenciya gelek mezine.

a: Rahib

## 58. Para Gengeşê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bêguman Xwe dê gotinên ewa ku sebaret bi mêrê xwe digel te gengeşe kiribû û gazindê xwe bo Xwe dê diket, Xwe dê bihîstiye ku we her du ya çi bo gotinê hebû. Birastî Xwe dê Bihîstin û Dîtine.
[2] Ewên ku li naw weda dibêjine jinên xwe, ´Tu bo min, wek pişta
dayka minî,´ Ew daykê wan nînin, daykên wan tenê ewin ku ew zane û
birastî ewa ku ew dibêjin, gotineke nebaşe û direweke û birastî Xwe dê
Lê xweş dibît û Lê dibhorît. [3] Ewên ku li naw we da, dibêjine jinên xwe
´Tu bo min, wek pişta dayka minî,´ Paşê li ser ewa ku wan gotiye
dizivrin, dibya bindestekê serbest biken, pêş ku ew destê xwe bidene
hevdu, fermana evê li we tête kirinê û Xwe dê agahdarê ewê ye ku hûn
diken [4] lê her kesekê ku peyda naket, dibya bi berdewamî bo du manga
rojî bît,  pêş ku ew destê xwe bidene hevdu û her kesê ku neşêt, dibya
xwarinê bidete şêst mirovê hejar. Ewe li ber hindê ye belke hûn bawerî
bi Xwe dê û peyamberê Vî biken û ewane sînorên Xwe dê ne û jibo
nebawera eşkenceyeke dijwar heye [5] Birastî ewên ku dijatiya Xwe dê û
peyamberê Vî diken, dê bêne nizim kirin, weke ewên pêş wan da
hatibûne nizim kirin û bêguman Me eşkereyên zelal şandine xarê û
nebawera dê eşkenceyeke serşorker hebît [6] Roja ku Xwe dê, dê
hemûya vejînît û ewan agahdarê ewa ku wan kiriye biket, Xwe dê
hisab kiriye, dema ku ewan li bîr kiriye û Xwe dê  li ser hemû tişta
gewahe. [7] Meger tu nabînî ku Xwe dê bi ewa ku di asimana û bi ewa
ku di erdê da heye dizanît. Çi gotûbêjeke nepenî  ya sê ya çinîne ku Ev
yê çarê nebît, nejî pênca ku Ev yê şeşê nebît, nejî li ewê kêmtir yanjî
zêdetir, bêy ku Ev digel wan da bît, li her derê ku ew lê bin, paşê Ev dê
wan agahdar biket sebaret bi ewa ku wan kiribû li Roja Vejiyanê da,
birastî Xwe dê zanista li ser hemû tişta heye.[8] Meger tu ewan nabînî
ewên ku gotibêjê nepenî[a] li wan hatiye qedexe kirin, paşê ew dizivrine ewa ku li wan hatiye qedexe kirin û jibo gunehê, dijmindariyê û serkêşiyê li dijî peyamber gotubêja nepenî diken? Dema ku ew têne bal te, bi ewê rewşa te dipirsin ku Xwe dê bi ewê rewşa te napirsît û li naw xwe da dibêjin, ´Çima Xwe dê me siza nadet, li ber xatira ewa ku em dibêjin?´ Cehnem têra wan heye, ew dê li wêderê da bişewtin û armanceke nebaşe.

a: Bi dizî ve, bi nihênî, weşartî

[9] Hûn ku bawer diken dema ku hûn gotubêjên nepenî diken, bes
gotubêjên nepenî neken bo gunehê, dijmindarî û serkêşî li dijî
peyamber têda hebît, lê gotubêjên nepenî biken jibo durustkariyê û
hişyariyê. Hişyarê Xwe dê bin, Ev ê ku hûn dê bêne kom kirin jibo bal
Vî.[10] Gotubêjên nepenî tenê li Şeytaniye ku ewên bawer diken xemgîn
biket lê, ew nikarît çi zirarê li wan bidet, xêncî bi destûra Xwe dê. Bila
bawermend xwe bispêrine Xwe dê. [11] Hûn ku bawer diken, dema ku
dibêjine we di kom bûnên xwe da, ´Cih weken´ Bes cih weken, Xwe dê
dê bo we cih weket û dema dibêjin ´Rabine ser xwe,´ Bes rabine ser
xwe, Xwe dê, dê ewên ku li naw weda bawer diken bilind biket û ewên
ku zanist bi wan hatiye dan pê pileya. Xwe dê agahdare li ser ewa hûn
diken. [12] Hûn ku bawer diken, dema ku hûn bi nepenî gotubêjê digel
peyamber diken, pêş gotubêja xwe ya nepenî, xêrekê biken, eve jibo we
bêhtire û paktire, eger tu peyda nekey, bes birastî Xwe dê Lêbihore û
Rehmê didet. [13] Meger dana xêrê pêş gotubêja nepenî da hûn şepirze
kirin? Bes dema ku hûn naken Xwe dê li we bihoriye, bes nûbêjê biken
û ew xêra ku bo we hatiye dîhar kirin biden û peyrevî li Xwe dê biken
û peyamberê Vî jî, Xwe dê agahdarê ewê ye ku hûn diken.

[14] Meger te ew nedîtine ku neteweyekê weke hevpeyman werdigin ku
kerbê Xwe dê li ser ewane? Ew li we nînin û ne li wanin û ew sûnd bi
direwê dixwen dema ku dizanin. [15] Xwe dê eşkenceyeke dijwar bo
wan amade kiriye, birastî ewa ku wan dikir nebaş bû. [16] Ewan sûnda
xwe jibo weşartinê bikar înaye ku pê rêgiriyê li rêya Xwe dê biken.
Lewma ewan dê eşkencyeke serşorker hebît. [17] Çi cara malê wan û
zarûkên wan, dê li dijî Xwe dê qazanca tiştekê bigehînîte wan, ew
hevrêyên naw agir da ne û ew dê ta bêdawiyê li wêderê da bimînin.
[18] Roja ku Xwe dê ewan hemûya li mirinê vedjînît. Ew dê bo Vî sûnd
bixwen, her wek ew bo we sûnd dixwen û ew hizir diken ku ew li ser
tiştekê ne. Bêguman, birastî ew direwa diken! [19] Şeytan desthilat li ser
ewan da peyda kiriye û wel wan kiriye ku bîr anîna Xwe dê li bîr
biken. Ew li aliyê[a] Şeytan ne û bêguman birastî ewên aliyê Şeytan dê
bidorînin.



a: Jibo peyva Hizib min alî bikar înaye

[20] Birastî ewên ku dijatiya Xwe dê û peyamberê Vî diken, ew dê li naw
ewên ku dê gelek bêne serşor kirin da bin. [21] Xwe dê nivîsiye,
´Bêguman Ez dê serkevim, Ez û peyamberên Min.´ Xwe dê Qewî û
Bihêze.
[22] Hûn neteweyekê peyda naken ku bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê
hebin û hez ewan biken ku dijatya Xwe dê û peyamberê Vî diken,
eger ew babên wan jî ban, yanjî kurên wan yanjî birayên wan yanjî
eşîreta wan, ewane ewin ku Vî bawerî di dilên wan da nivîsiye û Ev pê
rihekê li bal Xwe we piştîvaniya wan kiriye û Ev dê ewan wergrîte
naw baxçeyên ku çem li bin da diherikin û ta bêdawiyê wêderê da
bimînin, Xwe dê digel wan keyfxweşe û ew jî digel Vî. Ew li aliyê[a]
Xwe dê ne û bêguman birastî aliyê Xwe dê, dê behremend bît.



a: Jibo peyva Hizib min alî bikar înaye

## 59. Para Kom bûnê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Paye bilindiya Xwe dê diket, ewa di asimana da û ewa di erdê da, Ev Bihêze
Biryardere. 2 Ev bû ku li yêkem kom bûnê da ewên nebawer li naw mirovên
nivîsîna pîroz li malên wan da kirine derê, we hizir nedikir ku ew dê biçin û
ewan jî hizir dikirin ku kelehên wan, dê ewan li dijî Xwe dê da biparêzît, lê
Xwe dê hate ser wan, li cihekê ra ku ewan çavnihêrî lê nedikir û tirs havête
naw dilê wan da, ewan malên xwe, bi destê xwe û bi destê bawermenda
wêran kirin. Li ber hindê hûn, ewên ku dîtin hene waneyekê[a] wergirin!
3 Eger Xwe dê jibo wan kirine der ne nivîsîba, Vî dê ew li dinyayê da eşkence
daban û di Dawiyê da, ewan dê eşkenceya agir hebît. 4 Çimkî ewan dijayetiya
Xwe dê û peyamberê Vî kirin û her kesê ku dijayetiya Xwe dê biket, bes
birastî Xwe dê gelek bi dijwarî siza didet. 5 Her tiştek ku we li dare xurma
kiribît, yanjî hêlabît ew li ser reha xwe bimînin, ew bi destûra
Xwe dê hatibû kirin, belke liber hindê Ev, ewên ku bi pêdagirî serkêşin serşor
biket. 6 Ewa ku Xwe dê li wan daye peyamberê Xwe, bes we hespê xwe
nehajotibûne ser, nejî hêştir, lê Xwe dê destihilatê didete peyamberê Xwe, li
ser her kesê ku Ev dixwazît û Xwe dê desthilat li ser hemû tişta da heye.
7 Ewa ku Xwe dê li rûniştiyên gunda daye peyamberê Xwe, bo
Xwe dê û peyamberê Vî ye û mirovên xizim, sêwiya, hejar û rêviya[b] ye, ew li
ber hindê ye ku ev li naw ewên heyî li naw we da nezvrît, her tiştekê ku
peyamber bidete we wergirin û her tiştekê ku ew li we qedexe diket xwe lê
biparêzin. Hişyarê Xwe dê bin, birstî Xwe dê gelek dijware li siza danê da.
8 Jibo hejar û koçberên ku li mal û heyî ê xwe hatibûne der kirin, li qenciya
Xwe dê digerên û pejirandinê û yarmetiya Xwe dê û peyamberê Vî diden,
ew li rastbêja ne. 9 Ewên ku li malên xwe da runiştibûn û pêşta bawer kirbûn,
hez ewan diken ku koçberî bal wan bûne û çi daxwaza di singê xwe da peyda
naken, li ber ewa ku dayne wan. Ew li serwey xwe da, derfetê didene wan,
tenanet eger ew bixwe jî hejar bin, ewên ku li çavbirsîtiya riha xwe têne
parastin, ew bi rastî serkevtî ne. 10 Ewên ku li paş ewan da hatin dibêjin
´Xwedanê me li me bibihore û li birayên me jî ku li baweriyê da pêş me ketin
û jibo aliyê ewên ku bawer kirîne çi taliyekê nehawêje dilê me da. Xwedanê
me birastî Tu Mêhrevanî û Rehmê didey.´

a: Ders b: Ewên ku li seferê da ne

[11] Meger we, ewên durû li ber çav girtine ku dibêjine birayên xwe, ewên ku
bawer naken li naw mirovên nivîsîna pîroz da, ´Eger hûn bêne der kirin,
bêguman em jî dê gel we bên û sebaret bi we, em çi cara peyrevî li kesê naken
û eger şerê we kirin, bêguman em dê harî we biken´ Xwe dê gewahiyê didet
ku ew direwînin, [12] Eger ew hatine der kirin, ew digel wan da naçin û eger
şerê wan kirin, ew yarmetiya wan naken û eger ew yarmetiya wan jî biken,
bêguman ew dê pişta xwe bidenê û paşê yarmetiya wan nayête kirin.
[13] Bêguman tirsa we di singê wan da gelek xurtire li tirsa Xwe dê, ew
neteweyekin ku tênagehin. [14] Ew hemû şerê we naken xêncî li naw gundên bi
keleh we yanjî li pişt dîwara we nebît. Tund û tîjî li naw ewan da dijware, hûn
hizir diken ku ew yêkgirtî ne, lê dilê wan li hevdu cuda ne, çimkî ew
neteweyekin ku hizir naken. [15] Wek mînaka ewên bi nêzîkî li pêş ewan da,
ewan berhema nebaşa mijarên xwe tam kirin û ewan dê eşkenceyeke bijan
hebît. [16] Mîna Şeytan, dema ku dibêjîte mirov, ´Bawer neke!´ Lê dema ku ew
bawer naket, ew dibêjît, ´Birastî ez te bêxwedan dihêlim, birastî ez li Xwe dê
ditirsim, Xwedanê hemû dinyaya,´ [17] Liber wê hindê, dawiya her duya ewe ku
ta bêdawiyê dê li naw agir da bin, ewe padaşê nebaşkara ye. [18] Hûn ku bawer
diken! Hişyarê Xwe dê bin û bila hemû rihek lê binhêrît ku çi şandiye sibê û
hişyarê Xwe dê bin, birastî Xwe dê agahdarê ewêye ku hûn diken.
[19] Nebine weka ewên ku Xwe dê li bîr diken, lewma Ev wel wan kir ku ew xwe
li bîr biken! Ew bi pêdagirî serkêşin, [20] hevrêyên naw agir da digel hevrêyên
naw baxçe da wekhev nînin, hevrêyên naw baxçe da dest xwe tînin.
[21] Eger Me ev Xwandine (Qurane) bo çiyayekê şandiba xarê, we dê dîtiba ku
ew dê ûstîxar biba û li tirsê Xwe dê, da ew dê hûr hûr ba, Em mînakên wisa
didene mirova, belke li ber hindê ew hizra xwe lê biken. [22] Ev Xwe dê ye û çi
xwedêyên dîke li xêncî Vî çinînin, zanayê ewa nedîtî û gewahî li ser dayî, Ev
Xwedanê Rehmê ye û Rehmê didet. [23] Ev Xwe dê ye, çi xwedêyên dîke li
xêncî Vî çinînin, Padişahe, Pîroze, Aştiyê didet, Dabînkerê tenahiyê,
Parêzere, Bihêze, Zordare, Mezine, Xwe dê paye bilinde li serwey ewa ku
dikene ´heval´ê Vî. [24] Ev Xwe dê ye Afrînere, Dahînere, Şêwedere, navê
ciwan jibo Vî ne, ewa di asimana û erdê da Vî paye bilind diket, Ev Bihêze
Biryardere.

## 60. Para Ew Jina ku dê bête Taqî kirinê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Hûn ku bawer diken, dijminên Min û dijminên xwe nekene piştîvan, xweşevîstiyê
nîşa wan neden, dema ku ewan bawerî bi eva ku li rastiyê jibo we hatiye nekiriye û we
û peyamber dikene derê, liber hindê ku hûn bawerî bi Xwe dê Xwedanê xwe diken.
Eger hûn bêne derê û li rêya Min da têkoşanê biken û li pejirandina Min bigerên.
Hûn bi dizîve bêjine wan ku hûn hez wan diken, lê Ez dizanim ewa ku hûn diweşêrin
û ewa hûn aşkira diken û her kesê li naw weda biket, bes bêguman ew li rêya rast
derketiye. 2 Eger ew serdestiyê li ser we da biken, ew dê bibine dijminên we û dê bi
nebaşî destê xwe dirêj we biken û zimanê xwe jî, ew awat dixwazin ku hûn bawer
neken. 3 Ne xizmên te dê qazancê bigehînine te, nejî zarûkên te, li Roja Vejiyanê da,
Ev dê li nawbera we da dadweriyê biket. Xwe dê ewa ku hûn diken dibînît.
4 Bêguman we mînakek baş li Ibrahîm da û ewên digel wî da heye, dema ku wan gote
netewa xwe, ´Birastî em xwe li we û ewa ku hûn li kêleka Xwe dê, da diperestin
nakene xwedan! Me nikolî li we kiriye û ta bêdawiyê li nawbera me û li nawbera we
da dijminatî û kîn peyda bûye takû hûn tenê bawerî bi Xwe dê diken!´ Xêncî gotina
Ibrahîm bo babê xwe, ´Bêguman ez daxwaza lêbihorînê jibo te dikem, lê min jibo te
desthilata çi tiştê li Xwe dê nîne ´ ´Xwedanê me, em xwe dispêrine Te û em dizivirine
bal Te û armanc jibo bal Te ye. 5 Xwedanê me, me neke taqî karî jibo ewên ku
bawera naken. Xwedanê me li me bibhore, birastî Tu Bihêzî Biryarderî.´ 6 Bêguman
jibo we li ewan da mînakeke baş heye, jibo ewên ku hêviya wan Xwe dê û roja
Vejiyanê ye û her kesê ku pişta xwe bidetê, bes Xwe dê çi pêvîstî nînin û jêhatiyê
hemû pesna ye.
7 Reng bît Xwe dê xweşevîstiyê bêxîte nawbera we û nawbera ewên ku hûn digel wan
da dijmin bûne li naw ewan da, Xwe dê Xwedan şêyane, Xwe dê Lêbihore û Rehmê
didet 8 û Xwe dê li we qedexe naket li ewên ku li ser xatira dînê we digel we şer naken
û we li malên we nakene derê ku digel wan mêhrevan bin û dadperwer bin, birastî
Xwe dê hez ewên dadperwer diket. 9 Xwe dê tenê li we qedexe diket, li ewên ku li ser
xatira dînê we digel we şer diken û we li malên we dikene derê û yarmetiya der kirina
we diken ku hûn bikene hevpeyman û her kesê ku ewan bikete hevpeyman, bes ew
nerastkarin.



*Taqî kirin yanî îmtihan kirin, ceribandin.

[10] Hûn ku bawer diken, dema ku jinên bawermendê koçber têne bal we, ewan taqî
biken, Xwe dê bi baweriya wan dizanît û eger hûn dizanin ku ew bawermendin bes
ewan nezivrînine bal nebawera, ew jibo wan qanûnî nînin, nejî ew[a] jibo wan qanûnî
ne, lê bidene wan, ewa ku wan daye û çi guneh li ser we nîne eger hûn digel wan
jiyana hevbeş pêk bînin, dema ku te xelatê bûkiniya wê dabît[b], jinên nebawer pê
girêya jiyana hevbeş xwedan neken, lê daxwaza ewa ku we daye biken û bihêlin ku
ew[c] jî daxwaza ewa ku wan daye biken. Eve dadweriya Xwe dê ye, Ev li nawbera we
da dadweriyê diket, Xwe dê Zanaye, Dadwere.
[11] Eger her jineke we çoye bo nebawera, dema ku dora we têt, hûn jî her wisa bidene
ew kesên ku jinên wan çoyne, ewa ku wan dabû û hişyarê Xwe dê bin, Ev ê ku hûn
baweriyê pê diken. [12] Pêşbîn[d], dema ku jinên bawermend têne bal te û digel te
peymanê girê diden ku ew çi ´heval´ a jibo Xwe dê peyda naken, diziyê naken, dawên
pîsiyê naken[e], zarûkên xwe nakujin û boxtanekê berhem naynin li naw dest û pêyê
xwe da[f] û li hîç tişteke serast da serkêşiyê li te neken, bes peymana wan bipejirîne û li
Xwe dê jibo wan daxwaza lê bihorînê bike, birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet.
[13] Hûn ku bawer diken, digel neteweyekê ku kîna Xwe dê li ser wane hevpeymaniyê
girê neden, birastî ew li Dawiyê bêhêvî ne, her wek ku nebawer li hevrêyên di gorê da
bêhêvî ne.



a: Mirovên nebawer
b: Mahreyî
c: Mirovên nebawer
d: Nebî, Peyamber, lêre base Mihemed peyambere
e: Xêncî hevjînê xwe ganê nadene kesê, zina.
f: Li gor gotina Ebdil Helîm, ´Boxtanekê naw dest û pêyê xwe da berhem neynin´, gotineke kevnarê erebaye, yanî bi direw nebêjin ku çi kesek babê zarûkê wane.

## 61. Para Rêz a

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Xwe dê paye bilind diket ewa di asimana û ewa di erdê da, Ev Bihêze
Biryardere. 2 Hûn ku bawer diken, çima hûn dibêjin ewa hûn naken?
3 Gelek kerbê mezine li bal Xwe dê ku hûn dibêjin ewa hûn naken,
4 birastî Xwe dê hez ewan diket ku li rêza da, li rêya Vî da şer diken, weke
awahiyên gelek peyt.
5 Dema ku Mûsa gote netewa xwe, ´Netewa min, hûn çima min dêşînin,
dema ku hûn dizanin ez peyamberê Xwe dê me jiboy we?´ Paşê dema ku
ew li rê derketin, Xwe dê dilê wan li rê derêxistin, Xwe dê netewa ku bi
pêdagirî serkêşe rênivînî naket. 6 Dema ku Îsayê kurê Miryemê got,
´Zarûkên Israîl, birastî ez peyamberê Xwe dê me jiboy ku Rênivîniya
(Torata) ku li pêş min da hatibû piştrast dikem û mizgîniya peyamberekê
jî didem ku dê li paş min bêt, dê navê wî Ehmed bît.´Lê dema ku ew bi
nîşaneyên zelal hate bal wan, ewan got, ´Eve bi zelalî cadû ye.´ 7 Kê li ew
bêdadtire ku sebaret bi Xwe dê direwa berhem tînît, dema ku ew tête gazî
kirin ku xwe radestê Vî biket[a]? Xwe dê neteweya nerastkar rênivînî naket,
8 ew dixwazin ku pê devê xwe ronahiya Xwe dê vemirînin. Lê
Xwe dê, dê ronahiya Xwe tewaw ket, herçend ku kerbê nebawera jî lê
vebît, 9 Ev e ku peyamberê Xwe bi rênivînî û dînê rast şand ku serwey
hemû dîna bêxît, herçend ku kerbê ewên ku ´heval´a bo Vî peyda diken lê
divebît. 10 Hûn ku bawer diken, ez we rênivîniyê danûstandinekê bikem ku
dê we li eşkenceya dijwar rizgar biket? 11 Bawerî bi Xwe dê û peyamberê
Vî biken û pê mal û canê xwe li rêya Xwe dê da, têkoşînê biken, eve bo
we bêhtire, bes eger hûn bizanin, 12 Ev dê li gunehên we bibhorît û we
vergirîte naw baxçeyên ku çem li bin da diherikin û avahiyên xweş li naw
baxçeyên bêpayan da, eve destkevtekê gelek mezine 13 û ewa dîke ku hûn
hez lê diken, yarmetiya li bal Xwe dê û serkevtina nêzîke! Mizgîniyê bide
bawermenda! 14 Hûn ku bawer diken, bibine yarmetîderê Xwe dê.
Herwek ku Îsayê kurê Miryemê gote şagirta[b], ´Kê yarmetîderê minin
jiboy Xwe dê?´ Şagirtan got, ´Em yarmetîderê Xwe dê ne.´ Paşê komekê[c]
li zarûkên Israîl bawer kirin û komekê[c] jî nekirin. Me piştîvaniya ewên ku
bawer kirî li dijî dijminên wan kir û ew bûne serdest.



a: Mosliman
b: Qotabî, ewê dersa distînît, xwendevan, ewê ku fêr dibît
a: Jibo peyva Tayfe min peyva Kom bikar înaye.

## 62. Para Civat ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Paye bilindiya Xwe dê diket ewa di asimana û ewa di erdê da, Padişahe,
Pake, Bihêze, Biryardere. 2 Ev e ku peyamberek li ewan bixwe, bo ewên
nexwendevar şande naw ewan da ku eşkereyên[a] Vî jibo wan bixwînît,
ewan pak biket û ewan fêrî nivîsîna pîroz ya têgeheştinê biket, herçend ku
pêşta ew bi zelalî di şaşiyê da bûn 3 û jiboy ewên dîke jî ku hêşta têkel
ewane nebûne, Ev Bihêze Biryardere, 4 eve Qenciya Xwe dê ye ku Ev
didete her kesê ku Ev dixwazît, Xwe dê Xwedanê qenciya gelek mezine.
5 Mînaka ewên ku Rênivînî (Toratê) bi wan hatibû sipartin, paşê ewan
hilnegirt, weka kerekê ku barê pirtûka hildigrît, nebaşe mînaka
neteweyekê ku nikoliyê li nîşaneyên Xwe dê diket û Xwe dê rênivîniya
neteweya nerastkar naket.
6 Bêje, ´Hûn ku peyrevî li rênivîniyê diken (Cihû), eger hûn dibêjin ku hûn
piştîvanê Xwe dê ne û mirovên dîke naw da diderêxin, bes hêviya mirinê
bixwezin, eger hûn rast dibêjin.´ 7 Lê ew çi cara hêviya wê naxwazin, li
ber xatira ewa ku destê wan pêşta şandiye û Xwe dê ewên nerastkar nas
diket 8 lewma bêje, ´Birastî mirina ku hûn lê direwin, bêguman ew dê we
bibînît û paşê hûn dê bêne zivrandin bo bal Zanayê eva nedîtî û Gewah û
Ev dê we agahdar biket ku we çi dikir.´
9 Hûn ku bawer diken! Dema ku di roja civatê[b] da, banga nûbêjê hate
dan, bes lezê lê biken jibo bîranîna Xwe dê û dest li kar berden eve jibo
we bêhtire, eger hûn bizanin.10 Paşê dema ku nûbêj tewaw bû paşê li ser
erdê da belav bin û li qenciyên Xwe dê bigerên û gelek cara Xwe dê bîr
bînin, belke li ber hindê hûn behremend bin. 11 Lê dema ku ew,
danûstandin yanjî li rê derketinê[c] dibînin ew direwine aliyê wê û te li
wêderê tenê dihêlin. Bêje, ´Eva li bal Xwe dê li rê derketin û
danûstandinê bêhtire, Xwe dê li bêhtrîn dabînkara[d] ye!´



a: Ayet, gotinên Xwe dê.
b: Roja înê, roja cumê.
c: Min peyva Lewh li erebî da bi li rê derkewtin wergêraye, li rêya hişariya Xwe dê derkewtin.
d: Min peyva Rezaq, bi Dabînkar wergêraye. Ev ê ku pêvîstiya dabîn diket.

### 63. Para Ewên durû

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Dema ku ewên durû[a] têne bal te, dibêjin, ´Em gewahiyê diden ku tu
peyamberê Xwe dêy.´ Xwe dê dizanît ku tu peyamberê Vî û Xwe dê
gewahiyê didet ku ewên durû direwînin. 2 Ewan sûnda xwe weke perjînekê
bikar înayne û pêşgîriyê li rêya Xwe dê diken û birastî nebaş bû ewa ku wan
dikir 3 ewe liber hindê ye ku ewan bawer kir û paşê jî bawer nekirin, li ber
hindê dilê wan hate pêçan, lewma ew tênagehin. 4 Dema ku tu ewan dibînî,
cendekê[b] wan te keyfxweş diket û eger ew bipeyvin, tu guhê xwe dideye
gotinên wan. Lê tu dibêjî qey ku darikin li ser pêya ragirtine, ew hizir diken ku
hemû qêrînek li dijî ewane. Ew dijminin, lewma agahdarê ewan be,
Belke Xwe dê ewan li nav bibet, ew çawa hatine xapandin 5 û dema ku
dibêjine wan,´Werin peyamberê Xwe dê, dê bo we daxwaza lêbihorînê biket´
Ew serê xwe dizvrînin. Tu dibînî ew pêşgîriyê diken, dema ku ew xwe mezin
diken. 6 Jibo wan her wekheve, çi tu daxwaza lêbihorînê bo wan bikey yanjî
bo wan daxwaza lêbihorînê nekey, Xwe dê çi cara li wan nabihorît, birastî
Xwe dê neteweya ku bi pêdagirî serkêşe rênivînî naket.
7 Ew li wanin ku dibêjin, ´Nedene ewên ku digel peyamberê Xwe dê ne, taku
ew waz lê tînin,´ Lê xizîneyên asimana û erdê yê Xwe dê ne, lê ewên durû
tênagehin, 8 ew dibêjin, ´Eger em bizivirine Medînê, bêguman dê ewên bihêz
dê ewên bêhêz têda bikene der´ Lê hêz ya Xwe dê, peyamber û bawermenda
ye, lê ewên durû nizanin. 9 Hûn ku bawer diken, nehêlin ku ne malê we, nejî
zarûkên we pêşgîriya we li bîr anîna Xwe dê biken û her kesê ku evê biket, bes
ew dê bidorînît. 10 Biden li ewa ku Me jibo we dabîn kiriye, pêş ku mirin bête
ser yêk li we û ew dê bêjît, ´Xwedanê min, çima jibo demekê kurt, Tu min
gîro nakey ku ezê xêra bikem û bibime li naw ewên dirustkar da,´
11 Lê Xwe dê çi cara rihekê gîro naket, dema ku dora wi hatiye û Xwe dê
dengubasê ewa ku hûn diken heye.



a: Jibo peyva Monafêq, min Durû bikar înaye.
(Durû yanî ew mirovê ku gotina devê wî û mebesta dilê wî yêk nîne)
b: Cisim, beden, laş, heykel.

## 64. Para Dest lê berdana Hevbeş

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Paye bilindiya Xwe dê diket ewa di asimana da û ewa di erdê da, padişahî ya Vî ye û
pesn ya Vî ye û Vî şêyan li ser hemû tişta heye. [2] Ev e ku hûn afirandine û li naw we
da nebawer hene û li naw we da bawermend jî hene, Xwe dê ewa ku hûn diken
Dibînît. [3] Ev afrînerê asimana û erdê li rastiyê daye û Ev şêwe da we û şêweyê we baş
kir û armanc jibo bal Vî ye. [4] Ev dizanît ku çi di asimana û erdê da heye. Ev dizanît ku
hûn çi diweşêrin û hûn çi aşkira diken. Xwe dê dizanît ku di singa da çi heye.
[5] Meger nûçeya ewên ku pêş we da bawer nekiribûn jibo we nehatiye?
Ewan berhema mijara xwe tam kirin û ewan dê eşkenceyeke bijan hebît.
[6] Ew li ber hindê ye ku peyamberên wan pê belgeyên zelal hatine bal wan, lê ewan
got, ´Meger bimir dê me rênivînî biken?´ Lewma ewan bawer nekirin û pişta xwe
danê û Xwe dê çi pêvîstî bi wan nebû, Xwe dê çi pêvîstî nînin û jêhatiyê pesnê ye.
[7] Ewên nebawer radgehînin, ´Ew çi cara nayêne vejandin.´ Bêje, ´Belê bi Xwedanê
min! Bêguman hûn dê bêne vejandin û hûn dê bêne agahdar kirin sebaret bi ewa ku
we kiriye û ew jiboy Xwe dê hêsane.´ [8] Lewma bawerî bi Xwe dê û peyamberê Vî
biken û ronahiyê jî ku Me şandiye xarê û Xwe dê deng û basê ewa hûn diken dizanît.
[9] Roja ku Ev dê we kom biket jibo Roja kom bûnê, ew Roja hem zirarê û hem jî
qazancê ye, her kesê ku bawerî bi Xwe dê biket û karên durust biket Ev dê kiryarên wî
yên nebaş li wî bimalît, Ev dê wi vergirîte naw ew baxçeyan da ku çem li bin da
diherikin û ta bêdawiyê li wêderê da bimînît, eve destkevta gelek mezine.
[10] Lê ewên ku bawer nekirin û nikolî li eşkereyên Me kirin, ew hevrêyên naw agir
da ne û ta bêdawiyê dê li wêderê da bimînin û armanceke nebaşe. [11] Çi karesat rû
nadet xêncî bi destûra Xwe dê nebît û her kesê ku bawerî bi Xwe dê biket, Ev
dilê ew rênivînî diket, Xwe dê hemû tişta dizanît [12] lewma peyrevî li Xwe dê bike
û peyrevî li peyamber bike, lê eger tu pişta xwe bideyê, bes li ser peyamberê Me,
tenê ragehandina zelale. [13] Xwe dê! Çi xwedê nînin bes Ev nebît, lewma bila
bawermend xwe bispêrine Xwe dê.
[14] Tu ku bawer dikey, birastî li naw hevjîn û zarûkên te da jî, te dijmin hene,
lewma agahdarê wan be, lê eger tu lê xweş bî û pişt guhê xwe we havêjî û lê
bibhorî, bes birastî Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet. [15] Heyî û zarûkên we tenê
bo we ezmûneke. Padaşê li bal Xwe dê gelek mezintirin [16] Lewma hişyarê Xwe dê
be hindî tu bikarî û guhê xwe bidê û peyreviyê bike û bide, ew jibo te bixwe
bêhtire. Ewên ku riha xwe li qornûs bûnê rizgar kirine bes ew dê behremend bin,
[17] eger tu deyneke baş bideye Xwe dê, Ev dê bo te lê zêde biket û Ev dê li te
bibhorît, Xwe dê Sipasdare, Pêdagire, [18] Zanayê eva nedîtiye, Gewahe, Bihêze,
Biryardere.

## 65. Para Berdanê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Pêşbîn, dema ku hûn jina ber diden, bes ewan bo dema wan ya destnîşan kirî
berden û dema wan ya destnîşan kirî bihejmêrin û hişyarê Xwe dê bin, Xwedanê
we! Ewan li malên wan nekene der, nabît ew bixwe jî biçin, meger ku ew bi zelalî
dawên pîsiyê biken û ewane sînorên Xwe dê ne û her kesê ku sînorên Xwe dê
bibezînît, bêguman ew nerastî li riha xwe kiriye. Tu tênagehî, belke Xwe dê, dê
rûdawekê bînîte pêş, paş ev mijarê. [2] Dema ku ew geheştine dema xwe ya
destnîşan kirî, yan bi mêhrevanî ewan xwedan biken yanjî bi mêhrevanî li wan
cuda bin û du mêrên dadperwer li naw xwe da gewah bigrin û bo Xwe dê
gewahiyê biden. Eve fermane li ser her kesê ku bawerî bi Xwe dê û Roja dawiyê
diket û her kesê ku hişyarê Xwe dê ye, Ev dê rêyekê bo wan peyda biket [3] û dê
jibo wî dabîn biket li cihekê ra ku ew çavnihêrî lê naket û herkesê ku xwe bispêrîte
Xwe dê, Ev têra wi heye, birastî Xwe dê mebesta Xwe bicih tînît, bêguman
Xwe dê jibo hemû tişta pîvanek dîhar kiriye. [4] Ewên ku li rewşa mangane li naw
jinên xwe da bêhêvî bûne, eger we guman heye, bes dema rawestana[a] wan dê sê
mang bin û jibo ewên ku rewşa wan ya mangane destpê nekiriye û ewên pêgiran,
dema wan dê heta zanê bît û her kesê ku hişyarê Xwe dê bît Ev dê jibo wi mijara
wi hêsan biket. [5] Eve destûra Xwe dê ye ku Ev jibo we şandiye xarê û her kesê
hişyarê Xwe dê bît Ev dê kiryarên wi yên nebaş li ew bimalît û dê padaşê wi jibo
wi gelek mezin biket. [6] Li ew cihê ku hûn têda dijîn ewan xwedan biken pêka
şêyanên xwe û zirarê li wan neden ku wan şepirze biken, eger ew li ewên pêgiran
bin bes bidene wan[b], taku ew dizên, paşê eger ew jibo we bimijînin[c] bes dirafê
wan bidene wan û bi mêhrevanî digel hevda ravêjê biken lê eger hûn bi yêk
neken bila yêke dîke bo wî bimjînît [7] û bihêlin bila mêrê heyî pêka heyiyê xwe
biden û ewê ku debarên wî kêmin, bihêlin bila bidet li ewa ku Xwe dê daye wî,
Xwe dê bar[d] nadete hîç rihekê xêncî ewa ku Ev daye wî, piştî dijwariyê Xwe dê,
dê hêsaniyê bînît. [8] Çend gunda li dijî fermana Xwedanê xwe û peyamberên Vî
ser hildan û Me jî hisab kir, pê hisabek dijwar û eşkence da, pê eşkenceyek nebaş,
[9] lewma tam kir, berhema mijara xwe û dawiya mijara wan dorandin bû.



a: Xwîn rêjî ya mangane
b: Nefeqe, pare bidene wan ku xwe pê xwedan biken.
c: şîrê xwe bidene zarûk.
d: Jibo peyva teklîf min peyva Bar bikar înaye.

[10] Xwe dê eşkenceyeke dijwar bo wan amade kiriye. Lewam hişyarê Xwe dê bin,
hûn ku we têgeheştin heye, ewên ku bawer diken, bêguman Xwe dê jibo we
bîranînek şandiye xarê, [11] peyamberek jî ku bi zelalî eşkereyên Xwe dê bo we
dixwînît, belke ew, ewên ku bawer diken û karên dirust diken, li tarîtiyê da
derêxîte ber ronahiyê û her kesê ku bawerî bi Xwe dê diket û karên dirust diket,
Ev dê wi, vergrîte naw baxçeyan da ku çem li binda diherikin û ta bêdawiyê ew
dê li wêderê da bimînin, bêguman Xwe dê, dê debarên baş bo wan hebin.
[12] Xwe dê ye Evê ku heft asiman û ewa di erdê da afirandiye, herwek wan jî,
ferman li naw wan da tête xar. Bila li ber hindê hûn bizanin ku Xwe dê desthilat
li ser hemû tişta da heye û bêguman Xwe dê hemû tişt pê zanistê dorpêç kirîne.

## 66. Para Qedexe kirin

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Pêşbîn[a], tu çima qedexe dikey ewa ku Xwe dê bo te qanûnî kiriye ku pê
hevjînên xwe keyfxweş bikey? Xwe dê Lêbihore û Rehmê didet
[2] Bêguman Xwe dê çareseriyek jibo sûnda we dîhar kiriye, Xwe dê
piştîvanê we ye, Ev Zanîne Biryardere. [3] Dema ku Pêşbîn bi nihênî[b],
serhatek gote yêk li hevjînên xwe û dema ku ewê aşkira kir û Xwe dê bi wî da zanîn, wî pişkek li ewê da zanîn û guhê xwe neda ewa mayî, paşê dema ku wî, ew sebaret bi hindê agahdar kir, ewê got, ´Kê tu agahdarê ewê kirî?´ Ew got, ´Ev ê Zanîn û Agahdar ez agahdar kirim.´
[4] Eger hûn her du peşîmaniya xwe jibo Xwe dê rabigehînin, çimkî dilên we li rê derketine, eger hûn li dijî wî pişta hevdu bigrin, bes birastî Xwe dê piştîvanê wî ye û Cibraîl û bawermendên durustkar, firişte piştî
hindê yarmetîderin. [5] Belke Xwedanê wî, eger ew, we berdet, we digel
hevjînên bêhtir veguherît, jinên bawermend ku xwe radestê Vî kirîne, peyrev, ewên peşîmanî ragehandî, ewên ku diperestin, rojiya digrin, çi
pêşta dawet kiribin, yanjî pakîze[c] bin. [6] Hûn ku bawer diken xwe û
binemaleyên xwe li dijî agirekê biparêzin ku sotemeniya wê kevir û mirovin û li ser da firişteyên xurt û dijwar radwestin ku serkêşiyê li Xwe dê naken li ew destûra ku Ev didete wan, lê ew diken ewa ku ferman
li wan tête kirin, [7] ´Hûn ku bawer naken, di ew Rojê da çi mahna negrin,
tenê dê padaş bi we bête dan, jibo ewa ku we dikir.´ [8] Hûn ku bawer
diken, bi peşîmaniya jidil we bizivrine bal Xwe dê, belke Xwedanê we, dê kiryarên we yên nebaş li we bimalît û we vergirîte naw baxçeyên ku li bin da çem diherikin, di ew Rojê da Xwe dê Pêşbîn şermezar naket û ewên ku digel wî da bawer kirin jî. Dê ronahiya wan li pêşberî wan û destê wan yê rastê bît, ew dê bêjin, ´Xwedanê me, bo me ronahiya me tewaw bike û
li me bibhore, birastî Te desthilat li ser hemû tişta da heye.´ [9] Pêşbîn, li
dijî nebawer û durû ya bi dijwarî têkoşînê bike û li dijî wan dijwar be.
Mangeha wan cehneme û armanceke nebaşe! [10] Xwe dê mînakekê li
ewên nebawer pêşkêş diket, hevjînên Nûh û hevjîna Lat, ewên ku li bin du koleyên Me yên durustkar da bûn, lê ewan her duya xiyanet bi wan kirin. Lewma ewan[d] li dijî Xwe dê, da çi qazanc bo wan nebûn û hat
gotin, ´Herne naw agir da, digel ewê ku diçine naw da´ [11] Xwe dê
mînakekê li ewên ku bawer kirî jî tînît, jina Fireûn, dema ku ewê got, ´Xwedanê min bo min malekê nêzîkê Xwe li naw baxçe da çêke û min li Fireûn û kiryarên wî rizgar ke û min li neteweya nerastkar rizgar ke´
[12] Û Miryema kiça Imran jî ku dawêna xwe pak parast û Me li riha Xwe pif kire têda û ewê bawerî bi peyvên Xwedanê xwe û nivîsînên pîrozên Vî kirin û ew ji dil we peyrev bû.

a: Nebî (Mihemed) b: Bi dizî we, weşartî c: Bakire d: Mêrên wan

## 67. Para Padişahiyê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Pîroze Ev ê ku Padişahî li destê Vî daye û Ev desthilat li ser hemû
tişta heye, 2 Ev ê ku mirin û jiyan afirandiye ku taqî biket kanê kê li
we li kiryara da bêhtire, Ev Bihêze û Lêbihore, 3 Ev ê ku heft asiman
afirandin, yêk li ser ewa dîke. Hûn hîç kêmasiyekê di afirandina
Xwedanê rehmê da nabînin, lewma dîtinê bizvrîninê, hûn çi
şikandinê têda dibînin? 4 Paşê du cara dîtinê bizvrîninê, dê dîtin bi
ûstîxarî bizivrîte ser we, dema ku ew mandiye.4 Bêguman Me
asimanê dinyayê pê çiraya xemilanidye û Me ew bo şeytana kirîne
sarox û Me jibo wan eşkenceya guriyê amade kiriye. 6 Bo ewên ku
bawerî bi Xwedanê xwe nekirin, sizaya cehnemê heye û armanceke
nebaşe. 7 Dema ku ewan dihavêjne têda, ew dê hilmijîna wê bibhên,
dema ku ew dikelît, 8 hema hema kerba da diteqît. Her cara ku
komekê dihavêjine têda parêzerên wê li ewan dipirsin, ´Meger
agahîderek bo we nehat?´ 9 Ew dê bêjin, ´Belê bêguman bo me
agahîderek hat, lê me nikolî kir û me got, ´Xwe dê hîç tiştek
neşandiye xarê bes tu li şaşiyek gelek mezin dayî´ 10 Û ew dê bêjin,
´Eger me guhê xwe dabayê da yanjî hizir lê kiriba, em li naw
hevrêyên naw guriyê da nedibûn, 11 paşê ew dê dan bi gunehên xwe
binên[a], lewma bila hevrêyên naw guriyê da wêda biçin! 12 Birastî
ewên ku nedîtî li Xwedanê xwe ditirsin, ewan dê lêbihorîn û padaşek
gelek mezin hebît. 13 Gotinên xwe bi nihênî xwedan ken yanjî bi
aşkira rabigehînin, birastî Ev dizanît ku li naw singa da çi heye.
14 Meger Evê ku afiranidye nizanît, Ev Nazike Agahe? 15 Ev e ku bo
we erd kevî kiriye, lewma li naw rêyên wê da bigerên û li debarên Vî
bixwen û Vejandin bo bal Vî ye. 16 Meger hûn hest bi tenahiyê diken
ku Ev ê li asiman da wel erdê naket ku we qurt biket, dema ku ew
nişkida dihejiyêt? 17 Yanjî hûn hest bi tenahiyê diken ku Ev ê di
asiman da tofaneke kevira li dijî we naşînît? Paşê hûn dê bizanin
agahdariyê Min çawa bûn! 18 Bêguman ewên berî wan li pêşta nikolî
lê kirbûn û nepejirandina[b] Min çawa bû! 19 Meger ew balindeyên li
serwey xwe nabînin ku çawa diveken û digrin? Naragrît xêncî
Xwedanê rehmê, birastî Ev hemû tişta Dibînît. 20 Ew kêne ku dê
bibine şervanên we ku yarmetiya we biken li kêleka Xwedanê rehmê?
Ewên nebawer tenê li xeyalekê[c] da ne.

a: Dan pênan yanî rastî gotin
b: Jibo peyva Nekîr min peyva nepejirandin bikar înaye.
c: li direwekê da dijîn, li şaşiyê da ne.

[21] Ew kêye ku dê bo we debara dabîn biket, eger Ev debarê Xwe
ragirît? Belê ew pêdagirin li şanazî û li rê derketinê da. [22] Meger ewê
ku ser rûmetê xwe da dikevîte xarê bêhtir hatiye rênivînî kirin yanjî
ewê ku serast li ser rêya rast da rêkê diçît? [23] Bêje, ´Ev e ku hûn
berhem înan û jibo we bihîstin çêkir û dîtin û dil, hûn kêm
sipasdarin!´ [24] Bêje, ´Ev e ku hûn li ser erdê da zêde kirîne û jibo bal
Vî ye ku hûn dê bêne kom kirin´ [25] Û ew dibêjin, ´Ew belêniye kengê
ye eger tu rast dibêjî?´ [26] Bêje, ´Zanist tenê li bal Xwe dê ye û ez tenê
bi zelalî agahdariyê didem.´ [27] Lê dema ku ew dibînin ew nêzîk dibît,
dê rûmetê ewên ku bawer nekirbûn dê şepirze bît û dê bête gotin
´Ewe ya ku we jibo wê gazî dikir.´ [28] Bêje, ´We liber çav girtiye, çi
Xwe dê min û ewên ku digel minin li nav bibet yanjî rehm li ser me
da hebît, kê dê nebawera li eşkenceya bijan biparêzît?´ [29] Bêje, ´Ev
Xwedanê rehmê ye ku em bawerî pê diken û em xwe dispêrine Vî û
hûn dê bizanin kanê kê bi zelalî di şaşiyê da ye.´ [30] Bêje, ´We li ber
çav girtiye eger ava we çik biba, kê dê karîba ava ku diherikît bînît?

## 68. Para Pênûsê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Nûn, bi pênûsê, bi ewa ku ew dinvîsin, 2 bi erîniya Xwedanê te, tu
cingirtî nînî 3 û birastî te dê padaşek bêpayan hebît 4 û birastî te
kesatiyeke gelek mezin heye 5 û tu dê bibînî û ew jî dê bibînin,
6 kanê karesatê li kîjan yêk ji we daye. 7 Birastî Xwedanê we dizanît
kanê kê li rêka Vî derketiye û Ev dizanît kanê kê hatiye rênivînî kirin.
8 Liber wê hindê peyreviyê neke li ewên ku nikoliyê diken 9 ew hêvî
diken ku tu nerm bî ku ew jî bikarin nerm bin 10 peyreviyê li hemû ew
bê buhayên ku hemû gavê sûnd dixwen neke 11 boxtankerên ku bi
gotinên nerast li wandera digerên, 12 rêgirê başiyê, sînor bezên û
gonehkar, 13 bêrehm, sereray wê hindê jî bi tewawî bêkêr, 14 çimkî ew
xwedan mal û zarûke, 15 dema ku eşkereyên Me bo wî têne xwandin
ew dibêjît, ´Çîrokên mirovên berê.´ 16 Em dê dirûşmekê ser difna wî
biden! 17 Birastî Me ew taqî kirîne, her wek ku Me hevrêyên baxçe
taqî kirin, ewên ku sûnd xarin ku dê li dema sibê zû da meyveyê wê lê
weken 18 bêy hîç mercekê, 19 lewma karesatekê li bal Xwedanê te we
li baxçe da, dema ku ew razabûn 20 û bo sibê ew rût bû 21 û sibê zû
da, ewan gazî hevdu kirin, 22 ´Zû herne naw berhemên xwe da, eger
hûn dixwazin meyveya lê weken´ 23 Û ew çon dema ku dengê xwe
nizim kirin 24 ´Nabît îro çi mirovên hejar bêne naw da!´ 25 Ew zû çon
bi pêdagirî û şêyan 26 lê dema ku ewan dît, ewan got, ´Birastî em
bezir bûne! ´27 Belê, em bêpar bûne!´ 28 Ewê li hemûya têgeheştîtir
got, ´Meger min negote we, ´Çima hûn paye bilind naken!´´ 29 Ewan
got, ´Paye bilindî jiboy Xwedanê me bît, birastî em nerastkar bûn!´
30 Paşê hindek li wan, li ewên dîke nêzîk bûn û hevdu gunehbar kirin.
31 Ewan got, ´Hewar li me, birastî em sînor bezên bûn, 32 lê belke
Xwedanê me, li şûn da tişteke bêhtir bidete me, birastî em ji dil we
dizivrine aliyê Xwedanê xwe.´ 33 Siza wisaye û bêguman sizaya di
Dawiyê da mezintire, eger ewan zanîba.
34 Birastî jibo ewên ku hişyarin li bal Xwedanê xwe, dê baxçeyên
şadiyê hebin. 35 Meger, Em dê wekhev rabûn û rûniştinê digel ewên
ku xwe radest kirine[a] û ewên tawankar biken 36 We xêre? Hûn çawa
dadweriyê diken? 37 Yanjî we nivîsîneke pîroz heye ku hûn lê fêr
dibin, 38 birastî jibo we têdaye ewa ku hûn hilbijêrin? 39 Yanjî we
sûnd li ser Me heye ku digehîte Roja Vejiyanê, birastî jibo weye ewa
hûn biryarê diden? 40 Li wan bipirse kanê kîjan li wan bo ewê
berpirsiyare.



a: Mosliman

[41] Yanjî ewan ´heval´ hene? Bihêle bila ew ´hevalên´ xwe bînin, eger
ew rast dibêjin. [42] Di Roja ku dê şewq[a] bêne hildan, ew dê bêne gazî
kirin ku çok daden û serê xwe binvînin, lê ew dê nekarin.
[43] Û çavên wan dê li ber xwe binêrin û serşorî dê li ser wan da bigrît,
birastî ew hatibûne gazî kirin ku çok daden û serê xwe binvînin,
dema ku ew li tenahiyê da bûn. [44] Lewma Min bihêle û ewên ku
nikoliyê li ev serhatê[b] diken Em dê pêngav bi pêngav, rêberiya wan
biken, li ew cihê ku ew pê nizanin [45] û Ez dê derfetê bideme wan,
birastî bernameya Min bihêze.
[46] Yanjî tu daxwaza padaşekê li wan dikey, lewma ew ketine bin barê
deynê da? [47] Yanjî ewan ya nedîtî heye, lewma ew wê dinvîsin?
[48] Lewma digel biryara Xwedanê xwe bêhin fereh be û nebine wek
ew hevrêyê di masiya mezin da, dema ku ew gazî kir, dema ku ew di
tengasiyê da bû [49] eger erêniya Xwedanê wî li ser wî da nehatiba,
bêguman ew dê li ser derava çol da hatiba havêtin dema ku ew
tawanbar bû, [50] lê Xwedanê wî, ew hilbijart û ew kire yêk li ewên
durustkar. [51]Birastî dema ku ewên nebawer bîranînê dibhên kêm
dimînît ku ew pê nêrînên xwe te li erdê biden û ew dibêjin, ´Birastî
ew cingirtiye!´ [52] Lê eve xêncî bîr anînekê jibo dinyaya nîne.



a: Pêşiya pê li naw bera gozînk û çokê. Delingê xwe hilden, dê pêşiya pêyê wan xwuya biket.
b: Jibo peyav Hedîs li erebî da min peyva Serhat bikar înaye.

## 69. Hebûna Bêguman

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Hebûna bêguman! [2] Hebûna bêguman çiye? [3] Çi dê te têbigehînît ku hebûna
bêguman çiye? [4] Ad û Semûd nikolî li karesat lêdanê kirin, [5] lewma Semûd pê
ewa gelek bihêz hatine li nav birin [6] û Ad jî pê bayekê ku bi xurt dikire hewar
hatine li nav birin [7] ku Ev bo heft şev û heşt rojên berdewam berda ser wan,
lewma we dê karîba netewa têda bibînin ku weke binê dare xurmên wala
ketibûn. [8] Meger hûn dikarin hîç çeşne şûnewarekê li wan bibînin? [9] Fireûn û
ewên pêş wî jî da hatin û gundên ser û bin kirî li ber guneha jî [10] û ewan
serkêşî li peyamberê Xwedanê xwe kirin, lewma Vî ew girtin bi girtineke dirêj.
[11] Birastî dema ku av serket Me tu li ser kelekê[a] da birî [12] belke Em ewê bo te
bikene bîranînek û guhên bihîser guhê xwe bidetê [13] û dema ku pif dikene
zirnayê da, pê pifekê [14] û dema ku erd û çiya têne bilind kirin û pê derbekê
ew têne hûr kirin [15] di wê Rojê da, dê rûdan rû bidet. [16] Di wê Rojê da, dê
asiman şeq bît, ew dê gelek nazik bît. [17] Di wê Rojê da dê firişte li ser qiraxên
wê bin, dê heşt, textê Xwedanê we li ser serê xwe ragirin. [18] Di wê Rojê da,
hûn dê bêne aşkira kirin û hîç yêk li sirên we weşartî namînin.
[19] Lewma ewê ku tomara wî dayne destê wî yê rastê, dê bêjît, ´Ewe tomara
mine, bixwîne. [20] Birastî min dizanî, ez dê bigehime hisaba xwe´ [21] Û li ber
hindê, ew dê li jiyaneke xweş da bît, [22] li naw baxçeyek bilind da, [23] bi ûşiyên li
berdestên wi. [24] Têr bixwe û vexwe, berxatira ewa ku te pêş xwe da şandiye, li
rojên derbaz bûyî da.´ [25] Lê herkesê ku tomara wi didene destê wi yê çepê da,
dê bêjît, ´Xwezî çi tomar nedabana min [26] û min hîç tiştek li hisaba xwe
nezanîba. [27] Xwezî ew dawî ba. [28] Malê min çi qazanc bo min çinebûye [29] û
desthilata min li min çoye.´ [30] Ew bigrin û leleyekê[b] pêweken [31] û paşê wî di
agirê cehnemê da bişewtînin [32] paşê ew bi zincîrekê weken ku heftê desta[c]
dirêje, [33] birastî ew bawerî bi Xwe dê herî mezin nedikir, [34] nejî ew han dida
ku xwarinê bidete ewên hejar, [35] liber hindê, îro ew lêreda çi dostên jidil we
çinînin, [36] nejî çi xwarin xêncî edaba[d] birîna, [37] kes naxwet xêncî gunehkara.´
[38] Lewma, Ez bi ewa ku tu dibînî sûnd dixwem [39] û bi ewa ku tu nabînî,
[40] birastî eve gotina peyamberê giran buha ye [41] û gotina helbestvanekê nîne,
tu çend kêm bawer dikey! [42] Nejî gotina rimêldarekê[e] ye, çend kêm tête bîra
te.



a: Gemî, ewa ser avê diçît
b: Ewa dikene ûstê mirovên girtî da, toqa asin ku destê mirov bi ûstê wî we girê diden.
c: Li Xwandinê (Quran)ê da peyva Zêre´en bikar hatiye, şêweyeke pîvanê ye, bi Inglîzî dibêjinê cubit, heftê dest dikete 32 mêtir!
d: Ava pîs ku li birîna têtin, çirk av, ava genî
e: Ew kesên pêşgotina diken, ewên ku falika diveken û bi direw da dibêjin ew dizanin ku dê çi bibît!

[43] Eşkereyeke li bal Xwedanê hemû dinyaya we,
[44] eger ew li dijî Me hindek gotin berhem înaban, [45] bêguman Me dê pê destê
rastê ew girtiba [46] û paşê Me dê şahdemara wî birîba [47] û çi kesê li naw we da
dê nekarîba ew biparêzît, [48] birastî eve bîranîneke bo ewên ku hişyarê Vî ne.
[49] Bêguman Em dizanin ku li naw we da ewên nikolîker hene [50] bêguman eve
dê bîte peşîmaniyek li ser nebawera [51] û bêguman eve Rastiye ku dê bête cih.
[52] Lewma navê Xwedanê xwe paye bilind bike, Ev ê herî mezin.

### 70. Para Hilkêşane Serê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Pirsiyarkerekê sebaret bi sizayekê ku dê bêguman hebît pirsî [2] bo nebawera,
çi pêşgîr lê çinînin [3] li bal Xwe dê, Xwedanê rêyên hilkêşana serê, [4] firişte û
rih hildkêşine bal Vî, li Rojekê da ku dirêjiya wê pênce hizar sale. [5] Lewma bi
bêhin ferehiyekê baş bêhn fereh be.[6] Birastî ew, wê li dûr we dibînin,[7] lê Em
wê nêzîk dibînin. [8] Di ew Roja ku asiman dê weke mîsê heliyayî lê bêt [9] û çiya
dê weke tayên hiryê lê bên [10] û heval sebaret bi hevalê xwe pirs naken,
[11] ew dê bi hev bêne nîşan dan, ewê tawankar dê awat bixwazît ku ew li
eşkenceya ew Rojê pê zarûkên xwe bête qerebû[a] kirin [12] û hevjîna wî û birayê
wî [13] û xizmê wî yê herî nêzîk ku serpenah dabûyê da [14] û herkesên li ser erdê
bi hevra, eger karîba ew rizgar biket.
[15] Lê bi hîç awayekê wisa nabît! Ewe guriye [16] ku pêstê ser kewil diket [17] û ew
gazî ewan diket ku pişta xwe dabûnê û wêda çobûn, [18] kom kiribûn û hil
girtibûn. [19] Birastî mirov bi kelecan hatibû afirandin, [20] dema ku nebaşî li wi
didet bêhin çike [21] lê dema ku başî li wi didet, nadet [22] xêncî ewên ku nûbêja
diken [23] ewên ku li nûbêjên xwe da berdewamin [24] ewên ku li malê wan da
mafek dîhare [25] bo xwarzok û hejara, [26] ewên ku bawerî bi Roja dadweriyê
diken [27] û ewên ku li sizayê Xwedanê xwe ditirsin. [28] Birastî nabît hest bi
ewlehiyê li sizayê Xwedanê wan bête kirin [29] ewên ku dawêna xwe pak
xwedan diken, [30] xêncî li hevjînên xwe û ewên ku yê destê wan yê rastê ne[b],
bes birastî ew nayêne tawanbar kirin.
[31] Lê her kesê ku li derveyê ew hindê bigerêt, bes ew sînor bezênin [32] ewên ku
bawerî û belêniya xwe xwedan diken, [33] ewên ku li gewahiya xwe da serastin
[34] û ewên ku nûbêjên xwe diparêzin, [35] dê li naw baxçeya da, dê rêz li wan
bête girtin. [36] Ewên nebawer xêre? Pêş te da lezê lê diken [37] li aliyê rastê da û li
aliyê çepê da, li komên cuda da?
[38] Meger hemû kesek li naw ewan da hêvî diket ku biçîte naw baxçê şadiyê da?
[39] Ne, birastî Me ew li wê afirandine ku ew pê dizanin [40] lewma Ez bi
Xwedanê rojhilat û rojava ya sûnd dixwem, birastî Em dikarin [41] ku wan digel
ewên li wan bêhtir weguherin û pêş Me nakewin.
[42] Lewma bihêle bila bêşol bipeyvin û bixwe bileyzin, taku ew Roja xwe
dibînin ku belêniya wê bi wan hatiye dan, [43] Roja ku ew dê bilez li gora da
bêne derê, wek tu bêjî ew bilez direvine bo aliy puteke damezrandî, [44] çavê
wan li ber wanin[c], dê serşorî ewan bipeçêrît, eve ew Roje ku belênî bi ewan
hatibû dan.



a: li şûn da bidet, weguherît, bedel.
b: Wergêrên ereb peyva kole bo wan mirova tînin, lê koletî li dînê îslamê da qedexeye.
c: ûstî xwarin û serê xwe bilind naken, lewma çavê wan li erdê dinhêrin.

## 71. Para Nûh

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Birastî Me Nûh bo netewa wî şand, ´Agahiyê bide netewa xwe, pêş ku
sizayeke bijan bo wan bêt.´ 2 Wî got, ´Birastî ez bo we bi zelalî agahîderim.
3 Xwe dê biperestin hişyarê Vî bin û peyreviyê li min biken 4 û Ev dê gunehên
we li we bibhorît û derfetê bidete we taku dema ku bo we hatiye destnîşan
kirin, birastî dema Xwe dê, gava ku ew têt, ew nayête paşve dan, eger we
zanîba!´ 5 Wî got, ´Xwedanê min, birastî min şev û roj gazî netewa xwe kiriye,
6 lê gazî kirina min zêdetir nekirye xêncî rewiyanê 7 û birastî her cara ku ez
gazî wan dikem, belke Tu li wan bibhorî, ew tilyên xwe dikene guhên xwe da
û xwe pê cilên xwe peçavtin, pêdagirî kirin û li xwe mezin kirinê da xwe
mezin kirin. 8 Paşê min bi aşkira ew gazî kirin. 9 Paşê min bo wan ragehandiye
û bi nehênî digel wan peyvîme. 10 Paşê min got, ´Daxwaza lêbihorînê li
Xwedanê xwe biken, birastî Ev bêpayan lêbihore. 11 Ev dê li asiman ra bo we,
bi firavanî bişînît, 12 Ev dê mal û zarûka bidete we û dê bo we baxça çêket û
dê bo we çema çêket. 13 We xêre? Hûn çima mezinahiyê nadene Xwe dê,
14 dema ku Ev hûn li qonaxa da afirandin? 15 Hûn li ber çav nagirin ku
Xwe dê çawa heft asiman afirandine, yêk li ser ewa dîke da.16 Heyv kiriye
ronahiyek danaye naw ewan da û roj jî kiriye çirayek?
17 Xwe dê wel we kir ku weke giyaya li erdê da şîn bin, 18 paşê Ev dê we
bizvrînîte têda û pê derêxistinê we têda derêxît 19 û Xwe dê bo we erd belaw
kiriye 20 ku hûn li ser rêkên wê yê pan da rê biçin?´21 Nûh got, Xwedanê min,
birastî ewan serkêşî li min kiriye û peyrevî li ew kirin ku mal û zarûkên wî
xêncî dorandinê bo wî zêde naket 22 û ewan bernameyeke gelek mezin
darêştin 23 û gotin, ´Xwedêyên xwe nehêlin û Wad nehêlin, nejî Suwa û nejî
Yaqus nejî Yauq û Nasir!´´ 24 Bêguman ewan gelek li rê derxistine û nerastkar
xêncî şaşiyê zêde naken! 25 Liber xatira gunehên wan ew hatine xendiqandin û
ew têkirine naw agir da û ewan li kêleka Xwe dê da bixwe yarmetîder peyda
nekirin 26 û Nûh got, ´Xwedanê min, xwe tenê nebawerekê jî nehêle ser rûyê
erdê, 27 birastî eger Tu wan bihêlî, ew dê koleyên Te li rê derêxin û ew nazên
xêncî nebawerên dawên pîs. 28 Xwedanê min, li min û dayk û babên min û
her keseke bawermend ku tête mala min da bibhore û li mêrên bawermend û
li jinên bawermend jî û jibo nerastkara zêde neke xêncî wêraniyê!´



* Navê Nûh yê serast Nû Xwe e. Xwandinê (Quranê) destpêkê bê nixte dihatine nivîsîn. Bawermenda dest pêkir û Xwandin bi nixte nivîsîin ku ewên ereb jî nebin bikarin bixwînin.
Ez hizir dikem ew demê nixta ser Nû Xwe ketiye û bûye Nûh, çimkî li Rênivînî (Torat) a hîbrû da jî dibêjine Nûh, Nû Xwe.
Eger hûn çav lê biken gemiya Nû Xwe, li ser çiyayê Cih dî (Cûdî) hate xarê. Çiyayê Cih dî li Şar Nû Xwe, ye (Şirnex). Şar Nû Xwe yanî Bajarê Nû Xwe.

## 72. Para Cina

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bêje, ´Bo min sirûş hatiye ku komeke cina guhê xwe danê û gotin,
´Birastî me, Xwandineke (Quraneke) sersirker bihîstiye [2] ku rênivîniya
dirsutkariyê didet, lewma me bawerî pê kiriye û edî em çi cara ´heval´a bo
Xwedanê xwe peyda naken [3] û bilinde bihagiraniya Xwedanê me! Ev ne
hevjîn wergirtine, ne kur. [4] Nezanên di naw me da sebaret bi Xwe dê
gotinên gelek zêde sînor bezên gotine [5] û me hizir kiribû, ne mirov nejî cin
çi cara sebaret bi Xwe dê direwa naken [6] û mirovên mêr hebûn ku penaha
xwe bo cinên mêr înan, lê ewan tenê barê wan zêdetir kir. [7] Ewan jî wek
we hizir kiribûn ku Xwe dê kesê li mirinê naraket. [8] Me hevil da ku destê
xwe bidene asiman, lê me zanî ku pir parêzvanên xurt hene û guriyên[a] ku
dirêjiyêt! [9] Pêşta em têda dirûniştin, li ciha da ku guhê xwe bidenê, lê
herkesek ku niha guhê xwe bidetê dê bizanît ku guriyek ku dirêjiyêt dê li
bendê bît. [10] Em nizanin kanê dê nebaşî hebît bo ewên li ser erdê yanjî
Xwedanê wan dixwazît ewan rênivînî biket. [11] Li naw me da dirustkar
hene û li naw me da ewên dîke jî, em peyrevî li rêkên cuda diken. [12] Em
arxayîn bûne ku em çi cara nikarin Xwe dê li ser erdê bêzar biken nejî em
çi cara dikarin pê firînê li ber Vî birewin.
[13] Dema ku me rênivînî bihîst me bawerî pê kir, her kesê ku bawerî bi
Xwedanê xwe biket ew li dorandin û bar natirsiyêt. [14] Li naw me da, ewên
xwe radestê Vî kirîne[b] hene û li naw me da ewên bêdad jî hene û her kesê
ku xwe radestê Vî biket, ew li rêya rast geriyane [15] lê ewên bêdad, ew dê
bibine sotemenî bo agirê cehnemê.´ [16] Eger ew li ser rêbazê rawestaban,
Me dê bo vexwarinê, bi firavanî av daba wan, [17] belke Em wêderê da
ewan taqî biken, lê herkesek ku pişta xwe bidete bîranîna Xwedanê xwe,
Ev dê wî bikete naw eşkenceya dijwar da. [18] Mizgewt boy Xwe dê ne,
lewma digel Xwe dê gazî kesê dîke neken [19] dema ku koleyên Xwe dê li
ser pêya rawesta ku li ber Vî bipariyêt, hema hema ewan bi peytî der dorê
wî girtin. [20] Bêje ´Ez tenê li ber Xwedanê xwe dipariyêm, ez çi kesê
nakeme ´heval´ê Vî.´
[21] Bêje, ´Birastî ez jibo we xwedanê zirar yanjî rêya rast nînim.´ [22] Bêje,
´Birastî kes çi cara nikarît min li Xwe dê biparêzît nejî ez dikarim li kêlek
Vî da çi penahê peyda bikem.



a: Çirûskê agir dihavêjine cina, li erebî da peyva şehab bikar hatiye.
b: Mosliman

[23] Bes ragehandin li bal Xwe dê û peyamên Vî.´ Herkesê serkêşiyê li
Xwe dê û peyamberê Vî biket, bes birastî ew dê agirê cehnemê hebît ku ta
bêdawiyê têda bît [24] ta dema ku ew belêniya ku bi wan hatiye dayîn
dibînin, paşê ew dê bizanin kanê kê yarmetîderên bêhêz û hejamrên
kêmtir hene. [25] Bêje, ´Ez tênagehim kanê ewa ku belênî dayne te nêzîke
yanjî Xwedanê min dê demekê bidetê da.´ [26] Zanayê ewa nedîtiye, lewma
Ev li nedîtiya Xwe jibo çi kesê aşkira naket [27] xêncî ew peyamberê ku Vî
pejirandiye, birastî Ev li pêş wî da û li paşta jî parêzvana dişînît [28] ku Ev
bidete zanîn ku bêguman peyamên Xwedanê xwe ragehandine, Vî ewa
digel wan da dorpêç kiriye û hemû tişta pê hejmara hisab diket.

## 73. Para Pêçayî

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1]Ewê xwe pêçayî! [2] Şevê rabe xêncî hindekê nebît, [3] nêviyê yanjî
kêmekê lê kêm bike, [4] yanjî lê zêde bike, hêdî û li hev cuda Xwandinê
(Quranê) bixwîne, [5] birastî Em dê peyveke giran havêjine ser te. [6] Bi
rastî rabûna di şevê da gelek dijware û gelek bi bandore û kêrhatîtire ji
bo gotina [7] birastî jibo te li rojê da mijoliyeke dirêj heye,
[8] û navê Xwedanê xwe bîr bîne û jidil we xwe radestê Vî bike.
[9] Xwedanê rojhilat û rojava ye, çi xwedê nînin bes Ev nebît, lewma
Ev weke parêzerê xwe vergire [10] û digel ewa ku ew dibêjin bêhin fereh
be û dûriyê li wan bike, dûriyeke ciwan [11] û ewên ku nikoliyê lê diken
bo Min bihêle, ewên xwedan erênî û kêmekê derfetê bide wan.
[12] Birastî li bal Me ne kelepçe û agirê bişewat [13] û xwarina ku
dixendiqînît û eşkenceya bijan [14] di ew Roja ku erd û çiya dihejiyên û
çiya dibine tepikê tozê ku diweriyêne xarê. [15] Birastî Me bo we
peyamberek şandiye û gewahe li ser we, her wek ku Me peyamberek
jibo Fireûn şand, [16] lê Fireûn serkêşî li peyamber kir û liber hindê Me
pê girtina wêraniyê ew girt. [17] Bes hûn dê çawa hişyar bin, eger hûn
bawerî bi Rojekê neken ku dê serê zarûka sipî biket [18] û dê asiman pê
li hev bête dirandin? Bêguman dê belêniya Vî bête cih. [19] Birastî eve
bîranîneke, lewma her kesê ku dixwazît bila rêkekê jibo bal Xwedanê
xwe bigrîte pêşiya xwe.
[20] Birastî Xwedanê te dizanît ku tu kêmtir li du pişka li sê pişkên şevê
ser piyayî û niviya wê û pişkekê li sê pişkê wê û komek li ewên digel te
jî, Xwe dê şev û rojê dîhar diket, Ev dizanît ku tu hisab nakey lewma
ziviriye bal te, lewma ewa hêsane li Xwandinê (Quranê) bixwîne. Ev
dizanît ku dê li naw we da, dê nexweş hebin û ewên dîke ku dê li ser
erdê da rêvîngiyê diken ku li qenciyên Xwe dê digerên û ewên dîke jî
ku li rêya Xwe dê da şer diken, lewma ewa hêsan lê bixwîne û nûbêjê
bike û ew xêra ku jiboy te hatiye dîhar kirin bide[a] û deyneke baş bide
Xwe dê, her tiştekê li başiyê ku tu bixwe dişîniye pêş, tu dê li bal
Xwe dê peyda bikey, Ev baştir û gelek mezintire li padaşa da û
daxwaza lêbihorînê li Xwe dê bixwaze, birastî Ev Lêbihore û Rehmê
didet.

a: Zikat

### 74. Para Ewê Xwe Peçavtî

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Tu, ewê xwe peçavtî, 2 rabe û agahdariyê bide 3 û Xwedanê xwe mezin bike
4 û cilên xwe pak bike 5 û xwe li qirêjê dûr ragire 6 mandî nebe ku zêde kom
bikey, 7 jibo Xwedanê xwe bêhn fereh be. 8 Dema ku pif kirine zirnayê da 9 ew
dê Rojeke dijwar bît, 10 jiboy nebawera hêsan nabît. 11 Ewên ku Min tenê
afirandine bo Min bihêle 12 û ewê ku Min gelek mal dayê da 13 û zarûkên
amade 14 û Min bo wî hêsan kir, 15 paşê ew dixwazît ku Ez lê zêde bikem.
16 Ne! Birastî ew digel eşkereyên Me serhişik bûye17 Ez dê wî di eşkenceyeke
dijwar da bipêçim. 18 Birastî ew hizir kir û xerîte kêşan, 19 lewma belke ew bête
li nav birin, çawa wî bername rêjî kir! 20 Paşê belke ew bête li nav birin, ew
bername rêjî kir! 21 Paşê lê nihêrî, 22 paşê xemgîn bû û xolkên xwe şor kirin
23 û pişta xwe dayê da û qude bû 24 paşê ew got, ´Eve tenê cadûyeke çav lê
kiriye, 25 eve nîne xêncî gotina bimirekê!´ 26 Ez dê wî hajome naw agirekê ku
dişewtînît. 27 Çi tiştek dê te têbigehînît ku agirê dişewtînît çiye? 28 Ew hîç
tiştekê lê bicih nahêlît û nahêlît jî, 29 ew pêst kewil diket, 30 li ser da nozdeh
hene. 31 Me nekirîne parêzerê cehnemê xêncî firişta û Me hejmara wan jiboy
nebawera kiriye ezmûnek, belke ewên ku nivîsîna pîroz bi wan hatiye dan
arxayîn[a] bin û belke baweriya ewên ku bawer diken pê zêde bît û belke ewên
ku nivîsîna pîroz bi wan hatiye dan gumanê neken û ewên bawermend jî,
belke ewên ku di dilê xwe da nexweşî hene û ewên ku nebawerin bêjin,
´Mebesta Xwe dê li ew mînakê çiye?´ Bi wê rêbazê Xwe dê dihêlît her kesê ku
Ev bixwazît li rê derkevît û rênivînî diket, her kesê ku Ev dixwazît û kes
şervanên Xwedanê te nas naket xêncî Vî nebît û eve nîne xêncî bîranînekê
jibo bimira. 32 Ne, bi heyvê 33 û bi şeva ku derbaz dibît 34 û bi sibêdeya ku
ronahî dibît! 35 Birastî eve yêke herî mezine, 36 agahiyeke jibo bimira 37 jiboy
her kesê li naw we da ku berdewam bît yanjî paşve bimînît. 38 Dê bidene her
rihekê, ewa ku bi destê xwe êxistiye, 39 xêncî hevrêyên aliyê rastê 40 li naw
baxçeyan da, li hevdu dipirsin 41 sebaret bi tawankara 42 ´Ew çibû ku tu
hajotiye naw agirê ku dişewtînît?´ 43 Ew dê bêjin, ´Em li ewan nebûn ku nûbêj
dikirin, 44 nejî me xwarin dida hejara, 45 me digel ewên ku pûç dipeyvîn, pûç
peyvî 46 me nikolî li Roja Darizandinê dikir 47 taku arxayînî hate ser me.´
48 Lewma navbêjvaniya navbêjvana berjewendiyê nagehînîte wan. 49 Bes ewan
xêre? Çima ew pişta xwe didene bîr anînê, 50 wek tu bêjî ew kerên weciniqî[b]
ne 51 ku li ber şêrekê direwin?



a: Jibo peyva yeqîn li erebî da min arxayîn bikar înaye, yanî piştrast bûn ku ew raste.
b: Nişkida agahdarê tiştekê bûn û tirsiyan.

52 Belê her yêk li wan daxwaz diket ku perên wekirî bi wî bêne dan 53 lê belê
ew li Dawiyê natirsin, 54 lê birastî eve bîranîneke. 55 Lewma herkesê ku
dixwazît, bila bînîte bîra xwe 56 û ew nayînine bîra xwe, meger Xwe dê
bixwazît. Ev jêhatiyê hişyariyê ye û jêhatiyê lêbihorînê ye.

## 75. Para Rabûne ser xwe

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Lê Ez bi Roja rabûne ser xwe sûnd dixwem [2] û Ez bi riha ku gazinda[a] li
xwe diket sûnd dixwem! [3] Meger mirov hizir diket ku Em hêstikên wi
nagehînine hev? [4] Belê Em dikarin, serê tiliyên wi jî nûjen biken. [5] Belê mirov
dixwazît nikoliyê li eva pêşya xwe biket [6] ew dipirsît, ´Bes ew Roja Rabûne ser
xwe kengê ye?´ [7] Dema ku çav zil dibin [8] û heyv diherifît [9] û roj û heyv
digehine hev, [10] di ew Rojê da mirov dê bêjît, ´Cihê rewiyanê kîveye?´
[11] Ne çi penahgeh çinînin, [12] di wê Rojê da, mangeh bo bal Xwedanê te ye.
[13] Di wê Rojê da, dê mirov bête agahdar kirin ku ew çi pêşwe şand û çi paşve
xwedan kir. [14] Belê, mirov li dijî xwe gewaheke, [15] digel hemû ew mahnê ku
ew tînîte pêş. [16] Zimanê xwe bi evê[b] nebizvîne ku lezê li evê bikey [17] birastî li
ser Me ye kom kirina vê û xwandina vê. [18] Lewma dema ku Me ev xwandiye,
paşê xwandina vê bişopîne [19] paşê birastî li ser Me ye zelal kirina vê, [20] lê belê
tu hez li ewa demûdest dikey [21] û waz li Dawiyê tînî. [22] Rûmetên ew rojê
ronahî ne, [23] dê zêndene aliyê Xwedanê xwe [24] û rûmetên ew rojê têkçoyî ne
[25] Çavnihêrin ku dê pişta wan bête şikandin. [26] Lê dema ku digehîte hêstikên
ûstî [27] û tête gotin, ´Kê dê çare biket?´ [28] Û ew arxayîne ku ewe çone [29] û ling
têk alandine [30] di ew Rojê da, ew dê bête hajotin bo bal Xwedanê te. [31] Ew, ne
bawer kiribû, nejî nûbêj kiribûn, [32] lê nikolî kiribû û pişta xwe dabûyê, [33] paşê
çobû bal mirovên xwe, xwe qude kirbû. [34] Li te nêzîktir û nêzîktir dibît.
[35] paşê li te nêzîktir û nêzîktir dibît. [36] Meger mirov hizir diket ku ew dê
bêxwedan bête hêlan? [37] Meger ew dilopke avika[c] rijyayî nebû, [38] paşê ew
bûye şêweyek ku dizeliqî, afirand û rêjedar kir [39] paşê li wi du cûre çêkirin, nêr
û mê [40] Meger Ev nikarît ku jiyanê bidete mirî?



*Min peyva Qiyametê bi Rabûne ser xwe vergêraye. Roja vejiyanê da, dê mirov rabine ser xwe bo lêpirsîn û dadweriyê, lê di parên dîke da min peyva Qiyametê bi Vejiyan vergêraye. Mirov têne vejandin.

a: Min Lome bi gazinde wergêraye.

b: Xwandin (Quran)

c: Tovê mêra, avika ku li mêra dirêjiyt

## 76. Para Mirov

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Meger demek hatiye ser mirov ku ew tiştek bû ku bas lê nehatibû kirin?
2 Birastî Me mirov li avika rijyayî, têkelekê afirand ku Em ew taqî biken û Me
bihîstin û dîtin bo wi çêkirin 3 Birastî Me ew rênivîniyê rê kir, çi sipasdar bît
yanjî nankor. 4 Birastî Me jibo nebawera zincîr û lele û agirê geş amade kiriye,
5 Birastî ewên bawermend dê li fîncana da vexwarineke têkel bi Kafûrê[a]
vexwen. 6 Kaniyekê ku koleyên Xwe dê lê divexwen, welê diket ku bi firavanî
lê biherikît 7 ew sûndên xwe bicih tînin û ew li Rojekê ditirsin ku nebaşiya wê
berbilave. 8 Liber hez lê kirin li hejara, sêwiya û girtiya, ew xwarinê didene
wan 9 ´Em tenê li ber rûmetê Xwe dê xwarinê didene we.
Em ne padaşê li we dixwazin nejî sipasdariyê. 10 Birastî em li Xwedanê xwe
ditirsin, Roja xemgînî û şepirzetiyê.´ 11 Lewma Xwe dê, dê ewan li nebaşiya
wê Rojê rizgar biket û ewan bigehînîte ronahî û keyfxweşiyê 12 û liber bêhin
fereh bûna wan dê padaş bidete wan, baxçeyekê û armûş. 13 Ew dê li ser
bermala[b] rûnên, ew dê li wêderê da ne rojê bibînin û nejî sirê 14 û nêzîk û ser
serê wan sîber heye û ûşiyên ku li berdestê wanin. 15 Dê pê dewriyên zîv û
fîncanên ku diteyîsin dê li dora wan bigerên 16 û amanên zîv ku diteyisin, ew
dê pîvana wan dîhar biken 17 û li wêderê da dê fîncanekê bidene wan ku têda
vexwen ku têkelek zencefîlê têdaye. 18 Kanî avek têdaye ku dibêjinê Selsebîl,
19 û lawên rêncber û nemir dê li dora wan bigerên, dema hûn ewan dibînin
hûn dê hizir biken ku ew mirwarî ne ku belav bûne 20 û dema ku tu lê dinhêrî
paşê tu dê şadî û padişahiyeke gelek mezin bibînî, 21 dê cilên armûşê kesk û
armûşê ku bi gula wehînayne dê liber wan da bin û dê pê bazinên zîv bêne
xemilandin û Xwedanê wan dê vexwarineke pak bidete wan, 22 ´Birastî eve
jibo te padaşeke û sipasiya têkoşîna te hatiye kirin.´23 Birastî Me hêdî hêdî bo
te Xwandin (Quran) şande xarê. 24 Lewma bo biryara Xwedanê xwe bêhin
fereh be û li naw ewan da peyreviyê li gunehkar yanjî nebawera neke 25 di serê
sibê û rojava bûnê da navê Xwedanê xwe bîr bîne 26 û di şevê da, li ber Vî çok
danê û serê xwe binvîne û li dirêjiya şevê da Vî paye bilind bike. 27 Birastî
ewane hez li ewa demûdest diken û Roja gelek dijwar li paş xwe we dihêlin.
28 Me ew afirandin û şêweyê wan bihêz kir û dema ku Em bixwezin Em
dikarin pê guhertinê ewên weka wan biguherin,29 birastî eve bîranîneke,
lewma her kesê ku dixwazît, bihêle bila rêyekê jibo bal Xwedanê xwe bigrîte
ber xwe.
30 Lê tu naxwazî xêncî ku Xwe dê bixwazît, birastî Xwe dê Zanîne Biryardere
31 Ev her kesê ku Ev dixwazît verdigrîte naw rehma Xwe, da lê nebawera, Ev
eşkenceyeke bijan jiboy wan amade kiriye.



a: Dareke ku gul avê lê digrin.
b: text, qenefe, mobl, kanape, sofa, couch.

## 77. Para Şandî pêş

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bi ewên ku li ser hevda hatine şandin [2] û bayên ku bi xurtî tên [3] û ewên ku pan
û berîn belav diken [4] û ewên ku bi cuda kirinê li hev cuda diken [5] û ewên ku
bîranînê tînine xarê, [6] weke cih bi cih kirinê yanjî agahdarî. [7] Birastî eva ku
belêniya wê bi te hatiye dan dê bête cih. [8] Lewma dema ku stêrk li nav diçin [9] û
dema ku asiman li hev têtе dirandin [10] û dema ku çiya têne teqandin,
[11] û dema ku peyambera kom dikene dema wan ya dîhar kirî, [12] bo çi rojekê
paşve hatibû dan? [13] Bo roja dadweriyê! [14] Çi dê te têbigehînît ka Roja
dadweriyê çiye? [15] Di wê Rojê da heware li ewên ku nikoliyê[a] lê diken! [16] Meger
Me ewên ewilî li nav nebirin? [17] Paşê Em dê pê ewên dawiyê ewan bişopînin,
[18] bi wî awayî Em rabûn û rûniştinê digel ewên tawankar diken. [19] Di wê Rojê da
heware li ewên ku nikoliyê lê diken! [20] Meger Me hûn li avikek siwik ne-
afrandin? [21] Paşê Me ew dana ciheke tenah da [22] jiboy demeke dîhar kirî?
[23] Lewma Me çarenûs dîhar kir, Em çend erênî çarenûsê dîhar diken! [24] Di wê
Rojê da heware li ewên ku nikolî lê kirîne! [25] Meger Me erd nekiriye cihê [26] jiyan
û mirinê? [27] Me têda çiyayên gelek mezin çêkirin û ava şêrîn jiboy vexwarinê
daye we. [28] Di wê Rojê da heware li ewên ku nikoliyê lê diken! [29] ´Here ew cihê
ku te nikolî lê dikir! [30] Here bin sîberekê da!´ Ku sê histûn hene[31] ne sîbera
hênike[b] nejî li dijî guriyê qazancê didet. [32] Birastî ew çirûskên hindî koşka
dihavête derê [33] wek bêjî hêştirên zer bûn. [34] Di wê Rojê da heware li ewên ku
nikoliyê lê diken! [35] Eve Rojeke ku ew napeyvin [36] û derfet bi wan nayête dan ku
ew mahneyekê bigrin. [37] Di wê Rojê da heware li ewên ku nikoliyê lê diken!
[38] Eve Roja dadweriyê ye, Me hûn û ewên ewilî kom kirîne.
[39] Lewma eger we bernameyek heye, bes li dijî Min bernama xwe biken.´
[40] Di wê Rojê da heware li ewên ku nikolî lê kirîne! [41] Birastî ewên ku hişyarê Vî
ne, dê li naw sîbera û kaniya da bin [42] û meyveyên her tiştê ku ew dixwazin
[43] ´Têr bixwen û vexwen jiboy ewa ku we dikir, [44] birastî bi wî awayî Em padaş
didene ewên ku başiyê diken.´ [45] Di wê Rojê da heware li ewên ku nikoliyê lê
diken! [46] Bixwen û bo demeke kurt bixwe xweş biqetînin, birastî hûn tawankarin.
[47] Di wê Rojê da heware li ewên ku nikoliyê lê diken! [48] Û dema ku dibêjine wan,
´ Xwe biçevînin´ Ew xwe naçevînin. [49] Di wê Rojê da heware li ewên ku nikoliyê
lê diken! [50] Bes pişt evê, ew dê bawerî bi çi serhatekê[c] biken?

a: Haşa kirin, bawer nekirin,
b: Fênik, sar, tezî
c: Min lêreda peyva hedîs bi serhat vergêraye.

## 78. Para Nûç ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Ew sebaret bi çi li hev dipirsin 2 sebaret bi nûçeya gelek mezin 3 ewa ku li ser
da ciyawazî hene? 4 Ne, ew dê bizanin. 5 Ne, ew dê paşê bizanin. 6 Meger Me
erd nekire cihê bêhn wedanê 7 û çiya jî kirîne sing? 8 Û Me hûn jî cot afirandine
9 û Me razana we jî bo bêhin wedanê çêkir 10 û Me şev jî bo peçavtinê çêkir 11 û
Me roj jî bo jiyanê çêkir 12 û li ser we da, heftên bihêz ava kirin 13 û Me çirayek
ku diteyîsît çêkir 14 û Me li ewrê baranê bi firavanî av şande xarê 15 belke Em pê
wê dexil û dan û giya bînine derê 16 û baxçeyên pir bi pel. 17 Birastî Roja
dadweriyê dema destnîşan kiriye 18 Rojekê ku dê pif kene zirnayê da û hûn dê bi
koma bêne derê 19 û dê asiman vebît û dibîte derwaze 20 û dê çiya bimeşin û
bibine rewreweka[a]. 21 Birastî cehnem çavnihêre. 22 Jibo sînor bezêna, cihê zivrînê
23 ku bo demeke gelek gelek dirêj dê li wêderê da bimînin 24 wêderê da, ew ne
fênikiyê nejî vexwarinê tam diken 25 xêncî ava keliyayî û edabdar[b] nebît,
26 padaşeke jêhatî, 27 birastî ew çavnihêrê hisabê nebûn 28 û pê nikoliya, nikolî li
nîşaneyên Me kirin 29 lê Me hemû tiştek di nivîsîneke pîroz da hejmartiye.
30 ´Lewma tam bike û Em çi cara bo te zêde naken, xêncî eşkencê nebît.´
31 Birastî jiboy ewên hişyar destkevtekê 32 baxçe û reza ye 33 û hevrêyên jêhatî û
hevtemen 34 û fincaneke tejî. 35 Li wêderê da, ew ne peyvîna pûç nejî direwê
dibhên 36 Padaşek li bal Xwedanê te we, dîhariyeke hejmartî 37 Xwedanê asimna,
erdê û ewa li nawbera wan da, Xwedanê Rehmê. Ew xwedanê gotina Vî nînin.
38 Di Roja ku rih û firişte di rêza da radwestin, ew napeyvin, xêncî ewê ku
Xwedanê Rehmê destûrê didetê û ew dê ya rast bêjît. 39 Eve Roja Rastiyê ye.
Lewma her kesê ku dixwazît bila zivrînekê bo aliyê Xwedanê xwe bigrîte pêşya
xwe. 40 Birastî Me tu agahdarê eşkenceya nêzîk kirî, Roja ku her kesek dê bibînît
ku destê wan bixwe pêşta çi tiştek bo wan şandiye û ewê nebawer dê bêjît, ´Xwazî
ez toz bama´



a: Dema ku mirov avê li çolê da dibînin, lê dema ku lê nizîk dibin dibînin ku çi nîne!
b: Ava pîs ku li birînê diderkevît, çirkav, çilkav

## 79. Para Ewên ku Radikêşine pêş

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bi ewên ku bi zorî radkêşin [2] û bi ewên ku hêdî radiken [3] û bi ewên ku bi mele [a]
xwe didene pêş [4] û bi ewên ku pê pêşberkêyê pêş hev dikevin [5] û bi ewên ku mijarê
rêk diêxin [6] Roja ku qêrîn dê deng vedet, [7] dê bişopînît û li dû da bêt, [8] dil dê wê
rojê da biqutin, [9] çavê wan li ber xwe binhêrin [10] Ew dibêjin, ´Birastî em dê bêne
zivrandin jiboy rewşa xwe ya berê? [11] Tenanet eger em hêstikên rizî jî bin? ´ [12] Ew
dibêjin, ´Bes ewe zivrîn jiboy dorandinê ye! ´ [13] Birastî bes, ew dê tenê qêrînek bît
[14] û nişkida ew dê hişyar bin. [15] Meger serhata Mûsa bo we hatiye? [16] Dema ku
Xwedanê wî di geliyê pîrozê Tuwa da gazî wî kir, [17] ´Here bal Fireûn, birastî wî
sînor bezandine [18] û bêje wî, ´Tu dê xwe paqij bikey? [19] Û ez dê te rênivînî bikeme
bal Xwedanê te, lewma tu bitirsî? ´ [20] Paşê ew nîşaneya gelek mezin nîşa wî da,
[21] lê ew nikolî lêkir û serkêşî kir. [22] Paşê ew pişta xwe dayê da û li ber xwe da,
[23] û ew kom kirin û gazî kir. [24] Paşê ew got ´Ez xwedanê we yê herî bilindim ´
[25] lewma Xwe dê, pê sizayeke bi mînak ew girt, bo dawiyê û ewlî [26] Birastî di evê
da jiboy ewên ku ditirsin waneyek heye.[27] Tu dijwarî bo afirandinê yanjî asiman
ku Vî ava kiriye? [28] Banê wê bilind kir û rêjedar kir [29] û Ev şeva wê tarî kir û
ronahî li wê derêxist [30] û erd jî piştî wê belav kir [31] û li wê ava wê û çeregeha[b] wê
derêxistin [32] û Vî çiyayên ku qahîmin danane ser [33] debarek jiboy we û ajelên we
yê kevî. [34] Lê dema ku karesata gelek mezin têtin, [35] Roja ku dê bête bîra mirov
ewa ku xebat bo kir [36] û agirê cehnemê dê derkewît jibo ewê ku dibînît. [37] Lê jibo
ewê ku sînor bezandine [38] û hez li jiyana ev dinyayê kiriye [39] bes birastî agirê
cehnemê dê bibîte penahgeha wi. [40] Lê jiboy ewê ku li pileya Xwedanê xwe
ditrsiyêt û riha xwe li hesta[c] parastiye, [41] bes birastî dê biheşt bibîte penahgeh.
[42] Ew sebaret bi demjimêrê li te dipirsin, hatina wê kengê ye? ´ [43] Tu li çi dayî ku
tu bas lê bikey?
[44] Dawiya wê bo bal Xwedanê te ye [45] tu tenê agahîderekî bo ewên ku lê ditirsin.
[46] Ew dê bibît li roja ku ew dê bibînin ku ew nemabûn xêncî êvarekê yanjî sibe
zûyekê.

a: Xwe li av dan, melevanî
b: Mêrg, cihê çera ajela
c: Hewa, hewes, hez.

## 80. Para Naw çavên xwe kirine girê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Ew naw çavên xwe kirine girê û pişta xwe dayê da, [2] çimkî mêrikê kore hate
bal wî [3] Çi dê te têbigehînît belke ew xwe pak biket, [4] yanjî bîrewerî bi wî bête
dan û bîranînê dê berjewendî jiboy wî hebît, [5] lê sebaret bi ewê ku xwe bê
pêdavîstî dibînît, [6] lewma tu bala xwe dideye wî [7] û li ser te nîne ku ew xwe pak
naket. [8] Lê sebaret bi ewê ku bi têkoşan hatine bal te, [9] dema ku ew ditirsiyêt,
[10] lê te agah li ew nîne [11] ne birastî, eve bîranîneke [12] lewma her kesê ku
dixwazît, belke bînîte bîra xwe [13] di perên birûmet da, [14] bilind û pak kirî da,
[15] nivîsî, pê destên [16] birûmet û erk nas. [17] Mirov li nav çoyî ye, çend nebawere!
[18] Vî li çi tiştekê ew afirand? [19] Vî, ew li dilopeke avikê afirand, Vî ew rêjedar
kir, [20] paşê Ev rêke jiboy wî hêsan kir, [21] paşê Ev dibîte hokar ku ew bimrît û
gorekê bo wî dabîn diket. [22] Paşê dema ku Ev dixwazît, Ev dê wî vejînît.
[23] Ne, ew bicih ne înaye, ew fermana ku Ev dabûye wî. [24] Bes bila mirov
zêndete xwarina xwe! [25] Me bi firavanî av rijande xarê [26] paşê me pê şeqa erd
şeq kir [27] û Em bûne hokar ku dexil û dan têda şîn bin [28] û rez û giyayên taze
[29] darên zeytûnê û xurmê, [30] baxçeyên pir bi pel [31] û meyve û giya [32] jiboy xweş
derbaz kirina we û ajelên we yên kevî. [33] Lê dema qêrîna ku ker diket têtin
[34] Roja ku her kesek dê li birayê xwe birewît [35] û li dayka xwe û li babê xwe,
[36] û li hevjina xwe û li zarûkên xwe, [37] di wê Rojê da, her kesek dê gêrodey[a]
mijara xwe bît, [38] di wê rojê da dê rûmet ronahî bin,[39] dikenin û keyfxweşin li
ber mizgîniyê [40] û di wê rojê da rûmetên ku dê xalî pêwer bin [41] û tarîtî dê wan
bipeçêrît, [42] ew li ewên nebawerin, ewên nebaşkar.



a: Mijûl.

## 81. Para Helweşandin ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Dema ku roj peçayî ye [2] û dema ku stêrk temirîne [3] û dema ku çiya wêda
birîne [4] û dema ku hêştrên deh manga pêgiran bêxwedan hatine hêlan
[5] û dema ku ajelên kêwî kom kirîne bal hev [6] û dema ku wel deryaya diken
ku li ser lêwa da birêjiyên [7] û dema ku rih têne cot kirin [8] û dema ku li ew
kiçika sawa ku bi saxî hatibû çal kirin tê pirsîn, [9] jibo çi gunehekê ew hatibû
kuştin [10] û dema ku per tête vekirin [11] û dema ku asiman tête jê kirin [12] û
dema ku agirê cehnemê tête geş kirin [13] û dema ku biheştê tînine nêzîk,
[14] dê rihek bizanît ku ew digel xwe çi înaye. [15] Lewma Ez bi ew sitêrkên ku
paşve diçin sûnd dixwem [16] ewên ku direwin û wenda dibin [17] û bi şevê
dema ku ew diçîtin [18] û bi serê sibêdeyê ku henasê[a] dikêşît, [19] birastî eve
gotina peyambereke giran buhaye [20] xwedan şêyane digel Xwedanê textê li
cih daye, [21] peyrewî lê bête kirin paşê bawerî. [22] Û hevrêyê we cin girtî nîne
[23] Bêguman wî, ew[b] li ser elendekê zelal dît. [24] Û ew ya nedîtî paşve
naragrît [25] û eve gotina Şeytanê der kirî nîne. [26] Lewma tu kîwe diçî?
[27] Eve nîne xêncî bîranînekê bo hemû dinyaya, [28] jiboy her kesê ku li naw
we da bixwazît ku rêkek rast bigrîte pêşya xwe. [29] Lê tu naxwazî, meger ku
Xwe dê bixwazît, Xwedanê hemû dinyaya.



a: Nefes
b: Basê firiştê ye ku navê wî Cibraîle (Gabriyel)

## 82. Para Şikan ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Dema ku asiman dişkêt [2] û dema ku sitêrk belav dibin [3] û dema ku
derya hil diçin [4] û dema ku gor pişt niqo dibin [5] rihek dê bizanît ku çi
pêşta rêkiriye û çi paşve hêlaye. [6] Hûn mirovino, çi tiştekê hûn
xapandine li Xwedanê we yê giran buha, [7] Ev ê ku hûn afirandin, hûn
rêjedar kiri û hûn hewseng[a] kirin, [8] di her şêweyekê da ku Ev xwast, Ev
hûn berhem înandin. [9] Lê belê hûn nikoliyê li Dadweriyê diken!
[10] Û birastî li ser we da parêzvan hene [11] tomarkerên giran buha,
[12] ew dizanin ewa hûn diken. [13] Birastî ewên durustkar dê li şadiyê da
bin [14] û birastî ewên nebaş dê li naw agir da bin. [15] Ew dê li Roja
Dadweriyê da têda bişewtin [16] û ew dê têda amade bin [17] û çi tişteke
dê we têbigehînît ku Roja Dadweriyê çiye? [18] Paşê çi tiştek dê we
têbigehînît ka Roja Dadweriyê çiye? [19] Roja ku rihekê hîç tiştek bo
rihek dîke çinabît, di wê Rojê da destûr ya Xwe dê ye.

a: Balans

## 83. Para Ewên ku Pîvanên kêm Dipîvên

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Heware li ewên ku bi pîvanên kêm diden, 2 ewên ku dema pîwanekê li mirova
werdigirn hemûyê distînin 3 lê dema ku ew bi pîwan didene wan yanjî bi kêşan
ew kêmtir diden. 4 Meger ew hizir naken ku ew dê bêne vejandin 5 bo Rojeke
gelek mezin, 6 Roja ku mirov dê li hember Xwedanê dinyaya da rawestin? 7 Ne
birastî! Tomara ewên nebaş bêguman li zîndanê daye. 8 Ew çiye ku dê we
têbigehînît zîndan çiye? 9 Tomarek ku hatiye nivîsîn. 10 Di wê Rojê da heware
li ewên ku nikolî lê kirîne, 11 ewên ku nikolî li Roja Dadweriyê diken!
12 Kes nikoliyê lê naket xêncî hemû ewên sînor bezên û gunehkar 13 dema ku
eşkereyên Me jiboy ew têne xwandin ew dibêjît, ´Efsaneyên ewên ewilî! ´
14 Lê belê qirêjê dilê wan pêçaye, li ber xatira ewa ku wan bidestê xwe tînan.
15 Lê birastî, di wê Rojê da, ew dê li Xwedanê xwe bêne cuda kirin,
16 paşê birastî ew dê li naw agirê cehnemê da bişewtin 17 paşê dê bête gotin,
´Eveye ewa ku we nikolî lê dikir ´ 18 Lê birastî tomara ewên dirustkar dê cihê
herî bilind bît 19 çi tiştek dê we têbigehînêt ku cihê herî bilind çiye?
20 Tomareke nivîsî, 21 gewahiya vê diden ewên ku înayne nêzîk.
22 Birastî ewên dirustkar dê li şadiyê da bin, 23 li ser bermala zêndidenê.
24 Hûn dê rewneqa şadiyê li ser rûmetê wan nas biken, 25 dê bo vexwarinê
şîrava[a] gula ya serê wê girêdayî bidene wan, 26 ya dawiyê jî miske, lewma ewên
ku kêberkê[b] diken, bila li ber hindê kêberkê biken 27 û têkelekê li ava Tensîmê,
28 kaniyavek ku ewên înayne nêzîk dê lê vexwen. 29 Birastî ewên ku tawan
dikirin, bi ewên ku bawerî pê dikirin pê-dikenîn 30 û dema ku ew liber wan da
derbaz dibûn, ewan çavê xwe li hevdu dimiqîn 31 û dema ku dizvrîne bal
mirovên xwe, ew dê zivrîban bi henek kirinê 32 û dema ku wan ew didîtin,
ewan got, ´Birastî ewane li rê derketine, ´ 33 Lê ew li ser wan da parêzvan
nehatibûne şandin 34 lewma îro ewên ku bawer kirbûn bi nebawera dikenin
35 li ser bermala zêndidenê. 36 Meger padaş bi nebawera hatiye dan, jiboy ewa
ku wan dikir?



a: Ava li gula digrin û di naw şûşê ser girtî da xwedan diken.
a: Mosabiqe, competition.

## 84. Para Tîş bûn ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Dema ku asiman tîş bûye [2] û bersiva Xwedanê xwe daye û erkê wê bû
[3] û dema ku erd hatiye belaw kirin [4] û ewa di naw xwe da havêtiye derê û
wala bûye [5] û bersiva Xwedanê xwe daye û erkê wê bû [6] hûn mirovino, birastî
hûn berxwe diden bo aliyê Xwedanê xwe, berxwe biden hûn dê Vî bibînin
[7] paşê ewê ku tomara wi didene destê wi yê rastê [8] bi zûyî dê hisaba wi
hejmartinek hêsan hebît [9] û dê bikeyfxweşî bizvrîte bal mirovên xwe [10] lê ewê
ku tomara wi li aliyê pişt we didenê [11] bi zûyî ew dê jiboy li nav çonê bikete
gazî [12] û li naw guriyê da bişewtît. [13] Birastî ew li naw mirovên xwe da
keyfxweş bû. [14] Birastî ew hizir dikir ku ew çi cara nazvrît, [15] belê birastî
Xwedanê wi, ew didît, [16] lewma Ez bi serê sibê sûnd dixwem [17] û bi şevê û
ewa ku dadipoşît [18] û bi heyvê dema ku tejî dibît [19] bêguman tu dê pile bi pile
biçiye pêş. [20] Lewma ewan xêre ku bawer naken? [21] Dema ku Xwandin
(Quran) jiboy wan tête xwandin, ew çok nadanên û serê xwe nanivînin,
[22] belê ewên nebawer nikoliyê diken [23] Xwe dê dizanît ku ew li naw xwe da çi
diweşêrin [24] lewma mizgîniya eşkenceya bijan bide wan. [25] Xêncî ewên ku
bawer diken û karên durust diken, ewan dê padaşeke bêpayan hebît.



* Tîş bûn yanjî şeq bûn, lêk cuda bûn

## 85. Para Kom-Sitêrkên Bilind

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bi asimanê ku kom sitêrkên bilind hene [2] û bi Roja ku Belêniya wê
hatiye dan [3] û gewah û ewê ku gewahiya wê tête dan, [4] li nav çobûn,
hevrêyên di çeperê da, [5] agirê bi sotemenî! [6] Dema ku ew li ber da
rûniştine xarê [7] û ewan, ewa ku bi serê bawermenda tînan, gewah bûn.
[8] Kerbê wan li ewan nedwebû, xêncî berxatira hindê ku ewan baweri bi
Xwe dê bihêz û jêhatiy pesnê hebû, [9] Ev ê ku padişahiya asimana û erdê
ya Vî ye û Xwe dê li ser hemû tişta gewahe. [10] Birastî ewên ku mêrên
bawermend û jinên bawermend çewsandine[a] û paşê peşîmaniya xwe ra
negehandine paşê dê eşkenceya cehnemê bo wan bît û dê eşkenceya agir
bo wan bît. [11] Birastî ewên ku bawer diken û karên durust diken, ewan dê
baxçeyên ku çem li bin da derbaz dibin dê hebin, eve destkevta mezine.
[12] Birastî girtina Xwedanê te dijware [13] Birastî Ev e ku destpê diket û
dupat diket [14] û Ev Lêbihor û Dilovane [15] Xwedanê birûmetê textê,
[16] diket ewa Ev dixwazît. [17] Serhata şerwana bo te hatiye [18] Fireûn û
Semûd? [19] Belê ewên nebawer nikoliyê lê diken. [20] Lê Xwe dê ewan li pişt
we dorpêç diket. [21] Belê eve Xwandineke (Qûraneke) birûmete
[22] li tabloyeke[b] parastî da.

a: Tepeser kirin, zordarî lê kirin, zulim.
a: Jibo peyav Lewh min Tablo bikar înaye.

### 86. Para Di Şevê da têt

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bi asiman û bi ewa ku li şevê da têt [2] çi dê te têbigehînît ku ewa di
şevê da têt çiye? [3] Sitêrka ku kon diket, [4] li ser her rihekê parêzvanek
heye. [5] Lewma bihêle bila mirov bibînît li ewa ku ew lê hatiye
afirandin. [6] Ew li avikeke rijyayî hatiye afirandin [7] derdikevît li
nawbera hêstikê piştê û peresûya da, [8] birastî Ev şêyan heye ku we
bizvrînîtê. [9] Roja ku dê nehênî[a] bêne taqî[b] kirin [10] paşê ew ne dê
şêyan hebît, nejî yarmetîderek [11] Bi asimanê ku dizvrînît [12] û erdê ku
ker dibît [13] birastî eve gotineke biryardere [14] û eve bo henekê nîne.
[15] Birastî ew xerîta bernameyekê dikêşin [16] û Ez jî xerîta bernameyekê
dikêşim. [17] Lewma derfetê bide nebawera, bo kêmekê derfetê bide
wan.



a: Weşartî, nepenî, sir.
b: Ezmûn, imtihan.

## 87. Para Herî Bilind

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Paye bilindiya navê Xwedanê xwe yê herî bilind bike [2] Ev ê ku afirand û
rêjedar kir [3] û Ev ê ku çarenûsa wan dîhar kir û rênivînî kirin [4] û Ev ê ku çere
tînîte derê [5] û paşê dikete pûşê reş [6] Em dê wel te biken ku tu bêjî û tu li bîr
nakey [7] xêncî ewa ku Xwe dê bixwazît, birastî Ev dizanît ewa ragehandî û
ewa weşartî.
[8] Em dê te hêsan bikene aliyê hêsaniyê. [9] Lewma bîr bînin, eger bîr anîn dê
qazancê bigehînît. [10] Ewê ku ditirsiyêt dê bête bîra wi, [11] lê ewê nebaşkar dê
xwe lê dûr biket, [12] ewê ku dê li naw agireke gelek mezin da bişewtît [13] paşê
ne dê bimrît nejî dê bijît. [14] Ewê ku xwe pak diket bêguman behremend dibît,
[15] û navê Xwedanê xwe bîr bîne û bipariyê [16] belê tu hez li jiyana ev dinyayê
dikey [17] dema ku Dawî bêhtir û mayendetire! [18] Birastî eve di nivîsînên pîrozê
berê daye, [19] di nivîsînên pêrozê Ibrahîm û Mûsa daye.

## 88. Para Rûdawa Gelek Dijwar

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Meger serhata rûdawa gelek dijwar bo te hatiye? [2] Di ew Rojê da, dê rûmet
ûstîxar bin, [3] kar biken û biwestiyên. [4] Ew dê li naw agireke gelek geş da bişewitin
[5] û dê li kaniaveke keliyayî bidene wan ku vexwen, [6] ewan jibo xwarinê çinabît
xêncî giyayeke tal û bi qelem. [7] ku ne xwarine nejî li dijî birsîtiyê têr diket. [8] Di wê
Rojê da, dê rûmet keyfxweş bin, [9] dê bi xebata xwe keyfxweş bin,[10] li naw
baxçeyeke bilind kirî da, [11] li wêderê ew peyvînên pûç nabihên, [12] li wê derê da
kanî avek diherikît [13] li wêderê da bermal bilind kirîne [14] û fîncan danane cihê
wan da [15] û doşekçe rêz kirîne [16] û berikên ravêxistî. [17] Meger ew nazêndene
hêştira ku çawa hatine afirandin [18] û bo aliyê asiman ku çawa hatiye bilind kirin
[19] û bo aliyê çiya ya ku çawa hatine qît kirin [20] û bo aliyê erdê ku çawa hatiye pan
kirin? [21] Lewma bîr bîne, tu tenê bîr înerekî [22] tu li ser ewan da desthilatdar nînî.
[23] Lê her kesê ku piştа xwe didetê û bawer naket, [24] paşê Xwe dê, dê pê
eşkenceyeke gelek mezin dê ew eşkence bidet. [25] Birastî vegera wan jibo bal Me
ye [26] paşê birastî hisaba wan li ser Me ye.

## 89. Para Serê Sibê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bi serê sibê 2 û bi deh şeva 3 û bi kit û cota 4 û bi şevê dema ku derbaz
dibît 5 meger di evê da sûndek heye jibo ewên ku têdigehin? 6 Meger te
nedîtiye ku Xwedanê te çi li Ad kir, 7 Îram ê ku sitûnên gelek mezin
hebûn 8 yên ku weke wan li çi erda da nehatine çêkirin 9 û Semûd, ewên
ku kevirên di gelî da kolan 10 û Fireûn ê xwedan sing[a]?
11 Ewên ku li welata da sînor bezandin 12 û li wêderê da gendelî zêde
kirin 13 lewma Xwedanê te qamçiya sizayê berdaye ser wan.
14 Birastî Xwedanê te hemû gavê çavdêriyê diket. 15 Û sebaret bi mirov,
dema ku Xwedanê wi, ew taqî diket ku digel wi da birûmete û erêniya wî
diket, ew dibêjît, ´Xwedanê min rêz li min girtiye. ´ 16 Lê dema ku Ev, wi
taqî diket û pêşya debarê wi digrît paşê ew dibêjît, ´Xwedanê min, ez
serşor kirîme. ´ 17 Lê belê tu rêz li sêwiya nagirî, 18 nejî tu han didey ku
xwarinê bideye hejara 19 û tu mîrat dixwey, hemûyê bi hevra dixwey
20 û gelek bi evîndarî hez li mal dikey. 21 Lê dema ku erd bi qutan û
qutanê pan bûye 22 û Xwedanê te hatiye û firişte jî rêz li dû rêzê da,
23 di ew Roja ku cehnemê tînine nêzîk, di wê Rojê da, dê bête bîra
mirov, lê bîr anîn dê bo wi çawa bît? 24 Ew dê bêjît, ´Xwezî min bo
jiyana xwe pêşta rêkirba! ´ 25 Di wê Rojê da kes eşkence nadet weka ku
Ev eşkence didet 26 û kes girê nadet weka ku Ev girê didet. 27 Ho riha
arxayîn 28 bizvire bal Xwedanê xwe, gelek keyfxweş û keyfxweşker
29 û here naw koleyên Min da 30 û here naw baxçê Min da.´



a: Alawek (kevir, asin, dar) 3ê goşe ku di erd da dikotin, bo nîşane!

## 90. Para Bajêr

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Lê Ez bi ew bajêrî sûnd dixwem [2] ku tu li ew bajêrî da serbestî. [3] Bi dayk û
bab û ewa dizên [4] bêguman Me mirov li dijwariyê da afirandiye. [5] Meger ew
hizir diket ku çi kesê desthilat li ser wi da nabît? [6] Ew dibêjît ´Min gelek mal
heder daye ´ Ew dibêjît. [7] Meger ew hizir diket ku kesê ew nedîtiye? [8] Meger
Me du çaw bo wî çênekirîne [9] û zimanek û du lêw jî [10] û du rê jî pêşanî wi
nedan?
[11] Lê ew, rêya ser jêhel nedaye pêşya xwe [12] û çi dê te têbigehînît ku rêya ser
jêhel çiye? [13] Serbestiya girtiyekê[a] ye, [14] yanjî li roja gelek birsîtiyê da xwarinê
bideye [15] xizmeke sêwî [16] yanjî hejarekê li tengasiyê da [17] paşê ew li wane ku
bawer diket û şîreta bêhn fereh bûnê diket û şîreta rehmê diket. [18] Ew
hevrêyên rastê ne, [19] lê ewên ku bawerî bi eşkereyên Me naken, ew hevrêyên
çepê ne [20] li ser ewan da agir nêzîk kir.



a: Serbest kirina miroveke bin dest, girtî, zîndanî.

### 91. Para Roj ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bi Rojê û ronahiya wê [2] û bi heyvê dema ku ewê dişopînît [3] û bi rojê,
dema ku nîşan didet [4] û bi şevê dema ku ewê dipeçêrît [5] û bi asiman û Ev
ê ku ava kir [6] û bi erdê û Ev ê ku pan kir [7] û bi rihê û Ev ê ku rêje dar kir
[8] û sirûşa nebaşiyê û hişyariyê da, [9] bêguman ew behremend dibît ewê ku
pak biket [10] bêguman dikewît ewê ku xerîta dikêşît [11] Semûd nikolî kir, ber
xatira sînor bezandina xwe, [12] dema ku ewê herî nebaş li naw ewan da
rêkirine pêş.[13] Lê peyamberê Xwe dê gote wan, ´ Hêştira mê ya Xwe dê û
vexwarina wê,´ [14] Lê ewan nikolî li wî kirin û ew qop kirin lewma
Xwedanê wan li ber xatira gunehê wan, ew li nav birin û wekhev kir
[15] û Ev li dawiya wê natirsiyêt.

## 92. Para Şev ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bi şevê dema ku ew dipeçêrît 2 û bi rojê dema ku pê ronahiyê
dibirqît 3 û bi Ev ê ku nêr û mê afirandine, 4 birastî xebatên te
ciyawazin. 5 Lê sebaret bi ewê ku didet û hişyarê Vî ye 6 û bawerî bi
ewa bêhtir heye 7 Em dê wî hêsan biken bo aliyê hêsaniyê. 8 Lê
sebaret bi ewê ku qornûse û pêweye ku pêvîstî bi çi nîne 9 û nikoliyê li
ewa bêhtir diket, 10 Em dê ewi hêsan biken bo aliyê dijwariyê 11 û
malê wi çi qazancê nagehînîte wi, dema ku ew dikevît. 12 Birastî
rênivînî li ser Me ye 13 û birastî bo Me ye Dawî û ewli, 14 lewma Ez
agahdariya agireke bi gurî dideme te, 15 têda naşewitît, xêncî ewê herî
nebaş, 16 ewê nikolî kir û pişta xwe dayê da. 17 Lê dê lê bête rakirin,
ewê hişyar, 18 ewê ku malê xwe didet ku xwe pê pak biket,
19 û çi erêniya kesê li ser wî nîne ku padaş bidetê 20 xêncî geriyan li
rûmetê Xwedanê xwe yê herî bilind 21 û bi zûyî ew dê keyfxweş bît.

### 93. Para Ronahiya Serê Sibê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Bi ronahiya serê sibê [2] û bi şeva ku pê tarîtiyê dadipoşît,
[3] Xwedanê te, ne tu bêxwedan hêlay, nejî kerbê Vî vebûye
[4] Bêguman Dawî dê jiboy te, li ewilî bêhtir bît [5] û Xwedanê te dê
zû bidete te û tu dê keyfxweş bî. [6] Meger Vî tu sêwî peyda nekirî û
serpenah neda te [7] û Ev tu wenda peyda kirî û tu rênivînî kirî [8] û
Ev tu xwedan pêvîstî dîtî û pêvîstiyên te dabîn kirin.
[9] Lewma sebaret bi sêwiya, bes tepeser neke [10] û sebaret bi ewên
ku dipirsin, bes dûr neke [11] lê, sebaret bi erêniya Xwedanê xwe
bêje.

### 94. Para Fereh kirinê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

[1] Meger Me bo te singê te fereh nekiriye [2] û Me jiboy te barê te rakir [3] ku gelek giranî li ser pişta te dikir [4] û Me nav û dengên te bilind kir [5] lewma birastî digel dijwariyê hêsaniye. [6] Birastî digel dijwariyê hêsaniye [7] lewma dema ku te tewaw kirin, paşê bi xurtî xebatê bike [8] û bala xwe bide aliyê Xwedanê xwe.

## 95. Para Hêjîr ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Bi hêjîrê û bi zeytûn ê 2 û bi çiyayê sînayin ê 3 û ev bajarê tenah, 4 birastî
Me mirov di bêhtrîn şêwe da çêkir, 5 paşê Me ew zivrande nizimtrîn
nizmatiyê, 6 xêncî ewên ku bawer diken û karên durust diken, paşê dê jibo
wan padaşeke bêpayan hebît. 7 Paştir çi wel te kir ku tu paşê nikoliyê li
Dadweriyê bikey? 8 Meger Xwe dê bi Dadtrînê dadvera nîne?

## 96. Para Şêweya ku Pêve Dizeliqît

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bixwîne! Bi navê Xwedanê xwe ku afirandiye. 2 Vî mirov li şêweyek ê ku
dizeliqît afirand. 3 Bixwîne û Xwedanê te herî comerde, 4 Ev ê ku pê pênûs ê
fêr kir, 5 mirov fêrî ewa ku wî nedizanî kir, 6 lê birastî miorv sînora dibezînît,
7 dema ku ew xwe bêkêmasî dibînît 8 birastî zivrîn jibo bal Xwedanê te ye.
9 Te ewê ku qedexe diket dîtiye 10 kole dema ku nûbêjê biket? 11 Te ditiye
kanê ew li ser rênivîniyê ye 12 yanjî destûra hişyariyê didet? 13 Te dîtiye kanê
ew nikoliyê diket û pişta xwe jî didetê? 14 Meger ew nizanît ku Xwe dê dibînît?
15 Lê eger ew nerawestît, bêguman Em dê wî pê porika[a] wî rakêşin
16 porka direwîn û gunehkar. 17 Paşê bila ew gazî hevalên xwe biket,
18 Em jî dê gazî firişteyên cehnemê biken. 19 Ne! peyreviyê li wî neke, çok danê
û serê xwe binivîne û nêzîk be.



a: Pirça ser eniyê.

## 97. Para Hêzê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Birastî Me eve di şeva hêzê da şande xarê, [2] çi dê te têbigehînît ku şeva hêz ê
çiye? [3] Şeva hêzê li hizar manga bêhtire. [4] Bi fermana Xwedanê xwe, firişte û
rih têne têda, jiboy hemû mijara. [5] Aştiye taku serê sibê têt.

## 98. Para Belgeya

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Meger ewên nebawer li naw mirovên nivîsîna pîroz da û ewên ku ´hevala´
jibo Vî peyda diken waz lê netînandin taku jibo wan belgeyek zelal bêt
2 Peyamberek li bal Xwe dê we perên pak kirî bixwînît 3 ku têda nivîsîna
durust heye. 4 Û li yêk cuda nebûn ewên ku nivîsîna pîroz bi wan hatibû dan,
taku piştî hindê ku jiboy ewan belgeyek zelal hat 5 û destûr bi wan nehatibû
dan xêncî ku Xwe dê biperestin û ji dil we dîndarê Vî bin, serast bin û nûbêja
biken û ew xêra ku jiboy wan hatibû dîhar kirin biden, eve dînê duruste!
6 Ewên ku bawer naken li mirovên nivîsîna pîroz û ewên ku ´hevala´ jibo Vî
peyda diken dê naw agirê cehnemê da bin, bo bêdawiyê dê li wê derê bimînin,
ew li nebaştrîn rihtibera ne.
7 Birastî ewên ku bawer diken û karên durust diken, ew li bêhtrînê rihtibera
ne. 8 Padaşê wan li bal Xwedanê wane, baxçeyên bêpayanin ku çem li bin da
diherikin û ew dê taku bêdaviyê li wêderê da bimînin. Xwe dê digel wan
keyfxweşe û ew jî digel Vî keyfxweşin, eve jiboy her kesê ye ku li Xwedanê
xwe tirsiyaye.

## 99. Para Erdhej ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Dema ku erd bi hejîna xwe dihejiyêt [2] û erd barê xwe dihavêjîte derê [3] û
mirov dibêjît, ´Ewê xêre? ´ [4] di wê Rojê da, ew dê nûçeyên xwe bêjîtê, [5] çimkî
Xwedanê te, sirûş dayiyê da. [6] Di ew Rojê da, dê mirov di komên cuda da
bêne pêş, ku kiryarên wan bi wan bêne nîşan dan. [7] Lewma her kesê hindî
giraniya nixteyekê başiyê biket, dê bibînît [8] û her kesê hindî giraniya nixteyekê
nebaşiyê biket, dê bibînît.

## 100. Para Hespê Hêriş ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bi hilke hilka hespê hêriş ê 2 û pê kutanê çirûska berhem tînin 3 û hêrişkerên
di serê sibê da, 4 paşê tozê quloz diken 5 paşê hemû pêkve digehine nîvekê da,
6 birastî mirov jiboy Xwedanê xwe nankore 7 û birastî ew gewahê evê ye
8 birastî ew gelek evîndarê servetê[a] ye. 9 Meger ew nizanît ku dema ewa di
gora da dihavêjine derê 10 û ewa di singa daye aşkira diken. 11 Birastî Xwedanê
wan li wê Rojê da digel wan agahdare.



a: Mal, heyî.

### 101. Para Karesat ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Karesat lêdan, 2 karesat lêdan çiye? 3 Û çi dê te têbigehînît ku karesat lêdan
çiye? 4 Roja ku mirov weke pelpeloka belav bûne 5 û çiya dê weke tayên hiryê
bêne kincrîn[a], 6 paşê ewê ku pîvera[b] wi girane, 7 paşê ew dê li jiyaneke
keyfxweş da bît, 8 lê ewê ku pîvera wi siwike 9 dê çala bê bin bibîte penahgeha
wi, 10 çi dê te têbigehînît ku ew çiye? 11 Agireke gelek geş!



a: Taw bi taw li yêk cuda kirin,
b: Terazû, pîvan, kêşan.

## 102. Para Pêşberkê bo ya zêdetir

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Pêşberkê[a] jibo ewa zêdetir te li rê diderêxît 2 Taku tu seredana goristanê
dikey. 3 Lê tu dê zû bizanî.4 Lê paşê tu dê zû bizanî. 5 Lê eger te bi zanista
arxayînî zanîba! 6 Bêguman tu dê agirê cehnemê bibînî.
7 Paşê tu dê bi çavên arxayîniyê bibînî. 8 Paşê di wê Roj ê da, dê sebaret bi
keyfxweşiya li te bipirsin.



a: Riqabet, Mosabiqe.

### 103. Para Roja ku Derbaz dibît

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

[1] Bi roja ku derbaz dibît, [2] birastî mirov li dorandinê daye, [3] xêncî ewên ku
bawer diken û karên durust diken û şîreta rastiyê diden û şîreta bêhin ferehiyê
diden.

## 104. Para Lome kirinê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Heware li hemû ew lome kerên ku loma diken 2 ewê ku mal kom diket û
dihejmêrît, 3 hizir diket ku malê wi dê wi nemir biket. 4 Lê bêguman dê ew
havêjine naw ewa ku diperçiqînît, 5 Çi dê te têbigehînît ku ewa diperçiqînît
çiye? 6 Agirê Xwe dê yê geşe 7 ewa ku digehîte ser dila 8 birastî ew li ser wan
nêzîk dibît 9 li sitûnên bilind da.



* Lome yanî pişt serê kesekê kêmasiya wi gotin.

## 105. Para Fîl

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
[1] Meger te berçav negirtiye ku Xwe dê çi serê hevrêyên fîl îna. [2] Meger Vî
bernameyên wan têk nedan? [3] Û Vî refên balindeya li dijî wan şandin, [4] pê
kevirên li heriya hişik bûyî li wan da [5] paşê Ev weke kayê hûr kirî dane
xwarin.

## 106. Para Qureyşê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Jiboy tenahiya Qureyşê ya weke her car, 2 tenahî di rêvîngiya zistan û
havîna wan da. 3 Lewma bihêle bila ew Xwedanê ev malê biperestin, 4 Ev
ê ku li birsîtiyê da xwarinê didete wan û li tirsê da tenahiyê didete wan.

**107. Para Qenciyên biçûk**

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Te ewê ku nikoliya dadweriyê diket li ber çav girtiye? 2 Ewe ewê ku guhê
xwe nadete sêwiya 3 û han nadet ku xwarinê bidene hejara.
4 Lewma heware li ewên ku nûbêja diken 5 ewên ku agahdarê nûbêjên xwe
nînin 6 ewên ku nîşa diden 7 û mêhrevaniyên biçûk qedexe diken.

## 108. Para Firavaniy ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Birastî Me bi firavanî daye te 2 li ber hindê li ber Xwedanê xwe bipariyê û
qurbaniyê bike 3 birastî dijminê te ewe ku dê bête birîn.

## 109. Para Nebawera

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bêje, ´Nebawerino 2 ez naperestim ewa ku hûn diperestin 3 û hûn
naperestin ewa ku ez diperestim, 4 ne ezim perestkarê ewa ku hûn diperestin,
5 ne hûnin perestkarê ewa ku ez diperestim, 6 dînê we jibo we ye û dînê min
jîbo mine.´

## 110. Para Piştîvaniy ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Dema ku yarmetiya Xwe dê têtin û serkevtin 2 û tu dibînî ku mirov pê koma
têne naw dînê Xwe dê, da 3 bes pesna Xwedanê xwe paye bilind bike û
daxwaza lêborîna Vî bike, birastî Ev peşîmaniyê bipejirînît.

## 111. Para Rîşalê Xurmê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Wêran[a] bin destên Ebû Leheb û ew jî wêran bît! 2 Qazancê nagehînîte wî mal û
destkevtên wî 3 Ew dê li naw guriya agireke geş da bişewtît 4 û jina wî jî ku qişika
hildigrît, 5 bendikê li rîşalê dara xurmê dora gerdena wê ye!



a: Peyva wêran bûn bikar hatiye, lewma min heman peyv bikar îna, lê em dikarin têbigehin ku destê wî bişkên, reng bît ew gotinek Erebî bît jibo li naw çonê.

## 112. Para Baweriya Ji Dil we

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Bêje ´Ev Xwe dê yêkta ye 2 Xwe dê bêpayane, 3 ne Ev zaye û ne Ev zane, 4 nejî çi
hemta bo Vî hene. ´

## 113. Para Rojhilat ê

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.

1 Bêje ´Ez penaha xwe dibeme bal Xwedanê rojhilatê 2 li nebaşiya ewa ku Vî
afirandiye 3 û li nebaşiya tarîtiyê, dema ku belav dibît 4 û li nebaşiya ewên ku
pif dikene girê ya[a] 5 û li nebaşiya çavnebara[b] dema ku ew çavnebrariyê diken.
´



* Rojhilat yanî dema ku taze roj diderkevît, li Xwandina pîroz (Quran) da peyva Feleq bikar hatiye.

a: Mirovên put perest pif dikirne girê ya

b: Ewên ku hez naken tiştê baş bo kesê bêne pêş, Hesûd.

**114. Para Mirova**

Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.
1 Bêje ´Ez penaha xwe bo Xwedanê mirova dibem, 2 Padişahê mirova,
3 Xwe dê mirova, 4 li nebaşiya ewên ku bi dizîwe piste pistê diken,
5 ewên ku piste pistê dikene naw singê mirova da, 6 li cina û miorva.

**Nûbêj**

Dibêjin peyva nivêj ê li nemaz ê hatiye, hindek jî dibêjin ew li nîyaz ê hatiye. Ligor lêkolîn û têgeheştina min, ew her du peyv Kurdî nînin, lê mebesta û wateya ev peyvê, ewe ku mirov pê pariyanê xwe bi Xwedanê xwe we girêdet! Xwe dê Xwedanê me ye û Xwe dê pariyan kiriye erk ku em bi peyva pêwendiyê bi Xwe dê we bigrin. Xwe dê Xwedan û koka meye û em bi pariyanê Xwedanê xwe bîr tînin û xwe pêwe digrin.

Ez kurdim, zimanê min nîşaneya Xwe dê ye, lewma min pêvîst zaniye ku bi zimanê xwe yê zikmakî liber Xwe dê bipariyêm, lewma li şûna peyva nivêjê da, min peyva nûbêj bikar înaye, çimkî niha pêve, ez dê pariyanê xwe ser li nû bi zimanê Kurdî bêjim. Pêvîste ez bêjim ku Ibrahîm peyamber nûbêj destpê kiriye û Ibrahîm peyamber li welatê Kurdistana îro bûye, her wisa pêvîste mirov bizane ku çi dibêje Xwedanê xwe. Di Xwandina (Qurana) pîroz da Xwe dê li ser min ferman kiriye ku ez pê nûbêjê rojê pênc cara xwe bi Xwedanê xwe we girê dem.
Nûbêja sibê, nîvro, êvarê, rojava û şevê.

Di dema nûbêja sibê da ez 2 cara xwe diçemînin. (2 reket)
Di dema nûbêja nîvro da ez 4 cara xwe diçemînin. (4 reket)
Di dema nûbêja êvarê da ez 4 cara xwe diçemînin. (4 reket)
Di dema nûbêja rojava da ez 3 cara xwe diçemînin. (3 reket)
Di dema nûbêja şevê da ez 4 cara xwe diçemînin. (4 reket)

Pêş ku kesek nûbêjê biket, pêvîste ew kes xwe pak biket, di Xwandina (Qurana) pîroz da, Xwe dê ferman diket ku mirov bi ew rêbazê xwe pak biken!

**5:6 CEJIN**

´´Hûn ku bawer diken, dema hûn dê nûbêjê biken, rûyê xwe bişon, dest û baskên xwe heta enûşkê bişon, serê xwe pê avê bimalin, pêyê xwe heta gozînkê bişon û eger pêvîst bû hemû laşê xwe bişon!
Eger her yêk li we nexweş bît yanjî rêviye yanjî li xwe berdaye yanjî pêvendiyek nêzîk digel jinekê hebûye û nikarît çi avê peyda biket, bes hindek axa temîz bînin û bimaline dest û rêyê xwe. Xwe dê naxwazît ku çi dijwariya jiboy we pêk bînît!
Ev tenê dixwazît we pak biket û erêniya Xwe li ser we bêkêmasî biket ku bi wî awayî hûn sipasdar bin. ´´
Devê nûbêjê para kilîlê (fatihê) ye.
Hindek kes bo nûbêjê destê xwe didanêne ser hev, hindek kes jî destê xwe didanêne ber tenişta xwe, mebest li nûbêjê pêwendî û pariyan liber Xwe dê ye, girîng nîne eger destê te ser zikê te bin yanjî li ber tenişta te bin.
Girîng pêwendî û pariyan liber Xw dê ye!

**Eve Devê Nûbêja Sibê ye!**

Destê xwe bilind bike ber serê xwe û bêje

**Xwe dê, ez dixwazim bo nûbêja sibê 2 cara xwe li ber te biçemînim, Xwe dê li min bipejirîne.**

Paşê bêje

**Ey Xwe dê mezin.**

Paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser destê çepê. Ew car para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Xwe dê mezin li min bibhore.**

Carek dîke serê xwe binvîne û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê bêje

**Ya Xwe dê mezin**

û rabe ser pêya, Paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser destê çepê û carek dîke para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje
**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**
Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje
**Xwe dê mezin li min bibhore.**
Carek dîke serê xwe binvîne û bêje
**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**
Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje
**Pesin, pariyan û peyvên pak hemû bo Xwe dê ne.**
**Ez gewahiyê didem Tu tenê Xwe dê yî û ez tenê liber Te dipariyêm.**
Paşê serê xwe bizvrîne ser mile rastê û bêje
**Aştî û rehma Xwe dê li ser te bît.**
Paşê serê xwe bizvrîne ser mile çepê û bêje
**Aştî û rehma Xwe dê li ser te bît.**
**.................................................................................................**

**** Bila aştî û rehma Xwe dê li ser te bît. ****
**** Te bi zimanê Kurdî nûbêja sibê xwand! ****

**.................................................................................................**
Piştî nûbêjê tu dikarî weke pariyan ewê bêjî yanjî her tiştek dîke te li Xwandina (Qurana) pîroz da hez lê kir bêjî.
Min bo ev pariyanê sirûş li Xwandina (Qurana) pîroz wergirtiye.
**Ey Xwe dê, Xwedanê min, li gunehên min, dayk û babê min û hemû bawermenda xweş be.**
**Ey Xwe dê, Xwedanê min, bêpayan sipas bo erêniya Te li ser min, dayk û babê min û hemû bawermenda.**
**Ey Xwe dê, Xwedanê min, min li rastiyê nêzîk bike, zanista min zêde bike û min wergire naw durustkara da.**
**Paye bilindî ya Te ye, bêpayan sipas bo Te.**

**Eve Devê Nûbêja Nîvro ye!**

Destê xwe bilind bike ber serê xwe û bêje

**Xwe dê, ez dixwazim bo nûbêja nîvro 4 cara xwe li ber te biçemînim, Xwe dê li min bipejirîne.**

Paşê bêje

**Ey Xwe dê mezin.**

Paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser destê çepê. Ew car para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Xwe dê mezin li min bibhore.**

Carek dîke serê xwe binvîne û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê bêje

**Ya Xwe dê mezin**

û rabe ser pêya, paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser destê çepê û carek dîke para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Xwe dê mezin li min bibhore.**

Carek dîke serê xwe binvîne û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Pesin, pariyan û peyvên pak hemû bo Xwe dê ne.**
**Ez gewahiyê didem Tu tenê Xwe dê yî û ez tenê liber Te dipariyêm.**

Paşê rabe ser pêya û bêje

**Ey Xwe dê mezin.**

Paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser
destê çepê. Ew car para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Xwe dê mezin li min bibhore.**

Carek dîke serê xwe binvîne û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê bêje

**Ya Xwe dê mezin**

û rabe ser pêya, Paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser
destê çepê û carek dîke para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Xwe dê mezin li min bibhore.**

Carek dîke serê xwe binvîne û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Pesin, pariyan û peyvên pak hemû bo Xwe dê ne.**
**Ez gewahiyê didem Tu tenê Xwe dê yî û ez tenê liber Te dipariyêm.**

Paşê serê xwe bizvrîne ser mile rastê û bêje

**Aştî û rehma Xwe dê li ser te bît.**

Paşê serê xwe bizvrîne ser mile çepê û bêje

**Aştî û rehma Xwe dê li ser te bît.**

………………………………………………………………………………………

**** Bila aştî û rehma Xwe dê, li ser te bît. ****
**** Te bi zimanê Kurdî nûbêja nîvro xwand! ****
***** Jibo nûbêjên nîvro, êvar û şevê tu 4 cara xwe diçemîni. *****

………………………………………………………………………………………

Piştî nûbêjê tu dikarî weke pariyan ewê bêjî yanjî her tiştek dîke te li Xwandina (Qurana) pîroz da hez lê kir bêjî.

Min bo ev pariyanê sirûş li Xwandina (Qurana) pîroz wergirtiye.

**Ey Xwe dê, Xwedanê min, li gunehên min, dayk û babê min û hemû bawermenda xweş be.**

**Ey Xwe dê, Xwedanê min, bêpayan sipas bo erêniya Te li ser min, dayk û babê min û hemû bawermenda.**

**Ey Xwe dê, Xwedanê min, min li rastiyê nêzîk bike, zanista min zêde bike û min wergire naw durustkara da.**

**Paye bilindî ya Te ye, bêpayan sipas bo Te.**

**Eve Devê Nûbêja Rojava ye!**

Destê xwe bilind bike ber serê xwe û bêje

**Xwe dê, ez dixwazim bo nûbêja rojava 3ê cara xwe li ber Te**
**biçemînim, Xwe dê li min bipejirîne.**

Paşê bêje

**Ey Xwe dê mezin.**

Paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser
destê çepê. Ew car para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Xwe dê mezin li min bibhore.**

Carek dîke serê xwe binvîne û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê bêje

**Ya Xwe dê mezin**

û rabe ser pêya, paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser
destê çepê û carek dîke para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Xwe dê mezin li min bibhore.**

Carek dîke serê xwe binvîne û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Pesin, pariyan û peyvên pak hemû bo Xwe dê ne.**
**Ez gewahiyê didem Tu tenê Xwe dê yî û ez tenê liber Te dipariyêm.**

Paşê bêje

**Ey Xwe dê mezin.**

û rabe ser pêya, paşê destê çepê danê ser nawika xwe û destê rastê jî danê ser
destê çepê û carek dîke para kilîlê bêje

**1 Bi navê Xwe dê, Xwedanê Rehmê, Ev ê ku Rehmê didet.**
**2 Pesn jiboy Xwe dê ye, Xwedanê dinya ya. 3 Xwedanê**
**rehmê, Ev ê ku rehmê didet. 4 Padişahê Roja dadweriyê.**
**5 Ev Tu yî ku em diperestim û Ev Tuyî em daxwaza**
**yarmetiyê lê dikem. 6 Me rênivîniyê rêya rast bike.**
**7 Rêya ewên ku Te qencî lê kirîne, ewên ku kerb nevekirîne,**
**ewên ku li rê nederketine.**

Paşê xwe biçemîne û destê xwe danê ser çokên xwe û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê gelek mezin.**

Paşê xwe rast bike û bêje

**Xwe dê Tu min dibhêy, ez li ber Te dipariyêm.**

Paşê bikeve ser çokê xwe û serê xwe binvîne ser erdê û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Xwe dê mezin li min bibhore.**

Carek dîke serê xwe binvîne û bêje

**Paye bilindî bo Xwedanê mine, Ev ê herî bilind.**

Paşê ser çokê xwe rûnê û bêje

**Pesin, pariyan û peyvên pak hemû bo Xwe dê ne.**
**Ez gewahiyê didem Tu tenê Xwe dê yî û ez tenê liber Te dipariyêm.**

Paşê serê xwe bizvrîne ser mile rastê û bêje

**Aştî û rehma Xwe dê li ser te bît.**

Paşê serê xwe bizvrîne ser mile çepê û bêje

**Aştî û rehma Xwe dê li ser te bît.**

……………………………………………………………………………

**** Bila aştî û rehma Xwe dê, li ser te bît. ****
**** Te bi zimanê Kurdî nûbêja Rojava xwand! ****

……………………………………………………………………………

Piştî nûbêjê tu dikarî weke pariyan ewê bêjî yanjî her tiştek dîke te li Xwandina (Qurana) pîroz da hez lê kir bêjî.
Min bo ev pariyanê sirûş li Xwandina (Qurana) pîroz wergirtiye.
**Ey Xwe dê, Xwedanê min, li gunehên min, dayk û babê min û hemû bawermenda xweş be.**
**Ey Xwe dê, Xwedanê min, bêpayan sipas bo erêniya Te li ser min, dayk û babê min û hemû bawermenda.**
**Ey Xwe dê, Xwedanê min, min li rastiyê nêzîk bike, zanista min zêde bike û min wergire naw durustkara da.**
**Paye bilindî ya Te ye, bêpayan sipas bo Te.**